

SAL 1



YEQŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 1



15 GULAN 1932

## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

### Têdaxistiyên Qomelê

Armanc, awayê xebat  
 û nivisandina Hawarê  
 Ji xwendevanên re  
 Elfabeya Qurdî  
 Stûna fekehan  
 Stûra zêrowan : buhar  
 Edebiyata welatî  
 Hawar hebe, gazi li dû ye.  
 Di dora dinyayê de  
 Xatirxwaziya Memî  
 Hêvî ji xwendevanan  
 Ferhengoy

FONDS  
 ROGER LESCO



Birê Frensizî

Buts et caractères de la revue Hawar  
 L'alphabet Kurde  
 Notices sur la littérature, mœurs et  
 coutumes Kurdes



## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

## Armanç, Awayê Xebat û Nivîsandîna Hawarê

Hawar dengê zanîné ye. Zanîn xwe nasîn e, xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedîqe.

Her qesê qo xwe nas diqe; diqare xwe bide nas qirin.

Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas qirin. Lewma qo zman şerta heyîné a pêşîn e.

Hawar jû pëve bi her tiştê qo qurdanî û qurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyasê jê dîr e, xwe naêxe siyasê.

Hawarê siyasê ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de dê bixebitin.

\*\*\*

Awayê xebatê. — Qareqî qo biqare biçê serî, divêt jê re pronivîseq bêt çêqirin. Me pronivîsa xwe ser bingehên jêrin lêqiriye.

1 — Belavqirina Elfabêya qurdî di nav qurdan û hîngirina wê. Senifandîna zmanazîna qurdî û hîn bi hîn di qomelê de belav qirin û pêşdetir di şiqelê qitêbê de derêxistin.

2 — Şehîtiya zarên qurdî û berhevdanîna wan. Şehîti ser mirovatîya zmanê qurdî digel zmanên din ên arî. Şehîti ser bingehên zmanê qurdî, ser diroq û awayê rabûn û pêşveqetina wî.

3 — Ber hevqirina çîroq, çîrçîroq û her texlît laje û stranên qurdî û birêve belavqirina wan.

4 — Senifandin û belavqirina diwanên qurdî. Bi van ve jînenigarîyên şair û mirovên bijarte jî dê bîn belav qirin.

5 — Şehîti ser reks û Keydeyên stranên qurdî.

6 — Şehîti ser her texlît rêzîqên qurdî û Qurdistanê, yên zemanê borî û yên îrû û senifandîna wan. Şehîti ser natinên Kurdistanê û piş û sinhetên qurdî.

7 — Diroq û erdnigarî:

Şehîti ser tevayîya diroq û erdnigariya welatê Qurdistanê û ser diroqa eşiran, berî, paşî û di wextê Mîr-Şeref de.

\*\*\*

Awayê nivîsandîne — Di hekê zmanê me de heta niho geleş tişt hatine gotin. Li nav van gotinan de tiştînen rast û nerast jî hene.

Ez qo qurdî û qurdmanezman im û zmanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zmanên din danîye ber hev, qitqitên wî hîrhûnandîne; keydeyên wî jî hev derêxistinê, diqarim jî biyanîyan bêtir û kenctir dehqera wî bidim xuya qirin û zanîn.

Zmanê me îrû hem freh hem teng e.

Frehe: Pi her tiştê qo qurdî pê mijûl bûne, dest dane wan, di wî warî de zmanê qurdî hing zmanên din û jî hinan bêtir pêş ve çûye, û qemiliye, û jî tu zmanên qemeli bi şûn de ne maye.

Tenge: Herçî qo jî qurdan re nenas mane û qurdî pê mijûl ne bûne, di wî warî de zmanê me rawestiyaye, pêş ve ne çûye, di cihê xwe de maye.

Lê zmanê me jî wan zmanan e qo ber her tiştê nuh, pîrsên nuh dizên û birêve pîrsên nuh jî wan çar dibin.

Herweqî xelqê Geliyê-Goyan, berî çardeh salan, gava tiyare ditin, tavil bizarê xwe balafir nav lê qirin. Ji lewre

qo ji banî, ji bala difire, Dîsan qurdmançinen qo tîlêfon dîtin, ji mesmêçê wê re bihistoq gotin. Ji ber qo deng pê têt bihistin.

Niho em vegerin ser gotna xwe; ser awayê nivîsandina zmanê xwe.

Îrû di zmanê me de du texlit qem-anî hene: wînda bûna pîrsinen qurdî û qetîna pîrsinen biyanî nav zmanê.

Em çî b qin qo zmanê me biqare vegere ser xuritiya xwe û di nav zar û zarawayên xwe de biqemile û bibe zmaneqî teqûz:

Di wînda bûna pîrsan de, pîrsin hene yeqar wînda bûne, hin hene ji zareqî qetine lê di zareqî din de dijtin û çendeq hene di axaftinê de qem tene gotin lê di mamîq, medheloq, çîroq û stranên de tene bihistin,

Em li peywan in, hin bi hin em wan dîxîn dest û dîsenifînin û gora melîcê jî ji nuh ve ser awayê hevedudanîna pîrsen qurdî pîrsinen nuh çêdîqin,

Ji bona pêşveçûna zmanê, divêt em bendên xwe bi tevayîya van pîrsan binivîstin û li paşîya her hejmarê ferhengê qeçê danin û tê de mana pîrsen qo di zaran de qem bûne û yên qo ji nuh ve hatine hevedudanîna ji xwendevanên xwe re bidim zanîn. Ji xwendevanên xwe hevî diqim ferhengê qeçê me kenc bixwînin û di heke pîrsê qeçê de qo fiqreçê wan hebe ji me re binivîstin; heqê cîyoqê pîrsêqê bizanin, ewa ha jî tev mana û ferken wê digel cîyoqê xwe ji me re bidin zanîn.

Weqo: rêqirin, şandin, hinartin cîyoqên hev in. Lê di mana rêqirinê de jî mana şandin û hinartinê farqê heye. rêqirin, herhal, bi rê existin û şandin e.

Dîsan, xeberdan, axaftin, peyivîn cîyoqên hev in. Gelo di nekeba wan de çî ferk hene?

\*\*\*

Hawar zarêqê nûza ye. Zarowa me ye; zarowa qurdan e. weq her zaro bi xweyîtiya dê û bav, bra û pîsmamên

xwe diqare bîji. Herqes, her qurd diqare arîqariya hawarê biqê.

Tuqes mebeje qo, ez miroveqî reben û neqerhatî me. Ji min ji diayê pêve tişteq naye.

Belê, tuqes vê xeberê mebeje, herqes bi tişteqî, bi awaqî diqare bê hawra hawarê. Tinê di be qo awayê hawarê nîzane. Jê re çend awa hene:

1— Qiriyarê hawarê bûyîn û jê re qiriyaran peyda qirin

2— Navên mirovên xwendewar lê nemaldar, qo niqarin qiriyar bibin, û navên medresan ji me re dan zanîn. Da qo hawar ji wan re herwe bête şandin.

3— Paş xwendina hawarê ji heval û nasên xwe re dan xwendin û ji mirovên nexwenda re bi xwe xwendin û ew ser tîdexistiyên qomelê serwest qirin

4— Ji hawarê re her texlit şîr û bendan nivîsandin.

5— Çîroq, medheloq û mamîqan berhev qirin û ji hawarê re şandin.

6— Di heke welat, eşîr, bajar û gundê xwe de tiştên qevn û nuh ji hawarê re rêqîqin:

7— Her texlit bergehên Qurdistanê peyda qirin û digel weslên wan ji me re hinartin.

Ji gotinên jorin kenc dixuye qo ji hawarê re arîqirin geleşê hesanî ye. Qesê qo dil biqê dê biqare jî.

\*\*\*

Di destpêqê de qomela me di pînzdeh rûjan de careqê dê derqeve. Piştî çend hejmaran qomela me dê bibe helteqî û li serê her heftêyê dê belav bibe.

### JI XWENDEVANAN RE

Hawar hawara we ye,

Deng û gazîya we ye.

Jin û zanîna we ye,

Werin, hawara xwe bin.

HAWAR

# Elfabêya Qurdî

BI NAVÊ YEZDANÊ PAQ Ê  
DILOVAN Û MIHRIVAN

Elfabêya qurdî ji sih û yeq herfan hevedudanî ye:

a b c e ç d i g h x ê j i k q u  
l m n o p r s t û f v w y z .

Herf di dengdayîyê de du texlîtin: dengdêr û dengdar .

Dengdêr ew herf e qo dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe derdîqeve û dengê dengdaran derdixîne .

Dengdar ew herf e qo dixwedeng e, ê belê dengê wê bi serê xwe û bê ariqariya dengdêrê dernaqeve .

Di zmanê qurdî de heşt dengdêr hene :

a e i ê î u o û

Lewre qo di denganiya qurdî de dengdêrêq geh, qin û geh drêj nabe dengdêrên qurdî di drêjahîya dengên xwe de serseqinî ne : qin û drêj in.

Dengdêrên qin :

e i u

e - der دەر , ser سەر , şer شەر

i - qin قین , bin بـین , din دین

u - qurd قورد , qur کور , qul گول

Dengdêrên drêj :

a - av آف , sar سار , bar بار

ê - dêr دەر , şer شیر , mêr مەر

î - tîr تیر , zîv زیف , şiv شیف

o - dor دەر , sor سور , qor کور

û - qûr کور , şûr شور , dûr دور

Di zmanê qurdî de bîst û sê dengdar hene:

b - bar بار , bav باف , ban بان

c - car جار , can جان , çin çin

ç - çar چار , çin çin , çem çem

d - dar دار , dan دان , din دین

g - gav گاف , giş گیش , garan گاران

h - him هیم , heja هیزا , halan هالان

a - xanî خانى , xwarin خوارن , xêr خیر

j - jin جین , jor زور , jazî ژازى

k - kir کیر , kenc کنج , keli کلی

q - qa قا , qer کر , qom کوم

l - lo لو , law لاو , lez لـز

m - mar مار , mêj مـیژ , maq ماك

n - nan نان , nerm نرم , nas ناس

p - par پار , por پور , pehn پـهن

r - rê رـی , rû رو , reş رـش

s - sar سار , sebat سبات , sofî صوفى

ş - şor شور , şev شـف , şa شا

t - tîr تیر , taket تاکت , tûj تـۆج

f - tanos فانوس , filan فلان , find فـند

v - vaji جازى , vala فالـا , virni قرنى

w - war وار , weris وریس , weq وک

y - yar یار , yeq یـک , yari یاری

z - zor زور , zabit ضابط , nafiz نافذ

Ji van pêve du herfên biyanî hene qo bireq ji qurdan wan dibêjin. Lewre qo ew herfên ha di eslên xwe de ne qurdî ne me ew ne existîne nav elfabêya xwe .

Ew ji (ح) û (غ) ne, me ew du herf bi danîna du dekan ser «h» û «x» nîşan qirine .

h - hal حال , x - xar خار

Qo ev du dek qetin ev herfên ha vedigerin ser herfên qurdî û dibin «h» û «x» .

Ji xwe piraniya qurdan şîna (غ) xeyidîn , xeyidîn , dibijta ; (خ)

Hawar denge zanîne ye . Zanîna ji me

me şî zanîn . به زانینی دنکی هادار

re rêya felat û xweşiyê vedîçe. Her qesê  
 کسی هر ئەدکە خوشی یی و فلات رێ یا ره  
 qo xwe nas diqe diqare xwe bide nas  
 ناس بده خوه دکاره دکه ناس خوه کو  
 qirin. Hawara me berî her tiştî heyîna  
 ههینا تشتی هر بری مه هاور . کرن  
 zmanê me dê bide nas qirin. Lewma qo  
 کو لوما کرن ناس بده دی مه زمانى  
 zman şerta beyîné a peşîne. Hawar jû  
 ژو هاور . . . پشین آ ههینی شرطاً زمان  
 pêve bi her tiştê qo qurdanî û qurdîti pè  
 پى کردی و کردانی کو تشتی هر ب پشه  
 bendewar e dê mijûl bibe .

بیه . ژهل دي . بندوار

Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêz-  
 anîya elfabêya qurdi quta qir. Ji nihopêde  
 bi hûrhûnandîna hevedudanîna wî dê  
 mijûl bibin

Dûmahîq beye .

### Stûna Fekehan :

Pêrar, digel çend hevelan derqeti bûm  
 gerê . Çendeqê di nav fekehan de mam .  
 Me sê çar medrese ditin Di hin medresan  
 de derqeti ji xelqê cih bêtir bûn. Di nav  
 wan de xortên her welatî, her eşîrî peyda  
 dibûn Serhedî, Heza romî, Botî, Diyabe-  
 qri, Bidlîsî, Mûşî, h. p.

Bi ditîna min gelek qêfxweş dibûn, Ji  
 min ser qurdanî gelek tiştan dipirsîn. Pira-  
 nîya wan bi herfên latîni jî dizanibûn.

Pêqve digotin qo qurdmancî bi herfên  
 latîni gelek kenc têt nivîsandin Ji bin paşî  
 lèn xwe pelin derdixistin û jî min re di-  
 xwendin. Tedigot, hemî jî şair bûn. Şih-  
 rên wan tev ser welêt û millet bûn.

Weqo: Bêriya Botan, Zozana Şerevdîne.  
 Girên beriyê, Çiyayên Dêrsimê, Bidlîsa-qe-  
 vnar . . .

Girêdana wan jî qurdmancî bûn, Ji  
 xelqê cih rejî cilên qurdmancî dabûn we-  
 rgitin. Qolosên xwe bi xwe çêdîqirin.

Di nav axaftinê da min jî wan re da-  
 zanîn qo dilêmin heye rûjnameqê qurdi  
 derêxinim .

Stûna Zarowan

## BUHAR

Buhar e , nuh buhar e ,  
 Tebîet giş li qar e ,  
 Çi heyadedan çi hal e .  
 Her tişt zendî reual e .  
 Buhar e , ev buhar e ,  
 Tebîet giş li qar e .

Berf dîhele li zozan ,  
 Stîrî şin in li deştan .  
 Qulîlq hêj nuh şepal in ,  
 Gul u bilbil heval in .  
 Buhar e , nuh buhare ,  
 Tebîet giş li qar e .

Mij qetiye li doran ,  
 Hure-hur e tumbaran .  
 Mih û berx in diqalin ,  
 Qeû li marî dinalin .  
 Buhar e , ev buhar e ,  
 Tebîet giş li qar e .

Roj vedide mîna bûq ,  
 Şun ve mane ba û pûq .  
 Şehar , zinar , lat û ber  
 Diçîrisin der bi der .  
 Buhar e , nuh buhar e ,  
 Tebîet giş li qar e .

Ji min daxwaz qirin qo jî wan re di  
 rûjname de stûneqê veqim Di vê stûnê de  
 herçî qo di mederesan de nayin xwendin  
 jî wan re bidim zanîn.

Em welê lêqhati bun qo wan jî min  
 bipirsin ez jî gora pîrsiyariya wan behsên  
 ser ilnû hiner jî wan re bêjim ,

Fekehino! Eve stûna we. Hon hema  
 bipirsin. Herçî ez bi xwe dizanim jî we  
 re bêjim , heqê di nav pîrsiyariyên we de  
 tişteq hebe qo ez pè nizamim jî wan bi  
 pîrsim qo pèdizanin û jî we re bidim zanîn.

# Edebiyata Welatî

Edebiyata welatî, ew edebiyat e qo ji jîna miletî, ji his û dilê wî, ji diroq û çirçiroqên wî, ji stran û lajeyên wî biltet .

Qaniya wî, dilê millet, his û heyata wî ye.

Tinê ev edebiyat e , qo germ rengin, bibihn û xwedan ruhnahtî ye.

Ji vê edebiyatê , dengê blûr û dilanê , stranên çiyê , zizîya hevîn û hejqirné bi teptepa dilan ve tèn bihîstin.

Piraniya miletan pirtecar vê rastiyê seh ne diqirin, ber ne diqetin .

Li ewropayê, miletin hebûn qo hej zmanên xwe ne deqirin. Zmanên xwe qîçiq, teng, nespehî û nehêja didîtin .

Ev hal di welatên rohelatî de jî dihat dîtin .

Herweqî di nav qurdan de, heçî mirovên zana radibûn qitêbên xwe ne bi zmanê qurdî lê bi zmanê biyanîyan dinivîsandin .

Piştî xebata sedan salan , di welatên ewropa û rohelat de hate seh qirin qo ev rê dernaqeve û ev awa naçe serî .

Çiqo millet ji wan qitêban re guh ne dida û xebata wan mirovan bersurdar ne dibûn. Ber vê yeqê ev mirovên ha veqerîyan ser zmanên xwe. Vêca xebata wan zûqa berên xwe dan û millet pey edebiyata wan çû .

Bi vî awayî di nav wan miletan de edebiyateqê geş û zendî çar bû .

Êdin her qes zana nezana, bajarî gundî qo xwendinê zanî be, zmanê wan seh diqirin , û qitêbên wan dixwendin .

Ji xwe welê jî diviya bû .

Ji her qo ji nivîsandin û belavqirina qitêban kesd ew e qo his û fiqrên kenc biqevî nav xelqî, di dil û serên wan de cih bigirin .

Ji mesela zmanî pève meseleqê din jî heye .

Herweqî nas e , fiqr û his di dora zmanî de xwe digehîtin hev, û her zman fiqr

û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin , û pey zmanên xwe diqevî .

Bi vî awayî digel zmanî fiqr û hisên biyanîyan ji tèn diqevî nav me , di dil û hisê me de cih digirin , û rû û gonê me ên manewî diguhêrinin , di heşifînin .

Paşî vê gotinê , kesda me , awayê edebiyata me ji xwe têt seh qirin , û ew rêya qo em tê re dixwazin herin bi xwe vedibe û diqeve pêşîya me .

Vêca, divêt qo em bi zmanê dê û bavên xwe, bi zmanê şîrîn û delal, bi zmanê qurdî, bi qurdiya xwerû binivîsinin , û fiqr û hisên xwe ji çiroq û stranên qurdî bigirin .

Ji xwe Ehmedê - Xanî berî sêsed salî vê rêyê ji me re veqirî bû. Lê heyt paşiyên wî pê ve ne çûn .

Xanî qitêba xwe bi qurdmancî nivîsandî bu û fiqr û hisên wê ji çirçiroqe qurdî , ji Memê - Alanê girti bû

Xanî xurtiya zmanê xwe hej wê gavê heşîya bû , û ji wan re qo pê ne dinivîsandin bi beyta jêrin dixwest bide zanin

«Safi semirand vexwar durdî

Mavendi - derî lisani - qurdî ».

Êdin çax e , qo em bidin pey Xanî .

Dr. Qamiran Ali Bedir-Xan

## HAWAR HEBE. GAZÎ LI DÛ YE

Ji bona brayê min Osman Sebrî

Şevqe tarî. Çav çavan nabine. Keşa erdê weq gîzanan lingên min ên xwas dibire. Bayê reş carnan diqeve guheqî min û di e din ra derdiqeve. Ket nizamim qo li qî me? Heyîna xwe bi lûxistina gopal li erdê dizanim. Ev çend rûj û şev e bi vî awayî diçim, dawî nayê, ji welatê berf û bagerê xelas nabim ...

Belê, îsev jî weq her şev tarî ye. Berf û bager ji awaqî li min dide; Sar e, dicemidim. Tewş e, livîn di min ne ma, deng ji min dernayê. Tinê sê dengan min qre gazî û hawar!

lieu immédiatement après la publication complète de l'alphabet. Aujourd'hui nous donnons les premiers Pages.

2— Etude comparée des différents dialectes de la langue Kurde. Etude de la parenté de la langue Kurde avec certaines autres langues. Etude de l'histoire de ses origines

### 3— Folklore

Cette partie de notre programme sera la plus fertile. Elle prendra soin de la publication des légendes, contes et chansons Kurdes. Une partie de ces publications sera traduite en français.

### 4— Littérature écrite :

Malgré que le Kurde n'a pas été régulièrement écrit, il a eu tout de même des poètes qui ont écrit en leur langue maternelle et nous ont laissé différents manuscrits, dont quelques unes ont déjà vu le jour, nous prendrons soin de les publier peu à peu et plus tard de les classer suivant l'ordre chronologique; ces études contiendront aussi la biographie des hommes de lettre et de divers personnes illustres.

### 5— Musique et Danse :

Dans cette partie nous chercherons à déterminer les caractéristiques de la musique nationale, de fixer et de noter ses mélodies ainsi que les caractéristiques, rythmes et figures des danses Kurdes.

### 6— Moeurs et coutumes :

Etude, déterminations et classification des mœurs et coutumes sociales, morales et religieuses du passé et du présent.

Détermination des principes qui ont gouverné la vie sociale jusqu'à nos jours. Définir le costume national et arrêter les nuances d'après les différentes contrées. La vie économique du pays, ses produits et son industrie nationale.

### 7— Histoire et géographie :

Etude de l'histoire et de la géographie générale du Kurdistan et étude de l'histoire des tribus, avant, pendant et après « Mir Cheret » Classification et publication de l'évolution et de l'influence des Kurdes, au

cours des périodes historiques, ainsi que l'histoire de sa vie politique, sociale et religieuse.

\*\*\*

Nous commencerons la publication de notre revue par quinzaine. Après quelques numéros elle deviendra hebdomadaire.

Notre revue sera publiée essentiellement en langue Kurde et française.

Les articles et les études qui seront publiés dans la partie Kurde seront aussi insérés dans la partie française, exceptés les articles qui auront un caractère purement d'enseignement primaire pour les jeunes gens Kurdes.

## L'alphabet Kurde

L'alphabet Kurde se compose de (31) lettres :

a b c e ç d i g h x ê j  
i k q u l m n o p r s  
t û f v w y z

### LES VOYELLES

La langue Kurde possède 8 voyelles :

a e i ê i u o û

Comme dans la phonétique Kurde un son de voyelle émis d'un même point de l'organe d'articulation ne peut pas être tantôt bref et tantôt long, les voyelles Kurdes sont stables dans la durée de leurs sons, elles sont brèves ou longues et ne varient jamais comme en français. Par conséquent les voyelles brèves ne deviennent jamais longues et les longues ne deviennent jamais brèves.

Les voyelles brèves sont :

e i u

Les voyelles longues sont :

a ê i o û

Voyelles brèves :

E — se prononce comme dans le mot « dette », mais plus fermé et tout à fait bref.

I — ressemble un peu aux « i » de « guirlande » et de « litre » mais plus fermé et tout à fait bref, comme le « e » final des infinitifs allemands ;



kommen, gehen, streiken, essen etc

U — peut être considéré comme composé d'une consonne et d'une voyelle, amalgame du «w» avec le «i»,

swind-sund xwirdeq - xurdeq.

**Voyelles longues :**

A — est toujours long, comme dans les mots pâle, âne. Il correspond donc à un «â» français et aux «a» des mots allemands suivants : mached, sprache, plural.

Ê — est toujours long, comme le «ai» ou «ei» français, chair, laine, peine, ainsi que les (e) des mots allemands comme : jemand, jener, einige.

î — se prononce comme le (i) du mot (épître) mais encore plus allongé.

O — se prononce toujours long comme le (o) du mot (rôle).

û — c'est le (ou) français ou le (u) allemand qui se prononce toujours long comme dans le mot (la cour.)

Particularité du (ê) Kurde - le (ê) Kurde change de prononciation devant le (a) et le (è) quand ces deux lettres sont accidentelles. Dans ce cas il est prononcé comme un (i) mais un peu moins aiguë.

ortographe	prononciation
------------	---------------

Pè :	pêyê min	piyê min
------	----------	----------

Dê :	dêya min	diya min
------	----------	----------

### LES CONSONNES

Des consonnes Kurdes les quatorzes suivantes ont les mêmes sons que les consonnes françaises :

b d h j l m n p r s t f v z

H — le (h) en Kurde est toujours aspiré, comme dans les mots: le hameau, le haricot

Plûtôt comme le (h) allemand et anglais : haben, I have

C — équivaut en français à (dj) comme : Djidde, Djebel - Druze .

Ç - correspond à (tch) comme dans le mot Tchécoslovaquie .

G - ne diffère pas du (g) français qui vient après les voyelles (a,o,u) garçon, goudron, guirland. tout à fait le (g) allemand

X - c'est le (x) grec où le (ch) allemand: Buch, Il est souvent désigné dans

les écrits français pas un (kh) Bedir-khan.

K - c'est un (c) français, un peu fort, tel qu'on le prononce dans les mots suivants : cristal, café, cable, coran, qui s'écrivent dans l'orthographe allemande par le (k) que nous avons adopté: kristal, kaffe kabel, koran .

Ş — c'est le (ch) français : chambre, chaise, bouche .

W - c'est le (w) anglais: whisky, tramway .

Y - est toujours consonne et n'est jamais voyelle, il correspond en français au son du (l) mouillé comme le mot mouillé. Ainsi que dans les mots anglais: yes, year, yellow .

« » - Dans l'alphabet Kurde le traima est un signe orthographique qui se pose principalement sur les consonnes (h) et (x)

H - donne le son du (ح) sémitique, consonne spirante .

Ë - donne le son du (g) grec.

Comme on le verra plus tard le traima pourra servir aussi pour exprimer quelques nuances phonétiques dans le dialecte du sud.

\*\*\*

Il est bien facile de percevoir dans notre alphabet, au premier abord, comme cela arrive dans la plupart des choses, des lacunes qu'on pouvait éviter. Mais celles-ci ne sont que la conséquence d'une nécessité qui nous imposa de sacrifier des éléments de seconde importance pour d'autres qui sont de première ordre.

Par conséquent après avoir exposé brièvement notre alphabet nous donnerons quelques détails sur le procédé de sa transcription tout en discutant les principes fondamentaux.

Cette petite étude suivante est consacrée à cette discussion qui peut être en même temps considérée comme l'exposé des motifs de l'alphabet kurde.

Avant de commencer cette discussion

il est indispensable de marquer nos points de départ et les principes qui nous ont servi de base pour fixer l'alphabet kurde. Ces principes nous les avons réduits à six points fondamentaux . . .

1 — A l'exception des exigences imposées par la phonétique kurde, se conformer en forme et en vocalisme, dans le domaine du possible, aux lettres de l'alphabet turc.

Le but de l'alphabet visant à fixer les sons sur le papier par des formes, ces formes étant exclusivement conventionnelles il n'y a aucun inconvenient à noter le son du (dj) par (c) et le son de (tch) par (ç) et vice versa .

Au contraire par ce procédé nous faciliterons aux Kurdes habitant le Kurdistan turc, et à ceux qui connaissent déjà l'alphabet turc, l'accès de l'alphabet Kurde

2 — Garder dans le domaine du possible, les sons quasi internationaux, des lettres latines dans l'alphabet Kurde,

Ce procédé assurera aux Kurdes l'avantage d'apprendre facilement les alphabets des langues étrangères et le notre aux étrangers.

3 — Noter chaque son par une lettre indépendante et éviter le système des lettres composées .

Il est évident que les lettres composées sont à tout point de vue, plus compliquées que les lettres indépendantes .

4 — S'abstenir de noter différents sons par une même lettre ou un même son par différentes lettres .

(à suivre)

Notices sur la littérature  
mœurs et coutumes Kurdes :

### AVANT PROPOS

Nous donnerons sous cette rubrique quelques notes tendant à caractériser la littérature, surtout populaire, mœurs et coutumes Kurdes, qui peuvent présenter un certain intérêt pour nos lecteurs étrangers.

Nos articles tenderont surtout à fixer et à noter l'état actuel des choses. Nous ne parlerons que très succinctement des origines et de l'histoire des sujets que nous traiterons.

Un autre caractère essentiel de nos articles sera de montrer les mœurs et coutumes d'une manière absolument exacte sans chercher à les déformer pour qu'ils puissent présenter quelques analogies avec l'Europe.

Evidemment nous les Kurdes aussi nous aspirons à nous moderniser, l'adoption de l'alphabet latin en est une de ses preuves. Mais nous voulons tout simplement dire que dans notre état actuel, nous ne ressemblons pas aux européens et nous en differons par les mœurs, coutumes et caractères propres à notre race.

D'ailleurs serait invraisemblable, sous prétexte que quelques Kurdes s'habillent à l'europpéen, de peindre le costume Kurde avec un chapeau haut de forme, pour couvre-chef et un smocking pour tenue.

Le souci d'être véridique nous oblige de donner des portraits réels de notre mode de vie et de nos mœurs. Il nous est, par exemple, plus commode de manger le riz avec une bonne cuillère que de le becqueter avec une délicate fourchette.

Mais d'autre part nous trouvons très naturel que nos femmes jouissent d'une liberté qui fait défaut chez les autres peuples d'orient.

Etant donné que la femme Kurde remplace son mari pendant son absence et accède à tous les grades de la hiérarchie sociale, jusqu'à devenir chef de tribu .

Comme notre langue ressemble par sa construction et spécialement par sa lexicologie plutôt à l'allemand qu'à l'arabe, évidemment ceci aussi doit être fixé tel qu'il est. Bien que langue parlée en orient on ne voudra pas lui donner comme soeur la grande langue orientale, l'arabe.

En un mot nos articles seront les fidèles et nettes impressions de tout ce que nous traiterons .

Ce genre d'étude objective, a été, malheureusement négligé jusqu'ici par les intellectuels d'autres pays orientaux, par crainte d'être considérés comme primitifs et

même barbares. Il n'est pourtant ni intelligent, ni utile de transformer la réalité des choses. Il est préférable de les présenter sous leurs véritables cachets, puisque ce sont eux qui nous caractérisent comme peuple ou nation distincte.

Si ces coutumes sont incapables de nous rendre heureux dans le développement du mode de vie sociale, sous l'empire des nécessités du temps présent elles se modifieront et se développeront tout en se conformant aux aspirations du peuple, de manière à former une continuation de toute une culture nationale.

On doit naturellement faire exception aux systèmes et méthodes scientifiques. Ceux-ci sont des institutions, de nos jours, devenues tout à fait internationales.

Tout peuple qui tend à se moderniser et se reformer doit accepter les formes et les procédés les plus neufs et les plus perfectionnés. Car les premiers sont de la culture pure, tandis que les seconds une civilisation générale.

\* . \*

Les textes et les noms propres qu'on citera seront écrits avec l'alphabet kurde. Les lecteurs en étudiant l'alphabet kurde, très simple et phonétique arriveront facilement à les lire.

D'autre part nous nous mettons à la disposition des orientalistes et de tous ceux, qui voudraient avoir des explications complémentaires sur les sujets traités. Nos pages leur sont ouvertes pour toute question qui intéresse de près et de loin le kurde, le kurdistan et le kurdisme.

### LALANGUE KURDE

La langue kurde est une langue aryenne. Langue Indo-Européenne, Indo-Germane.

D'après les dernières recherches archéologiques et philologiques, il semble que la langue actuelle dont les Kurdes se servent, est la langue des Médes, comme celle des Persans et celle des Parses.

On admet aussi que la langue Kurde tire ses origines de la langue Zende et celle des Persans de la langue Peblewi.

Même aujourd'hui le Kurde parlé pas les Kurdes des alentours de [Hemedan] s'appelle [Qurdîya Zendi] qui veut dire le [Kurde Zende]

Dénomination qui tend à disparaître en devenant simplement Qurdî

Il y a déjà trois siècles que le poète Kurde «Ehmedê - Xanî », auteur de «Mem û zîn » fit allusion à la similitude de la langue des Kurdes et de la langue des Médes .

La poète fait de longues reproches aux hommes de lettre Kurde d'avoir négligé leur langue et d'avoir écrit en arabe, en persan et en turc, et il dit textuellement :

( à suivre )

### Qirîyarîya Qomele

Qirîyarî : Ji bona Sûriya, Tîrqiya  
Ecemistan, Irak û welatên Kevkasê :

Saleqî	500	Kirûş-sûrî
Şesmehqî	300	Kirûş-sûrî
Sêmehqî	175	Kirûş-sûrî

Ji bona welatên din :

Saleqî	150	Frenq
Şesmehqî	90	Frenq
Sêmehqî	50	Frenq

Her tişt bi navê xweyî tene şandin :

Şanî : Taxa Qurdan



### ABONNEMENTS

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase :

1 an	100 fr.
6 mois	60 fr.
3 mois	35 fr.

Pour tout autres pays :

1 an	150 fr.
6 mois	90 fr.
3 mois	50 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire :

Emir Djeladet Aali Bedir-Khan

Damas : Quartier Kurde

Xweyî û midirê berpirsiyar :

Mir Celadet Ali Bedir-Xan

كلمة: ( bel — بَل ) der , ser , qer

i — هي ما تقابل الكسرة في اللغة العربية كالكسرة من كلمة ( من min )

u — لا يصح مقابلة هذا الحرف بالضممة تماماً فهو يقارب الضمة بلفظة ( كُرْدُ — qurd ) gur, guvaştin

والاحرف الصوتية الممدودة هي :

a — هي ما تقابل الالف الممدودة ( آس — as ) awa, av

e — هي ما تقابل الياء المستعملة في الكلام العامي ككلمة (خير) وهي لا توجد في اللغة العربية الصحيحة: der, zêr, nêr

i — هي ما تقابل الياء الممدودة بلفظها العربي الحقيقي (جديد cedîd ) zîn, şîn

û — هي ما تقابل الواو الممدودة بلفظها العربي الحقيقي (نور — nûr ) dûr, rût, qûntar

o — لا يوجد لها مقابل في اللغة العربية وهي تقابل ال( o ) الافرنسية وتلفظ دوماً ممدودة ولا توجد بحالة قصيرة .  
والاحرف الصامتة هي كما يأتي :

b = ب ، c = ج ، ç = چ ، d = د ، دض = g = گ  
h = ه ، x = خ ، j = ژ ، k = ق ، q = ك ، l = ل  
m = م ، n = ن ، p = پ ، r = ر ، s = س ، ص ث  
ş = ش ، t = ت ط ، f = ف ، v = ف ، w = و  
y = ي ، z = ز ذ ظ

بما انه لا يوجد في اللغة الكردية حروف (ض ، ص ، ط ، ث ، ط ، ظ ، ذ ، ز) لذلك ففي كل الكلمات التي اخذها الاكراد من اللغة العربية ، يلفظ حرف (ض) مثل (د) و (ص) مثل (س) و (ط) مثل (ت) و (ذ ، ظ) مثل (ز) .

لقد دخل على اللغة الكردية من اللغات الاجنبية زيادة على حروفها حرف الحاء والغين في بعض انحاء البلاد الكردية .

فلذلك اعطينا لهذه الاحرف الصور الآتية :

h = ح — حال — hal

x = غ — غار — xar

موقعها بين سائر اللغات . ودرس العلاقات والروابط اللغوية التي تربطها بها .

٢- درس وتبع مرافق ومعالم ودواوين الامة الكردية في مختلف المناطق والأرجاء التي يقطنها الاكراد .

٣- درس مميزات الرقص الكردي باوزانه وواضعه . ودرس مميزات الموسيقى الكردية وثبتت لحنها

٤- البحث عن الاوضاع الاجتماعية كالدين والعادات والاخلاق البائدة والتي لا يزال يعمل بها الاكراد . ونعنين المبادئ الاجتماعية التي كانت وما برحت مسيطرة على حياتهم .

٥- جمع واحصاء الآثار العلمية والأدبية ونشرها ودرس آثار وتراجم رجال العلم والأدب من الاكراد .

٦- البحث عن احوال البلاد الكردية من حيث توزع سكانها ومن حيث اوضاعها الاجتماعية والسياسية والتاريخية وطبيعتها الجغرافية .

٧- درس جغرافية كردستان على اساس توزع العشائر قبل « الامير شرف » وفي ايامه وبعده .

## الاحرف الهجائية الكردية

تتألف الاحرف الهجائية الكردية من احدى وثلاثين حرفاً :

a b c ç d i g h x ê j i k q u l m n o p r s ş t û f v w y z

الثانية من هذه الاحرف هي صوتية والآخرى صامتة .

ان الحرف الصوتي في اللغة الكردية لا يكون احياناً قصيراً واهياناً ممدوداً انما يكون اما قصيراً واهياناً ممدوداً بصورة مطردة .

فالأحرف الصوتية القصيرة هي :

e — هي ما تقابل الفتحة في اللغة العربية ، كالفتحة من

صاحب الامتياز والمدير المسئول

الامير مهدي عالي بدرخان

## کوردجه الفبا

کوردجه الفبا ( ۳۱ ) حرفدن مرکبدر .

a b c e ç d i g h x ê j i k q u l m n o  
p r s ş t û f v w y z

بو حرفلردن ( ۸ ) ی صدالی ( ۲۳ ) ی صداسزدر .

صدالی حرفلر : a e i ê i u o û

کوردجه ده صدالی حرفلرک امتدادی ثابتدر .

بو صدالی حرف گناه اوزون و گناه قیصه او قوناماز . بنا

برین صدالی حرفلر قیصه و اوزون اولقی اوزره معین ایکی

غروب تشکیل ایدرلر .

قیصه صدالی حرفلر : e i u

اوزون صدالی حرفلر : a e i o u

قیصه صدالی حرفلر :

e — تور کجه الفباده کی ( e ) نک مقابلیدر .

( gelmek , germek ) کهلرنده اولدیغی گبی

i — تور کجه کی نقطه سز ( i ) در .

u — ( w ) صداسز حرفیله ( i ) صدالی حرفلرک

امتزاجندن وجوده کان بر صدایی افاده ایدر . sund

اوزون صدالی حرفلر :

( a ) — ( kâtip ) کلیمه سنده کی اوزون ( a ) در .

e — ( ergeç ) کلیمه سنده کی ( e ) لرک اوزون

اولارق تلفظنه معادل برس و بریر . فرانسزجه ( peine )

کلیمه سنک ( ei ) سیدر .

i — ( tiz ) کلیمه سنده کی تور کجه الفباده ( i )

ایله کوستر یان و فقط دائماً اوزون او قونان بر ( i ) در .

û — ( duradur ) کلیمه سنده کی اوزون ( u ) در .

صداسز حرفلردن

b c ç d h j l m n p r s ş t f v y z

تمامیله تورک الفبا سنده کی حرفلرک سسلر بنه مال کدرلر .

متباقی صداسز حرفلر :

g — ( geldim ) کلیمه سنده کی ( g ) در .

k — ( kar ) کلیمه سنده کی ( k ) نک غیر تلاقندن

تلفظنه تقابل ایدر .

q — ( kâzim ) کلیمه سنده کی ( k ) نک بر آزالین

تلفظنه معادلدر . فرانسزجه ( quatre ) کلیمه سنده کی

( que ) سیدر .

x — عربلرک ( خ ) سننک عینیدر .

yy — انگلیزجه ( yy ) در ( Whisky, Tramway )

عربلرک تور کجه املاده ( vesl ) شکنده یاز یلان

کلیمه کی ( v ) بی تلفظاری گبی

بعض مناطقه کوردلر ( ح ) و ( غ ) ی ده تلفظ

ایلمکده درلر . بو حرفلر کوردجه ده مبادلری اولان

حرفلرک اوزر بنه ( .. ) اشارتک وضعیله و الفبا خارچنده

اولقی اوزره شو صورتله کوسترلشدر . ħ = ح x = غ

نقطه سز ( i ) و اشارتلی ( g ) تدارک اولنه مدیغندن اشبو

تور کجه عباره لی الفبا ره بری بالضرور اسکی حرفلرله ترتیب

ایدلشدر .

## بری عربی

### هدفنا و خطتنا

لقد اسسنا مجموعة (هاوار) لغاية علمية وادبية

محصنة، فهي اذاً لن تتدخل في الشؤون السياسية مطلقاً .

اننا نريد ان نخدم في هذه المجموعة اللغة الكردية

والادب الكردي؛ وقد وضعنا لذلك برنامجاً نسير عليه

في بحثنا ودرسنا كما يلي :

المبادئ الاساسية :

۱- نشر الالفباء الكردية الحديثة بين الاكراد .

ودرس اللغة الكردية وتدوين قواعدها والبحث في مختلف

لهجاتها . والبحث عن القواعد والاصول التي خضعت

لها هذه اللغة في تطورها منذ اقدم العصور . وتعيين

### الفبای کردی

الفبای کردی از سی و یک حرف ترکیب میشود :  
a b c e ç d i g h x ê j i k q u l m n o p r s  
š t ū f v w y z

هشت حرف از آنها با صدا و بیست و سه حرف بی صدا هستند .  
در زبان کردی حرف با صدا گاهی کوتاه و گاهی دراز  
نمیشود . بدین جهت حرفهای با صدا دو قسم اند . کوتاه  
است و دراز .

حرفهای با صدا و کوتاه :

e — مقابل فتحه است : پَر per

i — مقابل کسره است : فاریس faris

u — این حرف بلکه نزدیک ضمه است ولی در حقیقت

ضمه نیست : کُرد qurd

حرفهای با صدا و دراز :

a — مثال (آ) در کلمه (آمدن) ameden

ê — مثال (ی) در کلمه (دیر) dêr با صورت که

کردها تلفظ میکنند .

î — مثال (ی) در کلمه (شیر) şîr

û — مثال (و) در کلمه (روز) rûz

o — مثال (او) در کلمه (او) ضمیر شخصی

حرفهای بی صدا ازین قرارند :

b = ب ، c = ج ، ç = چ ، d = د ، ض = g = گ

h = ه ، x = خ ، j = ژ ، k = ک ، q = ق ، l = ل

m = م ، n = ن ، p = پ ، r = ر ، s = س ، ص

ت ، ş = ش ، t = ت ، ط ، f = ف ، v = ف

w = و ، y = ی ، z = ز ، ذ ، ظ

در زبان کردی حرفهای (ض ص ث ط ظ ذ)

علیحده وجود ندارند . بدین جهت برای آنها حرفهای

جدیدی معین نشده است .

بعض کردها حرفهای (ح) و (غ) را تلفظ میکنند .

وآن حرفها بدین شکل نوشته میشود :

ح = h ، غ = x

آزمرو قسکی ر بن ونکیرهاتی مه ؛ ژمن ژدعایی پیقه  
تیشتیک نایه .

بلی ، تو کس فی خبری میبیره ، ژلوره کو آف  
نهراسته . هروکی مه گوت هر کس ب تیشکی ،  
ب آواکی د کاره بی هاوارا هاواری . تنی دبه کو  
آوایی هاواری نزانه . ژیره چند آواهنه :

۱ - کر پیاری هاواری بوپن و ژیره کر پیاران  
پیدا کرن .

۲ - ناوقین مروقین خوندوار لی نه مالدار کو نکارن  
کر پیار بین و ناوقین مدرسان ژمره دان زانین ، دا کو  
هاوار ژوان ره هروه بیته شانندن .

۳ - پستی خوندنا هاواری ژهقال وناسین خوره  
دان خوندن و ژمروقین نخونداره بخوه خوندن و او  
سرتیده خستی بین کوملی سروقت کرن .

۴ - ژهاواری ره هر تخلیط شعر و بندان نفیسانندن .  
۵ - چپروک ، مدهلوک و مامکان برهف کرن  
و ژهاواری ره شانندن .

۶ - د حق و لات ، عشیر ، باژار و گندی خوهده  
تشتن کفن و نو ژهاواری ره ریکرن .

۷ - هر تخلیط برگین کردستانی پیدا کرن و دگل  
وصفین وان ژمره هنارتن .

ژگوتنن ژورین قنچ دخویه کو ژهاواری ره  
آری کرن گلاک هیسانی به . کسی کو دل بکه دی بکاره ژری

\*\*\*

د دستپیکه ده کو ملامه د پانزده روژان ده جارکی  
دی در کفه . پستی چند هزاران کو ملامه دی  
بیه هفتکی ولسری هر هفتی بی دی بلاف بیه .

تشتن راست و نراست ژى هنه .  
 از کو کرد و کردمانجز مام و زمانی خواه رندد زانم و من  
 اوب هفت هشت زمانین دن دانیه برهف ، کت  
 کتین وی هور هوناندنه ، قیدین وی ژهف در یخسته ،  
 د کارم ژ بیانین بیترو قنجر ده کراوی بدم خویا کرن  
 وزانین . زمانی مه ایروم فره هم تنگه .  
 فره : ب هر تشتی کو کردپی مژول بونه ،  
 دست دانه وان ، دی وی واری ده زمانی کردی هنگ  
 زمانین دن و ژ هنان بیتر پیشقه چویه و کلیه و ژنو  
 زمانین کلی ب شونده نه مایه .  
 تنگه : هر چی کو ژ کردان ره نناس مانه و کرد  
 پی مژول نه بونه دوی واری ده زمانی مه راوستیابه ،  
 پیشقه نه چویه ، دجهی خواه ده مایه .  
 لی زمانی مه ژوان زمانانه کو بر هر تشتی نو ، پیرسین  
 نو دزین و بریقه پیرسین نو ژوان چار دین .  
 هر وکی خلقی کلی بی گویان ، بری چارده سالان ،  
 کاقا طیاره دیتن ، ناقل ب زاری خواه بالا فر ناقل  
 لی کرن . ژلوره کو ژبانی ، ژبالا دفره . دیسان  
 کردمانجنن کو تلفون دیتن ، ژمسمعاوی ره بهیستوک  
 گوتن . ژبر کو دنگ پی تیت بهیستن .  
 نهو ام فگرن سر گوتنا خواه ، سر آوایی نقیساندنا  
 زمانی خواه .

ایرو د زمانی مه ده دو تخلیط کیانی هنه .  
 وندابونا پیرسین کردی و کتنا پیرسین بیانی ناقل زمین .  
 ام چی بکن کو زمانی مه بکاره فگره سر خور بیتیا  
 خواه و د ناقل زار و زار آو این خواه ده بکله و بیه  
 زمانکی تکوز .

د وندابونا پیرسان ده ، پیرسین هنه یکجار وندابونه ،  
 هن هنه ژزاری کی کتنه لی دیکه دن ده دژین و چنک  
 هنه ذ آخفتنی ده کیم تینه گوتن لی دمامک ، مدهلواک ،  
 چیروک و سترانان ده تینه بهیستن .

ام لپی وان . هین ب هین ام وان دئین دست  
 و دصننن و گورا محجتی ژى ژ نوغه سر آوایی  
 هقد دانینا پیرسین کردی پیرسین نوچید کن .

ژ بونا پیشقه چونا زمین ، دقیت ام بندین خوب  
 نقاپا اوان پیرسان بنقیسینن ول پاشیا هر هژماری  
 فرهنگو ککی دانن و تیده مانا پیرسین کو دزارانده کیم  
 بونه و پین کو ژنوغه هاتنه . هقد دانین ژخوندقائین  
 خواهه بدن زانین .

ژخوندقائین خواه هیقی د کم فرهنگو کامه قنچ  
 بخوبین و د حق پیرسکی ده کوفکر که وان هبه ژمره  
 بنقیسینن ، هکه جیو کا پیرسکی بزائن ، او اهاری  
 نقمانا و فرقین وی دگل جیو کا خواه ژمره بدن زانین .  
 و کو : ریکرن ، شانندن ، هنارتن جیو کین هقن .  
 لی دمانا ریکرنی ده ژمانا شانندن و هنارتنی فرقک هیه .  
 ریکرن هر حال ب ری یخستن و شانندن .

دیسان ، خبردان ، آخافتن ، پپهین جیو کین هقن .  
 گلود نقباوان ده چه فرق هنه ؟

\*\*\*

هاوار زارو ککه نوزایه ؛ زارو و امه یه ؛ زارو  
 وا کردانه . وک هر زاروب خویبتیادی و باف ،  
 برا و پسامین خواه د کاره بژی . هر کس ، هر کرد  
 د کاره آریکار یا هاواری بکه . تو کس میژره کو ،

# هاوار

## کوملا کردی

### آرامنج، آوایی خبات و نفیساندنا هاواری

• ۲- صحیبتیا زارین کردی و برهقدانینا وان .  
 صحیبتی سر مروفتانیا زمانی کردی دگل زمانین دن  
 ئین آری . صحیبتی سر بنکین زمانی کردی ،  
 سردیروک و آوایی رابون و پیشقه کتناوی .

• ۳- برهقکرنا چیروک ، چیرچیروک وهر  
 تخلیطلاژه و سترانین کردی و بریقه بلاقکرناوان .  
 • ۴- صنفاندن و بلاقکرنا دیوانین کردی .  
 ب فان فه ژینه نگارین شاعر و مروقین بژارته ژی  
 دی بین بلاق کرنا .

• ۵- صحیبتی سر رقص و قیده بین سترانین کردی .  
 • ۶- صحیبتی سر هر تخلیط ریز کین کردی  
 و کردستانی ، بین زمانی بوری و بین ایرو  
 و صنفاندناوان . صحیبتی سر هاتین کردستانی  
 و پیش و صنعتین کردی .

• ۷- دیروک واردنگاری : صحیبتی سر نقایی یا  
 دیروک واردنگاریا و لاتی کردستانی و سر دیروکا  
 عشیران . بری ، پاشی و دِ وقتی میر شرف ده .

\*\*\*

آوایی نفیساندنی - دِ حقی زمانی مدهه حتانهو  
 کلک تشت هاتنه کون . دناف فان کوتنان ده

• هاوار دنگی زانینی به . زانین خوه ناسینه  
 • خوه ناسین ژمره ری یا فلات و خوشی بی قد که  
 هر کسی کو خوه ناس دکه ، دکاره خوه  
 بده ناس کرن .

• هاوارامه بری هر تشتی هیینا زمانی مه دی بده  
 • ناس کرن . لو ما کو زمان شرط هیینی آپشینه .  
 • هاوار ژو پیقه ب هر تشتی کو کردانی  
 و کردیتی پی بندواره دی مژول ببه .

• تنی سیاست ، ژی دوره ، خوه نائیخه سیاستی .  
 • هاواری سیاست ژ جقاتین و لاتی ره هشتیه .  
 • ب سیاستی بلا او مژول بین . ام ژی د واری  
 زانین ، هنر و صنعتی ده دی بختین .

\* \* \*

آوایی خباتی - کارکی کو بکاره بچه سری ،  
 دقیت ژیره پرونقیسهک بیت چیکرن . مه پرونقیسا  
 خوه سر بنکین ژیرین لیکریه .

• ۱- بلاقکرنا الفابی یا کردی دناف کردان  
 و هیینکرناوی . صنفاندنا زمان آزینا کردی وهین  
 ب هین د کوملی ده بلاق کرن و پیشدتر د  
 دِ شکلی کتیبی ده درئیخستن .





هزارمار ۱  
۱۵ گون ۱۹۳۲

# هاوار

سال ۱  
یکشوب

کومه کردی

تیلده خستین کومه لی

آرمانج ، آوایی خبات و نقیساندنا هاواری

فارسی

القبای کردی

ترکی

کردجه القبا

عربی

هدفتنا و خطتنا

عربی


الاحرف الهجائية الكردية

م ۱۹۳۲

مطبعة الترقی بدمشق

ه ۱۳۵۱


SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 2



1 HİZİRAN 1932

## Qomela Qurdi \* Revue Kurde

### Têdeaxistiyên Qomelê

Civata arîqariyê	.....
Ta, tawî û tabir	D <sup>r</sup> . E. Nafiz
Lehî	.....
Du Egid	D <sup>r</sup> . Q. A. Bedir-Xan
Elfabêya qurdi	.....
Gundê nûava	Kedrican
Ferhengoq	.....
Tola welêt	.....
Xanî	D <sup>r</sup> . Q. A. Bedir-Xan
Berdêlq	Osman Sebrî

### Birê Frensizî

L'alphabet Kurde	.....
La langue Kurde	.....

*Dr. M. Khidir*  
*Opérateur et Oculiste*

Damas

Salkie

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET ENFANTILLES**

Damas

Armon

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqiya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûs-sûrî — 100 frenq

ŞesmeHQî 300 kirûs-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûs-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

ŞesmeHQî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Şam : Taxa Qurdan



## Civata Arîqariyê ji Bona Qurdên Belengaz

Vê paşiyê di jiyîna miletê qurd de tişteqî mezin, biasas û xêrçar hatiye çêqirin. Qurdên Cizîrê ji bona xweşqirina halê qurdên belengaz civateq bi navê jorin danîne .

Pêrûz ji wan re, pêrûz , hezar pêrûz. Xwedê mala danîyan ava û xweş biqe û şolê wan bibe serî .

Bi vê civatê ji qemasiyên me ên bêhejmar yeq ji nav hate hilanîn . Devê qortaleqe qûr qo her rûj jiyîna me diqot, rayên me dicût , pê hatiye girtin .

Ji vê civatê re herweqî danî di pêsgotinqa nizamnamê de dibêjin, ji herqesî bêtir em , miletê qurd , hewcedar bûn .

Pêsgotinqa nizamnamê seabên danîn û çêqirina civatê ji me re gelec kenc dide zanîn .

Min ji dil qir xwen-levanên xwe serwest biqim . Da qo ew ji weq min pê dilşa û qêtxweş bibin .

Eve pêsgotinqa nizamnamê :

«Qurdino! Em miletê qurd , ji herqesî bêtir hewcedarê arîqariya hev in . Ji me re ewçend zanîn û hiner û hinerwerî ji divê . Ji lewra qo em ji hêxweyîti û berberiyê qetine binîya qortalanezanî û belangaziyê . Ji bona qo em biqarin bèn ser xwe û ji vî halî bifilitin, divê em destgîrên hev bibin , xwe bidin ber barên hev û yeqdil û yêgdeng kerara xwe bidin. Ew kerara qo me hemîyan ji nezani, ji belengazî , ji zivari û ji dilîyê de xelas biqe . Danîyên vê civtê bêvidar in qo hon bi tevayî bi wan re biqin, ji ya wan biqin, pişt bidin wan û bixebitin, da qo ev qarê hanî ê kenc û rehaqar biçe serî .

Tu şiq nîne , heqe hon holê bi me re bixebitin , miletê me zû bi zû ji vî halî xelas dibe û rûj bi rûj birêve ber bi kenci û avahiyê ve diçe .

Madam heta irû ji nav me ew dewlemendên camêr derneqetine qo bi derbqê hezar zêran bidin û ji bona miletê xwe dibistanan û binyanên xêrê çêqin , divê em xwe bi xwe bixebitin û bi yeq du kirûşên xwe wan hezar zêran bidin hev .

Ev kirûşên ha ji me re , ji welatîyên me re rêya xwendin û zanîn û ya xweşiyê dê veqin . Ev yeq du kirûşên qo hon ji civata xwe re bidin ji bona her yeqî we ne beha ne . Lê qo gihane hev bi qerî miletê me tèn û pê gelec tişt çêdibin . Bi kirûşên we dibistan tèn çêqirin , maleq pê ava dibe , dermanên çend nexweşan pê tèn qirin, û hon bi dayîna wan fikir û bi nedayîna wan dewlemend nabin .

Xebata me , xebata danîyên civatê destpêqirin û rêberî ye. Civat bi arîqariya we , bi têqil bûna we ava û xweş dibe , û qarê civatê bi vî awayî diçe serî .

Bê şiq e qo heqî hej miletê xwe diqin û di rayên wan da xwîna qurdî a paq digere arîqariya civatê ji bona wan deyn e , deyneqî mezin, bilind û mikedes e .

Ji xwe herqes deyndarê miletê xwe ye , ji ber qo ewî ew bixweyî qiriye , ji ber qo herqesî nanê miletê xwe xwariye û herqes dizane qo « Nanê mêran li mêran bi deyn e » . Werin, xwe bilezînin û deynê xwe ji miletê xwe re bidin » .

Gotinên danîyên civatê li hire xelas dibin .

Ji van gotinên gewherîn re gelec tişt

Stûna Zarowan

## Tola Welat

Welat! welat! qanî xweşî?  
 Kewî îrû tu nexweş î.  
 Qanî ew qen, qanî geşî?  
 Çiman holê weq dilreş î?  
 Çiman wisa tu bêmad î?  
 B'qurê xwe re xeber nadî?  
 Qul û qûvan ji her alî;  
 Lewra welat wer dinalî.  
 Destên tirgo li te qetin;  
 Bi xwîna te sor bûn repin.  
 Mîr û mela dar ve qirin;  
 Xort û xurtan ji te birin.  
 Ez qo qurd im ji bîr naqim.  
 Bi xwîna xwe divê raqim.  
 Ez bixwînim, xwenda bibim;  
 Mezin bibim, zana bibim.  
 Mêrquj bibim bi nav û deng;  
 Ez hilgirim top û tifeng.  
 Tola te jî evda te jî,  
 Dê hilinim doza te jî.

Sam: 7 Tirmeh 1931

ninin qo em biqarin zêde biqin. Tinê di hekê rayên civatê û ser awayê ariqariyê divê em çend pirsan bibêjin.

Serniveqa civatê di Hesiçê de ye. Di her bajar û gundên mezin ên Cizirê de maliqên wê hatine veqirin û hin bi hin vedibin.

Serniveqa civatê ji bona dantna dibistaneqê û lèqirina xestexaneqê ji niho ve xwe qar diqe.

Heçî qo ariqariya civatê biqin ariqariya xwe diqarin rast bi rast li Hesiçê ji serniveqa civatê re bişain.

Ariqariya civatê bi her tiştî dibe, ne tinê bi pere. Çaxa benderê nîzing e. Xwedan gund û cotqarî diqarin ceh û genim ji bidin. Heqe ji serniveqê re şandina wan dişwar e, dayî diqarin bidin nimîndeyê civatê ew ji digehîne civatê.

Nimîndeyê civatê li Şamê Dr. Ehmed Nafiz beg e, qo qurdên Şamê hemî ji rind nas diqin.

## Behî

Tifak û yeqbûn, zexmî û xurtiya civatê ye. Nifak û berberî kelsî û jariya wê ye.

Di vê cihanê de ber tişther mezinahî bi tifak û yeqbûnê, bi dayîna hev ber barren hev, bi hevgihana mirov û bi hevgihandina xebatên wan hatine pê.

Milet û dewletan bi tifakê gihane bilindiya her tiştî û bi nifakê qetine binîya qortala neyînê

Ji lewre mirov diqare bibêje heyin di tifakê de, neyîn di nifakê de ye.

Xurtî û zexmiya yeqbûnê di lehiyê de qeleq kenc têt ditin.

Ma lehî çi ye?

Lehî ji hevgihana dilopên baranê pêve ne tu tişt e.

Peşqên baranê gava ji hev cuda û yeq bi yeq diqevîn rûwê erdî, erd wan dadikurtine.

Tihniya xwe pê vediqujîne. Lê gava digehin hev, hingî ji wan peşqên kels lehîqe boş radibe. Dilop û peşqên baranê di yeqbûnê di tifakê de ne.

Erdê dilopxwer êdin di destên wan de lehistoqeq e. Ew serdestên erdî ne. Bi erdî re dileyizin; sînga wî kul diqin, têdiqevîn, bilindiyên wî hildiveşinin, qendalên wî diqelesinin.

Lehî weq hûteqî har û heç radibe ser xwe, ji pal û qaş û newalan dadixure. Li ber wê tu qes, tu tişt; bican, bêcan nema diqare biseqine. Lat, zinar, qevir, rêl, dar, direh serên xwe li ber xurtiya tifaka dilopan ditewinin û lehî, ew şehinsehê yeqbûnê ewan mîna çilowên siviq dide pêşiya xwe, rêş diqe, dimale.

Halê qurda ji ev e.

Qu: d ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tèn dakurtandin. Qo gihane hev dibin lehî, lehîqe boş, tu qes, tu tişt li ber wan niqare biseqine.

Felata welatê me di rabûna vê lehiyê de ye. Bêrût: 28 Tebax 1929

## Stûna Fekehan

Ta , Tawî û Tabir

Yeqî ji fekehên deşta Hesinan ji me nexweşiya tayê pirsîyar diqe. Me pirsîyariya wî da bijîşqê xwe û jê cuhabeqê daxwaz qir .

Eve, reşbeleqa fekeh û cuhaba bijîşqî.

Deşta Hesinan: 23 Gulan 1932

Ezbenî !

Min stûna xwe-stûna fekehan-xwend. Geleq tişt hene qo divêt em ji te bipirsîn. Heval nav hev de şewirîn û me got bila pirsîyariya me a pêşin nexweşiya tayê bibe . Da qo em jê xelas bibin , eklê xwe bidin ser hev û biqarin tiştînen din ji bipirsîn . Ji lewre qo ji tayê eklê me ne ser hev e , em jê geleq aciz in .

Paşî, ez destên te maç diqim û hevîdarê cuhaba te me .

Hesenê Qoçer

Cuhaba bijîşqê me :

« Xelqê deşta Hesinan ji hesinî çêqirî bûwana jî diviya bû heta niho di vextûna tayê de bihatana helandin. Herweqî dihêlin jî .

Ji xwe birê welatê me ê germiyan û deşt ji vê afetê xerab dibe.

Gava ji xelqî têt pirsîn , xelqê nezan dibêjin qo nexweşt ji ava gundî ye. Niq dilê wan ava wan ne paqij e, bijehr e, herçî vedixun pê diqevîn

Lê ne welê ye. Ew ava zelal û ştrîn qo di ber gundê we re dibore û gundê we pê şên û ava dibe, di eslê xwe de paqij e, avîje ye, qaniya jiyîna we ye . Jehr û nexweşt di nezani û tiraliyê de ye.

Niho divêt ji we re bidim zanin ew avên paq qo qaniya jiyîne ne, çawan nepaq û jehr û axû dibin.

Herweqî nas e, gava av serberdayî diheriqin, li deştan belav dibin di çal, qortal û di her cihên nizm de dipingirin , ji wan pingavan berpê dibin. Pingav bi

zemanî ve dibin çirav, di dora wan de giya, stirih û zil şin dibin. Di nav wan de pêşî (qelmêş) cih digirin, hêlinên xwe çêdiqin. Jê difirin , tèn li ser dest, rû û laşên me datînin, bi me vedidin. Mirovên pêvedayî di nav (6-21) rûjan de pê diqevîn û dibin tawî .

Di destpêqa nexweşiyê de laş û leb-tên mirov dişqên, direcîfin, piştre germ dibin . Hêlê nexweşiyê ji sê çar saetan heta sê çar rûjan dom diqe û bi xwêh danqê derbas dibe. Pêşdetir ev hêlê ha an her rûj an di serê du sê rûjan de carqê vedigere tê. Heqe nexweştî derman naqin pêde diçe û dibe (taya-veşartî).

Di taya - veşartî de rengê nexweşan zer dibin, xwina wan diçiqin, ziqê wan diperçifin, diqevîn haleqî ecêb, dibin weq meşqeşî vala ser du dariqan an ser key-siqeqî daçiqandi.

Di vî şiqî de nexweş zû bi zû namire lê ji derba xwe diqeve, bi qerî tu tiştî, tu qestî naye. Ne mal, ne zar û zêç , ne welatê wî jê tu fêde nabînin. Perîcar ji avîne jî diqeve, zarowên wî nabin, qo bibin jî nexweş û qêmsihet dertên. Bi tişteqî qîçiq dimirin. Ji bona wî jiyîna namîne . Heta qo ezrail bê hawara wî di nav êş û tehlîyê de diperpîte, vedigevize.

Eve ha şiqleq e. Şiqleqî din jî heye Jê re (taya-xebîs) dibêjin . Di taya-xebîs de şiqliken giran hene qo di nav sê çar saetan de diqujin . Ev şiqî perîcar di zarowan de têt ditin .

Eve ta. Hon dibînin qo tanexweşiqê giran û xedar e. Ji tifo, qolêra û ji web-ayê xirabtir e. Nexweşiqê welê ye qo rayê heyîna me , rayê heyîna milletî diqoje .

Bi gotinên jorin kenc xuya qir qo ev nexweşiya xedar ji pêşîyan , pêşî ji pingav û çiravan tene pê, lê tucar ne ji ava zelal qo xwedê pesna wê di kuranê de da û di hekê wê de (we cêhelnâ minel maî qule şeyîn hey) me her tişt bi avê jiyandine, gotiye.

Vêca qo me qaniya nexweşiyê peyda

û dijminê xwe bicih qir divêt ji bona qevandin û kelandina wî bixebitin.

Me goti bû qo ta ji pêşyan, pêşî ji pingavan çar dibin, lê ne ji avê, ji xwarinê an ji fêqî û terahyan.

Belê dijmin pingav e. Ji lewre qo pingav û ava men hêlina hêqên pêşyan in. Icar divêt em bala xwe bidin di dora xwe de tu pingav û çiravan mehîlin. Ji bona wê ji divêt, avên seqînî bêne heriqandin, çiravan bêne zuwa qirin, di dorê de herçî zil, stirih û giya hene bêne jêqirin û digel rayên xwe xeritandin.

Qo av heriqîn, çirav zuwa bûn êdin pêşî niqarin hêqên xwe li dorên me berdîn, ji me dûr diqevîn em jî ji tayê xelas dibin.

Ji bona zuwa qirîna çiravan awaqî kenc heye, Ew jî danîna darên Evqalipos e. Ev darên ha ji niq hiqûmetê peyda dibin, Divêt jê bêt daxwaz qirin, Herçî avên qêçiq, mirov diqare li ser wan gazê birêşîne.

Nexweşiya tayê ji her wextî bêtir di çaxa fêqî û benderê de boş e, Ji lewre, xesma di wê çaxê de divêt mirov ji xwe re mikate bibe,

Xebeta bîngehî herweqî me got heriqandina avan û zuwandina çiravan e, Lê ji hêleqî din bi standina dermanên tabir mirov diqare xwe jê biparêze, Dermanê tabir silfato ye, Berî ewilî silfato dermaneqî erzan e. Di pişt re hiqûmet berwe belav diqe. Silfato: erzan me be jî herhal jiyîna we jê behatir e.

Vêca, ji bona parastinê di çaxa tayê de yanî ji havîna pêşîn heta paiza paşîn divêt mirov di heftiyê de du caran, serê her sê rûjan grameqî silfato bixwe. Mirovên silfatoxwarî ji pêşyan bêne pêvedan jî bi tayê naqevîn.

Heçî bi gotinên min ve çûn tucar nexweş naqevîn. Lê heçî qo pê ve neçûn û nexweş qetin divêt xwe nîşanê diqtoveqî biqin.

Heqe diqtor ne qet dest divêt xwe bi xwe derman biqin.

Awayê dermanqirîne jî, ev e:

## XANÎ

Ew nûr e, herê li erdê şîhrê  
Şîhra me ye, şîhra bendewarî

Seydayê me ye, melayê yeqta,  
Ava qiriye bi şor, kesran,

Parisê guli bi şorê qurdî,  
Ava te diqir melayê xanî.

Bê zêr û qevir, ji pêta arî.  
Ava te diqir serayê şîhrê.

Gewher ew e, ew û can e bistam,  
Destpêqire ew, û da ew encam.

Rubnahî te da, li erdê qurdan,  
Ruhnahîya te, delala yezdan.

Hêvin tu î, tu çavê sayda,  
Ferzane î tu û lawê mewla.

B' sazê, te diqir, te da wê cûşîş,  
Ey hişveqiro! te da wê xwabiş.

Şestare te ye, qo da me zamin,  
Firdews li qû ye, bihar û havîn.

Gul, bilbil û ney mekam û jale,  
Tev de diqirin fixan û nale.

Zêr qer tu î tu ne pilewer tu,  
Seyda yî herê, û ser hiner tu.

Meywa te xweş e û avdar e.  
Weq Xanî qî ye? tu qes niqare.

Bercis tu î tu, tu rêberê me,  
Textê te di dil û ser serê me.

Tirba te ne ax e, canê Xanî.  
Tirba te dile û cawidani.

Rehmet bi te ye û pesna yezdan,  
Heyrana te ne, xulam û xakan.

*Dr. Qamiran Alî Bedir-Xan*

Mirovên gihastî ji hebên silfato — her hebê wî çariq gram — her rûj çar heb, zaro heta delî salî sê heb, şeş saetan berî halê nexweşiyê, serê saetê hebeq distînin zarowên yeqsolî tinê niv heb distînin.

Bi vî awayî fehtiqê xwe derman diqin Piştî heftiqê du heftiyên din dermanê xwe sê rûjan distînin û sê rûjan berdidin.

Eve, ta, tawî û tabin. Heqe hon jî ya min diqin nexweş naqevîn, qo biqevîn jî zû bi zû kenc dibin.

*Dr. Ehmed Hafiz*



## Elfabêya Qurdî

Dûmalîq : 2

Herweqî di geleş tîstan de têt dîtî dibe qo di cara pêşîn de di elfabêya me de jî qem û zede lîn qemanî de biqevîn ber çavan.

Ev qemanîyên ha di eslên xwe de jî qemanîyê bêtir paşîya hin qoteqîyan in qo mirov jî wan niqare xwe bide alî.

Ji lewre piştî dan zanîna elfabê divêt awayê hevedudanîna wê û qitqitên bingehên wê bîn raveqirin. Da qo xwendevanên me kenc tîbigelî qo ew qemanîyên ha herweqî me got ne qemanî, lê di azîna elfabê de tîstînen adetî ne.

Ev benda ha jî bona berhevdana wê hatiye nivîsandin,

Lê, berî destpêqirîna berhevdanê divêt herçî esas û bingeh hene qo jî me re bûne hîm û elfabê li ser wan hatiye danîn bêne xuya qirin.

Me ev bingehên ha di dora şeş destûran de gihandine hev.

I — Ji wan nîktan pêve qo xasê denganiya zmanê qurdî ne, di şîql û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabêya tîrqa nîzing xistin û jê nedûrçetin.

Armanca elfabê seqinandinê dangan li ser qaxezê bi şîqlan e, şîql bi herfan tîstînan qirin, û herf kebalewî û bihemd in. Ji lewre nîşanqirîna dengê (ç) bi (c) û yê (ç) bi (ç) û bi hevguhartin û cihguhastîna wan weqhev û bêferk e.

Lê bi vi awayî qurdên welatê jorîn û heçî qo elfabêya tîrqi dinasin de biqarin bê dişwarî ya qurdî hin bibin û qomel û qitêbên me bihêsantî bixwînin.

II — Herçend dibe, ewçend dengên herfên latîni ên adetî qo di zmanên din de nas in, di elfabêya qurdî de hilanîn û neguhartin.

Bi vi awayî qurdê de biqarin elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsantî fêr bibin.

## Du Egîd

Du egîd çû bûn serê welêt û dil qetî bûn. Gava ew birin nav qoma dijminan, serên xwe dan ber xwe.

Seh diqirin qo Qurdistan wînda bûye, esqerê qurdan şîqestîne, revîne û sereqên wan hatîne girtin.

\*\*\*

Her du egîd li ser van xeberên tehlî digirîyan û yeq jî wan digot :

— Çikas ez tîşîhim, birîna min çikas dişewite.

Ê din digot :

— Stran vemirî, govend seqinîye. Min jî divê ez bi te re bimirim, lê di piştî min de jin û zaroên min hene, bê min de perîşan bibin.

\*\*\*

— Pîreq jî bo min çî ye? Zaro jî bo min çî ye? Pêteqê bilîntir di dilê min de rabûye. Pîreq û zaro heqe birçî ne, berde bila herin bigerin, welatê min, welatê min wînda bûye.

— Bra hevîyeqya min jî te heye, heqe ez niho mirim, laşê min bi xwe re bibe, û min li erdê Qurdistanê veşîre.

\*\*\*

Qolesê min dane ser sînga min, tîfinga min bide destê min û xencera min bêxe ber piştî min. Ez dixwazim wisa raqevim û bibihîzim, weq nobetdareq di gorînê de, heta qo dengê topan û şhîna hespanbên.

\*\*\*

Dema reprepa hespên egîdên qurdan di ser tîrba min re biborin û dengê tîfing û topan bîn, ez bi çeqên xwe ve jî tîrba xwe, xwe hilavejim, jî bo standîna welatê xwell jî bo standîna welatê xwell!.

*Dr. Zamîran Alî Bêdir-Xan*

III — Nîşanqirîna her dengî bi herfêqê serxwe û jî awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin.

Bê şiq e qo hînbûn, xwendin, nivîsandin û leqdana herfên serxweji yên hevedudani hêsantir e.

IV — Her dengî bi herfeqe cihê nîşan qirin, yanî ji awayê nîşanqirina çend dangan bi herfeqe an dengeqî bi çend herfan, xwe dan alî.

Ev awajî fiqra çêqirina elfabêqê bi hindiq herfan an jî kesda kenc liserseqinandinina denganiyê diqare bizê.

Lê pê her du jî naqevî dest û di zmanî de bila sebeb pirsîna di şiqî de cîyoq peyda dibin û di nivîsandinê de tevlihevîqe mezin berpê dibe.

Ji xwe di tu zmanî de danganî û nivîsandin ne lîvên yeq in, û nivîsandin niqare bi tevayî li denganiya wî zmanî bê. Lewre qo qitqit û rengên denganiyê bi elfabêyê nayin nîşan qirin û li ser qaxezê seqinandin. Welê bûwa diviya bû elfabêya her zmanî jî (50-60) herfan hevedudani bibe.

V — Herçend heye, jî barqirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî.

Nîşan jî hêleqê di nivîsandinê de bi vegera kelemê wextî dide wînda qirin. Ji hêla din bi jîbirqirina nîşanê herf vedigerin ser şiqlên xwe ên eslî, bî nîşan, û tevli-hev dibin.

Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî dişwarîqe din e.

Ji lewre jî bona tevayîya herfên bîntşan me ev ( ^ ) pejirand, û bilindeq nav lê qir. Ji ber qo dengên herfan hem diguhêrîne hem bilind diqe, û jî nîşanên weq ( . - , - ' ) kenc têt veketandin.

Ji xwe boş bûna nîşanan nivîsandinê qirêt diqe.

VI — Herfên welê bijartin qo di şiq-ên xwê de li hev bîn û biqevî hev.

Ji lewre diviya hû qo em di nav herfên latîni de himînin û jî elfabêyên din weq yûnanî û rûst herfan megirin.

Me jî welê qir û elfabêya xwe bi hindiq guhartina dengên herfên latîni û

bi barqirina bînan bi bilindeqê çêqir,

Bi vî awayî û gora destûrên jorin me elfabêyê xwe li sih û yeq herfan hevedudaniye. Herweqî di despêqê de me da zanîn.

Sehîtiya qo di her sê zarên qurdî de hatine çêqirin xuya qirine qo di zmanê qurdî de dengên bîngehî ev sih û yeq deng in. Ew jî bi van sih û yeq herfan hatine nîşan qirin.

Belê, herfin hene qo geh zrav, geh stûr, geh jî pêsî, geh jî paşiyê tî xwendin. Lê ev lerkên ha ne jî guhêrîna cihê derqa dangan, lê belê jî guhêrîna rengê dangan tîne pê, û jî lewre di elfabêyê de nayin nîşan qirin. Ji ber qo elfabêtinê dangan nîşan diqe, ne rengê dangan.

\*\*\*

Ezê bi dengdaran dest pê biqim. Ji sih û yeq dengdarên qurdî, dengên hevdehên jêrin, di elfabêya her zmanî de, bi ferknên qîçiq, yeq in.

b d g h q l m n p r s t  
f v w y z

Tinê di elfabêya tîrqi de (q) û (w) nînin, Ji ber qo di zmanê tîrqi de dengîna cihê weq (v) û (w); (q) û (k) nayin ditin.

Dengê herfa (w) jî xwe di tîrqiye de peyda nabit.

(dûmahiq heye)

## Ferhenggoq

**AZIN** awayê tevayîya zanîneqê an tîşt-eqî. Azîna elfabê, yanî tevayîya keyde û destûrên ilma elfabê. Berdêlqa wê di zmanê Elmanî de «lehre» ye.

**Berhevdan** Ser tîşt-eqî, jî bona diltîji-qirina hevdu şexalî û sehîti qirin. Bi saetan ve me da ber hev

lê dîsan me dilê yeq tijî ne qîr.

**Berpê-bûn** Hatin pê . Ji serxwebûna welateqî re xebateqe mezin divêt, serxwe bûn bê xebat û fedaqariyê berpê nabe, naye pê.

**Binyan** Ji her texlît avahiyê re binyan têt gotin. Xanî, burc, kesr, olî, mizgeft h. p.

**Bibemd** Heçî qo ne bêhemd e .

**Bos** Zehf, gelec. Li ser welêt baraneqe boş hat.

**Bijîsq** Ewê qo bijîşqî diqe. Bi xweşqirina jiyîna mirovan mijûl dibe û wan derman diqe.

**Dibistan** Ew dera qo têt de hîn diqin. Di dibistana gundê me de deh zaro hene.

**Dişwar** Ne hêsani, zehmet. Dişwar e gelec belayê xurbet, Binve, qezeba min binve lo lol  
*Emin Alî Bedir-Xan*

**Dîl** Ne aza, girtî, hesir. Dilê dilana te me  
Işev mewanê te me  
Sibe ser rêqa xwe me.

**Doz** Dehwa û daxwaz, paşîya daxwazê Xwelî li ser têt diqim,  
Dêst bi deng û ceng diqim,  
Doza Şeng û Peng diqim,  
Dehwa şerîet diqim.

**Geşî** Halê geşbûnê. geş, ew tîşt e qo bi rubnahî ye, bel û veqirî ye.  
Bihnûntiya dewleta te geş bit,  
Kasî tu hebî dilê te xweş bit.  
*Emin Alî Bedir-Xan*

**Gevyberîn** Ji gewherî çeqirî, weq gewher.

**Havîna-pêşîn** meha salê a çaran. Ji xwe qurdmanê mehan bi du awahî bi nav diqin. Bi navên ser xwe û bi navên çaxên salê.

1 — Adar Buhara—pêşîn

2 — Nisan Buhara—navîn

3 — Gulan Buhara—paşîn

4 — Hîzêran Havîna—pêşîn

5 — Tirmeh Havîna—navîn

6 — Tebax Havîna—paşîn

7 — ilon Paîza—pêşîn

8 — Çiriya-berî Paîza—navîn

9 — Çiriya-paşî Paîza—paşîn

10 — { Çileyê-berî Zivistana — pêşîn  
{ Qanûna-berî

11 — { Çileyê-paşî Zivistana — navîn  
{ Qanûna-paşî

12 — { Sibat Zivistana — paşîn  
{ Gecoq

**Hêsani** Ne dişwar. Ji bona her qesî zmanê wî hêsani ye, ne dişwar e.

**Kebalevî** Bi Kebale, û gorê dilxewaz an lihevhatinê çeqirî, nê qoteqî .

**Qoteqî** Tîşteqî bêhemd, bi zorê, bivê nevê. Ez ne diçum, qoteqî ez birim .

**Qûvan** Êş, qul, qeser. Sed ah û qûvan û qeser,  
Heft eyn û lam çûn jî hicrête.  
*Fekêhe Ceyran*

**Nimînende** Evê qo heyîneq an heyîna tîşteqî dinimîne, raber diqe.

**Pejirandin** Ji tîşteqî re qo têt dayin an gotin herê qirin û pêvê çûn, kebûl qirin .

**Haveqirin** Ji bîni jî rayî veqirin û danzanin.

**Rehaqar** Ewê qo rehayê, xweşiyê didê

**TOI** Evd, evdin, heyf.

**Têgehi Stin** Kenc fehm qirin û berqetîn. Herçend tu bibêji ji ew têtagehit .

# L'ALPHABET KURDE

suite 2

Ce procédé qui peut naître du souci d'établir avec le moins de lettres un alphabet ou de vouloir fixer plus précisément la phonétique, ne peut servir qu'à la création des homonymes homographes et à engendrer d'innombrables complexités dans la dictée.

Presque dans toutes les langues, même dans celles qui sont munies du plus phonétique alphabet, l'orthographe ne correspond que plus ou moins imparfaitement à la prononciation, parce que les alphabets n'arrivent jamais à fixer ponctuellement la phonétique d'une langue.

5.— Eviter autant que possible de charger les lettres de nouveaux et de différents signes.

Les signes causent d'une part une perte de temps pendant l'écriture, ils ont d'autre part, l'inconvénient d'être oubliés ou négligés et par conséquent de rendre le son de la lettre à son origine vocale.

L'adoption des différents signes peut engendrer une extrême perplexité. C'est pourquoi nous avons préféré adopter seulement l'accent circonflexe [^] qui diffère nettement d'un [.] qu'on allonge parfois par négligence ou d'une apostrophe (') et ainsi de suite. D'ailleurs l'abondance des signes rend l'écriture laide.

6.— Choisir des lettres homogènes dans leurs formes extérieures.

Quoique l'emprunt des lettres aux différents alphabets apparait au premier abord comme plus avantageux.

\*  
\*\*

En prenant pour base ces principes et en profitant de toutes les possibilités que nous offre l'art de transcrire l'alphabet, nous avons arrêté à (31) lettres l'alphabet Kurde.

Les recherches faites dans les trois dialectes principaux de la langue Kurde ont démontré que les sons ou lettres Kurdes ne sont autre chose que ces (31) lettres.

Il est possible de prétendre que certaines

de ces lettres sont tantôt dures et tantôt fines, tantôt antérieures et tantôt postérieures, Mais comme nous le démontrerons plus tard, ces petites différences dans une même lettres ne sont que des nuances de couleur du même son produites au cours de la durée de ce son et qui ne peuvent même pas être fixées par un alphabet phonétique comme le nôtre.

\*  
\*\*

Commençons par les consonnes:

Des (23) consonnes Kurdes les suivantes se trouvent presque dans toutes les langues, avec les mêmes sons à quelques nuances près, ainsi que dans le turc à l'exception du « w » et du « q ».

b d f g h q l m n p r  
s t v w y z.

w.— Il donne le son du w anglais et correspond au son consonnique du و arabe qui n'existe pas dans la langue turque. Ainsi que les turcs n'ont pas distingué le q du k.

Le و arabe qu'on trouve fréquemment dans la langue turque, dans des mots empruntés à l'arabe, est prononcé par les turcs comme un v français. Tandis que dans la langue Kurde, comme en anglais, les sons v et w sont distincts. Et dans différents mots d'origine Kurde par le fait du changement de ces deux sons on constate de grandes différences dans le sens de ces mots :

dev : bouche dew : lait caillé battu  
avec de l'eau

vir : ici wir : là

ev : ce ci ew : ce là

ava : prospère awa : manière, style

Maintenant examinons les opinions qui peuvent être émises au sujet de l'adoption de ces deux lettres.

On peut dire que du point de vue pratique comme la proportion du w dans la langue Kurde est  $\frac{557}{33798}$  et celle du v  $\frac{329}{33798}$  on pouvait prendre le w pour و et le v pour و c'est à dire vice versa, puisque ce derrier est plus simple dans l'écriture.

Par ce procédé nous aurions éloigné ces deux lettres de leurs sons internationaux.

« à suivre »

Notices sur la littérature  
moeurs et coutumes Kurdes.

## La Lange Kurde

- SUITE -

2

« Safî şemirand vexwar durdî

Mænendi-derî lisani - qurdî » 1

« On a laissé le pur et on a bu le dépôt, cette langue Kurde est comme celle de derî . »

Après ce très court aperçu historique nous passons à l'examen de l'état actuel de la langue Kurde. La langue Kurde se divise en trois dialectes principaux:

- 1 — Le dialecte du Nord
- 2 — Le dialecte du Sud
- 3 — Le dialecte du Nord-Ouest.

I - Le dialecte du nord est parlé par tous les Kurdes du Kurdistan occupé par les turcs, par les Kurdes de la Caucasia jusqu'à kere-Bağ , par ceux de la république d'Erivan , par les Kurdes de la Syrie, par une partie des Kurdes de l'Irak habitant le Mont Sindjar et la contrée située au nord d'une ligne partant du sud du Siudjar par Mosil , et atteignant à l'est la ville de Rewandiz , ensuite par les Kurdes de la Perse habitant le nord et l'ouest du lac de Urmî , par les Kurdes du Khorasan , au nord-est de la Perse, appelés Qurdên Xwêresanê . les kurdes de Khorasan .

II - Le dialecte du sud est parlé par les Kurdes de l'Irak et de la Perse à partir du sud de la ligne Mosil - Rewandiz et du lac de Urmî vers le sud et sud-est , jusqu'aux limites méridionales des Kurdes Bextiyarî

III- Le dialecte Nord-ouest est le dialecte des Kurdes Dumilî . Du Dumilî on ne peut pas tracer une limite fixe quelconque , par ce que trop mélangé avec les Kurdes Qurdmanç parlant le dialecte du Nord le Qurdmançî .

«1» La langue Mède s'appelle aussi lisani-derî c'est à dire la langue de la porte , langue du palais . Par ce que pendant l'égémonie Mède dans toute la Perse la langue officielle était celle des Mèdes .

Tout de même les points de condensation de ce dialecte sont : ( Dêrsim , Palo . Genc , Çepekçîr , Maden , Pîran , Egil , Siwêreq , Pêçar , Çermiq . )

De ces trois dialectes le dialecte du sud est celui qui se subdivise en sous-dialectes avec des différences assez nuancées . ainsi que :

1 - le Kurdes de Muqrî qui se parle du sud du lac de Urmî jusqu'au sud de Sekiz 1

2- Baba - Qurdî le Kurde parlé par les Kurdes de l'Irak non compris ceux qui causent le Qurdmançî dialecte du Nord .

3 - Le Kurde dit simplement Qurdî , du sud de Sekiz jusqu'au sud du Qurdmançşah .

4 Le Lorî parlé par les tribus Lor

5 - Le Bextiyarî , celui des tribus Bextiyar

Au sud nous avons aussi le Hevremanî idiome propre aux Kurdes habitant la montagne de Hevreman .

Les Hevremanî parlent aussi le Qurdî comme les Dumilî connaissent le Qurdmançî .

Le Dumilî a aussi par région quelques nuances, mais pas autant marquées pour se subdiviser en sous-dialecte .

Le dialecte du nord forme une unité linguistique très nette et n'accepte aucune subdivision en sous-dialecte .

En ce qui concerne la répartition des dialectes nous devons noter ceci que cette répartition ne peut jamais être considérée comme des limites définitives pour les mots et les expressions de chaque dialecte

Les mots des divers dialectes ne diffèrent pas beaucoup l'un de l'autre . Puis , fait caractéristique-qui peut être un point de départ pour une étude de l'histoire de la répartition des

1 Ce sous dialecte est commun entre le dialecte du Nord et du Sud, de même qu'il s'appelle Qurdmançiya - Muqrî , comme le Kurde parlé à l'ouest de cette contrée, en Irak, s'appelle Qurdmançiya - Soran et qui se prolonge au delà de Rewandiz au nord du Hevlêr Arabella .

dialectes—un mot du dialecte du sud qui ne se trouve pas dans les contrées méridionales du dialecte du nord se recontredans une contrée septentrionale de ce dernier, ou dans le dialecte du Nord Ouest et vice versa.

Comme par exemple dans un poème Kurde dernièrement découvert à « Silêmanî » et datant de 19 années après le Hejir contient le mot « qenîq » qui ne subsiste de nos jours que dans le dialecte du Nord-Ouest, Dumilî.

#### Dénomination des dialectes:

Le dialecte du nord s'appelle Qurdmançî et les Kurdes qui causent ce dialecte sont appelée Qurdmanç .

Les Qurdmanç considèrent ce mot comme l'équivalent du mot Qurd et généralement ils appellent les Kurdes Qurdmanç et non pas Qurd. Mais chez les autres Kurdes cette dénomination est quelquefois différente et attribuée à d'autres kurdes que ceux du nord. C'est ainsi que les kurdes des alentours de Sekiz, Sinandiz et Sewicblax désignent avec ce mot les kurdes Baban et leur langue; comme Qurdmanç et Qurdmançî [1] Ces mêmes kurdes nomment les kurdes du nord, les Qurdmanç lolo-qurd et leur idiome lolo-qurdî. Cette dénomination provient du vocatif lo, la chez les Dumilî, très employé chez les Qurdmanç.

- A suivre -

1 A ce propos je veux noter un fait qui m'a été rapporté par des hommes d'un grand âge et qui est aujourd'hui peu connu parmi les kurdes appelés Baban. La maison des Emirs de Silêmanî s'appelle (Pepe-Bebe-Baban-Baban) et les kurdes de leur principauté s'appelaient comme ceux de la contrée limitrophe Qurdmanç.

La population ayant été, en raison du régime féodale, attribuée à la famille régnante, on a désigné ces kurdes par l'expressin les kurdes des Baban. Peu à peu l'usage de cette expression s'est généralisé et elle a prévalu sur celle de Qurdmanç.

Xweyî û midirê berpirsiyar :  
Mir Celadet Ali Bedir-Xan

## بر ديلك

ژ قردري جاني جانبارارا

ژيين خوشه ب خرتي  
ل کردستان ب کردان ،  
باق و بران ؛ چه بكم ؟  
حمو من تي بدردان .

من دل ت جار نه نالی  
من زارت جار نه کالی  
ب دلشکی ب لالی  
سینگاخوه دا بر رمان .

من ایشف دیت خوناراست  
دنگ و گازی چه خوش هات  
دگوت رابن کردنو !!  
ثق بران و ثق خوه هان .

دربان ل مه ت زانی  
رم نینه گش نرانی

خوپان کبرن کردانی  
أف ترال و نزانان .

هاواری ، خوهش آوا کر  
دلی کردان پی شا کر  
زارو زمان آقا کر  
ژین و خوهشی بلا کر .

کاتیبا عربان ۱۸ - ۵ - ۱۹۳۲

عثمان صبري

صاحب الامتياز والمدير المسؤول

الامير مهديوت عالي بدرخان

ژ هر جسنی چشیک پدچن و ب هر زمانی د  
خوینن! ژ فان چشیکان آ کو کز بامن دشوتینه  
و هندر لمن دبر تینه؛ شالوله . بژن و خوه ندناوی  
رهنبیا چاقیمن و قینانا دلی منه .

گندی مه دناف فان رزان ژ پانزده مالان  
هقد دانیه؛ وارگئی مه، مزلا جفتاتا گندی  
مه به . پاششیدقان لسر وارگه، ناقروژان دناف  
میر گارزی مه ده ام، دچن . پرس و گالگالین  
مه تقا پف خوه شین . .

کلا ولات، چا هولی گران و ژیرنابه؟ حتا  
نهو مه دگوت: ام بی درو پوغانین، ژ لورا  
هر گاف برینین مه د آخفین و ژ حسرتا اردی  
باق و کالان ام دین دبن فیجا مه جه دفی؟ گند  
گندی مه، بغچه و باغین مه . تکوزه؛ هر تشت،  
هر تشی مه!

ماقی وسانه؟ جارگی ورن، هندری من  
قروژن دلی من ژی درینن و ب کیر که توژ چینی  
چینی بکن، وی گافی آف چینین دلی من اوی بینه  
پدیشین و پیرا بینه گرین . لی دزانم هون خوه نا  
گرن حبستیری چاقین وه، اوی چمی آمدییی  
درباس بکه . شوندا هونی بزنان کو از، نه تنی  
دلکتییی خوه شکیییا شالولی مه . از دلکتییی  
دنگی ویمه ژی کو ژینا مه یا درل در دناف نکاین  
خوه دا تو تود که وب فی داویکلای داوی تینه .  
— خوینین ل گندی نوا آقا! گندی وه؛  
مز کین و هاوارا باژاری وه !!

قدری جان

فیجا، ژ بونا پاراستنی، د چاخا تایی ده، یانی ژ هافینا  
پیشین حتا پاپیزا پاشین دفیت مروف د هفتی ده  
دو جار ان، سری هرسی روژان گرامکی سلفا تو  
بخوه . مروفین سلفا تو خواری ژ پیشییان بدنه  
پیدان ژی ب تایی نا کفن .

حچی ب گوتینن من فه چون ت جار نخوش  
نا کفن . لی حچی کو بی فه نه چون و نخوش  
کتن دفیت خوه نیشانی دکتور کی بکن .  
هکه دکتور نه کت دست دفیت خوه بخوه  
درمان بکن .

آوایی درمان کربنی ژی آفه .

مروفین گهاشتی ژ سلفا تو — هر جی وی چارک  
گرام — هر روژ چار حب، زارو حتا ده سالی سی  
حب، شش ساعتان بری حالی نخوه شی پی د سری  
ساعتی جبک دستین . زارو وین بکسالی دفیت تنی  
نیف حب بستین .

ب فی آوایی هفتیکی خوه درمان دکن پستی  
هفتیکی دو سی هفتین دن درمانی خوه سی روژان  
بر ددن وسی روژان دستین .

آفه، تا، تاوی و تابر . هکه هون ژ یا من  
دکن نخوش نا کفن، کو بکفن ژی زو بزو  
قنج دین . دکتور احمد نافذ

## گندی نوا آقا

آقین هر کی . . باغ و بغچه . . . دناف فان  
بغچه یانده هر تخلیط دارین ب بر، لسر فان داران

مه گوتبو کو تاژ پيشبيان ، پيشی ژ پنگاگان چار دبن ، لی نه ژ آقی ، ژ خواری آن ژ فیکي و تراهیان .

بلی دژمن پنگاځه . ژ لوره کو پنگاځ و آقامن هیلینا هیکن پيشبيان . ایچار دقیت أم بالا خوه بدن د دورا خوه ده تو پنگاځ و چراغان مهیلن . ژ بونا وی ژی دقیت ، آقین سکنی بینه هر کاندن ، چراغان بینه زوا کرن ، د دوری ده هرچی زل ستره و گیاهنه بینه ژیکرن و دگل رایین خوه خرتاندن .

کوآف هر کین ، چراځ زوا بون ئیدن پيشی نکارن هیکن خوه لدورین مه بردن ، ژمه دور د کفن أم ژی ژ تایی خلاص دبن .

ژ بونا زوا کرنا چراغان آوا کی قنج هیه . اوژی دانینا دارین [ أفکالپتوس ] ه اف دارین ها ژی نک حکومتی پیدا دبن . دقیت ژی بیت داخواز کرن . هرچی آقین کچک ، مروف دکاره لسروان گازی بریشینه .

نخوه شیدا تایی ژهر وختی بیتر د چاخافیکی و بیلندری ده بوشه . ژ لوره ، خسا د وی چاخی ده دقیت مروف ژخوه ره مقاته ببه .

خبانا بنگهپی هر وکی مه گوت هر کاندنا آفان و زواندنا چراځانه . لی ژ هیلمکه دن ب ستاندنا درمانین تابرمروف دکاره خودژی بیاریزه . درمانی تابرسلفاتویه . بری اولی سلفاتودر مانکی ارزانه . ارزان مبه ژی هر حال ژینا وه ژی بهاتره .

دقی شکلي ده نخوهش زو بزونا مره لی ژدربا خوه دکفه ، ب کپری توتشتی ، تو کسی نایه ، نه مال ، نه زار و زیج ، نه ولاتی وی ژی ت فیده ناینن . پر یچار ژ آقینی ژی دکفه ، زاروین وی ناین ، کو بین ژی نخوهش و کیم صحت درتین . ب تشتکی کچک دمرن . ژ بوناوی ژ بین نه دن نامینه . حتا کو آزراییل بی هاوارا وی د نائف ئیش و تحلی یی ده دپر پته ، قد گفزه . . . .

أقی هاشکله . شکلي دن ژی هیه . ژیره ( تایا - خبیث ) دبیرن .

د تایا خبیث ده شکن گران هنه کو د نائف سی چار ساعتان ده د کژن . أف شکل پر یچار د زارووان ده تبت دیتن .

أفه تا . هون دینن کو نخوه شیکه گران و خداره . ژ تیفو ، کو ایر او ژ و بایی خرابتره . نخوشیکه ولی به کورایی هیینامه ، رایی هییناملتی د کوژه . ب گوتنن ژورین قنج خویا کر کوآف نخوه شیا خدار ژ پيشبيان ، پيشی ژ پنگاځ و چراغان تینه پی ، لی توجار نه ژ آقا زلال کو خوددی پسنای د قرآنی ده دا و د حقی وی ده ( وجعلنا من الماء کل شیء حی ) مه هر تشت ب آقی ژ یاندنه ، گوتیه .

قیجا کومه کانبیا نخوه شیی پیدا و دژمنی خوه ب جهکر دقیت ژ بونا کفاندن و قلاندنا وی بختن .



ستونافقهان :

تا ، تاوي و تابري

پکي ژ فقېين دشتا هسنان ژ مه نخوه شيبيا تايي پرسيار  
دکه . مه پرسيار پياوي دا بژيشکي خوه و ژي  
جهاپه کي داخواز کير .  
أفه ، رشبله کافقه و جهاپا بژيشکي .

أز بني ! دشتا هسنان ۲۳ گلان ۱۹۳۲  
من ستونا خوه - ستونا فقهان - خوه ند . گلک  
تشت هنه کودفیت أم ژته پيرسن . هقال ناق  
هف ده شورين ومه کوت بلا پرسيار پيامه آپشين  
نخوه شيبيا تايي بيه ، دا کو أم ژي خلاص بين ، عقلي  
خوه بدن سر هف و بکارن تشتن دن ژي پيرسن .  
ژلوره کو ژ تايي عقلي مه نه سر هقه أم ژي گلک  
عاجزن . پاشي از دستين ته ماچ دکم وهيقيداري  
جهاپاته مه .  
حسني کوچر

جهاپا بژيشکي مه :

« خاكي دشتا هسنان ژ هسني چيکري بو انا دقيا  
بو حتا نهو د قيتونا تايي ده بهاتانا حلانندن . هروکي  
دحلن ژي .

ژخوه بري ولاتي مه ئي گرميان ودشت ژقي  
آفيتي خراب دبه .

کاڤا ژ خلکي نيت پرسين خلکي نزان  
ديژن کو نخوه شي ژاڤا گوندي يه نک دلي وان  
آڤاوان نه پاکژه ، ب ژهره ، هرچي قدخون پي  
دکفن .

لي نهولي به . او آفازلال وشيرين کود بر گندي  
وهره د بوره و گندي وه پي شين و آفادبه ، د اسلي  
خوده پاکژه ، آفيژه يه ، کاننيا ژ بېناوه به . ژهر  
ونخوه شي د نزاني و ترالي ده يه .

نهو دفيت ژودره بدم زانين او آڤين پاك کو کاننيا  
ژيني يه ، چاوان نپاك و ژهر و آغو دبن .

هر وکي ناسه ، کاڤا آف سر بردايي دهر کن ،

ل دشتان بلاف دبن د چال ، کورتال و دهر جهين  
نرم ده د پنگرن . ژوان پنگافان بر پي دبن . پنگاف  
ب زماني فه دبن چراف . د دوراوان ده گيا ، ستري  
و زل شين دبن . دناف وان ده پيشي [ کلميش ] جه  
دگرن ، هيلين خوه چيد کن . ژي دفرن ، نين  
لسر دست ، روولاشين مه داتين ، ب مه فددن .  
مروفين پيفه دايي دناف [ ۶ - ۲۱ ] روژان ده پي  
دکفن و دبن تاوي .

دستپکا نخوه شيبی ده لاش ولبتين مروف دشکين ،  
در جفن ، پشتره گرم دبن . حالی نخوه شيبی ژسي  
چار ساعتان حتاسی چار روژان دوم دکه و ب خو  
بهانکي درباس دبه .

پيشده تر أف حالی ها آن هر روژ آن دسري  
دوسی روژان ده جاري فدگره تي . هکه نخوه  
شي درمان ناکن پيده دپه دبه [ تايبا - فشارتي ] .

د تايبا - فشارتي ده رنگي نخوه شان زر دبن  
خوينواون دچکن ، زکي وان دپرچفن ، دکفن حالکي  
عجيب ، دبن وک مشکه کي فالاسر دودار کان آن  
سرقه يسکه کي داچکا گندي .

خرتی وزخمیا یکبونی د لہی ده گلاک قنج  
تیت دیتن .

ما لہی چه به ؟

لہی ژ هفگهانادلوپین بارانی پیقه نعت تشته .  
پشکین بارانی گاقا ژ هف جدا ویک ب  
یک د کفن رووی اردی ، ارد وان دادقرتینه .  
تهنپیا خوه پی قد کژینه . لی کاقا دگن هف ،  
هنگی ژوان پشکین قلس لہیکه بوش رادبه .  
دلوپ و پشکین بارانی د یکبونی د تفاق دهنه .  
اردی دلو پخو ژ ئیدن د دستین وان ده لهبستو  
ککه . اوسر دستین اردی نه . ب اردی ره  
دلپیزن ؛ سینگاوی قل د کن تیدگفن ، بلندپین  
وی هلدقشینن ، کندالین وی دکاشینن .

لہی وک خونکی حار و حیچ رادبه سرخوه ،  
ژ پال و کاش ونوالان دادخوره . ل بروی  
توکس ، توشت ؛ ب جان بی جان نما دکاره  
بسکنه . لات . زنار ، کفر ، ریل ، دار ، دره  
سرین خوه ل بر خرتیا تفاقا دلوپان دتوینن ولہی ،  
اوشهنشهی یکبونی اوان مینا چلووین سٹک  
دده پیشیا خوه ، ریش دکه ، دماله .  
حالی کردان ژی آقه .

کرد ژ هف جدا دلوپین بارانی نه . جہی  
جہی تین داقرتاندن . کو گهانه هف دین  
لہی ، لہیکه بوش ، توکس ، توشت ل بروان  
نکاره بسکنه .

فلاتا ولاتی مه د رابوناتی لہی ده به :

بیروت : ۲۸ تبخ ۱۹۲۹

دستین تر کول ته کتن ،  
ب خویناته سور بون رین  
میر وملا دارقه کرن ؛  
خورت و خرتان ژته برن .  
از کو کردم ژ بیرنا کم .  
ب خوینا خوه دخی را کم .  
از بخوینم ، خوندا بیم ؛  
مزن بیم ، زانا بیم ؛  
میر کژ بیم ، بناق و دنگ ؛  
از هلگرم نوپ و ننگ ؛  
تولاته ژی ، اقدانه ژی ؛  
دی هلینم دوزا نه ژی .

شام : ۷ تیره ۱۹۳۱

## لہی

تفاق و یکبون ، زخمی و خرتیا جفاتی به .  
تفاق و بربری قلسی و ژار پیاوی به .  
دخی جفاتی ده هرشت ، هر مزناهی ب  
تفاق و یکبونی ، ب داپنا هف بر بارین هف ،  
ب هفگهانامروث و ب هفگهاندا خباتین وان  
هائنه پی .  
ملت و دولتان ب تفاق گهانه بلندپیا هرشتی  
و ب نفاق کتنه بنپیا کورتالا نیینی .  
ژلوره مروث دکاره بیژه هپین د تفاق ده ،  
نپین د نفاق ده به .

سونازارووان :

## تولا ولایت

ولات! ولات! کانی خوشی؟  
 قوی ایرو تو نخوشی .  
 کانی اوکن ، کانی گشی؟  
 چمان هولی وک دلرشی؟  
 چمان وسا تو بیادی؟  
 ب کری خوهره خبرنادی؟  
 کل و کوفان ژهر آلی؛  
 لورا ولات ور دنالی .

سر نیټکا جقاتی د حسچی ده یه . د هر  
 بازار و گنډین مزون ټین جزیری ده مالکین وی  
 هاتنه ټکرن وهین ب هین ټدین .  
 سر نیټکا جقاتی ژ بونادانیناد بستانکی ولیکرنا  
 خسته خانکی ژ نهوټه خوهره کار د که .  
 حسچی کو آریکاری یا جقاتی بکن آریکاری یا  
 خوهره د کارن راست ب راست ل حسچی ژ  
 سر نیټکا جقاتی ره بشینن .  
 آریکاری یا جقاتی ب هر تشتی دبه ؛ نه تنی  
 ب پره . چاخابندری نیز ینگه . خدان گنډ  
 وجوتکاری د کارن جه وگنم ژی بدن . هکه  
 شاندا وان ل سر نیټکی دشواره ، دای د کارن  
 بدن نمیننده یی جقاتی ، اوزی دگپینه جقاتی .  
 نمیننده یی جقاتی لشامی دکتور احمد نافذ بکه  
 کو کردین شامی حی ژی رندناس دکن .

اټ قروشین ها ژمره ، ژ ولاتیدین مره ری  
 یا خواندن وزانین ویا خوشی بی دی ټکن . اټ  
 یک دو قروشین کو هون ژ جفاتا خوهره بدن  
 ژبوناهر یکی وه نه بهانه ، لی کو گهانه هټ بکیری  
 ملتی مه تین وپی گلک تشت چیدین . بقروشین  
 وه دبستان تین چیکرن ، مالک پی آقاده ،  
 درمانین چند نخوهره شان پی تین کرین وهون  
 ب داینا وان فقیر وب نداینا وان دولمندنانین .  
 خباتامه ، خباتا دانی پین جقاتی دست پیکرن  
 ور بیری به . جفات بآریکاری یاوه ، ب  
 ټیکل بونووه آقا وخوش د به وکاری جقاتی  
 بقی آوایی د چه سری .

بی شکه کو حسچی حژ ملتی خوهره دکن  
 ودراپین واندا خوناکردی آپاک دگره آریکاری یا  
 جقاتی ژ بونا وان دینه ، دینکی مزن ، بلند  
 ومقدسه .

ژخوهره هر کس دینداری ملتی خوهره ، ژ  
 بر کو اوی او بخوینی کره ، ژ بر کوهر کسی  
 نانی ملتی خوهره خواری به وهر کس دزانه کو  
 « نانی میران لمیران بدینه » . ورن ، خوهره بلزینن  
 ودینی خوهره ژ ملتی خوهره بدن .

کوتنن دانپین جقاتی ل هره خلاص دین .  
 ژ فان کوتنن گوهرین ره گلک تشت نینن  
 کو ام بکارن زیده بکن . تنی د حق راپین  
 جقاتی وسر آوایی آریکاری پی دټیت ام چند  
 پرسان بیژن .

# هاوار

کومهلا کردی

## جفتاتا آر بکری بی ژبونا کردین بلنظار

حوجه داری آر بکاری یا هفن . ژ مه ره اوچند زانین وهنر وهنروری ژی دفی . ژ لورا کو ام ژ بی خوبیتی و بربری بی کتنه بنی یا کورتالا نزانى و بلنگازی بی . ژبونا کو ام بکارن بین سرخوه و ژ فی حالی بفلتن دفی ام دستگیرین هف بین ، خوه بدن بر بارین هف و یکدل و یکدنک قرارا خوه بدن . او قرارا کومه همیان ژ نزانى ، ژ بلنگازی ، ژ زیقاری و ژ دیلی بی دی خلاص بکه .

دانین فی جقتی هیقیدارن کو هون بتقانی ب وانرا بچن ژ یاوان بکن ، پشت بدن وان و بختین ، دا کو اف کاری هانی ئی قنچ ورها کار بچه سری . توشک نینسه ، هکه هون هولى بمره بختین ملتى مه زو بزو ژ فی حالی خلاص دبه وروژ پروژ بریشه بر ب قنجی و آقاهی بی قه دچه . مادام حتا ایروژ ئاف مه او دولمندین جامیر درنکتنه کو بدر بکی هزار زیران بدن و ژبونا ملتى خوه د بستنانان و بنیانین خیری چیکن ، دفی ام خوه بخوه بختین و ییک دو قروشین خوه وان هزار زیران بدن هف .

فی پاشی بی د ژ بینسا ملتى کرد ده تشتکی مزن ب اساس وخیر کار هاتیه چیکن . کردین جزیری ژبونا خوه شکرنا حالى کردین بلنگاز جفتاتک بناقی ژورین دانینه .

پیروز ژ وان ره ، پیروز ، هزار پیروز . خوه دی مالا دانیشان آقا و خوش بکه و شولى وان بیه سری .

ب فی جقتی ژ کیاسین مه بین بی هزار یك ژ ئاف هاته هلانین . دفی کورتاله که کور کو هر روژ ژ بینا مه د کوت ، راپین مه دجوت ، پی هاتیه گرتن .

ژ فی جقتی ره هروکی دانی د پیشکوتنکا نظامنامی ده د بیژن ، ژ هر کسی بیتر ام ملتى کرد ، حوجه دار بون .

پیشکوتنکا نظامنامی سببین دانین و چیکرینا جقتی ژ مه ره کلک قنچ دده زانین .

من ژى دل کرخوه ندقانین خوه سر وقت بکم . دا کو او ژى وک من پی دلشا و کیفخوهش بین . آقه پیشکوتنکا نظامنامی :

« کردنو! ام ، ملتى کرد ، ژ هر کسی بیتر

زكوة غراف ومطبعة

أبو بكر بن خنيزة بن هشام بن عبد المطلب بن عبد مناف بن قصي بن كلاب بن مرة بن كعب بن لؤي بن غالب بن فهر بن مالك بن النضر بن كنانة بن خزيمة بن مدركة بن إلياس بن مضر بن نزار بن معد بن عدنان

حفر جميع المعادن والصور الملونة واللوحات النحاسية  
طبع بطانات ودرجات بحروف فائقة على الطراز الحديث

الطبيب  
أحمد نافذ

المختص في الأمراض الجلدية والزهريّة والأطفال

دمشق

عرفوس



الطبيب  
محمد حسين  
المختص في الأمراض الجلدية والزهريّة والأطفال

دمشق

صالحية

## اشتراقات مجموعة هاوار

في غير هذه الأقطار	في سورية والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس
عن سنة واحدة ١٥٠ فرنك	عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك
عن ستة شهور ٩٠ فرنك	عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوري - ٦٠ فرنك
عن أربعة شهور ٦٠ فرنك	عن أربعة شهور ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

سال ۱

مارشعب

# هاوار

کوملا کردي

هژمار ۲

۱ هزيران ۱۹۳۲

تېده خستين کومهلی

.....	چقاتا آریکاری ئی
د کتور احمد نافذ	تا ، تاوی و تا بر
.....	لهی
د کتور کامران عالی بدرخان	دؤا کید
.....	انفاییا کردي
قدری جان	گندی نو آقا
.....	فرهنگوک
.....	تولا ولیت
د کتور کامران عالی بدرخان	خانی
عثمان صبری	بردیلك

م ۱۹۳۲

مطبعة الترقی بدمشق

ه ۱۳۵۱

SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 3



15 HİZİRAN 1932

## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

### Çêdaxistiyên Qomelê

Hevixistina zmanan	Dr. Q. A. Bedir-xan
Qunciqa bijîşqî	Dr. E. Nafiz
Pêrûzname	Hamid Ferec
Silêman Bedir-xan	Kedrican
Dibistan	C. A. Bedir-xan
Elfabêya Qurdî	« « «
Pi hênceta pêruznameqê	« « «
Ferhengê	« « «
Ma çiman diçî	Dr. Q. A. Bedir-xan
Lavelav	« « «
Şeva we xweş	C. A. Bedir-xan

### Birê Frensîzî

L'alphabet Kurde	D. A. Bedir-Khan
Le Floklor Kurde	« « «

Çapxana terekî

ŞAM — 1932

هزمار ۲

—\*—\*—

۱ هزيران ۱۹۳۲

# هاوار

بدي

سال ۱

—\*—\*—

مارشعب

کومهلا کردي

تيدة خستين کومهلی

.....

جفتا آربکاری ئی

دکتور احمد نافذ

تا ، تاوی و تابر

.....

لهی

دکتور کامران عالی بدرخان

دؤ کید

.....

الفاییا کردي

قدری جان

گندی نوآقا

.....

فرهنگوك

.....

تولا ولیت

دکتور کامران عالی بدرخان

خانی

عثمان صبری

بردبلاک


م ۱۹۳۲

مطبعة الترقی بدمشق

۵ ۱۳۵۱



SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 3



15 HİZÉRAN 1932

## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

### Çêdeaxistiyên Qomelê

Hevxistina zmanan	Dr. Q. A. Bedir-xan
Qunciqa bijîşqî	Dr. E. Nafiz
Pêrûznâme	Hamid Ferec
Silêman Bedir-xan	Kedrican
Dibistan	C. A. Bedir-xan
Elfabêya Qurdî	« « «
Pi hênceta pêruznameqê	« « «
Ferbengoq	« « «

Ma çiman diçî	Dr. Q. A. Bedir-xan
Lavelav	« « «
Şeva we xweş	C. A. Bedir-xan

### Birê Frensizî

L'alphabet Kurde	D. A. Bedir-Khan
Le Floklore Kurde	« « «

Çapxana terekî

ŞAM — 1932

*Dr. M. Khidir*  
*Opérateur et Oculiste*

Damas

Salhié

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES**

Damas

Arnouf

**PHOTOGRAVURE**

**EYOUBIYE FRÈRES**

*Inscription sur tous les métaux. Gravure coloriée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.*

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an	100 fr.
6 mois	60 fr.
4 mois	40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an	150 fr.
6 mois	90 fr.
4 mois	60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyarîya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên keykasê:


Salqî	500 kirûs-sûri	— 100 frenq
Şeşmehqî	300 kirûs-sûri	— 60 frenq
Çarmehqî	200 kirûs-sûri	— 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî	150 Frenq
Şeşmehqî	90 Frenq
Çarmehqî	60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Şem : Taxa Qurdan



## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

### DI DORA HEVXISTINA ZMANAN DE

Gava xwedê dinê afirand û ew ava qir, jê re intizam da. Ji lewre qo bê intizam tu tişt nagehe, nêmeşe, tucar niqare heta paşiyê bimîne.

Her tiştên dinê di destên kanonên xwedê de ne. Tu tişt niqare xwe ji ferm-anên kanonan dût biêxe jê bifilite. Her tişt bindestê wê ye.

Intizam ji nizamê derdiqive, û nizam ji kanonê .

Kanon ew tişt e qo, bisemt, birê, bicih û rast e. Xwe her car naguhêre, liserseqinî ye, herweqî rabûye, welê ji pêş ve diçe. Her tişt û awayên wê abadinin.

Kanon du texlit in. A pêşin, ew e qo ji mej ve, ji berî ve, ji ber xwedê ve hatiye danin, yanî danîyê wê xwedê ye. A din ew e qo ji ser û mejiyê mirovan, ji hiş û jiyîna wan, ji diroq û rêziqên wan tene pê. Ev kanonên ha kanonên civaqî ne .

Di vê dinyayê de, zayîn û mirin, ciwanî û pîrî, rabûn û qetin, her tişt bi hiqma kanonan çêdibin .

Buhar û Havîn, Paîz û Zivistan, rûj û şev, boş bûna bayî, barîna baranê. hatina bertê, hemî bi kanonên xwedê dikewimin.

Tu qes li ser kanonên xwedê ne xweyiyê hiqm e, kanonên civaqî li ser civat û miletan xwedan hiqm in. Ev kanonên ha, diqarin biguhêrin, biqevin şiqleqî din. Ji ber qo xwedê bi guhêrîna wan ferman qiriye. Bi vê guhêrinê civat û miletan pêş ve diçin, diqemilin.

Diroqa dinê raberê me diçe qo ge-  
leq milet qeti bûn dilîyê, bi sedan salan

ve tê de ma bûn. Pêşdetir bi xebat, bi camêrî, bi zanîne ew miletên ha, xwe ji dilîyê veqirin, ji bin nîrê bindestiyê rabûn, xwe aza qirin û bûn serxwe.

Ma qî heye qo nizane, xwedê hesin çire afirandiye? Xwedê ew afirandiye ji bona qo dil ne diqir, tu milet, ne yeq ji, xulamîtiya mileteqî din biçe.

Xwedê hesin afirand ji bona qo miletên dil, pê kelem, tîfing û şûr çêqin û xwe ji bindestiyê ji nîrê dilîyê bifilitînin.

Heye qo mirov ji xwe bipirse, ma çiman xwedê miletan neyarên hev diçe. Cuhaba ve pirsîyariyê hêsantî ye.

Lewma qo ji kanonên xwedê yeq ji ser, krên û pevçûn e. Xwedê dixwaze, ê xurt, ê bakil, ê zana, ê qêrhatî di dinê de bimîne û hevsara wê bêxe destên xwe.

Her dema jiyîna me, her helkelqa me, her gava xebata me şereq e.

Ne tinê em, çarwa û giya ji di ser di hevxiştinê de ne. Jiyîn û mayîna me tinê bi xebat û bi hevxiştinê ye. Yê qo, xwe ji xebat û şerî dide paş diqeve çalê, diqeve gorina mirinê,

Zman ji weq her tişt li hev dixin, nekeba wan nine, di şerî de ne. Ji ber qo her zman dil diçe mezintir bibe hawîdorên xwe veqe, biqeve lêvên nû, serên nû, Ev yeq. Jû pêve zman dixwazin, zmanên din biqujin û biqevin şûna wan.

Diroqa dinê ji me re dide zanin qo heta niho geleq zmanên dinê hatine quştin. Ji wan zmanan re « Zmanêu mirî » dibêjin

Pevçûn û hevxiştina zmanan qereqer û bêdeng e.

Stûna Zarowan :

## Şeva We Xweş

Şev e, şev e; roj çû ava  
Hingûrê re cihê xwe da.

Roj safirî qet li doran,  
Soringa wê ma li boran,

Lê, şûna xwe vala ne hişt,  
Hêv û stêriq şandin ji pişt.

Hêdi hêdi hilbatine,  
Li ser seran xweş hatine.

Ber bi me tèn ji zozanan,  
Belav bûne li ezmanan.

Hatin hatin pêrgî-hev bûn,  
Pêwr û mêzin rengî-hev bûn.

Xemilandî geş û şîrin,  
Dinêrin me ji qaqeşin.

Dest û newal mîna sih in,  
Pozên çîyan weq birih in.

Xuya naqin herçî dûr in,  
Herçî gir in, tev de hûr in.

Xewa min têt xewa şîrin,  
Li min xweş e, eih û nivîn.

Himbêz biqim dayîqa xwe,  
Ez xwe bidim landîqa xwe.

Hêvi diqim sibeqe geş,  
Guhdarino şeva we xweş.

Şam : 18 Tirmeh 1931

*Djêladet Calî Bedir Xhan*

Belê, ev şer, bédeng e, bê top û ti-  
fing, bê balafir û mitralyoz e. Lê belê  
hiqma wî ji her şerî bêtir, mezintir û xi-  
rabtir e.

Di şerê zmanan de, rihê zmanan tèn  
standin, xurtiya dil û canên wan tèn şqê-  
nandin û pêta heyîna wan tèn vequştin.

Zmanên qo li hev dixin dest bi quştî-  
na pirsên hev diqin. Dil diqin, herçend  
heye ewçend biqevî hindurê zmanên din,  
tê de cih bibin hêdi hêdi biqevî quştî-  
yên wî zmanî û di paşiyê de çarniqarên  
wî bigirin, ewî ji him û riqnên xwe hil-

divêşînin û ser xerabeyên wî binyaneqe  
nû ava diqin û tê de, di nav wê ava-  
hiya nûjen de dibrûsqin.

Herçend zmanê me ne qetî be ji bin  
vê talûqeyê, heqe em mikate mebin  
dê biqeve.

Berî ewilî geleq pirsên biyanî hene  
qo qetine nav zmanê me. Geleq qurd z-  
manê xwe ji bir qirine, pê niqarin bixwî-  
nîn, binivîsîn. Ev hal daviya hevxiştana  
zmanan e.

Ma zmanê me ne spehî ye? ma qurd  
xwendin û nivîsandinê nizanin? Ma ji bo  
her tiştî nav û pirsê qurdî nîne?  
Çawan nîne!!!

Belê heye. Lê belê, qurd û zmanê  
me di hevxiştina zmanan de me hineq  
qem qirye.

Geleq qurd hene, ji zarên xwe re pi-  
rsinen biyanî têqil diqin. Heçî holê çê-  
diqin xwe davêjin bin hiqma zmanên bi-  
yanîyan.

Qurd halê şerî rind dizanin. Dîjm-  
in bi derbeqê perîşan nabe. Di hevxi-  
ştina zmanan de jî holê ye.

Her pirs qozîq e, û her pirs qo  
em pê emel naqin ji zmanê me diqeve  
û wînda dibe, li şûna wî pirsê biyanî  
tê û diqeve, welê qozîq ji distê me diçê.  
Bi pêveçûna wî helî qozîq yeq bi yeq ji  
destê me dertên û paşê, bi tevayî em  
şargeha xwe wînda diqin. Yanî zmanê me  
weq miroveqî birîndar, nexweş diqeve  
û dimire.

Vêca ji bona vejandina zmanê me di-  
vêt qurd hemî, gava daxêvin, an dini-  
vîsîn, bala xwe bidin û pirsên nequrdî  
tevlî zmanê xwe meqin.

Bi vî awayî, zmanê me pirsên xwe  
ên jibirqirî an windabûyî ji nû ve peyda  
diqê. Ji milê din jî pirsên nû dizê û  
halo zmanê me vedigere ser xurtiya  
xwe a pêşin.

Mileteqî dil qo zmanê xwe wînda  
ne qirîye, weq qirîyeq e qo mifta zind-  
ana xwe bi xwe re hilaniye.

## Quncîqa Bijisqî

Nexweşî û Dermanqirin

Hesenê Qoçer ji me nexweşiya tayê pirsî bû . Di hejmara paşîn de me peyda bûn , belavbûn û dermanqirina nexweşiyê ji xwendevanên xwe re bi bendeqe dirêj û digel her texlit qitqitên wê da bû zanîn .

Di nav gund û eşirên qurdmancan de ji tayê pêve her celeb nexweşî tene ditin . Lê , ew ne weq tan e qo bi hin tevdiran ji binî bêne kelandin . Digel vê hindê , mirov diqare xwe ji wan nexweşiyên ji biparêze . Lê îrû danînga me ne ew e . Danînga me a îrû dermanqirina nexweşan e .

Di baqurê sûriyê de ji Cizîra mir Şeref heta rojavayê Cerablîsê bi sedan gundên qurdmancan û eşirên qurdmanc hene qo bê diqtor in . Hêj tu diqtor pê li wan ne qiriye . Hecî nexweş diqevî bi destên tebîbên qurdmancî tene derman qirin . Carinan , lê qem , diçin ba jaran û xwe nişane diqtoran diçin :

Tebîbên qurdmancî , ev diqtorîqên ha tiştan dizanin qo carinan biqerî nexweşan tèn . Lê ne her gav .

Piştî dayîna cuhaba Hesenê qoçer li dermanqirina nexweşên xwendevanên hawarê fiqirîm . Min ev awa ji xwe re saz qir . Nexweşên xweji dûr ve di vê quncîqê de derman qirin . Nexweşan nexweşiyên xweji min re binivîstin ez ji di rûpelên hawarê de şîratan bidim wan .

Di diqtorîyê de ji bona qo diqtor biqare li ser nexweşiyê vebe divêt nexweş

Zmanê me geleq qevne , zmaneqî dewlemend , spehî û frehe . Lê em zmanê xwe rind nizanin . Me ew hêj nas ne qir . Berî her tiştî divêt em hîne zmanê xwe bibin da qo biqarin wî nas biçin û bidin nas qirin .

« Ev meywe eger ne abdar e .  
Qurdmancî ye , ev keder li qare . »

*Dr. Zamîran Alî Bedir-Xan*

## Elfabêya Qurdi

3

Herçend di hin pirsên erebî de qo qetine nav zmanê tirqî ji (a) pêve (b) hebe ji , tirq van du herfan cihê cihê bilêv naçin . (c) a erebî gora denganiya zmanê xwe weq (d) qe stûr dixwinin û duqan ji cihderqeqê derdixinin . Ji ber vê yeqê van her du dengan bi herfa (k) nişan qirine û herfa (q) yeqar ne existin nav elfabêya xwe .

W — Herweqî me got di elfabêya tirqî de (w) ji nine . Tirq dengên (w) û (v) weqhev bi lêv diçin û (z) a erebî weq (v) a qurdi û fransîzî dixwinin . Lê di zmanê me de herfên (v) û (w) , herweqî di zmanê inglîzî de heye , cihê cihê

wesfa nexweşiya xwe jê re kenc bidit zanin .

Ber vê yeqê û ji bona hêsani qirina wesfdana nexweşiyê min ji nexweşan re pirsîyariyên jêrîn pêq anîye .

Nexweşên qo awayê dermanqirinanexweşiyên xwe ji min de bipirsînin divêt yeq bi yeq li pirsîyariyên min ên jêrîn veqerînin .

1 — Çend saliya ?

2 — Ji qengêve nexweşî ?

3 — Nexweşiya te cawan dest pêqir ?

4 — Ji çi teşihî ? Qu derên te teşihin ?

5 — Nexweşiya te pêde diçe an carman rahe dibî ?

6 — Di dema nexweşiyê de çi dihesî ?

7 — Heta niho te xwe nişanê diqte-reqî qir ? ger te qir diqter çi gote te û çi derman da ye te ?

8 — Beriya niho bi nexweşiyê qe din qeti bûyî ? Ger pê qeti bûyî bi qojan û qengê ?

Eve pirsîyariyên min . Hecî li wan kenc vedigerînin kenc ji tèn dermanqirin

*Dr. Ehmed Hafiz*

têne ditin û qurd dengên wan her du herfan ji cihderqên cuda derdixînin.

Geleq pirsên qurdi hene go bi gah-êrina wan herfan û bi qetina wan li sînên hev di mana wan pirsan da ferkinen mezin têne pê. weqî niho:

qevandin	qewandin
dev	dew
vir	wir
aya	awa
evi	ewi

Herweqî têt ditin me dengê (ڤ) bi (v) û yê (و) bi (w) nîşan qirin.

Niho divêt em texmîna wan tîştan biqin go di heke awayê nîşanqirina wan de diqarin bîn gotin.

Di paşîya vê bendê de sê cedwel hene. Cedwela paşîna ji me re nisbeta herfên qurdi nîşan didê.

Gora wê cedwelê di zmanê me de nisbeta (v)  $\frac{329}{33798}$  û ya (w)  $\frac{557}{33798}$  e. Yanî di kîseqê de go (33798) herf hene (v) (329) û (w) (557) caran derbas dibê.

Jê dixuyê go di zmanê qurdi de (w) ji (v) bêtir e. Ji lewra, me dengê (ڤ) bi (w) û yê (و) bi (v) nîşan biqirina çetir ne dibû? Bi vî awayî me dengê wan du herfan ji dengên xwe ên navmiletî — go irû weq dengên wan ên adetî têne hesêb-dûr bixistana.

Dûrxistina dengên herfan ji dengên xwe ên adetî, gora destûra me a duwin, tinê di qoteqiyê de, an bi destxistîna fêdeqe mezin de, bihata çêqirin.

Qoteqî yeqcar nîne, fêde hebe ji geleq çiçiq e, ne welê ye go em ji bona wê destureqe xwe a bîgehî feda biqin.

Belê (v) bi yeq dran e, û (w) bi du dranan e. Lê her du ji bi derbqê, bi liveqe kelemê tîn nivîsandin, ne go (v) bi derbeqê û (w) bi du derban.

Ju pêve di denganiyê de (w) du (vv) tê hesêb, bi vî awayî deng û şîqlên wan ji lihevtên. Ji xwe di zmanê trensîzî û di

## Silêman Beg Bedir-Xan

Silêman beg, qurê xalid beg Bedir-xan e. Di (1890) mihaciriyê de hatiye dinê, li Stenbolê di Sîtanîyê de xwendiyê, xorteqî jîr. ekilmend û delal bû. Ji miletê xwe geleq hej diqir.

Vê paşîyê yeqî ji hevalê min ji min re şihreqe wî da bû. Ev şihre li ser qurdistanê, li ser welêt hati bû nivîsandin. Min ji bi vê hêncetê dil qir serhatiya. Silêman begî di vê qunciqê de vejînim û pêre navê wî ji wînda bûnê xelas biqin.

hinên din de (w) re(double v) yanî (du car v) dibêjin.

Y— Ev herfa ha di hin zmanên de carinan dengdar û carinan dengdêr e. Herweqî bîrdêla wê a erebî (ي) ji carinan dengdêr û carinan dengdar e.

Me ew, tinê bi dengê xwe ê dengdari exist nav elfabêya xwe.

yar	يار
diyar	ديار
derya	دریا
beyar	بیار

Ev herfa ha di nav pirsên qurdi de geleq hindiq têt ditin. Perîcar diqeve navbera du dengdêran û wan digehine hev.

Derzi	deziya	Zinê
Rê	rêya	welêt
Ba	bayê	qur
Tili	tilyên	wî

Ji hêla din ev herfa ha hin bi hin diqeve nav zman û pêde meyildariya qetînê diqe. Di zmanê qurdmancî de gava pîrseqê go paşîya wê bi (o) an (û) tê, dengdêreqe biyanî dibit (w) yeq diqeve navbera wan û wan digehine hev.

Parsû	vê parsûwê	parsûwa	stûr
Çilo	vî çilowî	çilowê	ter

«dûmahiq heye»

*Celadet Ali Bedir Xan*

Hej qirina welatê wî jê ra bû bû im-  
aneq. Herweqî-di şihra xwe-di beyta jêrin  
da dibêje:

Hiba welat ji iman e  
Ax qurdistan! Ax qurdistan!

Ûesreta welat, jê re bû bû quleqî  
mezin:

Eşka welat dil şewitand  
Can û ciger tev peritand

Her çend welatê biyanîyan lê xwes  
dihat . Lê halê zozan bi hawaqî din  
didit :

Herçî welat weq şeqir e  
Halê zozan şirintir e

Gava ev ax û qesera ha ji dil hat û di  
şihra xwe da :

Sed ah ! ji destê firketê

Sed ah ! ji bo vê hicretê

Nivîsand qesî lê mêze neqir kerara

xwe a davî da :

Heta qengê vê xurbetê

Da em, biçin nav miletî

û bêtirs çû nav welat, heval û ho-  
gîrê xwe.

Ji bona ditina welat, wî cehd qir .  
Xwedê jî je re miyaser qir . Di nav xo-  
rtên qurdan da rubê qurdîtiyê tehimand,  
jiwan re xwendin û rêya rast nîşan da .  
Lê, hezar esef xwedê pê re nebî serî ,  
emrê wî di wê rêyê da niv kurîniçî bû , bû  
kurbana gula tirqa , rûviyê wî li ser  
sungiye tiraq geriya ...

Belê . Silêman beg bi Ciwanî serê  
xwe di rêya welatda da . Bist û du salî  
bû . Lê, hesreta welat pê ra ne ma . Di-  
gel vê kasê rêya xwe ne kedand . Lê bi  
nevîqir , fiqr û serhatiyên wî ji bona xo-  
rtên qurdan, bû derseq . derseq bi îbret .

Îrû xortê me yêr qo Silêman begî  
dinasin hemijî bi serê wisund dixun û  
dixwazin weq Silêman begî di rêya felata  
welat da bixebitin . Ger wê rêyê ne kedinin  
ji tubeis ji akibeta Silêman begîra nine .  
xwedê qî barana rehma xwe lê biqe û meji  
bi rehma wî şa biqe ...

*Kedrican*

## FERHENG OG

Civaqî

Yê civatê, bi civatê re giredayî, xwe di-  
gehîne civatê, Rêziqên civaqî, kanonên  
civaqî. Yanî ew rêziq û kanonên qo jiyîna  
me a civaqî digerinin,

Zar. Zarawa

Zman, birê zmaneqî. Di zmanê qurdî de  
sê zar hene. Zarê Dumilî, Zarê Lori û Zarê  
Qurdmançî.

Zarawa, di nav yeq zari de awayên  
gotinê û bilêvqirinê.

Yeçiti . Yeçbûn

Yeçiti, pêq û lihevanîna qitqitên tişteqî qo  
di hîm û bingehên xwe de ji yeq rayî ne,  
ne cuda ne. Qo bi yeçitiyê digehin hev û  
bi tevayî heyîneq ditînin pê, û êdin ji hev  
venaketin.

Yeç bûn, yeç bûn jî weq yeçiti ye .

Lê di yeç bûnê de ew tiştên an qesên qo  
hatine lihevanîna an dayîn hev, dibê qo ne  
ji yeq rayî bibin û rûjqê ji hev vebin û  
veketin.

Dotmîr

Qeça mîr. Di rêziqa Qurdistanê de herçî  
torin û makul gora rêzên xwe dihatin bi  
nav qirin, weqî niho: Mîr, Mîreq, Pismîr  
Dotmîr, Dêmîr, Jimmîr, Axa, Pisaxa h. p.

Liservebûn

Nasqirin, qarin bi nav û nîşan qirin. Bij-  
îşq li ser nexweşîya min vebû, yanî  
niqari bi bizane ez ji çî teşihim, nex-  
weşîya min çî ye.

Xwenda. Xwendewar

Her qesê qo xwendin û nivîsandinê  
dizane xwenda ye. Lê xwendewar ew qesê  
qo geleq xwendîye û di vî warî de xwe-  
dan behre bûye.

Vên

Bi tevayîya xurtiya dilê xwe xwestin û  
li ser seqinîn, pê bikerar bûn.

«Sifatên di seb'e ji bo zilcelal

Bizan heft in ey arifê pur qemal;

Xweşî, şîn û zanîn û vên û qelam

Bihistin digel difî bû tamam.»

*Chmedê - Xani*

## Dibistan

Dibistan ew dere qo em tê de dixwînin. weq dibistanê gundê me.

Di dibistanê de mamhoste û zarowên gundî hene.

Ji zarowên dibistanê re şagirt dibêjin. Ez jî şagirteqim. Lewra qo diçim dibistanê û dixwînim.

Her rûj subehî şagirtan qitêb, defter û kelemên xwe didin hev û diçin dibistanê.

Mamhoste dersa şagirtan dibêjit, şagirt guhdar dibin, kenc bala xwe didin qo rind têbigehin û hîn bibin.

Mamhoste di ciheqî bilind de rûniştîye, jê re diyaroq dibêjin.

Şagirt li rex hev liser rûnişteqan rûniştî ne. Li ber şagirtan berqêşq hene.

Li ber min jî berqêşqeq heye. Gava ders quta dibe, berqêşqa xwe ber bi xwe ve diqîşînim, qitêb, defter û kelemên xwe tê de vedîşêrim, diçim hewşa dibistanê digel heval û hogirên xwe dileyizim.

Di qunceqê dersxanê de depreş heye. Depreş liser sepîqî suwarqirî ye.

Mamhoste, carinan, ji diyaroqa xwe datê û bi tebaşrê li ser depreşî dinivîsîne. Herçî qo devqî qenc nayin seh qirin, bi nivîsandinê jî me re dide zanîn. Hin caran jî şagirtan radiqe, dersên wan jî wan re dide nivîsandin û xeletên wan derdixine û rast diqe. Pêr mamhoste li ser depreşî tişteqî xweşqoq nivîsandi bi, hêj di bira min de ye:

«Çiyayên bilind bê mij nabin  
Newalên qûr bê av nabin»

*Djêlêdet Cali Bedir Khan*

Niqtezan . Niqtebêj

Ewê qo niqteyan dizane û dibêje. Filan qes niqtezane. Behvan niqtebêje, niqteyan dibêje.

Niqte ew gotin e qo mana wê ji bona herqesî ne qîş e. Têgehîstina wê hineq dişwar e. Bi awaqî welê lihevhatiye

qo mana wê yeqcar rast mebe jî dîsan qêta mirov jê re têt. Ji xwe spehîtiya wê jî di wê de ye.

Herweqî xwendevanên me dizanin navbera Şêxê Barzan û Hîqûmeta Irakê ser e. Qurdên Barzan vê paştiyê çend balafirên Irakê daxistine. Di nav zabitên balafirên de inglîz jî irakî jî hebûn. Barzan irakî quştin û dest bi inglîzan ne dan. Xelqî jî Şêxê Barzan pirsîn:

— Te çire irakî quştin û inglîz hiştin, irakî misilman, inglîz file ne; diviya bû tu inglîzan biqujî û irakîyan hîlîni.

Şêxê ciwan û niqtezan li wan vegeand û got:

— Min jî lewma quştin. Ji ber qo ez naxwazim xirabî li xelqî biqim. Min misilman quştin, ew bûne şehid û bi destê min çûne bihuştê, min inglîz biquştana, ji lewre qo file ne biçûwana dojhê.

Nûjen . Qevnar

Nûjen, herçî qo ji nû ve hatiye çêqirin, çaxa çêqirin û danîna wî ji me ne dûr e, ji me re nas e. Ne qevnar.

Qevnar, her tiştê qevn, lê ewçend qevn qo dema çêqirin û danîna wî ji me dûr e, ji me re ne nas e, di zemanê pêşyan de çêbûyî. ne nûjen.

Abadîn

Tişt an qeseqî qo davî û paşya wî nîne, naye, her gav dimîne, tucar wînda û xirab nabe. Hêyîna xwedê abadîn e, ji ber qo xwedê herweqî ne zaye, namire jî. Ehmêdê-Xanî bi Memo-Zîne, navê xwe di dirroqa qurd û Qurdistanê de abadîn qiriye.

Vejanîdîn

Ji mirinê anîn jiyînê. Ji nû ve jiyîn dayîn.

«Şerha xemi-dil biqim fesûne,  
Zîne û Memî diqim behane.  
اسماعیل بگ داخوند .

کہ لیک برا و خویش ہاوالانی دل سوڑیے  
رونیشتبون . مہ کہ بہ کہ نین و کیف قہ خونند .  
و بوئہ قہ پیروزی و گہ یشتنا ہاوار ہورگہ خومہ  
دایہ رازاندن بہ یادی روحی پاک یی براجوان وہ ساغی  
وسلامتی ہی پاش یہ چپی ماوان و بہ شرفی مہ زن  
و خواوہ رھمتی مہ زنتان مہ دہ ست کر بہ کیف و شادی  
و عود و کمانچہ و غرامافون نزیک سی ساعات مہ  
ہوگرگی خوی بہ رنہ دا .

کو قارا زار کرمانجی کوتا و نوہا مہ  
را اگر تہوژوان و روژاندا دی دہ ر کہ ویت مہ نسخہ ی  
وان تقدیم دہ کہ بن ایتر خدی ہاوالا وہ بیت میرم .

سید مرزی

زینا خورتان و فرشتہ ، زینا چاق و باق و کال  
دلکتی یہ زینا زیدان ، دلکتی خورتان و پیر  
سردلان ہیقین و شاہہ ، افسرہ سرشاہ و میر .

صاحب الامتیاز و مدیر المسئول

الامیر جہدوت عالی بدرخان

## لوریا بدرخان

— زحاجو آغاره —

هروکی خوهنده قانین مه دستونا خوهده بخوینن  
ایروأم لوریکی بلاقدکن: «دلایلیا زارووان»  
آونده هرکس باور بکت کوأف لوریایا  
دلایلیا بدرخانی مزنه ، لوریا باپیرینه . لی نه ولی  
یه . بقی لوری نه باپیرین بدرخان ، لی نفی بی  
وی ، برای من بدرخان دنقیناند و دلوراندن .

أف لوریایا کوب خوه ، ب زمان ومانا  
خوه قه هیژایه ، ژ بونا من ژ هلاکه دن بیر که مزن  
وزلوله . پی باپیر ، باف ، دی و برای من تین بیرامن .  
ژ بر کوبدرخان ناقلیکری به ؛ تیده ناخی باپیری  
من هیه . او بدرخانی کوب خرتی و مزناهییا  
خوه قه ناخی خوه ، ل شونا ناخی مالباتکی خسته . (۱)  
او بدرخانی کو ژ بونا یکیتیا کردستانی خبته ،  
ژ بونا سرخوه بونا کردستانی کتیه شر وقرینان و  
هرتشتی خوه دی قی ری به ده فداگریه  
وژ بونا وی ژی مر به .

أف لوری باقی من ژ برای من ره گوته . او باقی  
کوژ من ره نه تنی خوینا خوه آپاک دا — اوخوینا  
کردی کوب هزار سالان قه د زوازانین بوتان ده  
ب باپین باگری هونک دبوود جزیری ده د ناخ  
گرمیالات و زنارین بر جابلک ده د کلها ، وهرگاف  
دمیدانین شر ورومتی ده ژ سینگین داهاتیین مالباتا  
آزیزان دهات ریتن — لی ازب دل وهشی

(۱) هروکی ناسه ناخی مالباتا میر کین بوتان آریزانه .

کردانی ب خوه دی کرمول وی ری بی خستم  
کو او ب خوه و باقی وی تیده مر بون .  
أف لوری دیامن ، دستراند وپی برای من دنقیناند .  
او دیا کو گاکا از هژده ، نوزده سالی بوم و من  
دل کر از بکشم مکتبا حریبی ژ من ره گوتهو :  
— ماژ تره نه ناموسه ؟ ت چاوان بکافی مکتبا  
حریبی و بی ضابطی ترکو . او ترکو کو ولاتی  
ته ژ دستی ته ستاننده ، ملتی ته خسته خلامی بی ،  
باپیری ته دلیل و مالباتا ته پریشان کر نه وهورن  
آقینه زبقاری بی .

أف لوریایا ژ برای من ئی کچک بدرخان .  
ره دهات گوتن . او برای کو خدی دمنفای  
ده داو دمنفای ده ستاندبو . او برای کچک  
ودلال کو دنا قسی چار ساعتان ، د سر آژنوین  
باقی من ، د کلها عکایی ده مر .

ژ قان پیقه د قی لوری بی ده بیرا خوه ها من ژی .  
هییه . خوه ها من پشتی مرنا برای مه ، د شیناوی ده ،  
ب دنگی خوه ئی زیز ژ مره او دنهوراند وپی أم  
دگریاندن .

جار کی ، من اف لوری ژ حاجو آغاره خونده  
وگوتبو کو حچی زاروین مالامه بدرخان ناخ  
لی دکن ژ دسی سالان بیتر ناژین و دمرن .  
آغا هنک فکری ول من فگراند :

— ژ بر کو رحمتی ناخی خوه نادیت کسی .  
ژ لورامن ژی أف بندها — کوهالانکه عشیروا  
ری به — پیشکشی آغایی خوه کر .

## ولایتي کردان

کایرا امر، وانه مالو خانه یی ویرانی مین  
تی بگه زانینی فن و کیرده وه و عرفانی من  
بروله نی کوردم سلاحشورم له میدانی شرا  
عالم آیزانی چلون بو روسته می میدانی من  
گو بروی گه شتو گوزاری باغوباغاتم بگه ی  
هرده لی (الله اکبر) چند خوشه سیرانی من  
آوی برماوهی منه نیوهی جهان تیر آو ا کا  
بو عراق و الجزیره روحه ئەم آوانی من  
مزرعه کیلکه ی وولاتم بوته انباری جهان  
رزقی ایران و عرب تأمین ا کا خرمانی من

\* \* \*

بو بلندی خوی به قورانی ژپانی گل ا کا  
گیانو مالی هیچه لا سر کیرده و گورانی من  
رو بدا بو دینو ملت زرتە یی کورتی و به دی

گیان ا دن نا کن تحمل عالم و شیخانی من  
او کسه بد بینه اسپاتی جهل بو خوی ا کا  
وا ا کا انکاری زور و بد به و دورانی من  
لا په ره ی تاریخی عالم شاهده بو دوری من  
دیاره هیشتا تاقی کسرای دولتی ساسانی من  
ادعایی علمی موسیقا امین اسپات ا کا  
راستوسی گاو و بیات و لاوک و حیران می من  
پیاوی وک سلطان صلاح الدین ایوبم بوه  
نخره بو اسلامی عالم کیرده وهی سولطانی من  
انقلابی چونی پیک هینا له اسلامو عرب  
میر (ابومسلم) بوسه کیرده ی گه لی شیرانی من  
نادری افشاری عبد الکریم خانی زنی  
دونی دنگی داله عالم سطوقی شاهانی من  
گوفتگو با انتهای بی خاتمه ش بی به م قیسه  
نسبتی آری به سه بو عنعنه و عنوانی من

عبد الظاهر اشیری کر کوکی

یه کی له ادبانی مصری گه و ره (عباس محمودی  
عقاد) گو تویه تی :

« ژپان چی یه و ادبیات چی یه !! » دو  
شتین له یه ک شیت دروست کروان و به یه ک ده زو  
چیزاون و له یه ک کارخانه ده رچوژه . له مه و پیدش  
خه لک پی ی نه ده ویست که بویان ایسپات بگه ن  
که ادبیات به بی ژپان پیک ناپیت ، به لام  
ایستا که زور پی ویستیا نه که بویان ایسپات  
بکریت که ژپان به بی ادبیات تاپیت . له گه ل  
ئه وه شدافریک نیه له به بی ئه م دو حقیقته . مه  
به ست هزوه کوهر ژپانی ادبیاتیکی هه به ، همو

ادیاتیکی ش ژپانیکی هه به ، و هر دو کیان به یه ک  
چیشته ده پیوریت و به برزی و نیزمی ده زانریت .  
ای وه خوا هیچ ژپان به بی میل و جاذبه ده بیت !  
و هیچ میلو جاذبه پیک به بی بیژین و گوتن پیک دبت !  
و هیچ قیسه راستو جوا نو قنجو ژیکه له ده بیتته یه ک  
له گه ل قیسه پیککی ناشرین و شیواوو آلوزاو !  
جوابی ئه م سوئالانه همو ئه مه به که ژپان  
به بی ادبیاتیک ریک ناکه ویت که لی ی . بوه  
شیته وه . و به برزی و نیزمی ادبیات هروه کو ژپان  
به غینی شیت ده پیوریت . . (تواو نه بوه)

هفتیمی سوری



لوري

## دلایا زارووان

۱

بنقه خوشبیا دل ود چاقان  
دادی ژتره هر رو نگهبان  
دازوت مزن بی بدر خان  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۲

هشیار مبه نهو نه قنجه  
مهدك ژتره بزانه گنجه  
بی خو مبه پاشیایوی رنجه  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۳

خوش حالی وکی کفوک و برخان  
فکر اندنانه ملک ژی حیران  
پا که نسبتاته دادی قربان  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۴

دورا فلکی لی سرمه کینه  
بختی مه رشه کذب برینه  
مسکن ژمره نهو نشینه  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۵

نه مال و نه صاغي و نه راحت  
نالان کر نه حی ژی محنت  
دشوارة گمک بلایي غربت  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۶

چرخا فلکی و کی نسیمه  
هونابه خدی گمک رحیمه  
روژا خوشی یی دبت کریمه  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

۷

هو قاس ت مپیژره أف چه حاله  
بی صبر مبه ولی مناله  
عون و کر ماخوه دی هقاله  
بنقه کذبامن بنقه لولو !!

امین عالی بدر خان

ادبیات نهو شتازیر که له دیلی انسان گیرد  
ده بیته وهو دیتوده چیت و دهری ده کازه دهره وه  
وده بلیت به زیمانکی شیرین و جوان .  
انجا ادبیات بیژین و گوتتی همو شتیک نینه ،  
بشکو عبارته له گوتنو بیژینی شتیک که به ستراوه  
به ( ژ بیان ) ه وه ، و که پیویستی ژبیانه .

یونانی کون ، روسی ، فرانسیزی ، المانی ، ۰۰ ه . پ .  
زورده کات . انجا بو نه وه که نه م حقیقته چاک  
تی بگه یین با هه ندیک باسی ادبیات و چه شنایی  
یکه یین .

ادبیات پیک هینانو گوتنی میشک و فکری  
انسانه به چه شنیکی جوانو خوشوصاف که تاثیر  
بکات له سهر انسان ، آیا انسان غه مگین و دیل  
ته نک ده کات ، یان فرحناک و دیل خوشو کیفدار  
ده کات .

# هاوار

کوفارا کردی

۲۰ تیر ۱۹۳۲

هژمار ۵

## ادبیاتی کوردی

ایران‌ده‌مانه‌ویت به کورتی باسی ادبیاتیک بکه‌ین که علاقه پیک زوری هه‌یه له‌گه‌ل ادبیاتی دنیا، و به‌تایبه‌تی ادبیاتی آری، نه‌ختیک له‌هه‌ندی ادبیاتی روزآواده کات و هه‌ندیک لی‌جودا ده‌بیت ئه‌ویش ( ادبیاتی کوردی ) به .

هر و کو تاریخی کوردان به نه‌زانروی ما و ته‌وه و هیشتا به نه‌واوه‌تی له‌لای تاریخ زانه‌کان نه‌زانراوه، ادبیاتی کوردیش به و چه‌شنه معلوم نیه و معلوم نه‌بوه . هر وه کو ایمه به ته‌واوه‌تی ئه‌و شتانه نازانین که تأثیری کیردوه ته‌سه‌ر کوردان و تاریخی کوردان، هر وه‌ها ئه‌و شتانه نازانین که تأثیری کیردوته سه‌ر ادبیاتی کوردی، انجائ‌ه‌و شتانه آیاسیاسی بی کوملی ( جفاکی ) بی، یان دینی . . .

هه‌میسان چونکه قومی کورد توشی لافاوی که‌لان و قومان بوه و قومانی جودا جودا هه‌مو اخلاقی، ادبی، کوملی تأثیران کیردوته سه‌ریان، زیمانیشان تأثیری لیان کیردوه . او ملته بیگانانه که هاتونه‌ته کوردستان

و ئهم وولانه‌یان داگیر کیردوه، که‌مو زور تأثیران لیان کیردوه و شتیکیان به‌جی هیشته‌وه، و ئه‌وه به شی کوردی که که‌و توه‌ته به‌ر ئهم لافاوانه له‌زیر تأثیری دین و زیمان و تایبات و احوالی کومه‌لی ئه‌وانه ماوه‌ته‌وه . و چونکه ملتی کورد نه‌زان بوه و مدنیته‌ی ئه‌و مله‌تانه‌زور بوه . ده‌ستیان کردوته وه‌ر کیردنی مدنیته‌ی لیان . انجا له‌گه‌ل مدنیته، شتی دیکه‌شیان، وه‌رده‌گیرد . وه‌کو: زمان، ادبیات، هابست، احوالی کومه‌لی ه . پ .

له‌به‌ر ئه‌و شتانه که له‌سه‌روهه گوتمان کوردی کان هه‌تا کو ایستا که له‌زیمانی خویان زیاتیر له‌زیمانانی بیگانانه‌تی ده‌کوشین . هر به‌بونه‌ی ئه‌وه‌وه کورد کان بو ادبیاتی کوردی تی‌نه‌کوشیونه . و ادبیاتی کوردی - ئه‌وه‌ی که هه‌یه - هر واه به نه‌زانراوی ماوه‌ته‌وه .

هه‌مو خوینده واران (هاوار)ی خوشه‌ویست ده‌زانین که گه‌لی کورد گه‌لیکی آریه‌یعنی هندی اروپایی به . له‌به‌ر ئه‌وه‌و زیمانی کوردی و ادبیاتی کوردیش وه‌کو زیمانان و ادبیاتانی دیکه‌ی آریه . و ادبیاتی کوردی له‌ ادبیاتی فارسی، هندی،

# کتبخانا هاواری

ریزانا الفای با کردی

هژمار  
۱

غروش سوری

۱۲۰۵۰

۱۰

بِ چرمی خملاندى

بِ چرمی عادتی

ژ بونا درقه دقبت حتی پوستی ب سربیت خستن

زنگراف و مطبعت

ایوبی خان بابا مشق

حفر جیمع المعادن والصور الملوت واللوحات الخایب  
طبع بطانات وادریات بحروف نائفة علی الطراز العربی

ملك الطاهر

دمشق

الطیب

احمد نافذ

انحصائی بالامراض الداخلیة والزهریة والاطفال

عرنوس

دمشق

الطیب

محمد حنیف

الافتصاصی بالجراحة و امراضه العیون و جراحتها

صالحه

دمشق

## اشتراکات مجموعه هاوار

وفي غير هذه الأقطار

۱۵۰ فرنك	عن سنة واحدة
۹۰ فرنك	عن ستة شهور
۶۰ فرنك	عن اربعة شهور

في سورية و توكية و العراق و بلاد العجم و بلاد القفقاس

۵۰۰ غروش سوري	— ۱۰۰ فرنك
۳۰۰ غروش سوري	— ۶۰ فرنك
۲۰۰ غروش سوري	— ۴۰ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق — حارة الأكراد


# هاوار بدي

## کوقارا کردی

### تیسده خستیاین کوقاری

هقندی صوری	ادبیاتی کردی
ج ۰ ۶۰ بدرخان	لوری یا بدرخان
سید حزنی	پیروزی یا هاواری
قدری جان	بسرکا زیرین
دكتور ك ۰ ۶۰ بدرخان	دلذریا گلکی
ج ۰ ۶ بدرخان	الفایبیا کردی
عبد الخالق کر کوکی	ولاتی کردان
۰ ۶۰ ۱ بدرخان	دلایبازارووان
دكتور ك ۰ ۶ بدرخان	شین و پسنایینی
جگر خوینی کردی	پسنا دیوکی
هر کول آزیزان	آلی کردان
رونکاریا شاگرتین کردین عراقی	


SAL 1



DUŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 6



8 Tebax 1932

## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Têdeaxistiyên Qovarê

Hawar	Şaqir Fetah
Zozanê Toci	Nemirê Miqsi
Mar û Mirov	Çiroqbêj
Ji min bawer bibe	Dr. Q. A. Bedir-Xan
Melayê Cizerî	Hereqol Azizan
Diq û Rovi	Çiroqbêj
Hêva çardeşivî	Kedrican
Ferhengog	Hereqol Azizan
Ji bona Hawarê	Cegerxwin
Gulbanqê Hîşyariyê	Mela Eli
Berdêlq	Kedrican
Hawar e	Bozan Şahin
Qurdewarî	Faikê bêqes
Sê malo gundo!	Stranvan
Elfabêya Qurdî	C. A. Bedir-Xan

### Birê Frensizî

Un femme, Chef de tribu	N. A.
O, village de trois maisons	Hereqol Azizan
Folklore kurde	C. A. Bedir-Khan
L'Alphabet kurde	D. A. Bedir-Khan

Çapxana terekî

ŞAM—1932

# QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

1

## Rêzana Elfabêya Qurdî

Note sur l'alphabet Kurde

Bi çermê xemilandî 12,50 K. S.

Bi çermê adetî 10 K. S.

Ji bona derve divêt hakê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Hafiz*

SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES

Damas

Arnois

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

Damas

Salki

## PHOTOGRAVURE

### Eyoubiye Frères

*Inscription sur tous les métaux. Gravure coloriée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.*

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qiriyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tîrqiya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûs-sûrî — 100 frenq

SesmeHQî 300 kirûs-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûs-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:


Salqî 150 Frenq

SesmeHQî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tist bî navê xweyî têne şandin:

Şam : Taxa Qurdan



## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Zozanê Tocî Çawan Bû? Irû Çawan e?

Yeq ji zozanên meshûr Qurdistanê (toci) ye. Tekriba bi sê hezar metrowan ji rûyê behrê bilindtir e.

Di mabeyna Erdîş û Diyardinê da zozaneqî bi av û qanî bi gul û giya ye.

Çikeder rindiyên tebîî hene xwedê jê dirîx ne qiriye. Beriya şerê mezin da çawan bû? Irû çawan e?

Pêşya şerê mezin da Tocî cihê geşt û seyrana qeç û xortên di Heyderan, Ademan, celaliyan bû.

Cihê rindan, bedewan û delalan bû. Li her aliqî qon û xewet li milî hev drêj dibûn. Qeriyên mihê sor û çavres li nav gul û giyan da winda dibûn.

Li mileqî şehîna hespan, li mileqî qalina miban ji qomên suwaran ji refê bêrivanan û çiyayên delal jindar dibûn. Adeta her aliqî da weq coybarên avê qen û şahî diheriqîn.

Irû çawan e? Eywah... ew çiyayên delal û dilrûba, ew zozanên cenetasa irû cihê hirç û guran e. Cihê qerçû û roviyan e.

Ne hespe, ne suwar, ne peze, ne şivan, ne berti ye, ne bêrivan.

Gelo çî li wan kewimî û çî bi wan hat?

Bar qirî bi çiqî ve çûn yan şereqî mezin li wan kewimî û hemî telef bûn.

Belê di pêşya şerê mezin da tirqo ji bo veqirina rêya Tûranê dixebitîn. Dixwestin tirqên Enadolê digel tirqên Tûranê mitesil bibin. Di mabeyna wan da tu hail memînîn. Ew ji bi mehwqirina qurdan û istila qirina Azerbeycanê dihat

wicûdê. Feket tebîkatê fiqri melûnane ji wan re mimqin ne bû.

Wextê qo şerê mezin destpêqir û xwe ra fîrset xenimet zanû dest bi quştina file û tehcira qurdan qirin.

File li pêş çavên wan quştin, piştî wî dest bi derêxistina wan qirin. Ewî li Tocî, Sbîneq, Şerevdinê li ser avên sar, li ser qeviyên herfê, li nav gul û giyan da, bi şîr û şeqir mezin bûyî, tirqan mal û menalên wan ji destên wan girtin, tazi û birçî ji welatên wan derêxistin, hindeq şandine germa Mosilê, bireq li Çikûr-Owa Edenê, kismeq li sorezara konyeyê rast qirin. Ev kewmê nezanê wajûnbext heja desîsa tirqan xebardar ne dibûn. Hiqûmeta tirqan di cihê miawenet da wesatî imhaya wan tedariq diqir. Ew ji weq berxên nav çingalê guri da bi tewreqî masûmane minteziri ecelî mewûdê xwe dibûn.

Yên qo nehatin tehcir qirin li cihê xwe mayî, ji nezaniya xwe hêj dostê tirqan bûn, ji bo mizeferiyta wan xwina xwe dirêhtin.

Mihacirên qurd tazi, birçî setil û belengaz hêdû hêdû mirin, heta ji sedî deh xelas ne bûn.

Ewên qo xelas bûn ji pîrên wan niqariyan xwe bigehînin welatê xwe, disa ava biqin. Ewên qo çuyî ji irû tirq xwina wan dirêjin li cihê çiyân û zozanan wan davêjin hebs û zindanan.

Dê bigrî çiyao bigrî zozano bigrî çî qaniyê bigrî, bê xweyî, rebeno Nemiro bigrî.

*Nemirê Mîqîsî*

# Berdêlq (1)

- Ji Lorîya Bedir-Xan re -

-1-

Rabe mêze qe , hebeq li doran  
Te xew dirêj qir, em pir li berman  
Êdin mezin î , lolo lawecan  
Rabe Bedir-Xan , dê rabe lolo !!

-2-

Hişyar be êdî , niho pir kenc e ;  
Axa Qurdistanê , ji te re genc e ;  
Paşîya xewê , bi zane renc e ,  
Rabe Bedir-Xan ! dê rabe lo lo !!

-3-

Gurê devbixwîn qete nav berxan  
Ma nizanî berx ? berx zarê Qurdan  
Bûne armanca rimanên roman  
Rabe Bedir-Xan , dê rabe lo lo !!

-4-

Dewra feleqê , eger qo qîn e ,  
Razan ji me re , ket bi qêr nîne  
Mesqen ne nivîn , dar û devî ne ,  
Rabe Bedir-Xan , dê rabe lo lo !!

-5-

Irû ye namûs , irû ye xeyret .  
Der û poşanan , em bûne ibret  
Êdin bes nîne , divê hemiyet  
Rabe Bedir-Xan ! dê rabe lo lo !

-6-

Çerxa feleqê , eger nesim e  
Pêşî qo herçend , qozîq qemîn e  
Çavê xwe veqe , xwedê qerim e  
Rabe Bedir-Xan , dê rabe lo lo !!

-7-

Çiman nabêjî , gelo çi hal e ,  
Sebra me ne ma , binal biqale  
Rabe ji me re , meydan qemal e ,  
Rabe Bedir-Xan , dê rabe lo lo !!

*Kedîcan*

(1) Lorîya Bedir-Xan , di bin sernameya delalîya zarowan û di hejmara pêncê , rûpela dudowê hawarê de belav bûye.

# Ji min bawer mebe

Robar hêdî hêdî diheriqe , pêlên  
wî sar û xweş in . Ava wî bi qef e , û  
weq ziv gewr e .

Meşa wî li destê , weq rêveçûna dest-  
girtîyan û bûqan bialûs e , beza wî di  
nav çîyan û geliyan de , weq reprepa !  
hespên serhişq e .

Lê gava ez jê re dibêjim qo ez hej  
wî diqim bila ji min bawer mebe !!

\*\*\*

Rêl qesq e , siha wê honiq û çaq e .  
Li ser çîkilên daran , çûqan , dişekin . Pelên  
wan ter in .

Lê gava ez jê re dibêjim , qo ez  
hej wê diqim bila ji min bawer mebe !!!

\* \* \*

Azman heşîn û avîje ye . Stêr weq  
gewher û mirartîyan dibirikin . Heyv  
bi ruhnahiya xwe distire .

Lê gava ez jê re dibêjim , qo ez hej  
wê diqim , bila ji min bawer mebe .

\*\*\*

Buhar bibihî û rengîn e , bi stran  
û qêf e . Şiraniya wê xweş , xweşîya wê  
şîrin e . Tebîet ji xewê radibe û diqene .  
Her qunc bi qulîlq û mêrg , bi av û dar in .

Lê gava ez jê re dibêjim qo ez hej  
wê diqim bila ji min bawer mebe .

\*\*\*

Can şîrîn e , jiyîn spehî ye . Ez hêj  
ciwan im . Min hêj bîst û pênc buhar  
ne ditin . Geleqî hej jiyîn û hevîne diqim .

Lê gava ez ji wan re dibêjim qo ez  
hej wan diqim , bila ji min bawer mebin .

\*\*\*

Dê û bav , ap û xwal , pismam û dot-  
mam çikas delal in .

Bi wan re runişîlin û di ber tifiqê  
de axaftin çikas delal û xweş e . Li ser  
çîyan û Zozanan bi wan re gerîn û bezîn



Jinenigari :

**Melayê Cizerî**

Mela yeq ji şair û zanayên mezin  
û navdar yê qurdistanê ye .

Navê wî Ehmed Nişanî bû . Lê bi  
navê Melayê Cizerî nas û dengî e .

Mela di Cizirê de xwedê daye .  
Xwendina wî a pêştin jî, di Cizirê de  
bûye . Piştîre jî bona xwendinê çû bû  
Irak , Sûriye , Misr û Ecemistanê .

Berdeveqê mirê Cizirê bû . Lê careqê  
jê enirî û çû bû Diyarbeqerê .

Mideqe xweş li wê maye, bireq ji  
şihrên xwe li Diyarbeqerê nivisandiye .  
Lê paşê dîsan vegeriya û hati bû Cizirê .  
Salên xwe di welatê xwedêdana xwe de  
kedandine .

Bejna melê ne qurt ne drêj, lê navîn  
bû . Rûwê wî girovêr, sipî û sor bû .

geleqî çaq e, pè dilê mirov vedibe .

Lê gava ez ji wan re dibêjim qo ez  
hej wan diqim bila ji min bawer mebin .

\*\*\*

Heval heval e, lê bra delal e . Çikas  
ez hej brayê xwe diqim .

Lê gava ez je re dibêjim qo ez hej  
wî diqim bila ji min bawer mebe .

\* \* \*

Ez dilqetî me . Delala min spehî ye .  
weq berfê gewr e, weq agira germ e,  
û weq gulan sor e .

Dilê min di çavên wê de dil e .

Lê gava ez jê re dibêjim qo ez hej  
wê diqim, bila ji min bawer mebe .

\* \* \*

Lê welatê min, welatê dê û bavê  
min, welatê çal û qalîqên min, welatê  
min ê şîrîn, gava ez ji te re dibêjim qo  
ez hej te diqim ji min bawer bibe .

*Dr. Lamiran Altî Bedir-Xan*

**HAWAR E**

Hawar e qurê min hawar e,  
Tu xwe meqe.  
Gereq e qo sindûf û merbend,  
Te zemt meqe.

Guliyên qeçên qurdan  
Di destên roman da,  
Hawar diqe  
Tu xwe meqe lawê min ha were,  
Tu xwe meqe.  
*Bozan Şahîn*

Çav û birihên wî reş bûn . Riha wî  
sivîq bû . Guliyên wî hebûn dihatin heta  
ber gûhê wî . Por, rih û guliyên wî  
hergav şehqirî bûn . Eniya wî fireh, stowê  
wî drêj bû .

Rêveçûna wî bi lez bû .

Qefiyeq davêt ser serê xwe, yeqe  
din ji li ser dipêçand . Xeftaneq li ber bû .  
Pêlaveqe sor têxiste pèyên xwe .  
Eba werdigirt . Hergav biqên bû .  
Bi dora xwe re xweş diqir, dilê  
xelqî ji xwe ne dihişt .

Mela di Cizirê de çûye rehmetê . Di  
taxa Torê di Medresa-sor de veşartî ye .

Tirba melê ziyaretgah e, xelq geleq  
kedrê wî dizanin .

Fekêhên Qurdistanê diwana wî bi  
destên xwe re digerin . Hin beytên wê  
ji ber diqin û kesideyên wê di civatan  
de dixwin .

Tirba melê kenc hati bû ava qirin .  
Lê vê paşiyê tirba wî xirab qirine .  
Esqerên tîrq qêlên wê şqênandin qevirên  
dora wê birin û ji xwe re qeçên tifiqan  
çeqirin .

Diwana melê li Berlin û li Stenbolê  
hatiye çap qirin . Bi destên xelqî re geleq  
nisxeyên destnivîs hene .

Mela ji zmanê xwe pève bi farisî,  
erebî û bi tîrqî jî dizanî bû .

Ber destên wî geleq fekeh bi xwedî  
bûne . Şairê navdar Fekehê-teyran jî, jî  
fekehên melê bû .

*Herçeqol Azizan*

# QURDEWARI

Qurde ta qey bi xaber bi, nustinet bêarî ye  
 Wasitey dwa qewtinet imroqe her bi qarî ye.  
 Seyrî em kewmane qe çûn bûn û ista bûn be çî  
 Heşf e bo, tu wa estîrî boy te ebd û carî ye.  
 Itifakî ger neqey lem cehle xot rizqar nedey  
 Paşe rojet kelbe be xwe îş û nûşet zarî ye.  
 Nîwero ye helse etir bergî sistî daqene  
 Zulmetî şew wa be ser çû we'deyî wişyarî ye.  
 Rêynezanî berbidew rêqey mearif bigre ber  
 Neştîmanet zor qe sasew jîni her xembarî ye.  
 Bêqesa ketî umîdî ser bexweyî ked neqey  
 Qurdewarî zendewew mihtacî lîtfî barî ye.

*Faîkê Bêqes*

## Diq û Rovi

Di gundeqî xerab de, diqeq hilqîşiya  
 bû ser dîwarê xanîqî û banq dida.

Roviyeq daborî, xwe da ber dîwêr  
 û deng li diqî qir û got:

— Qeqo, diqo çî diqî bir?

Diq lê veqerand û got:

— Roviyo ma tu nabîni gundê me  
 xerab bûye. Ez jî bang didim, dixwazim  
 çend gundî û cotqaran bidim hev û gundê  
 xwe jî nû ve ava biqim.

— Heqe welê ye, ma tu nizanî qo  
 ez jî cotqareqî qêrhatî me, dê were  
 ciheqî nişanî min biqe, jî xwe re qoxeqê  
 ava biqim û dest bi xebatê biqim.

Diq kail bû, qet pêşiyê, rovi da  
 pey, qo herin niq qefxwêyê gund jî rovi  
 re erdeqî bibijêrin.

Diq danehati bû, di ser dîwaran re  
 derbas dibû, diçû.

Gava gehîştin qavileqê, diq xwe  
 dahilanî deng li qefxwê qir.

Qefxwê rabû, rovi dit.

Qefxwêyê te tajiyeqî fêris bû. Rovi  
 baz da, taji qet pey, da heta quna wî.

Sibetir rovi disan daborî. Diq ew

nas ne qir. Çiroqa ava qirina  
 gund jê re got.

Rovi qenî û lê veqerand:

— Bextreşo diqo, hetanî qo  
 tu qizirê vî gundî yî û taji jî  
 qefxwêyê wî ye, ev gund tucar  
 ava nabe.

## Mar û Mirov

Miroveq bi rê ve diçû.  
 Rastî mareqî hat. Mar qetî bû  
 bin qevireqî mezin. Ne diqarî  
 bû derqeve, ne jî bilive. Dilê  
 mirov pêve ma. Xwe da ber  
 qevirî, qevir raqir û ew xelas  
 qir.

Mar xwe daweşand, ser ziqê  
 xwe rabû û drêjî wî qir. Bi  
 wî vedaya. Mirovî got:

— Maro, heyran, ma çawan dibe,  
 min tu jî mirinê xelas qirî, tu dixwazî  
 min biqujî

Marî got:

— Ma jî mej ve em ne dijminên  
 hev in, ezê bi te vedim.

Mirov qir ne qir, mar jê nedigeriya.  
 Paşî, gote wî:

— Ket mebit em herin jî ekilmendeqî  
 bipirsin.

Mar Kail bû, û dan rê. Gaveqê  
 çûn rastî roviqî hatin. Mesela xwe jê re  
 gotin. Rovi li mirovî fedqirî û qenî.  
 Piştîre gote wan:

— Divêt ez cih bibînim qo biqarim  
 kerara xwe bidim. Şûn da veqeriyân û  
 hatin ber qevirî.

Rovi jî mirov re got:

— Tu qevirî raqe.

Ewî ew raqir. Rovi jî marî re got:

— Tu jî biqeve bin.

Mar qete bin û mirov qevir berdaserî.

Bîsteqê man, rovi deng ne diqir.

Marî got:

— Roviyo qanî kerara te, ez di  
 bin qevirî de pelixim.

Mirov dil diqir qo here. Rovi xwe  
 li buwara wî girt û got:

— Careqe din, vî qevirî jî cihê wî rameqe.

*Çiroqbêj*

## Hêva Çardesevî

Hênîşqa min li ser balgê, serê min,  
di nav qefa destê min î paldayî, lingê  
min î rastê bi erdêve nîrani; destê min î  
çepê li ser çonga lingê min î çepê bû...  
Jû pêve min xwe wînda qir hişê min jî  
serê min çû, qetîm bajarê xewn û xeyalan.

\*\*\*

Gava qo min, li jêrê xwe, li deryayê  
mêze qir, agireqî bi gûr, pêtên wê  
lihtên û datên, çavên min jiber ruhniya  
wê vene di bûn; tîrêjan davîtin ronîqa  
çavê min...

Di nav deryayê de agir: agireqî  
wisî bi silorî... ma tu car tê bira tu  
qesî? Min serê xwe jî deryayê bilind qir  
û li jor mêze qir, Hêveq çardesevî.. bi  
min re qaniya û bi xapandina min re  
mizmîzî... û got:

— Lo lawîqê delal; ma ne ma tu  
jî vê bêhişiyê hişyar bibî? Ev, kedereq e  
ez li bende te me...

Tu dikefilî, min germî date, bi gerna  
min tu jî xirîna mirinê xelas bûyî. Dê  
rabe jî çeyîya min re berdêlvan bibê!

Lê tişteq heye divê qo ez jî ve-  
neserim, min çeyê bite qir ne jî bona  
te, belqî jî bona xwe...

Belê, Mîn tu dit nedit, bêhemdî  
xwe varkilim. bejn û bala te, ez bêhiş qirîm.  
Ma çiman nabêjim? a bê hiş ezîm!..  
Lawîqê min ez hevîna te me!!

\*\*\*

Herê, tê bira min limin sarbû,  
diriciftim, dilerizim...

Ew serma ne jî keşa erdê, ne jî pûqa  
berfê, ne jî ji borîna ba û baranê bû. ew  
serma, jî bêqestiyê, û jî rebeniyê bû...

Xwîna min hişq bûbû, hevê ter qir  
û bi serda dibêjt ez, hevîna te me.

Gelo ez çiyê wê bibim? Devê min  
nagere û hev li bende çûhaba min e. Lo,  
xwedê, ez çî vegerînim? qo hêva xwe  
dixweş biqim.

Damarê livînê qete zimanê min,

Jî Zîn û Mem

## Welatê Qurdan

Dicle û Ferat û avê Xabûr  
Dengîn.. di ser dinê de meşhûr

Firdews e diyarê ap û xwalan  
Axê wê nivîna bav û qalan

Ser Bozêrewan û zîne xweşreng  
Mem lez dibezî ser ewr û ser meng

Bajar û gund û kesr û burcan  
Gî dilxweşî ne bi şexk û şadan

Ava ye bi reng û dewlemend e  
Ser erd û dinê jî bêmenend e

Her cih bi eşîr û qaniyê çaq  
Hêlîna welat û şadiyeq' paq

Ilon, Tebax, Tîrmeh, Adar  
Nisan û Gulan û cot û bazar

Her rûj û heftî hev û salan  
Dîroqa welat e rûpelên wan

Bav û qur û qeç û mam û pismam  
Pismam mirin di şopa dotmam

Qurdmanc teva mirovên hev bûn  
Yeq jî ne cuda hemî jî tev bûn

Cotqar û şivan bi qen qirin şor  
Ser mêrg û zewî û solinê sor

Parone û ga û goliqên reş  
Gamêş û medeq gededq hemî geş

Hogeq û bizîna û berx û nojen  
Weq av û co sipî û rewşen

Cih cih bi bihuşt zmanê qurdi  
Cih cih bi mekam û zarê qurdi

Ava ye welatê qurd û qurdan  
Gencine ye Zîn û çavê Alan.

*Dr. Zamiran Ali Bedir-Xan*

min dilqir, dest bi galgalan biqim, Lê çî  
bibînim: min dit, jî kozîya baqur û roava  
ewreqî reş, bi mij û xumam bi lez û  
bez gihîste ser hêva min. Gotina min  
dikirîqa min de ma. Hêv, reş di xenikî..

(Jî xewê vecinikîm)

# ELfabêya Qurdî

6

Berdêlên wan di elfabêya erebî de ev in :

ج — ژ      گ — ك

Ş — Ev he f berdêla (ش) a erebî ye. Dengê vê herfê di fransîzî bi (ch), di elmanî bi (sch) û di inglîzîyê de bi (sh) têt nîşan qirin.

Ji hertên latîni jî bona nîşanqirina vî dengî di destê me de tu herf ne ma bûn. Gora destûreke me diviya bû qo em bi hertên hevedudanî emel meqin. Destûra me a pêşîn em dixistin nîzingî elfabêya tîrqa.

Ji hêla din cihderqa vî dengî geleq nîzingî cihderqa herfa (s) ye.

Miletên qo di zmanê wan de ev deng nine li şûna wî (s) dibêjin.

Di zmanê yûnanî de (s) nine. Ji lewra yûnanîyên qo nû dest bi frensîzîyê diqin şûna (chambre-sambr) (sambr) dibêjin û pîrsa (paşa) (pasa) dixwînin.

Di encamê de me ev deng, weq tîrqa, bi vê herfê nîşan qir.

Ji xwe ev şîql di elfabêya xelqê romanyayê de, jî mêj ve hebû.

X — Ev dengê qo di elfabêya erebî

Ax! Ax! Gewra min, rinda min, dilqetiya min. Tu bi çi lewnî têt xewna min?

Ew, ne xewn bû. Ew, ne xeyal bû. Ew, ne hev bû.

Ew, ser hatiyeq kewimî; gewra min, rinda min, dilqetiya min bû. Ewrê reş jî di zanim qibû.

Mifsido, ewro! te destê min jî gewra min qir, û gotiina min a dawî jî, di kirîqa min de hişt.

Ez, niho bi ax û qeser, bi kirîneqe bilind dikirim:

Şermesar im! gewra min. Ez jî hêvinê te gorîyê te, candayê te me!!

*Fredican*

de bi herfa (ع) têt nîşan qirin di hin zmanên arî de jî heye, weqî niho elman vî dengî bi (ch) nîşan diqin. Lê milletên din, weq yûnan, bi (x) dinimînin.

Ev herfa ha di hin elfabêyan de, weq ya frensîzan, du dangan bihev re dinimîne û dide xwendin, yanî dengêqî wê dutaqî heye.

Herweqî:

Alexandre — Aleksandre

Exemple — Egzemple

Ji ber qo dengê wê ê dutaqî jî me re ne gereq bû, me ev herfa ha weq yûnanan û hin milletên din jî bona nîşanqirina dengê (z) êxiste nav elfabêya xwe.

Q. k — Dengên qo di erebîyê de bi (ق) û (ك) nîşan diqin û jî hev bi geleqî cihê ne di zmanê me de jî cihê cihê peyda dibin.

Digel vê hindê (ق) a qurdî jî ya erebî nermtir û siviqtir e. Mirov diqare bibêje qo (ق) a me nîzingî wê (k) yê ye qo di pîrsa (kristal) de têt dîtin û frensîz (cristal) dinivîsinin.

Ji bona nîşanqirina van dangan di destê me de du herf hene: (q) û (k).

Gelo bi qîjqê dengê pêşqî û bi qîjqê dengê paşqî divêt bête nîşan qirin.

Deng weqî jî pêşîya devê mirov derdiqeve pêşqî û gava jî paşîyê derdiqeve paşqî ye.

Herweqî (ق) paşqî û (ك) pêşqî ye.

Ji ber qo dengê (ق) jî kirîqê û dengê (ك) jî pêşîya wî derdiqeve.

Di zmanê frensîzî, elmanî û di hinên din de (qu) dengêqî dide qo rast bi rast dengê wê (ك) yê ye qo di pîrsa (qar - ك) de têt bibistin.

Xelqê Eşîra Bêrtî jî çaryeqê re carinan (qart) dibêjin. Di zmanê frensîzî de jî (quart) heye û mana wê jî çaryeq e.

Tinê frensîz (t) ya paşîn naxwînin û weq (qar - ك) a qurdmancî bê (t) diaxwînin. Di van du pîrsan de dengê (qu) a frensîz û (q) a qurdî weq hev in û di tu tiştî de jî yeq hev ne cuda, ne qem, nê zêde ne. (dûmahîq heye)

# L'hospitalité Kurde

## Une femme, Chef de tribu

« Le récit qui suit, est écrit par un de nos amis qui avait rempli des fonctions de gouverneur dans les provinces orientales de l'ancien Empire Ottoman, dans le Kurdistan, avant la guerre mondiale, et qui avait eu l'occasion d'observer et d'étudier les mœurs et coutumes pittoresques et exotiques des populations habitant ces régions; les lignes suivantes ne doivent donc pas être prises pour des récits fantaisistes, mais des descriptions de la vie réelle vécue dans ces pays »

Le peuple Kurde est un de ceux qui ont conservé intacts, au cours des siècles, leurs mœurs et coutumes patriarcaux, parmi lesquels figure la fameuse hospitalité orientale. Cette hospitalité est, chez le Kurde, exquise et déférente, notamment à l'encontre des passants de marque,

J'avais eu, il y a plus de vingt ans, l'occasion de jouir moi-même de cette hospitalité, lorsque, de par mes fonctions, j'avais visité quelques villages et achirets (tribus) Kurdes.

Il y a, dans l'ancienne province ottomane de Van, un district qui était connu sous la dénomination de Chatak et dont dépendait un nahié (commune), Nordouz. Cinq tribus Kurdes (achirètes) habitaient, entre autres habitants, ce district, à savoir: Alan, Chidan, Ezdinan, Khalilan, Khavechdau.

Le plus important de ces achirètes était Ezdinan, dont le chef était une femme, jeune à peine âgée de trente-six ans, aux traits beaux et énergiques; elle s'appelait Fatma et était connue dans la région sous le surnom «kralitsa» (la reine).

Elle était la veuve de deux frères, chefs de la tribu, qu'elle avait épousés successivement, et qui étaient morts l'un après l'autre, laissant Fatma ou Falma à la tête de l'achirète. Elle était écoutée et obéie dans sa tribu, et généralement respectée dans la région entière. Elle était très intelligente, d'une intelligence au dessus du médiocre, bien que restée inculte.

C'était aussitôt après la proclamation de la Constitution Ottomane en 1908; j'avais été hospitalisé douze jours, avec sept ou huit compagnons, dans la tente de Falma. C'était au

mois d'août, et les gens de la tribu Ezdinan avaient quitté provisoirement leurs villages, habitations hivernales, pour estiver sur un plateau assez haut, leur «zozan», lieu d'estivage. C'était un assez large plateau, pourvu de sources vives, dont les eaux fraîches étaient vraiment un délice sur ces hauteurs et à cette saison-là, et dont le climat était on ne peut plus sain et fort. Nous étions princièrement hospitalisés par la reine d'Ezdinan. Tous les jours, il y avait inmanquablement l'agneau traditionnel, avec d'autres plats, douceurs et laitages y compris. Une partie de la grande tente noire rectangulaire, était mise à notre disposition, où il nous était servi de matelas propres, ainsi que des draps et des coussins, avec tout le confort possible sur ces montagnes, assez éloignées des grands centres.

Nous communiquions avec Falma par l'intermédiaire d'un arménien qui faisait l'interprète, puisqu'elle ne connaissait que le Kurde, et moi, bien que j'en avais acquis certaines notions, je n'étais pas à même de la comprendre. Un jour, quand on causait sur le changement de régime survenu dans le pays, Fatma, elle aussi, prit part à la conversation; elle aussi voulait la justice, la liberté: «Ez edaletê dixwazim, Ez huriyetê dixwazim».

Cette femme illettrée, qui était dépourvue d'une instruction même rudimentaire, dont la vie était passée jusque là dans ces vallées et dans ces montagnes, qui ne connaissait rien des rouages de l'organisation d'un état moderne, avait pu saisir, rien que par son bon sens inné, le sens du changement politique survenu et les exigences de la nouvelle époque qui s'ouvrait.

Cette femme, chef de tribu, était une bonne cavalière et maniait bien l'arme à feu; bref, elle était une véritable amazone.

Un jour, je m'étais aventuré, accompagné d'un seul gendarme, jusqu'à des hauteurs voisines, sur lesquelles était campée une tribu turbulente assez nombreuse dont je me souviendrais du nom, si j'avais en main mes notes. Les gens de cette tribu n'avaient pas une bonne réputation. Fatma, en me voyant absent de la tente depuis quelques heures, s'en était inquiétée, et supposant que j'avais pris la direction des hauteurs citées, avait monté sur un bon cheval, pris des armes et quelques valets

Textes et Traductions :

**Sê malo gundo !**

—1—

—Xelqê delal mî' di' serê vi çiyayî  
Sê bisqê' di şê,

— hûriq, hûriq —

berdane ber vi bayî

—Şeva nivê şevê, were tewafa sîng û berê

Hê' şîr tê ne geriyayê.

Yar yar yar, Sê malo gundo !

—2—

Ez çûme derê' çeman ,

Çem e' sar ia .

Zozanê' bavê te bilind in,

Berf û baran lê dibarin .

Isal, sala hefta ye,

Berî lawiqê min qetiye

Welatê xerîb û xurbetê,

Sîng û berê' miu fadilê!

Bê mihas û bê timar in.

Yar , yar , yar , Xopano gundo!

—3—

Çavên min ê' reş, qil derman e

Irû , sé rû' , çavên min Kerimîn,

Li derê' van rêyan e.

Xwezî min zanî ba

Çivanê min û bejna Zirav

Çend rû' mane.

Yar , yar , yar , qambaxo gundo !

—4—

— Çiyaqo ! bilindo ! rê di ber e,

Ezê bişînim Diyarbeqra xopan,

Heyaseqê bînim, jî bejn û bala te re.

Xelqê delal mîna mêqeweqê

Ji ên kereberbanqa sibê, qew di ber e.

avec elle et s'était empressée de venir à ma recherche .

On pourrait multiplier à volonté ces récits d'hospitalité Kurde; pendant mes pérégrinations, de 1909 en 1914 dans les provinces aux confins orientaux de l'ancien Empire Ottoman, j'avais été maintes fois l'objet de cette hospitalité généreuse. Si j'ai choisi le cas relaté là-dessus pour le présenter aux lecteurs du Hawar, c'est que je l'ai jugé digne, à plus d'un point de vue, d'en retenir l'attention.

N. A.

Yar , yar , yar , Xerabemao gundo !

—5—

Heyranê ! Heyranê , heyraneqe di jî

Te sê bisqê' di şê, berdane ser darê

[ dergûşê, dihinijt,

Te şewitand malê gundi û çiranan

Te şewitand lihêfa serçavê min jî,

Yar , yar , yar , Dengê makulan li te

[ nayê gundo !

**TRADUCTION**

O VILLAGE DE TROIS MAISONS

—1—

— J'ai vu le beau monde (la bienaimée )  
sur le sommet de cette montagne ,

Elle a abandonné trois tresses blondes  
devant ce vent ci

—Viens dans la nuit de minuit (au fond  
de la nuit ) au pèlerinage de la poitrine et  
des seins

Où le lait n'a pas encore circulé.

Yar, yar, yar(1) O village de trois maisons.

—2—

Je suis allé dans les lieux des rivières,  
les rivières sont froides;

Les plateaux de ton père sont hauts, la pluie  
et la neige y tombent.

Cette année, c'est la septième,

Depuis que mon garçon est parti,

A l'étranger, au pays de l'exil;

Ma poitrine et mes seins, vertueux!

Restent sans caresse, sans amour

Yar, yar, yar... O village misérable!

—3—

A mes yeux noirs le collyre est un remède  
Aujourd'hui, voilà trois jours que mes  
yeux se fatiguent,

A regarder l'endroit de ces routes,

Ah si je savais .

Pour ma rencontre avec celui,

A la telle fine

Combien de jours restent.

Yar, yar, yar... O village soit maudit,

—4—

— O montagne ! O haute, dont la route  
à côté ,

(1) Expression très courante dans les langues  
aryennes de l'orient qui signifie ami, compagne  
d'amour.

# L'ALPHABET KURDE

6

Tout de même on ne peut pas dire que ces (→) sont toujours court comme le (i) Kurde, puisque les (i) des izafats d'après le (arouze) rithme arabe, sont enclins à des variations. Et c'est pour cette cause que ces (→) sont quelquefois des (i) Kurdes.

Si, dans le sud, cet (i) diffère de l'(i) Kurde ordinaire, ou de (i) cette différence ne peut provenir que d'une nuance de couleur vocale et non d'une nuance de changement du son qui correspondrait à un changement de point d'émission de ce son.

J'enverrai chercher du rosse Diyarbekir,  
Une ceinture pour ta taille et tes flancs,  
Le beau monde comme une perdrix  
femelle  
Pareille à celle dont, avant l'aurore,  
Le mâle est à côté.  
Yar, yar, yar ... que tu reste en ruine,  
village .....

5

Extase, extase, encore extase,  
Tu as abandonné tes trois tresses  
blondes, sur le bois du berceau, tu t'assoupis,  
Tu as brûlé les biens des villageois et  
des voisins,  
Tu a brûlé même la couverture de ma  
couche.  
Yar, yar, yar... La voix des nobles ne  
t'arrive plus, village!

\*  
\*\*

Cette chanson m'a été communiquée par  
(Çeçan) fils de (Haco) agha, chef des tribus  
Kurdes de (Hevêrçan).

Elle peut être considérée comme un  
exemple typique du dialecte (Hevêrçan),  
que nous avons, sciemment, voulu garder tel  
qu'il est.

Nous ne présentons à nos lecteurs, qu'une  
partie de cette chanson qui contient une dia-  
logue entre les deux amoureux.

*Hereqol Azizan*

D'ailleurs, ainsi qu'on le verra plus  
tard, dans différentes contrées du pays,  
comme dans chaque langue, la prononcia-  
tion est plus ou moins dure ou fine.

Û.— Cette voyelle correspond tout-  
à-fait à l'(u) allemand qui en français est  
noté par (ou).

Dans certaines contrées on le pro-  
nonce aussi comme les Français.

U.— C'est une voyelle unique en  
son genre est un des deux sons qui carac-  
térisent la phonétique Kurde. Pour pou-  
voir bien exprimer le son que donne  
cette voyelle il faut traiter en même temps  
d'un autre son qui peut être considéré  
comme accouplé au premier.

Comme dans toutes les langues de  
flexion, et particulièrement les langues  
aryennes, en Kurde, une voyelle placée  
au commencement d'un mot peut régir  
différentes consonnes et ne faire avec  
elles qu'une seule syllabe. Par exemple les  
mots: blûr xwar, stûr, krên, standin,  
braştin.

Lorsque ces consonnes sont le (x)  
et le (w), la voyelle qui les régit les fait  
prononcer en les amalgamant, comme:  
xwe, xwin, xwarin, xwêh, daxwaz.

Parmi ces différents mots prenons  
(xwe) et essayons de trouver son équiva-  
lent phonétique dans un mot français.

Prenons le mot français (oie) et  
ajoutons devant lui un (x) Kurde, nous  
avons (xoi) qui est le correspondant pho-  
nétique du (xwe). Ainsi que dans les mots:  
quoi, bois, loi, choix. Autrement dit, le  
(oi) arrive à exprimer ce son si on le  
fait précéder par un (x) Kurde.

Voici la preuve matérielle que ce  
son est bien tel que nous le définissons.  
Dans quelques mots du dialecte du  
Nord-Est, chez lesquels ce son a disparu,  
on en trouve un rest, le (w) du (xw).  
Par exemple dans ce dialecte le mot (xweş)  
est devenu (weş) c'est à dire que le (x) a  
disparu; mais il ne s'agit pas du (xoş)  
tel que le prononcent les Persans, ni du

## MEMÊ-ALAN

## PREMIÈRE ÉPISODE

## La maison des (Alan)

La chanson commence par une courte définition du Kurdistan et indique la localité où se trouvait le royaume occidental de (Memê-Alan) en Kurde (welatê-Mexrîbî) qui, mot à mot, veut dire le pays occidental.

(xos) avec un (o) bref, tel que le prononcent les Turcs.

D'autre part, lorsque la lettre (w) est suivie de la voyelle (i), l'amalgame est tellement forte que le (w) adouci par la voyelle (i) et combiné avec elle produit presque un nouveau son. Comme il s'agit d'un son bref nous l'avons noté par le (u) et nous avons réservé le (û) à un son long, ainsi que nous l'avons déjà indiqué. De la sorte, nous nous conformons à cette règle que le ( ^ ) sert toujours à la représentation des sons longs.

Cette voyelle, qui cache en elle une consonne, fait lire plus forte les consonnes qu'elle régit, surtout quelques unes d'entre elles, ainsi que nous le dirons plus tard.

Nous avons dit que le (u) n'est jamais le son bref de (û), car dans la phonétique kurde un son de voyelle émis du même point de l'organe d'articulation ne peut pas être tantôt bref, tantôt long. Une oreille bien exercée à la phonétique Kurde arrive sans difficulté à saisir ce point. Cependant on peut en fournir des preuves qui s'adressent aux yeux et ne recourent pas à l'ouïe.

Examinons la transformation vocale que subissent certains mots étrangers en pénétrant la langue Kurde.

Le (ـ) arabe et un (û) bref. Dans plusieurs mots arabes empruntés à cette langue, le (ـ) se transforme en (i) Kurde, en raison de manque de (û) bref dans la langue Kurde; exemple:

(à suivre)

Ce pays qui n'est point prévu dans toutes les variantes est défini comme étant au bord de la mer, dans laquelle aux lointains invisibles, existaient même des îles (1)

Les maîtres de ce pays étaient trois frères qui repondaient aux noms de (Hûşeng, Bebrem, Feridûn). Tous les trois, étaient des vieillards, le plus jeune était âgé de (75) ans. Ils étaient riches mais n'avaient pas d'enfants.

Les princes voyant leur âge avancé, la mort proche et une énorme richesse devant eux décidèrent de partager leurs biens entre les pauvres du pays et de ne garder pour eux que le strict nécessaire.

La même nuit tous les trois firent le même songe. Dans le pays il y avait, après les princes, un vieux savant qui possédait une puissance extraordinaire et qui s'appelait (Nerîman). Il avait une fille du nom de (Gulîzer) belle mais assez âgée et que personne n'avait osé demander en mariage.

Un mage avait dit aux princes pendant leur rêve, allez demander (Gulîzer) en mariage; elle donnera le jour à un garçon que vous nommerez (Mem); il sera un héritier digne des (Alan).

Les trois frères après s'être raconté leur rêve, décidèrent de demander (Gulîzer) pour (Hûşeng) et le firent.

(Gulîzer) à la fin de la gestion donna le jour à (Memê-Alan) qui fut la joie du pays entier.

Son père ainsi que ses oncles mirent tous les soins possibles à bien élever cet héritier du trône. Ils firent venir pour lui des professeurs des contrées les plus éloignées.

Dès son bas âge il fut bon tireur, bon escrimeur et bon cavalier. Son père lui avait organisé sous le commandement de (Bengi)(2) une garde spécial de (1500) tireurs d'élite. Tous jeunes gens et fils de la noblesse du pays.

(à suivre)

(1) Les (dengbej) que j'ai questionné à ce sujet m'ont répondu qu'ils avaient entendu dire que ce pays se trouvait autrefois dans le golfe d'Alexanderette, et la plupart ne savaient même pas où se trouvait ce golfe.

(2) (Bengi) est le fils de la tente maternelle de (Mem) et le neveu de son grand père le savant (Nerîman).



تشرین الاول

پایزا ناڤین  
payıza navîn

چریا بری  
çiriya berê

تشرین الثاني

پایزا پاشین  
payıza paşîn

چریا پاشی  
çiriya paşê

کانون الاول

زڤستانا پشین  
zivistana pêşîn

چلیا بری  
çeleya berê

کانون الثاني

زڤستانا ناڤین  
zivistana navîn

چلیا پاشی  
çeleya paşê

شباط

زڤستانا پاشین  
zivistana paşîn

گجوک  
gecoq

شباط  
sibat

اسماء الايام

الجمعة { این  
în

السبت { شنبه  
embih

الاحد { یکشنب  
yeqşemb

الاثنين { دُشنب  
duşemb

الثلاثاء { سیشنب  
sêşemb

الاربعاء { چار شنب  
çarşemb

الخميس { پینج شنب  
pêncşemb

اسماء الايام والاشهر

لقد سألتنا بعض قرائنا عن اسماء الايام والاشهر باللغة الكردية . فيها نحن نلي طلبهم ونبين الاسماء المذكورة فيما يلي :

للاشهر باللغة الكردية نوعان من الاسماء . فالنوع المألوف هو تسمية الاشهر بأسمائها المستقلة واما النوع الثاني فهو خاص بتسمية اشهر السنة بحسب اختلاف قصولها . وهذا النوع اكثر استعمالاً في الاغاني والاشعار .

اسماء الشهور

آذار

بهارا پشین  
buhara pêşîn

آذار  
adar

نيسان

بهارا ناڤین  
buhara navîn

نيسان  
nisan

مايس

بهارا پاشین  
buhara paşîn

گلان  
gulan

حزيران

هاڤینا پشین  
havina pêşîn

حزيران  
hizêran

تموز

هاڤینا ناڤین  
havina navîn

تیرمه  
tîrmeh

آب

هاڤینا پاشین  
havina paşîn

تباخ  
tebax

ایار

پایزا پشین  
payıza pêşîn

ایلون  
îlon

صاحب الامتياز والمدير المسئول

الامير جهادوت عالي بدر خان

# فرهنگنوڪ

رِ كَرْدِي لِ عَرَبِي

تفسير المفردات الكردية باللغة العربية

لقد ذكرنا في العدد الاول من مجلتنا (هاوار) أنها مجلة ادبية علمية بحت ترمي الى توحيد اللهجات الكردية المختلفة والى تعليم القراءة والكتابة بصورة منتظمة للاكراد وفقاً لاشرائط المقررة .

كنا نفسر حتى الآن باللغة الكردية المفردات اللغوية التي تعد غريبة في بعض اللهجات . غير اننا قررنا ، اعتباراً من هذا العدد ، أن نخصص في مجلتنا عموداً لتفسير هذه المفردات الكردية باللغة العربية ، وذلك بناءً على اقتراح بعض قرائنا الأفاضل . فسندرج إذن بعد الآن باللغة العربية معاني جميع الكلمات التي يسألنا عنها القراء تحت عنوان (فرهنگنوڪ) فنرجو من حضراتهم ان يطلبوا منا تفسير جميع الألفاظ والعبارات التي تشكل عليهم فإنا سنسرع الى اجابتهم في هذا المكان .

فرهنگنوڪ { (فرهنگ) تأتي بمعنى قاموس . وأما  
ferhengnoq { (كوڪ) فهي اداة للتصغير . فمعى

ددى هر كسى وى برى اقى دار  
كلك ديلبر ونازك و نازه دار  
هزار بلبلى دل شواط و بخوين  
قلن كيمه أرزانه پينج سد قروش  
دنيق باغى و يده دكن آه وزار  
بخوازن ژعالى جلادت بغار

هنگر فونى كرى

فرهنگنوڪ هي إذن القاموس الصغير او مفردات لغوية

ناس كرن { المعرفة ، هذا مصدر مركب واما بسيطه  
nasqirin { ف (ناسين) فتقول مثلاً (از فلان كسى

ناس دكم ، او ، دِ ناسم) اي انني اعرف فلان

لوما { معناها (لانه)  
lewma {

هيين { الكيان او الوجود مثلاً (هيينا خدى  
heyin { آبادينه) اي وجود الله ابدي

پرونڤيس { وهي تفيد معنى (البرناهج) تماماً  
pronivis {

بنگه { معناها (الأصل او الأساس)  
bingeh {

تاڤل { اي (مباشرة) او (للحال)  
tavil {

تكوژ { اي مكمل او (مستكمل)  
teqûz {

روال { اي (فتى ، شاب) وهي تلفظ بلهجة الجنوب  
rewal { بشكل (روله او رولا)

رشبلك { معناها الحقيقي (مسودة او تسويد) وإن  
resheleq { كان بعض الأكراد يستعملونها مكان

(مكتوب)

آرمانج { هدف  
armanc {

آوايى خباتي { (آوا) طرز . (خبات) عمل فحصناهما  
awayé xebatè { طرز العمل

گوپال { كل عصا معكوفة الرأس على الإيطلاق  
gopal {

بردېلك { تأتي بمعنى نظيرة في الشعر  
berdêlq {

هڤخستنا زمانان { (ل هڤخستن) معناها الضرب  
hev xistina zmanan { ببعضه او الجدال والتركيب

يفيد معنى جدال الألسنة

## کلهبانکی له شپاري بي

چاشي خوځه که ژخواب رابه  
 ميزه ڪو ولات همو خرابه  
 جارك لولاتي خو بنيره  
 روځي گاه پشته چونا شيره  
 اودسث تزي ژميرگك و آقا  
 روژ تي ده ژزوځه چويه اقا  
 اوگوه زمردين دسرده  
 برفن دحلن و باغ دبن ده  
 اوباغ تزي گل و لاله  
 مرغی سحری لبر دکاله  
 لوراگورفك ژ کند وزاغان  
 هيلين کرزه دناقا باغان  
 بلبل ڪو بزار خو دخوينه  
 زاغ ژي ژخو دنك بدردخينه  
 برژي ربانه کهپايه ژيرين  
 جيکي خوي ژير بژور بکورين  
 جارك هره سرچيای وزوزان  
 ب آواز کي ژيني بانکه کوردان  
 بيژه همويك بين بهف ره  
 جاني خوبدن بچوک و کقره

ملا علی

شهنشاه وپاشايه و خوند کار  
 رهزو باغ و باغچه بروژو زنار  
 سرفراز وجومرده او بغيچه فان  
 هواره پرجوانه کچه نوه گپ

## ژبوناهواری

ژبو مبري زراف و گران و سرفراز و هنرمند

ميرهادت عالی بدرخان

بنده گوناشي جگر خون هاتيه ناسکرت دستي ته  
 ماچدکم وبي هزاره سلاخان لجاب عالیشان دم هبونا سري  
 ته لجهاني ژپاد شاهی مزن دخوازم وبقان چند خوشخواني  
 ژيرين ازهاواراته پيروز دم ۰ ولي ديساوهك پيرز ناما  
 (حامد فرج) نابه چکوي جوان ميري بري هر کسي  
 هاواراته پيروز کر ۰

هزار جاري پيروز بتن اف هوار  
 هزار آه وزارين دکن لي ازم  
 گلک خوب ورنده وکي گلغزار  
 ژوان بلبلان تي جگرخوين وژار  
 کلستاني زاري مه يه اي جوان  
 دبیم آخ ولات آخ ولات آخ ولات  
 ژبو بلبلي دل ته خوش بو بهار  
 آئيناته کستم کرم تار ومار  
 چه ميوک شيرين بري وي گها  
 ولات پرخوشه چول و دشت و چيا  
 پسندیده گو من بري وي دخوار  
 لزواني ژوري دجهين آئين سار  
 چه بوستانکي پرخوش و پر باق  
 دنيا ولات من ديه سي بهشت  
 هيه تيده خوځ و بهوک و هنار  
 کليبي و شاخي و چولا حصار  
 لبروي هيه بغيچه قبانک مظهر  
 حصار گلک خوشه دشت و چيا

## مار و مروف

مروفك ب ری ٲه دچو . راستی مار کی ہات .  
مار کبوی بن کفر کی مزن . نہ د کاری بو در کفہ ،  
نہ ژ ی بلقہ .

دلی مروف پیٹھ ما . خوہ دا بر کفری ،  
کفر را کر و او خلاص کر .

ولاتین وان دریخستن هندك شانده گرما موصلی  
برهك لچوقور اووا آطنه یی قسمك لشوره زارا  
قونیه ئی راست کرن ، آف قومی نزاری واژون  
بخت هیژا دسیسا تر کان خبردارنه دبون . حکومتا  
تور کان دجیبی معاونتیدا وسائط احمایا وان تدارك  
د کر . اوژی وك برخیت ناق چنکالی کوریدا  
بطوره کی معصومانه منتظر اجل موعود خوہ دبون ،  
یی کونہاتی تہجیر کرن لچی خوہ مائی ژ نزانینسا  
خوہ ہیژ دوستی تور کان بون . ژ بو مظفر بتاوان  
خونا خوہ دریہتن .

مہاجرین کرد طازی برچی سفیل<sup>۱۱</sup> و بلنگاز  
ہیدو ہیدو مرن حتی ژ صدی دہ خلاص نبون .  
اوی کو خلاص بو نژی پری وان نکاریان خوہ  
بکہینہ ولاتی خوہ دیسا آقابکن . اوبت کوئی  
چوئی ژ ی آبرو تورك خونا وان دریژن لجیبی چیان  
وزوزانان وان داٹیزنہ حبس وزندانان . دہ بگری  
چساؤ بگری زوزانو بگری کانیبی بگری  
بی خوئی بو رہنو نمرو بگری ! . . .

نمری مکی

مار خوہ داوشاند ، سرز کی خوہ را بو و در پژی  
وی کر . ب وی قدا یا . مروف گوت :

— مارو ، حیران ، ماچاوان دہ ، من ت ژ صرنی  
خلاص کری ، ت دخوازی من بکژی  
— ماری گوت :

ماژ مژ ٲہ ام نہ دژ منین هفن ، ازی ب تہ قدم .  
مروف کر نہ کر ، مارژی ندگریا ، پاشی  
گوتہ وی :

— قت مبت ام ہرن ژ عقلمند کی بیہرسن .  
مار قائل بو ودان ری . گہ ٲکی چون و راستی  
رو ٲیکی ہاتن . مسٹلا خوہ ژیرہ گوتن . رو ٲی ل  
مرو ٲی فد کری و کنی . پشترہ گوتہ وان :

— دقیت ازجہ بینم کو بکارم قرارا خوہ بدم .  
شوندا ٲگریان و ہاتن بر کفری .  
رو ٲی ژ مرو ٲرہ گوت :  
— ت ٲی کفری را کہ  
اوی او را کر . رو ٲی ژ ماری ر ہ گوت :

— ت ژ ی بکفہ بن  
مار کتہ بن و مرو ٲ کفر بردا سر . بیستکی  
مان ، رو ٲی دنک ند کر .  
ماری گوت :

— رو ٲی بو ! کافی قرارا تہ ، از د بن کفری  
دہ پلخیم .

مرو ٲ دل د کر کو ہرہ . رو ٲی خوہ ل  
ہوارا وی گرت و گوت :

— جارہ کہ دن ، ٲی کفری ژ جہی وی  
رامکہ . . . . .

## روزاني توجي

داوان بو؟ ايروچاوانه

بڪ ٿ زوزانين مشهور كردستاني (توجي) به .  
تقريباً ٻسي هزار متروان ٿ رويني بحري بلند تره .  
دمايينا (ارديش) و (ديادينى) دا زوزا- نكي باٿ و كافي بگل و كيايه .  
چه قدر رنديين طبيعى هنه خدى ٿى دريغ نكره به .  
برييا شري مزن دا چاوان بو؟ ايروچاوانه ؟

پيشييا شري مزندا (توجي) جي گشت

به وه وه خه رييڪه له بيدار پيشدا هه ره به وه وه خه رييڪه . . . . .

چونكي ٽهم کوڦاره هي به كييڪه بيچووي گه وره ترين وپايه دار تر بيني خانه داني كورده؛  
خانه دانك نه وه ونه ته وه يان بويي گه ياندنو تي گه ياندني كورده رييڪه بون . . . . .

ٽوه هاوار! . . . ٽه زانم له كوي وه دى يتو له قورگي كى دى يته دهره وه ! . . . ٽه گه رله شيش له شويني خوي نه تواني بچوولي ، به خوا گياني هه موو كورد په وه ريڪه : له سه روخواري كورد ستانه وه د فريته لات ، ٽه وده نكه بي هيزهت به هيزده كا . . . ده بي ٽه وده نكه راستهت به گوي روزه لاتو روزه ٽاوادا بچي ! . . دلي مردوود زيندو دوى راست په رستي پي راچه ني ! . . ٽبتي زامى چه ندسه دساله ي كوردي به سه زمانيان تي گه پيني .

ساكر فناع

وسيرانا كچ و خورتين د حيدر ان ، آدمان ، جلايلان بو .  
جي رندان ، بدوان و دلالان بر . ل هر آليكي كون و خيوت لمي هف دريٿ دبون .  
كربي مي صورتو چاقرش لناف گل و كياندان دنادبون .  
ملكي شهبنا هسپان ، مللي كالناميان ٿ كومى سواران ٿرفي بيريقانان و چيابين دلال ٿ بندار دبون .  
عادتا دهر آليكي دا وگ جو بيارين آڻي كن وشاهي دهر كين .  
ايروچاوانه ؟ ايواه . . . . . او چيابين دلال و دلر با ، او زوزانين جنت آسا ايرو جي هرچ و گرانه .  
جيي كپر كو و روڦيانه . نه هسپه ، نه سوار ؛ نه پزه ، نه شقان ، نه پيري به ، نه بيريقان . . .  
گلو چه لوان قومي وچه بوان هات ؟ بار كرن بچيكي ٽه چون يان شرڪي مزن لوان قومي وحي تلف بون .

بلي دپيشييا شري مزن داتو کو ٿبو ٽڪرنا ريبا توراني دخبتين .  
دخوهستن تر كين آنا طولى دگل تر كين توراني متصل بين .  
دمايينا وان دا ت حائل مه منين .  
اوڙي ب محو كرنا كردان واستيلا كرنا آزر باچاني دهات وجودى .  
فقط تطبيقا تي فڪر ملعونانه ٿوانرا ممڪن نه بو .  
وقتي كوشري مزن دست پي كر وخورا فرصت غنيمت زانين دست بگشتنا فله و تهجيرا كردان كرن .  
فله لپيش چاڦين وان كشتن ، پشتي وي دست بدرينختنا وان كرن .  
اوى ل توجي ، سيدنك ، شرفدينى لسر آڦين سارلسر كڦي بن برفي لناف گل و گياندان بشير وشكر مزن بوئي تور كان مال و منالى وان ٿ دستين وان كرنن طازي و برچي ٿ

# هاوار

## کوقارا کردی

# هاوار

کورد ریک ته که وی ؟

هاوار ! ... کوایاچه

ناویک له مه جوانتر بو  
روژ نامه یه کی ئیمروی

هاوار : له چاری هه موو کوردیکاده  
خویندر یته وه ؛ هه تا کو دارو به ردی وولاته که  
شمان ده قییزینی . هاوار ! .. هاوار ! ...

هاوار : دو که لیکه رهشی ئاهونا له ی لی  
قه و ماوانی کورد له ده روونی سالحی یه وه دبته  
ده ره وه ...

هاوار : ئاوازیکی توندو کار بیگه ره له کومه له  
گوری مردووانی ئه ییو بی و به درخانی یه وه  
دبته ده ری ...

هاوار : ناله یه که له شوینیک دبته ده ره وه  
ناوه راستی روژ هه لاتو روژ ئاوا یه ، شوینی  
دواروژی عالم به لام چی شینی ئیستای کورد ...

هاوار : نه مامیکه به ده ستیکی زانا له زه ی  
یه کی به پیتا نیژراوه ؛ به لام بوئه مه ی به رو بووم  
بدا ده بی چاودیری بکری تاگه وره ده بی ...  
انجا به هه موو هیزی خوومه وه ده قییزینم :  
هاوار دینمه به ره و که سانه ی دوو پوو لیکیان له

گیرفاندایه ، که رتیکی بوژیانی ئهم کوقاره دابین .  
هاوار دینمه به ره و بوژی و نووسه رانه مان ،  
بوئه وزانا وتیکه ییشتووانه مان ، که یه رده ی  
زه مانه له گوشه ی په نهانی داشار دوونی یه ده :  
خویان دهرخن ، قه له م بجه نه کار ، به نووسین توژی  
یارمه تی ئهم روژ نامه نه ونه مامه بدن ...

هاوار دینمه به ره وانه ی که یارمه تی پودلو  
نوو سیدینیان پی نا کری ، بکوشن ئهم کوقاره به  
ناوگه وره و بچوو کی کورداندا بلاویکه نه وه ...  
هاوار دینمه به ره واتی که هه ره ییچیان لی  
نا کری ، هه ول بدن ئهم ( کومه له ) یان  
ده ست که وی بخونینه وه ، یاخود به خه تکی  
بخونینه وه تاله خویان وله خه لک بگن ! ..

چونکی ئهم کوقاره هه رپبته ی ( قسه یه ی ) به  
ده ستی به کیکی زاناو تی گه ییشتوو نووسراوه  
ته وه ؛ هه ر قسه یه ی له دلیک هاتوته ده ره وه ،  
یه ناسکی وه ک په ره ی گول ، یه قایمی ( بوپاراستی  
خوشه ویستی کورد ) وه ک سنوه قی پولاو هه یه  
هه ربیره ی له میشکی یه کیک هاتوته ده ره وه ،  
کورد و کوردستان وه ک هه یکه لیکه گه ره  
وبلبنده هه میشه له پیش چاویایه ، له خه ودا

# کتبخانا هاواری

هژمار  
۱

ریزاننا الفابی با کردی

غروش سوڤی

۱۲۶۵۰

ب چرمی خملاندی

۱۰

ب چرمی عادتی

ژبونا درفه دڤیت حتی پوستی ب سر یدت خستن

زنگراف ومطبعة

ایوب بیخانا

حفر جسیم المعادن والصور الملونة واللوحات الخارصية  
طبع بطانات دار ریسات بحرف فائز علی الاراض الحریب

ملك الظاهر

دمشق

عرنوس

دمش

الطبيب

احمد نافذ

اختصاصی بالاراض الداخليه والرهزیه والأطفال

الافتصاصی بالجرارة وامراضه العيون وجرارة

صالحیه

دمش

## اشتراکات مجموعه هاوار

وفي غير هذه الأقطار	في سورية وتونسية والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس
عن سنة واحدة ١٥٠ فرنك	عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوڤی - ١٠٠ فرنك
عن ستة شهور ٩٠ فرنك	عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوڤی - ٦٠ فرنك
عن اربعة شهور ٦٠ فرنك	عن اربعة شهور ٢٠٠ غروش سوڤی - ٤٠ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجریده : دمشق - حارة الأكراد

# هاوار

کوڅارا کردي

تېلده خستيين كوڅاري

شا کر فتاح	هاوار
نمري مکسي	زوزاني توجي
چيرو کيڅ	مارومروف
د کتورک ۰ ۶ ۰ بدرخان	ژمن باوربيه
هر کول آزيان	ملایي جزري
چيرو کيڅ	ديک وروفي
قدری جان	هيفا چارده شفي
هر کول آزيان	فرهنگوک
ج ۰ ۶ ۰ بدرخان	الفابيا کردي
جگرخوين	ژبونا هاواري
ملا علي	گلبنانکي هشاري بي
قدری جان	برديک
بوزان شاهين	هاواره
فائق بيکسن	کرده واري
سترانقان	سي مالو گندو



## Qoyara Qurdî \* Revue Kurde

## Têdewîstîyên Qoyarê

Qurdmanç Kene in  
Cemilê Haco  
Le Hawarda  
Edebiyati Qurdî  
Mêrê min  
Cewabname  
Zarê Qurdmançî  
Mişo û Xido  
Elfabêya Qurdî  
Ferhengoj

Cemilê Haco  
C.A. Bedir-Xan  
Serjêr  
Hevindê Sori  
Dr.Q. A. Bedir-Xan  
Helim Rifki  
Hawar  
Hereqol Azizan  
C. A. Bedir-Xan  
Hereqol Azizan

Birin  
Ey Feer  
Hesinger  
Delalê Eysê

Dr.Q.A. Bedir-Xan  
Lawiqê Qurd  
Kedrican  
Stranvan

## Dîrê Frensîzî

O Belle Aiche  
Fables  
Memê-Alan  
L'Alphabet Kurde

Hereqol Azizan  
Hereqol Azizan  
C. A. Bedir-Khan  
« « « «

# QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

1

## Rêzana Elfabêya Qurdî

Note sur l'alphabet Kurde

Bi çermê xemilandi 12,50 K. S.

Bi çermê adeti 10 K. S.

Ji bona derve divêt hekê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Hafiz*

**SPECIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES**

Damas

Armonie

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

Damas

Salki

## PHOTOGRAVURE

### Eyoubiye Frères

*Inscription sur tous les métaux. Gravure coloriée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.*

Damas

Malé : Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûs-sûrî — 100 frenq

ŞesmeHQî 300 kirûs-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûs-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

ŞesmeHQî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Şam : Taxa Qurdan

## Qoyara Qurdî \* Revue Kurde

## Qurdmane Kene in Lê Nezan in

Qurd Kene in û xwîna wan hemî namûs, rûmet û cisarete. Ji lewra wilo radibin hevdu diqujin û malên hev dixun.

Yeq ji wan serê xwe ji êdin re natewîne. Ji ber qo çavê xwe di vî îşî de veqirin e. Çi xortê qo nû radibe, çavê xwe li kençiyê digerinê her dibîne mêrê Kene û meshûr qo xelq pesnê wî didê ew e qo mêran diquje û talanan ditîne û serê xwe ji herberê xwe re natewîne.

Ew xort ji radibe dest bi quştin, talan û herberiyê diqe û xebateqe zor dixebite çima qo jê re pesn e. Heçî mêrê qurd e qo qete îşqî her dixwaze qo li pêşîya hevalan be. Pir caran ji em dibînin qo yeqî qurd bi çend hevalan re — qo ne ji meletê wî — diqewe îşqî, ger xwendin be, mêranî be, ger hemalî be, ewê qurd li pêşîya hevalên xwe hemîyan e. Çima tebiet û cisaretê wî kebûl naqe qo qes li pêşîya wî bibe.

Heqe mîletê qurd ji mîna van mîletên din qo irû pêsde çûne, zana bûne dê dîsan li pêşîya hevalan hemîyan bûna û di nav mîletan de meshûr bibûna. Lê piçqî şûnda mane.

Dermanê zana bûnê ji ev e. Heçî qo qurd e û dibêje ez çêliyê qurdan im divê artîqariya civata xerî biqe, her qes li gora haldê xwe, da qo civat ji biqare meufieteqê li me biqe, zarowên me bide xwendin û dibistanan bine devê deriyê me. Ma ne çêtir e qo em şêst heftê zêrên zer li yeq zaroqî bidin heta qo em li bajarqî ji van ên dîr bidine xwen-

din? Ew şêst heftê zêr ji civata xerî re bit em diqarin sed zaroqî pê bidin xwendin. Ji ber qo ewê dibistana bine devê deriyê me. Mesref li zaroqan naçe.

Tu tişt ji, mirovan zana naqe ji xwendinê pêve.

*Cemilê-Haco*

**Cemilê Haco** — Nivîsevanê benda jorin Cemilê Haco ye. Gelo Cemilê Haco qiy e. Ciwan e, pîr e, li qû di qîjan dibistanê de xwendiyê.

Herweqî di encamê de qîş bibit hêjaye qo em biqevîn pê van pîrsîyariyan û li wan vegerînin.

Cemilê Haco xorteqî bist, bist û yeq salî ye, ne qetiye tu dibistanan, û ber destê tu qesî de ne bisalan ne bi mehan ne xwendiyê, ji jizmanê xwe pêve bi tu zmanan ji nizanî.

Cemilê Haco qurdmanê pêsîn e qo xwendin û nivîsandinê bi elfabêya zmanê xwe û bê artîqariya zmananê din elimîyê.

Di sala Hezar û nehsed û sih de, ji ber qo em derbasî xetê bû bûn hiqûmetê em anî bûn Şamê û lê rûniştandî bûn.

Hingî em çendeq bûn. Cemil ji bi me re bû, tevda di taxa qurdan de, bi mîvani li mala Eli axa Zilfo cih bû bûn. Sev û rûj nav hev de rûdiniştin.

Ez bi elfabê û zmanazîna qurdî mijûl dibûm. Min ji her qesî tişteq dipîrî û herqesî ji mijûlalîya xwe re bendewar diqir.

Cemil ji herqesî bêtir bendewarî nîşan diqir, kene berdiqet û tedigehîşt.

## Mêrê min di serî de ye!

Di welatî de şerqî xurt, serxwe-  
rabûneqe mezin çêdibû. Mîr û axa, eştr  
û gundî, jin û qeç hemî dixebitîn.

Ji ser çiyayên bilind, ji zozanên  
çeleng dengê serî û stranên welatî dihatin.

Can û dil, lêv û dev şa dibûn  
Gotin distirand.

\* \* \*

Di pala çiyayê Hereqolê de, di  
gundeqî ava û xweşiç de, xelqê gund  
direkisîn.

Cemil yeqar nexwenda bû.  
Hêj Kelem ne qirî bû destê awe. Çavên  
wî hîn li ser tu xêzên herfan ne geri-  
ha bûn.

Ev, ji bona min ji derbeqe kenc  
bû. Ji qurdmanceqî nexwenda re elfa-  
bêya xwe hîn qirin.

Hingî, di destê me de tişteqî çap  
qirî nîn bû, bivê nevē, Cemil elfabêya  
qurdî bi destinivîsê hîn dibû. Min her  
rûj jêre çend herf nîşan diqirin û bi  
wan re pirsîn çêdiqirin.

Cemil di nav hefteqê de elfabêya  
qurdî xelas qirî bû. Êdin bi elfabêya zma-  
nê xwe diqari bû her tişt binivîsîne û  
destnivîsên rind bixwîne.

Ev e Cemilê Haco û benda wî a  
pêşin « Qurd Kenc in lê nezan in »

Divêt qo Cemilê Haco, ji bona  
xortên qurdan nimûne bibit. Heçî xortên  
qurd hene qo hej welat û milletê xwe  
diqin û dixwazin xidmeta wan biqin bila  
Cemil bînin pêş çavên xwe û weq wî  
bixebitîn û ji xwe re û ji milletê xwe re  
bifêde bibin.

Di hekê benda wî de çî bibêjim,  
çawan pesna wî bidim ez jî nizanîm. Hew-  
kas bibêjim qo heta niho tuqesî sebeba  
brberîyê û nifaka qurdan bi vî rengî û bi  
vê zelalîyê ne dîtiye, ne ji nîşan qiriye.

Her bijî Cemilol! Xwedê te ji mal  
û milletê te re bihilî.

*Celadet Ali Bedir Xan*

Rûj, hêdî, hêdî di gencîneya  
ronabîya xwe de vedimirî.

Di ser serê çiyayê Hereqolê de  
roj weq efsereqe zêr dibirikî.

Hereqol xêw û şah e, roj tacê wê.

\* \* \*

Ewr di nav rengên sor û heşin,  
al û qesq dibezin û diqevînim himêzên hev.

Işev şeva daweta Zîn û Zend e.

Zîn û Zend îrû deh sal in bi  
zencîra hevîne bi hev re giredayî ne.

Sibe Zênd ê here daweta welatî,  
daweta mîr û camêran, egîdên qurdan.

\* \* \*

Roj vemiriye. Pûşîyeqe reş qet li  
ser çiyayê Hereqolê û berfê gevr. Ba nîne.

Rêl bêdeng e radize. Hêv di na-  
vbeyna ewran de, bi rûyê xwe ê zivîn  
diqene.

Di pala çiyayê Hereqolê de, di  
gundeqî ava û xweşiç de du dil hextiyar in.

\* \* \*

Sibe Zû saet Şeş e. Blûr û zirne  
bi çil xortên qurd dimeşin. Zend di nav  
wan de ye. Zend cem delala xwe, di-  
zgirtîya xwe, jina xwe tinê Şeveqê ma.

Serê wî giran e, dilê wî dişewite. Dilê  
hevîna delala xwe ye.

\* \* \*

Şev e, şeveqe tari. Baqî sar û xurt  
tê, berf û baran bi hev re diqevînim. Di nav  
zinar û rêlan de ba difîqîne. Dengê wî  
qûvî ye.

Zend tîfînga xwe dide hevalê  
xwe, bê Zîna xwe niqare, rêya xaniyê xwe  
digire. Di paş wî re, dengê tîfîngan û hêdî,  
hêdî guregurên topan vedimirin.

\* \* \*

Ezman bi stêran tijî ye. Berf û  
baran seqîname. Ba westiyaye.

Bes ji dîr ve ewreqî reş dilive.

— Li deriyê Zîne didin. Zîn ji hu-  
ndir dipirse. Dengê mîrê wê tê:

— Zîne...veqe...ez im..Zend..mêrê.. te..  
Zîn derî vedîqe, ji Zend re mêze diqe...  
bi çaveqî sar û tehl û jê re dibêje:

— Mîrê min Zend.. bi welatîyên  
xwe ve di serî de ye !!! û derî digire.

*D. Zami'an Ali Bedir Xan*

## BIRIN

—Şer bi lepê xwe—

Mêrg û Zevî xirbe ne  
Gund û kesr tirbe ne  
Bilbil mirî gul mirî  
Ne rez maye ne tirî.

\* \* \*

Ne gul û ne qulîlq man  
Ne parîz û gulistan  
Ne dengê xweş ne mekam.  
Pêve jah û intikam

\* \* \*

Çavên bûqan b'hêstir in  
Qund digirin distirên  
Ne pez mane ne şivan  
Ne blûr û blûrvan

\* \* \*

Gelî, Çiya guwah in  
Ne xulam in ne şah in  
Deşt û newal bi xwin in  
Diroqa me dixwin in.

Rêl û dehliq bûne zer  
Zevî bûq in qezizer  
Xwelî bûne xerabe  
Yezdanê me de rabe

\* \* \*

Bi camêri niqarin  
Bi bêbextî diqarin  
Em jî qer in û qor in  
Ji pira wan diborin.

\* \* \*

Ne kesr ma ne serban  
N'e mîreq ma ne siltan  
Ne saxî ma ne mirin  
Himê me jî dibirin

\* \* \*

Qen vemirî girin ma  
Derman çû û birin ma  
Qeçiq çû û qezî ma  
û aheqe rizî ma

\* \* \*

Gulistan bû qevristan  
Ber çavên min Qurdistan

Ariqarê me nine  
Hêvî ! çiraqê bine !!!  
\* \* \*

Çavê Binefsê leşin e  
Sosin jî qet bişin e  
Ne giya ma ne rêhan  
Li parîzê Qurdistan

\* \* \*

Ne ma lê lê ne lo lo  
Kiriq, qund, gur û eylo  
Diqenin xudan saz in  
Qezeba me dixwazin

\* \* \*

Mêrg û Zevî xirbe ne  
Gund û Kesr tirbene  
Bilbil mirî gul mirî  
Ne rez maye ne tirî

\* \* \*

Hawar çû û hêstir ma  
Nijdi mir û hêstir ma  
Mamiq qur û dirêj et  
(Şer b'lepê xwe) dibêje..

*D. Zamiran A. Belir-Kan*

## EDEBIYATI QURDÎ

—2—

Ewaneqe qem u zor malûmatê-  
qyan heye le edebiyati zimanani ewrupa  
dezanin qe le zemanî qonewe, hetaqû  
êstaqe leser sê paye serqewtiwe we ês-  
taqes edebiyati ewrupa debête sê çesnewe.  
Ewiş: edebiyati gorani, edebiyati çiroqî  
edebiyati qomidi [ temsili ]

Edebiyati ewrupa we hetaybeti, edebiyati  
yonani qon le payey yeqemini derqe-  
wtini hemû ibaret bû le gorani, we lew  
deme yonaniyeqan fiqr u mîşqi xoyan  
be « Helbest » rêq dexist we destyan deqi-  
rde bêjini ew helbeste be gorani. Ew  
şitane qe le dilyan deculayewe hemûyan  
rêqdexist be helbesti gorani, qe degeran  
le naw şaxu dolani yonaniyan, yan qe  
dadeniştin le ser roxi behri [ ice ] den-  
giyan heldebri we destyan deqirde gorani  
bêjin, heta ewendey pêneqû ehwalyan

gorra, we destyan qirde medih qirdin u  
helbest heldan le ser piyawani gewre,  
karemanan, we palewanani xoyan, hendê  
car ew helbestaneyan drêj deqirdewe we  
her be medih qirdiniş nedeman, beşqu  
destyan deqirde rêqixistini jiyani ew piya-  
wane: le dayiq bûnyan gewrebûnyan;  
xu we rewîştian, mirdinyan be helbestêqi  
dûrudrêj, we be şewkêqi germewe des-  
tyan deqirde bêjin u gotini ew helbestane.  
Be qurti? yonaniyeqani qon helbesti  
çiroqiyan dadena, yanî edebiyatyan le  
payey goraniye we serqewte payey  
[ çiroqi ].

Inca engawêqi drêj edebiyat le  
payey çiroqi mayewe, heta nexte nexte  
serqewt u geştiye payey Qomidi, inca  
her lew demewbû qe edebiyati Qomidi  
le... ewrupa peyda bû we bilaw bwewe.

Eme payeqani serqewtini edebi-  
yati wiltani rojawa ye. We eme payeqani  
serqewtini edebiyati gelani ariye. Aya le  
wiltani Qurdistan ru wergêrine duwawe

we binorin le tarixi edebiyati, em payane debinin yan na ? ?...

Madam edebiyati qurdî, edebiyatêqî ariye, debê wequ edebiyati zimani rojawa wabêt, we debê beser ew payaneda ser qewtibêt.

Belê; edebiyati qurdî le zemani qoni pêşûda goranî bûwe, we qurdanî zemani pêşû fikru mêşqî xoyan, awatî dilyan, hemû be helbest rêqxistiwe, we destyan qirdiwete bêjin u gotinî ew helbestane be goranî.

Qurdanî pêşû—her wequ beşeq le qurdanî imroşawati dili xoyan be helbest danawe, we ew helbestaneyan be goranî gotuwe, le damenî çiyayan, yan, leser rûbaran, yan leser qanî u serçaweqan be dilwêr, yan be şimşal ew helbestaneyan gotuwe.

Inca nexte nexte eme serqewtuwe, we hezyan neqirdiwe ehwalî palewanan-yan çiroqî ciwan u şirin u kincyan tenya be helbestêqî goranî bibêjin, we her bewe bimênêtewe. Beşqu destyan qirdiwete rêqxistinî ew şitane, ehwalî ew piyawe bilindane be çend helbestêqî çiroqîyê dîrudrêj we destyan qirdiwete bêjinî we xwêndinewey le beynî xoyanda.

Her bew ceşne edebiyati qurdî le payey goraniyewe serqewt bo payey çiroqî, we qurdeqan destyan qirde dananî helbestî çiroqî, yan reqxistinî çiroqî xoyan be şiqî Helbest.

Inca çunqe edebiyati Qomîdî bestrawe be kewme bilinde mutemeddineqane we, we zor pêwisti medeniyyete, we çunqe hêsta hetaqu êstaqe be tewawe tî pruşqey hetawî medeniyyet wilatî qurdistanî rûnaq neqirdiwetewe, we şaran u dehati qurdistan be bergî ciwanî medeniyyet nerazawatewe, leber ewe edebiyati qomîdî le qurdistanda derneqewtuwe, we edebiyati qurdî hêsta negeyîstiwete payey sêyem.(tewaw ne bûwe)

*Hevîndê Sorî*

## Hesinger

Hesinqereq şev û rûj, dixebitî jî dil can  
Xebata wî zincîreq, qo nakete tu caran  
Her careqê qo çaqûc, lêdixist dilxewes

[ dibû

Imîda wî kewitir, hêviya wî geş dibû  
Çend rûj holê peşveçûn, min jî bala xwe

[ dida

Zincîr hê ew zincîr bû, dîsa weqe xwe

[ dima

\*\*\*

Bi wî çaqoçê biçûq, ew zincîra kerase  
Ma tucar tê şiqandin, gelo qî pê hesas e  
Çûme ez niq hesinger, min jê qire pirsîyar  
Li ber pirsîyara min, qarê xwe qir hebeq

[ sar

\*\*\*

— Lo ! mamê min î delal, qerema xwe

[ erzan qe

Dilopeq jî derdê xwe, jî min re jî nûş'canqe  
Herçend bala xwe didim, ev çaqûc û ev

[ zincîr,

Tinê bûye derd û qul, tişteqî din naqev

[ bir !

Heta qengê ? tê wisan, bi tekîn û rekîn qe  
Xêrgunehê vê tokê, jî bende re telkîn qe.

\*\*\*

— Wey ser çavan tu hati, lo lawiqê zemani

Ji xwe ez bûm çavnihêr, te bi xwe qir

[ xuyanî

Hêj hetanî vê dmê, tuqes nehat bi merak  
Ne gotin gelo ciye, ev tekîn û ev terak

Guhdar bibe qurêmin, tu hêjayî xuya ye  
Sirê jî te vesêrim, ew jî bo min ceza ye

Berî ya min ferztire, gotina bav û qalan  
Geleq li cî gotine, rehmet liwan bi baran

Wan gotine «yê bêsebr, tim tihin û tim

[ bê av

Hûriq hûriq bi derzyê, kulteyn dibin

[ sardelav »

Ev xebat û cehda min gotina bavanî ye

Ger îrû neqe serî, bo sibê hêsanî ye.

# FERHENGOG

( Deng )

Vê paşiyê û gora melicetê, ji pirsê deng me çend pirs hevedudanîne. Bi hênceta pirsê ( dengî ) qo di elfahêya qurdi de derbas dibe, em dixwazin van pirsên nû û hevedudanî raveqin û ji xwendevanan re bidin zanîn.

Dengî: bi deng re giredayî, pê bendewar Dengîni : tevayî û halê «dengî», herf carqê bi şiqlên xwe, carqê bi dengîniya xwe tene seh qirin.

Dengayî: Pîşeya dangan, pê tevayîya dengên zmaneqî tete seh û nişan qirin.

( Guwah )

Ewê qo tîstêq dit an bihiştîye, û piştê awayê çebûna wî gora ditin an bihistina xwe dide zanîn.

( Pêşqî )

Her tîstê qo ji pêşiyê ye. Dengê pêşqî : ew dengê qo ji pêşiya dev derdiqeve.

( Paşqî )

Her tîstê qo ji paşiyê ye. Dengê paşqî : ew dengê qo ji paşiya dev derdiqeve.

( Cihderq )

Cihê derqelinê. Qaniya tîstêqî. Cihderqa (b) lêv in, yanî dengê herfa (b) ji lêvan derdiqeve.

( Raveqirin )

Ji rayî veqirin, pê çavan xistin û dan zanîn ; izah qirin.

*Hercqol Azizan*

Bê imîdî ne kenc e, tu destê xwe vemale  
Ne ez zêde xwêh bidim, ne tu lo min

[ binal e

Yeqdest em bi repinqin, heval dibe zilcelal  
Bira toka diliyê, bibe polayê zelal  
Em vê toka lanetê, ji serê xwe bidêrxin  
Hîngî bira bibînin, ya em gurin ya berx in

*Kedrican*

# Mîso û Xido

Du dengbêjên destê Siûcê, Mîso Beqebûr û Xidoyê Hindawî hati hûn ziyaretê Hawarê. Her du jî berazî, Mîso pişî, Xido elaedîni.

Mîso peyaqî bejnqurt û stûr , Xido bejnnavin û zravîq e. Emrê Mîso di dora pênçihî, yê Xido di dora sih û pênçan de ye.

Ji me re Memê—Alan strandin, Xido bû Mem û Mîso Zîn.

Xido : Mem li ser hespê xwe, li ser qaniyê seqîniye, davêje ser Zînê :

Ez Mem im, tu Zîn î

Ez qurê mîrê Mexribîyan im

Tu qeça Mîr Zengin î

Ez xwedanê 1500 xortên qurdan im

Tu xwedîya 40 cariyên qember zêrin,

Bi xelxalên zivîn î.

Mîso, ji Zînê ve lê veqerand :

Lo lo! Memo bejnzravo li fena tayê rêhanê  
Pêda tine tûq û qelemo !

Ji dilê min re şifa û hem merhemo  
Xeyala dilê min bi qul, bi elemo !

Mîso çend beyt ji şibreqe xwe jî gotin:

Em biçûq bûn, pir nezan bûn

Qo mezin bûn, cangiran bûn

Li pêş cavên me dûman bûn

Ev sîçên bav û qalan bûn

Em ne dane ber xwendinê

Da bibînin rengê dinê

Irû jî hat rûja mirinê

Mîso dit qo ji beytên wî re qêfa min  
hat, çendeqên din jî gotin:

Rojeq hilat li me zer bû

Hêla xwedê li ser me bû

Hercend rabû xweş xeber bû

Paşê ne ma diçû ava

Hêv û stêriq li nêv nava

Em jî hemî tevda biçin

## ELfabêya Qurdî

7

Belê me goti bû qo (ق) dengeqî paşqî ye. Herçend ev deng, rast birast di zmanen arî de nîn be jî, di navbera (q) û (k) de qem û zêde ferkeq heye, û di wan zmanan de jî herfa (k) di eslê xwe de, gora dengê herfa (q) dengeqî paşqî nişan diqe.

Zmanên latîni ên îrû vî dengî pericar bi herfa (c) nişan diqin. Ji ber qo ev du herfên ha, di zmanê eslî de, berî hatina pê, zmanên latîni ên îrû bi hev guhêrine.

Di zmanê latîni ê qevn de (k) bi tinê di pirsên (Kaeso) û (Kalendae) qari bû xwe bilîne, di ên mayîn de (c) yeq qetiye şûna wê qo xelqê Romayê ew mîna (K) yeq bi lêv diqirin û dixwendin. Herweqî di pirsên (cable, café, corbeille, corbe, cristal) de, qo bi (c) qê tene nivisandin, û ev (c) gora dengê (qu) yê dengeqî paşqî dide. Lê belê di zmanê elmanî de qo ev (K) yên ha bi (c) ne guhêrine ev pirsên ha bi (K) tene nivisandin: (Kable, Korb, Kaffe, Koffer, Kristal)

Nibo divêt em hiniqî bi behayê (K) ya qurdî ê dengî mijûl bibin. Ji

Çi şîretên qu: û bivan  
Bibinin bejn û balavê  
Bi ruhna ya her du çavan.

Di dema rabûnê de, Mişo Hawarê di destê xwe de gerand, dil qir qo li me jî xweş biqit. Ev e diyarya wî:

Va îşa vaye vanî  
Dêrgul bi mêrg û qanî  
Sê mêran kelem anî  
Her sê jî Bedir-Xanî

Dengbêjên me piştên xwe dan feleqê, berên xwe dan oxurê, xatir xwestin û çûn. Oxura wan li xerê bit.

*Hereqol Axizan*

bona wê jî ezê (K) ya qurdî deynim ber (c) ya frensizî û (ج) a erebî.

Dê em pirseqe frensizî bibin: (cri) dengê (c) ya wê geleq nizingî (k) ya me ye, û di navbera wê (c) yê û (k) ya pirsê (kir) hema tu ferke nine û mana wan jî yeq e, (cri) di fransezîyê de (kir)e.

Weqî niho, mirov diqare pirsê qurdmanî (Kren) bi elfabêya frensizî weq (crèn) biaivisine.

Li ser berhevdanîna dengê van herfan min çend tecrîbe çêqirine qo di zanîna wan de hin fêde hene.

Herweqî:

1 — Min jî hin xortên qurd re — qo ew hinî elfabêya qurdî qiri bûn — pirsê (cristal) da nivisandin. Tevda li xwe qerîyan û paşê bi hev re, herweqî di elmanîyê de tete univisandin di şîqlê (Kristal) de nivisandin.

2 — Min ev pirs jî hin xortên qurd re da nivisandin qo herfên erebî nas diqirin bê li erebî nizanî bûn. Bi (ق) qê û di şîqlê (قريشال) de nivisandin.

3 — Min ev pirs jî qurdeqî re da nivisandin qo bi erebî dizanî bû û bi salan di medreseyan de xwendî bû, melayê min berî qo binivisîne, hiniqî seqinî, pirs çend caran bi lêv qir, di guhê xwe re qir û jî min re got:

4 — Gora bilêvqirîna qurdeqî nezan qo bi erebî nizane divêt (قريشال) bête nivisandin. Lê qo bi erebî hate xwendin dengeqî paşqî dê bidit qo jî hundirê Kirîqê têt û qurdmanceqî nêzan niqare derêxine û weqe xwe bi lêv biqe. Ji lewra bi imlaqe erebî a fesih divêt (كريشال) bête nivisandin.

— Min ev pirs jî erebeqî re da nivisandin. Ket li xwe negerîya û tavil di şîqlê (كريشال) de nivisand.

Nisbeta (k) di zmanê qurdî de  $\frac{150}{33798}$  û ya (q)  $\frac{1056}{33798}$  e. Yanî di zmanê me de (q) jî (k) bêtir e, û nivisandîna (q) jî ya (k) yê hêsantir, siviqtir e, û (q) jî (k) zûtir tete nivisandin.

(dûmabiq heye)

*Cela det Ali Bedir - Xan*



Textes et Traductions :

*Delalê Eysê*

— 1 —

Delalê Eysê, Delalê Eysê!  
Çiya bilind in, ez te nabînim  
Destê xwe ser sînga te bigerinim  
Lî dinyayê weqa te ez nabînim.

— 2 —

Delalê Eysê, Delalê Eysê!  
Ezê tenbûrçê çêqim, ji garde perdan  
Ezê tîlan baxim ê, ji qul û derdan  
Jinê delal, ji mîrê xerab  
Têtine quştin, nayîne berdan.

— 3 —

Delalê Eysê, Delalê Eysê!  
Ezê tenbûrçê çêqim, ji hestûwên maran  
Ezê tîlan baxim ê, ji bisqê yaran  
Ezê devî deymîn, bin guh, guharan.

— 4 —

Delalê Eysê, Delalê Eysê!  
Ezê tenbûrçê çêqim, ji hestûwên çûqan  
Ezê tîlan baxim ê, ji qeziyên bûqan  
Na, ez nazewicim dosta min piçûq e.

— 5 —

Delalê Eysê, li men û li wî dilî  
O li wî dilî  
Bejna te qulilqan, nû xemilî  
Dê û bavê te ser min û ser te  
Çûne gilî.  
Leyla li min î, Leyla li min î  
Terqa te naqim heta xirêna mirinê  
Ez tîr bûme edî, ji wê gotinê.

## TRADUCTION

*O Belle Aïche*

— 1 —

O Belle Aïche O Belle Aïche!  
Les montagnes sont hautes, je ne te vois pas  
Pour que je promène ma main sur ta poitrine  
Dans le monde je ne vois pas d'émule à toi

— 2 —

O belle Aïche, O belle Aïche  
Je ferai une guitar à quatorze diapazon  
Je lui donnerai pour cordes, de souffances  
[ et de douleurs  
Les jolies femmes de la part des hommes mé-  
[ chants  
Ne peuvent pas être abandonnées mais tuées.

— 3 —

O belle Aïche, O belle Aïche  
Je ferai une guitar des os de serpents  
Je lui donnerai pour cordes les méches des  
[ bien-aimées  
Que la bouche effleur, sous l'oreil et sous les  
[ boucles.

— 4 —

O belle Aïche. O belle Aïche  
Je ferai une guitar des os des oiseaux  
Je lui donnerai pour cordes les tresses des  
[ jeunes mariées  
Non, je ne me marie pas, ma bien aimée  
[ est petite,

— 5 —

O belle Aïche! malheur à moi, malheur  
[ à ce cœur là,  
O à ce cœur la.  
Ta taille est récemment ornée de fleurs  
Ton père et ta mère, contre moi et contre toi  
Sont allés se plaindre  
Tu es ma Leyla, tu es ma Leyla  
Jene te quitterai pas jusqu'à la râle de la mort.  
J'en ai assez de ces jaseries.

\*\*\*

Dans les deux derniers vers de la  
deuxième strophe il est dit: « Les jolies femmes  
de la part des hommes méchants, ne peuvent  
pas être abandonnées mais tuées ».

Ceci est dû au fait que chez les Kurdes  
musulmans, chrétiens ou eyzedis le divorce  
quoique admis par les uns il n'est généralem-  
ent pas pratiqué par les Kurdes parce qu'il  
est contraire à leur tradition nationale. C'est  
pour cette raison qu'ils ne divorcent jamais  
leurs femmes, mais les tuent dans des cas  
d'honneur. Le mari assassin est d'habitude  
protégé par tout le monde, même par ses  
ennemis de sang.

Leyla, c'est un des noms symboliques des femmes aimées qu'on emploie souvent dans toutes les poésies orientales.

*Fables:*

### L'HOMME EST LE SERPENT

Un homme sur sa route rencontra un serpent. Le serpent était sous une grande pierre. Il ne pouvait ni sortir, ni bouger.

L'homme eut pitié de lui, et s'avança vers la pierre, leva la pierre et le sauva.

Le serpent se secoua, se dressa sur son ventre et se précipita sur lui. Il a voulu le piquer. L'homme a dit :

— O serpent, je t'en prie, comment ça se fait ? Je t'ai sauvé de la mort, tu veux me tuer,

Le serpent a répondu :

— Ne sommes nous pas de longue date des ennemis, je te piquerai.

Tous les arguments de l'homme n'influença point le serpent. A la fin l'homme lui dit :

— Neanmoins allons demander à quelqu'un de raisonnable.

Sur l'aquiescement du serpent ils se mirent en route. Après une petite course rencontrèrent un renard. Ils lui racontèrent le fait et les propos échangés entre eux. Le renard regarda l'homme et sourit, puis leur a dit :

— Il faut que je me rende sur les lieux pour prendre une décision.

Et sur ce fait ils se rendirent sur les lieux. Le renard dit à l'homme :

— Lève la pierre.

L'homme la leva. Le renard dit alors au serpent :

— Toi, mets toi sous la pierre

Le serpent rentra sous la pierre et l'homme laissa tomber la pierre sur.

Peu après voyant que le renard ne disait rien, le serpent dit :

— O renard ! où est-ce ta décision, je me suis écrasé sous la pierre.

L'homme faisait mine de partir. Le serpent s'interposa devant l'homme et lui dit :

— Une autre fois ne touche plus à cette pierre.

### LE COQ ET LE RENARD

Dans un village en ruine, un coq était perché sur le mur d'une maison et chantait. Un renard qui passait, se rapprocha du mur et s'adressa au coq et lui dit :

— O frère coq ? que fais-tu ici ?

Le coq répondit :

— O renard ! ne vois-tu pas que notre village est en ruine, et moi par mes chants je tache de rassembler quelques villageois et laboureurs pour restaurer notre village.

— Puisqu'il est ainsi, ne sais-tu pas que je suis un bon laboureur, allons montre moi une place pour que je puisse construire une cabane et commencer à travailler.

Le coq ayant consenti se mit en route. Le renard le poursuivait, pour voir le ( qefxwê ) du village et choisir un terrain pour le renard. Le coq n'était pas descendu du mur et faisait route en les escaladant.

Lorsqu'ils arrivèrent à une maison en ruine, le coq se baissa et appela le ( qefxwê ).

Ton ( qefwê ) était un levrier gigantesque. Le renard voyant le levrier prit la fuite, le levrier se jeta à sa poursuite jusqu'à son terrier.

Le lendemain, le renard repassa. Le coq ne l'ayant pas reconnu lui raconta de nouveau l'histoire de la restauration du village. Le renard lui a sourit et dit :

— O coq au cœur noir, tant que tu serais le ( qizîr ) et le levrier le ( qefxwê ), votre village en ruine ne sera jamais plus restauré.

\*  
\*  
\*

Nous avons fait une traduction littérale de ces fables à fin de conserver, tel quel, le style de la narration Kurde, et c'est pour quoi nous avons admis quelques expressions et tournure de phrases qui ne sont pas familières à la langue française et qui ne sont propres qu'à la langue Kurde.

Les mots ( qefxwê ) et ( qizîr ) gardés tel quel dans la traduction signifient successivement préposé et pourvoyeur du village.

Nos lecteurs trouveront les textes Kurdes de ces fables à la quatrième page de notre revue Hawar, No 5, sous les titres de ( Mar û mirov ) et ( Dîq û rovi ).

*Hereqel Azizan*

Notices sur la littérature  
mœurs et coutumes Kurdes

7

## MEMÊ-ALAN

Quar d Mêm eut atteint sa quatorzième année son père lui céda le trône des (Alan)

Le plais des Alan était construit dans la mer sur ( 360 ) colonnes de marbre.

Après du palais les pêcheurs du pays jetaient leurs filets. Un jour le bruit courut dans le pays que les filets des pêcheurs étaient tellement lourds qu'on ne pouvait plus les tirer.

Tout le monde vint pour prêter secours, mais les filets ne bougeaient pas. On informa ( Mem ) de l'évènement. Il se précipita pour secourir les gens. Les (1500) gardes prêtèrent main forte, mais tout effort resta vain. [ Mem ] fit appeler son grand père materiel qui ne tarda pas à venir avec sa nombreuse suite de disciples et adeptes munis de leurs trompes magiques et leur drapeau sacré.

( Neriman ) fit savoir à son petit fils, le jeune roi qu'il s'agissait du dragon des mers, monstre puissant dont les livres des savants parlaient et son apparition sur les côtes du pays ( Alan ) était le signe que quelque chose d'extraordinaire se préparait dans l'astre de destinée du roi.

( Neriman ) fit signe à ses disciples que soufflèrent par leurs trompes une étrange mélodie. Les cordes tendues se relachaient peu à peu, de sorte que les pêcheurs les tiraient sans difficulté.

A un moment donné une colonne d'eau s'éleva vers le ciel et la tête du dragon apparut sur la surface de la mer. Peu après le dragon ayant forme d'un cheval, se débattait entre les filets des pêcheurs. Avec des grandes précautions on l'amena dans la cour inférieur du palais et on l'enferma dans une cellule,

## L'ALPHABET KURDE

7

C'est pour cette raison que l'on ne réussissait qu'imparfaitement à noter ce son quand on écrivait le Kurde avec des lettres arabes. Pour rendre le ( u ) du mot « sund », on le notait par un « , », et on l'écrivait سوند ; mais comme on faisait aussi usage de ce « , » pour noter un autre son long, il remplissait mal sa fonction. On a essayé d'écrire سوند mais on retrouvait les mêmes inconvénients puisqu'on devait le lire « sund ». Plus tard, les « moullabs » qui étudiaient dans les « medressés » ont essayé de tenir compte de la dureté de la voyelle « u » en remplaçant le « س » par « ص » ; ils ont donc écrit سوند. Néanmoins, malgré toute les dictées savantes, le son restait intacts dans la bouche du peuple et nous est arrivé tel qu'il était à l'origine.

Les échanges subis dans la langue par la voyelle « u » fournissent une nouvelle preuve de ce que cette voyelle n'est point un « u » bref. En effet, dans certains mots pour être remplacé par un autre, lequel n'est jamais le « u ».

Cette dispartition affecte deux formes:

1 - Remplacement par un « i »

2 - Remplacement par un « ö »

( à suivre )

baigné par les ondes de la mer et gardé par sept portes en acier munies chacune de sept cadenas. Mais personne ne pouvait s'approcher de lui.

Plusieurs écuyers et autres gens se firent tuer pour obtenir la prime promise par le roi à celui qui arriverait à dompter le monstre. ( à suivre )

Xweyi û midirê berpîrsiyar

Mir Celadet Ali Bedir-Xan

میشو و خدو

د دنگیژین دشتا سروجی ، میشو بکبور و خدو یی  
 هندای هاتون زبارتا هاواری . هر دُ ژي برازی ، میشو  
 پیژي ، خدو علاه الدینی .  
 میشو پیاکی بژ نکرت وستور ، خدو بژن ناقین و  
 زراقکه . عمری میشو دِ دورا پینجھی مای خدو د دوراسه  
 و پینجان ده یه .  
 ژمه ره مه آلان ستراندن . خدو بو مم و میشو زین .  
 خدو : مم لسره سپی خوه ملسرکانی بی سکنی به ، دا  
 فیژه سرزی بی :

ازمم مات زبني از کري ميري مغربيانم ت'  
 کچا مير زنگيني  
 از خداني هزار و پينج صد خورتن کردانم تو خوه  
 ديبيا چل جاري يي کبر زيرين ب خلاخلين ز يقيني  
 ميشو ، ژ زبني ټه لي فگراند :

لولو ! مو بژ نزا ټول فناتايي  
 ريچاني پيدا تنه توك و کلمو  
 ژ دلي من ره شفا او هم مرهمو  
 خيالادلي من ، ب کلي ، ب المو !  
 ميشو چند بيت ژ شعر که خوه ژي گوتن :

ام بچوک بون پر نزان بون  
 کومزن بون ، جانگران بون  
 ل پيش چاقين مه دومان بون  
 اټ سوچي باق و کالان بون  
 ام نه دانه برخوه ندني  
 دا بپينن رنگي دني  
 ايو ژي هات روژا مرنی .

میشو دبت کو ژ بیتین وی ره کیفامن هات . چند کین  
 دن ژي گوتن :

ای فجر

ای فجر جوان ! فجری املمان !  
 آسمان روونک که روشکه ولائمان !  
 لابه تاریکی له سه ربا غوچيامان !  
 راپه رینه له خه و روح دار و ولائمان !  
 بلن بسیه نوستن  
 بلی بسیه رستی  
 بلی بسیه په ستي  
 ایترا اتباه .  
 لا و بکي کورو .

ژ فوه نرقائان ره :

بندین خوه ند قانین . ه کو گه شتنه هاواری  
 گلاک بونه . نقد او دنسخکی ده نایینه بلاف کرن .  
 روپلین هاواری قیم نا کن . ژلورا اټ بندین ها  
 ب دوری دی یینه بلاف کرن . برقی یکی دقیت  
 کو خوه ند قانین مه ل مه مگرن ول دورین خوه  
 بسکینن . هیدی هیدی ، بر یقه چی ژی دی بلاف بین .

روژک هلات لمه زربو هیلا خدی لسرمه بو  
 هر چند رابو خوه ش خبر بو پاشی نما دچو آقا  
 هیف وستیزکل نیف ناقا ام ژي حی نقدا بچن  
 چه شیرتی کرو باقان بپینن بژن و بالاقی  
 ب رهنا یا هر دُ چاقان

د دمارا بونی ده ، میشو هاواری دِ دستی خوه ده گراند ،  
 دل کر کوله ژي خوه ش بکت . اټه دیار باوی :  
 ټا ایشا ټایه ټانی دیر گل ب میرگ و کافی  
 سی میران قلم آنی هر سی ژي بدرخانی .  
 دنگیژین مه پشتمین خوه دان فلکی ، برین خوه دان او  
 غری ، خاطر خوه ستن و چون . او غراوان ل خیری بت .

هر کول ازیران

### زاري ڪردمانجي

ڪوٽار ڪه ڪڻهه . اٺ هفت سالن ، خوني  
 بي وي ئي خدان ڦين وهمت ، ميرزا حسين حزني  
 مڪرياني ڪوٽارا خوه درواندزي ره دردخينت .  
 ميرزا حزني بري هنگي لڄاي بو . ڙخوه ره  
 چاپخانڪي ساز ڪر و بڄوه ره بر بو رواندزي .  
 زاري ڪردمانجي دوي چاپخاني ده تبتت چاپ ڪرڻ  
 لي صدحيف ومخانب ڪوزاري ڪردمانجي ڙ  
 بي خوي تي ، اٺ دسالن ، روپلين خوه ل خوه  
 ڪرتبو ونڪار بو در ڪڻهه .

د بيلست وسي تيرمه و ۱۹۳۲ و د روراشمبهي  
 ده ڙنوقه ڦيڪر يا ڙپني ودر ڪت . تيده ڪلڪ  
 نشئين قنچ وب فيده هنه . خيزين ڙيرين ڙ  
 بند ڪه وي به ڪو سرناما سر بهور ديا ( بسرهاتيا )  
 ڪورداتي هلد ڪره :

« سر بهوردي ڪڻهه ونا وداراني ڪورد له سالي هه زار  
 و دوسه دي هجري هه تا هزار وسيه سه د . له ڪوٽاره دا  
 يڪ به يڪ نه ڦ پياوه ڪڻهه ڦانه باسي نه ڪه ين وه ده ي خه  
 ينه به زچاوي خوبندواره خوشه ويسته ڪاني زاري ڪردمانجي .  
 وه نه ڦانه به ڪتبپيش نقديم يان نه ڪري ، له عصري  
 سيزده مينه وه هه تا عصري چوارده به رگي بيڪه مين وله  
 اولي نه م عصره وه هه تا امرو به به رگي دوهم نا و نراوه . »  
 هاوار هڻا لاخوه نه آنوزالي ڙنوقه زاب  
 گرميا دلي خوه هميز د ڪه وتي خوه شها تئاوي .  
 ڙيزداني پاك ڙيره ڙينڪه دريڙ دا خواز دڪت  
 و پيرده ڙخوه ندقائين خره هيڻي دڪت ڪو ڪرياري  
 زاري ڪردمانجي بهن دا ڪو اٺ ڪو ڦارا ڪردي  
 بڪارت ڙيٺ وخدمت مالت وولاتي خوه بڪت .

سالان نه ب مهان نه خوه نديه ڙي . ڙ زماني خوه پيڻه  
 ب ت زمانان ڙي نزانن .

جميلي حاجو ڪردمانجي پيشينه ڪو خوه نندن ونفيساندني  
 ب الفابي يا زماني خوه وبي آريڪار يا زمانين دن علميه .  
 د سالاهزار و نه صدوسه ده ، ڙ بر ڪو ام درباسي  
 خطي بو بون ، حڪومتي ام آني بون شامي ولي روشتانديون .  
 هنگي ام چنڊڪ بون . جميل ڙي ب مره بو . ڦندا ،  
 د تاخا ڪردان ده ، ب ميڻائي ل مالا علي آغا زلفو جه بو  
 بون . شف وروڙ نائ هڻده رودنشتن .

از ب الفابي و زمانان بنا ڪردي مڙول د بوم . من ڙ  
 هر ڪسي تشڪت دپسي وهر ڪسي ڙ مڙولا هيا خوه ره  
 بندوار د ڪر .

جميل ڙهه ڪري پيتر بندواري نيشان د ڪر ، قنچ برد ڪت  
 و قيد گشت .

جميل يڪجارجوه ندا بو . هيڙ قلم نه ڪر بو دستي خوه  
 چاقين وي هين ل سرت خيزين حران نه گرها بون .  
 اٺ ، ڙ بونا من ڙي در بڪه قنچ بو . ڙ ڪردمانجي  
 ڦوه نداره الفابييا خوه هين ڪرڻ .

هنگي ، د دستي مه ده تشڪي چاپڪري نين بو . بشي  
 نقي ، جميل الفابييا ڪردي ب دستنڦيسي هين دبو . من  
 هر رور ڙيره چند حرف نيشان دڪرڻ و ب وان ره پرسن  
 چيد ڪرڻ .

جميل دناٺ هفتڪي ده الفابييا ڪردي خلاص ڪر بو .  
 ڦيدت ب الفابييا زماني خوه د ڪار بو هر تشت بنفيسينه و  
 دستنڦيسين رند بڄوينه .

اٺ . جميلي حاجو و بندواري آپشين « ڪرد قنچن لي نزانن »  
 دڦيت ڪو جميلي حاجو ڙ بونا خورتنين ڪردان نمونه  
 پيت . حچي خورتنين ڪرد هنه ڪو حڙولات و ملتي خوه  
 د ڪن و دخوازن خدمتا وان بڪن بلا جميل بينين پيش  
 چاقين خوه و وڪوي بڄين و ڙخوره و ڙملتي خوه ره بنفيده بين .  
 د حقي بندواري ده چي بيڙم ، چاوان پسنواري بدم از ڙي  
 نزانن . هو قاس بيڙم ڪو حتا نهوت ڪسي سببا بريري و  
 نفاقا ڪردان ب ڦي رنگي و ب ڦي زلالي بي نه ديتيه ،  
 نه ڙي نيشان ڪر به . هر ڙي جميلو ! مخدي ت ڙ مال

## کردمانج قنجه لی نزانن

کرد قنجن و خویناوان حی ناموس ، رومت و جسارته . ژلورا ولو رادین هقدود کژن ومالین هف دخون

یک ژوان سری خوه ژئەدن ره ناتوینه . ژبر کو چاقی خوه دئی ایشی ده فکرنه . چه خورتی کو نورادبه چاقی خوهل قنجی یی دگرینه هر دبنه میری قنچ ومشهور کو خلک پسنی وی دیده اوه کو میران د کژه وتالانان دتینه وسره خو ژ بربری خوه ره ناتوینه .

او خورت ژی رادبه دست ب کستن ، تالان و بربری یی دکه و خباتکه زور دخبته چما کو ژیره پسنه . حچی میری کرده کو کته ایشکی هر دخوازه کول پیشیا هقالان به . پر جاران ژی ام دبندن کو یکی کردب چند هقالان ره - کونه

که رامه وه سهر ره ی اول نازانم حالی بوی که غزلی (بطرز قدما) یش تقریباً به مقصد یکی وانوسراوه ؟ که وابو رنگه معذوم ببین . نه که رله ۳ زباند ( کوردی فارسی ، تورکی ) اشعار وغزلیاتی بنده ت چا پی که وته وه خویندوته ته وه البته له مسلکم تی که یشتوی . مع مافیه له رغمی نه مانه وله رغمی نه وه تی که به خلاف عقیده ی ابوه ادبیاتی بی عشق و به تعبیری صحیحی ( ادبیاتی بی خطوخال ) له نظر مندنا وه کو ( آوینه ی مس ) وابه . دیسانه وه تقدیری به رزی حسیات و بلندی مفکوره تان نه کم . چونکی من ازانم ابوه کین ۰۰۰۰ ؟

### هلبم رفقی

— هر وکی مه ژئە نسخا پیشین شه گوته هاوار ، هاوارا کردان ، هاوارا هر کرده . ژلوراه مه بندا ژورین کو جها بکه بلاف کر . هکه ( نوروز ) دل کوو لی فگراند رو پلین هاواری ژیره ژی فکری نه .

هاوار

ژملتی وی - د کفه ایشکی ، گر خوه ندن به ، میرانی به ، گر جمالی به اوی کردل پیشیا هقالین خوه حمیانه . چا طبیعت و جسارتی وی قبول ناکه کو کس ل پیشیا وی بیه .

هکه ملتی کردژی میناقان ملتین دن کو ایرو پیشده چونه ، زانا بونه دی دیسان ل پیشیا هقالان حمیان بونا و دناق ملتان ده مشهور بیونا ، لی پیچکی شونده مانه .

درمانی زانا بونی ژی اؤه . حچی کو کرده و دیژه از چیلی پی کردانم دئی آریکار یا جقاتا خیری بکه ، هر کس ل گورا حالی خوه ، دا کو جقات ژی بکاره منفعتی ل مه بکه ، زارو وین مه بده خوه ندن و دبستانان بینه دئی دری بین مه . مانه چیتره کو ام شپست هفتی زیرین زر ل یک زارو کی بدن حتا کو ام ل بازار کی ژقان ئین دور بدنه خوه ندن ؟ او شپست هفتی زیر ژ جقاتا خیری ره بت ام د کارن صد زارو کی پی بدن خوه ندن . ژ بر کو اوی دبستانا بینه دئی دری پی مه ، مصرف ل زارو کان ناچه .

ت نشت ژی مروقان زانانا که ژ خوه ندنی

### جمیلی حاجو

پیقه .

جمیلی حاجو - نفیستانی بندا ژوین جمیلی حاجو به . گلو جمیلی حاجو به کی به . جوانه ، پیره ، ل کو د کیزان دبستانی ده خوه ندیه .

هر وکی د انجای ده کفش بت هیژابه کو ام بکفن پی فان پرسپیار بان ول وان و گر بنن .

جمیلی حاجو خورتکی بیست ، بیست و یک سالی به . ز کتیه ت دبستانان ، و بردستی ت کسی ده نه ب

## جوابنامه

بو (نوروز) ی مستعار خاوه‌نی مقاله (زمان) که به سدر لوحه‌ی (بوشاعر یکی کورد) له ژماره (۲۴) می زاری کرمانجیدا نشر کرأبو.

مقاله یك که حه وت سال له مه و پیش له تنقیدی شعر یکدا له دفتری خاطرانی خوتا نویسوته ایر و اینجه — بته ساحه‌ی انتشاره وه وله جریده‌ی (زاری کرمانجی) دا عرض خوینده وارانی نه که ی . نه مه همت ووته وانا یکی به رزه ، جنی نقدیر و تشکره . امیدم وایه که نهو دفتری خاطرانهت خزینه یکی زنگین ورنگین و به اعتباری محتویاتی تحفه یکی نوینی گران قیمت بی . هر چند تنقیده کت به راستی معقول و مقبوله به لام اگدر عاجز نه بی ده کیم : که بونشری او تنقیده له انتخابی زماندا اصابت نه کردوه . چونکی تنقیدی نعلیک اصولاً یاله وه ختی کردنی او فعله داو یاله عقیبه وه ده کریت . اگه روا نه بویه تاریخ بویه . نه ده بو به درسی عبرت . ثانیاً تنقیدیک نه بی توجیهي هدفیکی معین بگری . اگه روانه بی بی عکس صدا امینته وه . ولهم نوعه تنقیدیش نه ، خویند وارانی له حقیقت آگادا رابن و استفاده اکن ، ونه او کسه‌ی تنقیدیش اکریت له خوی آگا . له به رانه به بی مدافعه ی نفس محکوم و بهم تخریشی البته معذور نه مینته وه ، من لیره دا هرزه و کیلی ناکهم اگدر تنقیده کت موجهی منیش نه بی ، چونکی تنقید هل اکریت له نویسنه وه ی نهم جوابه دا خوم هر به مصیب ازانم . مع مافیه ایوه تنقیدی شعر یک اکن که حوت سال له مه و پیش نشر کراوه وله میانه‌ی تنقید دا نه فرموت که «چه ملتکی ترهیه له عصری فن و علمدا له زمانی عرفان و صنعت دا شاعره پروهشه کانی له پاش هه مورابورا دنیک له شعر دا باسی (مژگان وچاوی کال ولیوی آل و بکهف ؟) . نه م سواله تان له چه درجه یکدا له گ. ل حقیقت تطابقی نه کاله وه بخت ناکهم . فقط وا ازانم که حقمهیه تنقیده

کتان . موجهی خوم بزائم . چونکی من تقریباً هشت سال له مه و پیش له شه شه مین ژماره‌ی غزه‌ی (امیدی استقلال) دا غزلیکم نشر کردوه که نه مه مطیلهه که به تی : (مار زلفت نو به چی خزانه‌ی عقیقی آل نه بی . تیر مژگان پاسه دانی دوری چاوی کال نه بی) . دقت نه فرموی که عباره (مژگان وچاوی کال ولیوی آل و . .) که حرفیه له مقاله کتان وه رگبراهه گدل مطلبی غزله کم چنده منا — سبتداره ؟ . . . جاری له پیش هه . مو شتیکدا عرضت ان . اکم که من له و تنقیده تان زور متحسس و پی خوشحال بوم . چونکی دوباره‌ی اکه وه قصه کاتبان حقه و راسته له گه ل امه یشدا (ذمیکی تحت المدح) هه ، چونکی دوو به شی مقاله کتان دلالت له بلندی موقع و شخصیتی (منتقد) نه کاله نظرا بوه دا انجمله به رامه‌ی من لابق ام نقدیرانه نه بوم ده میک له نویسنه وه ی جوابدا متردد مامه وه . فقط فکر یک که جسارتی جواب نویسنه وه (خوتی هل قلا ندنی) پی بخشیم اوه بو که له نقدیرانه که تاناوه کو تنقیده کتان نامصیب ین . والا اگر له جهت تنقیده که تانه وه له عدمی اصابتان امین نه . بومابه ممکن نه بوخوم به و شخصه به رزه بزائم که ایوه تنقیدی نه کهن . به لی لطفاً اگر تماشای سرلوحه‌ی غزله کتان بفرمایه و توری لی ی وورد بیوانیه وه ده تان زانی که اوغزله بو تخر به یکی قلم واه ژیر مقصد یکدا نوسراوه چونکی سه رلوحه‌ی (بطرزی قدما) و بالخاصه شعر و مقاله کافی پیش نه ونسخه یه کافیه بو اظهاری مقصد . بهم مناسبته وه حکایتیکی بچو کتان بو بگره وه . : — سه رده میک دیسازه وه له غزه ته یکی بچو کدا چند شعر و مقاله یه کم نشر کرد له شعره گاندا زورم سعی نه کرد که لاسایی شعر اتازه کافی تورک بکه مه وه متجدده به میشکه کانی وه کوتو زوربان قدیرا کرد . فقط روژ یک له مجلکسیدا بعض له و تچدد پرورانه یش حاضر بون که (قدما پرست) یک هجومي کرده سهرم و تنقیدی کردم له جیاتی مدافعه به اسلوبی کون چند شعر یکم نشر کرد که نه واومثالی اوته ولی بان معلوم بوله و میدانه شداله (قیر قایچ) لاناوهم دوباره

بە یان

- شەرب لێی خۆه -

مەرگ وزقی خەبە نە  
گەند و قصر تەبە نە  
بابل مری گل مری  
نەرز مایە نە تری  
نە گل و نە کلیاک مان  
نە پاریز و گلستان  
نە دنگی خوش نە مقام  
پیشە ژاە و انتقام  
چاقین بوکان بە هیستەرن  
گەند دگەرن دەستەرن  
نە پز مانە نە شقان  
نە بلور و بلورقان  
گلی چیا گواھین  
نە خلام و نە شاھن  
دشت و نوال بە خویەن

دیروکا مە دخوین  
ریل و دحلك بونە زر  
زقی ، بوکن کز بزر  
خوولی بونە خرابە  
یزدانی مە دە رابە  
بە جامیری نکارت  
بە بی بختی دکارت  
أم ژى کورن و کورن  
ژ پرا وان دەورن .  
نە قصر ما نە سەربان  
نە میرک ما نە سلطان  
نە صاغی ما نە مەرن  
هه‌مه‌هه ژى دەرن .  
کەن قەمری گەرن ما  
دەمان چو و بەرن ما  
کچک چو و کزی ما  
و آهکە رزی ما :  
گلستان بو کەرستان  
بە چاقین مەن کەردستان

آر بکاري مە نینە  
هیشی ، چراکی بینه  
چاقی بنفش هشینە  
سوسن ژى کت بە شینە  
نە گیا ما نە ریمان  
ل پاریزی کەردستان  
نە ما ، لی لی ، نە لولو !!  
قرک ، گەند ، گەرواپلو  
دکەن خدان سازن  
کەدبامە دخوازان  
مەرگ وزقی خەبە نە  
گەند و قصر تەبە نە  
بابل مری گل مری  
نە رز مایە نە تری !  
هاوار چو و هیستەرما  
ژدی مە و هیستەرما  
مامک کەرت و دەرژە  
«شەرب لێی خۆه» دەیزە .

دکتور کامران عالی بەرغمان

بوە ، و کوردانی زەمانی پیشو فکرو میشکی خویان ، آواتی  
دیلیان ، هەمو بە هە لێ سەت ریک خستوه . و دەستیان کەرن -  
دووە تە بیژ بنو گوئتی او هە لێ ستانە بە گورانی .  
کوردانی پیشو - هە و کو بە شیک لێ کوردانی  
ایروش - آواتی دێلی خویان بە هە لێ سەت داناوە ، و او  
هە لێ ستانە یان بە گورانی گوئوه ، لێ دامنی چیا یان ، یان لێ  
سەر رووباران ، یان لێ سەر کانی و سەر چاوە کان بە بلور  
یان بە شمشال او هە لێ ستانە یان گوئوه .  
انجانه ختە نەختە مە سەر کە وتوه ، و حە زبانی نە کێردوه  
أحوالی پالە وانانیان ، چیرۆکی جوانو شیرین و قنجیان  
تە نیا ، هە لێ سەتیکێ گورانی بیژین ، وەر بە دەهه‌ینه -  
بوە . بە شکو دەستیان کێردوه تە ریکخستنی او شتانه ،  
أحوالی او پیاوه بلندانه بە چە نە هە لێ سەتیکێ چیرۆکی  
دورو درێژ و دەستیان کێردوه تە بیژینی و خویند نەوهی

لێ بە بینی خویان دا .  
هە ، ر بە و چە شنه ادبیاتی کوردی لێ پایە ی گورانی یه‌وه  
سە ر کە وت بو پایە ی چیرۆکی ، و کورد کان دەستیان  
کێردە دانانی هە لێ سەتی چیرۆکی ، یان ریکخستنی  
چیرۆکی خویان بە شکلی هە لێ سەت .  
انجا چونکە ادبیاتی کومیدی بە ستراوه بە قومه بلندە  
تەمەنە کازە وه وزور پیویستی مدینتە و چونکە هیشتا هە  
تا کو ایستا کە بە تە واوەتی پیروشکە ی هە تاوی مدینت  
وولاتی کوردستانی روناک نە کێردوه تە وه و شارانو  
دیهاتی کوردستان بە بە رگی جوانی مدینت نە رازاوه تە  
وه ، لێ بەر اوە ادبیاتی کومیدی لێ کورد ستانداەر -  
نە کە وتوه و ادبیاتی کوردی هیشتا نە گە بیستوه تە پایە ی  
سپیه م .  
( تە واو نە بوە )

هه‌قەری صوری



### ادبياتي كوردی ۲

اوانه كه كه موزور معلوماتيكيان هه به له ادبياتي  
زيماني اورپاده زانين كه له زماني كونه هه تاكو  
ايستا كه له سهرسي پايه سهر كه وتوه وايستا كهش ادبياتي  
اور پاده بيته سي چه شنهوه . اويش : ادبياتي گوراني ،  
ئادبياتي چيروكي ، ادبياتي كوميدى [ تمثيلى ] .

ادبياتي اورپا — وه تايبه تي ادبياتي يوناني كون —  
له پايه ي به كه ميني دهه كه وتي هه عبارت بو له گوراني ،  
وله دهه يونانيه كان فكهرو ميشكي خويان به هه ليه ست  
( شعر ) ريك دخيست و دستيان د كيرده بيژيني او هه ليه سته به  
گوراني . او شتانه كه له ديليان د جولايه وه همويان ريك  
دخيست به هه ليه ستي گوراني ، كه ده كه ران له ناوشاخو  
درلاني يونانستان ، يان كه داده نشتين له سهر روخي بحري  
[ ايجه ] ، ده نكيان هه له ده بري و دستيان د كيرده گوراني  
بيژين ، هه تا اوه ننده ي بي نه چو احواليان گوررا ، و  
دستيان كيرده مدح كيردين وه هه ليه ست هه ل دان  
له سه ريبايراني كه و ره ، قارمانان ، و پاله واناني خويان ،  
هه ندي جار او هه ليه ستانه يان دريژ د كيرده وه وه به

مدح كيردنش نه ده مان ، به شكو دستيان د كيرده  
ربكخستني ژباني او پياوانه : له دايبك يونيان ، گه و ره  
يونيان ، خو و ره ووشتيان ، مردنيان به هه ليه ستيكي دور  
و دريژ و به شوقيكي كه رمه وه دستيان د كيرده  
بيژينو گوتني او هه ليه ستانه : به كورتبي يونانيه كان  
كون هه ليه ستي چيروكي يان داده نا ، يعني ادبياتي له  
پايه ي گورانيه وه سهر كه وته پايه ي [ چيروكي ]

انجار انگاو يكي [ وختيكي دريژ ادبيات له پايه ي چيروكي  
مايه وه ، هه تانه خته نه خته سهر كه وت و كه ييشته پايه ي  
[ كوميدى ] ، انجا هه له وه ده مه وه بو كه ادبياتي كوميدى  
له اورپا بيدا بو و بلاو بو ده .

اوه پايه كانى سه ر كه وتني ادبياتي وولاتاني روز  
آدايه . و نه مه پايه كانى سه ر كه وتني ادبياتي كه لاني  
آريه . آيا له وولاتاني كوردستان رووه رگيزينه دواوه  
و بنورين له تاريخي ادبياتي ، ام پايانه ده بينين يان نا ؟ . . .

مادام ادبياتي كوردى ادبياتيكي آري به ده بي  
وه كو ادبياتي زيماني روز آوا وايت وده بي به سه ر او  
پايانه دا سه ر كه و بتيت .

به لي : ادبياتي كوردى له زه ماني كوني پيشودا « گوراني »

وروز ( هاوار ) بكه ين وله يزدان پيارينه وه  
وبلين

« بژى هاوار . . . بين خيوى هاوار »

تاو كوده نكي هاوارمان ، كه كاته به رده ي كردگار  
دستي خويىنا ويمان داوېني دوشمن ، گري زارى  
وشك وتينومان آوى علم و فن وزانستى ، نه نوش .  
نه وسابه چنگي اسنين و كوهه ، توجه ركي دوشمن  
دره بينن توله ي باق وبراى خومان بسندين . . .  
ايتر . . . . . بژى هاوارا . . . . . بين  
خيوى هاوار . . . . .

ژبونا آريكار پيا كردستاني به ، خوينامن  
ژبوناشرو رزاندي به !!! »

له هاواردا وينه ي چياياني خوينين ؛ و دولاني  
گول گولي رهنگي ولات ، و نمونه ي مردياره تي  
شيرازه ي كورد ، بينين . . . . .

له هاوارا . . . له ناو بركي ، و كو قاره كورد به دا  
هيواي ژبان ، چيژين ، غونچه ي آزادي به  
خوين كه شاهه بون نه كه مين دليكي به هيزا  
به ته نگاهه پرورده كر او دا نه بين . . . . . له  
هاوارا كورد يكي تازه كه نجى كي آزاد . . .  
ژيان يكي شيرين نه بينين بو به بي ويسته شف

# هاوار

## کوئارا کردی

### له هاواردا

و کثري خومان نه بري به لام تاثيره که ی ناگورری له  
 دلی مندا ، نهك به تنها هر له دلی مندا به لکوله  
 دلی همو کوردیکیدا . گولی سیسی هیوا نه گه  
 شینیته وه ، مه یلی آزادی تازه نه کاته وه ، له  
 پریشانی و پارچه پارچه ی خومان نه گه یین .  
 له هاواردا له اسمانی بی ته می آدایا دور له نی  
 سیاست بی نه وه ی که زردی زنجیری اسارتان  
 بینه گوی ، و کله پچه ی عبودیتان چاوبی بکه وی ،  
 یادستی خونای دشمنان بیدین . . . دور له مان له بن  
 سی به ری داری هیوادنه حه سیننه وه نسیمی  
 سربستی و آزادی هه له نه مژین ، حس به شیرینی  
 ژیان و خوشی سه ره به خویی نه که یین له هاواردا  
 هقالی برا کورده جگر خونینه کائمان نه زانین ،  
 شیوه ی په شیوی ژنی هه ژاری نه زانی کورد  
 و منالانی گپروده ی بی باف برائه بیدین .

له هاواردا گیانیکتی بلند ، دلیکی به  
 هیز ، چنگی کی آسین گه ردنیک کی آزاد ،  
 و دامنی کی پاک نه بیدین که همویان له له شیکدا  
 گرد بونه وه و بدنگی کی به رز ( هاوار )  
 نه کات و نه تی :

« دلی من ژبو هژ کرنا کردستانی به ، خورتیا من

له هاوارا دلیکی تو اوه ، جگه ربکی خوبنین ،  
 چاویکی پر فریسک نه بیدین .  
 له بی دهنگی شهودا له نیو دهنگی گریانی  
 منالانی بی باوک و ژنانی بی روله ، و نالینی جوانه مه رگاندا  
 دهنگی ( هاوار ) م دپته گوی ، نازک . . . دلگیر . . .  
 لام له تیزترین آوازی موسیقی حزین شیرین  
 تره دپته گویم نه و دهنگه نه سپایه هه رو کوشنه ی  
 نه سیم ، ورشه ی گیا ، ناله ی قمری ، قاسپه ی که و ،  
 و تاقه گی آتی روبرار . . . . . دپته گویم و کو  
 آهی حزینی سه ره مه رگان . . . . . بی چرپه ، بی  
 سپروه . . . . . بی دهنگ . . . . . نهنگ . . . . . له  
 ترسی چاقی بدان ، له سامی دهستی دشمنان به نه  
 سپایبی دپته گویم وه آه . . . ناتوانم بلیم چه کاری  
 له دلم نه کات ؟ !

ناتوانم بلیم چه یادگیری له دماغدا راست نه  
 کاته وه له چه په ربکی دلم نه دا ! ! ؟ له کام اعصابم  
 نه که وی !

دهنگی هاوار له شامه وه دپته گویم له پاش  
 نه وه ی دهشت و بیابانی یگانه ( بیانی ) و کیو

# کتبخانا هاواری

ریزانا الفابی با کردی

هژمار  
۱

غروش سوری

۱۲۶۰

۱۰

ب چرمی خملاندی

ب چرمی عادتی

ژبونا درفه دفتت حتی پوستی ب سر بیت خستان

زنگراف و مطبعت

ایوب بیخاوان دایمشوق

حفر جمیع المعادن والصور الملونة واللوحات الخارصية  
طبع بطاقات وارر بسات بحروف نائرة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب

احمد نافذ

انحصان بالامراض الداخلية والزهرية والاطفال

عرنوس

دمشق

الطبيب

محمد خضيب

الافتصاصي بالجراحة وامراضه العيون وجراحتها

صالحه

دمشق

## اشتراقات مجموعة هاوار

وفي غير هذه الأقطار	في سورية وتونس والعمق وبلاد القفقاس
عن سنة واحدة ١٥٠ فرنك	عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك
عن ستة شهور ٩٠ فرنك	عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوري - ٦٠ فرنك
عن اربعة شهور ٦٠ فرنك	عن اربعة شهور ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

# QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

1

## Rêzana Elfabêya Qurdî

Note sur l'alphabet Kurde

Bi çermê xemilandi 12,50 K. S.

Bi çermê adeti 10 K. S.

Ji bona derve divêt hekê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Hafiz*

SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES

Damas

Arnois

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

Damas

Galié

## PHOTOGRAVURE

### Egoubiye Frères

Inscription sur tous les métaux. Gravure coloriée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes,

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyarîya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûs-sûrî — 100 frenq

ŞesmeHQî 300 kirûs-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûs-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

ŞesmeHQî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tiştî bi navê xweyî tene şandin:

Şam: Taxa Qurdan

## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Şeraniya Zmanê Qurdmancî

Weqê ez gehîştim Bêrûtê roj çû  
bû awa û sê saet ji şevê derbas bû bûn.

Sibetir, bert nivro, ji mêvanxanê  
derqetim, min da qûce û qolanên, û  
gehiştim meydana Burcê. Dinya germ,  
ba şil, bihna mirov teng dibû, diçiqiha.

Min xwe da ber siha Kêlweqê,  
canê xwe divêsihand.

Burc meydanaqê fireh û drêjqî ye.  
Di nava wê de parizeqî qîçiq lê spehi  
heye. Bi giya, bihnûn û duran xemilandî ye.  
Tê re aveqê qîçiq dibihure û diqeve  
nav bêrmeqê teniq. Erda bêrmêji qevirên  
şehqîrî û benevşgon raxistî ye. Re-  
ngê avê tede winda dibe. Pêrm weq ze-  
viyeqê benevşin xuya diqe.

Li serê meydana, sê qûceyên me-  
zin-ji baqur, ji rojhelat û rojava—xelqê  
bajêr ditînin û lê dirîjênin.

Xelq di nav qûceyan de mîna  
robaran diheriqin. Ev sê robarên qo di  
meydanê de digehin hev, dibin lehiqê boş  
û xwe didin ber parîzî. Di ber caxên  
parîzî re pêlên lehiyê dişikên û lehi di-  
bê du bir, bireq di ber rastê û birê din  
di ber çepê parîzî re diheriqe, hetapi-  
ştî Serayê, paşê, dilopên lehiyê, ber bi  
bêhrê ve, ji hev diqevîn û belav dibin.

\*\*\*

Xelq di ber min re dibihurîn. Pîr  
û ciwan, jin û mîr, dewlemend û belengaz;  
ji her rêzê, ji her rayî, ji her nijad û miletî.

Min ew ji belg, dem û serçavên  
wan nas diqirin.

Carinan şeskeqî gewr û pehn bi

şasîqeqî qesq diqetin be, qumeqî sor  
di ser çarîqeqê re dikelikî. Jiniqeqe ziq-  
mezin, weq deneqî, gêr dibû û diqet  
pîsta qeqîqeqe narîn û bejnzrav.

Ev e, pêxwaseq, qaşo bê hemdê  
xwe destên xwe di ser hêt û navqelên  
van pîreq û qeqîqan re digêrine.

Min canê xwe vêsîhandî bû. Pa-  
bûm, qetim nav pêlên lehiyê. Ji nişqê ve,  
ji qolaneqê, çend seriyên bi qum û dest-  
mal li min der bûn.

— Ne lol!... hê zû ye... ma çiman...  
dev jê berde... Heso digot... na herê...  
guh mede....

Ket ne dihat bîra wan qo ez ji  
bi zmanê wan dizanîm, qo ez ji yeq ji  
wan im.

Ji xwe ji min re zilameq divîya  
bû qo hûrmûrên min hilgire, bibe mêvan-  
xanê. Min deng li yeqî qir.

— Xorto, heqe vala yî bi min re were.

Xortê qo min deng lê qiri bû, ji  
hevalên xwe veketiya û da pey min.

Heta qo em gehîştin diqaneqê min  
deyn ne qir. Li diqanê min cişareyeq da  
wî û me dest bi axaftinê qir.

— Xorto, tu xelqê qû derê yî?

— Ez xulam, ez bedlîsî me

Lê zmanê wî ne zarê xelqê bed-  
lîsî bû, min got:

— Ma çire dibêji qo bedlîsî yî, ji  
zmanê te qîş e qo tu ji dora Mêrdînê yî.

— Belê, xebera te rast e, lê ez eslê  
xwe dibîjim. Ez bedlîsî me, lê di miha-  
ciriyê de derqetim û di dora Mêrdînê  
de bi xwedî bûme, ber vê yeqê...

— Qengê hatiye Bêrûtê?

— Ev bû saleq û hin, ma ez xulam tu ji qûjan welatî yî?

— Divêt tu jî, ji zmanê min bizanî.

— Gora zmanê te tu jî welatê Botanî, lê di vî bajarî de tu botî nînin.

Pêleqê seqinî. Qi'ş bû qo dîfîqrî û di bîra xwe de li tişteqî digeriha. Di pey re, rabû ser xwe, hat destê min û got:

— Ez xulam, li sûqê min menêre, min aniha tu nas qirî. Ji xwe min bihisti bû qo yeq ji we li Bêrûtê ye. Min dil diqir ez herim ziyareta wî lê min fedî diqir. Xwedê ji min re li hev anî.

— Belê yeq ji me li Bêrûtê ye, lê ew ne ez im, ew brayê min'ê. Ez li Şamê rûdinim.

Di pey re ez û xweyîyê diqanê em qetin bazara qaxeza Hawarê. Ji xwe ji bona qirîna qaxeza Hawarê hati bûm Bêrûtê.

Min şuxlê xwe quta qirî bû. Qaxez bi rêhesinê bihata rêqirin. Tinê qaxeza çermî min bi xwe re bibira. Xortê min çermê Hawarê qir piştî xwe û me da rê.

Em çû bûn diqaneqê din. Min bi xweyîyê diqanê re xeber dida. Qurdmancê min di qurçiqeqê de li ser tetiqan rûnistî li min dinêrt û diqenî. Min jî bi dev-geneqê jê re got:

— Xorto, tê xêr e, çire diqenî?

— Xêr e ez xulam, ji qêfa qurdmanciyê, ji qêfa qurdmanciya te diqenim. Belê li Bêrûtê qurdmancê zehf in. Ji sibê heta evarê em bi qurdmancî xeber bidin. Lê gava ji devê te dibihîzim hêj bêtir qêfa min jê re têt. Ax ez xulam, tu nizanî qurdmancî çikas şêrin e.

— Na herê. qurdmancî qengê bûye şêrin.

— Bi serê te ê eziz, tu zman weq qurdmancî nê şêrin e. Ez bi tirqî rind nizanîm, lê min ew geleşî bihistiye. Li Irakê min erebî û ingilîzî geleşî bihis-

tine. Li Sûriyê her rûj erebî û frensîzî dibihîzim. Ez van datinim ber hev û dibînim qo şêraniya zmanê qurdmancî di tuwan de nîne. Le çî fêde ew bi qurdmancî nizanin.

— Ma bizanîyana çî dibû?

— Hingî, ji qurdmanciyê pêve bi tu zmanan xeber ne didan . . . .

*CelaDet Altî Bedir - Xan*

## Rêya Teze

Rûjnameqê qurdmancî, bi herfên nû, bi qurdmanciyêqê xwerû, li Rewanê, di şiqleqî spehî û çeleng de derdîqeve.

Vê paşiyê çend hejmarên wê gehîstine destê me. Çavên me pê biraha bûn, dilê me şa û geş bû.

Qurdmancên Rewanê ji rûjnamê pêve çend qitêb jî derêxistine. Me sê çar rûj mijûlahîya xwe bi wan qirin.

Ji nav rupelên wan ên taze û ter bihna qulîqên çiyayê Elegozê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal - û - şapiqê qurdmancî, xencer û pişt-xencera qal û qalîqên me dihatin dîtin.

« Rêya Teze » weq navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê qevntir, bi emr jê mezinter e. Hejmara wê a paşin qo gehîstiyê destê me a pencî û nehan e. Li gora qo Rêya—Teze rûjnameqê dehrûjqi ye, berî salqê û hin dest bi derqetinê qiriye.

Ev çend beytên jêrin ji qitêbeqê qurdmancên Rewanê ye:

Eysê, Kurban, rabe j'xwê

Herin meqtebê. dersxanê

Welatê qitêban pir şêrin e

Meriv li wê dinya dibîne

Dê û bavê me tariyê da bûn,

Ji dinê bê hes, bê xeber bûn.

Dîsan ji wê qitêbê şihreqê zaroqan:

**Strana Dilan**

Lêvên te du pêt in  
Çavên te stêr,  
Diranên te mirarî  
ilê te dêr.

Ava bi ronahî  
Weq Zerdest î  
Dinê û ezman î  
Mêrg û dest î.

Sor î rohelat î  
Deng û nay î  
Buhar û blûr î  
Brûsq û ba yî.

Porên te zêr û zer  
Canê te ziv  
Tu bibe jî min re  
Tastê û şiv.

Taûsê arper î  
Qenina bûq  
Biqene dimirin  
Baqur û pûq.

Tu ewrên ezman î  
Tu qesqesor  
Li ber lamên te lez  
Dimire sor.

Tijî hevîn tu î  
Hesret jî tu  
Zana û ferzane  
Şîret jî tu.

Çûqeçe delal î  
Dengeqî çaq  
Qaniya zelal î  
Weq berf î, paq.

Xwesteqa min tu î  
Strana min î

Mêqewa min tu î  
Şivanê min î.

Xezala min tu î  
Çavên te reş  
Ez beranê te me  
Sînga min geş.

Pêşnivejê te me  
Tu mizqeft î  
Dilê min ezman e  
Têde stêr î.

Di çavê' roj û hêv;  
Ronahî tu,  
Li kesra spehîyan;  
Avahî tu.

Sînga te çiyâ ye  
Tu agir î  
Li buhiştê hevîn  
Pêxember î.

Bêqes im û tinê  
U bê dotmam  
Di vê dinyayê de  
Bê govend mam.

Qulilqa Adar î  
Bihna buhar î  
Tu deng û hawar î  
Stêra êvar î.

Pêşnivejê te me  
Tu mizqeft î  
Dilê min ezman e  
Têde stêr qî.

Porên te zêr û zer  
Canê te ziv  
Tu bibe jî min re  
Tastê û şiv.

*D<sup>r</sup>. Zamiran A. Bedir-Xan*

**Dawet e**

Ji zozanan hat kuling  
Xeber anî jî xweyîng  
Dibê werin dawet e.  
\* \* \*

Dawet e xweş dawet e  
Ji qurdan re rûmet e.  
Dawet şer e, şahînet.  
\* \* \*

Bê xweyî man gund, qelat  
Gazî diqe ev welat  
Dibê werin hewar e.  
\* \* \*

Bê qezî man qeç û bûq  
Di rêlan de fa û pûq  
Bê belg mane dar devî.  
\* \* \*

Navno diqin qurdanî  
Ne helîştin mêranî  
Qurdinon rabin dawet e.  
\* \* \*

Herê lawo dawet e  
Dawet e xweş dawet e  
Bûqa te jî Qurdistan.  
\* \* \*

Qezîyên wê delal in  
Çi nermoq û şepal in  
Ber mekesê mede wan.  
\* \* \*

Dengê avê çî ziz e  
Newal jê re eziz e  
Welat! welat! welato!  
\* \* \*

Ji zozanan hat kuling  
Xeber anî jî xweyîng  
Dibê werin hewar e.

*Celadet Ali Bedir-Xan*

**Bizina Pîrê**

Bizina pîrê çû çolê  
Lê da herf û bagerê.  
Pîriq derqet jî malê.  
Li bizina xwe digere  
Hê ! hê ! . . . . .  
Bizina xwe digere  
Surê pozê pîrê bir,  
Pozê pîrê werimî;

Guran bizina pîrê xwar;

Pîrê li ser digirî

Way! way ! . . . . . Li ser digirî.

Ji bona îrû me hevkas got, pêşdetir  
em disan jî Rêya — Teze behs biqin.

Em jî hevala xwe re rêyeqe xweş  
û dawîyeqe geş hevî diqin. Divêt qo her  
gav me hey jî hev hebit û gereq e qo  
em hevdu ser xebata hev serwext biqin.

*Hercqol Axîzan*

## EDEBIYATI QURDÎ

—3—

Lewaney serewe be tewawetî der-deqewêt qe edebiyati qurdi edebiyatêqî ari ye, we bilinde, we berze, we herweqû edebiyati zimanani ari kabila bo berz-bûnewe we serqewtin. We her çende medeniyet le qurdistanda bilaw bibêtewe ewende edebiyati qurdi serdeqewêt we berz debêt.

Ba nextê binorin lew hezarau çiroqane qe qurdeqan helyan bestwe, we dayan nawe, be tewawetî biyan xwênînewe, lew deme deza ûn qe hiç ferkêq niye le beynî edebiyati ême, we edebiyati zimanêqî rojawa we lew de me bilindayî edebiyatman deselmênin.

Aya helbesti çiroqî ( Mem û Zîn ) çî ferkêkî heye legel helbesti çiroqî ( Jiyada ) !!!

Aya ew helbestani çiroqîye qe imro le ewrûpa deybinin çî ferkêqî heye legel helbesti çiroqîy imro qe le qurdistanda bilaw bûwatewe !!!

Ewendey pê nawêt, her nextê binorin lem çiroqey xwarewe we sirinci lê bideyn ew deme bilindayî edebiyati xoman tèdegeyn.

Em helbesti çiroqîyey xwarewe le deşti herirî rojhelati (Hewlêr)—qe beşi nawerastiye le soran bilaw bûwetewe. We lew nawe be [ şiri leşqirî ] benaw bange. Çunqê danereqey nawî [ leşqirî ] bûwe. Lem çiroqê da basi ( Mir Suleyman begi herir ) deqat qe axremîn paşay emareti herir bûwe. Em karemane çend salêq beramber turqan radewestêt, we hera deqat, le paşan deşqêt u degirret u debrêt bo Estemûl legel leşqirîy piyawî. Mir Suleyman beg xuşqêqî zor ciwanî debêt qe nawî ( Xanzade Xatûn ) debêt. Leşqirî hezi lê deqat. Inca şewki serbexoyî le layêqewe we girpey hez lê qirdin le layêqî diqewe agir le dili ber

dedat. We dest deqate danani em helbes'te ciwan u şiriney xwarewe :

« Le wî dewrim denorî heta ewî zemanê, le wî zamanim denorî heta dewri kubad Xanê, le dewri Kubad xanim denorî heta dewri Xan Suleymanê, le dewri Xan Suleymanin denorî heta dewri Cum Cume sultanê, le dewri Cum Cume sultanim denorî heta dewri şahî Newsirewanê. Eqim ne dit weqû mîrî herîr u herîr begiyan, le diwani hîze romyan, helbistê be giranê. Ewroqe dadesubhaynê, çî modet nine lo ewî axay, ewetanê be tenê maytewe le wilati xeribiyan bebê Xudanê.


Ewroqe serê min dehêse, dilê min ked hadî nabê leber giriyan, eger emîn rojîm lê helatibû le hemû kedem u heft şaran, dedatin le geliy Amedî le geli Sûlakê, dedatin le serî herîr u herîr begiyan, dedatin le çemî Sûredê, le min xemliye be qulunqî sêwî we henarî we ewan mîrate dar hermeyan, hemû ales seherî, beyanî qomelêqî bulbulan,êqe şaloran, be çiriqe çiriqê le naw da deqin dad û fixanê. Eger le hiqewe beser bêne xwarê qomeliqî mehbûb û zerdîyan deyan gût: leşqerî !!!, Eger etu hezdeqey le xoşîyan kebûl naqey taliyan, bigere reweqî tûlan digel xezanêqî tajiyan, herewe serî herîr û herîr begiyan biqe zewk û sefay ewan zerdîyan. Dênewe le qolî kesarê, besiq berdanê, xîne lênanê çawres qirdinê degel qaniyan arekêqî tinoqe be tinoqe deçorêtwe le gahî şare qezyan.

Ewroqe şayi yeq degerê le serî meydanê, têdaye ayşî Suleyman begî degel mîre medyan, eger şireqî biqrî be pênc sed zêrî lê pêşra bidey le singî ewan zerdîyan. Le ber dilê min cezme çî nuqar naqe leber ilûd û meçîdî ewan take şayiyan, emîn le paşaxê xom swar nabim leqî muanneqan deber pişti xom ranaqem çî xenceran helnagirim çî nasiraiyan heldigirim



## Hawareq

Ji xweyîyê Hawarê, apê min ê dal  
Celadet Alî Bedir-Xan re :



Min çend xeber ji bona Hawarê nivisandine. Ji apê xwe hevî diqim bi çaveqî kenc li wan mêze biqe.

Ez yeq ji wan qurdên piçûq im qo bi şev rûjan, bi rûj şevan dijnêrim û di dilê xwe de dibêjim : gelo Hawara me qûjan rûjê ê bê ?

Rûjên postê bi me nas in. Di wan rûjan de em çavnêriya wê diqin.

Rûja qo Hawarê ji postê distîmin, diqim bin paşila xwe û newêrim zû zû veqim. Ji ber qo qêfa ditina wê ji xwe jî didexisim. Hêdi, hêdi piştê wê vediqim li çermê wê dinêrim li têdexitîyên wê agah dibim û paşê diqevim nav rûpelên wê.

Hawar qaniyeqê zelal, ez meriveqî tihû in ; piyan piyan jê vedixum, agirê dilê xwe pê vediqujênim.

Apo, tu nizanî Hawar bi me çikas xweş e, çikas delal û beba ye. Tu zanî çira apo ? Ji lewra qo ev sê çar sal in ez di dibistana biyanîyan de dixwînim, hîn ez bi xwe ne hestîya bûm lê ev Hawara dilşewat ez dîn qirim. Şev û rûj dixwînim, bendên wê ji ber diqim, û dîsan jê tîr nabim.

Ez û hevalên xwe em nav hev da şewirîn. Belê herçî qo bi zmanê me hate nivisandin ji me ra hêsantî ye, xwendina wê biqêf e. Qo me ew carqê xwend êdî ji bîra me naçe. Ma ji bona herqesî jî

qeqşolêqî derwêşan, postalêqî haciya'û dêperimewe leberî estîryan, deçimewe naw kewme gelêqî lewan dasinyan. Ew-roqe dade sublaynê çî modet nîne, lo ewlaşax, ewetanê be tenê maytewe le wulati xerîbiyan, we nayêtewe ser ew mulq u dewletan, heta ebed u ebel ebedîyan.

*Hevîndê Sorî*

ne wisan e. Herê zmanê herqesî jê re şêrin û hêsantî ye. Ji lewra her qes bi zinanê xwe dixwîne û dinivîsine. Tinê em qurd di bistanên xelqî bi zmanê xelqî divwînin. Ma çira ji bona çêliyên qurdan ji dibistanên cihê çênaqim qo em têde bi zmanê xwe bixwînin.

Tu zanî apo min çî qir. Ser vê yeqê ez rabûm û çûm cem bavê xwe û min jê ra got :

— Bawo tu çira min dişîni dibistana biyanîyan. Di wan dibistanan da zmanê Hawarê nîne. Ew zmanê qo zmanê min e, zmanê qurdmancî ye.

Bavê min hîniq seqîni serê xwe qir ber xwe, madê wî guhêrî, bi dengê giran, lê zîz, li min veqerand û got :

— Lawo xebera te ye. Divêt qo tu di dibistanên qurdan da bixwîni. Lê sed beyf û mixabin dibistanên qurdan hêj ne hatine pê. Belê, di çavên te dixwînim, tu dixwazi ji min bipirsî : « Ma çira heta niho dibistanên me çêneqirine ? » Çeneqirine, ji ber qo herçî xwenda û zana rabûne şûna qo xidmeta mîletê xwe biqin, xidmeta mîletên din qirine. Zmanê mîletên din pêş ve birine û yê xwe şûn ve hiştine.

Gava ji bavê xwe veketiyam, dilê min dişewitî ez geleq ber xwe diqetim. Ji xwe ra, ji mîlet û zmanê xwe ra, heyfa min dihat. Herê gotinên bavê min rast bûn, pêşiyên me ji mîlet û zmanê xwe ra guh ne dan. Ma îrû, îrû jî guh nadin.

Herê ez balê xwe didim, ji çend mezin û zanayan pêve, tuqes di Hawarê de hawar naçe, naye hawara Hawarê. Ez dibînim qo li wê meydana qo Hawar ji meletê qurd ra veqirîye tu qes hespê xwe najo ê. Belê tuqes naqeve tirad û meydana.

Ez ji mezinên xwe dipirsim, we çira em anîne dinyayê. Ji bona qo em bibin dil û xulamên xelqî ? an em jî weq

## Bêriya Welat

Ax . . . dilê min çikas bêriya wê duriyê diqe, !! Wê duriya qo di nav wê de ezman bi rengeqî din heşin e, stêr weq çavên delalan dibirikin, û çiya rawestiyane,

\*\*\*

Bêdengiya rêlan, min diqîştne bin siha xwe. Dixwazim di bin çikilên berû, kizwan û qenêran de rûnim.

\*\*\*

Çikas bi dileqî şewiti, ez dixwazim guh bidim guşguşa pelên daran. Dixwazim herim ronahiya hêvê, bi ser zinar û ser serê çiyân de bibe zim.

\*\*\*

Tinê li wê derê, di wê spehiti û delalîyê de, diqarim bidil biqenim,

*Dr. Zamiran Ali Bedir-Xan*

xelqî xudan rûmet û bişeref, û bi serê xwe bijîn. Heqe wan em ji bona xulamîyê anîne, xwezî ne aniyana u warên xwe qor bihiştina.

Apo ez jî te hêvî diqim bila ew mezinên ha li min megirin. Ma Hawar ne ji bona hawar û gaziyê ye. Ez jî di rûpelên Hawarê de hawar diqim.

Apo, te carqê di bendeqê de digot: «Qurd jî hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tên dakurtandin. Qo gihane hev dibin lehtî, lehtiçe boş. Tuqes, tu tişt li ber wan niqare biseqine. Felata welatê me di rabûna vê lehtiyê de ye.»

Belê apo, ew dilopên baranê em in, em qurdên piçûq. Divêt mezinên me, me bi dil û hişê qurdmançî bixwedî biqin, da qo em bigehin hev û bibin ew lehtiya qo me bifilitîne û bigeh'ne mirazê me.

Paşt ez tîm destên te apê min î delal.

*Wecdî Cemil Paşa*

## Qurdeqî qîçiq

Hêviyeqe Mezin

Di vê hejmara Hawarê de bendeq heye: «Hawareq». Nivîsevanê wê Wecdî, jî mala Cemil paşa, qurê Mihemed begî ye. Wecdî lawîqe qî sêzdehsalî ye.

Wecdî berî sê salan bi bav û mamên xwe ve hatiye Sûriyê û irû digel pismamên xwe di dibistanên Hesîçê de dixwîne. Weqê ez li Hesîçê bûm, Wecdî dihat niq min, me bi hev re xeber dida, jî min re çiroqa Rostemê-Qurd digot. Hej min diqir û weq mameqî xwe li min dinihêrt.

Wecdî heta irû jî xwendevanên Hawarê bû, bi vê bendê bûye yeq jî nivîsevanên wê.

Belê Wecdî bi salan qurdeqî qîçiq e lê jî bona dawiyê hêviyeqe mezin e.

Çavê min Wecdî!

Eve, herweqî te dil qir, min jî welê, benda te êxiste Hawarê û belav qir. Ji benda te re geleq qêfa min hat. Tu pê xeberdoxiya hemî hevsal û hogirên xwe diqî. Belê hevsal û hogirên te jî weq te difiqirin, êdin ew jî dixwazin her tiştî bi zmanê xwe hin bibin û di dibistanên qurdan de bixwînin.

Ewle be qurê min, hêdi hêdi, bi-rêve, ew jî dê çêbibin.

Heta hingî divêt hon bi xwendina Hawarê rind hînt zmanê xwe bibin.

Belê, xebra te ye; xwenda, zana û dewlemendên qurdan, herweqî divîya bû, welê ne hatine hawar û gazîya Hawarê. Lê me hêvî heye, ew mirovên cangiran jî hêdi hêdi jî çêrandin û mezinqirina ziqên xwe bigerin û herqes gora halê xwe, hin bi kelem, hin bi dirhavên xwe bêne hawara me. Lê em li hêviya wan ne seqîn û naseqîn jî. Ji ber qo jî hezaran pêrewî re pêşreweq divêt.

Paşt, ez çavên te maç diqim, Xwedê te ji bav û miletê te re bihêle, qurê min î delal.

*Celaîet Ali Bedir - Xan*

## Ala Qurdan

Ronahiya dil û çav ;  
Diyariya dê û bav ;  
Pêsiya wî roj û tav ,  
Spehitiya ax û av.

Ala qurdan ser be ser  
Sor û gewr e qesq û zer.

\*\*\*  
Kehremanê ceng û şer ;  
Kiblegahê mê û ner ;  
Cayegahê can û ser  
Afitaba dar û ber

Ala qurdan ser be ser  
Sor û gewr e qesq û zer.

\*\*\*  
Hêviya xortan û mêr ,  
Mihreba mizgeft û dêr  
Şahê evd û şahê şêr  
B'reng û bihn e ziv û zêr.

Ala qurdan ser be ser  
Sor û gewr e qesq û zer.  
*D<sup>r</sup>. Zamiran A. Bedir-Xan*

## FERHENGQ

( Mèvanxane )

Xaniyê qo mèvan û rêwîyan bi pere dihewinin. Weq odayên gundên qurdmançî. Lê bi vê ferka qo odayên me herwe ne, mèvanxane bi pere ne. bi frensîzî ( Otêl ) dibêjin.

( Vêsihandin )

Rahet qirin. Xwe vêsîhandin, xwe rahat qirin e.

( Belg )

Ji belgên daran pève ji cil û girêdanê re jî têt gotin.

( Quta-qirin )

Xelas qirin, Kedandin. Me darsa xwe quta qir. Darsa ma quta bû.

( Agah )

Xeberdar, serwestî. Ez agah bûm, ez xeberdar bûm.

( Xeberdox )

Ewê qo bi nav û navê çendeqên din, ber hemîyan ve dibêje. Xeberdoxî : xeberdox-bûn e.

## ELFABÊYA QURDÎ

8

Ji sebebên bingehî pève qo yeq bi yeq hatine raveqirin , ber vê yeqê jî me nîşan-qirina (ج) ê bi (K) û ya (A) ê bi (Q) çê tir û rastir ditin .

C , Ç — Di destê me de (C) û (Ç) mane . Me ev jî bona nîşanqirina dengên (ع) û (ع) hilanî bûn .

Gora eslê van herfan dengê (ع) jî (ع) bê-tir bi (c) dihatnîşanqirin . Herweqî di latîniya qevn , di babilîsqa şêsa de , qo diqet pêsiya ( e , i , y , æ . œ ) dengê (ع) a me dida , mîna dengê (z) ya elmanî , weqî niho di pirsên jêrin de : (Ceres, Cicero, centum, circus, Cyrus, Cæsar, coetus, caremonia)

Digel vê hindê me ev herf jî pêsiya xwe ve jir , dengê wê ê qevn da alî û em di warê kebaleyê de man . Ji ber qo kebale li destûra me a pêsin çêtir dihat û jî bona feda qirina wê destûrê çî fêde çî qoteqî hebû .

Di zmanê de nisbeta wan jî hema yeq e .

$C \frac{102}{33789}$        $Ç \frac{103}{33798}$  .

Di encamê de me dengê (ع) bi (c) û yê (ع) bi (ç) nîşan qirin

Li hire dixwazim tişteqî di çavên xwendevanan re biqim .

Ew dengê qo di elfabêya erebî de bi (ع) tete nîşan qirin di hin dewerên Qurdistanê û di pirsinan de ne weq dengê xwe ê nas lê bi awaqî din têt bilêv qirin. Bi awaqî welê qo ser dengê (z) ya elmanî diçe .

### DENGÛR

Herweqî me berê jî goti bû dengdêrên qurdî di drêj an qin bûna degên xwe de serseqinî ne. Yanî dengdêreq drêj tucaran qin nabe û ya qin drêj .

Di yûnanîya qevn de jî dengdêr holê bûn, dengdêreq geh qin geh drêj ne dihat xwendin. Tinê di yûvanîya qevn de dengdêrinen navîn jî hebûn qo di zmanê me de ninin. (dûmabîq heye)

*Cêladet Ali BedirXan*

## MEMÊ-ALAN

Le roi a eu encore une fois recours à son grand père ( Nerîman ) qui entra et sans hésiter chez le monstre et commença à le caresser. Celui-ci se laissa faire et tout d'un coup devint un cheval domestique.

On le nomma ( Bozê-rewan ) et ( Nerîman ) raconta à son petit fils ce qu'il avait vu dans les livres à son sujet. (Bozê-Bewan) était le cheval destiné à parcourir les plus grandes distances dans le plus court laps de temps. Il pouvait faire le tour du monde dans quelques jours.

( Memê-Alan ) le monta et parcourut la ville parmi les applaudissements de ses sujets.

Le roi des ( Alan ) fit venir tous les célèbres selliers du pays, il mit à leur disposition tout le trésor royal, et leur ordonna de faire une selle modèle pour ( Bozê-rewan ) « et lui firent une selle que pendant le jour éclipsait le soleil et pendant la nuit la lune »

## DEUXIÈME EPISODE

La rencontre de ( Zîn ) avec ( Nem )

Les trois filles du roi des fées survolèrent le fleuve de ( Cizîr ) et se perchèrent sur les murs de ( Burca-Beleq ) de là elles glissèrent au boudoir de ( Zîn ) où la jeune princesse dormait tranquillement.

Elles prononcèrent le nom de ( Singav ) soufflèrent sur ( Zîn ) et lui jettèrent un mouchoir sur les yeux. Tout d'un coup la respiration cessa ( Zîn ), elle devint immobile comme une morte.

La soeur aînée appela une suite de fées qui se chargèrent du lit de ( Zîn ) et l'enlevèrent

A l'arrivée au palais de ( Mem ) on le trouva dans le même état d'immobilité que ( Zîn ). On posa le lit de ( Zîn ) à côté de celui de ( Mem ). On découvrit le visage de ( Zîn ) et les trois soeurs se perchèrent sur les bords des fenêtres et contemplèrent les deux beautés.

Elles attendirent un peu, voyant qu'ils ne bougeaient pas, elles leurs soufflèrent de nouveau

( Mem ) fut le premier à ouvrir ses yeux,

il se dressa dans son lit sur ses genoux, ne savait comment expliquer la présence d'un autre lit auprès du sien. Il se leva, examina, porte et fenêtres, tout était bien clos, rien à soupçonner de ce côté. Il se mit de nouveau dans son lit, il tira la couverture sur sa tête et essaya de dormir, puisque ce qu'il voyait ne pouvait être qu'une vision. Mais le sommeil ne venait pas.

Il se leva de nouveau et s'approcha du lit et enleva un bout de la couverture. Sa surprise fut plus grande qu'auparavant. Une jeune fille qu'on pouvait prendre pour morte reposait dans le lit.

( Mem ) retourna à son lit et pria le bon Dieu en disant : « O tout puissant ! mes années n'ont commencé de marcher vers le chiffre quatorze que depuis quelques jours. Même les mouches mâles et femelles n'ont pas encore choisi les pans de mon manteau pour se rencontrer. Aie pitié de moi et comme tu as amené ce lit auprès de moi ramène le d'où il vient ».

( Zîn ) restait toujours immobile. Les trois colombes soufflèrent de nouveau.

( Zîn ) ouvrit les yeux et constata la présence du lit de ( Mem ). Elle aussi ne savait comment expliquer la présence d'un lit dans sa propre chambre. Elle aussi, comme ( Mem ) examina porte et fenêtres. Tout étaient bien fermés et intacts. Elle remarqua aussi que les lanternes étaient doublées, au lieu de deux il y en avait quatre avec celle de ( Mem ).

( Zîn ) pensa à une trahison. Le même jour elle était allée faire une excursion, un jeune homme épris d'elle en soudoyant les gardes s'était faufilé jusque dans son intérieur.

( Zîn ) prise d'effroi et de colère se dressa dans son lit et d'une voix énergique s'adressa à l'étranger : « Lo lo.... qui es-tu ? que cherches-tu ici, dans mon intérieur, je ne me rappelle pas de t'avoir parlé, et invité. Si j'appelle ( Tacîu, Çeqo, Gurgîn ) viendront, te donneront à la bouche dévorante des épées ciselées. Ne sais-tu pas qui je suis et où tu es ? ( à suivre )

Textes et Traductions :

*Yeli Delal*

— 1 —

Yeli delal, delal . . . . .  
 Delal . . . . .  
 De rabe emrê dilê min bi gorî  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

— 2 —

Yeli delal ! suwarê' me suwar bûne  
 Berên xwe dane w'alfiyê rojhîle da  
 Pêşîya selefê suwaran danî bû qûna  
 [ çiyayê Evdilezîz  
 Paşîya selefê suwaran danî bû qûna  
 [ girê di Qewqeb'da  
 Dê xwezî ji xêra Xwedê ra  
 W'ezê bibima bakeqî gulan û rêhanan  
 W'ezê biqetama destê lawîqê xwe da  
 De w'ezê rûjê sê caran banê  
 [ min biketa ber simbelê reş da

— 3 —

Delalo destê min berde  
 Zîqaq û qolanê' gundê me teng û tarî ne  
 Şeytan û avanê' gundê me geleş in.  
 Şeytan û avanê' gundê me geleş in  
 Dîbê hineq ji wan bi hênceta agirî  
 Sibê bîne bi ser halê min û te  
 [ de delalo !

Delal . . . . .  
 De rabe emrê dilê min bi gorî  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

— 4 —

Yeli delal, delalê mala bavê min di xewa  
 [ şêrîn de  
 W'ezê dil naqim ji xewa şêrîn raqim  
 De w' ezê herîin sûqa Diyarbeqra şewiti  
 Ebaqî ji sorê besrawî ji qenarê delalê  
 [ bavê xwe de binim delalo !  
 Serê sibehê pê daqim.

— 5 —

Yeli delal . . . . .  
 Yeli delal, heçî cuhabeq ya xêrê  
 Ji qenarê delalê mala bavê min de ji  
 [ min re bîne

« — Sehet xweş »

« — Ya te jî »

W'ezê bidim ê ciwanîqa ber mehîne  
 We heqe pê kaîl ne be  
 W'ezê bidin ê sed û bîst qîs û zînetê  
 [ malê dinê

De heqe bi wan jî Kaîl nebê  
 Sed û bîst aşên mala bavê min hene  
 W'ezê bidim ê, li binê soniqê; Nîsêbîne  
 Delal . . . . .  
 Emrê dilê min bi gorî  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

**TIRSIM EZ BIMIRIM**

Tirsim ez bimirim dilo heyran  
 Li vê paîzê delalo  
 Li vê paîzê.

Tirba min çêqin dilo heyran  
 Li bîniya gûzê delalo  
 Li bîniya gûzê.

W'ezê ramûsim dilo heyran  
 Sê bisqê' di Kîzê hoyo  
 Sê bisqê' di Kîzê delalo  
 Sê bisqê' di Kîzê.

Tirsim ez bimirim dilo heyran  
 Li vê buharê hoyo !  
 Li vê buharê.

Tirba min çêqin dilo heyran  
 Li bîniya darê hoyo  
 Li bîniya darê delalo  
 Li bîniya darê.

Ezê ramûsim dilo heyran  
 Sê bisqê' yarê hoyo  
 Sê bisqê' yarê delalo !  
 Sê bisqê' yarê.

*O Mon Beau*

— 1 —

Yeli delal . . . . .  
 Delal . . . . .  
 O lève toi, que la vie de mon cœur te soit  
 [ un tombeau  
 Mon cœur n'a pas de patience sans toi . . .

— 2 —

Yeli delal! Nos cavaliers sont en selle  
 Ils se dirigèrent vers l'est  
 Les détachements de l'avant bivouaquèrent  
 [ au pied du mont Abdoul—Aziz  
 L'arrière des détachements avaient bivou-  
 [ aqués au pied de la crête de Kawkab  
 Ah par la grâce de Dieu  
 Que je fusse un bouquet de roses et de basilics  
 Et que je tombe entre les mains de mon  
 [ garçon ( amoureux )  
 O que ma poitrine se brise, trois fois par  
 [ jour devant les moustaches noirs

— 3 —

Mon amour ! laisse moi la main  
 Les mechants et les malins de notre village  
 [ sont nombreux  
 Oui, les méchants et les malins de notre  
 [ village sont nombreux  
 Il est bien possible que quelques uns d'en-  
 [ tre eux , sous prétexte de feu  
 Viennent le matin de bonne heure nous  
 [ surprendre  
 Delal . . . . .  
 O lève toi, que la vie de mon cœur te soit  
 [ un tombeau

— 4 —

Yeli delal, le beau de la maison de mon père  
 [ est dans un doux sommeil  
 Mon cœur ne consent pas que je l'éveille de  
 [ ce doux sommeil  
 Que j'aïlle au marché du Diyarbekir, l'ardent  
 Pour que je lui apporte un aba' semblable  
 [ aux abas rouges de basrawi  
 Pour que je l'en couvre vers le matin.

— 5 —

Yeli delal . . . . .  
 Yeli delal, à tout personne qui apportera une  
 [ bonne nouvelle  
 De la part du beau de la maison de mon père  
 Je lui donnerai la jument et au plus la pouliche  
 S'il n'est pas satisfait avec cela  
 Je lui donnerai les 120 bourses, les plus beaux  
 [ bijoux de ce monde  
 Si encore il ne se contente pas de ceux-ci  
 Il ya les 120 moulins de la maison de mon père  
 Je les lui donnerai, ceux-ci son en aval des  
 [ alluvions, à Noussebine

Delal . . . . .  
 Que la vie de mon cœur te soit un tombeau  
 Mon cœur n'a pas de patience sans toi.

### J'AI PEUR QUE JE MOURRAI

J'ai peur que je mourrai, o cœur en extase !  
 Cet automne, delalo  
 Cet automne.  
 Qu'on prépare ma tombe, o cœur en extase !  
 Sous le noyer, delalo  
 Sous le noyer.  
 Oh, que j'embrasse, o cœur en extase  
 Les trois boucles de la fille hoyo  
 Les trois boucles de la fille, delalo  
 Les trois boucles de la fille.  
 J'ai peur que je mourrai, o cœur en extase !  
 Ce printemps, hoyo  
 Ce printemps delalo !  
 Ce printemps.  
 Qu'on prépare ma tombe, o cœur en extase !  
 Sous l'arbre, hoyo  
 Sous l'arbre, delalo  
 Sous l'arbre.  
 Oh, que j'embrasse, o cœur en extase  
 Les trois boucles de la bien-aimée, hoyo  
 Les trois boucles, delalo  
 Les trois boucles de la bien-aimée.

\*  
\*\*

Il y a là haut deux chansons l'une, un chant d'amour et l'autre un chant de danse. Pour celui-ci, il n'y a besoin d'aucune explication; quant au chant d'amour, c'est un passage de (Delalê—Berîyê) dont nous avons déjà parlé dans le troisième numéro de notre revue; page : 11. Cette chanson qui a beaucoup d'expressions et d'images tout à fait propres à la langue Kurde et étrangères à la langue Française, n'a pu être traduite que d'une manière à exprimer le sens général. Par conséquent il importe de donner quelques explications pour le lecteur étranger.

Le mot (delal) que l'on peut à la rigueur traduire par le mot (beau) n'a pas d'équivalent exacte en français.

Il signifie à la fois, beau, gentil, amoureux etc . . . aussi avons nous préféré le laisser sous sa forme Kurde dans la traduction.

( Que la vie de mon cœur te soit un tombeau ) c'est une expression surtout usitée par les femmes Kurdes envers leurs maris ou

leurs bien-aimés. Elle veut dire que je me sacrifie à toi et à chaque instant de la conversation elles leurs dressent la parole en disant ( ez gorî ), textuellement ( moi ton tombeau ) En somme c'est un terme de politesse comme le ( Kuss die Hand ) de Vienne. On trouve cette expression dans quelques chansons sous la forme ( ez gorîya serê te me ), ( je suis le tombeau de ta tête ).

( Que ma poitrine se brise, trois fois par jour. . . ) veut dire, si je le voyais trois fois par jour pour souffrir devant la splendeur de sa beauté.

( Sous prétexte de chercher du feu ). Dans les villages on a la coutume d'aller le chercher chez les voisins, là où se trouve encore un reste de feu dans la cheminée.

Elle fait des cadeaux à celui qui lui apporterait la bonne nouvelle, parce que le jeune cavalier est parti pour la guerre.

L'expression qui se répète au cours de la chanson ( la maison de mon père ) veut dire plutôt le foyer de mon père et le mot ( mal ) que nous traduisons par maison correspond plutôt au mot anglais ( home )

Ces chansons ont été chantées par la cantatrice Kurde ( Meryem Hanim ) de la tribu ( pêncinaran ) enregistrées par la compagnie ( Odeon ) sous numéro ( 35483 - 35484 )

Nous avons choisi ces chansons et indiqué le numéro du disque pour cette raison que la cantatrice Meryem hanim est parmi les cantatrices celle qui chante et prononce le plus nettement de façon que chaque mot soit bien saisi et entendu. Ceux des lecteurs qui s'y intéressent peuvent bien chercher le dit disque et comparer la chanson chantée avec les paroles dont le texte et la traduction viennent d'être présentées là-dessus.

A propos, nous croyons devoir ajouter, à titre d'éclaircissement, que dans la chanson enregistrée par la plaque, il y a deux mots, en dehors du texte de la chanson, prononcés par la chanteuse et par un auditeur. Le premier est prononcé par un auditeur, ( Sehet xweş ) et signifie : « Bonne Santé », et le second mot est la réponse de la chanteuse ( ya te ji ) « Pareillement. » Chez les Kurdes, lorsque dans une réunion, il est chanté, il est d'habitude d'encourager la personne qui chante par ces mots.

Hereqel Azizan

هرچی خوه ندا وزانا رابونه شو نا کو خد تا ملتی خوه بکن ،  
خدمتا ملتین دن کر نه . زمانی ملتین دن پیشقه بر نه و بی  
خوه شو ننه هشتنه .

گافاژر باقی خوه ققیتم ، دلی من دشوتی ، از گدک  
برخوه دکتم . ژخوه را ، ژمات وزانی خوه را حیفا من دهات .  
هری گوئین باقی من راست بون ، پیشین مه ژمات  
وزمانی خوه را گه ندان . ما ایرو ، ایرو ژی گه نادن .

هری از بالاخوه ددم ، ژچند مزن و زانا بان پیشه ، ت  
کس د هاواری دا هاوار نا که ، نایه هاوارا هاواری . از  
دینم کول وی میدا نا کو هاوار ژملتی کردرا فکر به  
ت کس هسپی خوه ناژوئی . بلی ت کس نا که  
تواد و میدانی .

از ژ مزین خوه دیرسم ، وه چرا آم آینه دنیایی ؟  
ژبونا کو ام بین دیل و خلامین خلکی آن ام ژی وک خلکی  
خندان رومت و ب شرف و ب سری خره بژین . هکه وان  
آم ژبونا خلامی بی آینه ، خوه زی نه آییانا و وارین خوه  
کور بهشتانا .

آپو از ژده هیشی دکم بلا او مزین هال من مگرن . ما  
هاوار نه ژبونا هاوار و گازی بی به . از ژی درو پلین  
هاواری دا هاوار دکم .

آپو ، ته جار کی د بند کی دا د گوت : « کرد ژهف  
جدا دلو پین بارانی نه . جهی جهی تین دافر تاندن . کو  
گهانه هف دین لهی ، لهیکه بوش ، ت کس ، ت تشتل  
یروان نکاره بسکته ، فلانا و لاتی مه درابونا ثی لهی بی دا به . »  
بلی آپو ، او دلو پین بارانی امن ، ام کردین بچوک . دثیت  
مزین مه ، مه ب دل وهشی کردمانجی ب خوه دی بکن دا کو  
ام بگن هف و بین اولهیا کو مه بفلتینه و بگهینه مرازی مه .  
پاشی از تین دستین ته آپی من ئی دلال .

حسجه : ۲۸ تبخ ۱۹۳۲

و جبری محمدی ااشا

صاحب الامتياز والمدیر المسئول

الامير جلال الدين عالي پير خان

## هاوارک

ژخوي بي هاواری ، آبي من ئی دلال  
جلادت عالی بدرخان را

آپو! ...

من چند خبر ژبونا هاواری نفيسانده . ژ آبي خوه  
هيئي دكم ب چاڤكي قنج ل وان ميزه بکه .  
از ياك ژوان كردين پچوكم كوب شف روژان ،  
ب روژ شقان دژميرن و د دلين خوه ده ديژن : گلو هاوارا  
مه كوژان روژي ئی بي .  
روژين پوستي بي مه ناسن . ديوان روژان دا أم

ده كه ن دادو فغانی . اگر له هيكه وه به سه ريئه خواری  
كومه ليكي مه حبوب وزه ردا يان ده يان گوت : له شكري !!  
اگر اتو حوزده كه ی له خوشيان قه بول نا كه ی تاليان ، بگړه  
روه كه تولان ده گه ل خيزانيكي تاريان ، هه روه سه ري هه  
ريرو هه رير به گيان ، بکه زه وق و صفای اوان زرديان .  
دينه وه له كولي قه ساري ، بسك به ردانی ، خه نه لی نانی ،  
چاواره ش كيردنی ، ده گه ل كانيان ، عاره قه كي  
تنو كه به تنو كه ددچور بته وه له گاهی شاه كه زيان . . . .

اورو كه شايك ده گه ري له سه ري ميدانی . تيدايه  
عيشي سليان بگي ده گه ل ميره مه دبانی ، اگر شيره كي  
بكري به پنج سه د زيري ، له پيش را بده ی له سنگي  
اوان زه ردیان . له بهر دليمن جه زمه چي نون كار نا كاله  
به ر علودو مه چيدي اوان طاقه شايان ، امن له پاش آغی  
خوم سوار نام له چي موعه ننه كان ، ده بهر پشتي خوم رانا  
كه م چي خه نيجه ران ، هه ل ناگرم چي ناصرانيان ،  
هه ل ده گرم كه شكوليكي ده ر ویشان ، پوستاليكي  
حاجيان ، ده په ريئه وه له بهري استريان ، ده چمه وه ناو  
قومه گه ليكي له وان داسنيان . او رو كه داده صبحيني  
چي موده ت نينه لو اوي آغای ، اوه تانی به تني مابته وه له  
وولاتي غر بيبيان ، ونايسته وه سه راو مولك و ده وله تان ،  
هه تا ابدو ا بهل ابديان . . . .  
هقذري صوري

چاقنير باوي دكن .

روژا كو هاواری ژ پوستي دستينم ، دكم بن پاشيلاخوه  
ونو يرم زوزو فكم . ژير كو كيڤا ديتناوي ژخوه ژي  
ددخسم . هيدي هيدي پشتاوي فدم ل چرم وي دنيرم ،  
ل تيده خستين وي آگاه دم وپاشي دكشم ناف  
رو پلين وي .

هاوار كانی يکه زلاله ، از مرڤكي تنم ، پيان پيان  
ژي قدخوم ، آگري دلي خوه بي قد كژبنم .  
آپوت نراني هاوار ب مه چقاس خوشه ، چقاس دلال  
وهيايه . ت زانی چرا آپو ؟ ژلورا كو آف سي چارسالن  
از د دبستانا بيانيان ده دخوينم ، هين از ب خوه نه حسيا  
بوم ، لي آف هاوارا دلشوات ازدين گرم . شف وروژ  
دخوينم ، بندين وي ژير دكم وديسان ژي تير نام .

از وهالين خوه أم ناف هقدا سثيورن . بلي هرچي كو  
ب زماني مه هاته نفيساندن ژمه راهيساني به ، خونداوي  
ب كيڤه . كومه اوجار كي خوه ند ئيدي ژ بيرامه ناچه .  
ما ژبونا هر كسي ژي نه وسانه . هري زماني هر كسي  
ژيرا شيرين وهيساني به . ژلورا هر كس ب زماني خوه  
دخوبنه ودفقيسيته . تني أم كرد د دبستانين خلکي ب  
زماني خلکي دخوينم . ما چرا ژبونا چيلي بين كردان  
ژي دبستانين جه چيناكن كوام تيداب زماني خودبخوينم .  
ت زاني آپو من چه كرم . سرڤي يكي از را بوم ، چوم  
جه باڤي خوه ومن ژيرا گوت :

— باڤوت چرامن دشيني دبستانا بيانيان . ديوان دبستانان  
دا زماني هاواری نينه . او زماني كو زماني منه ، زماني  
كردمانجي به .

باقي من هنك سكني ، سه ري خوه كر برخوه ، مادي  
وي گهيري ، ب دنگكي گران لي زيز ، ل من  
فكراندو گوت :

— لاوو خبراهه به . دقيت كوت د بستانين كردان دا  
بخويني . لي صد حيف ومخابن دبستانين كردان هبژ نه هاتنه  
بي . بلي ، د چاقين ته دخوينم ت دخوازي ژمن بهرسي ،  
(« ما چرا حتما نه دبستانين مه چينكرنه » چينكرنه ، ژير كو



## ادبياتي ڪوردي ۳

## از ڪورپيا بانگي ته مه

هاوار هاوري ڪورده ده نڪوو ڪاڙي ولاته  
مزگي في خوناسي نه هاتين به دهنگي هاوار  
ڪي ٿو ڪور پير و جووان

هاوار هاته چي پايان دهشت و گوندي له رزان  
بانگي آزادي ڪوردان يك بووني خوشي دلان  
که وته ناو مال و خيزان

هردهم به ده مي هاوار پيڪ ده ڪوششو هاوار  
هوشير ده بنا ڪوردان لاده بان شينسا ولات  
از ڪورپيا بانگي ته مه

آڪره: ۲۸ حزينان ۱۹۳۲

ماموسنا

و دست دکاته داناني ام هه لبهسته جوانو شيرينه ي خواره وه:  
«له وي ده ورجم ده نوري هدا ت اوي زماني، له وي  
زمانم ده نوري هدا ت ده وري قباد خاني، له ده وري قباد  
خام ده نوري ده نوري هدا ت ده وري خان سلجاني، له ده  
وري خان سلجاني ده نوري هدا ت ده وري جم جهه سلطاني، له  
ده وري جم جهه سلطاني ده نوري هدا ت ده وري شاهي  
نوشرواني. ايڪم نه ديت و ڪو ميري هرير و هرير به گيان،  
له ديواني حيزه روميان هه ابستي به گراني. اورو ڪه داده  
صبحه يني، چي مودهت نينه لو اوي آغاي، اوه تاني به ته  
ني ما يسته وه له وولاتي غريبيسان به بي خوه داني  
او رو ڪه سهري من ده هيشي، دلي من قهد هادي ناي  
له به رگر يان، اگر امن روژم لي هه لاتو له هه موقه ده مو  
هه فت شاران، ده داتن له گه لي آميدي له گه لي سولاتي،  
ده داتن له سهري هرير و هرير به گيان، ده داتن له  
چه مي سوره دي. له من خلميه به ڪولونڪي سيوي و هناري  
و اوان ميراته دارهه رميان هموع، له سهه حري، به ياني  
ڪومه ايڪي بلبلان، ايڪه شالوران، به چر بيڪي له ناودا

له وانه ي سه ره وه به ته واوه تي ده رده ڪه ويت ڪه  
ادبياتي ڪوردي ادبياتيڪي آري به و بلند هه وه رزه  
وه و ڪو ادبياتي زميناني آري قابله يو به رزبو نه  
وه و سه ر ڪه وتن. وهر چه نده مدنيت له ڪورد ستاندا  
يلاو بيته وه اوه نده ادبياتي ڪوردي سه رده ڪه ويت  
و به رزه بيت. يانه ختي بنورين له وه هه زاران چيرو ڪانه  
که ڪورده ڪان هه ليان به ستوه و دايان ناوه، به ته واوه  
تي بيان خونينه وه، له وده مه ده زانين ڪه هيچ فرقيڪ نيه  
له. يني ادبياتي ايمه و ادبياتي زميناتيڪي روزاوا و له وه ده  
مه بلنداي ادبياتمان ده سه ملينين.

ايا هه لبهستي چيرو ڪي (مهم و زين) چي فرقيڪي هه به  
له گه ل هه لبهستي چيرو ڪي يوناني ڪون (ايلادا) !!  
ايا اوه لبهستاني چيرو ڪي به ڪه ايمرو له اورو پا ديئينين  
چي فرقيڪي هه به له گه ل هه لبهستي چيرو ڪي ايمرو  
که له ڪورد ستاندا يلاو بوته وه !!

اوه نده ي پي ناويت، هه نه ختي بنورين له چيرو ڪي  
خواره وه و سرنجي لي بدنه او ده مه بلنداي ادبياتي خومان  
تي ده گه بن.

ام هه لبهستي چيرو ڪي به ي خواره وه له ده شتي حريري  
ووژ هه لاتي (هه و لير) — ڪه به شي ناوه رستي به له  
سوران — بلاو بوته وه. وله و ناوه به (شعري له شڪري)  
به ناو بانگه. چون ڪه دانه ره ڪه ي ناوي (له شڪري)  
بوته. له چيرو ڪه داباسي (مير سلجاني بگي حرير) ده ڪات  
که آخره مين پاشاي امارتي حرير بوته. ام قارمانه چه ند  
ساليڪ به، رام بهر تور ڪان راده وه ستيت وه را ده ڪات، له  
پاشان ده شڪيت و ده گبريت وده بر بت بو (استامول)  
له گه ل (له شڪري) ي پياوي. مير سلجاني بگ  
خوشيڪي زور جواني ده بيت ڪه ناوي (خانزاده خاتون)  
ده بيت. له شڪري چه زي لي ده ڪات. انجا شوقي سه  
ره، خوبي له لاييڪه وه و گير په ي چه زلي ڪيردين  
له لاييڪي دپڪه وه اگر له ديلي بهر ده ادت

داوته

ژ زوزانان هات قلنك  
خبرآنی ژ خوه بینگ  
دبی ورن داوته  
\*

داوته خوهش داوته  
ژ کردان ره رومته  
داوت شره شاهینت  
\*

بی خوه بی مان گندکلات  
گازی دکه اف ولات  
دبی ورن هواره  
\*

بی کری مان کچ و بوک  
د ریلان ده باو بوک  
بی بلگ مانه دار دقی  
\*

نافو دکن کردانی  
نه هلشن میرانی  
کردون رابن داوته  
\*

هری لاوو داوته  
داوته خوهش داوته  
بوکاته ژی کردستان  
\*

کزی بن وی دلان  
چه نرموک وشپالرن  
برمقی مده وان  
\*

دنگی آتی چه زیزه  
نوال ژیره عزیزه  
ولات! ولات! ولاتو  
\*

ژ زوزانان هات قلنك  
خبرآنی ژ خوه بینگ  
دبی ورن هواره

مهدت عالی بررخان

ژ خانی را

هنر خبرکی کردوارینه  
دکی رومی احمد خانی

خانی تو بسه بکه هواری  
راه تو بله ژوی مزاری  
بفکر تو بین دیاری زبی  
صوره وکی کل همی ژخوبنی  
دومان وگری ژخانمانان  
چاوان دگهته آسمانان  
فریاد و فغنی دخت و بوکان  
زاری و هواری فان پچوکان  
جورا ولد حرامی جنکیز  
زه رزهشته نه باغ نه پاریز  
ویران کر نه کلات و بازار  
تالان کر نه مزارو بازار  
جیکی زری و دلال ورنندان  
لی عره هرچ و بوم و کندان

لی

بی هیقی مبه بنیر توجارک  
کردین بشقاق بین مبارک  
أبروقه نمایه وان نفاقک  
پیکشه همی بونه أفاقک  
طاوسی و عیسوی مسلمان  
ژسیواس حتما بکپهته لوران  
یک جان و دل و یک هواردن  
بالجمله لگازی بی بکارن  
شش ساله همی بچوین دبازن  
آزادی و خوه بچوه بی دخوازن  
یادی بمرین و یا بژین ۲۰  
قت لائقه کرد بینته اسیر

بایزید: ۱۵ هزاران ۱۹۳۲

همین زردست

هشمارنامه

هاوار کردنو! نکن نکن  
رنجانیار ژبیر نکن  
شف وروژی هون خونکن  
میرانیا خوهون زیده کن

هاوار کردنو نکن نکن  
یکیتیاخو وندا نکن  
ناموساخو پایمال نکن

هاوار کردنو آمه پرن  
چاقین مه کسی نابرن  
ناخبین پرخرانن  
أم ب قانونان نزانن

هاوار کردنو ب لزیبن  
زاروکی خو بچوبینن  
ب قانونان یزاینن  
بلگی دوزامه هلینن

هاوار کردنو نکن نکن  
یزمانی نیار گال گال نکن  
زمانی کردان هون فره کن  
کچ و بوکان پایمال نکن

\*\*\*

هری لی هری لی هری لی زری یه  
ازی نخوهشم نخوهشیل تایی یو  
براجیکی من داینن ل زوزانی میر گه میری  
ل بر یلکیا برنی یو  
بلکی کچو بوکی ایلارنگین بین هرن  
سیرانگاهو  
چلنك گورامن دستنی خوبده  
بنسری من عقداالی خدی بو  
دوایی دوایی فلک کمال شویتی خایینی مرانی  
دشتا سروچی: ۱۴ تباخ ۱۹۳۲

لاوی فندی

د پي ره ازو خودی یی دکانی ام کتن  
بازارا کاغذا هاواری . ژ خوه ژبوننا  
کر پنا کاغذا هاواری هاتبوم بیروتی .

من شغلی خوه کتا کر بو . کاغذ ب دپسني  
بهاتار یکرن . ننی کاغذا چرمی من بخوه ره پیرا .  
خورتی من چرمی هاواری کر پشاخوه ومه داری .

ام چو بون دکانکه دن . من ب خو یی یی  
دکانی ره خبر ددا . کردمانجی من د کر چککی  
ده ل سر نشکان رونشتی ل من دنیرت ود کنی .  
من ژ ی ب دقکنکی ژیره گوت :

— خورتو ، ته خیره ، چره دکنی ؟

— خیره از خلام ، ژ کیفا خوه دکنم ، ژ کیفا  
کردمانجی به ، ژ کیفا کردمانجیا ته دکنم . بلی  
ل بیروتی کردمانج زهفن . ژ صبی حتا ایقاری ام  
ب کردمانجی خبر ددن . لی گاقاژ دقنی ته دپهزم  
هیژ بیتر کیفا من ژیره تی . آخ از خلام ت نزانن  
کردمانجی چقاس شبرینه .

— ناهری ، کردمانجی کنگی بو به شیرین ؟

— ب سری ته ئی عزیزم ، ت زمان وک  
کردمانجی نه شیرینه . از ب ترکی رند نزانم ، لی  
من او گلکی بهستیه . ل عراقی من عربی و انگلیزی گلک  
بهستنه . ل سوری یی هر روز عربی و فرانسوی دپهزم ،  
ازقان داتینم برهف و دینم کوشیرانیا زمانن کردمانجی  
د . توان ددینه ، لی چه فیده اوب کردمانجی نزانن  
— مابزایانا چه دبو ؟

— هنگی ژ کردمانجی یی پیشه ب ت زمانان

خبر نه ددان . . . . . مهورت عالی بدرخان

هلکړه ، بیه میغانخانې . من دگل ل بکی کر :

— خورتو ، هکله قالایی ب من رده وره . خورتی  
کو من دگل لی کر بو ژ هقالین خوه وقتیا داپی من  
حتا کو ام گهشتن : کانکی من دیند کر ل دکانی  
من جغار یک داوی به دست ب آخافتنی کر .  
— خورتو ، ت خلکی کو دری یی ؟

— از خلام ، از بدلیسی مه

لی زمانی وی نه زاری خلکی بدلیسی بو ، من گوت :

— ماچره دپیژی کو بدلیسی یی ، ژ زمانن ته  
کفشه گوت ژ درامیردینی یی

— بلی ، خبراته راسته ، لی از اصلي خوه دپیژم ،

از بدلیسی مه لی د مهاجری یی ده در کتسه و د  
دورا میردینی ده ب خوه دی بومه ، برقی بکی . . .

— کنگی هاننې بیروتی ؟

— اف بوسالک وهن ، ما از خلام ت ژ کوینی ؟

— دقیت ت ژ ی ، ژانی من بزانی

— گورا زمانن ته ، ت ژ ی ولاتی یوطانی ،

لی د قی بازاری ده ، ت بو طلی نینن

پیلکی رکنی ، کفش بو کو دفکری و د پیرا  
خوه ده ل تشکی دگرها . د پی ره رابوسر خوه ،  
هات دستی من و گوت :

— از خلام ، ل سوچی من منیره ، من آنها

ت ناس کری . ژ خوه من بهستبو کو یک ژوه

ل بیروتی به ، من دل دکر از هرم زیارتاوی لی


من فدی دکر ، خدی ژ من ره ل هف آنی

— بلی یک ژ مه لی بیروتی به ، لی اونه ازم ،

او برای منه ، ازل شای رودنم

# هاوار

بروی



کوفارا کردی \* مجله کردیته

## سیرانی یا زماننی کردمانجی

ره دهر که ، حتا پستی سرانی ، پاشی ، دلو پین لهوینی ،  
 برب بجرى فه ، ژ هف د کفن و بلاف دبن .  
 خلك دبرمن ره دهورین . پیرو جوان ، ژن  
 ومیر ، دولند و بلنگاز ؛ ژ هر ریری ، ژ هر  
 رانی ، ژ هر نژاد و ملتى . من او ژ بلگک ، دیم و  
 سرچاڤین وان ناس د کون .  
 جارنان شفقه کی گور و یجن ب شاشکه  
 کی کسک د کتن هف ، کمکی صور د سر  
 چار کی ره دقلقی . ژنکانه ز کزن ، وک دنکی ،  
 کیردبو و دکت پشتا کچککه نارین و بژنراف .  
 آفه ، پیخواساک ، کاشو بی حمدی خوه دستین  
 خوه د سرهیت و ناقکین فان پیرک و کچکان ره  
 دگرینه . من جانی خوه قیسپاندبو . رابوم ، کتم  
 ناف وی لهی یی . ژ نشکی فه ، ژ کولانکی چند  
 سری بین ب کم و دستمال ل من در بون .  
 — نه لو ! . هی زویه . . . ماچمان . . . دق  
 ژى برده . حسو دگوت . ناھری . . . گهمده . . .  
 قت نه دهات بیراوان کواژژی ب زماننی وان  
 دزانم ، کواژژی یک ژ وانم .  
 ژخوه ژمن ره زلامک د قیابو کوهومورین من

وکی از گهشم بیروتی روژ چو بو آقاوسی  
 ساعت ژ شقی در باس بو بون .  
 صبه تر ، بری نیفرو ، ژ میخانخانی در کتم ، من  
 دا کوچه و کولانان و گهشم میدانا برجی . دنیا  
 گرم ، باشل ، بهنا مروفت تنگک دبو دچکها . من  
 خوه دا برسها قهوکی ، جانی خوه د قیسپاند .  
 برج میدانکه فره ودر بژکی به . د ناقاوی ده  
 پار یزکی کچک لی سپهی هه به . ب گیان ،  
 بهنون و داران خملاندی به . تیره آفکه کچک  
 دهوره و د کفه ناف بیرمه تنک . اردا بیرمی ژ  
 کفرین شهکری و بنفشگون راخستی به . رنگی آفی  
 تیده و نداد به . بیرم وک ز قییکه بنفشین خویا دکه .  
 ل سری میدانی ، سی کوچه بین مزن — ژ  
 باکر ، ژ روژ هلات و روژ آقا — خلمکی باژیر  
 دتین ولی در ژینن .  
 خاک دناق کوچه یان ده مینا روبران دهر  
 کن . آف سی روبران کوه میداننی ده دگن  
 هف ، دبن لهیکه بوش و خوه ددن بر پار یزی .  
 د برجاغین پار یزی ده پلین لهی یی دشکین ولهی  
 دبه د بزرک د بر راستی و بری دن د برجی پار یزی

# کتبخانا هاواری

ریزاننا الفابی با کردی

هژمار  
۱

غروش سوری

۱۲۶۵۰

۱۰

ب چرمی خملاندی

ب چرمی عادتی

ژبونا درقه دڤیت حتی پوستی ب سربیت خستن

زکوغراف و مطبعتة

ایوبی خانک دلمشوق

حفر جمیع المعادن والصور الملونة واللوحات الخارصیة  
طبع بطانات رادریان بحروف نانرة علی الطراز العربی

ملك الظاهر

دمشق

الطیب

احمد نافذ

اختصاصی بالامراض الداخلیة والزهریة والأطفال

دمشق

عرنوس

الطیب

مختصک

الافتصاصی بالامراض العیون وجرانها

دمشق

صالحیه

## اشتراکات مجموعه هاوار

وفي غير هذه الأقطار

۱۵۰ فرنك

عن سنة واحدة

۹۰ فرنك

عن ستة شهور

۶۰ فرنك

عن اربعة شهور

في سورية و تروكية و العراق و بلاد العجم و بلاد القفقاس

عن سنة واحدة ۵۰۰ غروش سوري - ۱۰۰ فرنك

عن ستة شهور ۳۰۰ غروش سوري - ۶۰ فرنك

عن اربعة شهور ۲۰۰ غروش سوري - ۴۰ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

# هاوار

سال ۱

هزارم ۸

دشمن

دشمن

۱۲ ایلون ۱۹۳۲

السنه ۱

القدر ۸

السنه

السنه

۱۲ ایلون ۱۹۳۲

کوفارا کردی \* مجله کردی

## تبدله خستییین کوفاری

ج ۰ ۴۰ بدرخان	شیرانی یا زمانی کردمانجی
هفتدی صوری	أدیاتی کردی
دکتورک ۰ ۴۰ بدرخان	پیری یا ولات
وجدی جمیل پاشا	هاوارک
هر کول آزیان	ری یا تزه
ج ۰ ۴۰ بدرخان	کردکی کچک
ج ۰ ۴۰ بدرخان	الفابی یا کردی
هر کول آزیان	فرهنگوک

بهمن زردشت	ژخانی را
دکتورک ۰ ۴۰ بدرخان	سترانادلان
ماموسته	ازگور پیا بانگی نه مه
دکتورک ۰ ۴۰ بدرخان	آلا کردان
لاوی فندی	هشیار نامه
ج ۰ ۴۰ بدرخان	داونه
سترانقان	بلی دلال
دیلو کفان	ترسم از بزم

SAL 1  
HEJMAR 9  
in  
30 Ilon 1932

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 9  
VENDREDI  
30 Septembre 1932

Qoyara Qurdî \* Revue Kurde



TOFEQ JI QURDMANCÊN DESTA HESINAN

çapxana tereki

SAM — 1932

# QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

1

## Rêzana Elfabêya Qurdi

Noteyên fîlphabeta Kurdî

Bi çermê xemilandî 12,50 K. S.

Bi çermê adettî 10 K. S.

Ji bona derve divêt hekê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Hafiz*

SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENÉRIENNES ET INFANTILES

Damas

Arnon

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

Damas

Salhi

## PHOTOGRAVURE

### Egoubige Frères

Inscription sur tous les métaux. Gravure colorée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qiriyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûş-sûrî — 100 frenq

Şesmehqî 300 kirûş-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûş-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

Şesmehqî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Şam : Taxa Qurdan



## Welat, Welatîni û Al

Welat erdê bav û qalîqên me ye.

Welat ew der e qo, pêşiyên me li wê rabûne, ji bona avahiya wê xebitîne û li wê mirine.

Welat ew diyar e qo, em tede seqînine û rûjeqê di nav axên wî de bêne veşartin.

Xelqê welateqî, welatîyên hev in. Bori, hal û dawîya wan bi hev re girêdane. Zmanê wan, girêdana wan, her hal û lebtên wan mîna hev in. Pêşiyên wan li rex hevdu rabûn, rûniştin û mirine.

Welatî bi Kencîya hev şa dibin, her xirabîya hev diqevîn. Şin û şahînetan wan yeq in.

Xelqê welateqî brayên hev, pîsmamên hev in.

Hergav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşt, avahî û azahiya welatê xwe dixebitin.

Qam û armanca wan yeq in.

Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe bêperwa dirijênin.

Herê dixebitin qo welatê wan meqevit bin destên mîletên din.

Lê mîletî hene qo welatê wan, bi awaqî, qetiye bin destên neyar û dijminan. Weq welatê mîletê me, Welatê Qurdistanê

Ev mîletên ha ji bona rizgarîya welatê xwe dixebitin.

Xebata wan ev e: Rûjeqê berê biyanîyan ji welatê xwe derînin û mîna mîletên din biserxwe bibin, di nav hev de bi xweşt, û bi Kencî bijîn.

Herqes hej welatê xwe, hej welatîyên xwe diqe.

Hejqirina welêt di dilê me de hevi-

neqe-mezin û bilind e. Em pê xurt, zexm û canfêda ne. Jê re welatîni dibêjin.

Welatîni di hundirê me de agireqî mikedes e. Pêta wî agirî ji me re her tîştên welêt dide hez qirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya deşt, dar û qevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir, xweştir û şerîtir in.

\* \* \*

Her mîlet xweyîyê aleqê ye. Al nîsana mîlet û welêt e.

Tevayîya heyîna mîletan di ala wan de civiyaye.

Al namûs, rûmet û bextê mîletan e.

Zarowên her mîletî ji bona bilindî û bikedrbûna ala xwe, bêperwa xwe didin quştin.

Ala her mîletî jê re beha ye. Di cejn û şahînetan de kesr, seray, xanî û quçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, slavan lê diqin, wê maç diqin, dattînin ser serên xwe.

Alên mîletên biserxwe, di ser qelat û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşqerî de diveqin pêşiyê.

Lê alên mîletên dil, weq ya mîletê me, ji her derê biderqirî, lihevtewandî li ser dilê zarowên wan de hilandî ne.

Mîletên dil dixebitin, xwînên xw dirijênin qo biyanîyan ji welatên xwe bikewirînin û alên xwe li ser qelat û bajarên xwe ji nû ve daçiqînin.

Ala her mîletî bi çend rengan û bî şiqleqî din e.

Ala qurda, ji jor ber bijêr ve, ser hev, sor, sipî û qesq e, di nava wê de roj diçirise.

## Melayê Gulê

Wexteqî li bajarê Hesengêfê belengazê hebû. Jineqê wî jî hebû. Navê jinqê Gulê bû.

Belengaz herûj mileq êzing diani bajêr û difiro, dida bi Kirûseqî, dudowan û rûja xwe pê derbas diqir.

Rûjeqê jî rûjan jina Kêzî û miftî çûne ser avê, qo cilên xwe bişou. Jina belengaz jî çû û ser wan re cilên xwe şustin. Gava jina Kêzî û ya miftî çav li jina belengaz qirin qo ewê cilên xwe di ser wan re dişo, hema rabûn dest bi jinqê û dijnan qirin. Drêj bûne, pora wê vedirûn, jî ber qo ava cilên wê a bikrêj bi ser wan de dihat.

Gula belengaz jî li wan teksîr neqir, û paşê pol poşman cilqên xwe tev qirin û dest bi giri qir, çû mala xwe hal hewalê xwe jî mêrê xwe re got.

Mêriq jî got:

—Hermet ez belengaz im û ew Kazi û miftiyê bajêr in, ma ezê çî biqim, sixêf û lédana te jî wan re ma.

—Nabit, ez li tu cihan rûnanim, yan tu ê bibî mela, yan tu ê min berdî, yeqê jî her duwan jî xwe re bigre.

—Hermet, ez ne bi xwendinê dizanin, ne diqarim li pêşiya du camêran nimêj biqim, ez dê çawan bibim mela. Ez hêvî jî te diqim tu bela xwe jî min veqe, ez qêrî vî îşî nayim.

Qir ne qir bela jinqê jî xwe veniqir. Reben mêriq rabû ser xwe, çû sûqê şaseqe xwe peyda qir û çû ser pira bajêr seqinî. Deftera xwe bi destê xwe regirt.

P.reqeq hat serê pirê, qo belengaz dit jê pirsî:

—Mela tu çî îşî li vir diqî?

—Ez nivîştan çêdîqim, pîreqa qo mêrê wê hej wê neqe ez diqarim biqim qo jê hez biqe.

Divêt zarowên Qurdistanê bixebitin û rûjeqe berê vê rojê hilînin, ber bi ezmanê Qurdistanê ve bilind biqin, li wê bibrûsqinin, welatê xwe ser avahîya xwe a pêşîn vegezin û di bin tava wê re biserxwe û bi qamiranî bijîn.

*CelaDet Ali Bedir - Xan*

Jinqê got: Mela ez di bextê te me, mêrê min hej min naqe, qo tu careqe min biqî hema tu çî bixwazî, ez jî te re seqinî me.

Sitileq mast jî bi jinqê re heye. Melê got jinqê:

—Vê sitila mêt û mêtîdîqî bide min ezê nivîşteqe te çêqim qo mêriq hej te biqe.

Jinqê rabû, mast û mecîdîq, da melê. Ji xwe rebenê melê nizane tîşteqî binivîstine, piçe qaxez reş qir û li hev tewand da jinqê û jê re got:

—Di nav qeziyê xwe de girêde

Jinqê jî mîna melê jê re got wisa qir.

Ji ba Xwedê mêriq hej jinqê qir, hejqirineqe zor. Xwedê jî melê re lihev anî, heqî qo tê niq melê jê re nivîşteqê çêdîqe, miraza wî tete cih.

Nav bi melê qet, Melayê Gulê holê, Melayê Gulê halo.

Teyreqî haqimê bajêr jî heye, li niq hêqim pir delal e. Rûjeqê teyrê wî winda bû. Çikas pîrs qir ne qir pejna teyrê xwe ne qir.

Rûjeqê hineqan gotin:

—Ya haqim qo ne Melayê Gulê teyrê te derene, êdin tu nema teyr dibînî, lê qo Melayê Gulê li qitêba xwe binihêre, ewê tavil derine, heçqo xwendaqî pir xurt e.

Hêqim du xulam rêqirine pey melê. Bi rê de mela çav li teyrê hêqim diqevê, di nav çavê dareqê de. Mela jî deng naqe heta gihîşt niq hêqim. Slav da hêqim, ewî jî slava wî vegeand, mela rûnişt, hêqim got:

—Mela xelq pir pesnê te dide qo tu xwendaqî pir xurt î, gelo rast e?

—Belê ezbenî

—Mela teyreqî min pir delal hebû, ev cend rûj in winda bûye, min divê tu teyrê min derênî:

—Bi saya Xwedê û ilmê ezê teyrê te derênim.

Careqê mela qitêba xwe veqir, pa Xwedê bide mela ne bê zane nê pê. Ma berê teyr ne diti bû. Li qitêbê nihêrt û jî hêqim re got qo teyrê te li filan derê ye.

Xulam çûn, di wê derê de qo melê gotiye teyrê ditin û anin.

Haqim ecebmayî ma, rabû ji melê re pênc zêr dan.

Melê perê xwe hilanîn, çû mal, gote pîreqa xwe :

—Hermet te ez qirim belaqê qo ez xelas nebim, irû hal hewalê min ev bû li ba hêqim, lê hema Xwedê ji min re lihev anî. Êdin bela xwe ji min veqe, ezê ji vê melatiyê bigerim, melatiya bi derewan naçe serî.

—Ket ez kebûl naqim, tu ê mela bibi Mela rehen ma ser halê xwe.

Paş çend rûjan xişrên qeça hêqim winda bûn. Dîsan hêqim şand pey melê da qo xişrên qeça wî derêne.

Bivê nevê mela rabû, bi dileqî qul rahişt qitêba xwe û çû derîzana hêqim.

Hêqim digel jin û qeça xwe li eywanê rûniştiye. Mela slav li wan qir û qitêba xwe veqir. Lê hal ew hale, mela tu tiştî nizane. Li qeçiqê dinihêre, dibine qo Kuleq di derpêyê qeçiqê de heye. Mela ji li Kulê şakiz dimine. Dawî, hêqim got :

—Mela tu çima wilo difiqirî û cuhab nadî ?

—Ezbenî, çikas ez li qitêbê dinihêrim fiqrê min li ser kulê ye.

Ser vê gotinê qeçiq rabû ser xwe û got :

—Nûqa hat bîra min, xişrên min di filan Kulê de ne.

Dîsan Xwedê ji melê re li hev anî. Hêqim deh zêr dane melê û qir berdevqê xwe.

Çend rûj borin, sebeteqe hêqim tijî pere winda bû. Dîsan şandin pey melê. Hêqim jê re got :

—Mela hal, hewal ev e, tu çî dibêji

—Ezbenî, min ji te divê, çil kaz, çil wekî birinc û çil rûj mihlet, bitifak ezê sebetê derînim .

Tiştên qo melê xwestin, hêqim jê re dan. Melê birinc û Kazên xwe hilanîn û çû mal. Qo xwedê jê re li hev ne anî mela qengê sebetê derêne. Çavê melê li wê bû qo her çil Kazi û birinci bixwe û ji xwe re baz de. Jina xwe re kewittî qir qo Kazeqê şerjêqe, wekiqî birinc têxe ziqê wê û zixureqî ji berde nav û biqe şiv.

Jiniqê mîna melê jê re got wisa qir. Bû êvar, Kaza xwe di nava xwe de danîn dest bi xwarinê qirin. Paş qo Kaza xwe xelas qirin, melê rahişt zixurê qo di

ziqê Kazê de bû, avêt refiqê û got :

—Hermet tu ji bo Xwedê şehde be, yeq ji wan çû.

Dizên sebetê ji çil mirov in. Yeq ji wan tê ber quleqa xaniyê melê dihesisîne gelo mela çî biqit, sebetê derêne.

Ê diz gava gotina melê dibihîze di dilê xwe de dibêje : « mela em nas qirine » û baz dide. Mela bi xwe ji Kazê re dibêje.

Diz diçe hevalên xwe serwest diqe. Du sê rûjan ser hev tîn ber quleqa xênî. Mela bi jina xwe ve Kazê dixwe, zixurî davêje refiqê û dibêje :

—Dudo ji wan çûn . . sisê ji wan çûn . . .

Diz Kail dibin qo mela bi wan hesiyaye, ji tirsaxwe sebetê ditînin niq melê û diqevin bextê melê .

Mela sebetê dibe û diçe niq hêqim. Hêqim sebetê vediqe, dibîne qo Kirûseq ji jê winda ne bûye.

Haqim pir dilxweş bû, rahişt çil zêrî dan melê. Êdin zman ser zmanê melê re ne man, mela bû imamê bajêr .

Rûjçe inê hêqim şand pey melê da qo li pêşiya wan nimêj biqe. Mela çû bihurt hundirê mizgeftê, li ber mihrabê ma seqinî, nezane bang bide ne ji Kamet biqe, ma heyirî, li dora xwe dinihêre nizane çî bêje. Hema carqê got şilb, li devê derî da û baz da. Hêqim û civata xwe çawan ev ditin dan pey melê derqetin derve . Qo paşiya wan ji mizgeftê xelas bû mizgett derxunqî qet.

Weqê mela ev dit bihna xwe da û ji hêqim re got :

—Ezbenî min zanî bû mizgeft biqewe, ji lewre min baz da.

\*\*\*

Haqim rabû xwe avêt ser destên melê û jê re got :

—Li dinyayê tişteq nîne qo tu nizanî, em hemî qoleyên te ne, herçî ji bixwazi ez ji te re seqinî me

Melê got :

—Ezbenî ezê tişteqî ji te bixwazim, min divê qo tu Kazi û miftiyê bajêr bispêrî min. Ji ber qo pir nekenc û fesad in.

Haqim rabû her du spartine melê. Melê ji bi vî qarî heyfa jina xwe ji Kazi û ji miftî hilanî.

*Cemilê-Haco*

## Dilqoçerê !!

Cavên te xweş heşin in  
Çima bi xem bi şin in  
Dengê te nerm zelal e  
Biqen' bi bêj' menale!  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

Delala min tu naz î  
Dengsîrîn î bi saz î  
Bi çavên te dinê geş  
Sînga te gul, gulîreş.  
Rêl ez im, tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

Tu aheng î b'lûr î  
Tu alûs î bi nûr î  
Ez dil im tu germî yî  
Xurt ez im, tu nermî yî.  
Rêl ez im, tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

Ez Gulan im tn gul î  
Tu ahengê bilbil î  
Ez birin im, tu derman  
Ez Kurban im ez heyran.  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

Deşta dil de asq tu î  
Hişê min re basq tu î  
Çavên te xweş heşin in  
Çima bi xem bi şin in?  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

Salên te hê ne hejde  
Di refêspehiyan de  
Dotmîr î, bûyî sereq  
Xulamê te me bê seq.  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

Tu dotmîr î û mîr î  
Şehyane yî bi jîr î  
Dengê te nerm zelal e  
Biqen' bibej' menale!  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilqoçerê b'nav û deng.

*Dr. Zamiran A. Bedir-Xan*

## Qurdistan

Êvar e  
Pir sar e  
Çol e, gir û çîyan bê dar in  
Tarî ye  
Zarî ye  
Bê te dil û can birîndar in.

Welat e  
Şewat e  
Hêstirên min diqevî; çem e,  
Dilê min  
Dilê min  
Êdî were delalê !!! dem e.

Mamiz î  
Bi saz î  
Qaniya stêr bû dilê min, mir  
Hejqirin  
Tum birin  
Xwelî bûn ne ma pêt û agir.

Adar e  
Hawar e  
Camêr tev dimeşin, bê Al in,  
Stran û deng  
Gul bê reng  
D'mehdiqan de zaro dinal in.

Gir û ber  
Krên û şer  
Top û tîfing diricifin .. Ah!!  
Ax û dar  
Gî Xwîndar  
Ne mîreq ma ne siltan û şah!

Qel û gund  
Cihên qund  
Jin û qeç burc û kesr gî  
[ qêmbexf

Li gorinan  
Berazan  
Bûqjî mir, ne ma serîr û  
[ text .

Talî reş  
Bist û şeş  
Lê dil ne mir ne bû ax û rîjî  
Hêstir reş  
Sing, dil geş  
Canên me gî camêrî tîjî.

*Dr. Zamiran Alî Bedir-Xan*

## Mîr û Mar

Mîreq ye Cizîrê geleş xurt  
û dewlemend bû. Êxiste  
serê xwe ji xelqê xwe re  
kenciqê biqe.

Zencîreq da avêtin ser  
pira bajêr, di ser nivê wê  
re ji zengileqî fêris da  
hilavistin.

Mîr banqer di nav welêt  
de gerandin. Ewê qo biqare  
zengilî bibejîne, mîr mi-  
raza wî dê bine cih.

Rûjqê Xelqê Cizîrê bi  
rimêna zengilî rabûn, ber  
bi pirê ve çûn qo bizanin  
qê zengilî hejandiye.

Çi dîtin, Şehmareq, xwe  
pêçandiye zengilî bi qerb û  
kehrê zingilî dihejtne.

Xelq lê qom bûn û dan  
ber kiran, da qo mar xwe  
jê veqe. Fêde ne qir, mar  
zengilî bêtir dihejand.

Xeber gihandine mîr. Mîr  
wezîrên xwe hinartin pey  
qo mar here balê. Mar da  
dûv wezîran û çû xafa mîr.  
Serê xwe dahiland qir erdê  
û paşê hilda, devê xwe ber  
bi ezmanî ve veqir.

Mîr ji wezîren xwe pir-  
sîyar qir, gelo daxwaza  
mêr çî ye.

Di qoma wezîran de we-  
zîreqî qarnas û şehraza  
hebû, got :

—Ezbenî, mar qiriye tiş-  
teqî daxwe, niqari bû, nê-  
çîra wî digewriya wî de maye.

Li devê mîr fedqirin,  
strowên marqî xuya diqir.  
Xerateq anîn, stro birin û  
mar filitandin. Mar da rê û çû.

Sibetir mar di hewşa bu-  
rcê de xuya qir. Bi devê xwe  
ve hûşîyeqî zêrin hildigirt.

# TOFEQ JI QURDMANCÊN DESTA HESINAN



## Groupe des Kurdes de la vallée de Hesinan

La vallée de Hesinan fait partie de Botan et porte le nom de la tribu botanienne qui l'habitait, les Hesinan, ce qui signifie « les fers ».

Le pays de Botan, pays très montagneux, possède quelques vallées qui lui fournissent tout espèce de denrées. La vallée de Hesinan, située dans la partie occidentale du pays, se prolonge de l'ouest de Djézire vers le sud et contient le mont « Kara-Tschogh ». A la suite de la dernière délimitation de la frontière Turquo-Syrienne elle a été rattachée à la Syrie.

Les personnes qu'on voit sur cette photographie sont des Kurdes de ( Dešta-Hesinan ) formant une ronde pour la danse, et qui ont cessé de danser pendant la prise de vue. Dans le groupe on voit quelques femmes. D'ailleurs dans ces danses de ronde les groupes sont mixtes, un homme et une femme.

Tuqest niqari bû mana vè ecebê bizane

Zmanê mêr geriya û ji mîr re got:  
—Mîrê min meheyîre, ev hûşiyê zêrin ji mêweqê tê qo di nav rezên te de şîr dibe. Di wextê pêşiyên te de ew mêwê hêrgav holê hûşiyên zêrin didan. Ji her qo pêşiyên te bi xelqê xwe ve adil û

mibrivan bûn, zilma xelqî ne diqirin.

Mîr ji mêr pîrsî :

—Heqe ez jî bi xelqê xwe adil bibim ew mêwê ji min re jî hûşiyên zêrin nade

Mar serê xwe hêjand û got :

—No, ezbenî ew edaleta qo ji bona hûşiyên zêrin tête çêqirin tu hûşiyên nayîne

*Qocerê Botan*

## Ji mirovên qêm re

— Bi Zerdeşt ve —

Jiyîn qaniyeqe xwestinê ye. Lê, di wan doran de qo mirovên qêm digel paqijan vedixun, qanî bijehr in.

Ez hej her tîstên paqij diqim, lê niqarim devê mirovên qêm û tihniya peyayên pis bibînim.

Wan bi qêmaytîyên xwe ava zelal jehradar qir.

Gava wan navê xeyalên xwe ên pis qirin xwesteq û armanc axaftin ji jehradar bû.

Weqê wan dilên xwe ên şil û şeylo didin ser agirî, agir bêqêf dibe, diqeve reşiyê û dû diqe.

Ekl û hiş bi xwe şayîya birikandinê dixin dûr û diqevînin tariyê.

Hin peyayên qo ji jiyîtnê xwe dane paş, ew tinê ji mirovên qêm xwe dûr dixistin.

Lewra qo ew ne dixwestin qanî û agir bi wan re par biqin.

Hinên din qo qetine çolê û bi heywanên quvî ezabê tihniyê qîşandin ne dixwestin bi hêştirvanên pis li qevîya qanîveqê rûnin.

Carina ji xwe re dipirsim.

— Ma jiyîn hewcedarî mirovên qêm û peyayên pis e ??

Camêrin weq teyroq û badevê hatin û pê li kirîqa peyan qirin. Ewan dil diqirin devên qortalên pis û bêşerm bigirin.

Brao !! ma dilxwaza te ne aveqe paqij û avîje û qaniyeqe zelale ?

Hingî xwe bilind qe, di bilindayiyê de qaniyeqe zelal û paq heye, di dora wê de mirovên pis û peyayên qêm rûnanin.

Di wê de agir bireng e, dû naqe, bî pêteqe sor diqirise.

Brayê nin !! dizanim qo tu pê qaniyeqê digeri,

Havîna dilê te wê honiqayiyê dixwaze.

Were, di wê de, bédengîyeqe nerm heye, ew bilindayî hêlin û welatê me ye.

Em hêlina xwe li ser dara dawiyê avê biqin.

## Qula Dil

Begê min, serwerê min ey Celabet  
 Şehê min, rêberê min pur edalet  
 Tu biniyîse di Hawarê selavan  
 Ji ber min ve li qurdmancan temaman  
 Çi qurdmancên Enadol û çî sûrî  
 Çi loran û çî gewran û çî sori  
 Çî gavan û çî sapan û çî mîr e  
 Geleq behtir li qurdmancên Cizîr e  
 Ji Nafîz beg bipirse ey begê min  
 Çî derman e, ji bo derdê dilê min  
 Birîndar e, ji ber daxa welat e  
 Gelo derman heye jê re, li ba te  
 Belê îsa ji ezman hate xwar e  
 Welê dîsa ne di jê re tu çare  
 Bi ser singa me danî destê taze  
 Di rengê ayînê di dil ne saz e  
 Diqir Kirîn digo derdê evî n e  
 Ev e, derdê li Ferhad û Şîrî n e  
 Ev e, derdê qo pê çune Mem û Zîn  
 Tu dê bimri bi vî derdî Cegerxwîn.

*Cegerxwîné Qurdî*

Vê paşiyê Cegerxwîné me ê xweşewist û hêja ji me re çend bend û xweşxwan rêqirine. Ji ber qo ev hejmara hatî bû bû me ji xweşxwana jorîn pêve tuwên din niqari bû belav biqin. Qo Xwedê hez qir di hejmara deha de emê çendeqan pîşqest xwendevanên xwe biqin.

Eylo bi nîqilên xwe ji me re zad dê binin.

Belê, em tucaran destên xwe direji xwarina qo mirovên qêm û peyayên pis jê dixun, naqin.

Ew destên xwe ên bêşerm direji xwarina me dê biqin û pê dev û zmanên xwe dê bişewitînin.

Em weq eylo weq berf û çîyan di rex hayê xurt de, dê bijîn.

Emê carqê weq bayeqe zor bi mirovên pis û peyayên qêm biqevînin û bihna wan bigirin.

Brayê nin !! ji dijminên xwe re şîretan biqe ber bi bayî ve tif meqin.

*Dr. Zamiran A. Bedir-Kan*

## Ez û Hawar

Weq piraniya qurdên qo di we-  
latên biyanîyan de radibin û ji bona xwen-  
dinê ji malên xwe ji dûr diqevînin, min ji  
zmanê xwe rind nizanî bû.

Pîştî kedandina xwendina xwe ne-  
zaniya zmanê min li min ji berê girantir  
dihat. Min dil diqir rind hînî zmanê xwe  
bibim. Hawar hat hawar û gazîya min,  
û ji min re bû mamhoste. Ji lewre çikas  
pesnê wê bidim ji disan niqarim bêm  
ber kenciya wê.

Nivîsandina Hawarê bi herfên di nû  
geleq baş e. Ji ber qo zmanê me, zmanê  
qurdî zmaneqî Arî, Hindo-Ewropî ye û  
tinê bi herfên miletên arizman rast û kenc  
têt nivîsandin.

Ji bona qo ez biqarim ramana xwe  
çêtir raveqim divêt birhaneye wî nîşanî  
xwendevanên Hawarê biqim.

Weqî niho, berî derqetina hawarê  
mamhosta min pîriqa min bû. Hingî min  
zmanê xwe bi herfên erebî dinivîsandin.  
Lê sibetir herçî qo min berî rûjqê nivî-  
sandi bû, min niqari bû ez bixwînim  
û weqe xwe bilêv biqim. Ser vê weqê  
min dev ji herfên erebî berda û ji xwe  
re bi herfên latîni elfabêyeq çêqir. Êdin  
bi elfabêya xwe min her tişt kenc dini-  
visand û rast dixwend.

Gava hawar derqet min elfabêya  
xwe û ya hawarê danî ber hev û dit qo  
her du elfabê geleq nîzingî hev in. Ne  
gereq e qo ez bibêjim, ev nîzingayî ez  
geleq şa û qêxweş qirin.

Par çû bûm Qurdîstana jêrin. Li  
Bexdayê min Tewfik Wehbî beg dit. Ew  
ji bi elfabêqê mijûl dibû. Lê beriya wê  
elfabêya hawarê derqet û me da pey.

Li Silêmaniyê di Civata Zanistiyê  
de min çend xortên xwenda nas qirin.  
Bi tevayî digotin qo zmanê me tinê bi  
herfên latîni tete nivîsandin û ne bi hi-  
nên din. Herweqî irû ji em dinivîsinin.

Lê divêt herçî xwenda û zanayên  
qurdan hene piştî bidin me û elfabêya me  
belav biqin, bi xwe hîn bibin û ji xortên  
nûgîha re hîn biqin.

*Eli Seydo*

## ELfabêya Qurdî

9

Dengdêrên qin ev in : e, i, u,

Dengdêrên drêj ev in : a, ê, î, o, û.

A. O- Ev du dengdêrên ha di zmanê  
mede ji weq yên zmanên din tenê bilêv  
qirin, lê hergav drêj in û tucar qin na bin.

Weqo :

A — çaq, dar, paq, bar.

O — zor, gol, lor.

Tinê di zarê nivro de carinan weq (eu)  
ya frensizî û (o) ya tîrqi tete xwendin.  
Hingî bi danina du dekan li ser (o)  
ye tete nîşan qirin : qol, gól.

Ê — Gava me sehîtiya denganiya  
qurdî diqir em rastî dengeqî hatin qonizî-  
ngî (فصحہ ثقيلہ) yê erebî ye.

Ev qengê ha qo di cara pêşin de  
li (a) yeqe qin dimîne di rastiyê de ne  
(a) yeqe qin e, û niqare bibe ji. Ji ber  
qo di zmanê de (a) ya drêj heye û qina  
wê niqare hebe.

Di encamê de xuya bû qo ev dengê  
ha ji (e) qe stûr pêvene tu deng e. Belê  
ev dengê ha (e) qe welê ye qo stûr  
tete xwendin û herçî dengdêrên qo di-  
dêre stûr dide xwendin.

Ev dengê dengdêrî tinê di hin dewerên  
Qurdîstanê de tete bihistin, ne di hemî  
deran de.

Hebû qo em vî dengî bi danina du  
dekan liser (e) nîşan biqin. Herweqî (e)  
yên pirsên (pêz) û (sêd) qo bi herfên  
erebî bi (ظ) û (ص) weq (ظ) û (صد)  
dihatin nivîsandin û dengdêrên wan stûr  
dihatin xwendin.

Ji hêla din ev ferka bilêvqirîna di  
hin pirsên erebî de qo qetine hundirê  
Zmanî tete ditin

esqer      ereb      eli

esqer      ereb      eli

(dûmahiq heye)

*Celadet Ali Bedir - Xan*

## MEMÈ-ALAN

« Ce pays c'est le pays de (Cizîra-Botan) domaine des princes, des chevaliers et des hommes braves. On m'appelle (Zîna-Zédan) la fille du prince [ Zengin ] la sœur du prince [ Ezin ] la cousine des trois [ Mêrquj ] tueurs d'hommes, [ Kelenda ] la dote payée du prince [ Çeqo ] La possesseuse de [ 41 ] esclaves, aux ceintures dorées et brillantes. Ce palais est [ Burca-Beleq ] le palais d'hiver des Emirs de [ Azîzan ]. ( 1 ) Au nom du créateur je suis capable d'affronter le scandale et expédier ta maison sur les ailes ingrates de l'univers [ feleq ]. Homme perdu, mon âme n'est pas du vent, assez, ne pénètre plus dans les asiles étrangers sans le consentement des propriétaires, allons va-t-en »

Mem ne pouvait plus se tenir, il se leva sur ses genoux et cria :

« Canemergê, qu'pêqetê ! que me racontes tu ? le pays que tu nommes [Gizîra-Botan] sa forme est étrangère à mes yeux et le son de son nom est inconnu à mes oreilles. Nous sommes dans le pays ( mexribî ) Le palais où nous sommes c'est le chateau fort « Burca-Qesqesor » « chateau-arc-en-ciel » qui de chaque point une nouvelle couleur jaillit. C'est la résidence des princes des « Alan ». Qu'est-ce que c'est Burca-Beleq où se trouve-t-il qui l'a-t-il bâti ? La capital du pays Mexribî repose sur sept côlines, possède 360 quartiers. C'est la mer qui prend soin d'elle, pendant que le soleil est couché elle lui jette ses écumes blanches montées aux ondes dorées de violettes . »

Il donne une longue description, il parle de sa garde royale, tout des jeunes garçons de la grande noblesse chacun capable de compter par cœur 7 . . . 17 . . . 27 . . . aieux et il ajoute :

« Rêvindayê . . . route perdu, lève toi,

1 - ( Zîn ) prenait la chambre de Memê Alan pour sa chambre. Le palais de Mem était une réplique de Burca-Beleq jusque dans ses moindres détails. Ainsi que l'aménagement de chaque chambre.

tu vois que ce chateau n'est plus ce que tu appelles Burca-beleq tu n'es pas chez toi, tu es chez moi qui n'admets pas ta présence. Tu vois bien, tu t'es trompé, tu devais aller chez quelqu'un qui t'attendait, va chez lui, prends tes chandelles et va les poser au sommet du lit, de ton amant pour éclaircir son visage noirci du fait de t'avoir détourné . . . »

( Zin ) proteste énergiquement et répète qu'elle se trouve chez elle à (Burca-Beleq). ( Mem ) commence à rire, il lui propose de descendre au rez-de-chaussée et d'examiner le palais pour la convaincre qu'elle n'est pas chez elle et qu'elle se trompe.

( Zin ) consent, mais ( Mem ) trouve un autre moyen pour éclaircir le malentendu. Il lui propose que chacun à son tour appelle ses esclaves, et ses gardes.

Zin consent et elle appelle: « Rêhan, Rêhan où es-tu viens . . (xwelîserê) viens . . . est-ce ainsi que tu exécutes mes ordres, tu ne devais pas laisser même le vent pénétrer chez moi sans que je t'ai autorisé ».

Elle appelle plusieurs fois, aucune réponse.

Mem à son tour fait appel à ses gardes. Le chef ( Bengî ) suivi d'une quantité de jeunes hommes qui montaient la garde apparaît au seuil de la porte et dit :

« Ordonne mon prince que j'envoie la ville tout entière à la bouche rouge de l'enfer »

( Zin ) s'oblige à s'avouer vaincue. Elle demande pardon. ( Bengî ) les quitte. ( Zîn ) et ( Mem ) se reconcilient ( Mem ) dit à ( Zin ) :

— Nous devons attendre jusqu'au lever du soleil pour savoir si tout ceci n'est pas un rêve et si cela c'est de la vérité. J'informerai mon grand père maternel ( Nerîman ) qui nous unira pour toute la vie .

Comme souvenir et pour pouvoir plus tard examiner la vérité de l'évènement ils changent leurs bagues.

La bague de ( Mem ) portait l'insigne : ( Mirê walatê Mexribî ) et celle de ( Zin ) ( Do-tmîra mala Azîzan ) Princesse de la maison des Azîzan. ( à suivre )



«Ils tombèrent dans un scemmil lourd, qu'on aurait pu penser qu'ils ne s'éveilleraient jamais, même si le dernier jour du monde arrivait et si le ciel leur tombait dessus ».

Les trois colombes sœurs résolurent d'amener Zin chez elle avant l'aube : elles levèrent donc son lit, et, survolant les déserts et les montagnes, traversant les brouillards et les nuages, frôlant les ombres de la lune, elles parvinrent à la capitale de Botan et déposèrent le lit de Zin dans son boudoir.

\*\*\*

Le lendemain, Zin n'ouvrit les yeux que vers midi; elle chercha le jeune homme de la nuit, et elle ne trouva personne. Mais si l'homme avait disparu, une flamme d'amour restait au cœur de Zin.

Elle se demanda un instant s'il ne s'agissait point d'un de ces rêves que les jeunes filles ont coutume de faire. Mais la bague de Mem était là pour attester la réalité de l'aventure nocturne. ( Oui, s'écria-t-elle, c'était bien vrai, ce n'était pas un rêve : la lune de Cizir avait touché le soleil couchant ). Et elle se mit à pleurer, à gémir et à pousser des cris.

Ses esclaves se précipitèrent auprès d'elle. Mais, n'osant rien lui dire, elles se contentèrent d'informer l'Emir, qui vint aussitôt.

« Au vert des yeux et au rose des joues, mir ( Azizan ) vit tout de suite que c'était un mal terrible : le vert des yeux, flétri par l'automne, avait jauni ; les joues roses, leur lumière éteinte, n'étaient que des plumes ternes et sans vie. »

Il convoqua toutes les autorités médicales ; mais Zin ne voulait de personne, et elle disait à son frère : « Mon aîné, je n'ai ni blessure ni maladie : Tranquillise-toi donc ». Puis, décrétant un deuil de six mois elle fit savoir que pendant cette période elle ne recevrait personne et resterait toute seule chez elle.

Car, en elle-même, elle se disait qu'entretemps. Mem donnerait signe de vie.

( à suivre )

*Djela det Xali Bedir-Khan*

## L'Alphabet Qurde

8

Dans la première forme la disparition n'est pas complète. Il n'est agi d'un amalgame de « wi », s'est tellement fortifié que le « i » l'a emporté sur le « w » qu'il a fait disparaître pour rester seul.

suwar, swiwar, siwar  
suştin, swiştin, şiştin

Dans la seconde forme le « u » disparaît en même temps que la consonne qui le suit, la voyelle longue « o » apparaît à sa place et compense la disparition du son consonnique.

cubt cot  
suhtin sotin

Le « u » entraîne quelquefois dans sa chute d'autres lettres différentes, voire même des voyelles.

bihurin borin

La forme seconde, c'est-à-dire « borin » donne également des dérivés.

Par exemple, le transitif de « bihurin » est « bihurtin » ; après la stabilisation de « borin » on lui a donné un transitif d'après la règle qui veut qu'on ajoute au radical du verbe intransitif la terminaison « andin ».

borin borandin

Ces sons existaient également dans la langue persane. En particulier, malgré le déclin de la prononciation la dictée du « xw » a persisté jusqu'à nos jours :

xwaber خواهر

xweş خوش

xwastên خراستين

xwace خواجه

L'auteur d'une grammaire persane ( رهنگی فارسی ) note bien ces points, mais d'une manière vague et imparfaite. Il dit textuellement : « Dans la langue persane on trouve encore deux lettres qui peuvent être figurées par ( خو ) et ( قو ) surmontés de trois points, et que l'on prononce encore au Kurdistan, au Khouzistan et à Chiraz. »

( à suivre )

## مارشا كردي

گلي بران ورن جنگي  
 بشوئين دل ژفي ژنگي  
 بيژم از حتا كنگي  
 نهن بك ژمه بفي رنگي  
 هاوار هيه ام چيكن  
 ورن دام خوه كار بكن  
 كاري ل چين كار بكن  
 داهون ژخوه ره كيف بكن  
 گلي بران بگرن گوڤند  
 بگرن چيكي دلال ورن  
 بن پنج بكن و كي اسد  
 دي ژوه بخوازن هر مدد

كيف وخوه شي هر بي وه به  
 هون ئي بزائن هر وه به  
 آف ولات و جكي وه به  
 ژ بيانيان ره بي فيده به  
 هون چه بكن بي لوسه به  
 چاق نيرين ام لدسني وه به  
 بزائن آف شاني وه به  
 والله وبالله آف وه به  
 از كو كردم از كردي مه  
 ژ جيكي خوه ره از گوري مه  
 نه بي دوست و بي خوه ديمه  
 گل آلابي لسري ريمه  
 از كو كردم دئي بكم  
 آقان بران ژخو را بكم  
 از بدم شير وان كر بكم

باق و كالان بي صاغ بكم  
 باق و كالين مه پر باشن  
 لي ام دگل هف دلشن  
 ابرو قوي ام نخوه شن  
 ماچو دم چاڤين گشن  
 از كردي بي شرنخي مه  
 خلاي ميري بوطي مه  
 هر وخت ژ وانزه گوريمه  
 جلادت عـالي بگي مه  
 آي بگ و آي مير سر وشاه  
 وك خرشيد عورو باو ما  
 هرن ژ ميره پشت و پناه  
 دائيم ژ وه ره هر الله .

مصطفى احمد بوطي

لي ام ژي و ژخوه ندقائين مه ئين دن هيئي دكن بلا بدو  
 شعرين خوه بخطكي رند ، گر و برسان ژدهف ثقتاندي  
 نيشينين دا كو ام بكارن رند و راست بخو بين و بند و  
 شعرين وان بي خلط در بين . نراستين زيننه خهو آقن ،  
 زيننه خهو - زيننه خهو . له لايه شندي - لالايه  
 شنهي . آده رو ايزد - آدهر و ايزد . له پاشي كرنوشي -  
 له پاشي شي كرنوشي .

هاوار

## الي قرائنا الكرام بالعراق

نظراً لما يحدث من الاختلاف في قيمة الاشتراكات في  
 مجلة هاوار - بسبب تطبيق نظام العملة العراقية الجديدة .  
 نبادر الي اعلان قيمة الاشتراكات عن المدد المختلفة بالعملة  
 العراقية كما يأتي :

فلس	فرنك	
1100	100	عن سنة واحدة
790	70	عن ستة شهور
460	40	عن أربعة شهور

ونرجو من القراء الكرام ان يرسلوا بدلات اشترائهم  
 بعنوان صاحب المجلة .

ونشكر همته . كما اننا ننتظر من جميع قرائنا الافاضل بان  
 يسألونا تفسير جميع المفردات المغضة عليهم .

كومل - هذا اللفظ يطابق كلمة (مجموعة) باللغة العربية .  
 كوقار - مجلة

لوري يا بدرخان - لوري : غناء تغنية الأم لتقوم ولدها ،

اذن لوري يا بدرخان غناء من هذه الاغاني مختص ببدرخان .

بسر كازيرين - اسم مكان واقع في ضواحي ديرك .

دلدي با گلگلي - دزي بمعنى السرأما (دلدي)

تأتي بمعنى سر القلب . ولفظة (گلگلي) عبارة من وردة .

فاصبح التركيت يفيد معنى : سر قلب الوردة ،

پيروزي يا هاواري - پيروز بمعنى التهنئة والتر كيب ،

بمعنى تهنئة هاوار ، مثال على ذلك : (جژناته پيروز به) أي

عيدك منها . هيسانی - هين . دشوار - صعب .

## زيننه خهو

د رو بلا سسي ياده بي ئي سرنامي شعركه هيه . تيده چند  
 نراستين چاڤي هنه . ام ژخوه بي بي وي هيئي دكن بلا  
 لي مه مگرت ژير كو ام ب زاري بابا كردي رند نزانن ،

## داهوارنامه

من دي روهنيكي هلبو بوژ داماس  
شفق دابو جزيري وارضى قافقاس  
بربرجا بلك لى پرسيار بون  
من گوتى وان كى پينچ حرفى هاوار بون  
نه دى نامى لثاڻف كردان بكي مير  
ژ بوچاپا هاوارى چيپكي زير ...  
سلاڻي گوهراڻى لعل و در  
ژ بر كردى جزيرى هديه ريكرد ...  
تو خوش هاڻى هاوارى سرسرى من  
ته صوهتي جان و جرگى دژمنى من  
رجو كارم ژ ميرى خوى جلادت  
وطن پرور خودانى تخت و دولت  
تو روزناما كى كردى بو مه چيپكي  
سرى سالى ب حرفين نو قريپكي  
بس ه نامى خبردانا گو پرڻي  
وكى درى اوى هرڻي قدر ڻي

احمد نامى

## فرهنگكوك

ڪا ڪنڊاينافي العدد السادس من جريدتنا أن قسماً من قرائنا  
سألنا تفسير بعض الكلمات التي تصعب عليهم معانيها باللغة  
العربية . وقد اجبنا الطلب وخصصنا صفحة لذلك ! اما عدم  
تفسيرنا الكلمات في العدد السابع هو أنه لم يسألنا احد من  
قرائنا الكرام . وقد وردت اليانا من جديد رسالة من أحد  
شباب اكراد الصالحية ، محتوية على بعض مفردات يطلب  
اليانا تفسيرها . وكانت رسالته مسطورة بالاحرف الكردية  
الحديثة . وقد ائقنها بمدة وجيزة اتفاقاً حسناً . فنحن نهنشه

برلين چي به وچي تياره ؟ ورن بگهرين به ديهاتا بزائن  
لاديني كورد له چه حالبكدا به چون نه ژي ؟ چند قوه تي  
به سهره وبه ؟ ، چي اخوا ؟ بو وچ لاواز وهزاره ،  
كوردستان چه نوعه معدنيكي تياره ؟ وكي خويني كورد  
نه مژي ؟ نهى لاوان ! نهى مبشراني سهر كهوتن و سهر  
به رزي ! بگن به فر ياي ملتا .

قاموسى كوردي : انقلاباتي زمانه ، عوارضى طبيعى  
زبانى كوردي شه قوپه ق كردوه ، هه ول بدهن  
قاموسيكى عام بگن تانسلى آتى له بگزي بگن . به  
خدمتكى گه وره بو عالمى كورد نه كهن . هاو  
خوينه كاتم .

د - لهش ساغى : ملته كان قدرى لهشى ساغى كهم  
ازانى ، چونكى هرچي پاره به كى هيه به دهسى چند  
اشخاصيكه وه وبه و مرشدبكي دل سوزى نه يوه كه فيري  
پكا به صورتبكي فنى خوي ده زمان بكا . ملت فيري صحت  
بگن . و پي بلين عصري 20 م عصري نوشته نيه عصري  
شترقه ، عصري ماده وقوته . به ملت لهش ساغ ودهوله  
مندايي

ح - سامان : كوردستان كه مالى كوردانه ،  
وقبري دوژمنانه و قبله ي ملي مانه ثروتي طبيعي زوره . آو  
واراضى به به ره كت شلاله ي به قوت معدني و كونه وت ،  
زيروز يروي خه اوز ، آس به نه رخی تيا هه ، حيوانات  
و نباتاتى جوي جوي زوره يشه و جنگه لى ڻي حسابه .

وطنى و ملتى كه امنده دهوله مندبى حيف نيه ؟ شوره  
يى نه ؟ آبرو چون نيه ؟ اولادي فقير بى ، حيف نيه دهستى  
زلت بو اسبابى معيشت پان بگانه وه ( ! ) هه ول بدهن !  
هه ول بدهن نه م ملته كه خوتان اولادي جگهر گوشه ي  
اؤن له فقيري رزگاري بگن . به چي ؟ شر كت .  
شر كتي جل ، توتون و جگهره ، دار و خالوز ، ميوه ،  
حبوبات ، سه يرا كاي هاو پنان ، كيتب نوسين . هيج نه  
بي بهم شر كتانه گه لى پاره ي وولاته كان ناده ين به بى  
گانه كه منتان لى نازانى . كه پاره شمان بو هه ، مو شتيكى  
ڻي اكه ين برا كاتم .

لاويكى كورد

## آوانی دوری

آي چاو ، چه شنی بازی قفس ههل و هری  
 [ په رت ،  
 کوا باله تیژه کانی نگسای حسنی  
 [ دلبرت ؟ ..  
 کوانی دوچاوی مست ؟ کوانی ؟ ..  
 کوانی بروی پیوه مست ؟ کوانی ؟ ..  
 کوانی زلفی رهش ؟  
 کولبی آل و گهش ؟ ..  
 کواهیکی جمال ؟ ..  
 کوا حسنی بی مثال ؟ ..  
 آي گوی ، ذلیلی چاوم و به رتویه نا  
 [ ا بهم ،  
 ده نگی له یاری دوره وه چییکم له  
 [ زیل ویم ؟ !  
 بابی خونده ی پر آهنگ بی !  
 نغمه ی تازی شوخ و شنک بی !  
 زره ی بازن بی !

به ره ولاي من بی :  
 هاره ی هیاسه که ی ،  
 ورشه ی کراسه که ی ! ..  
 آي حسن شامه ، له چاوه له گو بیچه  
 [ ما یوسم ،  
 بونی له یاره وه دینی ختامن افسوسم ؛  
 بابی ، بونی هنه سه ی بی ،  
 پر به سینهم وه ک تاسه ی بی  
 بابی بوی مه مه ی  
 له درزی سوخمه ی ؛  
 بونی وه نه وشه ، گول ،  
 میخه ک ، عطر ، سمل ، ..  
 آي لامسه ، ا گرچی نه ، بو ده نگو ، ره  
 [ نگو ، بو ..  
 وه ک شیت ، به عقلی خامه وه ، خوم  
 [ خسته به ختی تو ؛  
 کوا تماسی لهش نه رمی ؟  
 کوالدتی کوش گه رمی ؟ ..  
 کوا ممکی پرچنک ؛

لیموی باغی سنک ؟ ..  
 کوا ماچی لیوی آل ؛  
 جرعه ی ا بدر خیال ؟ ! ..  
 آي خاطر اقی عمری گذ شتم ، وخیالی  
 [ نوم ؟  
 خنکاو ی بجر ی دوری نه که ی عشقی  
 [ رنجه روم !  
 جاوه ت له چاوم ون نه بی ،  
 هدر گز لای تو نوشتن نه بی ؛  
 چه شنی آوینه  
 دائم بنوینه :  
 عشقی قدیمی یار  
 تاوه ختی احتضار !! ..  
**گوران**  
 أم شعرا نه ، له سه راصولی ( فقره )  
 ریک خراون ، هدر فقره به ک عبارت له  
 چوار بیت بیستی به کم و چوارم له  
 سه روزنی عروض و تراون ؛ دوهم و سه  
 به میش له سه روزنی به نجه .

مکتبی ملی : ایمه مکتبی ملی مات نیه ، امه  
 ناته واویه کی بی آمان و گوره به ایوه که دل بریندارانی  
 کوردن و جگر سوزن همول بدهن مکتبی ملی زور کهن !  
 دیاره که خومان له شی خومان دهرمان نه که ین که سن  
 نایکا ( ۱ ) [ هزار سال بکه ی بیگانه په رستی له آخر بدا  
 دینیت نشستی ] عبرت . مکتبی دهات ریک بجنه .  
 تأریخ و جوغرافیای ملی : زور شوره یی به بو خوبنده  
 واران کورد و به تابه به تی بوایمه که تا ایستا تقریباً هیچ  
 هه ولمان نه داوه بو زیاد کردنی تأریخیان ( ! ) نه بی چاک  
 بزاین لاوانی اقوام کون به کونی وولاتیان نه گه رین بو  
 توسیعی تأریخیان . چونکی تأریخی ملی خالقی شعوری ملیه  
 وولات گه ران زی = حسس برابه تی و ناسیایو نه حاته  
 میشکی افرادی اقوامه وه . به کوردو کوردستان چي  
 لاویکی بزانی هیالابه چند به رزه ؟ میسسیپی چند دریره ؟

بوخویندن که مدنی و عصری بی . ایوه پی و یسته ملت  
 تی بگه به نن هدر دولایان یک بجنه تافکاری ملت رله مه  
 زیاتر نه بی به دوو که رته وه . وافرادی ملت له یکتری  
 ناگهن اگه روا بینه وه .  
 مطبوعات : - بو پیشکه و تن و سه ر که و تن و سه ر به  
 رزی ملت مطبوعات وه ک آو ، هوا پی و یسته . قدری  
 زبانتان بگرت ، جلیکی جوانی له بهر کهن ؟ الفبای تازه  
 بلا و بکه نه وه ، الفبای کون ، کون بو .  
 کیتی علمی ، ادبی ، اجتماعی ، اقتصادی بنوسن ، ترجمه ی  
 بکهن ، له چاپی بدهن ، بین به آو نه ی غزه ته و مجله .  
 ایوه جسارتی ادبی بجنه میشکی ملته وه . توسیعی مطبوعات  
 ونشری مؤلفات به اصولی شرکت بو کورد زور باشه و زور  
 به سوکی موفق نه بی و کورد نه که و بته دوره ی انتباهی  
 حقیقه وه .

## موسی دواروز

بولو وانی کوردا

۱- براکام! جاران و امان نه زانی ته گهر ایرو  
 نانیکن بی هیچ مشور خواردنی سه بنین مان به پی ویست  
 نه ته زانی . له به رته مه ده توام بلم : هه چچی نازه  
 واو بک ه . یه له وولاته کانا چه علمی ، چه اقتصادی . . .  
 هند گه شتی له به رمشور نه خواردنه وله بهر بی باکی هاتوته  
 میدان وزل بوه . انجا ، ایوه که له دوا روژدا جی باو کو  
 باپیرتان ، که و پته دهس و نه بن به ماموستای پیشکه و تني  
 قوم ، کتاف به باشم زانی له [ هاوار ] دا هاوارتان بینمه  
 بهر وله ناته واوی وطن و ملت توزیک باستان بو بکم که له  
 حیاتی عملیتان ته واوی بکن . و په لی مات بگرن وی بی بهن  
 بوساحه ی پی شکه و تن و سهر به سنی . له م جولانه وه بهدا  
 به عقل و منطق حرکت بکن .

چونکی له حرکاتا له عقلو منطق دوور که و تنه وه ماتی  
 پی محوا بپته وه که امه ش خدمت نیه خیانت و جناپته . . . !  
 ۲- هاو خوبنه کاتم ! پی ره ویی ایستای ژبانی وولات  
 و ملتته کان زور ناریکه هیچ ممکن نیه شان به شانی مدنیت  
 یروا : خرافات میشکی و ملتی پوچ کرده ( ! ) له بهرامه له  
 پیش هه مو شتیکدا هه چچی خرافاتیک له ، الی خوتانا له  
 شاری خوتانا ، له دیه اتدا چه خرافاتیک ته بینن هه موی  
 سنگه و بهرد بینن !!! ته ویش به شینه بی . له فجری  
 تاریخچه وه تاشه ری گه وره کورد یعنی ملتته خوشه ویسته کان  
 له گه ل اقوامی روژ هلاتدا ناسیاوی هه بو . به هوی شه ری  
 گه وره وه له گه ل روژ آوا یکانیشا ناسیاوی په پیدا کرد .  
 مزینی اساسی ملتته کمان یعنی کورد به هوی تنها ناسیاوی له  
 گه ل اقوامی روژ هلاتا فوه تاوه ، دار زاوه ، داوه شاره .  
 له هه مو هنگا و یکی تجدد و پی شکه و تنانان به ک سهر  
 لاسایی اورو پایه کان بکه نه وه ، لاسایی روژ هلاتی کردنه  
 وه له تجدد دا بو ایه بی که لکه . چونکی له شرقدا و به  
 تابه به تی له ده ورو پستی خومانا چه اینن هه مو به مدنیت  
 رهنگ کراوه به لام ناوه که ی هوازیا ترهیچی تیانیه .

چینه بند

ناکس حی بونه میر و آغا  
 بی آف کری ملاوی نه آفا .

\*

رابه هره نک هقال و کلان  
 دات نکفی نوال و چالان .

\*

درمانکی چیکه بو برینی  
 دات نکفی دناق نقینی .

### ایوب عالی بدرخان

۱- اساساً اورو یا یه کان له تجدد ماموستان و تیاپی ربون . . .  
 به فیربونی زبانیان ته توان به کسه رمدناین حقیقیان لی وهر گرن .  
 ۳- ملیت مقدستره له هه مو معتقدایک : - قومه کتان  
 گه لی فلاکتی دی وا گدر ایوه به عزمو نباتیکی بهرزه وه  
 هه ولی بو نهدن تووش فلاکتی زلتر ته بی . سببن حقیقی  
 امه که هه مو فردیک له عینی درجه دا معنای ملیت تی نه  
 گه نیراوه . تالیستا منوران محترمان هه ره ولین داوه که  
 متنقدان فیری مفکوره ملی بکن . ایوه ته بی چاک بزوان  
 هه راوان کوردنن .

جوتیار ، فلاح ، دارفروش ، آودیر ، صنعت کار ، تجار  
 هه مو کوردن . فرضه له سهرتان له حیاتی عملیتانا له گه ل  
 جوتیار ، فلاحا ، شوانا ، گارانا تجارا ، صنعت کارا ، آودیرا ،  
 به صورتیکی دیوقراتانه بیولینه وه ووقی بگه بین ملیت  
 مقدستره له هه مو معتقداتیک ولذتی بجنه میشکه وه ، ووقی بگه  
 بین له م عصره دابی ملیت ژبان محاله و نه بی کورد بو کردیژی .  
 بو پیشکه و تن چپان ته وی ؟

۴- زانست - لهش ساغی - سامان

۱- زانست : چونکی خوتان له گه ل زانست  
 خهر یکن به پی ویستی نازانم باسی زانست تان بو بکم .  
 له ولاتی مقدسمان زانست به دوور بگه دا ته روا  
 ۱- مکبئی رسمی . ۲- خو بندن له مز گه و تا .  
 ملت بو یه اولادی خوی ته نیرته مکتب و مز گه و ت

- زندہ خہ و -

شہ و بکي روناک وہ لک چہری دلدار ،  
آسمان بی پہ لہ ، زہوی خاموش بو ،  
جر بوہی تہ ستیرہ لہ دور وہ کو تار ،  
بودلی برنیار زور بہ خروش بو .

لہ لایہ شندی دلگشای شہ مال ،  
لہ لایہ بابل مست بوی گل ،  
منی بیچارہ ش گبرودہی خیال ،  
بادہم پیر تہ کرد لہ خو بناوی دل .

ہیندہم خواردہوہ خوبی گہ ش وسور ،  
نہم ما توانای سہری طبیعت ،  
بازم دا ، دہ رچوم لہ جهان ، لہ خلقت ،  
فریشتہ آسا فریم سہرہ و زور . . . .

کاتی ماندو بوم ، شابا لم شکا ،  
نیشتمہ وہ لہ تار گل و گلزاری ،  
جی بکي تنہا ، نہ بو گیانداري ،  
مامہ وہ بی کس ، بی یار ، بی نوا . .

تاچاو بریکا ہر لالہ زار بو ،  
گیانداري تہ نیا بالندہی بی خہم ،  
تارو ربابی دہ نگي ہزار بو ،  
ہیچ بولہ چاویا باغہ کہی ارم .

خستمیہ ترسہ وہ چولی وتہ نیایی ،  
ہاتہ وہ بیرم بہ لینی یزدان ،  
بہشتہ ، ووتم ، ایرہ بی گان ،  
نہ مالام ابتر بیری دنیا بی . . .

ہاوارم کردہ ایزدی بی چون ،  
فریاد رسم بی لہم وحشت زارہ ،  
یار ہبرم بی بور یگمای دہ رچون ،  
یازہ حالیم کا لہم سروکارہ . .

ناگاہ لہ پہ نای داریکی بہ رزا ،

ہاتہ دہرہوہ پیریکی فانی ،  
سراپا بہ رگی سپی لہ بہ ردا ،  
پرچیکی درپڑ ہتاسہر شانی ،  
دو چاوی گہ شی براق و پرنوز ،  
رو بیکی بشوش ، رویشینکی وقور .

\*\*\*

تزیک بو وہ لیم فرموی « آی رولہ ،  
» توجیت ، چہ کارہ بیت ، آدہ میزادی ؟  
بہ ندبت ، آزادی ، مانی ، دلشادی ؟  
چون ربت کہ وتوتہ تہم جگا چولہ ؟ »

ووتم « من کوردم نہ تہوہی ساسان ،  
پرستشکاری آدہ رو ایزد ،  
ہاتوم بیمن عہدی پیشینیان ،  
تی بگم دوری دارا و یزد گرد ، »

» بر بزم بویان قرمیسکی خوینین ،  
ہاوار بہ رمہ بہر تاجداری میدیا ،  
بلا لیمہ وہ ، بکہم زاروشین ،  
تا کو ہر مزمان بگا بہ فریا . .

فرموی « با پروین بولای آ کباتان ،  
لہ وی بیینہ بہ ہردو چاوت ،  
گیانی پیشینیان ، میدیا و کیان ،  
ایستایش ہول تہدہن بو بہ رزی ناوت . »

\*\*\*

بہ جو تہ رویشین ناگہ ینہ شاری ،  
پر لہ آوازہی شایی وزہما دہن ،  
پر لہ فریشتہ و بہ ری شوخ و شن ،  
نہم دی لہ ناویا غمباری جاری . . .

لہ ہرلا یاری ، گوپین ، جلیتین ،  
لہ ہرلا تہ قہی نالی شورہ سوار ،  
لہ ہرلا جلوہی رو بیکی نازدار ،  
لہ ہرلا لہ نجہی یاریکی شیرین .

لہ ہرلا شوری ، سازو نوایی ،  
لہ ہرلا دہ ستہی شوخانی خوش گل ،  
لہ ہرلا بانگی ، سیگاو صبا بی ،  
لہ ہرلا چیمن ، صحنی خوش گل .

لہ ولاوہ کوشکی ، بہ رزوسہ آزاد ،  
پنجہی لی تہ دالگل کم کشان ،  
سرفروی تہ بومانگی درخشان ،  
داخ لہ دلی بو بابل ، اور ، آکاد . .

دہ ستہ بہ گوردی جوان و جنگاور ،  
پوشیدہ زری و بہ رگی آستین ،  
گور زورم بہ دہ ست ، جنگی ودلاور ،  
دہ ورہ یان دابو ، بو بون بہ پہ رژین .

پر سیم لہ رہبر « کی یہ خواہنی ،  
تہم کوشک وسرا ، تہم قصر و جاہ ؟ »  
فرموی « نشیمن ، پایتخت شاہہ ،  
» موفہ ر کہ خولی ، دارو دہوہ نی . .

لہ پاشی کرنوش و سپاسی یزدان ،  
دہ ستورمان و ہر گرت بو خدمتی شاہ ،  
چو ینہ آستانی کیوان لہ آسمان ،  
لہ تاو دبدبہی سہری سور تہ ما . . .

خواوہ ندی بابل ، قیصری روما ،  
فرعون مصر و شاہی نارام زین ،  
ہمو سجدہ بہر ، زانو ہر زمین ،  
بو تخت دارا و ایوان کسرا . . .

شاہی کشور گیر بوم ہاتہ کفتار ،  
فرموی « پیشکش کہ سپاسی خسرو ،  
» بہ کوردی بدبخت ، بہ کوردی ہزار ،  
برہ بی مژدہی ژیا نیکی نہو ، »

» روژی ہر ہلدی ، فرار تہ کاشو ،  
» بہ راست تہ گہری آخری زندہ خہو . .

### میر و کسه

جار کي ميري جزيري درکتبو گري . ري با خوه  
خستبو طوراً هغير کان . شكي دگد کي فلحان ده ما . دغي  
کندي ده ديرک هبو . مير چو بو زيارتا ديري . ژ کسه بي  
ديره ره گوت :

— ازي ژته سي پرسان بکم ، لي نه نهو پشي سي مهان  
ونه ل هر ل جزيري ، هکه ته ل وان فگراند ازي ته  
بکم بطريق وهکه ت نراني فگريني ازي ته ژ کشتي بي بيختم  
وبکم درگشاني ديري .

مير داري وچو . کسه کت تخمينان . کسه رو برو  
دچلمسي ، ژصبي حتا ايقاري رها خوه دکر نآف دستين  
خوه و قد کشکشانده . د دلي خوه ده دگوت : « خدي او  
ت خدي بي من ئي چا کي ، از ژي کسه بي ته ئي رندم ،  
آف چه بلايه کوه آيه سري من ، ازي چاوان ل مير فگر بنم » .  
کسه خوه بي بي پز وششان بو . حالي کسه دکت  
بر چائي شقاني وي ژي . جار کي شقان ژ کسه ره گوت :  
— باقو ، آف چه حالي ته به . چه دست دايه ته . ژ صبي  
حتا ايقاري دفکري و پرخوه دکشي ، کايژه خلاصي خوه  
بلکو من نقديرک ژيره ديت

ژخوه کسه ل بيکي دگريا کوه دردي خوه ژيره بيژه .  
را بودردي خوه ژ شقاني خوه ره گوت شقان کني و گوت :

— ما آف ژي نشسته . مير چه د کاره ژمه بپرسه کوام  
نکارن لي فگر بنن . قت خم مخوه ، من بشينه جزيري ازي  
بزائم لي فگر بنم .

کسه بي قائل بو و دلي خوه راحت کر . مي مه يون  
تمام کسه شقاني خوه ريکر جزيري .  
شقان خوه کهاند بر جابلک و درکت خا فا مير . مير بکيف  
بو . ژشقان پرسى و گوت .

— کسه ، کايژه د بچري ده چند دلوپ آف هنه  
— هزارتنا دلوپين آفا بچري گلک هيساني به . تني دقيت  
ت امر بکي کو دقين چمان بگرن .  
مير کني و گوت :

— خوه ش جهابه . پرسيدار بباددووا ، هکه ازخوه بفروشم  
چند زير دم  
— بيست ونه

— من آف صح نکر ، آف چه هزاره ؟  
— ميري من ت زاني کو عيسي پينمير ب سه زيري  
هاتبو فروتن . هر حال قائلي کو ژي ب زير کي کيمتر  
به ئي فروتن

مير آف ژي عجا بنده و ژي پرسيداريا پاشين پرس کر  
— کسه او ، کايژه من نهو از د دلي خوه ده چه ديژم .  
— از خلام آف ژ هميان هيسا نيتره . نهوت دلي خوه ده  
ديژي کواز کسه مه ، نه ؟ لي نه ولي به ، از شقاني وي  
مه ، کسه ل گنده . . . . .  
کو ميري بو طوان

قصر ، سراي ، خاني و کوچيان پي دخيلين ، دبر  
وي ره دبورن ، سلاقان ليد کن . اوي ماچ دکن ،  
داتين سر سرين خوه .

آلين ملتين بسر خوه ، دسر کلات و بازارين وان ره  
ل پيل دبن ، دريغه چونالشکري ده دکشن پيشي بي .  
لي آلين ملتين دبل ، وک ياملتي مه ژهر دري بدر کري ،  
لهفتواندي لسردلي زارووين وان ده هلا ندينه .

ملتین دبل دخبتن ، خونن خوه در ژين  
کو بيانينان ژولاتين خوه بقور بنن و آلين خوه لسر

کلات و بازارين خوه ژنوقه داچکين  
آلا هر ملتي ب چند رنگان وب شکلکي دنه .  
آلا کردان ، ژرور بر بژيرقه سر هف ، سور ،  
سپي ، کسکه ، دنقا و وي ده روژ دچرسه .  
دقيت زارووين کردستاني بخبتن و روژ که  
بري قی روژي هلين ، برب آزماني کردستاني  
قه بلند بکن ، ل وي بروسکين ، ولاتي خوه سر  
آقاهييا خوه آپيشين فگر بنن و دبن رقا وي ره بسر خوه  
وب کامراني بژين . مهودت عالي بدرخان

# ههوار

سال ۱

هه‌مار ۹

—

ابن

۳۰ اپیلون ۱۹۳۲

السنة ۱

العدد ۹

—

الجمعة

۳۰ اپیلون ۱۹۳۲

کوارا کردی \* مجله کردی

## ولایت ، ولایتینی و آل

مه ، ولاتی کردستانی . آف ملتین ها ژبونا  
 رزگاریا ولاتی خوه دخبتن .  
 خباتا وان اقه : روژه که بری بیانیان ژولاتی  
 خوه درین و مینا ملتین دن بسر خوه بین ، دناف  
 هقهدهب خوهشی وب قنجی بژین .  
 هر کس هژولاتی خوه ، هژ ولایتینی خوه ده که .  
 هژ کرنا ولایت دلی مه ده هیقینکه مزن و بلند .  
 أم پی خرت ، زخم و جانفدانه ژیره ولایتینی دیژن .  
 ولایتینی دهندری مه ده آگره کی مقدسه .  
 پیتاوی آگری ژمه ره هرتشتین ولایت دیده حز کرن .  
 ژلوره ، دبرچاقین مه ده آخ ، آف ، چیا ، دشت  
 و دار و کفرین ولاتی مه ژبین ولایتین دن سپهتر .  
 خوه شتر و شیرینترن .

\*\*\*

هر ملت خوه بی بی آلکی به . آل نیشانا ملت  
 و ولایت . نقایا هیاناملتان دآلاوانده جقییابه .  
 آل ناموس ، رومت و بختی ملتانه . زارو وین هر  
 ملتی ژبونا بلندی و بقدر بونا آلاخوه ، بی پروا  
 خوه ددن کشتن .  
 آلا هر ملتی ژیره بهایه . دجژن و شاهینتانده

ولایت اردی باف و کالکین مه به .  
 ولایت او دره کو پیشین مه ل وی رابونه ،  
 ژبونا آواهییا وی خبتینه ول وی مرنه .  
 ولایت او دیاره کوام تیده سکینه و روژه کی  
 دناف آخین و یده بینه فشارتن .  
 خلکی ولایتکی ، ولایتین هفن . بوری ، حال  
 و داویاوان ب هقره گریدانه . زمانی وان ،  
 گریداناوان ، هر حال ولایتین وان میناهفن . پیشیاوان  
 لرخ هقدورابون ، رونشتن و مرنه .  
 ولاتی ب قنجیا هف شادین ، بر خرابیا  
 هف د کفن . شین و شاهینتا وان یکن .  
 خلکی ولایتکی برابین هف ، پسامین هفن .  
 هرگاف ب هقره ، دست ب دست ژبونا  
 خوهشی ، آقاهی و آراهییا ولاتی خوه دخبتن .  
 کام و آرمانجا وان یکن .  
 ژبونا ولاتی خوه جان و مالین خوه ددن در ،  
 خو بنین خوه بی پروا در ژینن .  
 هری دخبتن کو ولاتی وان مکفت بن دستین ملتین دن  
 لی ملتین هنه کو ولاتی وان ، ب آواکی ،  
 کتیه بن دستین نیار و درنمان . وک ولاتی ملتی



# کتبخانا هاواری

ریزانا القابی باکر دی

هزار  
۱

غروش سوری

۱۲۶۵۰

۱۰

ب چرمی خملاندی

ب چرمی عادتی

ژبونا درقه دقبت حتی پوستی ب سر بیت خستین

زنگراف و مطبعتہ

ایوبیہ خان بدمشوق

حفر جمیع المعادن وَالصُّور الملوّنة واللوحات الخارسیة  
طبع بطانات وادریات بحروف نازرة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطیب

احمد نافذ

اختصاصی بالامراض الداخلیة والزهریة والأطفال

دمشق

عمرنوس

الطیب

محمد حسیب

الافتقار صبی بالبراحرة ومرضه العیون وجرانها

دمشق

صالحیہ

## اشتراکات مجموعة هاوار

وفي غير هذه الأقطار  
عن سنة واحدة ۱۵۰ فرنك  
عن ستة شهور ۹۰ فرنك  
عن اربعة شهور ۶۰ فرنك

في سورية و ترقية والعراق و بلاد العجم و بلاد النفقاس  
عن سنة واحدة ۵۰۰ غروش سوري - ۱۰۰ فرنك  
عن ستة شهور ۳۰۰ غروش سوري - ۶۰ فرنك  
عن اربعة شهور ۲۰۰ غروش سوري - ۴۰ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

سال ۱  
هزمار ۹

این


۳۰ اپریل ۱۹۳۲

# هاوار

برقی

السنه ۱

العدد ۹



الجمعة

۳۰ اپریل ۱۹۳۲

کوفارا کردی \* مجله کردیة

تیخستیپین کوقاری

ج ۰ ۴۰ بدرخان

جمیلی حاجو

کوچری بوطان

لاویکی کزد

دكتورك ۰ ۴۰ بدرخان

کوچری بوطان

علی سیدو

ج ۰ ۴۰ بدرخان

هر کول آزیزان

لات و آل

ملایی گلی

میر و مهار

مشوری دواروز

ژمروپین کیم ره

میز و ککشه

ازو هاوار

الفانییا کردی

فرهنگوک

دكتورك ۰ ۴۰ بدرخان

پیزوت

امین عالی بدرخان

گوران

احمد نامی

مصطفی احمد بوپی

دكتورك ۰ ۴۰ بدرخان

جگری خوین

دلکوچری

زیننه خو

چند پند

آواتی دوری

داخواز نامه

مارشا کردی

کردستان

کلادل

SAL 1  
HEJMAR 10

YEQŞFMB

23 Çiriya-Berê 1932

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 10

— — — — —  
DIMANCHE

23 Octobre 1932

Qoyara Qurdî \* Revue Kurde

## Gêzistiyên Qoyarê

Leylana Rastiyê  
Eqsi Sedayi Hawar  
Gelo ne Wisan e  
Ji mela û şexan re  
Ji pismamê min re  
Mîr û Qund  
Dilê min pir dişewite  
Yeçitîya herfan  
Elfabêya Qurdî

Ilhamî Hawar  
Ax Qurdistan  
Hey Weten  
Berdêlq  
Hişyarî  
Di Şorezareqê de  
Ji xwendevanan ve

Dr.Q.A. Bedir-Xan  
Pirot  
Kedrican  
Cegerxwinê Qurdî  
F. Mistefa Şahin  
Qoçerê Botan  
Selahedinê Serhedî  
Xweyiyê Fawarê  
C. A. Bedir-Xan

Gewran  
Silêman Bedir-Xan  
Xwedoq  
Cegerxwinê Qurdê  
Dr.Q.A. Bedir-Xan  
Kedrican  
Hawar

## Birê Frensişî

La musique Kurde  
Memê-Alan  
O sans maison  
L'Alphabet Kurde

Pr. G. Michaelian  
D. A. Bedir-Khan  
Hereqol Azîzan  
D. A. Bedir-Khan

Çapxana terekî

ŞAM — 1932

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES**

Damas

Arroue

Damas

Salhié

*Dr. M. Khidié*

*Opérateur et Oculiste*

## PHOTOGRAVURE

### EYOUBIYE FRÈRES

*Inscription sur tous les métaux. Gravure colorée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes,*

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyarîya Qomelê

Ji bona Sârîya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûş-sûrî — 100 frenq

Şeşmehqî 300 kirûş-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûş-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

Şeşmehqî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî tene şandin:

Mîr Celadî Alî Bedir-Xan

Şam: Taxa Qurdan

## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Leylana Rastiye

Nivê şevê ye. Ezman bê stêr e.  
Bayeqî sar û dijwar tê. Li ser rêqe asê  
û xweher bi hezaran û bi sedhezaran qurd,  
pîr û ciwan jin û zaro, sax û nesax diçin.

Di dora wan de gund û bajar xirbe  
ne. Ji bixêriyan dû dernaqeve, reyîna  
seh nayin.

Rez û dehl, zevî u cinîn şewitan-  
dî ne. Ne feqî hene ne ji darên delal.

Mazî. deyndar, rêli, guhij û darên  
berû hişq in. Weq qelên tirban mane.

Weq qelên miriyên qurdistanê.

Qeriyên pez u garanên dewaran  
xuya nabin. Çarmedor qavil, qavileqî  
tarî.

Ji dûr ve, herûj, roj dibirike, ba-  
jarên mezin û gundên ava xuya dibin.

Ji dûr ve, gelec dûr, di buharê de.  
qulîq dibişqivin deşt û mêrg, germiyan  
û zozan bigiya û bi hêşinayî diqenin.

Buhiştta bihn û reng deriyên xwe  
vediqe.

Lê di wê rê de, di wî geliyî de ro-  
nahî nîne, tav nîne, roj dernaqeve,  
ne rojhelat û ne jî rojava heye.

Birindar ji eşên birinên xwe, jin û  
zaro ji birçîtî û tihniyê dinalin û digirin.  
Zaroyên berşîr ji birçî ne. Memiqên dê-  
yan zuwa ne.

Qes qesî nabîne. Gelec caran di  
tariyê de rêwingî rêyên xwe winda diçin.

Hineq ji wan diqevîn, di qortal û  
çalan de winda dibin.

Lê ev qoma qurdî bi zehmet, bi cefa,  
bi xwîn û birin pêşve diçe. Di şûn xwe  
ve di rêça xwe de bi sedan dilsotî, can-

sewittî û birindar û miriyan dihêlin.

Bê tirb û bê qel wan berdidin.

Wisn bisalan ve ev qom bi rê ve çû.

Di tariya şevê de, di badevê de, di  
sariya zivistanê de pêşve çû, serborî û  
serhaliya xwe, bi mirî û birindarên xwe  
li ser rêya xwe nivîsand û çap qir.

Ev qom şevqê gîha zozoneqî spehî,  
di pêşberê çiyaqî bilind û mezin.

Gelec sal hebûn qo vê qoma he ro-  
nahî û şabûnî ne dîtî bûn.

Ji nişqa ve di pêşberê wê de ron-  
biqe zelal çirist. Rêya wê a asê; rast,  
sivîq û xweş bû. Ne gevir man û ne stiri.

Çarmedor hêdî hêdî xuya bû.

Ji her gir, ji her palên çiya, ji her  
deşt, ji her serên qaniyê gundeqî ava û  
xemilandî diyar bû û qomê re qenî.

Mêrg û çiman, rez û hexçe bi sosin  
û rêhan, bi nêrgiz û benefş bi gulnexwîn  
û belalîzq teyistû.

Birindar li birinên xwe dinên, di-  
binin birîna wan goşt girtiye. Dê li zaro-  
yên xwe mêze diçin û dibinin qo edî  
rûyên wan ter û taze ne, ne zer in û ne  
bi hêstir in, hinariqên rûyên wan weqê  
gul û gulnexwînan sor in. Li memiqên xwe  
mêze diçin tejtî şîr bûne.

Rihspî û pîrejî xwe ciwan dihesin,  
dibinin qo ji dilên xwe re xort bûne. Ji  
nişûvên çiyayî û zozanan pez dadîqevîn  
jêr. Berx û qariq di çêreqe bor û bilind  
de xwe hildavêjin û dileyizin.

Xelqên qomê diqenin û distirin, he-  
mî bi govend û saz in.

Hemî ji hev dipirsin:

—Ma ew nalîn û girin qû ve çu ???!!!

Çi kewimiye qo çarmedora me ji

nişqa ve, husan ava û xweş, dewlemend  
û rengin bû ! ! ! ! ! Ma em qetine  
buhîştê ! ! !

\*\*\*

Rihspîyeq û pîrejineq bi qopalên  
xwe serê çiyayî nişqa qomê qirin, qomê  
çavên xwe zivirandin wî çiyayî, hûr mê-  
ze qirin.

Di serê çiyayî de, xorteqî bi bejn  
û bal, xorteqî zexm u nêr, xorteqî çeleng  
û jêhatî, xorteqî bi goşt û gewde, xorteqî  
delal û spehî çavên xwe digemirîne û  
veqêşa tîne xwe.

\*\*\*

Ji qomê dengeq bilind û kîreq şabû-  
niyê rabû.

Qom ji rihspî û pîrejîne pîrs qir :

—Ez nihû dibînîn û seh diqim, ronahiya  
min ne ji rojê ye, lê belê, ji çavên  
wî xortî tê ! ! ma çi kewimiye ! ! !

Ji dilxweşî du hêstirên germ li ser  
rûyê pîrejîne de tîn, ji nû ve wî xortî  
nişqa qomê dide û bi dengê dia û zari  
dibêje :

—Qurdistan ji xew rabû ! ! !

*Dr. Zamîxan Alî Bedir-Xan*

## Gelo ne wisan e ?

Wê rûjê min cilê xwe biribû ser  
Cilşo, trû ez çûme bînim.

« Hawar » di bin çengê minda, qe-  
tim hundur, Cilşo ji min pîrsîyar qir :

—Ew çîye dibin çengê te de ye ?

Miu weqe her car qo jî her qesîre  
bi iftixar dibêjim : Hawar e, qovara me  
a qurdiye.

Li wê derê cindîyeqî qumsor ji he-  
bû, lîmîn mêzeqir . . . mêze qir û bi zmanê  
xwe got :

Wellahtî derew e, billahtî derew e,  
ma çawan bi qurdmancî tê nivîsandin û  
ket ew qurdmancê qo binivîse heye ??

Ev pîrsên ha, çikas giran, çikas mana-  
dar û çikas bextê meyî reş îspat diqe.

## Ji xwendevanan re

Hawar hawar te ye  
Deng û gaziya te ye  
Heqe te hawar divê  
Ari Hawara xwe qe.

Kiriqa min tîjî girî bû, lê, geleq  
car, min ev pîrsên ha, ji devê geleq  
merivan bihîstibû. Lê çi biqim ? ev qe-  
manî ji me ye, ji xwenda û mezinê meye !

Ji wan pîrsên wî cindîyî ez diqarim  
geleq mana derînim. Lê ezê bi yeq du  
made ên veqirî derpêş biqim :

1 — Mirovên qurdmanc qo dixwin-  
in, xudan ilm û xudan cih dibin, li paş  
xwe vedigerin û li mîletê xwe di nêrin  
mîletê xwe pir li jêr dibînîn, ji bona  
ihtirasta xwe a şexsî û heywanî, li wî  
mîletî nabine xwedî û dibêje :

« ez ne ji wî mîletê qurdim »

2 — Mîletê qurd, di pê yî muslima-  
nyêre, ji her mîletan bêtir, dîne xwe ajotin  
ji murşîdê xwe û her çend mîletên müs-  
lîman hene, bi cavê biraên mezin li wan  
mêze qir. Lê sed esef wan bi çavên şef-  
ketê li me mêze neqir in. Di hekê meda  
piropaxanda çêqirin; gotin « Mîletê qurd  
ji taifa ecina, û mutriban e, kabîliyeta tu  
tiştî di wande tune ye. H. P. . . ( Heta,  
piropaxanda di wan li mîletê me jî tesîr  
qir. Ji lewra zana û mezinê me ji qurd-  
mancîyê dûr revîyan, bune pêşdarê ilm  
û îrfan, mêranî û her tiştên mîletê  
biyanîyan ).

\*\*\*

Hezar şabaş û sipas qo êdin li her  
cî mîletê me lişyar bûye û dibe. Qovar û  
qitêbên me bi zmanê me derdiqevîn.

Ji bona em mîletê xwe bi xelqê nas-  
qirin bidin divê xortên me ji nezer û  
galgalên biyanîyan îbretê bigirin û xwe  
bavên guliyên dara mîletê û bi hejînin.  
Hawar guliyeq ji wê darê ye.

*Kedrican*

## Hisyarî

Ne ceng û şer, şeva tarî, ne mêrani, ne Qurdistan,  
Dilê min zexm û nêrin e bila her cih be goristan.  
Ne ma govend, ne ma zurne, ne ahenga dilê xortan.  
Qeser û giş qul û uale, bi xem mehdiq bi xem Botan.

Ji hêlqê ax û hawar e, ji hêlqê xwîn û qortal e,  
Ji hêlqê laşê xortan in, ji hêlqê dengê kertal e.

Ji hêlqê zaroyên sêwi, ji hêlqê jin jinûbî ne,  
Ji hêlqê sed birîndar in tu qes naye û nabine,

Hevalê bûq û destgirtî ne ma kesr e ne ma hêwân  
Hevalê jin û dê êdî şeva tarî û goristan

Ne ma Ewrex, ne ma Dêrgul ne man dengbêjê Qurdistan,  
Ne ma hexçe ne ma sosin ne ma mamiz ne ma zozan

Ji hêlqê laşê zaroyan ji hêlqê destgirtî

Quro rabe, bi camêrî çima nayî çima sist !!!

Hevalê hev bibin êdî hevalên hev brayên hev  
Hemî mêr in hemî qurd in hemî yeq dev.

Ne botî me, ne xerzî me xulamê axa Qurdistan,  
Ne mîr im ez ne axa me peyayê dewleta qurdan.

Welatê min tu î gevre bi nav û deng şehînsah î  
Tu mîr î hem tu axa yî tu hem sultan û hem şah î  
Buhîsta erd û ezman î çiraya dil tu î armanc  
Hemî dil in xulamên te heçî qurd in heçî qurdmanc.

Bilind î tu welatê min, welatê bav û qalên paq,  
Tu xweşbihn î tu xweşreng î tu xweşdeng î welatê çaq.

î gul û rez bi deşt û gir bi kesr û burc tu ava yî  
Tu sîng û pêşira maq î tu î mehdiq tu ewra yî

Welatê min biqen êdî hemû qurmanc ji xew rabûn  
Bi rûyê te, bi çavê te dilê qurmanc hemî şa bûn

Ciwan in lav û dilên te bi hevîn dil geleş xurt e  
Rêya me dûr û dijwar e bi hêvî rê geleş qurt e

Tu rêber be tu fermanber em in leşqer em in esqer  
Xudanê evd û îman in bi izna Yezd û pexember.

Ji bo me roj û hêv êdî çira ne pêt û ronahî  
Kirênê qurd û Qurdistan bi zanîn e bi avahî

Xweyî dîroq xweyî esl in me da zanîn me da Zerdeşt  
Welatê qurd gulistan e, gulistan in zevî û deşt.

Welatê min, welatê xweş welatê paq, Qurdistan  
Tu hêlîna ciwan û xort tu î gewher li Xuristan.

Dinê geş bû û talî geş û tîrb û gorn ji dil şa bûn  
Welatê min biqen êdî, hemî qurmanc ji xew rabûn.

*D. Lamiran Ali Belir-Xan*

## Mîr û Qund

Di wextê xwe de mîreq  
yê Cizîrê hebû. Geleşî zorqer  
û dilhişq bû. Xelq nema diqari  
bûn zilma wi biqîştin, xwînî  
bûn û ji welatê xwe derqetin.

Cizîra Mîr Şeref mîna  
deşteqê, bê avahî û şenahî  
ma. Avahiyên Cizîrê ji torî  
û bûman re bû bûn seqan.

Mîr rûjê, ji qer ve, der-  
qeti bû gerê. Ji xerabeyê  
gundeqî dadiborî. Du qund  
li ser dîwarên qavileqî ve-  
niştî, diaxaftin. Yeqî ji ê  
din re digot:

— Mamê qund, qeça xwe  
nadî qurê min?

— Ser çawan, lê barê qeça  
min giran e, ditirsim qo  
niqari bî hilgirî

— Heqê behsa kelenî diqî  
hêsanî ye. Qundê paşin qenî  
û ji ê pêşin re got:

— Ma çawan hêsanî ye,  
hay ji xwe hebe, kelenê  
qeça min beramberê çend  
gundan e.

— Herê, min hay ji xwe he-  
ye, lê dîsan dibêjim hêsanî  
ye. Ma di welatê me de ji  
gundan bêtir çî heye? Ma  
tu nizanî qo Welatê Cizîrê  
ji zordestiya mîrê me vala  
bûye, erd û zevî tevda bê  
xwedî mane. Tu hema ji  
min gundan bixwaze. Her-  
çend bixwazî, ewçend bi-  
dim te.

Weqê mîr ev xeber bihi-  
stin, geleş ber halê xwe qet  
û jûvan bû. Ji wê rûjê ve xwe  
ediland û êdin zilm ne diqir,  
digel xelqê xwe di lovan û  
mihirvan bû.

Xelq ev bihistin. Vegeri-  
yan hatin cihên xwe û wela-  
tê Cizîra Botan ji nûve ava  
û sên bû. *Loçerê Botan*

## ELfabêya Qurdî

10

Bê şiq e qo awayê bilêvqirîne bi (pez, sed, esqer, ereb, elî) li dengayîya qurdî çetir tê û duristir e.

Ez qo botî me van (ê) yên ha ne weq piraniyê, lê weq hindiqatî yê, yanî stur (ê) bilêv diqim. Digel vê hindê, madam em irû elfabeqê ji bona zema-neqî-ne ji bona zar û zarawayan-çêdiqin ev dengê ha niqari bû bête nişan qirin. Herweqî me ji nişan ne qir û ne xiste elfabêya xwe.

Min pirsên jorin, ji hin xortên eşira xwe û eşirên dorê-qo hîni elfabêya Qurdî qiri bûn-da nivisandin. Ket li xwe ne geriyan û bi (e) qe adettî nivisandin. Hingî min ji wan re ji (ê) ya stûr kal qir.

Bi awaqî welê li min vegerandin qo pê mesele safî qirin. Ji min re gotin: (Di nav wan herfan de qo te nişanî me qirin, me bê dişwarî ew herf peyda qir qo wî dengî biqare xuya biqe. Jê diyar e qo ew deng tinê bi wê herfê tête nişan qirin û ne bi herfeqe din).

e, i, u, — ê, î, û,

Niho, me ev şeş herf hene qo di pêşberê hev de du tofên di şiqî de nişingî hev ditînin pê.

Em van çarên jêrên bibin destê xwe û bi van mijûl bibin:

e, i — ê, î

Lê herweqî me berê ji gotî bû, di dengayîya qurdî de, dengdêreq carinan qin û carinan drêj nabit, yanî herçî dengdêrên qo qin in drêjên wan nîne û herçî drêj in qinên wan peyda nabin.

Ber vê yeqê dengdêra (e) herçend bête drêj qirin tucar nabit (e) ji ber qo cihderqên wan ji hev cuda ne. Herweqî (i) ji bi drêjxwendinê nabit (î).

## DI ŞOREZAREQÊ DE

Ez û hevaleqî xwe li ser rêqê dimeşin  
Em ji qêra hatine quda diçin? napirsin.  
Ji halên xwedizanin em rêwînin kedim in  
Çikas zeman dibore xwe bêmecal dibinin  
Sol di lingê me nema, pritine cilê me  
Neynûqê me dirêj in, bûne gulî porê me.  
Tinê tistê bi me re qo weqî berê mane  
Qeşqûl gopalên di me, evan bi mer wefane  
Histiriyên çavbeloq, carna di qet lingê me  
Êşa di van miratan davit ta ser dilê me.  
Gava dibû zivistan mericîl canê tazî  
Qu havîna germ dihat bêfêde biqe gazî,  
Hêdî hêdî canê me keşm û kertîş derdixe  
Ber alatan hîn dibin, bivênevê xwe bi xwe  
Bi vîfhawî em diçin, bê eklê xwe bê şûr.  
Ev rêya ma bê dawî pêş ve diçû dûr  
[ qo dûr

\*  
\*\*

Rûjeq disan ji rûjan ket hal dime ne ma bû  
Ne gund û ne gundiyeq ew cih pêda  
[ tenha bû  
Çima şûnda hineq deng hate ji nagihanî  
Lê bala xwe didimê ew deng pir qûr di  
[ nali.

Di destê me de tu herfên din ne ma  
bûn, û gora destûreqe me diviya bû em  
bi herfên hevduanî emel meqin. Ji lewra  
ji bona nişan qirina tofa paşin me ev (a)  
nişana ha pejiranad û navê wê qir bilindeq.

Ev nişana ha di hin elfabeyên din  
de jî heye. Lê bi vê ferka qo di elfabeyên  
din de dengê dengdêran weqe xwe dihê le,  
cihdêrqên wan naguhêrine, tinê bilind  
dide xwendin. Di elfabêya me de du qa-  
rên wê hene: Dengê dengdêran diguhêrine  
û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên  
bi bilindep hemî jî drêj in û tucar qin  
nayin xwendin. (dûmahîq heye)

*Celadet Ali Bedir-Xan*



Min dil qir qo bibêjim : mêze biqî hewalo  
Meger ew jî bihistî, qo gote :

— Ey delalo !

Ev çî deng e dinale ? gelo livî cihê ha  
Nebe ew jî weqe me qeramperê berbi ha.

\*\*\*

Wisn derqet texmîna hevaloqê niqtedan  
Bextreşeqî qurdmanc bû. diqir ax û ox  
[ aman

Min jê re got:

—ey bira te çî hal û hewal e?

Çiman wisn li erdê veqetî û dinale ?

Wijî li min vegerand, got :

— « Derdê min giran e,

« Çîroqa min dirêj e, bêt nivîsîn roman e

« Ez jî qurdên serhedê, Melazgird e gundê

[ min

« Ez derqetî heft sale. Bi hiş û bi dilê min

« Zmanê me bû sebeb, bû felaqet ji bo me

« Mirovên çavsor hatin, jê re digotin: rom e

« Zmanê me î delal « yasak » qrin bizorî

« Zmanê xwe î dixwar bo me qirin

[ mecbûrî

« Êdin curmeq mezin bû, bi qurdmancî

[ xeberdan

« Guhnedanî hedê qê ? heps û sungî û

[ zîndan

« Êdin wisn nedibû, me cendeqan xwe

[ qar qir

« Li hemberî dijminan me hespê xwe pir

[ xar qir

« Lê... feleqê bi me re nebîr serî em

[ keîs man

« Weq e noqên liqevir em li deran bêqes

[ man

« Dê û bavê min hemî bi tevayî wendane

- Hevalê minî ewilî xwe avête nav -

— Gelo tu ket nizanî li qîjan alî mane ?

« Lo, biraol zînarî Çiman tu min nas naqî

« Ez Ferzandê birame, em in jî dê û bavqî

\*\*\*

Herdu bitan himbêz bûn bi qul girî û

[ qeser

Erd û ezman hejîyan, agir qete dar û ber.

*Kedrican*

## L'Alphabet Kurde

9

Ce son est dû à l'influence de la phonétique Kurde, ou plutôt a été gardé dans ces contrées sous cette influence ; les montagnes du Kurdistan se prolongent en effet jusqu'au Khozistan, et à Chiraz on trouve beaucoup de Kurdes ( Bextiyari )

Le ( خو ) correspond tout à fait au son que nous avons noté par le « xw » et qu'il est prononcé par les Kurdes.

Le son que l'auteur de la grammaire persane veut noter par un ( قو ) surmonté de trois points, c'est à dire un ( ق ) à trois points, n'est autre que le « q » Kurde suivi de la voyelle « u » amalgame du ( w ) et de l' ( i ) Kurde qui endurecît la prononciation. L'auteur trouvant ce son plus dur que le ( ك ) ordinaire, mais plus doux que le ( ق ) l'a figuré par un ( ق ) en lui ajoutant un point pour l'adoucir, tel les mots ( qul, qur, qun, quç ). Mais la langue persane, étant écrite avec des lettres arabes et possédant une vaste littérature écrite de la sorte, a été très influencée par la phonétique arabe. En conséquence le son que nous avons transcrit par la voyelle ( u ) s'est complètement transformé en ( ؤ ) arabe. L'auteur qui ne pouvait apercevoir la voyelle, a attribué cette variation du son dans la même consonne à une variété de la consonne ( ك ) qui aurait produit une nouvelle consonne, et il l'a noté par un ( ق ) à trois points.

De même certains Kurdes ayant étudié l'arabe dans des Medressets et habitués au système, utilisé par l'alphabet arabe, qui consiste à compenser le manque de voyelles par la multitude des consonnes, prétend que dans la langue Kurde ( à suivre )

Notices sur la littérature  
mœurs et coutumes Kurdes

10

### MEMÊ-ALAN

Une seule personne était arrivée à connaître le motif véritable du deuil de Zîn. C'était Beqoyê-Avan, le magicien de Botan. Comme tout le monde, il avait trouvé l'affaire extraordinaire, et il voulait connaître la vérité. Résolu à trouver le mot de l'énigme, il entra dans son cabinet de magie.

C'était une petite chambre, au plafond si bas qu'un homme de haute taille n'aurait pu s'y tenir sans se courber. Dans un pot contenait un liquide qui bouillonnait comme du goudron. Dans un autre coin, on apercevait des chauves-souris, des ossements et un crâne de très grande dimension. Dans le troisième coin gisaient pêle-mêle de petits objets; sacs, fils, lambeaux d'étoffe, chevelures de femmes couteaux, ciseaux. Dans le quatrième, des têtes de serpents et de lézards émergeaient de vase à demi brisés. Au milieu de la chambre se trouvait un bassin dans lequel nageaient des fées de mer et des poissons de couleurs variées. Un chat noir, dépourvu de poils, maigre comme un squelette, se promenait de ci de là. Beqo toucha le chat de son bâton, puis le frappa de quelques coups. Le chat se jeta sur les serpents et se mit à les griffer. Les serpents s'éveillèrent de leur lourd sommeil et commencèrent à remuer. Tour à tour, les animaux et les divers objets disposés dans la chambre se mirent à danser et sautèrent au plafond.

Toujours avec son bâton, Beqo traça sur le sol un cercle au milieu duquel il plaça un entonnoir; et sur l'entonnoir, il déposa un miroir qui révélait le monde et ses habitants. Au bout d'un moment, des figures apparurent sur le miroir, puis surgit le palais de Memê-Alan et l'aventure de cette fameuse nuit se déroula. Beqo se mit à rire, et dit: « Voilà un nouveau prétendant qui viendra du bord des mers lointaines ». Il laissa l'appareil comme il l'avait disposé; tous les animaux et tous les accessoires de magie menaient la sarabande.

\*  
\*\*

Mem se réveilla tôt; d'un sursaut, il se dressa sur le lit: les yeux fixés sur la bague de Zîn, il se remémorait l'aventure de la nuit. Il s'en souvenait parfaitement: Les noms eux-mêmes lui restaient présents: (Cizira-Botan) (Burca-Beleq). C'était la première fois de sa vie qu'il avait entendu parler de ces lieux; il ne savait qu'une chose: sa visiteuse de la nuit, était la fille d'un prince kurde, et venait de très loin. Mais comment était-elle venue? comment avait-elle pu pénétrer dans ses appartements? Comment avait-elle si subitement disparu? Il ne pouvait se l'expliquer.

Bengî de son côté s'inquiétait, il ne savait comment interpréter l'évènement de la nuit. A deux heures de l'après-midi, Mem n'avait pas encore donné signe de vie; inquiet, Bengî s'approcha doucement des appartements de Mem.

Mêm entendit le bruit des pas; comme il ne voulait voir personne, il cria de sa chambre: « que personne n'entre, je n'ai besoin de rien. S'il me fallait quelque chose, je vous appellerai ».

Bengî revint sur ses pas, et rejoignit ses camarades. Il les consulta. Ils décidèrent d'entrer chez leur maître, coûte que coûte, même au prix de leur vie.

Bengî choisit les pages favoris du prince, et en leur compagnie il entra brusquement chez son maître. Mem ne leva pas même la tête; il était triste, pensif, il semblait qu'il eût maigri et vieilli. Bengî lui adressa la parole:

« Altesse, qu'avez-vous? pourquoi êtes-vous si triste et si mélancolique? S'il s'agit de la jeune personne, qui à l'entrée de la ville, au retour de la chasse au chevreuil, vous a jeté des fleurs, Votre Altesse n'a qu'un ordre à donner. Je n'aurai besoin que d'une minute » . . . .

Mem interrompfit Bengî d'un signe de la main, et dit: « Voilà mes ordres, tais-toi, ne dis rien à mes parents de l'affaire de la nuit dernière. Va me chercher Bogzê-Rewan, prends dans le trésor de l'or et des diamants; fais moi monter sur le cheval de mer et indique moi la route de Cizira Botan ». (à suivre)

## A propos de la musique Kurde

Un de nos distingués lecteur d'Alep, a l'occasion d'une lettre qu'il nous a envoyé pour nous féliciter d'avoir adopté les caractères latins, nous a donné ses impressions sur la musique Kurdes. Il nous a paru intéressant de publier cette lettre qui démontre l'impression que la musique Kurde a faite sur un étranger ne connaissant pas le Kurde. En saisissant cette occasion nous voulons remercier l'auteur de la lettre, pour la sympathie qu'il a manifesté envers nous et pour les vœux qu'il a bien voulu formuler au sujet de notre revue. « Hawar »

Mon cher Emir,

Je vous remercie très vivement pour le No de la Revue Kurde « Hawar » que vous avez eu l'amabilité de m'envoyer, et je vous prie de vouloir bien m'expédier aussi les Nos précédents pour que je puisse en avoir la serie complète.

Depuis plusieurs années déjà, je porte un intérêt spécial à l'Histoire du peuple Kurde, et depuis que je suis en contact ici et au Kurd-Dagh, avec vos compatriotes, j'ai essayé de me faire initier aux secrets de votre langue et aux beautés des chansons populaires Kurdes. Ces mélodies exercent même sur l'étranger qui les entend pour la première fois et qui n'en comprend point les paroles, un attrait et un charme très sensible.

Vous avez réalisé un grand pas dans le chemin du progrès en adoptant les caractères latins pour votre langue aryenne, et en facilitant ainsi la diffusion de l'écriture parmi le peuple. Je suis certain que vous marchez ainsi à pas sûrs, vers une Renaissance de la langue et de la Littérature Kurde; et si vos contemporains n'apprécient peut-être pas tous vos efforts comme ils le méritent, les générations qui suivront vous en garderont une reconnaissance éternelle.

Je salue donc en vous le Pionnier de la Renaissance littéraire dans la Nation Kurde, et je vous prie d'agréer, mon cher Emir, avec mes sentiments d'admiration sincère, l'expression de mes congratulations les plus vives.

*P. G. Michaelian*

Textes et Traductions :

### Bêmalê

— 1 —

Bêmalê, dinê li te qer e, li min fat e  
 Hawar li te qer e, li min fat e  
 Li ser serê min û bejna bilind taveqê  
 [ barana hûr tê  
 W'ezê naqim terqa bejna bilind, çavê  
 [ reş û beleq  
 Heta serê min biqeve li ser darê vê tabûtê  
 Ax rebî rebî . . . . .

— 2 —

Bêmalê ! dinê sibe ye, roj derqetî ji  
 [ aliyê Botan  
 Rebî ! sibe ye, roj derqetî ji aliyê Botan  
 Tavê da li bedena Diyar beqra şewitî  
 [ Kîzan û xortan

— 3 —

Xwezî mirazê min û bejna bilind hasil biqira  
 Minê qirasê ber bedena xwe bifirota  
 Ax eman, eman . . . . .  
 Bêlome ye.

— 4 —

Ax rebî ! megrî megrî tu delal î  
 Hawar çavê reş û beleq ji qilê sibhanî  
 meqe xalf  
 Hema tu min î, qirasê di min î, qirascanê  
 [ min î, helalmal î  
 Ax eman, eman . . . . .  
 Bêlome ye.

### Q sans maison

— 1 —

O sans maison, le monde est sourd à  
 [ toi, il m'est ouvert  
 L'appel au secours est sourd pour toi,  
 [ à moi elle m'est ouvert  
 Sur ma tête et sur la taille haute, tombe  
 [ un nuage de pluie fine

Je ne quitte point la taille haute, les yeux  
 [ noirs et pigmentés  
 Jusqu'à ce que ma tête tombe sur le  
 [ bois de ce cercueil  
 Ah! mon Dieu . . . . .

— 2 —

O sans maison! c'est le matin, le soleil  
 [ se lève du côté de Botan  
 Il jeta la lumière sur les murailles de  
 [ Diyar-Bekir, l'ardente, sur les jeunes  
 [ filles et les jeunes hommes.

— 3 —

Ah s'il accomplissait mon voeu et celui  
 [ de la taille haute  
 J'aurai vendu la chemise de mon corps  
 Ah, eman. . . . .

Ceci n'est pas à reprocher

— 4 —

Ah Mon Dieu, ne pleures pas, tu es belle  
 Ah non, ne laisse pas les yeux noirs et  
 [ pigmentés sans collyre  
 Ah oui, tu es à moi, tu es ma chemise,  
 [ tu es ma « chemise-cœur » tu es  
 [ chaste et pur  
 Ah eman . . . . .

Ceci n'est pas à reprocher

\*

\*\*

Dans la langue Kurde le mot ( qer )  
 qui signifie ( sourd ) et aussi ( muet ). De même  
 que « xwe qer qir » mot à mot « s'est fait sourd »  
 veut dire « c'est tut ». En conséquence le premier  
 vers de la première strophe signifie « tu es  
 encore jeune, tu ne comprends pas le monde,  
 ainsi que les appels au secours ».

L'expression de ( sans maison ) qui n'a  
 pas d'équivalent en français à la rigueur peut  
 être traduite « ô ma petite sans chaumière ».

L'expression de ( chemise-cœur ) nous  
 l'avons traduite du Kurde tel qu'elle est. Elle  
 signifie [ l'enveloppe du cœur ].

Ce qu'il y a de plus intéressant dans cette chan-  
 son c'est sa tonalité. Un genre de mélodie propre  
 à l'intérieure de la ville de Diyar-Bekir, et  
 chanté surtout par les appaches ( pêxwaz ) litté-  
 ralmente traduit ( va nu-pieds ).

Ce genre de mélodie s'appelle ( Keyda  
 binê bedenê ) et quelques fois ( Keyda Hewselê ).

La première veut dire ( Mélodie du pied-  
 de la muraille ). Cette dénomination provient  
 du fait suivant:

L'ancienne citadelle de Diyar-Bekir,  
 jusqu'à nos jours est en bon état et possède  
 différent tour de flanquement qui sont encore  
 habitable. Les apaches de Diyar-Bekir, renom-  
 més dans tous le Kurdistan, mènent une vie  
 tout à fait propre à eux. Ils portent un costume  
 spécial avec un poignard à la ceinture, portant  
 le nom du précieux acier Kurde ( Teban ).

Dans la ville il y avait des métiers qui leur  
 étaient spécialement réservés.

Jusqu'aux derniers tsmpts dans la ville  
 de Diar-Bekir il n'existait pas de maisons de  
 plaisir. Ces appaches divisés par groupe, d'après  
 les quartiers de la ville, avaient installés, sous  
 les murailles de la citadelle dans les tours, des  
 locaux d'amusement où ils amenaient des  
 femmes, jouaient de la musique et s'amusaient.  
 Alors les mélodies des chansons qu'ils chantaient  
 sous ces murailles avaient prises le nom de  
 ( Keyda binê bedenê ).

La ville de Diar-Bekir est située sur  
 des rochers plus haut que la vallée. Ses jardins  
 qui sont dans la plaine et plus bas que la ville  
 portent le nom de ( Hewsel ). Pendant l'été le  
 groupe des appaches avec toute leur organisation  
 descendent aux jardins du ( Hewsel ) où ils con-  
 tinuaient à s'amuser. C'est pour cela que ces mé-  
 lodies quelquefois aussi s'appellent ( Keyda  
 Hewselê ).

Les lecteurs qui s'intéresseront à la  
 mélodie de cette petite chanson, la trouveront  
 dans le disque de la Compagnie Odéon No  
 ( 220597 ) chanté par Mariam Hanoum.

*Hercqol Arizan*

## Biyânû

Ji ber go xweyîyê Hawarê bo qar-  
 ûbarinen qovarê çû bú derve qovar ni-  
 qari bú di dema xwe de derqevit.

Ji xwendevanên xwe hêvî diqin li  
 me megirin û tê biborin. " Hawar "

بیاوړو

له به رچونې خواوې ندى هاوار بو دهر وه بوهندى كاروبارى  
 كوڅاره كه نه توارن هاوار له وختي خويدا دهر پيښرى .  
 تكاله خوښه ره كانمان ده كه ين كه لم بابو ته وه لپان بيورن .  
 ژير كو خوه يې يې هاوارى بو كاروبار نن كوڅارى چوبو  
 درغه كوڅار نكار بو دده ماخوه ده در كقت . ژخونده  
 قايښن خوه هيڅى د كڼ لمه مگرن وتي بيورن .

سنور

لهم روزانه دا قصيده « سنور » مان ، كه له لايښ  
 عبد الخالق اثيرى كړ كو كڼى به وه دانراوه ، وهر گرت .  
 وختي خوى هم قصيده به له مصر به ناوى حاجى قادري  
 كويى به وه له كتيبي « شرفنامه » دا چاپ كړاى .  
 به هي مرحوم ده زانرا . نيمه ايره راستيه كه مان — له  
 سهر آرزوي اثيرى — له توفيق وهې بك پرسى ، فرموى  
 « بلى هم قصيده به هي عبد الخالق اثيرى به » .  
 له نسخه كڼى بره وه ماندا هم قصيده كه ده نوسين وم  
 نه وه ده نوسين كه چوڼ به هي حاجى قادري مرحوم  
 دراهه ته قلم .

بو خوښه ره كانى عراقان

برا كورده عراقيه كانمان هاواريان ، هر له وروژه وه  
 كه ده سى كړد به ده رچوڼ ، به چه شنيكى وا خوش  
 ويست و به روپيكي ، وه نده خوشه وه به پير به وه هاتن  
 كه دلمانى پر كړد له هيو و زات . نيمه ش به رامبر به م  
 خوشه ويستيه هميشه خومان به سپاسدار ده زانين و بو زياد  
 كړدنې هم خوشه ويستى و راپه رومونه ي هم برايانه مان  
 هه تاله ده سمان بيت له خزمهت دوا نا كه وين .

خوښه ره عراقيه كانمان چي له نوسينه كانيان و چي له  
 كاغزه تايبه تيه كانيا ندا پيروزي بابي نه وه مان لي نه كڼ  
 كه هاوار بهم تپپانه و بهم نيسكه دهر ده هينڼ ، و راسپيرى  
 نه كڼ كه هميشه له سهر هم رى به بروين .  
 به لي نيمه ش هم رى به بهر ناده ين ، هم رى به رى  
 يكي تازه به له ژبني داني كورديدا ، و هاوار له سهر هم  
 رى به به هه نكاوى نه له زروك له روپشتندايه .

بيجگه له مه هاوار كه به دو شيوه دهر نه چي ، بو  
 نه وه ش تي ده كوشى كه هم دو شيوه به به به يك نيك بكا ته وه  
 كه هم نه ركه ، چند گران و چند پيروزي به ، لاي  
 شاره زا دياره .

به لام بو كه بيشته هم پيروزي به هومايه شنيك كه  
 ره كه ، ده زانن چيه ؟ ناشي نه ي زانن ، پايه دارى هاواره .  
 هاوار به چيى نه ژي ؟ يې گومان به دراو .

هاوار نه له لايښ كومه ليكه وه دهر ده هينرى و نه  
 له كومه ليكه وه يار به نه سيني . هاوار گوار بېكه كه  
 به هه كڼى تابونه دهر نه چي و هر به و يار به به نه تواني بڅي ،  
 انجا ، ناستارو نه كه ينه برا عراقيه كانمان و نه لين ،  
 « نه گهرده رچونى هاواريان پي ويسته ، تكانيان لي  
 نه كه ين كه هه كڼى تابونه كانيان به ره به ره بنيرن . »  
 هيوامان وايه ، گوى له تكامان ده گيرى .

ژغوره ندرقانان ره

هاوار هاوارا ته به دنگ و گاز پيانه به  
 هكه نه هاوار دقي آرى هاوارا خوه كه

ژلوره مه دست ب دريخستا هاوارى كړ والقاى ياخوه  
 ژ كړدو بيانپانزه دازانين . ايرود ميدانى ده تشتكي  
 چيكرى هيه . كوڅارك والقاى يك . الفابى يك و كوڅارك .  
 نك دليمن ژبونا ايرود ياچيترو راستراغه كو ام هيلاخوه  
 بدن وڅي القاى يې حتا هنگي كو محبتا عدلاندى بكتت  
 پيشى يې وري ل مه بگرت ، پيشقه بين .

د گل څي هندى دقيت از جار كه دن څي پيڅرم كو ام  
 هر گات ميلدارى بكيڅي يې نه و آرمانجا خباتامه يكيڅي به .  
 ام ب گاتڼ ب څين وهشك برب آرمانجا خوه څه دچن  
 و ناسكڼن . ژير كو دستپكرنا مه ژخوه ب درنگي كتيه .  
 ام غا دكارن دهيشى يې ده بسكڼن .

گلک سپاسان ل پيروتي دلال دم كو اڅ هينجتاها  
 خسته دستى من .  
 غوه يې يې هاوارى

ستونا نوکړه شتابان:

## دلی من برد ستونه

هری لی . هری لی زری بی ، ازی نخوشم نخوشی  
 ناقاجیان ، سری من عقدا لی خدی ناسکته ل سر بالگیا ،  
 درمانی من ربی خدی کتیه قلی درزیا ، کسکی خدانی  
 خیران تونینه بدستی من بگره من باقیژه سر ربکی آف  
 آیان ، بکی خدانی خیران دردی دل دیتیبو ، ب دستي  
 من گرتی از آقیم سر ربکی آف آیان ، منی بالا خوددایي  
 ژ و بدا تن جوتی دزریان ، یکی ژوان زریا گوت فقیرو آف  
 چه حاله توتیدایي ، یادنی گوت لی لی پور کوری ماتو نزانف  
 نه تاویونه باویو ، دردی کامباخی دل چتنه بویه باکتیه  
 فان هستیا ، بک ژوان زریا سباخیرا خوب سر مدا خوار بو ،  
 منی کوری از هریمه طوفا خالا روپا بژشابونا دستي من کته  
 حللی موری مرجانی استیا ، حللی موری مرجانی استیاب سر  
 من عقدا لی خدییدا دقتیا .

ثی زری بی اسمکی ل من خاندی از کریمه موربکی  
 آقیمه ناّف انجیا ، شفا نیقی شف بو ازب خوافا هاتم ،  
 ازوکلش گورا خوکنن کیف حنک لا قردیا ، منی نزانف بو  
 پیره کی دمالدا هبوسی وسه درانی پیریبو ، هرسی وسه درانی  
 پیری ژی دیشیا ، حتانی سبی آلی ب آلی پارخان ب  
 پارخان ول دگریا ، ویلاب پیری کلې کذابې شیطانی  
 فسادی فنونی ملهونی : سبی شبکی رابوب ناغیدا مشیا ،  
 کیف حنکی من زریامنا دلالی کوه دنکی آقیمه ناّف گدیا .  
 گندی بی مال شوبتی کر نه جرمکی مزنا قیننه اشې بی مهردویا :

ده وایي فلکا مال شوبتی بی بخته بمرانایي ،

از کوریم از کوریم از کوریم ، چودورا صلاح الدین

سلطانه ، هاتی دورامو فانه ، هون رابن گلی کردوبرانه ،  
 أم شرابکن ل سرفان دژمنانه ، دژمن دبیژن کرد بی خودی  
 مانه ، هون بزاین أم نه ب خودینه ؛ خودی بی مه  
 بدرخانینه ، أمی هلدن عقدا شیخ سعید شهاب الدینه .

صلاح الدینی سرمدی

## زبسامی من وجدی جبل باشارا

پسام وقتا فابنده کوهی ل هاواری نفیساندی باقی من  
 کو دخونه عشرامی بران لدورا باقی من پر رونشوبن  
 باقی من ژی بدننگی زیز دخونه من بالا خوه دای هم باقی من  
 هم ژی جفاناوی هستر کتنه چاچی کشکانه . پسام از  
 ژی و که ته کورده کی قچیکم و که ته از ژی پر پر  
 ل هاواری هوس دم . هن جاران دجی خوه دا د خوینم . خو  
 من دغر بولنی سبه دا هشیار دم کو هین هاواردستی مندایه .  
 تی بالامن کو ایقاری من خوه ندی به . از دې خوافا چومه  
 دیسا دست بخوه ندینی دم لی سرفی بنداته ازو هفالیین مین  
 ام کیش هشیار بون مه بی هفرا کوت گلو میزه کن  
 وجدی ژی فنا مه کورده انچه کی کچکه لی بندک  
 چقاس خوه ش نفیساندی به از ژی و که ته دبستانی بیانیا ندا  
 دخوینمه بلی پسام از ژی توجار ژی خوش نام ژر کو نه  
 بزمانی مه به از هین قچیکم عمری من نه ۹ و دهن ۱۰ و کاته  
 نکارم خوه ش بنفیسنم فا پرسن کومن نفیساندی ژی دی  
 رو په لی هاواری دا کومن بنده ته خوه ند ژر گوتینن ته و کیفا  
 من هات قاپرسانا من نفیساندن آف هشیار بونا من وهفالیین  
 من دیسا دی روی کوردمانجی قچیک ئی مینا ته به پاشی  
 هر دو چاچی ته ماچ دم پسام . فوزی مصطفی شاهین

لاوی میری بران

وشی چریا بری ۱۹۳۱ ده گوت وکارین درختناوی  
 دپیشیا گجو کی ده (شباط) بیک آنبو . چار مهان  
 ازل هشی بی مام ، دا کو ب دستبرای خوه فه دست بدست  
 الفایکه ولی درینم کو پیشده تری ل دو بتی بی شمکت .  
 لی هروکی من ژورقه گوت ل من نه دهات فگراندن .  
 ژی بیتر ژی من نکار بو ازل هشی بی مینم .

دپی ره توفیق وهی بک چو عراقی . لی تشغلن نخوش  
 قومین کوژ بونا هر کسی ناسن . دگل ثی هندی من ژیره  
 چند جارن نفیساند ، لی لمن فنگراندبو . ثی پاشی بی مه زانی  
 کو نفیسارین من نه گهابون دستي وی .

ژخوه در کتنا هاواری ژبونا ثی بکی درنگ مایه .  
 هاوار دهما گلانی ده درکت . من رخصتا هاواری دبست

## لسر بکيتيا زماني کردي

— له بو پيروي خوشه ويست —

گوتهين خويي بي بندا (عکس صدای هاوار) گلك راست  
 وفتجن . دسروان ره ت گوتن نينن .  
 هرو کي مه چند جار ان گوته بکيتيا ملتي کردي بـ  
 بکيتيا زماني کردي تپته پي . د بکيتيا زمين ده  
 گافا پيشين زي بکيتيا حرفانه . ياني ژبونا نفيساندا زماني  
 ملتي دقيت زانا وخوندا وارين وي ملتي ب تقايي ژبونا زماني  
 خوه الفايکي بيژيرن وهکه دوي زماني ده چند زار هته ،  
 زار همي ب وي الفايي بي بينه نفيساندن .  
 ژهژمارا پيشين هه خويابه کو آرمانيجا هاواري آپيشين و  
 بنگهي آقه :

### « دهر نشتي ره بکيتي »

آف آرمانيجا ژمه ره بو به دستور . حسانه و ام بـ  
 دسنوري هه چون ، ايرو دجن ، و دداوي بي ده دي بچن .  
 و کي نهو ، کرييار بيا هر روز نامه و کو فاري ژبونا  
 ولاتي بيانينان ژجهي چاپکرن گرانتره . لي هاوارا کو  
 دهر نشتي ده ميلداری بکيتي بي به کرييار بياخوه ژبونا هر ولاتي  
 کو تپده کرده هته وک هف کر نه . بـ  
 هاواري زبان دبه . ژبر کو حقي پوستي ژبونا سوري بي  
 (۱۰) ساتيم ، لي ژبونا عراق و ايران ولاتين قفقاسي (۱۵۰)  
 ساتيمه . لي ام پي قائل بون دا کو کردي کرييار بيا  
 هاواري ده ژي وک هف بين .

بلي ام دزانن کو زمانزاني ب قيمت وهيژا مامهوسته بي  
 گرام توفيق وهبي بک ژي ب حرفين لاتيني الفايي بک چيکريه .  
 پيرار و کي مه هقدول شامي ديت الفايي بين خوه ژ  
 هف ره دان زانين و او دانين برهف . دناقبرا وان ده فرقن  
 هبون . مه دل کر دجهده الفايي بين خوه بکيهين هف وژ  
 هر دووا الفايي بک نو بيژيرن و بلاف بکن .  
 هنگي دستبرايي من ئي خوشه ويست و گرام دکوت کو  
 هن سر الفايي يا خوه دي بچتم . ژلورا بک کرنا الفايي بين  
 خوه مه آقينو داوي بي .

تف ژناف مهرا کر نه . گلو « زيد قائم » ژمره چد که ؟  
 ام شانزده سالان دخوين ، هيژ ترانن عربي مژول بين و  
 نکارن چند خبران ب عربي بفتيسينن و زماني خوه ژي ژبير  
 دکن و ترانن بخوين . آف ژي ژ دستي شيخان هاتيه مريمه !  
 چمان ام سر بلند نابن ؟

لورا ام ، و کي خلکي ژهفالي خوه ئين بلنگازره بـ  
 دظوه شي جقاتان چينا کن . ملا بين خلکي ب تقايي جقات  
 و خباتي ژ ملتي خوره دکن ، پيران دجفينن ، بلنگازي خوه  
 پي خوه دي دکن . ام ، ملا بين کردان ژ بلنگازي ملتي  
 خوه دخون و نادن . گلو چمان ام ل آورو پائي تماشا نا کن  
 و يال ملا بين مصر وهندي ميزه نا کن . چاوان او ژملي  
 خوره دخبن . ترخودي نه روايه کو ژفي ملتي بلنگاز  
 بخون و ژوان ره نه خبن . روژک هيه آف ناني وان لمه گلي  
 بکي . دوي روژي ده ، ام نکارن جهاب بدن .  
 چمان ام ب هقره اتفاق نا کن ؟

لورا مه نه خوه نديه . چکو پيائي خوه نده حقي هفالي  
 خوه ناس دکه ، و ندا نا که . اگر لاوي گافانکي بـ  
 قلما خوه مزن پي هفالي وي تف ژويره کياني ديينن . مگر  
 لاوين آغابن . ژبرفي بکي بلنگاز و مزينن دمه ب دستي  
 نياران تپنه کوشتن و ب هقره اتفاق نا کن !  
 چمان ام بي تاريخ و کتپين ؟

لورا ام گازنا ژ ملا و خوه نده وارين خوه دکن . حتا  
 نکا ژمه ره کتپيان ب زماني مه نه نفيسينه ، ب شون  
 خوه ده هشته . هندو افغان و ايران ب زماني خوه دفتيسينن  
 چمان ام ب زماني خوه نا نفيسينن ؟ گلو زماني مه و که زماني  
 خلکي نابه ويا ام بيکيرن !! زماني مه زمانکي سقکه ،  
 چالا که ، چلگه ، فره هه . هر پرسکي دهمبري پرسوي زماني  
 خلکيده هيه . ژ زماني خلکي سقکتره . حچي کو  
 بالاخوه بدني تاقل بزائن کو زماني مه ژ زماني خلکي  
 سقکتره خوشتره . وهارنگه زماني مه سقک و سر بلند تره ؛  
 و سانه چمان ام ب زماني خوه و که خلکي کتپيان چي  
 نا کن ؟؟؟ آخ آخ نو بيژي لـ بژنا سواري مه تي .

هگر هوين

## الهامي هاوار

- بومفڪوري بدرغالي به کان -

درويشيڪم دي له سهر دخهي شا  
- شاي صلاح الدين - به كول ته گريا؛  
هاواري ته كرد ، ته ي لاوانه وه ،  
دلي انساني ته تا وانه وه ! ...

\*\*\*

درويش ميريك بو خيوي تخت وتاج .  
چرخ لي وي وهر گهرا كهوته به رتاراج ...  
اي چرخي غدار ، افسر بازيچه ،  
به حصير گيري نرش وقاليچه !  
سهر ي را هاتوي تاجي سربستي  
كه ي ته نه وي بوزندان پرستي ؟  
سنگي كه تخته جيگاي آرامي  
كه ي قنيات ته كا به ياي ناكامي ؟ ...  
وهك شير نر كافي ، وهك آگرهه لچو ،  
زنجيري پچران ، له زندان ده رچو !

سویند به آور کده ومزگهوت و کلیات ده خوم  
سویند به آسته وو قوران وبه تورات ده خوم  
سویند به بیت و حرم ومغ کده و تات ده خوام  
سویند به خوینی شهدای کورد وبه سادات ده خوم  
عاقبت بهره پهبشانی به دل سوتاون  
هه ی وطن تا کو فلک چه رخه نه دات و نه گه ربي  
آوری عشقت له همو چه رگ وهه ناوی ته گه ربي  
ناوی تو سهر گوئی ناوانه چی ممکن به ده ربي  
تاوی به خت وه دره وشیت عدوت گه ر بدربي  
دلی دوژمن له رقت لهت له ته چاوپر آون .

هدوك

گه لي هه له تي برد بوپيچكه ي تخت  
به لام نه خوسا به ردي دلي بخت ،  
گه لي كيشاي دست بوجه ي افسر .  
به لام ناوچاوي نه نيوسي ظفر ! ...  
سهر ي خوي هه ل گرت ، روي كرده شاران:  
تويشوي ري ته نيا عشقي كوردستان !

\*\*\*

ايستا له ده شتي شام له سهر قبري  
باپيري گه وره ي بو ولات ته گري ،  
بو ولات ته كا شيوه ن وهاوار ...  
كورده غيرتيك زينهار ! صد زينهار !  
به كومهل بگرن گوي له هاواري :  
كومهل جلب ته كا رقتي باري ! ...  
گوران

## قولوا الحق ولو على انفسكم

ژبونا شېخ و ملان !

گلي سيدان ازي چند گوتنا ژوره ببېژم ، گرك هون  
نه خيدن . ژر بښه چمان ام بلنگازن و خلك دولندن . لورا  
ام نزانن . چمان ام گاذا چوخ ب ده مجيديان د كرن و ام  
گاذا شالي خوه ب ده قروشان نا كرن ؟ وها رنگه كرين و  
فروتنا مه تفده ژمره زياته ، نه كاره اف ژي ژدستي ملا  
وشېخان تي سرېمه . لورا جاره كي دناف و عظ و گوټني خوه ده  
ژمره نايژن .

چمان ام نزانن ؟

لورا شېخ و ملا بين مه روژ كي ژمره نايژن كو ژخوه ده  
دبستان و مدرسان چيكن . اكر چند مدرسه ل ولاتي مه  
هنه ژي ديسان سېداپين مه ژمره ژر « زيد قائم » پيښه  
نايژن . علم حساب و هندسه و فلڪيات و حكمت و صنعت



## ههري وطمه

له خهوی غه فلهت هه استه که ده میسکی تهنگه  
چهرخی که چهره و به شه و شور و ورق و نهی ره نگه  
هه لسه و ختیکی گه لی پیسو و رهش و پرده نگه  
وهه بی دهنگی و خه و بو هه مو کوردی نه نگه  
نهنگ بو پیایوی خرابه که له ریزه ی پیایوان

دهمی دانیشنن و آسوده نی به تیکوشه  
وختی سستی بو که چی و لیزی نی به بخروشه  
روژی سهر خوشی و بی هوشی نی به هه لوشه  
چاخی خودین و آوینه نی به دای پوشه  
روژی یک بون و فونونه که نه کهن فووتاون

گهر له خاکی سنه وو بانه نه گهر بابانیم  
گهر له کوردی لهک و لوور گهر له شنوو لا جانیم  
گهر له گوران و جهان بگلو نه گهر سورانیم  
گهر برو کی و به کری ایلی دزه و بوتانیم  
هه مو وهک یک به بهشی سودو زیانی ناون

اهلی ههولپرو سلیمانی و نه کره و زاخو  
رانیه و پژدهرو چوارتا و رواندز تا کو  
خاقتین مه ندلی و آمیدو چی ژه نگار و چی خو  
کفریسی و پروی وو کر کوک و هه له بجه و شاهو  
باوک و دایکیان ییکه یک ملتن و یک ناون

گهر مسلمان و دینان و به زیدی و گه برین  
زاده ی یک ره گزی و تیره و و شاخ و به فرین  
وه کو پینج تامسکی ده ستیکی زلین تاده مرین  
گهر وه فرین له ده می دوژمن نه ده ین وهک به برین  
ور بلا و بین و به نه نها وه شکین سوتاون

شیرین نه م شاخ و چیا یانه بی کورد جیا نه  
کوردین و خاکی وطن دایک و هم باومانه  
آسکی نه م چیمه نی کوردیه نو وطن چاومانه  
یازی هیلانه بلندی و وطن بالمانه  
هه پهره ووهی یک دابه نی خاک و آون  
تهی شه مال هه لسه به بهدخواهی خراب بیرلی

دهست له خاکی وه هه پیروز نه دا لاچی هه لی  
سه ری پیایوانی له خوینا وه تلی به لکو گه لی  
نهشی بی دهست و ریژی له چیا و بکو و گه لی  
خو مه رنجینه برو تا کو له وه قدا ماون  
ناوی نه م خا کانه نه وانه نی به کوردستانه  
جیگه بی به برو هه ژیر آژده رو هم شیرانه  
خاکی نه و چاترو خوشتر له هه م خا کانه  
ناوی آزادی کورد تیشک پهرو دهخشانه  
نه م کوردن نه کسه غیرن که بلیی زور خاون  
نه م خاکی که که فهر هادی هه بو بو آشور  
نه م خاکی که که خاوه ندی سریر بون و غیر  
نه م خاکی که هه م پیایوی دایرو بازور  
بو همورابی هه بو کاوه و بو ظلمت نور  
ماتی خاونی شان و شرفن هه م ماون  
برزی و زیره کی نه م ملته هیشنا ماوه  
دین و آین و کتیب بونیا ن هیشنا ماوه  
بی شون تهختی سلیمان یان هیشنا ماوه  
گات و آسته وودین کوردیان هیشنا ماوه  
خاک و خول ملت و آثارو نیشانیان ماون  
روژی روناک و رهش و تالی و خوشی زورمان دینی  
جهرو کوشتاری هموراب و سکندرمان دینی  
ظلمی آشورو سکیت کلدی و بیزانسان دینی  
دهشت و صحرائی عرب پر له لهش و خوینان دینی  
ظلمی چه نگیزی بوتیجوری که چیهست هه رمان  
خاکی کورد ماتی کورد شور و شه ری زور دیوه  
گه لی جار چول و چیا بی پر له که لهش په ستیوه  
کیله شین شاهده نه م خا که به خوبن ره نگیه  
تورک و تاتیک و عجم کوژنتی کورد هه رژیوه  
گه لی شاهانی جهان به م غمه دل ره نجاون  
شیری کورد ژدهره له هه رشان و سه ری گهر بکهوی  
ده کوژی بوچی ده کا بیتو نه گهر سه رنه نهوی  
اموی و فاطمیه کان چیژ تیان نه گهر راست نهوی  
صفوی و قاجاری دبتیان نه توش گهر بتهوی  
خو . ده بزویی ده لپی کورد شهیدا له ماون

## برديلك

— ر عبد الخالق ائبيري كړوكوي ره —

ای برا شهبازی اوجی فن وهم عرفانی تو  
 صد وکي ابن الاثيری گوری یو قربانی تو  
 تیری خوشخوانی نه صهتان جان ودل ای کاکی خوم  
 ناتوانم از خوه را گیرم ل بر خوشخوانی تو  
 باغ و بستات خوشن سیرانی لی کردم سحر  
 جنة المأوی یه شاخک از رهن و بستانی تو  
 زاب و دجله آثی خابور و فرات هر لا دچی  
 آثی سوری یو عراق از کانی کردستانی تو  
 فارس و روم و عرب محتاجی دخل ودانی من  
 تاجری دنیا جمو محتاجی شغلی وانی تو  
 دین و ملت هر دو فوتان کس ل وان نابت خدی  
 هیچ ل خو هوشیاری نابن عالم و شیخانی نو  
 دائماً جهل و نه زانی بو خوه اثباتی ا کن  
 منفعت هیچ بو مه نادن شیخ و مامستانی تو

هیتوانی مکتبا من گر سرفرازی بین  
 دی بزی آن دولتسا ساسان وهم کیا فی تو  
 صد صلاح الدین و پی صد وهك ابی مسلم هبی  
 فائیده هیچ بو مه نادن سطوت و شاهانی تو  
 گفت و گویت پر خوشه هر چونی فرمات کری  
 نسبتا آری بسه بو عن عن و عنوانی تو  
 لازمه ام هول بدن بو انفاقی کردی مه  
 بختی یو زازانی من هم سوری یو بابانی تو  
 هیوی دارم گو خطانه گرن ل خوشخوانم چکو  
 از نه میدانم بلیم بر شیوه و گورانی تو  
 لی سلاقان از دم دائم لا کرادی عراق  
 لا جرهم دوست وهشال وهوگر و جیرانی تو  
 گرمها پائیزی پاش بی ب خیره پر خواهشی  
 لی هبن پاره ل کن من دی بېم میوانی تو  
 از جگر خونم ل دردان لول من صوتایه دل  
 ملها در دی دلی من لاوک و حیرانی تو  
 هگر خوینی کردی

سوران و بوتان به قرینه تی بگن و دیسان هندی کلهی  
 وای کوردستانی شمالی به که لک بهاریت که کورد  
 جنوب بتوانن به قرینه له معنا که ی حالی بین .  
 نویسنی فرهنگو که زور به که لکه ، به لام اگر معنا که ی  
 به کلمات مشتر که ( یعنی نهوانه ی که مالی همو کورده و به  
 تاپه تی هی لهجه یک نیه ) بنوسریت استفاده ی که لی زیاتر  
 لی نه کریت .

من امیدم وایه اگر هاواری خوشه ویست بومد تیکسی  
 مناسب له سدر نم ریگایه وه بروا اوسا لهجه یکی مشتر کی  
 کوردی دا نه مزربیت و یو له به ک تی که یشتن مجبور نابین  
 به که لک هینانی زمانیکسی اجنبی .  
 پروت

که دانیشتوانی خوارو له گفتگوی دانیشتوانی سهرو تی  
 ناگات و به طبیعت حال هه تا له یک تی که یشتن که م بیت  
 دل له دل دور نه که و پته وه ویک بون گران نه بیت .  
 لام وایه پیش همو شتیک و وظیفه ی خوینده واران کورد  
 ههول و تهقه لادانه بویک خستی لهجه کافی زمانی کوردی .  
 به لای منه وه گو فاری هاوار نه توانی له م بابت وه یارمه تیکسی  
 باشی بکات . وه کو :

بی گان له زمانی کوردیدا هزاران کلهی وایه به که  
 له همو لهجه کاندایه معنایان به که و فرقیان نیه . هتا بتوانریت  
 مقالات به و کلمانه بنوسریت که مشتر که و جگه له وه میش  
 مثلا هندی کلهی لهجه ی بابانی تی بجزریت که ممکن بیت

## آخ کردستان

حمد و ثنا بوانس و جان  
بو خالقی کون و مکان  
خصما کو آف نوعی انسان  
دایه ژیرا عقل و زمان  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

چقاس صلات و هم سلام  
اوبت لسر خیری انام  
هم اهل و اصحابی کرام  
اوه رکنی دینی اسلام  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

حچپی کرده منسوب بیت  
بال غیری خوه، مامون دبت  
ب نص حدیث اثبات دبت  
بی باف و بی قیمت دبت  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

کانی ولات باف و ویران  
کانی او دنگ کا دلبران  
کانی چیا کانی زوزان  
کانی او یزف کانی باران  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

حچپی ولات ناحینه  
رومتاوی هر حال نینه  
بال بیغمبر مقبول نینه  
ناموساوی بکجار نینه  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

کسی حبا ولات نکت  
نعمتی خوه و ندا دکت  
آیت و سان حکم دکت  
ژ بو خوه ره محروم دکت  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

ولاتی مه گل و ریجان  
ژی تینن هر بهنا جنان  
ام پی بونه مست و مستان  
حتا ابد آخر زمان  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

هر چند ولات وک شکره  
حالی زوزان شیرینتره  
او شیر و ماست هیژ خوه شتره  
ب هزاران ژی چیتره  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان  
عشقا ولات دل شوتاند  
جان و جگر تف پرتاند

صبر و عقل ثنفا رفاند  
قوتا پی ثنفا ستانند  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

آه ژ دستنی فی فرقتی  
آه ژ دستنی فی هجرتی  
حتا کنگی فی غربتی  
دام بچن ناف ملتی  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

اف گوتنا سلیمانه  
او ژ نسلا بدرخانه  
خدان دردو بی درمانه  
فلک ژیره بی آمانه  
حبا ولات ژ ایمانی  
آخ کردستان، آخ کردستان

سال : ۱۹۱۱ . سلیمان بدرخان

\*\*\*

هرو کی قدریجان ده‌ما‌ر مارا هاواری  
آسی یاده نفیساند بو سلیمان بك لی  
شاخی ب دستین ژندرره . بین ترکو  
هاتبو کشتن . شعرا ژورین یای به .  
قدریجان ژیر دزانی بو ژمره نفیساند ام  
ژی ژبونا شا کرنا رحی وی ل هره  
بلاف دکن . رحمتا خدی لی ول  
مالبا‌ناوی بت .  
هاوار

تروه کار به ده ستانی خوشه ویستی گو‌قاری هاوارچه شنه  
تیبیککی تریان ههل بژاردوه که لگل هنه که ی توفیق  
وهی بگ ریک نا که ویت . آیا ممکن نیه بو ئه‌وه ی ری  
به سدرلی تیک چون نه‌دریت . کومیلیکی شاره‌زا له‌م دو  
تیبیه وورد بینه‌وه ، یایکیکیان ههل بژیرن ویا یکیان

بجهن و به و ته‌رمه تیبیککی بک ره‌نگ بوزمانی کوردی داینن؟  
بیری دوه‌مم له بابت لهجه‌ی کوردستانی خوارو  
وسه‌رو ووه به . هرو کو جاریک گو‌قار یکی انکلزبکی  
نوسیوی «طبیعتیش به‌رام‌به‌ر به ملت کورد غداره» و به  
موانع طبیعیه کوردستانی به نوعی له بک جیا کردوته وه

# هاوار

کوفارا کردی \* مجله کردیه

## عکسی صدای هاوار

بو خاوهنی سه ره رزی گوڤاری هاوار :

به خوش دل و گشایشی گیانهوه چند نسخه بکی  
گوڤاره گرا! نهبا که تاتم خوبندهوه . به راستی دلی تنگ  
ئه کاتهوه و بیبری ووشک هه هاتو آو ده داتهوه . یزدان  
پایدارتان بکات !

ئهوهی زیاتر هیوا ئه بخشیت و تین ئه دات به توانا ؛  
ئهو ریگای تجدد و تازه گی به که کردوتانه به نشانه . ههوهل  
گهواهی ئهوه وهر گرتن و بلاو کردنهوهی تیپ ( حروف )  
فرنگی به . به راستی بوژ یاندنهوهی کورد وادیات  
کوردی ئه مه هنگاو بکی پاله وانانه به .

لهروژ بکدا که جهسان له ناو شورشی و هه رای زمانه  
دینیکی کون و دامز راندنی دینیکی تازه دا ئه تلا بهوه ،  
لهروژ بکدا که باوهر بکی هزار ساله له گل باوهر بکی  
چند روژه دا که و تبوه زوران بازی و لهروژ بکدا که  
سیبهری همایون ایزد و گیانی پاکی زاراتو شترا له ناو نیزه  
خویناوی ورمی سورمه لگه راو ایران زمینی بهجی هیشت و  
فر بنده بو بار گاهی آسمانی — آله و روژه دا زمانه کوردی —  
آقبستائی ه ظلم و زور به رگی شیرین و نازداری خوی  
له بهر دا که نزا و جلیکی لایه ی له بهر کرا که هم پی که م  
بو وهم لی نه ئه هات .

ئه م جله غیر طبیعیه له گل خو بیدا زور سرو سیمپالی خسته  
ناو ههستی زمانه که مانده ، آهنکی شیرین و دلنوازی  
« آقبستائی » ی شیواند ، گیانی زهرده شتی زویر کرد و به م  
چه شنه بهره به کی بهاداری تاریخی کوردی پیش اسلامی  
شارده به .

نیازم نیه له م چند دیره دا بو تاریخی کونی کرد  
بلاو نیمه وه و یازامی دل بکو لنیمه وه . بلام ئه وهوی  
ئه وه نده بلیم که کشفیات زمان شناسی و فیلولوجی به تهوای  
به همو کس پیشان ئه دات که زمان که رتیکه له  
ههستی معنوی ملت ، زاده ی ملته و به وه وه نوساوه . و به و  
اعتباره که زمان واسطه ی ده رخنه ستی بیر وهوشی ملته  
بی گان زمانی هر ملتیک له طرز ادا و معنادا فرقیکی  
گوره ی هیه له گل هی ملتیک تر . سه ره رای ئه وه یش  
نفاوت عرق ، محیط و استعداد اساسی ملت تأثیر کی زوری  
هیه له بیک هینان و ربیک خستی زماندا . له م روه وه همو  
زمانیک هه ندی « کاره کتهر » تایه به تی هیه که  
له زمانیکی تر جای ئه کاته وه ولام وایه هر بو به له زمانه  
فرنگیدا به تیپ ( حروف ) ئه لین « کاره کتهر » .  
کوردی بیچاره له گل گه لی شتی تر دا تپه که شیان پی  
وازی هینا و ئه وه شیان بی روانه بینی .

شیان دلخوشی و سپاسه که پاشی هزار و ئه وه نده سال  
واهوشی هاته وه سه ره نه تهوهی ساسان و میدیا و بهر گیکی  
جوان و بهجی بو زمانه که مان هه ل ئه بژیر ریت . به م  
مناسبه ته وه دوشم هاتو ته بیر که ئه وهوی بی خه مه بهر چاوی  
کار به ده ستانی گوڤاری خوشه ویست .

له پاشی ئه رک و خریک بونیکه چند ساله بیک له زمان  
شناسه قیمتداره کانی کورد — توفیق وهی بگ — له سه ر  
بنه ی لاتینی تپه ی بوزمانی کوردی هه لژارد ، الفابته کی  
له سه ره و تپه دانا و گه لی لاوانی کوردی عزاق فیری ئه و  
تپه ی بون و ایستا به که لکی ئه هین . که چی له سه ر بکی



سال ۱

هه‌ما ۱۰


بکشیب

۲۳ چر پیابری ۱۹۳۲

# هاوار

السنة ۱

العدد ۱۰



العدد

۲۳ تشرين الاول ۱۹۳۲

کوقارا کردی \* مجله کردیه

## تبخستییین کوقاری

د کتورک ۰۶۰ بدرخان

پیروت

قدری جان

جگر خوینی کردی

فوزی مصطفی شاهین

کوچری بوتان

صلاح الدینی سرحدی

خوه بی بی هاواری

ج ۰۶۰ بدرخان

لیلانا راستی بی

عکسی صدای هاوار

گلونه وسانه

ژ ملا وشیخان ره

ژ پسامی من ره

میر و کند

دلی من پر دشوته

یکیتیا حرفان

الغایینا کردی

گوران

سلیمان بدرخان

خدوک

جگر خوینی کردی

د کتورک ۰۶۰ بدرخان

قدری جان

هاوار

الهامی هاوار

آخ کردستان

هی وطن

بردیلک

هشیاری

دشوره زار کی ده

ژ خوه ندقانان ره

م ۱۹۳۲

مطبعة الترقی بدمشق

۵۱۳۵۱

SAL 1  
HEJMAR 11

PENCŞEMB  
10 Çiriya-Paşê 1932

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 11

JEUDI  
10 Novembre 1932

Qovara Qurdî \* Revue Kurde

## Têawistiyên Qovarê

Şin  
Yequetiman  
X. R. Bedir-Xan  
Dr. F. Bêrekdar  
Çirciroqa Bîngolê  
Elfabêya Qurdî

C. A. Bedir-Xan  
Hevindê Sori  
Hawar  
Hawar  
Hereqol Azizan  
C. A. Bedir-Xan

Sinor  
Meşheda Ibretê  
Zarîneq  
Tabûta Bixwîn  
Şehîdê Gewre  
Zmanê min

Evdilxalik Esiri  
Dr. Q. A. Bedir-Xan  
Cegerxwînê Qurdî  
Kedrican  
M. Ehmed Botî  
Dr. Q. A. Bedir-Xan

## Birê Trensizî

Memê-Alan  
Legende  
L'Alphabet Kurde

D. A. Bedir-Khan  
Hereqol Azizan  
D. A. Bedir-Khan

capxana terekî

SAM — 1932

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES**

Damas

Arrou

Damas

Sakk

## PHOTOGRAVURE

### Eyoubiye Frères

*Inscription sur tous les métaux. Gravure colorée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes,*

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse,  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an	100 fr.
6 mois	60 fr.
4 mois	40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an	150 fr.
6 mois	90 fr.
4 mois	60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qiriyariya Qomelê

Ji bona-Sûriya, Tirqiya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî	500 kirûs-sûri — 100 frenq
ŞesmeHQî	300 kirûs-sûri — 60 frenq
Çarmehqî	200 kirûs-sûri — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî	150 Frenq
ŞesmeHQî	90 Frenq
Çarmehqî	60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî tene şandin:

Mir Celadî Ali Bedir-Xan

Şam: Taxa Qurdan



## Şêx Evdirehmanê Garisî Çû Rehmetê

Şin ... şin ... şin ... her der reş ne ma hesîn, dil biqul, can biqeser, çav bi girin.

Bang dan, Şêx Evdirehmanê garisî ne ma, hati bû xêrê, çû rehmetê...

Herê Şêx Evdirehmanê Garisî, ruhniya çavên Onrdistanê, germiya dilên qurdên Kenc, bi du beriqên bêbext, dest ji me qışand û çû. Bû şehidê dîn û milletê xwe, Kurbanî armanca xwe.

Herê bi bêbextî hate quştin. Ji xwe weqîdîn quştina wî nîn bû. Bi mêranî ne dihate quştin. Li pey wî gelec geriha bûn. Ew mêrên Kenc peyda ne dibûn, ne dihatin ditin qo biqevîn pêşya wî, dor lê bigirin, pê biberizin û wî biqujin.

Herê, ji quştina wî re an bêbextî an beriqeqî xêlqî diviya bû.

An ne weq miroveqî adeti di nav nivîna xwe de dê bimiriyaya.

Mirina di nav cihan, ne mirina wî bû. Heyfa xwedê ji jê re dihat, pê kail ne dibû qo ev mêrê bi her tiştê xwe bi dîn, bi zanîn, bi destê xwe kenc, di nav cihan de weq miroveqî adeti bi bayê an bi tayê biêşînit û di pey re kasidê xwe verêqit û emanetê xwe jê bistînit. Evdirehman ne steli bû.

Jê re katileq ji nav malê, goliqê malê diviya bû qo bê tirs û lertz biqeve bin paşila wî, here destên wî û welê wî bide ber tîngê û xencerê.

Heqê dar xirab dibe qurmê wê jê ye. Ji xwe qurmê darê ji darê mebit dar tucar xirab nabit.

Welê ji bû. Dinya li Şêxê me bû bû hevar. Roj çû bû ava, hevalên wî jê dâr qeti bûn, ew bi xulameqî xwe ve di nîzingî gundeqî de li hêviya kasideqî dima.

Hingûra şevê dest bi qetîne qiri bû. Dema nimêjê ji hati bû. Di ber wan re aveq diheriqî. Şêxê delal xwe vemalt, tîngê xwe da xulamê xwe, qet pêşiyê, ber bi avê ve diçû.

Xulamê wî, ji par re, ew da ber tîngê. Derb lê qet, şex li xencera xwe xebitî û lê zivirî, derbeqe din singa wî kul qir.

Xulam, yeqî seirti bi navê Necmo, serê şêxê xwe bi xencera wî jêqir û bir dijminan. Herê bi xencera şêxê xwe, ji ber qo ya xwe di singa wî ra qiri bû.

Necmo hate xelat qirin, em ji pêre. Hewranîyeqî reş bû xelata me.

\*  
\*\*

Herê bang dan, Şêx Evdirehman ne ma, ji bona xidmeta milletê xwe za bû, ji bona wê ji mir.

Nizanim ezê çawan biqarim wesf û pesnê wî bidim.

Şêx Evdirehman ji wan mirovan bû qo dèyên dinyayê qem di ziqên xwe de gerandine.

Şêx bû, mela bû, seyda bû, mêr û mêrxas bû.

Şêx bû, xwedan teriket, miridên wî lê weq pêxembereqî dinihêrtin.

Mela û seyda bû. Di mezhebê şafîtiyê de zanaqî zor bû. Islamiyet weq xwe nas diqir û dida nas qirin. Jê ne mûweq qem diqir, ne ji weq melayên din, ji bona veşartina nezaniyên xwe û şelândina xelqî, lê zede diqir.

Herçend mirovê axiretê bû, ewçend ji mirovê dinyayê, mirovê nûwîni û peşveqetîne bû. Nav di xelqî

dida qo bixwînin, her tîstî hîn bibin. Piraniya fekehên wî bi herfên latîni jî dizani bûn.

Carqê min jê pirsî bû, heqe ji nivisandîna zmanê me bi herfên latîni jî aliyê şerîtê ve tu manî heye. Rûwê wî ê delal û binûr, bi devqevqeneqê zelal bû û li min veqerand;

— Ma çîre hebit, Xwedê emr û nehyên xwe jî me re ne bi herf û şîqlan, lê bi kîseyê daye zanin. Ji xwe şîqlên herfên kurana pêşîn ne jî şîqlên îrû bûn. Ji lewra mîrê min, te qo xwendîye û dînya dîtiye, seh biqe û ji me re herfinen welê bibijêre qo mîletê me zûqa hîni xwendîne bibit. Fetwa bi min re ye.

Min got mêr û mêrxas bû. Herçî mesela Berwarê seh qirine kenc dizanin, ew şêxê delal çî mêreqî zor bû. Bi deh pûnzdeh xulamên xwe ve keza Berwarî raqirî bû. Weqê xwe dida ber qevîreqî, sed zîlamên kenc niqari bûn çepera wî raqin.

Berî sê salan gava me da bû çîyayên Hevêrçan, li xwe ne danî bû suwar bibe, xwe vemalt, du rextên xwe avêtin stowê xwe, tîfing bi milê wî ve, bi pêncih û çend salên xwe, weq xorteqî bîstsalî da bû qaş û şeharan.

Peyayên sist pê xurt dibûn. Xelq pê diseqînîn.

Şêx Evdîrehman qîtêbeq, qîtêbeq mezîn û bepîvan bû. Lê sed heyf û mixabin, li ber nisxeyeqe din ne hate nivisandî.

Liser Qurdistanê te herçî jî bixwesta niq wî peyda dibûn. Dîroqa eşîran, mejvemayên mîletê qurdan . . . . .

Di nav Qurdistanê de zehf gerîha bû. Nemaze halê welatê Botan ecêb dizanî bû. Diqarî bû bibêje ser û binê her berê Botan jî çî rengî ne. Ser haqîm û mîreqên Botan cîroqînen nebihîstî dizani bûn.

Belê şêxê min tu miroveqî holê bûyi, lê îrû tu çûyi û destên me jî te bûne. Nîzanim heyfa min jî qê re bêt. Ji te re an jî me re. Tu çûyi rehmetê, em

## Zmanê min

Qurdmançî zmanê bav û qal e  
Tirba xwe de, dê bi wê dînalê

Qurdmançî ye deng û pîrsa pêşîn  
Qurdmançî be deng û pîrsa paşîn

Sor, gewr û qesq bi rengê qurdi  
B' Qurdmançî, tinê bi dengê qurdi

Bavê min û dadiqa sipîpor  
Banî me diqin jî tariya gor

Qurdmançî zmanê bav û qal e  
Tirba xwe de, dê bi wê dînalê

*D<sup>r</sup>. Zamîran Alî Belîr-Xan*

hişîn di nav derd û şînê de.

Xelq dê bibêjin: Şêx Evdîrehman çû, qelase wî di çolê de ma. Herê mala xwe guhast, bê tirb û gorn, bê rêç û sop, warqor çû . . . . .

No, qurdîno, nequrdîno! yarîno neyarîno! dostîno, dijminîno! Evdîrehman bi tirb û gorn û xwedan war çû.

Lê veşartîna wî jî weq mirin û quştîna wî ne bi awaqî adetî, lê bi awaqî dîn, bi awaqî welê bû qo heta niho ne-nas û neçêqirî . . . . .

Belê şêxê min, min jî te re qefeneqî welê bijart qo hêj tu qelase pê ne hatiye pêçandin, min jî te re tirbeqe welê qoland qo hîn tu mirî ne qetin ê.

Min qefenê te qir: Sor, sipî û qesq û zer, ala te, û min tu veşartî nav rûpêlên hawarê û li serê wî qêla te daçiqand.

Qefenê te qefeneqî welê ye, rûj-qê bêt, jî te vebit û liser qelat û bajarên welatê te re li pêl bibit.

Tirba te tirbeqe welê ye qo ne qêla wê bi brûsqên ezmanî dişiqe, ne caş û diwarên wî bi ba û bagarê hildîweşe, ne axa wê bi baran û lehiyê qul dibe û jî hev diqeve.

Tirba te qîtêbeq e, qo nîfsên mîletê me deste-desta biqin û her nîfs jî nîfsê din re heta paşiyê, hînda rûja kîyametê, jî hevdu re dê bîspêria.

Ev tirba te a abadin e. Min eva ha ji bona te bijart û qoland.

Lê te tirbeqe din ji heye qo tu bi xwe bê hemdê xwe û bê hemdê min hatî û qetî navê.

Ew ji dilê min, dilê min ê jar û biderd e. Lê bi hevîn û hejqrina te ewçend xurt e qo biqare laşê min û qelaşê te heya paşîya emrê min hilgire, û me her du heta hingî bi xwedî biqe.....

\*\*\*

Şêxê min bi pêncih û çend salên xwe we weq zaroqeqî qo di paşîla dêya xwe de dimirit, bê ax, bê nalîn û zarîn bê tek-û-rek û teşxele, bê deng û pêjn, bi rê qetî û çûyî.

Belê tu diçûyî û bi te ne dihesiyan, bîr ne dibirin. Ji xwe bi te bihesiyana qengê ew destê bêbext ê bêserm li te radibû.

\*\*\*

Bigirî Qurdistanê bigirî, bigirî Botan bigirî, bigirî garisî bigirî, bigirî Gozgehê bigirî.

Qeç û bûqên Qurdistanê, guliyên xwe qur biqin, xwelî li serên xwe biqin, reşa xwe girêdin, şin... şin biqin, bi ax û zarînê bigirî.

Tu ji miro bigirî, biqeve pêşiya hemîyan bigirî û binal.

Şêx Evdirehman ji qîsê hemîyan çû, lê nemaze ji qîsê te çû. Bine bira xwe, weqê bi şêxê xwe re rudiniştî çawan li te fedqirî, qusan çavên wî bi hej û hevînê tu himbêz diqirî...

\*\*\*

Ey axa Qurdistanê, welatê Botan, eşîra Garisan halanan di xwe bidin, pesnê xwe bidin, fortan û zirtan biqin û bêjin: Evdirehman ji ax û toza min hati bû pê.....

رحمتی خلیل رامی بدر خان بك



Rehmeti Xelil Ramî Bedir-Xan Beg

ne ma heşin. Dil biqul, can biqeser, çav bigirî.

Bang dan, Şêx Evdirehmanê Garisî ne ma, hati bû xêrê çû rehmetê...  
CelaDet Alî Bedir-Xan

Evdirehman ji heşinahiya çiyayên min belgih girti bû....

Evdirehman di bin qonên min da rabû bû....

Tu ji Hawarê, pesnê xwe bide û beje:

Tirba Şêx Evdirehman di min da ye, min ew veşartiye nav rupêlên xwe, qêla wî daçiqandiye raserî xwe.

Ey'erd ji min bide-xise qo'min ew şehîdê dîn û millet ji te re ne hişt û ne qir para te.....

\*\*\*

Şin... şin... şin... her der reş

## Yequetiman

Ked naşê: ta êsta tenegeyîstibîn qe bo jiyani azadî millet seretay gişt qarêq le naw xomana ( yeqbûnî ) ye: Xwa ne xwaste naqoqî we dûdîlî we hajawe nuklaney sergerdanî we encami perîşa niye... [ Peyje Jimare: 1, lapere: 6 ]

Le herçar hejmari ( 4, 5, 7, 8 ] qovari Hawari xoşewistman, be qurti basî edebiyatî qurdîman qird we her çilneq bêt diyarman qird qe edebiyatî qurdî, ferkêqî niye le edebiyatî ewrupa we weqû edebiyatî zimauani ewrupa kabîli peşqewtine.

Inca carêq waz le edebiyat bînîn

bo carêqi dîqe we rû biqeyne geli qurd, weqû pizîşqêqi mîşiq rûn nexoşi qomeli ( civaqi ) em kewme bidozînewe we bizanîn le layen em nizame çiyeti ? ? çî nexoşiyêqi heye ? ? .. We ew nexoşiyane çilon detwanîu çaq biqeynewe ? ?

Eger nextêq binwarin le kewmi qurd we le ehwalî qomeli, be tewawetî tedegeyn qe nexoşiy here gewrey em gele biçir biçir bûnyeti, we pîrş u bila-wiyeti we şewaw u şilejawiyeti.

Imro eger binwarin le gelani di-ya we yeqe yeqe biyan pişqinîn debînîn hiç gelêq niye weqû ême mal wêran u axir şer bêt, hiç milletêq niye weqû ême biçir biçir u xêl xêl bêt, hiç kewmêq niye weqû ême şewaw u alozaw bêt.

Bo wa nextêq bir naqeynewe we tê nabînîu le ehwalî xoman we waz lew axir şeriye nahênîu qewa le hezaran sa-lewe heta imro wa qurdi darizand u perîşanî qird.

Eger nextêq seyri dewr u pişti xoman biqeyn, neweqû gelani xorawa, her seyri dirawsêqan man biqeyn ew deme tedegeyn qewa—her weqû xawendi ( peyje ) y dil sutaw gotuwyeti— « hiç kewmêq be cestey ême nebuwe, qes weqû emey lê nehatuwe!!... le naw xomana be yeqtriyewe nenûsawin. Her qes le a'stêqewe bo xoy we legel xoy xerîq mawe. Xizmeti bêqane be dil u be giyan, xizmeti xo he bêgarî we he sûqî nasirawe. Le ber ewe : bo çaqey millet hiçyan pê neqrawe we her çiqman bûwe be fêl u heleti bêqane gupçir gupçir le naw bi-rawe. »

Bo wa!!... Hemû xêlati qurdis-tan bûnete dujmin le yeqtrîf. Her yeqe be çawi bêqane seyri ewqeytirî deqat!!.. Bowa !... ( Biradost ) dujmini ( Sûrçî ) ye. ( Herqî ) dujmini ( Barzanî ) ye, ( Bar-zanî ) dujmini ( Zebarî ) ye, ( Zebarî ) duj-mini ( Jalebani ) ye.

Insan dili desûtê, cigeri debirjêt, kurigi pir giryan debêt qe seyri ehwalî naqoqiy qurdeqan we encami xirapiyam naqoqiye deqat...

Hetaqû êstaqe her çiqman besera hatuwe, her çî naxoşivêqman çejtuwe hemû be hoy biçir biçir bûni xomane we pîrş u bilawî we şilejawî xoman besera hatuwe. We her be hoy em na-qoqi w hajaweye kewmi qurd wa dari-zawe we dafetawe we geyste em encame perîşanî ye.

Her « be hoy pîrş u bila wî xo-man, be fir u fêl, bêqane, her roje be corêq we nawêqewe milletyan be tefre tûş u xerîq qirduwe. Bo beng u bawî xoyan pêşûy emeyan pêwist buwe. Le hiç layêqewe maweyan nedawe qe millet le qari xoy wurd bibêtewe. Belam lem zemaneda qewa hemû qirdeweyêqman lê aşqira hûwe, lemewla rêy qoşîşman lê dagîr neqrît.

Milletêq qe le hezaran salewe ta êsta be wuryayî xoyewe he hêzi tiru xencera agadari naw u nişani xoy qirdi bêt, lemewla be qomeli be ilm u me'arif aga-dari zor bo asane...

Ewa ewrupa qe hemû weqû êmen we le êman. Ha qe bilêm : le ser zewiya hiçyan nehêst qe ney dozînewe...

Êmemanan le çaw ekwami a'lema gelê paşqewtuwîn, hiç nehêt bo ewey qe bigeyine rizey diraw sêqanman debê sew u roj he bê wuçan weqû ewan he-wal u tekela bideyn. Le jêr tanût u tewr u tuwanci a'lema nemênîn.

Hawarawi cehalet le ser xoman laherîn. A'lemi cihan be tewawî biza-nin qe ême be rasti le regi ariyan we netewey Madî. ( 1 ) ( tewaw ne bûwe )

*Hevindê Sorî*

Em ji Hevindê Sorî hêvî diqin:

1 — Dûmahîqa benda xwe ji me re zûqa bişînit. Da qo benda wî bir bi bir pey hev derqevit û weq cara pêşîn nayît veketandîn.

2 — Mana pîrsên jêrîn jî jî me re bidit zanîn. Ji ber qo di zarê me de nenas in : şewaw, alozaw, waz, diraw-sêq, peyje, wuryay ( wiryay ). *Hawar*

# Elfabêya Qurdi

11

Gora destûrên me ên bingehî, qo ji bona çêqirina elfabêya xwe me pêqanî û di pêşiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû qo em bê sebebeqe zor ji elfabêya tirqan dûr meqevin.

Li hir e, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr qetin.

Tirq (i) ya qin bi (i) qe bê nikte nişan qirin. Heqe me ji welê biqira û (i) ya qin bi (i) qe bê nikte û ya drêj bi (i) qe adeti nişan biqira çêtir ne dibû.

No, ji ber qo (i) qe bê nikte di nav herfên (u, û, m) û di peş û paşê hîn herfan de tevli wan dibe û ji wan derxistana wê diqeve dişwariyê. Ji xwe tirq ji piştî çêqirina elfabêya xwe pê hesiyân û ji bona veketendina (i) qe bê nikte ji herfên jorin — qo qetiye rex an nava wan — ser herfa qo berî (i) yê dihat îşareteqê berdidan.

Bê şiq e qo me niqari bû em biqevin nerastiyeqe welê qo ji aliyê danîyê xwe ve hati bû nişan qirin.

Jû pêve, herweqî heta niho xuya bû, ji lewra qo dengayiyên van du zmanan cihe ne, isûlê dengdêrên qurdi bivê nevê ji isûlê tirqan dûr qetiye.

Tinê di hekê vê (i) yê de tişteqî din heye. Dibêjin qo di zarê nivro de ev (i) ya ha carinan zravtir tete xwendin. Nemaze di izafetan de. Ji ber qo di zarê nivro de mê û nêr ne mane, jê qetine û izafeta erebî yeqcar xwe xistiye nav wî zarî.

Weqî niho, di zarê baqurî de, gora mê û nêr bûna pirs û navan du siql hene:

Qurê Remo            Qeça Remo  
Qurê di Remo        Quça di Remo

Lê di zarê nivro de, ji ber qo mê û nêr ninîn, ev terqibên ha iq izafetê tene gotin.

Quri remo        Qeçi Remo

Ev izafatên hanî di zarê baqurî de ji peyda dibin, lê ne di zmanê axaftin û nivisandina adeti de, lê belê di zmanê dabê ( edebiyat ) a qevn de, nemaze di şihran de qo bi wezna erûzê hatine nivisandin.

Di zmanê baqurî de ev izafetên ha weq pirs û terqibinen biyanî ne, di nav dîwanan de mane û ne qetine zmanê xelqî. Weqo:

بگراوه یه بك تر نسل میران

Bi elfabêya me û gora bilêvqirina qurdiya xwerû, herweqî xelq bilêv diqin ev misra' divêt holê bête nivisandin.

[ Begzade ye yeq ji nesli-miran ]

Navbera (nesli) û (mîran) me xêzqoqeq êxisti, pê şiqê wî ê biyanî xuya dibe.

Digel vê hindê mirov niqare bilêje qo (i) yên izafetên erebî hergav weq (i) yên qurdi qin û stûr tene xwendin. Ji ber qo di wezna erûzê de ji bona destxistina ahengê ev (i) yên ha qo ( ) a izafetê ne carinan drêj û drêjtir ji tene xwendin.

Lê heqe di zarê nivro de (i) yin hene qo ji (i) ya adeti zravtir tene bilêvqirin ev zravî ne ji guhêrîna cihderqa dengî, belqo ji guhêrîna rengê dengî tete pê qo naye nişan qirin.

Ji xwe di zmanê me û di her zmanî de dengdêr û tevayîya herfan gora zar, zarawan qem û zêde, bi ferkinan tene bilêv qirin, zrav û stûr dibin, herweqî di birê xwe de bête gotin.

û — Ev dengdêra ha, dengdêreqe bilind e, herweqî di pirsên ( dûr, qûr, zû ) de tete xwendin.

Piraniya qurdan vê dengdêrê weq elmanan yanî stûr û hindiqayîyeqe qiqiq weq frensizan yanî zrav dixwinin.

(dûmahiq heye)

CelaDet Ali Bedir-Kan

Textes et Traductions :

## Çîrçîroqa Bîngolê

Rûjçê, şivaneqî pezên xwe di çiyayê Bîngolê de diçerandin. Şivan westiya bû, xwe gihandi bû qaniyeqê. Di ber wê re dareq hebû. Şivan xwe da ber siha darê û veqet.

Pêleqeq borî. Şivan li dora xwe dinihêrt, dit qo ji kuleqê sê mar biderqetin û berên xwe dan qaniyê. Her sê jî biqul û bibirin bûn. Her sê jî peleqî şin qirine devên xwe û xwe berdane avê. Têde xwe şuştin û derqetin. Birînên wan sax bû bûn. Jû pêve qeti bûn xwe-şîyeqe nû jî. Spehî û ciwan bû bûn.

Şivan heyirî ma û ji xwe re got :

— Eve qaniya jiyina abadîn.

Axayê wî qet bîra wî. Axa ji salan ve nexweş bû. Qeti bû nav ciban, niqari bû bilive jî. Şivan rabû, bi şahîqe mezin da rê û çû gund, axa pê hesand. Xelqê gund gihane hev, darûbesteq anîn axa lê qirin û birin serê Bîngolê.

Weqê mar jî avê derqeti bûn û di nav giya û qeviran de dişelihan, ji laşên wan av dipejiqî û ji her dilopa avê qaniyeqe nû vedibû. Heta qo xelqê gund û şivan gehisti bûn Bîngolê pehna çiyê bi dilopên avê ji gol û qaniyan tijî bû bû. Şivan li qaniya xwe geriha. Ji qaniyeqê diçû qaniya din, qaniya xwe ne didit. Ji ernê bihna wî teng bû, xwe berda ser bereqî û got :

Bîngol e, hezar gol e

Ez çî zanim, qijan gol e

û qaniya jiyina abadîn ne hat dîtû, jê tuqesî venaxwar. Ji lewra tu jiyîn ne abadîn e, û horqes dimirit

\*\*\*

Le pays du Kurdistan est un pays très montagneux. Les montagnards kurdes sont très attachés à leurs montagnes, qui, à travers les siècles, aux temps les plus reculés de l'histoire au cours des invasions des armées étrangères,

leur ont servi de refuge inviolable. De là, ils surveillaient le va et vient des envabisseurs parcourant la vallée. Ainsi que Xénéphon le raconte dans la retraite des dix milles.

Aussi, ces montagnes qui jouaient un grand rôle dans l'existence des kurdes, ont-elles été l'occasion de différents sujets de légende et d'épopée.

Chaque montagne de Kurdistan a sa légende qui symbolise tantôt la vie, tantôt l'amour etc. . .

La légende dont nous venons de donner le texte plus haut est la légende de la montagne de ( Bîngol ), située au sud de (Erzeroum) et au nord de la vallée de ( Mouche ). Cette montagne qui est le paturage des troupeaux des tribus de différentes contrées, symbolise la source de la vie éternelle. Elle s'appelle aussi ( Bihngul ) qui veut dire odeur de rose. Cette dénomination lui a été donnée parce que la montagne pendant le printemps est couverte de milliers de fleurs qui répandent une agréable odeur. Il est probable que le mot ( Bîngol ) est la transformation du ( Bihngul ), transformation qui se rencontre souvent dans les mots kurdes

## La légende de Bîngol

Un jour un berger faisait paître ses moutons à travers la montagne de Bîngol.

Le berger était fatigué. Il rencontra une source, vis à vis de laquelle se trouvait un arbre. Le berger s'allongea à l'ombre de l'arbre.

Un instant passa. Le berger regardait tout autour de lui, il aperçut trois serpents sortant d'un trou et se dirigeant vers la source. Tous les trois avaient des plaies et des blessures. Tous les trois prirent une feuille verte, dans leurs bouches et descendirent dans l'eau. Ils se lavèrent, puis sortirent. Leurs blessures étaient cicatrisées.

En outre ils avaient pris un nouvel air de santé. Ils étaient devenus beaux et jeunes.

Le berger s'étonna et se dit à lui-même : « Voilà la source de la vie éternelle ».

Il se rappela de son agha. L'agha depuis des années était malade. Il gardait le lit et ne pouvait pas bouger.

Le berger se leva et avec une grande joie se mit en route, alla au village, et informa l'agha.

Les hommes du village se réunirent, ils apportèrent un brancard, y posèrent l'agha, et le transportèrent au sommet du Bîngol.

Lorsque les serpents étaient sortis de l'eau et se glissaient parmi l'herbe et les pierres, des gouttes d'eau tombaient de leurs corps. De chaque goutte naissait une nouvelle source. Jusqu'à l'arrivée des villageois et du berger la plateforme de la montagne, grâce au gouttes d'eau était pleine de lacs et de sources. Le berger chercha longtemps sa source, allant de l'une à l'autre, il lui fut impossible de trouver sa source. Etouffant de colère il se laissa tomber sur une pierre et dit :

C'est Bîngol, c'est mille lacs  
Comment sais-je, lequel des lacs.

Et la source de la vie éternelle ne fut pas découverte, personne ne put y boire. Et c'est pourquoi nulle vie n'est pas éternelle et tout le monde meurt.

\*\*\*

Les deux vers, à la fin, sont passés dans la langue populaire et servent de proverbe.

Cette légende compte quelques autres variantes. C'est ainsi que l'une d'entre elle raconte qu'un chasseur avait tué quelques pigeons, après avoir déplumé ses gibiers, il les plongea dans la dite source pour les laver. Les pigeons retournèrent à la vie et s'envolèrent.

Le chasseur retourna à son village pour avertir son agha souffrant, et les gouttes d'eau qui tombaient des ailes des oiseaux avaient créés tant de sources et de lacs qu'il fut impossible de trouver la source primitive.

*Hereqol Azizan*

## L'Alphabet Kurde

10

aussi existe deux (ك) , comme en arbes le (س) et le (ص) le (ت) et le (ط) et ainsi de suite.

Mais nous n'avons bien qu'un seul (q), celui ci, comme tout autre consonne, et sous l'influence des voyelles brèves et longues, se prononce tantôt dur et tantôt fin.

Nous donnerons plus de détails à ce sujet dans la partie traitant de l'influence des voyelles sur les consonnes.

Notons en passant qu'en Kurde également ces deux sons tendent à disparaître, mais la proportion dans laquelle cette modification s'est effectuée n'est encore aujourd'hui que le 3 à 4 0/0.

Dans le (u) qui est composé, comme nous l'avons vu, de (w) et de (i), le (w) tombe et le (i) seul subsiste :

suwar      swiwar      siwar

Quant au (xw), il se perd totalement, comme dans la langue persanne; cette disparition se produit dans la région de (Xarpût) où

les Kurdes commencent à prendre contact avec les turcs.

\*  
\*\*

Différence de prononciation concernant certaines voyelles — Certaines voyelles Kurdes donnent bien à des différences de prononciation selon les régions. Les Kurdes de la région constituée par le (Botan) au centre, le (Heqarî) au Nord et le (Behdînan) au Sud prononcent en général les voyelles (o, û, i) plus fin que les autres Kurdes [1]

Les Kurdes de cette région prononcent le (û) comme le (u) français et non; ainsi que la majorité des kurdes, comme le (u) allemand. Ainsi, ils prononceraient le mot (culture) comme les Français, tandis que la majorité prononcerait « Kultur » comme les allemands.

Comme conséquence naturelle de cette prononciation, les mêmes kurdes prononcent le « o » comme le « ou » français, étant donné que la langue n'a pas encore fait distinction des trois sons de voyelles aussi qu'en français:

Ceux qui prononcent (u) français ne

(1) D'après une de mes récentes études les voyelles Kurdes « baissent » du Nord vers le Sud, c'est à dire deviennent courtes ou fermées. Je traiterai plus tard ce sujet.

Notices sur la littérature  
mœurs et coutumes Kurdes

11

### MEMÈ-ALAN EPISODE III


Le voyage de Mem à Cizira Botan

Bengî songea à ce qu'il devait faire. Pour la première fois il devait choisir entre servir son maître et lui désobéir. Finalement il se décida à prévenir le père et les oncles de son maître du projet de voyage à Botan conçu par Mem.

Bengî trouva les trois vieillards et la mère du prince en société. L'on conta d'anciennes histoires et des aventures de guerre. Alarmés par la nouvelle apportée par Bengî, ils allèrent trouver Mem, qui n'avait pas encore quitté son lit. Ils firent tout leur possible pour le persuader de ce que son aventure de la nuit ne pouvait être qu'un rêve, un jeu des mauvais esprits. Mais Mem ne daignait pas même les écouter; il était bien résolu à aller trouver la belle princesse de Botan, avec laquelle il avait échangé sa bague.

(Julide) crut devoir avertir son père, le sage Nerîman. Celui-ci vint trouver son petit fils, mais lui non plus n'arrivait pas à le convaincre. A tout ce qu'on lui disait, Mem répondait brièvement par un simple : « Non »

peuvent pas sauter le ( ou ) et dire (o); ceux qui disent ( ou ) normalement arrivent à (o).



Ces mêmes kurdes prononcent le ( i ) plus doux que la majorité, qui le prononce comme le ( e ) des infinitifs allemands; eux le prononcent comme le ( i ) du mot français ( pie ) mais plus fermé

\*  
\*\*

Il nous faut maintenant examiner quelque sons consonniques, non kurdes, mais qui ont cependant pénétré dans la langue Kurde.

( à suivre )

On songea alors à un autre moyen. On convoqua toutes les filles du pays, pour qu'elles fassent une parade devant Mem. Peut être l'une d'entre elles, pensait-on; ressemblerait à ( Zina-Zêdan ) et attirerait l'attention du prince. Mais Mem ne fit pas même attention.

Tout était donc perdu. On se désigna à chercher quelqu'un qui connut ( Cizira Botan ).

Trois jours durant, les crieurs publics parcoururent le pays, et firent les plus belles offres à qui montrerait la route de Botan. Personne ne pouvait se charger de cette mission, d'ailleurs Mem ne voulait pas admettre qu'on l'accompagnât.

On prépara, pour le départ du prince, une cérémonie funéraire. On plaça un mannequin ( 1 ) dans la cour de ( Burca - Qerqesor ).

Les poétesses des deuils chantèrent des élégies, et tous étaient habillés de noir. Mem, faisant semblant de ne pas s'apercevoir de ce qui se passait, se précipita vers ( Bozê-rewan ). Bengî et ses pages montèrent en selle.

Tout le monde le poursuivait : ses parents ne voulaient point le quitter. Mem dut mettre son cheval au galop pour les distancer, et jusqu'au coucher du soleil il ne s'arrêta point.

Enfin la nuit tomba. Ils ne savaient plus où aller. Ils distingua quelques vagues lumières et se dirigea vers elles. Soudain il s'aperçut qu'il était revenu dans sa propre ville. Il frappa à la porte d'une maison modeste, il y passa la nuit et le lendemain, il se remit en route.

Peu après il arriva à une source fraîche entourée de grands arbres. Il descendit de son cheval pour aller boire. Après avoir bu, il se retourna vers son cheval et à sa grande stupéfaction, il vit à côté de ( Bozê-rewan ) un autre cheval exactement semblable. ( à suivre )

1) C'est une ancienne coutume Kurde qui a subsisté jusqu'à nos jours.



## زارينك

آگر بر كردستاني كت  
 لورا دكت هاواره دل  
 صد باغ و صد بستاني كت  
 ماندي بلبل ژاره دل  
 پينك ژ كردستاني هات  
 ميلاك و جركي من ديات  
 امان ولات امان ولات  
 باهر بكن خون خواره دل  
 باهر ر بكن اي ياري من  
 هاڤال هم گوه داري من  
 هر گاه و هر ايقاري من  
 ناخوش و هم بي زاره دل  
 بي زار و پر ناخوشه او  
 كنجي سپاه گوت پوشه او  
 گه سينه گه سيدو شه او  
 گه حيدري كراده دل  
 گه شاهه او گه بي كسه  
 گه كرده او گه فارسه  
 گه بريره گه چركسه  
 گه ترکه گه تاتاره دل  
 گه رستمه گه خاتمه  
 گه پاد شاهی د يلمه  
 بي يارو دوست و هم دمه  
 لومست و گردن خواره دل  
 گه چوله گه زوزانه او  
 گه دير كه گه وانه او  
 گه شاخه گه و ستانه او  
 گه وشه گه زفاره دل  
 مگر خونيني كروي

نقشبندي ، هلگرتين وي او دانين أردی ، خلك ل دورا  
 وي ريز بون . بر ساعتان شه گوتن و گوتن ، گر بيان  
 و گرياندن . . . هري ژيرا حيف بو .

ماچاوان حيفا مروف ژيرا نايه ، ماچاوان مروف . بر  
 مرناوي ناكته . . . امتحانا خوه فداند ، دكتور دركت  
 كو نخوه شان درمان بكه ، وان نهيله زو زو بمرن . لي مرن  
 ب تهناوي گرت وسي مهان او ايشاند ، نه او بجنوه . هه پيشه  
 بين وي نيكار بون في آريكاري نخوه شان في بربري مرن  
 درمان بكن ، وژدستي مرن خلاص بكن . .

ماچقاس زو ؟ چقاس بر لژ دلي مرن لي بژيا . پاتزده  
 سالان پيده آژوت ، چاند و طوف كر . وختي د ربنی  
 هاتبو . داس بندستي خوه ره ، كتبو زقيبا خباتا خوه لي  
 مرن نه هشت كو برخور داري خباتا خوه بيه . بيدرا خوه  
 را كه ولبا بكه ، ژي جبكي آن ددوان بجنوه . .

هيژ شهادت نامه خوه نه ستاند بو ، نه كرو بو بيركا خوه  
 ژي . حقي وي داهر تشتين وي پيك آني بون . نخوه شي بي  
 لنگين وي برين و او خستن ناق جهان . آف رسمي هال .  
 شهادت نامه بي بهانا زلقاندن . افسوس . . . وك ديارى و  
 و بيركه پاشين ل . روپلين هاواري كت . . .

اي خورتي دلال و هيژا مه تو سپارتي مهرقاني و  
 دولوواني يا يزداني پاك . ته دنياژ خوره و دوست و ناسين خوه ره  
 رش كر ، خوه دي آخرتا ته سپي و آقا بكت .  
 هاوار

ژ لورا كو دكتور احمد بيرقدار ژ كردمانجين شامي به  
 بقى نقي خلکي تاخا كردان بي في بندي علاقه دار  
 بين . تيده پرسن هنه كو ژر بو حميان نه ناسن . بو في بكي  
 مه او پرسين ها ژير شه بعري ايضاح كونه .

كلات : قلعة - آك : علم - درخك : نصبة -  
 ژيبين : حيات - رنجور : مهنة - نمازه : خاصة -  
 سته ور : عقيم - تاخ : حي - بژيشك : طبيب -  
 ماموسته : استاذ - رومت : شرف - هه پيشه : زميل  
 - ورگرتن : اللبس - پر بچار : على الاكثر -  
 دبستان : مدرسة - فین : ارادة - هاو ير : محيط -  
 افسوس : ويل - مهرقاني : الرحم - دولوواني : الشفقة

## دكتور احمد بيرقدار

د بیست و چاری فی مہی ده ، روزا دوشمې پستی نیښی شفی ژ کلانا زانین وهاری آلکه نو بار ورنګین بر بر یژ بو وکت آخی .

هری ، د کتور احمد بیرقدار ، أف خورتی دلال و هیژا کو درخکا ژیناوی هیژ بیست و پنچ بهار نه بهورتبون وشاخ و پلین وی تفی بیست و پینچ جاران بشکفی بون پستی نخوه شیکه خدار ورنجود — کوسی مهان آژ وتبو — چاقین خوه نخوه گرتن و کت ری یا آخرتی .

د کتور احمد بیرقدار ب هینبا خوه فه ژمره بو ژرینکه کن ، درد کی در یژ ، جانکی کچک ، بر بنکه مزن ، وچو .

د کتور احمد بیرقدار نمازه ژ کیسی تاخا کردان چو . او تاخا سته ور کو بری صدسالان ل راسری شامی هاتیه دانین ، ختاها ژمره تفی دو یژ یشک دابون : د کتور محمد خضر بک آلا رشی — خدی عمری وی در یژ بکه — ورحمتی د کتور احمد بیرقدار .



د کتور احمد بیرقدار ژ عشره برازن ، بری هر تشتی ود گل هر تشتی کرد کی پاک ، دلخوت و خدان بخت و رومت بو .

حجی کو او ناس د کرن ، تفی جار کی ژی دیتی بن ، برمرناوی کتن ، شیناوی گرتن ورشا خوه گریدان . ژ زاروتی و لاوانیا خوه فه ب خبات و خدان شرف و رومت بو ، خباتکه زور دخبئی کول پیشیا هقال و هو گرین خوه به . رومت و همتا وی نه دهشت کو کس ل پیشیاوی بیه .

د لاوانی یا خوه ده دتاخی ده رودنشت . صبی بر بانگی فه رادبو . جلین خوه ورد گرتن و دداری . پر یچار خرینیا خوه ژی نه دخوار . دیاوی آرحتی گازندان لی دکر وژی دپرسی :

— چمان لاووبی خرینی دچی ؟

احمد لی فد گراند ود کوت :

— یادی دترسم درنگ بینم و باژاری بری من خوه بگینن دبستانی . . .

ب فی قین و خباتی ژ دبستانین تجهیز و سلطانی بی بکین درکت و کت طیبی بی . د طیبی بی ده ژی زو کا خوه دا ناسکرن . کت راسری

هقالین خوه .

ل قشارتناوی ژ هر ریزی خلک هاتبون . ماموسته ، هقال ، ناس وهقیپشه بین وی نقدا پی را راوستیان .

ژیرا ژوی خورتی دلال و چلنک را چلنک ، گل و کلیلکان آتی بون . تابوتاوی کر بون نائف کسروانان .

تابوتاوی ب ریشه ، دسر پشت و ملین هفاین خوه ره هیدی ، هیدی دقلتی ، چند جاران درخوینا

تابوتی قیو . ته دگوت ، احمد دین ره تام ددتی . هری تام ددا ، درخوینا تابوتا خوه فد کر ، ژبونامرنی بی گلکی جوان بو . چاقین وی ل دنیا بی مابون ، او دنیا کو هیژ ژیرا ب نفاپی نه ناس بو . دستین وی ژی ندیون ، دل دکر درخوینا تابوتا خوه فکه ، خوه زر که بکفه سر انگگان ول ژرینی فکره . لی هیپات ! مرن دست دابوتی ، ئیدن فگر نه مابو . . . ل ریکه ولی کتبو کو مروف بی حمدی خوه دکفه ئی ، و ب حمدی خوه ژی نکاره در کفه . وکی تابوتاوی گها مری گر ، کت هاو پرا شیخ خالدی

## خليل رامى بدرخان

د سيزدهي ټي هېښې، دروژا پينځشېمې، بري نېشرو ساعت شش و نيښاده خليل رامى بدرخان، لـ بيروتي دخاني يکي دو مزلين و يک تابين ده چو رحمتي .

خليل رامى بک سرخوه بو . هيژنه کتبوناق جهان . لسر کرسپيکي روشتي قهوا صبهې قد خوار . ژ نشکافه دخوره چو . خلکي دورا وي ولي باور کړن . لي د راستي يي ده دلي وي ژبونا کردستانا خوه نما ليدخست .

عمری وی گهشتبو دورا هفتي يي . خليل رامی بک ژ کرين مير بدرخان ، ابن پاشين بو . نمينده يي نقشکي ولي بو کو لباتين (اعضا) وي گلک کيم بونه . او چند کو بلکو ابرو نقدا ناگن چاران ژي .

ژجوانياخوه قه دبلي کردستاني، پالهبی سرخوه بونا ولاقي خوه بو . بر بيا نهو بـ چل و پينچ سالان دگل برازی يي خوه عقد رزاق بک — کو بـ عمر ژي مزتر بو — درباسي کردستاني بو بو . ژ کردستانا ايراني کتبو دورا جوله ميرگي . لـ وي هر دوژي خوه دابون دست و کتبون زندانا سلطان عبد الحميد .

دـ سالاهزار و نه صدو نوزدها ده متصرفي ملاطبي بو . بر دو براز پين خوه وهقالين وان دابو چي . دپي ره وک حمي کردين ولاقي ژ ترکی يي در کتبو هاتبو سوري يي . حتا پاشي بي ، عمری خوه لـ شامي و لـ بيروتي بوراند بو . دل دکرل شامي برجاغين تر با باقي خوه بمره . لي خدي ژيرا حزنه کر . لـ بيروتي چو رحمتي و لـ رخ برايي خوه — خالد بک بدرخان — هاته قشارتن .

رحمتي ژ زماني خوه پيشه ب ترکی ، عربي و فارسي ژي دزانبو . هر چند بـ ترکی رند دزاني بوژي ، لي ژ آوايي آخافتناوي خوياد کر کو ترکی نه زماني وي به . ژ بر کو زماني وي لي قنچ نه شکيا بو . خلکي دورا وي آفـ ژي ره دگوتن . نه دغني ، لي کيفاي دهات و ژوان ره چيرو کا هين بونا تر کياخوه گلي دکر : — وکي از ده سالي بوم ، من نودست ب ترکی بي کر بو .

## تابوتا پغوبه

— شيخ عقد رحمانی گارسی چو رحمتي —

لـ أردی دنیرم دلو پین خوبی ددمه سر شوبی چه بیدم از داروبر ، کفر کچ گش دکن شینی بی حمدی جانی خوه دقیرنم از

تابوتک دناقا عوره کی بـ خوبن ملکان کشاندن ازمانی ژورین ترسکی داسر من لبتم رجفین برچاقی من رش هات دل بورینم از

او تابوت ، تابوتا عقدی رحمان بو سر دنیا دره وین اویک میشان بو گر ترک حیات بو ، جنت مکان بو بر رحماوی شاین حمی کرد و از

لی صد حیف ژ بوته آی رحمان شیخم چقاسی کرد هنه ژ بوته بیخم تیلکی گازی بی ، ولیخم لیخم او هاوار هندکه ژي تیرنام از

شهادت ، مه نه دیت وسان بـ عبرت جنایت ، خیانت وسان ب رقت ژبونا مروقی خدان حمیت تاریخا روژا ته شین ! قید دم از

### قدری جان

برابین مه ابن مزن ژمه کچکان ره دگوتن « ئیدن دقیت هون ژي هینی ترکی بی بن » . جار کي ام لسر تاشتی بی بون . عقد رزاق بک لـ رخ من روشتی بو . چینیکی گوشت ژدستی من کت أردي . من دل کر ازب ترکی بیژم . هین تی بیرامن چاوان من خوه دافهم کړن : « گوشت دوشدی سرکلاق » آفـ دگوت وژ دل دکني . خدي گهنین وی بغفرینه ورحما خوه لی بکه .

## شهبدي ڪوره

شيخ عقدر حماني گارسى چورحمتي

روهلات حنا رو آقا

ملا خدى هزار جار آقا

خلك پير بون ابرو بون زاقا

كو بكن ژ شيرى گرتيه داقا

شيخي من توئى شهيدى ملت

شيخي من توئى ، تو شورى همت

شيخي من توئى ، خوبى سعادت

شيخي من توئى ، تو چو پي ب رحمت

بو ژينا ملتي كردا

ته همت كر حى اردا

ته طوف كر پاش خوقه دردا

هيه جارك لمه پيدا

شيخي من صبه شفق دا

شيخي من چيه ل مه پيدا

شيخي من ازم پپوك ل دردا

شيخي من ژته ره رش گريدا

ام نافي ته دكن آلا

ل چيات ونيث نالا

تو بي جژنا دهر سالا

تو رادبي ژناف آقا چالا

شيخي من صبه خوابو

شيخي من گري ل مه رابو

شيخي من ژ بين نما بو

شيخي من پرساته مابو

مصطفى احمد بو طي

فرج الله ذكي افندي رشبلڪاك هات . تيده رشبلڪا سيد  
عبد الخالق اثيرى افندي ژى هيو . .

هنگى خوابو كر ڪو اڦ شعرا ها ڪو نسبت بال  
عقد القادري ڪو پي ڦه (رحمتا خواه دي لي بت) هاتبو  
ڪرن نه ياي به وشعرا عقد الخالق اثيرى به . ويچا من  
بسر هاتيا قصيدا سينورى هرو ڪي ل هره گلي دم ژ علي  
عوني افندي را گوت . اوى ژى ژ عقد الخالق اثيرى ره  
نقيسانده . ژو پيشه ازل ڪاغذين خواه نين ڪفن گريام  
وشعرك ژوان شعرين ڪو امضا (ز . ع) هلد گرتن پيدا ڪر  
و دا عوني افندي . اوى ژى ژ عقد الخالق افندي ره شانده .  
ڦيچا خوابو به ڪو او (ز . ع) پي ليستيه و ام شاش  
ڪرانه ، لي راستي بدرنگي بڪڙه ژى روژ ڪي خوابو به .  
هرو ڪي دڦي مسئلي ده ژى پشتي سى سالان خوابو .

ام ژى عقد الخالق اثيرى افندي هيڻي دڪن بلا لمه مگره .  
ژ بر ڪو مه دڦيا بو ام شعرا وى بلاڦ بڪن نه ڪو نافي وى  
ژ شعرا وى بدزن . مڪرو آقان د (ز . ع) ده به .  
اڦ مروڦي ها ژ بو نامه نه ناسه . هڪه عقد الخالق افندي  
ناس د ڪه بلا لي بگره .

اڦ ژ مسئلا حافظي شيرازى ژى پيشده تر چو . حافظه  
جار ڪي د جڦاتڪي ده رو نشتبو . يڪي شعرين وى دڦوندن  
و د گوت «از حافظي شيرازى مه» حافظ سرڦي گوتنى رابو  
سر خواه و ژ جڦاتي ره گوت :

— من دزى شعرا ن دڦيون لي هيژ دزى شاعران نه دڦيون .  
مير ڪي مه شعر ژى دزين ، شاعر ژى دزين ، خواه بي

خوه بلبي هاواري

بين نوژى آفانندن .

— فرج الله ذكي افندي دل دڪه شرفنامي ژ نوڦه چاپ  
بڪه . پيره نسخه ڪه چاپنڦيس هيه ڪو د سالو ۱۸۶۰ ده  
د پترسيورغي (وليا مينوف زرنوف) دابه چاپ ڪرن .  
نڪ من ژى نسخه بڪه دستنڦيس هيه ڪو من د ڪتبيخانا حلبى  
ده لبر نسخه ڪه دن نقيسانده . ام ژته هيڻي دڪن توژى  
ب مه ره بڄتي و آريڪار يامه بڪي . ب تره شرفناما باڦي  
ته هيه . ام دل دڪن قان هرسي نسخان دڦين برهڦ  
و ژقان هر سسى يان نسخه ڪي درست درڦين .

من ناڦل هري ڪرو مه دست بڄباتي ڪر . پيله ڪڪ  
بورى . هن هڦالين ڪول سورى بي گهاون هڦ از ڦخوه  
ندم سورى بي ، من شرفناما باڦي خواه ژوان راهشت وهامت سورى بي .  
محمد علي عوني افندي ژ دور ڦه ژى آريڪار يامن دخواست ،  
لي ري پي نه دڪت ، دستي من نه دگها .

روژ ڪي چند شعرين صوراني ڪتنه دستين من دڦين  
هميان ره ل شونا امضا حرفين (ز . ع) هبون . تيده يڪ  
هيو ڪو لسر تڄو بين ڪر دستاني بو . سرناما (غزلي شيخ  
عقد القادري ڪوبى) هلد گرت . ژيره گلڪ ڪيڦا من  
هاتبو . هنگي محمد علي عوني افندي وشرفنامه هاتن بيرامن .  
من دڦي خواه ده دگوت «اڦ ل شرفنامي تبت» وجهده  
من او لطف تواند و ب نقيساندي ڪي ژ محمد علي عوني افندي  
ره ڦريڪر ڪو بڄن شرفنامي . من د خواه ست ڪو بڪڙه  
پيشيا شرفنامي ، لي خستن پاشي پي .

برى دو هيقان محمد علي عوني افندي هاتبو شامى و چند  
روژان بو بو ميڦاني من .

دوى چندي ده ژ علي عوني افندي ره ژ مصرى ژ

سنور

کوردده ده زانی له کوو جیگره خزمانی تو  
 گووگره بوتی بلیم جیگه خیلائی تو  
 کیوی ظروس وعمق حوزه اسکندرون  
 غریه تا بجرى رهش سنوری میدانی تو  
 بجرى رش وئه رده هان آوی اهراسه بزان  
 حه دی شماله ئه مه بو کوچ وجولانی تو  
 اه لوهن وگولی اورمی تاسهری آوی آراس  
 سنوری روژ هه لاته جوکه و کیوانی تو  
 هه وازو کیوی حمین ژه نگاروری مصیبین  
 سنوره بو جنوبی باغچه و باغان تو  
 له ناوی اهم سنوره دوانزه ولایت هه یه  
 دهلین دوانزه ملیون نفوس کوردانی تو  
 حاشا درویه و ترا نفوسیان نه نوسرا  
 ده گاته بست ملیون بنو سری قومان تو

له ده ربه اهم سنوره له انقره و خراسان  
 بلوش و ئه زری بیجان له ویشه خزمانی تو  
 اهی وه طنی خوشه وست ناوتم اه و جا که بست  
 مندالیکی ساوه بوم ده بومه قوربانی تو  
 ونه ی ولاتی کوردده له سهر زوانت و پرده  
 ئه ئیری اهم حاله ته ده ایلی ایمانی تو

من .لا عبد الخالق اثیری شاعری کوردانم اهم غزه  
 له که به غلطو په له ت و نانوئه له آخری ( شرفنامه ) ده رج  
 کراوه بناوی حاجی قادره وه . هی حاجی قادریه هی منه .  
 لاوانی کوردی کر کوک و سلیمانی و کوی آکابان له مه هه  
 له چاپده ری شرفنامه له مه داختای نیه . تحقیقان کرد  
 کاری کی یه . اه و نیاوی خومه وه له م مجله ی (رونا کی هاوار)  
 له چاپ درا هه رکه سی له لاوانی کر کوک و سلیمانی کویی  
 وثیقه بکی هیه که حاجی قادره بنوسی بو اثباتی آماده م .

سهر حسین زاده عبد الظالم اثیری

و کی ازل مصری بوم روژ کی محمد علی عونی افندی  
 ئی سیوه رکی هاته نک من و ژ من ره گوت :

هالانان دخوه بدن ، پسنی خوه بدن فورتان و زرتان بکن  
 و بیژن :

عقد رحمان ژ آخ و توزا من هاتبو پی .  
 عقد رحمان ژه شینا هییا چیا پین من بلکه گرتبو .  
 عقد رحمان دین کوانین من ده رابو بو .

توژی هاواری ، پسنی خوه بده و بیژره :  
 تر با شیخ عقد رحمان دمن دایه ، من او قشار تیه ناڤ  
 رو پلین خوه ، کیلاوی دا چکاندیه راسری خوه .  
 ای آرد ژمن بدخسه کو من او شهیدی دین و ملت  
 ژته ره نه هشت و نه کر پاراته . .

شین . . شین . . شین . . هر در رش ، نه ما هشین .  
 دل بکل ، جان بکسر ، چاف بگرین .  
 بانگ دان ، شیخ عقد رحمانی گارسی نه ما ، هاتبو خیری

چو رحمتی . .

بلی تو دچویی و بته نه دحسیان ، بیر نه دبرن . ژخوه  
 بته بحسیانا کنگی او دستی بی بخت و بی شرم لته رادبو .

\*\*\*

بگری کردستانی بگری ، بگری بوتان بگری ، بگرین  
 کارسی بگرین ، بگری گوز گهی بگری .  
 کچ و بو کین کردستانی ، گلپین خوه کر بکن ،  
 خوه لی لسرین خوه بکن ، رشا خوه گریدن ، شین . شین  
 بکن وب آخ وزارینی بگرین .

توژی . میرو بگری ! بکفه پیشیا حمیان بگری و بنال .  
 شیخ عقد رحمان ژ کیسی حمیان چو ، لی نمازه ژ کیسی  
 نه چه . بینه بیرا خوه ، کی ب شیخی خوه ره رود نشست چاوان لته  
 فد کری ، کسان چاڤین وی ب هژ و هشین تو همبیز دکری .

\*\*\*

ای آخا کردستانی ، ولاتی بوتان ، عشیرا گارسان

## شهادت عبرتي

— شيخ عقد رحمانی گارسی چو رحمتی —  
 ملايي من و شيخي من ملايي أردی کردستان  
 شهیدی أرد و ازمانی شهیدی گوزگه و بوتان  
 ژبو ملت ، ژبو کردان ، فدا بويي ، تو قرباني  
 شهیدی عشق و ایمانی ؛ شهیدی رزم و میرانی  
 ولاتی ته ، ملايي من ؛ ولاتی پاک ، کردستان  
 نه گوزگه بو ، نه شرنخ بو ، ولاتی ته ، نه ژي بوتان  
 ژبو ناموس و جامیری ، ژبو ملت فدا بويي  
 ژمیرین ته ، ژمیرین ته ، ژنشکافه جدا بويي  
 ریبا ملت و دینی ده ، بـ میرخاصی تو بوی قربان  
 مقامی ته بهشتینه ، بـ امرو گوتنا قرآن .  
 در ازمانی امیدی ده ، تو برجیس بوی تو کوب بوی  
 ژبو یار و ژبو دژمن ، ژبو کردان تو بی کرب بوی  
 ریبا دین و ولاتی ده قلمکیش بوی و شور کيس بوي  
 ژبو ملت ژبو کردان بـ عزم و رزم ژچه زابوی  
 ژبو لاشی ته شيخي من مزاره آخا کردستان  
 دنی ترباته شيخي من و گورنا ته دلین میران  
 ژبو کردان ژ گوزگه او پیامک خوش دیاری بو  
 بـ میرانی و جامیری بـ هر تشتی دکاری بو  
 ژبی بختی مه صافی کر ، ژبی بختی خلا من أم !!  
 ژبی بختی پریشانن ، و بی دولت زلامن أم !!  
 چلنگک بو میر و ژبهاتی ، بـ تقدیر بو و ژیرک بو .  
 بـ ناق و دنگ بـ خون و رنگ بـ هر تشتی مبارک بو  
 بـ شوری ته بـ پرساته بـ علم و رفعت و غیرت  
 تو بوی ریبر و ترباته حمی ره مشهدا عبرت  
 بریندارن ته درمان کرن بریندارک تو کشتی آخ ؟!  
 ژ نوڤه هیستر و ماتم ژنوڤه جان و دل کامباخ !!

بـ میرانی و گرناسی تو بوی سیدا تو بوی ریبر  
 دلالی میر و جامیران دلالی رب و پیغمبر  
 بـ مالاته ، عشراته حمی ملت بریندارن  
 گرین و آخ وزاربنه ، گرین و آخ و هاوارن  
 تو سیدابوی ، تو بوی باثک تو بوی گوره تو بوی آرمانج  
 فقہین ته بریندارن ، بریندارن حمی کردمانج  
 ژ نوڤه شاهیا دژمن ، ژنوڤه گر و سه شایون  
 بـ ترباته ، لی شيخي من هزاران کردژخه و رابون .  
 تو آلی ، گوره بی ای شيخي ، تو روزاهیه مات  
 تو آلی ، گوره بی ای شيخي ؛ تو کانی بوی ژبو همت  
 تو آلی ، گوره بی ای شيخي تـ تربا قدسیا کردان  
 بـ زانین و بـ جامیری دی رابه ئیدی کردستان .  
 مرنا ته و پنداته قژینن ملتی کردی !!  
 فقہین ته پیاپین ته بژینن ملتی کردی !!  
 تو آلی گوره بی ای شيخي هشی میرو فقہان بوی !!  
 سری ته ژآخا کردستان رهی ته ژآخا بوتان بو  
 تو آلی گوره بی ای شيخي تـ آلامشهدا کردان  
 تو پلکی زیت و وزیرینی ژ دیروکا دلی خورتان  
 تو دیروکا شهیدانی تو سر بورینا کردستان ،  
 صبی قربانا شيخي من دهن صد دستین جنگیز خان .  
 دلالی آخا کردانی دلالی آخا کردستان  
 تیمورلنگ قط نه کر و سان نه کر و سان ژي جنگیزخان  
 تو سلطانی دل و چاقی ، تو سلطانک هنرور بوی  
 بـ شور و علم و شیرانی تو سیدا بوی تو ریبر بوی  
 ملایی من بیژم چه ژپوسان پر مزتر تو !  
 ملايي من بیژم چه ژجانان پر مزتر تو !  
 تو چوبی ، پر ژي سیوی مان ، دلی ملت ژي ماباته !!  
 ملايي من بیژم چه دلی من بو به ترباته !!  
**دکتور کامران عالی بدرخان**

شيخي من بـ پنجه و چندسالین خواهه ، وک زارو که کی  
 کو دپاشلا دیا خواهه ده دمتر ، بی آخ ، بی نالین و زارین  
 بی تقی و رق و تشغله ، بی دنگ و پیژن ، بـ ری کتی و  
 چوبی .

أو ژي دلی من ، دلی من ئی ژار و بدرده . لی بـ هقین و  
 هژ کرنا ته او چند خرتنه کو بکاره لاشی من و کلاشی ته  
 حیا پاشییا عمری من هلگره ، و مه هر دو حناهنگی بـ خواهه  
 دی بکه . . .

حالی ولاتی بوتان عجیب دزانی بو . د کار بو بیتره سر و بنی هر  
بری بوتان ژچه رنگی نه . سر حاکم ومیره کین بوتان چیرو کین  
نه بهیستی دزانی بو

\*\*\*

بلی شیخی من تو مرو قسکی هولی بوی ، لی ایرو تو چوپی  
و دستین مه ژته بونه . نزام حیفامن کی ره بیت . ژته  
ره آب ژمه ره . تو چوپی رحمتی ، ام هشتن دناف درد  
وشینی ده .

خلک دی بیژن : شیخ عقد رحمان چو ، کلاشی وی  
دچولی ده ما . هری مالا خوه گهاست ، بی ترب و گورن ،  
بی ریچ وشوپ ، وار کور چو . . .

نو ! کردنو ، نه کردنو ! یارنو ، نه یارنو ! دوستنو ،  
دژمننو ! عقد رحمان ب ترب و گورن و خدان وارچو .

لی قشارتنا وی ژی وک مرن و کشتناوی نه ب آواکی  
عادتی ، لی ب آواکی دن ، ب آواکی ولی بو کوحتا  
نہو نه ناس و نه چیکری . . .

بلی شیخی من ، من ژته ره کفنکی ولی بژارت کو  
هیز تو کلاش پی نه هاتیه پیچاندن ، من ژته ره تر بکه ولی  
کولاند کو هین تو مری نه کتی .

من کفنی ته کر : سور ، سپی و کساک و زر ، آلاته ،  
و من تو قشارتی ناف روپلین هاواری ولی سری وی  
کیلاته داچکاند .

کفنی ته کفنکی ولی به روز کی بیت ، ژته قبت و  
دسر کلات و باژارین ولاتی ته ره ل پیل بیت .

تر باته تربکه ولی به کونه کیلاوی ب بروسکین  
ازمانی دشکه ، نه جاغ و دیوارین وی ب باوباگری هلد  
قشه ، نه آخاوی ب باران و لهی پی قل دبهو ژهف د کفه .  
تر باته کتیکه ، کو نقشین ملتی مه دسته دستابکن و  
هر نقش ژنفتی دن ره حتا پاشی پی ، هندتا روزا قیامتی ،  
ژهدره دی بسپرن .

اڤ تر باته آبادینه . من اڤا هار بوتانه بژارت و  
کولاند . لی ته تربکه دن ژی هیه کو تو بخوه به حمدی  
خوه و بی حمدی من هاتی و کتی ناڤی .

ملا و سیدابو . د مذهبی شافعی بیده زاناکی زور  
بو . اسلامیت و که خوه ناس د کر و ددا ناسکرن .  
ژی نه مووک کیم د کر ، نه ژی وک ملاپین دن -- ژبونا  
قشارتنا نه زانیا خوه و شیلاندنا خلکی - لی زبده د کر .  
هر چند مروقی آخرتی بو ، او چند ژی مروقی دینایی ،  
مروقی نو وینی و پیشقه کتی بو . ناف د خلکی ددا کو  
بخوینن ، هر تشریف هین بین . پرانیا فقهین وی ب حرفین  
لاتینی ژی دزانی بون .

جار کی من ژی پرسی بو ، هکه ژنقیساندنا زمانی مه  
ب حرفین لاتینی ژا لی بی شر یعنی شه تو مانع هیه . رووی  
وی ئی دلال و ب نور ، ب دقنکی زلال بو و لمن فگراند .  
- ما چره هبت ، خوه دی امر و نهپین خوه ژ مه . ره نه  
ب حرف و شکلان ، لی ب قصه پی دابه زانین ، ژخوه  
شکلین حرفین قرآنا پیشین نه ژ شکلین ایرو بون . ژلورا  
میری من ، ته کو خوه ندیه و دنیا دبتیه ، صح بکه و ژمه  
ره حرفین ولی بیژیره کو ملتی مه زو کا هینی خوه ندنی  
بیت . فتواب من ره به .

من گوت میر و میر خاص بو . هرچی مسئلا برواری صح  
کر نه قنچ دزانی او شیخی دلال چه میر کی زور بو . ب  
ده پانزده خلامین خوه شه قضا برواری را کر بو . و کی  
خوه ددا بر کفر کی ، صد زلامین قنچ نکار بون چپراوی  
را کن .

بری سی سالان کاڤا مه دابو چیاپین هقیر کان ، ل خوه  
نه دانی بو سواریه ، خوه قلمات ، دو رختین خوه آفتین  
ستووی خوه ، تفنگ ب ملی وی شه ، ب پنجی و چند  
سالین خوه ، وک خوردکی بیستسالی دا بو کاش وشهاران .  
پیاپین سست پی خرت دبون . خلک پی دسکین .  
شیخ عقد رحمان کتیک ، کتیکه مزن و بی پیژان  
بو . لی صد حیف و مخابن ، لبر نسخه بکه دن نه هاته  
نقیساندن .

لسر کردستانی ته هرچی ژی بخوه ستانک وی پیدا  
دبون . دیرو کا عشیران ، میژ شه مابین ملتی کردان . . .  
دناف کردستانی ده زحف گرها بو . نمازه (خاصه )

# هاوار

بدي

## کوقارا کردی \* مجله کردیة

### سین

شیخ عقد رحمانی گارسی چورحمتی

شین . . . شین . . . شین . . . هر در رش ، نه ماهشین .  
دل بکل جان بکسر ، چاف بگرین .  
بانگ دان ، شیخ عقد رحمانی گارسی نه ما ، هاتبو  
خیری ، چورحمتی . . .

\*\*\*

هری شیخ عقد رحمانی گارسی رهنا چاڤین کردستانی ،  
گرمیا دلین کردین قنج ، ب دو بر کین بی بخت ، دست  
ژمه کشاند و چو . بو شهیدی دین و ملتی خوه ، قربانا  
آزمانجا خوه .

هری ب بی بختی هاته کشتن ، ژخوه و کیدن کشتنا  
وی نین بو . ب میرانی نه دهاته کشتن . ل پی وی گلاک  
گرها بون . او میرین قنج پیدا نه دیون ، نه دهاتن دین  
کوبکشن پیشیاوی ، دورلی بگرن ، پی ببرزووی بکژن .  
ژیره ، ژ کشتنا وی ره آن بی بختی ، آن بر ککی  
خیلکی دقیا بو . آن نه ، وک مره قکی عادی ، دناق نفینا  
خوه ده دی برابایا .

مرنا دناق جهان ، نه مرنا وی بو . حیفا خوه دی ژی  
ژیره دهات ، پی قائل ندبو کو أف میری ب هر تشتی خوه ،  
ب دین ، ب زانین ، ب دستی خوه قنج ، دناق جهان ده  
وک مرو قکی عادی ب بایی آن ب تایی بیشتینت و دپی ره  
قاصدی خوه قریکت و امانتی خوه ژی بستینت .  
عقد رحمان نه سته لح بو .

ژیره قاتلاک ژناق مالی ، گولکی مالی دقیا بو کو بی ترس

ولرز بکفه بن پاشلاوی ، هره دستین وی و ولی وی بده  
بر تفنگ و خنجری .

هکه دار خراب دبه گرمی وی ژی به . ژخوه گرمی  
داری ژداری مبت ، دار تجار خراب نابت .

ولی ژی بو . دنیا ل شیخی مه بو بو هیقار . روژ چو بو  
آقا ، هقالین وی ژی دور کتبون ، اوب خلامکی خوه  
قه در نینگی گند کی ده ل هیقییا قاصد کی دما .

هنگورا شفی دست ب کتنی کر بو . دمانیژی ژی  
هاتبو . د بر وان ره آفک دهر کی . شیخی دلال خوه  
قمانت ، نفنگا خوه دا خلامی خوه کت پیشی پی ، بز  
ب آفی قه دچو .

خلامی وی ، ژ پاررا ، اودا بر نفنگی . درب لی کت ،  
شیخ ل خنجرا خوه خبتی ولی زقری ، در بکه دن  
سینگاوی قل کر .

خلام ، یکی سعرتی ب ناڤی نجمو ، سری شیخی  
خوه ب خنجراوی ژ بکر و بر دژنمان . هری ب خنجرا  
شیخی خوه ، ژیر کو یاخوه دسینگاوی ره کر بو .  
نجمو هاته خلالت کرن ، ام ژی پیره ، حورانیکی رش  
بو خلالتا مه .

\*\*\*

هری بانگ دان ، شیخ عقد رحمان نه ما ، ژبونا خدمتا  
ملتی خوه زا بو ، ژبونا وی ژی مر .

نزانم ازی چاوان بکارم وصف و پسنی وی بدم .  
شیخ عقد رحمان ژوان مروقان بو کو دی بین دنیا پی کیم  
د ز کین خوه ده گراندنه .

شیخ بو ، ملا بو ، سیدا بو ، میرو میرخاص بو .

شیخ بو ، خدان طریقت ، مر بدن وی لی وک پیخمبرک دنه پرتن .



زكي غزاف وطبقة

أبو يونس الخوانساري المشهور

حفر جميع العادين والصور الملونة واللوحات الخاسية  
طبع بطانات رادريبات بحروف ناضرة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب

أحمد نافذ

اختصاصي بالامراض الداخلية والزهرية والأطفال

عرنوس

دمشق

الطبيب

أحمد خصيك

الافتصاصي بالجراحة و امراض العيون وجراحها

صالحه

دمشق

## اشتراكات مجلة هاوار

وفي غير هذه الأقطار

١٥٠ فرنك

عن سنة واحدة

٩٠ فرنك

عن ستة شهور

٦٠ فرنك

عن اربعة شهور

في سورية وتركيا والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس

عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك

عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوري - ٦٠ فرنك

عن اربعة شهور ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك

الراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة: الامبرمبوليت عالي بررفان - دمشق - حارة الأكراد

السنة ١

العدد ١٦

الجميس

١٠ تشرين الثاني ١٩٣٢

# هاوار

سال ١

هزمار ١١

الجميس

١٠ جرياني ١٩٣٢

تنتي

اود مينت

هر كس دي بيت



شيخ عقد رحمانى گارسى

ژ ملا شيخ عقد اللهى

خانجورى

خليفه نى شيخ حسيني باصرتى



هات و ميوس

له هره فشارقى به

رحمانى نى بيت

١٣٥١-١٩٣٢



SAL 1  
HEJMAR 12

YEQŞEMB

27 Çirîya-Paşê 1932

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 12

DIMANCHE

27 Novembre 1932

Qoyara Qurdî \* Revue Kurde

## Têxistiyên Qoyarê

Yequetiman	Hevindê Sorî
Gazinda Xencera min	C. A. Bedir-Xan
Em çiman bişûnda man	Mistefa Şahin
Çaw	Gewran
Strana Gulê	Dr. Q. A. Bedir-Xan
Yeqîtîya Qurdan	Ş. M. Şahin
Taziye	Mamosta
Qew û Qitiq	M. Ehmed Botî
Qer, Gur û Rovi	Qoçerê Botan
Elfabêya Qurdi	C. A. Bedir-Xan
Le bo Şehideqî	Ehmed Namî
Xeyal	Tahir Fiad
Yadi Weten	E. Bêqes
Ey Gelawîj	Gewran
Heyv û stêr	Dr. Q. A. Bedir-Xan
Cegerxwîn	Kedrican
Gazî	Evdirehman Fewzî
Her bijî	Le Zibêr Qurdî
Nalnala Dil	Ismail Hebeş
Hawar e	Iawê Fendi
Ziyareta Hawarê	Mistefa Miltî

## Birê Frensizî

L'Alphabet Kurde	D. A. Bedir-Khan
L'âne, le loup et le renard.	Qotscherê Botan
Memê-Alan	D. A. Bedir-Khan

Çapxana terekî



## Yequetîman

2

Ba nextê basi ew şitane biqeyn, qe be pêy ewe yequetîman bo ray î debêt, we nextêq le yeqeti gelani dinyay diqe biqeyn, taqû be pêy ewan êmeş yeqbûni xoman durust biqeyn we sazi biqeyn.

Danîştuwani rûy erz le mêjewe destyan qirdiwete qomel hestin we be qomel jîyan we wext rabwardin.

Çunqe yeqêq le xûy here gewrey emane meyl qirdinyane bo qomel hestin.

Bem çesne le zmani here qonewe dauîştuwani rûy erz qomelyan damezranduwe we nizami qomelîyan pêq hênawe.

**Belam:** nayewêt hilêyn u bibêjin ew nizame qomelîye qe lew demeda hebû weqû nizami cinaqiy imro nabuwe. We nizami qomelî lew caqewe herwa gorrawe we he gorran pêşqewtuwe hetaqû geyiştiwete nizami qomelî berzi imroqe.

**Belê:** nizami qomelî, her weqû hemû nizamiq, hemû jîyanêq, hemû çîstêq le rûy erz le jêr tasîri (kanûni pêşqewtin be gorran) e, we kanûni pêşqewtin be gorran qe le sali 1859 feylesûfi mazini Inglîz (Darwên) dayna, zaniyarani ewrupay imro ew kanûne leser hemû çîstêq tetbik deqen we le hemû zanistiyêq tetbiki deqen.

Leber ewe (Sosiolojî — zanisti civaqî) ş tabî'a bemi kanûneye. We her weha nizami qomelîş be pêy kanûni Darwên pêşqewtuwe we le pêşqewtin daye.

Le pêşda gotman danîştuwani rûy erz le mêjewe nizami qomelîyan damezranduwe. **Belam** ew nizame weqû nizami cinaqiy êstaqe nebûwe. We lew deme ew nizame zor iptidayî we biçûq we na-

tewaw bûwe. Her ewende yeq dû qes legel mal u mindalyan her demê peqewe degeran. Be roj le jêr sêber darêq dehesanewe, we be şew le eşqewtêq denustin eger piyawêqyan dirindeyêqi biqustayêt, hemûyan pêqewe lêy her debûn we deyan xward. Eger yeqêqyan nexos biqewtayêt, ewani tirî şew u roj xizmetyan deqird, we hemû be destewayi yaridey yeqtrîyan deda.

Inca em yeq dû male reş u rûte bere bere be ziguzê we be «jin-be-jin» qirdin zor debûn, we ewendey pê nedeçû debûne 50 – 60 qesêq. Bew çesne zor debûn we ewane hemû be zimanêq kiseyan deqird, be pêy pêşrewêq be rêwe deçûn, hemû xû w rewuştêqyan debû, we hemû demê-hemû pêqewe dealan.

Inca ew 100 – 200 qese piyawêqi (miroveqi) ixtiyaryan le naw xoyan heldebijard, we pesendyan deqird be gewrey xoyan, we hemûyan be careq be nawi ewewe naw debran.

Bem çesne le zemani qonda nizami qomelî le (nizami xezanî) yewe serqewtuwete (nizami xêlî).

Inca ew xêle le şwênêq rûnenistuwe, we cêgeyêqi taybetiy nebûwe. Beşqû hemû demê le geran bûne, be roj xeriq neçir girdin we xwardementî peyda qirdin bûne, be şewiş geyiştibênete ber çî şwênêq, yan her çî eşqewtêq lêy danîştûne, we lewêda nustûne. Lew deme ew xêlane qe hebuwe, hiç din, we ayinêqyan nabûwe. Le ser hiç dinêq nabûna. **Lepaşan** nexte nexte destyan qirde peristini axa w gevrey xoyan le paş mirdin, yan peristini dar u berd, yan put, yan mang u hestêre w hewre-tirişke, yan heywanat.

Lew deme dîn bestirabuwe (tirs) ewe, çunçe (lora) lew çîstane qe gotman tirsawin, her leber ewe ( ji bona wî ) destyan qirdiwete peristinyan, we be xwa dananyau.

Bew çeşne nizami qomelî le seretay damezranida qe xêzani we le paşan xêlî bûwe, ne bestirawe behîç peristîşêqewe we çîstêqi dîqewe. We lew dewre qe dewri yeqemîni qomelî bûwe, danîştuwani rûy erz le haletêqi wehşiyane jiyawin. Inca dewri duwemîni nizami qomelî hatuwe qe ( dewri dîn peristî ) ye.

Inca dîn peyda bûwe, le pêşda dîn u tirs pêqewe bestirawe we têqalawe, we destyan qirdiwete peristinî ew çîstane qe lêy tirsawin, le paşda bere bere peristîş pêş qewtuwe, we peyxemberan peyda bûwe qe le duwayî hemûyan dîni Islam pêq hatuwe.

Danîştuwani rûy erz aya xorhelatî bêt, yan xorawayî be tundi em peristîşeyan gird, we beryan neda. We le ser eme zor car şari gevre gevre dagirsa we be xorayî xwêni çend hezaran xelq rîja, heta rojawayîyaqan culanewe bo rêqxistinî dîneqan, we piyawî dana we gewrey weqû ( Marten loter ), ( ziwînglî ), ( qelnen ) peyda bû, ewendey pê neçû şeri sî sal peyda bû, we sî sal ewrupayîyaqan qewtine giyan yeq, we yeqtirîyan quşt, qe şereqe bir ayewe, we musamehey dînî le ewrûpa cêqey tea'ssubî dînî girdewe, we wazyan le dîn hawird, we hemûyan têqoşin qe hemû qesêq serbeste bo wergirdinî her çî dînêq.

Le paş ewe bere bere hêzi dîn u peristîş qem bûwawe, we ew şewkey carani nema, we gelani cuda cuday rûy erz çawyan le a'smane we bo erz dagird qe le ser erz xwayêqi dîqe şîtêqi tîrî bidozinewe, qe bî peristin, we bewe helsine giyan xwa qoneqeyan.

Inca felsefey maddîyay taze le cêqey felsefey dînîyay qon danîşt we be çaqî tasîrî qirde ser ewrupayîyaqan, dozînewey wulatani taze dergay qirin u firoştinî le ser piştî bo xelq qirdewe qe

## Cegerxwîn

Di dema heşê min wenda dibûyî  
Mizgîneq ji min re hat û got: bixwîn.  
Min cegerperitî, min dilhilâyî,  
Mêze qir ev mizgîn b' navê Cegerxwîn

\*\*\*

Hevalê xoşewist pesna gundê min,  
Bi ah û qeseran pêşqêş didî min.  
Ji nû ve pêteq ar, da ser daxê min.  
Derd û qul tevdayîn tewşe Cegerxwîn!

\*\*\*

Dêriq pir xweş e hêja ye pesnê;  
Çi biqim naqev dest; ji ber vê xesmê  
Bi dil birîndar in qurdên vê neslê,  
Ne ez û tu tenê hemî Cegerxwîn!

\*\*\*

Ma Maden hindîq e ji darên beran  
Osmanyê, Sêwerq, Mûşa-Serhedan.  
Ji çayê Torozê heta Dest-Rewan,  
Giş xabin! hin çêtir bizan Cegerxwîn.

\*\*\*

Dizanim tu zanî, welat giş xweş e  
Hin bajar hene qo tu lê na mese  
Mesela Elezîz çî lawqeleş e  
Bidîta bi çavê şîhrê Cegerxwîn.

\*\*\*

Hevalo tu xweş bî; tim bî dilê xwe,  
Welatê bihuştin tim bi sazê xwe  
Saz biqî di nava tilyên destê xwe  
Da nezan bizanin tu yî Cegerxwîn...

*Kedrican*

caran neyan qirdi bû we neyan dezanî,  
we hemû qesêq şew w roj le pênawî ik-  
tisadiyyati xoy deçuwe pêşane. Inca le paş  
emane dozînewey şî u meqî ewê, şîq u  
gumani xiste dil dindareqan, destyan  
qirde şîq qirdin lew çîstaneqe leqîtêbani  
dîn bêjarbû we gotrabû.

( tewaw ne bûwe )

*Hevîndê Sor*

## Keyo û Stêr

Işev şev e, şev bi şev e  
Dê digirî tirba xwe ve  
Heyiv derqet stêrqa xwe ve  
Dilqetî me û singjar im  
Bê welat û bêbajar im.

Erdê xwe re ez heyran im  
Birindar û bêderman im  
Ji qurdan re ez kurban im  
Dilqetî me û singjar im  
Bê welat û bêbajar im.

Bêxweyî me ez tinê me  
Yeq ji camerên dinê me  
Ji bebextî ez qetî me  
Dilqetî me û singjar im  
Bê welat û bêbajar im.

Jşev şev e şev bi şev e  
Bavê min tê gora xwe ve  
Heyiv derqet stêrqa xwe ve  
Dilqetî me û singjar im  
Bê welat û bêbajar im.

*Dr. Zamiran Ali Bedir-Xan*

## Gazî

Rabin brano, rabin rabin  
Ber bi welêt em bibarin  
Em derêxin van neyaran  
Ji welatê bav û qalan  
Qurdistana me delal e  
Lê biqul e zehf dinale  
Belê welat pir delal e  
Lê bibirin û bêhal e  
Dermanê wi di me de ye

Di min, di te, di wî de ye  
Pêqve heqe em xebitin  
Welatê me dibe rengin  
Dêst û çiya tev spehî ne  
Ezmanê wî buhîştin e  
Me diqşêne ber bi xwe ve  
Rabin êdin ev çî xew e  
Belê tevde, tevde rabin  
Ne yeq, dudo pêqve rabin  
Bê bêbextî, bi camerî  
Heqe rabin, rabine gî  
Hawar e ev, deng û hawar  
Tev lerizin, direh û dar  
Namûs biqin weqî mêran  
An bimirin weqî şêran.

*Evdirêhman Tewzî*

Sereqê Eşira Jilîyan

## Yeqitiya Qurdan

Rûjgê bi çend hevalên xwe va  
me da bû rê, em diçûn Qaniya - Ereban.  
Deşta Sirûcê di ber me ra weq çarşevê  
zêrin raxistî bû. Zeviyên ceh û  
genim cih bi cih zer diqirin. Ji germiyê,  
ji erdê ber bi ezmanî ve ewrên xumamê  
radibûn, der bi der leyloqên çeleng  
dihatî dîtin.

Gava em gehîştin sîqê me xwe  
da ber siha kahweqê, me zehf xwêh da  
bû, me canên xwe divêsihandin.

Ji nişqa ve di ber deriyê kehwê  
de kirocîreq bû. Xelqê kehwê tevda ber  
bi derî çûn.

Me dit qo du xort rahîştine hev  
û li hev dixin. Çend xortên din qo di  
devê qolanê de seqinî bûn, ji cihê  
xwe rabûn, baz dan û xwe gihandine  
xortên pêşin. Ket ne pîrsin, seh ne qirin  
gelo çiman li hev dixin qî biheke, qî  
nehêk e, hema tevda li yeqî bûne qom  
û lêdan. Geleq ne borî ji hev bûn, ê le-  
xistî bi baqur da çû û ên mayîn hatin  
kehwê. Ez geleq kehîrî bûm. Ma mêranî  
ev e, qo neh deheq li yeqî qom bibin û li  
wî bidin. Ji kebra xwe min ji wan re got:

— Ma hon fedî naqin, deh mirov

li miroveqî dixin. Diviya bû qo hon herin  
biqevî nav wan û ji wan re navçitî biqin,  
ne qo tevda li yeqî xûn.

Xortên me tevda rabûn ser xwe  
û pêqve gotin:

— Beg im, mesele ne welê ye, ne  
dema navçitîyê bû. Qa em ji te re  
bibêjin, tuê bibinî qo hek di destê me  
de ye. Lewê qo bi baqur da çû ne ji me  
bû, î romî bû. Namusa me kaîl ne dibû  
qo yeqî biyanî pês çavên me de li yeqî  
qurdmanc bide. Ji lewra me ket ne pîrsî  
gelo qî nehêk e, û em li biyanî qom bûn.  
Ji xwe welê ji divêt. Heqe qurdmanc nehêk  
be jî, disan divêtem ariqariya î qurdmanc  
biqin da qo ew meqeve bin lingên biya-  
niyan. Ji ber qo ê qurdmanc ji me, ji  
miletê me, ji xwîn û nijadê me ye.

Lew deme qe mêsiq wa têqçûbû, dinya naxoş bûbû, ewrupayîyeqan çawerewani xwayêqî tazeyan deqird qe le bati xwaqey pêşûyan daynên, qatê sêryan qird huqûmeti taze derqewt we (nizami gel peristî) pêq hat, inca ew deme ewrupayîyeqan gotyan wata qe hetaqû êsta boy degerayn we neman dedoziyewe, wa boman dozrayewe.

Remî çeşne « destûri gel peristî » cêqey « destûri dîni » y girdewe. çunqe eweyan pê xoştir bû, we ew destûreyan bo çaqtir bû we ciwantir le rûhî zeman-yan dewşayewe.

Ewendey pê neçû « qomelani gel peristî » derqewt taqû cêqey piyawani dîn bigrêtewe. Inca qe kanûnî dimoqrati bilaw buwewe le naw hemû xelqda, be tewawetî binaşey « Gel peristî » cêqey xoy gird, we kayim bû.

Inca lewew duwa « Gel » buwe mabûdi xelq, we têgeyîştî qe tarîxi serqewtîni gel şerefêqê boyan, we leser mal u mulq u dewlemendî gel binaşey xoşî w sea' detyan radewestêt.

Bem çeşne nizami qomelî, le dewri « dîn peristî » yewe serqewte dewri « Gel peristî » we hetawî gel peristî be tewa- wetî rûy erzi rûnaq qirdewe.

Inca kanûnî « gel peristî » kanû- nêqî taze niye qe le paş « nizami dîn pe- ristî » le ser rûy erz derqewtibêt.

Min dereng, geleq dereng sehqir qo qitêban ez xapandîme. Ew ne qurdî bûn.

Di gerana dinê de, dest û pêyê min dil û singa min birîndar bûn.

Lê min nuho di tenîsta qanîyeqê zelal û di bin siha darên spîndar û bişenga de, di rêya welatî de şabûnî peyda qir.

*Dr. Zanîran Ali Bedir-Kan*

Legel eweş da wa direng hetawi helat, we dinyay rojna qirdewe. Em kanûne kanûneqi tebî'îye le dinya da. Çunqe leser çend çîstêq nefsi rawestawe, we le ser çend çîstêq rawestawe qe le nafi beşer da xerizî ye.

Le zemani qonewe beşer neştumani xoy xoşwistuwe we xoy bo fida qirdiwe we heta insane dirindeqaniş ew cigeyeyan xoşwistuwe qe lêy hatûnete dinya, we leseri jiyawin.

Her leber ewe le başi duwayîy kerni nozdemînewe hetaqû êstaqe « gel peristî » weqû dinêqi lê hat we êstaqe yeqêq le dîneqan dejmêrrêt.

Imro eger nextêq binwarin le dîni « gel peristî » debînî le babet meylewe, we te'assubi dîniyewe le dîneqani tiri tîjtire, we ewaney qe em dîne deperistin zortir bo pêwisti dîneqeyan mil qeç deqen, we xoyan fida deqen.

Çend carêq « Mosolini » basi berzi w bilindayi romay qoni qirdiwe, gwê-lê-giteqani xistiwete coş u xiroşewe, we bê hosyani qirdiwe.

Çend carêq Yûsif Mazîni, pey-xemberi yeqyeti Italiya be yeq qelime hezaran xelqi lêxurîwe bo maydani şer, we xoyan be quşt dawê le pênavî yeqyeti, we serbexoyî neştumanyan.

Leber ewe gelani rûy erz ra-hatuwin le berz qirdini xoyan, we berzbûni hemû çîstêq qe hîn xoyane, yan qe berzyan deqatewe, we herçî qesêq be pêçewaney eme bicûlayitewe be xayin dejmêrra we be dujmini neştuman dadendira, we dequjra, yan hepis deqra.

Em çiroqe qe le wexti şeri Rûs u Japoni sali ( 1904 — 1905 ) peyda bûwe, be tewawetî em fiqreman pêşan dedat :

Lawêqi japonî le wexti ew sere şewêq le ser nwêni em law ew lay deqird, hiç xewi nedehat. Şariş tariq bûbû bicge le prûşqeyêq qe le çirayêqewe dehat we cegeqey rojna deqird hiçî tiri nededi.

( dûmahîq heye )

*Hevindê Sorî*

## Buhara Dêriqê

( rupeleq ji bîra yeqî dîl )

Buhara Dêriqê ji 25ê Şibatê dest pê diqe. Lê, heta pazdehê Adarê baê reş, merivan diêşîne. Ji xwe newala « Zînara sior » neba ji baê jêrin pêve — qo ew jî ji bêhra sipî baranê tine — tu baên din lê naên.

Ji ber qo bireqên çîyan ji roj-helat, rojava û baqur da weq hêveqe sê şevîn lê digerin û dora wê digirin.

Di paş van çîyan de Rêla çîyaê mazi heye. Dêriqê pala xwe daye çîyan û berê xwe daye şorezara Erebiştanê...

\*\*\*

Gava buhar tê, xwîn li canê min vedigere. jiyîneq nuh jî pêre tê. Em, zarên dibistanê — nola dilên qo ji çalan bi ser ruê dinê diqevin — hol dibin bi ezmanan diqevin û çirivîtan didin xwe.

Em, bi dora Mamosteên xwe diqevin; hineq jî me xwe daven hustû û destên mamoste, hineq jî rû û çavên wî maç diqin, destûra gerê jê hevî diqin. Pa e em bi rê diqevin. Ma key dibistan e?? Na !! Em, ji hev belav dibin. Mamosteê me, me weq çêlqewan jî bin lat û znaran derdixe, dixeyide tewş e, diqene rû dide me. Vêca em digihêjin nav baxçeqî, li ser mêrgeqê rûdinin, taştêya xwe dixun, û desbi lîsqê diqin. Her qî jî me destdirêjî diqe. Mamoste gopalê xwe dihezîqîne, me ditirsîne, û dibêje :

— Ez nabêjim qulîqên xelqê me kurifînin, pê li çandinîyên wan meqîn..

Şîretên dûr û dirêj li me diqir. (Eha min şîret got) Na !! şîret, ne ev in. şîret ew e qo buhara sala çûyîn mîfeti e qulî Arîf Ebas beg — îrû li Hesiçê jî bona felata mîletê me rêberîyê diqe — li me qir. Herê, şîreteqe qo tucar jî bir nabe.

Rûjeqê Arîf beg em civandin, li me şîret qirin û ev çiroq pêre got :

— Hon mêze biqin, jiyîn weq vê

## Siyabendê Silivî

Çirçiroqa Siyabendê Silivî bi nav û deng e. Ev jî weq Memê-Alan yeq ji çirçiroqên me ên qevn û spehî ye. Herqes pê dizane. Ezê li hir bi hênceta loirya - mirina qo min berî sê salan nivisandîye, û di vê hejmarê de belav diqim bireqî wî hildim.

Siyabend Xec-di rûja daweta wê de-ji destên heft brayên wê revand û biri bû serê çiyayê Xelatê. Ji ber qo Sîpau dilqetîyan dihewîne û wan dipareze, nahêle tuqes nîzingî wan bibit.

Rûjqê Siyabend serê xwe dauî bû ser ejnûwên Xecê û di xew re çû bû. Ji dût ve qerîyeq gaqovî derbas dibû û diçû ser delavî. Di qeriyî de dêleq, ciwanegayeq û heşt gayên din hebûn.

Ciwanega rex delê ve diçû û ne dihişt heft gayên din nîzingî wê bibin. Heçî qo ber bi delê ve dihatin, stiruhên xwe di wan hildida.

Xecê weqê ew ditin, mala wê, heft brayên wê û şerê rûja revandinê qet bira wê. Ma Siyabend jî weq vî ciwanegayî Xec ji destên heft mêran ne stand û revandî bû.

Xecê bi bira mal û heft brayên

buharê delal û şêrine. Dil dixwaze qo em bi xweşîyeqe geş bijîn. Ev jî bi xebat û destgirtina hev dibe. Kenc bala xwe bidinê, di zemanê berê da padişahêq di nivîna mirinê de gazî zaroên xwe diqe û ji her yeqî re dariqeçî biçûq dide û darê her yeqî bi wî dide şiqestandin. Şûnda Kandî wan dariqan kevdeki çêdiqe û dide destê wan, yeq bi yeq. Ji wan yeq jî niqare wî kevde dariqan bişqênine. Hingî jî wan re dibêje « Hon jî wisan in. Hon jî yeq bi yeq tene şiqestin lê hon gihiştin hev qes niqare we bişqênine »

Arif beg li vir gotinên xwe ke-dand û bi çavên zelûl xatir ji me xwest, da rê û çû...

*Kedrican*

xwe ber xwe qet û dest bi girtûê qir. Çend hêstirên Xecê qeti bûn rûwê Siyabend. Siyabend pê hisyar bû û ji Xecê re got:

— Ruhniya çavan, çirê digiri, beta niho biqêf û dilxweş bûyî, çî li te dest da, qa bêje min.

Xec qir qo mêhejit. Lê Siyabend jê ne geriya, geleq ber wê da. Dawî lê vegerand û got:

— Siyabendo, qerîyeq gaqovî derbas bû û çû avê. Têde dêleq, ciwanegayeq û heft ga hebûn. Qo min ew ditin, ew rûj hat bira min qo te ez ji destên heft brayên min revandin, û min ji xwe re got « heqe wê rûjê yeq ji me bihata quştin, ê quştî jî tu bûwayî, piştî te re halê min dê çî bûwa », ser vê yeqê girtiya min hat.

Siyabend rabû, qevana xwe hilda qo here wî ciwanegayî biquje. Xec qet buwara wî qo meçit, qir ne qir, Siyabend guh ne da û ber bi delavî ve çû.

Ciwanega di dora delê de digeriya. Siyabend ew da ber qevana xwe, tir lê qet.

Ciwanega, çend gavên xwe randin û xwe gihand qeviya hevrazeqê û li ser şehareçî veqet. Bi birin bû. Ên mayin dor li delê girtin, û baz dan.

Siyabend çû ser, ciwanega jî stiruhên wî girtin qo şerjêbiqe. Ciwanega gehiştî bû çanqesiyê, bihna xwe a paşin bidaya, bi hêla canê xwe serê xwe hejand, destên Siyabend jî stiruhên wî filitin, pêyên wî şemitin, ger bû û ji hevrazê de qet newalê. Di binê newalê de dareqe hişq hebû. Siyabend piştîqî qeti bû ser, çikilên darê di piştî wî re çûn.

Xec demeçe xweş ma hêviyê. Hewiya wê ne dihat, rabû, da şopa Siyabend û xwe gihand ciwanegayî lêqeti. Ciwanega li ber mirinê bû.

Ji newalê de nalineq dihat. Xec xwe dahiland û Siyabendê xwe di wî halî de dit. Lê giriya û qilamin avêtin ser. Di pey re xwe zer qir û avêt newalê, di rex mêrê xwe de mir.

Dibêjin qo di wê newalê, di wî cihî de qo Siyabend û xec mirine serê

Textes et Traductions :

## Loriya Mirinê

Siyabendo ! Siyabendo ! deng biçe  
 Ji jîna xwe jîna xwere reng bide  
 Nav mijê de xuya dibin hêstiran  
 Ma qê digot, nêçir biqêje nêçirvan  
 Binve lawo, binve lawo, binve lo !

Exlat disa tevli hev bû, dû mij e  
 Siyabendo, Siyabendo, de bêje  
 Ma ez gorî min go meçe : ji ba min  
 Belê min go, lê te ne qir ji ya min  
 Binve lawo ! binve lawo ! binve lo !

Serê Sipan di nav pûqê, pûqê şên  
 Bager, bahor bi rê qetin disa tèn  
 Gaqoviyo, canemerge, ji qû hat  
 Çawan bû qo, Siyabendo lê bû mat  
 Binve lawo ! binve lawo ! binve lo !

Dil û qezeb çênî çênî jêqirin  
 Weqe tirqê perasûwa ra qirin  
 Stiruhên ga hesinîn in ji fola  
 Min go meçe, lê Siyabend guh ne da  
 Binve lawo ! binve lawo ! binve lo !

Siyabendo ! tîrzêrîn û zivqevan  
 Min go meçe ber şehar û delavan  
 Ger nêçirêq te gereq bû hin caran  
 Ma ez ne bûm nêçira te hem kurban  
 Binve lawo, binve lawo, binve lo !

Siyabendo ! Siyabendo ! te çî qir

her Buharê du derxên gul radibin û du  
 qoqî di ser wan re difirin. Dibêjin ji qo  
 her çiyayê Qurdistanê stêreqe wî heye.

Ji hingî ve yên Sipanê Xelatê bûne dudo  
 û her şev di ser tîrbên Xec û Siyabend  
 dibirikin û wê goristanê diruhnin.

\*\*\*

Berî sê salan di civateqê de Si-  
 yabend distrandin. Bi wê strandinê loriya  
 mirinê ji min re hilqet û min ji nivîsand

Qo Xwedê hez qir, pêşdetir çir-  
 çiroqa Siyabendê - Silivî di Hawarê de  
 bête belav qirin.

*Hercqol Azîzan*

Çiton bû qo tu şemîtî ji ser gir  
 Te ev qortal çawan bijart bo hêlin  
 Ma ne heyf e, hêj nûbar e ev hevîn  
 Binve lawo ! binve lawo ! binve lo !

Serê Sipan, stirih direh, zinar in  
 Teyroq û berf nêçirvan re neyar in  
 Min go meçe, gaqovî ye, lawecan  
 Ji hev biqev, biqev hilweş, ey Sipan  
 Binve lawo, binve lawo, binve lo !

Biqev, memîn, hilweş biqev çiyao !  
 Rabe, rabe Siyabendo zavao !  
 Rabe, bê yê te ez niqarim, rabe ax  
 Bê xweyî û sêwî mame hilbe ax  
 Binve lawo ! binve lawo ! binve lo !

-Siyabend ji bintya qortalê lê vedigerine :

Megrî, megrî, qeçê megrî, delalê  
 Berde mirin, weq bûqeqê bila bê,  
 Qê gotiye mirin tal e, na herê  
 Birinên min ket naêşin, lê belê  
 Dilê min de tu î hergav ditirsim  
 Tu êşandi stiruhên ga ? dipirsim  
 Qeçê megrî, qeçê megrî, delalê  
 Berde mirin weq bûqeqê bila bê.

-Xec pês ve ajot :

Siyabendo ! Siyabendo ! menale  
 Ma qê digot ev encamreş, li bal e  
 Ezê çawan nagirim û hêstiran  
 Germ û xwînîn, narêşnim pêşirân  
 Binve lawo ! qinve lawo, binve lo !

Nalînên te qûr û ziz in mîna merg  
 Ezê çawan xwe ragirim, meqim deng  
 Nalnalên te qo gehîştin dilê min  
 Hêstirên min dibarin ser qulên min  
 Binve lawo ! binve lawo, binve lo !

Binal, binal, Siyabendo, her binal  
 Te ez hiştim û xwe avêt di nav çal  
 Te zanî bû bêxwedî me bêqes im  
 Ez vê qulê çawan biqim birêsim  
 Binve lawo ! binve lawo, binve lo !

Gelî Sipan quçên Exlat mebin bend  
 Rêqê bidin, min gehînin Siyabend  
 Gelî Sipan, berwareqê, bazdoneq  
 Min re veqin, derbas bibim, herim teq  
 Gorin bibim Siyabend re me bûqeq.

*Qantya-Creban : 12 Çirîya-Berê 1928*

## Berceuse de la Mort

Siyabendo! Siyabendo, parle  
 Donne un signe de vie à ta femme  
 Dans le brouillard on voit de larmes,  
 Mais qui aurait dit que le gibier tuerait le  
 [ chasseur

Dors mon garçon dors...

Le mont Akhlat est encore s'en dessus des  
 [sous, couvert de fumée et de brouillard

Siyabendo! Siyabendo, dits alors

Oh que je te sois tombeau, je t'ai dit ne t'en.  
 [ va pas de chez moi

Oui, je l'ai dit, mais toi tu n'as pas suivi  
 [ mon conseil

Dors mon garçon dors...

La sommet du Sipan est dans l'ouragan, un  
 [ ouragan formidable

L'orage et la bourrasque sont en chemin ils  
 [ viennent encore

Le cerf, le maudit, d'où est-il venu

Comment fait-il que Siyabend fût mâter par lui  
 Dors mon garçon, dors...

Le cœur et le foie étaient coupés, en mille  
 [ morceaux

Comme une flèche enfoncée dans les côtes

Les cornes du cerf sont de fer, d'acier

J'ai dit ne va pas, mais il ne m'a pas prêté  
 [ son oreille.

Dors mon garçon dors...

ô Siyabend, au flèche dorée, à l'arc argenté  
 J'ai dit ne va pas vers les rochers plat et  
 [ aux abreuvoirs

Si quelquefois te fallait un gibier

N'étais je pas ton gibier et ton sacrifice

Dors mon garçon, dors...

Siyabendo! Siyabendo, qu'as tu fait

Comment se fait-il que tu glissas du sommet

Comment as tu choisi cette abîme pour nid

N'est-ce pas dommage, cet amour est encore  
 [ tout frais éclos

Dors mon garçon, dors...

La sommet de Sipan est pleine d'épinés,

[de chardons et de rochers

La grêle et la neige sont des ennemis pour

[ le chasseur

J'ai dit, ne va pas cher enfant, c'est le cerf

ô Sipan, brise toi, tombe et effondres toi

Dors mon garçon, dors...

Tombe, disparais, tombe ô montagne

Et toi Siyabendo, lève toi jeune marié

Lève toi sans toi je n'en puis plus, lève toi ah

Je suis resté sans protecteur, orpheline, dres-

[ ses-toi ah

Dors mon garçon, dors...

-Siyabend lui répond du fond du précipice :

Ne pleures pas, ne pleures pas, fille, ma belle

Laisse la mort venir comme une jeune mariée

Qui a dit que la mort est amère, mais non

Mes blessures n'ont point du male, mais

[ seulement

C'est toi qui es toujours dans mon cœur, j'ai

[ peur

Et te demande, est-ce que les cornes du cerf

[ t'ont fait du mal

Ne pleures pas, ne pleures pas, fille, ma belle

Laisse la mort venir comme une jeune mariée

.Khadj continue

Siyabendo! Siyabendo, ne gémis pas

Qui aurait pensé que cette noir fin est devant

[ nous

Comment, que je ne pleure pas, que je ne

[ verse pas des larmes

Chaudes et sanglantes, sur ma poitrine

Dors mon garçon, dors...

Tes gémissements sont profonds et tristes

[ comme la mort

Comment me retenir et ne pas crier

Alors que tes soupirs arrivent à mon cœur

Mes larmes tombent sur mes plaies

Dors mon garçon, dors...

Gemis, gemis, Siyabendo, gemis toujours

Tu m'as laissé et tu t'es jeté dans l'abîme

Tu savais que j'étais sans appui et sans soutien

Comment ferai-je pour cicatriser cette blessure

Dors mon garçon, dors...

ô Sipan! ô pierres de khalat ne soyez pas des

[ obstacles

Donnez-moi une route et menez moi chez

[ Siyabend

ô Sipan, un sentier, un gué

Ouvrez moi, que je passe et que j'aïlle

Et devienne pour Siyabend une tombe et

[ non une épouse.

\*\*\*

Cette chanson que j'ai nommée la (Berceuse de la mort) est un poème qui m'a été



inspiré d'un passage de la légende (Siyabend-Silivj), dont j'ai versifié tout en gardant les expressions populaires.

Siyabend est le nom du héros (Siliv) est le nom de la tribu. Le tout veut dire le Siyabend de Silivan.

Pour pouvoir bien saisir le sens de ces vers quelques explications seront nécessaires au sujet de la légende : Siyabend est un pauvre orphelin qui vit et grandit dans des circonstances des plus difficiles. Dès son bas âge il se fait connaître par les faits d'armes. Siyabend à travers ses aventures tombe amoureux d'une fille d'un chef, répondant au nom (Khadj). Khadj aussi répond à l'amour de Siyabend. Mais comme Siyabend n'est pas de la noblesse leur union est impossible. Les parents de Khadj malgré elle l'ont mariée à un jeune homme de la noblesse. Le jour des noces Siyabend attaque le cortège et enlève khadj des mains de ses sept frères.

La montagne (Sipanê-Xelatê) est renommée pour donner abri aux amoureux et interdire à qui que soit d'en approcher. Siyabend se réfugia avec khadj dans cette montagne.

Un jour Siyabend ayant posé sa tête sur les genoux de Khadj s'endormit. Au loin un groupe de cerfs passa, allant vers l'eau. Ils étaient sept mâles, une femelle et un jeune mâle amoureux.

Le jeune mâle accompagnait la femelle et ne laissait aucun des autres s'en approcher. Khadj en les voyant se souvint de sa maison, de ses sept frères et du jour où Siyabend s'était battu avec ses sept frères et l'avait enlevé à eux. Siyabend aussi ne l'avait-il pas enlevé comme ce jeune cerf des mains de sept hommes.

Khadj à ces souvenirs devint triste. Quelques larmes coulèrent de ses yeux et tombèrent sur le visage de Siyabend. Siyabend s'éveilla et lui dit :

— Pourquoi pleures tu, tout à l'heure tu étais heureuse et gaie, que t'arrive t-il dis-moi, mon amour

Khadj essaya de lui répondre évasivement, mais comme Siyabend insistait, elle lui répondit ainsi :

— Un groupe de cerfs vient de passer, allant boire. Il était composé d'une femelle d'un jeune mâle amoureux et de sept autres mâles. En les voyant je me suis rappelé le jour de mon évasion. Pendant que tu te battais avec mes sept frères si un de nous deux était tombé mort, et si ce mort ent été toi, qu'est-ce que

je serai devenu. Alors les larmes ont coulé de mes yeux, à cette pensée.

Siyabend se leva, prit son arc pour aller à la poursuite des cerfs, Khadj fit tout son possible pour l'en empêcher. Mais elle n'y parvint pas. Siyabend se rendit à l'endroit de l'eau, le jeune mâle se trouvait auprès de la femelle. Siyabend tira sur lui, la flèche l'atteignit. Le cerf fit quelques pas et tomba sur un rochet plat. Il n'était pas encore mort, Siyabend se précipita sur lui, prit ses cornes dans sa main gauche et de l'autre tira son poignard pour l'égorger, juste à ce moment là, l'animal pour donner son dernier soupir secoua vivement sa tête. Les cornes échappèrent de la main de Siyabend, ses pieds glissèrent et il tomba dans le précipice. Au fond du précipice il y avait un arbre sec, Siyabend tomba dessus, les branches lui traversèrent le dos et sortirent de sa poitrine.

Khadj l'attendit longtemps. Puis alla à sa recherche, elle trouva la bête tuée. Elle entendit un gémissement qui venait du fond du précipice. Khadj se penchant vers l'abîme vit son Siyabend, lui dit quelques mots d'amour et se jeta dans le précipice et meurt à côté de son amant.

\*\*\*

Les effets de la légende se manifestent encore jusqu'à nos jours. On dit que à l'endroit où sont morts Siyabend et Khadj, chaque printemps deux rosiers poussent et deux papillons les survolent. On dit aussi que chaque montagne de Kurdistan a une étoile propre à lui, depuis la mort de Siyabend l'étoile propre à la montagne de (Sipan) s'est dédoublée et chaque nuit elles éclairent les tombes de Siyabend et de Khadj.

*Hereqol Xizian*

## Le nombre

des repas chez les Kurdes

La gourmandise des montagnards iraniens a, de tout temps, retenu l'attention des étrangers. Les anciens auteurs grecs nous les présentent sous les traits suivants : « grands mangeurs et bons tireurs ». Les chroniques arabes, turques et persanes ne manquent pas de récits, grossièrement symboliques, sur l'insatiable appétit de ces montagnards qu'on a

pris l'habitude de désigner par le nom généralisant de « Kurde » (1)

En effet les Kurdes sont des grands mangeurs. La raison en revient spécialement au climat, au relief du sol et au mode de vie qui est la conséquence de ces deux facteurs géographiques.

Le climat de Kurdistan proprement dit (2) est trop excessif. Il a des grands écarts de température annuels et diurnes. Le froid de l'hiver qui dure de six à huit mois permet le développement de petits glaciers dans les vallées suspendues des hautes montagnes ; et couvre d'une épaisse couche de neige les villes et les villages parsemés à une altitude moyenne de 1000 mètres, la température s'abaisse dans cette saison, jusqu'à 25° ou 30° au dessous du zéro.

L'été au contraire, est court mais très sec et très chaud. La température s'élève, en cette saison, à 30°, 35° de chaleur et parfois à 40° dans les petits bassins et les petites plaines enfermés.

Pour lutter contre les excès de ce climat épuisant, l'organisme exige une alimentation intense et reconstituante.

La circulation dans ce pays trop accidenté et le mode de vie rustique ou pastorale des Kurdes ne contribuent pas moins à exciter leur appétit.

Pour aller d'un village à l'autre il faut parfois escalader et redescendre les flancs pyramidaux d'un anticlinal haut de quelques centaines de mètres. S'ajoute à cela l'activité qui secoue le Kurde pen-

1) Le nom « Kurde » qui veut dire fort et brave était donné aux tribus irréductibles de la Mède antique. Un de ces foyers d'insoumission permanente était le pays de Botan qui fut appelé depuis l'antiquité kurdistan c'est-à-dire pays des kurdes. Après la conquête islamique tous les tribus médiques qui ont refusé de reconnaître les nouveaux maîtres étrangers se retirèrent dans les hauteurs de leurs montagnes et devinrent comme leurs frères de Botan des Kurdes c'est-à-dire des rebelles insaisissables par rapports aux citadins des villes médiques.

2) Le pays qui groupe le plus grand nombre de kurdes c'est l'E. de la Turquie, l'O.-N.O de la Perse, le N.-N. E. de l'Irak et le S.- S. E de la Caucasic.

dant la saison serrée d'automne et d'été : la moisson, l'ensilage, le labour, le séchage des fruits et des légumes, le fauchage et l'amoncèlement du foin, l'extraction du beurre, la vente des produits de la ferme au marché, la coupe de bois pour le chauffage, la réparation des toits et des cheminées, le nettoyage des étables etc... Tous cela fait du Kurde une sorte de machine humaine qui nécessite une grande quantité de combustible alimentaire.

Or le sol de Kurdistan n'est pas ingrat. Il abonde en toutes sortes de produits ; céréales, arbres fruitiers, forêts et des grasses prairies

Bien servi par une riche nature, et toujours éprouvé par l'appétit, le Kurde a dû, comme l'homme le plus civilisé de nos jours, s'occuper du nombre et de la répartition de ses repas quotidiens, dans l'ordre qui convient le mieux à ses besoins.

Quand il se lève de bon matin, pour aller dans son champ, il fait son premier petit déjeuner, constitué de fruits et de pain, qu'il appelle ( Keretûn ). Arrivé au champ il fait vers 7 H. son second petit-déjeuner ( xwirinî ) composé de lait frais non sucré, de pain de fromage et de fruits.

Vers 10 H 30 le Kurde fait son véritable déjeuner qu'il appelle ( taştê ). C'est à ce moment qu'il co somme le plus de viande, de légume, de salade, surtout de l'oignon ( pîvaz ) de lait cahier ( mast ) et qu'il boit du ( dew ) sorte de lait cahier extrêmement dilaté par l'extraction du beurre et assaisonné avec du sel.

A trois heures de l'après-midi, le Kurde fait une sorte de five o'clock qu'il appelle ( firavîn ) où il boit du lait et mange du pain et des fruits. Le soir vers 6-7 H. le Kurde fait son dîner ( şiv ) où il prend son potage, mange des légumes cuits, du ( savar ) sorte de blé moulu qu'on cuit avec le beurre, de la

viande et qu'il boit son (dew).

Dans les longues nuits d'hiver, le Kurde qui veille jusqu'à minuit, à tisser son tapis, à ciseler son poignard, à incruster de pierrerie une petite hache de sucre ou à bavarder avec ses voisins et ses voisines autour du feu, se trouve obligé de prendre son souper (paşiv) avant de dormir.

Toutefois il faut noter que certains peuplades kurdes ne se trouvent devant la nécessité de respecter ce nombre de repas quoiqu'ils en savent tous le nom et l'usage.

Il y a en de tous temps de flots d'émigrants kurdes qui se sont déferlés dans les plaines limitrophes de Syrie et d'Irak. Là, ils furent obligés de modifier leurs anciennes habitudes. La longueur de la saison chaude, la platitude et la facilité des terrains, le contact avec les Arabes, généralement très sobres, portèrent remède à leur insatiabilité et leur conseillèrent de supprimer quelques repas de liste du jour.

Pour ironiser la friandise des montagnards de Botan, les Hevêrqans racontent l'histoire suivante :

« Quand à l'époque du premier Bedir-Khan, les botaniens occupèrent les territoires de Hevêrqan, les soldats et l'escorte du prince exigèrent d'être nourris comme chez-eux. Satisfaction leur fut faite et mangèrent successivement leur keretûn, xwirîni, taştê, firavîn, sîv et paşiv. Après minuit les botaniens se réveillèrent et demandèrent, encore une fois, à manger.

— Quel genre de manger désirez-vous? leur demandent les Hevêrqans.

— Nous désirons un firavîn.

— Mais n'avez-vous pas mangé votre firavîn?

— Si, mais comme il y a un firavîn d'après midi pourquoi il n'y aura-t-il pas un tiravîn d'après minuit! répondirent-ils à leurs généreux hospitaliers.

En examinant l'horaire, l'importance

et le menu des repas chez les Kurdes, on peut y entrevoir certaines particularités qui réclament une petite explication. Une de ces particularités qui sautent le plus aux yeux c'est le manque de repas à midi.

Il semble que le kurde a hâté l'heure du déjeuner pour passer, en pleine activité, le temps le plus chaud et le plus alourdissant du jour. Ce procédé qui a l'avantage d'étouffer le besoin de sieste ou de repos, en été, économise beaucoup de temps et augmente considérablement le rendement du travail champêtre. Cependant les Kurdes qui habitent les grandes villes apprennent à manger à midi et appellent ce déjeuner (mîvro) c'est-à-dire mi-jour.

Un autre point d'importance capitale est la richesse du menu Kurde en vitamine. Les Kurdes mangent beaucoup de fruits et d'oignons. Ils boivent beaucoup de lait non chauffé et non sucré. Ils consomment aussi beaucoup de viande dont l'influence toxique est considérablement réduite par la boisson désinfectante du (dew) et par l'absorption d'une grande quantité de (mast) lait caillé. Cela explique peut-être la cause de la longévité des Kurdes qui détiennent actuellement le record de l'âge dans le monde entier (Zoro agba, 164 ans).

On peut enfin constater que le montagnard kurde diffère, des paysans d'autres races voisines, par l'adaptation de la nourriture à ses besoins et surtout par son insoumission aux heures de manger traditionnelles qui ont été dictées aux autres peuples, dans l'origine, par les trois étapes de la lumière diurne : lever midi et coucher.

\*\*\*

Le Kurde n'est pas l'esclave convaincu de l'inconsciente nature. Il réagit plutôt sur elle. Son énergie n'est pas encore paralysé par la résignation mystique des autres races orientales.

*Newin*

## بکاء و بکاء و بکاء

بکیت فابکیت النهی والقوافیا  
 بشدوی واشجبت الندی والنوادیا  
 وابکیت احداق المعانی وانما  
 جعلت لها آماق شعری مجاریا  
 واذرفت من در البدیع مدامعا  
 فقلدها منی یراعی الدراریا  
 وانی لابکي والبکا یبعث البکا  
 لاعماق وجدانی فابکي بیانیا  
 واهرق من ماء الحیاة نزیفا ما  
 حکمی عندما اذ عندما جد جاریا  
 وانی لیکینی الاسبی کل ماری  
 خیالک یا شوقی فارجع باکیا  
 تصورت فی عینی وذوقی ومسمعی  
 ولمسی وشمی اذ اراک خیالیبا  
 ومن حق مثلی ان یذوب من البکا  
 علیک وان یرکي الدیار الخوالیا  
 لأن کان غیری قد بکاک بدمعه  
 فانی بوجدی قد اذبت فوادیا  
 وان کان لا یرضیک ذاک فانی  
 لعمرک سمح هاک منی حیاتیبا  
 \*\*\*  
 ولست بناس اذ تقول مترجما  
 حیاتک بالعرق الکریم مباحیا  
 سمعت باذنی من ابی وهو قائل  
 من الکراد صلی جئت فی العرب ناشیا  
 وقد جاء فی «الذکر الحکیم» الادعهم  
 لا یأثم ان کان ثم نقاضیا  
 اذ أنت کردي وشاعر عصرنا  
 وممک قریض العرب لازلت راعیا  
 بک الکردي قد جروا ذبول فخارهم  
 علی هامة الجوزا وشادوا المیانیا  
 وان تک فی ذا العنصر الیوم واحدا  
 فقد کنت فی ذا العصر للشعرواقیا

وانت امیر الشعر فی الشرق دائما  
 وما زال فینا صوت فضلك داویا  
 ترحلت عنا لا ملالا وانما  
 بذاک قضی الرحمن ما کان قاضیا  
 ومن بعدکم جزل القریض رقیقة  
 وما دق من مینی تدهور هاویا  
 \*\*\*  
 خلعت بعد شوقی دار فضل بوئمها  
 بنوا الفضل اذ کانت منی وامانیا  
 وناح هزار الایک یندب ماجدا  
 علی النعش محمولا الی الخلد ماضیا  
 وامست دیار التیل قفراء بعده  
 وأصبح روض العرب فی الشرق ذاویا  
 بکی کبکائی کل صب بدمعه  
 یجود ولكن لا یجید القوافیا  
 \*\*\*  
 أری شعراء العصر قد طال صمتهم  
 فلم تلق منهم من یصوغ المرثیا  
 وانی لأدري سر ذلک فاعلموا  
 بان الذی قد حل دك الرواسیا  
 دهی الشرق خطب فادح وجرى بنا  
 الی قارعات قد تجر الدواهیبا  
 فطاشت حلوم القوم وارتاع جلمهم  
 خلا الشاعر الکردي وقد قام ناعیا  
 اذا سدت الافواه فی الشام انی  
 انا الصادح الشادی وان کنت «وانیا»  
 اغرد فی کل المواطن باکیا  
 علیک باشجانی فابکي یراعیا  
 وارثیک یا ابن العم فی کل منتدی  
 بما راق ابداعا ورق معانیا  
 فانت الذی قد قدتنا وجعلتنا  
 نصوص من الالفاظ ما کان غالیا  
 بفضلک سرنا رافلین الی العلی  
 بهجک شوقی قد بلغنا المعالیبا  
 فانت لهذا الشرق خیر دعامة

## کلادل

دلی من تیره ، تیر درد ویرین  
 میژفه در کتم ژ ولاتی خوہ دور  
 دلی من هری تف کله بخوین

\*\*\*

جرگامن آگرگری وپینته  
 دورژ مالاخوه ربن درکتی  
 من هدار نابه قت نابه بی ته

\*\*\*

من نه گند نه مال نه ژن نه زاره  
 من دثیت ولات ولاتو ولات  
 بی ته اف ژپین اسر من باره

### عقد رحمان فوزی

بما انت اودعت الشعور مبادیا  
 وانت الذی ابدیت ما کان غامضا  
 واظهرت فینا منک تلك الایادیبا  
 بتلك المبادی والایادی وکما  
 یخالف مبداکم نکید الاعادیبا  
 \*\*\*

رویدک شوقی لا تکن ثم بانسا  
 فتم یا حییبی هادی البال هانیا  
 علی الوطن المحبوب اسد روابض  
 وانیاها اضحت ظبی وعوالیا  
 \*\*\*

وقد کنت ارجوان الایک مرة  
 ولكن قضی الرحمن ان لا تلاقیبا  
 اذا فی جنان الخلد یجمع شملنا  
 غدا نسب «الاکراد» ان کنت ناسیا  
 وتحت «الوا» یوم النشور یضمننا  
 نبی ائی للخلق بالحق داعیا  
 الوالی

## نښی دل

نښی دل وه ره مالی به ابتر لاده له وحشت به س نقدی حیانت بکه صرفی خه وی غفلت حیفه گوډه ری خوت ببه به قیمتی مورو علوبتی طبعت مه فروشه به دنانت افرادی بشر هه ری ه که شاده به هوایی حیرانه لهم احواله هه مو اهلی بصیرت حدت حتی فقیر نه دری به بهک رشوتی ملعون بو خوین نه گری لهم ستمه چاوی مروت انسانی به سیرت نه بی نهک صورت نه گینه حیوان گه لی نوعی هه به انسانه به هیئت ناکهس له خسیسی بوه ته دوژمن خوش فیضی هه به بو دوژ منیش اربابی حمیت مهر دانه وهره پیشه وهره له وکاره که نهی که ی یامه بکه که نهی که ی به ته واوی بکه غیرت ثابت به له سهر حالی مه ترسه له حوادث دنیا به ابتر دیت و نه چپی شادی و مهنت نه م بهک دوده مه فرصته گهر قدری یزانی آبابی عزیزت مه که ضایع به سفاهت

ظاهر فواد

## فرمیسک

فرمیسک چیه ؟ دلویک آو ۰۰ به لام له آوروتر ، له آگر روناک تر ، له نه شته رتیتر ۰۰۰۰ .  
 دلویک : که له خوبنی دلی عاشق سو برتر ، له جگری روله کوژراو گه رم تر ، له وجدان صاف تر ، له اخلاق پاک تر ، له عشق حساس تره ۰۰ .  
 دلویک که له رسته مرواری گه ردنی کجان جواتر ، له اونگی سدرلیوی غنچه ی به بایان شیرین تره ۰۰ .  
 رحمی دایک ، صبری عاشق ، که ساسی هه تیو ، هه ژاری مظلوم ۰۰ . والحاصل هه مو مغدور بته کانی کون وقوژنی ژیان ۰۰۰ . نه مانه هه مو ۰۰۰ به ره و رحمتی عرش ی گه وره سهری نیاز یان هه ل بری ، وچا و یان کرده وه بودرمانی تسلی ۰۰۰۰ .  
 نه زانی چیبو له عرشه وه ، دلوب دلوب ، تکابه ام چاوانه ؟ .  
 فرمیسک ، که وهه ری یکی خوشه و بسته ، که خالق له نا وهه مو مخلوقا تابه ته نیا پیشه که شی انسانی کرده .  
 له به ره وه ؟ فرمیسک نه وه به که : ته نیا به سهر ده ردیکی انسانی دا تلور آیتنه وه ؟ یاخو نه تکیته لیوی برینیکی تزیهی دله وه ۰۰۰۰ .  
 فرمیسک ، اگر له روی رقتی محض ، عاطفه ی صمیمی ، شعوری راسته قینه وه بی : فرمیسکه ! ا بگینه ر بیوقیکی پیسه ، چلکی معنوی شی آوبته به ! ۰۰۰۰ .

گوران

## زارو دلهن

نمازه زارو وین ولاتی ژیرین ولاتی کردان ثق خیر و بیره همی معدنه ثق زیف و زیره لی چه بکم ایرومایه ژ خلکی ره ولاتی کردان همی چیمنه عکید وشیر و پلنک تی هنه همی هاقال و کر باقی مه نه پیشی لدنیا دودولت هیون نیک ژی فارس بو و ام بچوه بون ترک و عرب و عجم تنه بون

ام نه عربین نه ترک ورومن خدان پاشانه لشکر و کوبن ایر و خرابین بن دستی بومن گنهی مه چپی به بو چپی دین ناکی پرسی ژ حالی مه کردان ناکی ام کیم کتنه تومه راناکی کوما ملتان ماتی تو کوری چاچی ته کوره توله نانبری یان کال و کوقی توله ناگری اڤ نه حریته کونک و زوره لی هون دزاین دنیا بدوره

فتلک ل ژیره فتلک ل ژوره خلکی ام کشتن آقین چمان بگلر و پاشا دناق مه نه مان کوما ملتان امان و امان کوما ملتان هون پو لپرستن در حتی مه ده هون قوی مستن خلکی بدوستی ام ایرو خستن خو کامه نایی ام قط رانازن ام ژوه دکن هیشی و گازن ام حتی خوه هر گاف دخوازن

بگر خوبنی کردی

## دردی سادو

بگرن و سری وی پیر چقینن «

میزه عقلی مه افقاس نه دبری کو ام تقدیر که ولو ژیره  
 بینن و ژی خلاص بین . بو نیز یکی سالکی حالی مه و سادو  
 ب قی کاری بو . مه کر نه کر سادو صافی نه کر .  
 ژ بر کیم عقلیامه . مه نزانای بوام تقدیر یکی ژیره بینن .  
 از نها ددم بر چاقی خوه و دینم کو عقلی مه گردان مینا  
 عقلی من و پی عسگری منه ، بلی ام پینجه شیتست زار و بون  
 و مه ب سادو نکار بو . ژ بر کو دودوان ژمه شری سادو دگر

دوختی شیری مزن ده بو . ام ب مالیتی دگری میران ده  
 بون . گری میران گندک ژ گندین مه به . تیده هفتی  
 هشتی مال هبون . باقی من ل خار پوتی دحیسا تر کوده بو .  
 هنگی از زارو بوم . گندکی مه ئی دن ژی هبو ، ژیره  
 دگوتن قنتر . قدری ده مال تیده هبون . هر  
 دو گند نیز یکی هف ، هما بهقه بون . ل قنتری



کر ککی کچل وتره دینی  
 هبو . ژیره دگوتن سادو .  
 ام زارو کین گری میران هبون  
 پینجه ، شیتست زاروک . از  
 بخوه سر عسگری وان بوم .  
 حمی ژی بر دستی من بون .  
 ل قنتری سادو ب سری خوه  
 بو . من دخوه ست از وی ژی  
 بکم بردستی خوه . لی سادو بر  
 بزی ب من دگر .  
 ازی هر صبه رابو و آمانی  
 زارو کین گند حمی بدانا هف  
 و بچو و آما سر سادو . من او  
 صافی بکرانا . گاکا سادو  
 چاف ل مه دگر هما ددا  
 کچکایی خوه و درژی مه  
 دگر . یک ددو ژمه ددا بر

و پینجه و هشت رودنشتن ول  
 وان دفرجین .  
 کردژی ددو شد کن ،  
 پینجه و شیتست رودنن حتا کو  
 هر دو صافی دین . پاشی ددودن  
 رادین .  
 هنگی ام زارو بون کس  
 نین بو کو شیرتکی ل مه  
 یکی دا کوام تقدیر اسادو بینن .  
 لی کردنو ! مالخرابنو قابه  
 ام ژوه ره دیژن هکه هون  
 بهقره دریژی سادو بکن هونی  
 سری وی بکن بن لنگین خوه ،  
 هکه نه سادو هر بوه ئی بکاری .  
 ژ من باور بن ، از نها جارنان  
 دفکر م و دقهرم ، ژ خوه ره  
 دیژم ، مال آقامن چپان هنگی

### سلطان صلاح الدینی ابوبلی

اف تقدیر ژ سادوره نه ددیت .  
 لی چه بکم عقلی زارو کی بو هو عقلی من دبری . کردژی  
 هیژ مینامن و هنگی زارو کن . لی پاش کومزن بین او ژی  
 مینامن دی پوشمان بین و بیژن : وای باقو چاوان بو کو بری  
 بیست سیه سالی مه خوه ژ سادو رحت نه دگر .  
 آخ ژ دردی عقلی بچوک کوتشنگ ژی فه خو یا ناک .  
 آخ ژ دردی سادو ، فی دردی ام کشتن .

خوه و دکتی پی وان ، حتا کو او بو ستاندانا آن سرین  
 وان بشکاندانا .  
 ام ئین ما بین دجهین خوه ده دسکنین ول وان دفرجین .  
 پاش کو سادو قائلیا خوه ژ وان دگر دیسان بری خوه  
 ددومه . یک ددو دن ژی ددا بر خوه و مینا ئین پیشین  
 ل وان ژی دگر . یکی ب عقل دناف مه ده نین بو  
 کو ژ مره بیژی : « گد بانو گاکا سادو پی یکی فه  
 کتت هما ئین دن حمی دریژی وی بکن ، لی ورن هف

## کوننا راست

بگلو پاشاو آغاو ری سپی و مختار  
 خدانی برچی بلك باغ وره زو جوت وجوبار  
 هر بلك بدل خوشی و سرفرازی و بی هوشی  
 ل جهان دژین ب فی طرز و هاوایی بی زار  
 قط کس له زارو کاپرس ناکت جارك ایرو  
 هر چندی ام ژنا چاری دکن قیرین و هاوار  
 ام کورد ایرو بلنگاز و ژارن و بی خدینه  
 کردستان قماشه وه لی نینه ژیره خربدار  
 ددستی مه ده هیه پرتالکی تازه و پرچاک  
 لی هروه کی خانی گوتیه پر کساده بازار  
 گر هف نگران ام کرمانج ب تبائی و بک دل  
 بی فیده ایرواق چپروک و گوتن و اشعار  
 گر هر بک ژجهی خو هوشیار بیت و بگرت شور  
 کارن و ژوان تی لی و لکن بونه سراسر  
 ام کیم خستن شیخ وملا و آغا و بگلران  
 لورا ام ایرو ژ حکومتان ناینه هژمار  
 بری ام حکومتکه جهان گیر بون ل دنیا  
 وهر تماشابه ایوانی کسری نقشی نیکار  
 یفی طوزی شیخ وملا و آغا بگلر نف  
 نامه ب خاپین ام نف ژخو بونه هشیار  
 ام مننی ژملا و شیخسا و بگان ناگرن  
 ام بلنگاز بونه سرفراز و ژهقره غم خوار  
 لی حکومتین اورو پا ژمره دستور نادن  
 دا ام بگرن ل کردستان وک فلکی دوار  
 ام جانی خوه ددن قط ترکا کردستانی ناکن  
 لورا پرخوشه دشت و نوال و چیا و زنار  
 همی گل و یاسمین و بنفش و ناز و ریجان  
 هنجاز و شمش و خوخ و تری و هم هنار  
 شیش و عجبور و گوندور و تروزی و قاون  
 شینکو مازی و گلاظ و خرو کویزو قیفار

دریا و گوهر و کیمیا و گازو کافی فقط  
 آش و آبی و بستان و زقی و میرگک و روبار  
 اُیرو شیخ و بگلو پاشا دخون لوغم ناخون  
 خوارنا وان برنجه خوارنا مه چیه ساقار  
 او رادزن دبرجاده لنک زری و گوران  
 ام لنک پی خواسان راد کفن د کونجکی طار  
 خانیکی من هیه پر کوره وه کی چالی (بپژهن)  
 در یژی و پخنی چار گاز هیه بگازی نجار  
 ل الیکی تقین و کوز و مریشک و فراغن  
 ل آلی بی دنی آگرو سرشوک و هم چنددار  
 ازنادم ب آقانی بی صلاح الدین کرد  
 کولشامی ژمره بونه فخره گاه و آثار  
 لناؤ- کردامه نه و کی حاجی قادری کوپی  
 لولاقی رومان دینی زبندانی ده پرژار  
 کردستان پرخوشه چاوا کوام دبپژن هر گاف  
 عینک و عیندار پی کند و مناروک تختی خندکار  
 بنیرن ل آوروپا و آمریکا و آسیا  
 هون ناینن ژبل مه کردان بلنگاز و عطار  
 ام نه ئی فی قاسینه و لکن بی خدان ای  
 برانو روژ دجیکی طنگده له چویه ایثار  
 ام بهقره بی نفاقن لورا ام کیمین اُیرو  
 ژهر چار طرفانده دست خستیه ناف مه اغیار  
 ایزیدی چیه نصرانی چیه وه هارنکه جوو  
 قی آف نه کردن وه یاخودام نه بافکن هر چار  
 عالم نف بون خدانی صنعت و دولت و حکمت  
 ام کردمانه ته فی بلنگاز و پرژار و بی کار  
 به سه اگروهون مزن رانا بن ام ئین هوررا بن  
 ژبری ده مزنان شور آئیت بچوکان دادار  
 جگرخوین ژار تاده روژان یژی و بنقیسی  
 خلاص نابین گوتن و شیرت عاجز دین گوهدار

بگر خوینی کردی

## خوناهتباری بی

آخ ولاتو آخ ولاتو  
 باق و برین مه چاوانن  
 ایشف من دیت خونک بترس  
 از جاره کی دست پی بکم  
 بایکی رش هاته ژرور  
 بگرین دا کاغذک صور  
 آز چومه جم پیرک زمان  
 من دایه در ثق روح وجان  
 پیری بومن رابو سرخوه  
 ل آقی خوه ند لمن نیری  
 کاغذ ب خوینسا بران بو  
 معناوان کور و گران بو  
 برائن مه تینه کشتن  
 خوه هان پورین خوه شاننده  
 ایرو لاشم پر دئیشه  
 لی چه بکم درمان نینه  
 درمانی کو از کشف دم  
 ژ دلبرینن وک خوه ره  
 قدری بیژ و بناله  
 ناموس نه ما، رومت نه ما

روژامه زو لیهلاتو  
 چما خبر ژی نه هاتو  
 تو کر مکی ژمن بپرس  
 دا تو ببین چقاس بجرس  
 لسر من کر بوره و بور  
 دناق هبون دو تاپین پور  
 من گوت : فالکی فکی امان  
 دردی من ره بی درمان  
 پیانا آقی دا برخوه  
 دیسا سری خوه دا برخوه  
 هر دو تا پورین خوه هان بو  
 ژفالا پیری نهان بو  
 ب خوبنین خوه تپته شستن  
 یانی «چماهون روشنن»  
 قنچ دزانم ژچه دیشه  
 طالع تونه بختی رشه  
 ب هیشینا خوه گش دم  
 پلین هاواری رش دم  
 شینی گریده بکاله  
 اف چه دردواق چه حاله

### قدری جان

دوست ملت و بن دستین وی لی دژمن و نیارین وی ژی  
 دزانی بون وحتا ایروژی دزنان .  
 دسال (۱۳۱۶-۱۸۹۸) ده وکی امپراطوری المانان  
 هاتبو شامی قصدا تر باصلاح الدین کر بو . بری کو بگه  
 تربی ژر گر وکا خوه پیا بو و بیلکه دریژ ب پیاتی چوبو .  
 هری اف صلاح الدین ، مروف و سرداری مزن صلاح  
 الدینی مه بو . صلاح الدینی کرد بو . ژبونا مزنا هییا ملتیکی ما  
 صلاح الدینک نه بسه ؟  
 جهورت عالی بدرخان

بر دستین ملاپین مزن ده خوه ندیه . ل شامی در دیوانا  
 نور الدین ده بخوه دی دبو .

دسال (۱۵۸) ده اسد الدین شیر کوه ، دچو هاوارا  
 مصریان . برازه بی وی صلاح الدین ژی پیره چو .  
 اسد الدین دوجارین دن ژی چو بو . مصری . دهر دوجاران  
 ده برازی بی وی پیره بو . دجارا سیم ده ل وی جه  
 بون ول مصری مان . سال پینجه وشیت وچار بو .  
 هنگی عاضد الدین الله ، خلیفه بی فاطمیان ئی پاشین لسر  
 کفلی خلافتی رو دشت . عاضد الدین شیر کوه خستبو  
 شونا شاور و کر بو وزیری خوه . صلاح الدینی خورت ژی  
 بر دستی مامی خوه ده دخبتی . پشتی سالکی شیر کوه چو  
 رحمتی وصلاح الدین کت دوساوی و بو وزیری عاضد الدین .  
 دسال (۱۶۲) ده ب مرنا عاضد الدین صلاح الدین بو ملکی  
 مصر . هر چند صلاح الدین بن دستی نور الدین دهاته ژی  
 حبیب دراستی بی ده بسری خوه بو . پاش دوسالان نور  
 الدین ژی بی زارو ژبیچ چو رحمتی وولاتی سوری بی ژی  
 بتقایی کت بن دستی صلاح الدین .

دولتا صلاح الدین ژر کردستانی دچو حتا وولاتی تونسسی .  
 صلاح الدین بیست و دوسا لان حکم کر و دسال (۵۸۹)  
 ده ل شامی چو رحمتی . عمری وی گهشتبو پینجه  
 وهفتان . ل شامی دینزنگی مز گفتماموی ده قشارتی به .  
 صلاح الدین دئی زمانی کن ده ولاتین دولتا خوه همی  
 ژی آقا کر بون . آقا هیکه ولی کو خلکین اور پایی ژوان  
 نمونه دگرتن .

صلاح الدین سلطان بو ، مردار بو ، زانا و شاعر بو . سر  
 هر تشتین دنیایی سر وخت بو . طبابت ژی دزانی بو . دبیژین  
 کو بربری وی قرانی انگلستانی ریشاری دلشیر دوختی  
 شری ده بخوه ش کتبو . حالی وی خدار بو . بژیشکین  
 قران نکار بون قرانی خوه درمان بکن . صلاح الدین  
 بژیشکین خوه شانند بون بالی . اوژی بسر بخوه شیبیا ریشار  
 قنبوبون . هنگی صلاح الدین بخوه ، کت شکلی بژیشکان ،  
 چونک ریشار و دژمنی خوه درمان کر .  
 صلاح الدینی ژوان مزنان بو کو قدری وی نه تی مروف ،





# هاوار

کوفارا کردی \* مجله کردیة

## سلطان صلاح الدین ابوبی

فه پف چون ملی بین خوین هر کین ، ب هزاران مروقی هاتنه کشتن . ملتین عیسی ملتین محمد چیکرن . هندک ما بو اول محمد ژ ناڤی هلا نیانا . ژ دو اولین دنیایی نین مزن یک نوبق بووآ ، آدن او داخوارانا . بکرتی اول محمد دچو وندا دبو . ئیدن خلك باورپیا خوه پی نه آنیانا .

هنگی ژولاتی سرحدان ، ژ چیا بین کردستانی ، ژ سنین زنارین مه روژک هلات . صلاح الدین . . . .  
ملتین عیسی چیکرن . اول محمد پاراست ، خلاص کر و ژ نوڤه دانی ، ژ لورا ژیره محمدی دوم ژی تینه گوتن .

\*\*\*

نهوام بکرتی ژینه نگارپیا صلاح الدین خوه بیژن .  
صلاح الدین ژولاتی سرحدان ، ژ کردین راوندی به .  
یاپیری وی دگل دو کرین خوه شادی نجم الدین ابوب  
واسد الدین شیر کوه ، ژولاتی خوه گهاستبو بغدادی وژی  
چو بو تکریتی ، ل وی جه بو بو . یاپیری صلاح الدین دتکریتی  
ده چو به رحمتی ، پیشده تر برای مزن ، نجم الدین ابوبی کو  
باقی صلاح الدینه بو بو دز داری تکریتی .

دسال ( ۵۳۲ - ۱۱۴۷ ) دتکریتی ده صلاح الدین  
هاتبو دنیایی .

باش دوسالان حاکمی موصلی عماد الدین زنگی ژ  
تکریتی درباس دبو . نجم الدین دهن تستان ده آر بکار بیاوی  
کر بو . عماد الدین نجم الدین و مروقی وی بخوه را برن .  
ویشتی فگرتنا کله بعلبکی او کر دز داری وی .

صلاح الدینی زارو ژی ب باقی خوه فه گهستبوسوری بی .  
خوه ند ناوی آپیشین د بعلبکی ده به . پیشده تر ل شامی

انسکو پید بیامزن ژ بندا صلاح الدین راهولی دستپی  
د که : « اڤ کرد . . . . »

هری صلاح الدین کرد بو ، ژ مه بو ، ژ مزین کردان  
بو ، هیژ بتر وراستر کردی مزن و مروقی مزن بو .  
ژخوه مزناهی ب مزنان چیده . کو مزن نین بن مزناهی نایه پی  
مزناهییا ملتان ژی هولی به . ملت ب مروقی مزن و بژارته  
مزن . او ملت مزنه کو مزنان دتینه پی ، مروقی مزن  
ژی درد کفن .

ژملنی کردان گلک مروقی مزن در کتنه . هروکی  
شاموی - زاناکی روس - کوتیه . ازی چند پرسی  
شاموری بکرتی ، بگهز مه هر : « وملت هنه ب جنگاوری  
ودلاور بیاهن سردارین خوه ، خوه دانه ناس کرن  
وژ هن دولتین آسیا و افریقای پادشاهن دانه . کرد ژوان .  
ناڤی کردان ، هیژ د پیشیا زمانی کفن ده ب درین  
رستم و پیشده تر ب کشور کشایی بین صلاح الدین  
ویرایی وی ملک العدل ، بلند و گش بویه . ژقان پیشه اڤ  
ملتی ها مزین دن ژی گهاندنه . هروکی کریم خانی زندی کو  
در نیقی بابلسکا هقدم ده مالبا طازندی دانیه ، وزانایی مزن  
ابن الاثیری بی جزری و ابو الفدا ، ژ میر کین ابوبی ،  
و دیر و کتفیسا زراف ادیسی بدلیسی . . . . »

ملتی کردان صلاح الدین دهیا مکه ولی ده آنیو  
دنیایی کو دنیا بو بو دو بر و لهف کتبو . ددشت و بلند  
جهین اوروپایی ده ب هزار ، ب لک و کرووران خلك گه  
بون هف و برین خوه دابون ولاتی روژهلات .

ملتین عیسی در بژی ملتین محمد کر بون . ب سالان

زنگنه غراف ومطبعت  
أبي خير خواتم المشوق

حفر جيسع المعادن والصور الملونة واللوحات الخارسية  
طبع بطانات ودرسات بحروف نادرة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب  
أحمد نافذ

اختصاصي بالأعراض الداخلية والزهرية والأطفال

عرنوس

دمشق

الطبيب  
محمد حبيب

الاختصاصي بالجراحة ودراسة العيون وجراحاتها

صالحه

دمشق

## اشتراقات مجلة هاوار

وفي غير هذه الأقطار

٥٠ فرنك	عن ستة واحدة
٩٠ فرنك	عن ستة شهور
٦٠ فرنك	عن أربعة شهور

في سورية وتركيا والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس

١٠٠ فرنك	عن ستة واحدة	٥٠٠ غروش سوري
٦٠ فرنك	عن ستة شهور	٣٠٠ غروش سوري
٤٠ فرنك	عن أربعة شهور	٢٠٠ غروش سوري

للارسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة: الامير بهارت عالي بدرخان دمشق - حارة الأكراد

سال ۱  
هزارم ۱۳  
مارش

۱۴ چله بی بری ۹۳۲

# هاوار

السنه ۱  
العدد ۱۳  
الدرجا  
۱۴ كانون الاول ۹۳۲

کوفارا کردی \* مجله کردیة

تبخستین کوفاری

سلطان صلاح الدین	ج ۰۶۰ . بدرخان
دردی سادو	جمیلی حاجو
پیشگو تنکک	ج ۰۶۰ . بدرخان
یکتیمان	هفندی صوری
کوفان	دکتور ک ۰۶۰ . بدرخان
سیابندی سلیقی	هر کول آزیان
بهارا دیوکی	قدری جان
فرمیسک	گوران
ئهی دل	طاهر فواد
خونا هشیاری بی	قدری جان
گوتاراست	جگر خوینی کردی
کلادل	عقد رحمان فوزی
پهیز	دکتور ک ۰۶۰ . بدرخان
سیابندی سلیقی	هر کول آزیان
زارو دلین	جگر خوینی کردی

عربی :

بکاء و بکاء و بکاء

الوافی

SAL 1  
HEJMAR 14

ŞEMBIH

31 Çileyê-Berê 1932

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 14

SAMEDI

31 décembre 1932

Qoyara Qurd \* Revue Kurde

## Têæistiyên Qovarê

Qomeli Zanisti	S....
Peşoyê darê	Cemilê Haco
Yeçyettiman	Hevindê Sori
Gazind û Gili	Osman Sebri
Xuyaboni Qurdî	Ehmed Hemdi
Le Qurdistan xwînî da Q.....	
Derdê Nezaniyê	Lawê Fendi
Du Guharto	Hereqol Azizan

Ho Cegerxwîn	Evdilxalik Esîrî
Bo xaweni Hawar	Apetin
Ji qiriyaran re	Cegerxwîn
Ma em tenê	M. F. Botî
Seqala	Hemen
Şêr û Piling û rovi	Cegerxwîn
Duri Şehwar	Fvdilxalik esîrî
Belê em mau	M. E. Botî
Xemi Zalim	Miço Mili
Dadê	Kedrican
Welat û dilê min	Dr. Q. A. Pedir-Xan

## Birê Frensizî

Note sur la Bible-Noire	Dr. Q. A. Bedir-Khan
Deux variantes	Hereqol Azizan

çapxana tereki

ŞAM — 1932

*Dr. A. Hafiz*

SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES

*Andiwâr*

*Djéziré*

*Damas*

*Salkiè*

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Oculiste*

## PHOTOGRAVURE

### Eyoubiye Frères

*Inscription sur tous les métaux. Gravure coloriée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes,*

*Damas*

*Malek Daher*

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an	100 fr.
6 mois	60 fr.
4 mois	40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an	150 fr.
6 mois	90 fr.
4 mois	60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qiriyariya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqiya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî	500 kirûş-sûrî — 100 frenq
Şeşmehqî	300 kirûş-sûrî — 60 frenq
Çarmehqî	200 kirûş-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî	150 Frenq
Şeşmehqî	90 Frenq
Çarmehqî	60 Frenq

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Mir Celadî Alî Bedir-Xan

Şam: Taxa Qurdan

## Yequetîman

4

Lew deme laweqe çawi deqatewe qatê seyr deqat destêq dirêj bû we dergaqe qirayewe, qiqêqi ciwani jiqeley bariq be qirasêqi awrêsimi sipî hate jû-rewe, be pê rûti hate pişewe heta geyişte cêgey laweqe. Lêfeqey nextêq hel dayewe we desti bo şani laweqe dirêj qird, we be pêqenînewe pêy got u culandiyewe.

—Helse, helse helse qurim!!!

Neştumanit le taluqe daye. Wa dujmin biraqanti quşt. Helse japon wa dagir deqrêt. Helse wa neştumane xo-sewisteqet le jêr dest u pêy dujmin demênêt.

—Helse, çeqit helgire. Êstaqe demi xo hesandinewe niye.

Laweqe seri helbri we be dengêqi berzînewe pêy got:

—Êwe qên, ey qiji cwan.

Cehwabi dayewe we goti:

—Min (ez) neştumanim ..... min japonim.

We be desti îşareti lay rûsi qid we goti:

—Qurim cêgay to lewê, le neverasti sere, le toy nwênî nerm niye.

Evey got we be hêwaşi bo lay dergaqe royîşt, we bzir bu. Inca laweqe be gur le cêgaqey derçû her weq yeqêq le xewêqi xirabda bibêt. Le paş çend rojêq qe rojnameqan nawî şehîdeqan blaw deqenewe, navi ew lawe le serûy hemûyan debêt.

Inca dinî gel-peristî peyxemberî heye. Piyawî dînî heye. Mustefa Qamil Sa'd Zexlûl, Yûsif Mazîni, Xarîbaldî, Wa-îşnaxton, dê Valîra, Xandî, Ihsan Nûrî Paşa

serqirdey heray Ararat, peyxemberani em dinen.

Em dîne qitêbani mukeddesîşi heye, ewîş destûri serbesti we serbexoyî tewawî ye. Dua' w wîrdî taybetî heye, Ewîş Marsî Kewmîye, legel goranîy wetenîqe lawan we pîran be dil sutawî deyxwênînewe. We be îhtîram gwêy lê ra deqrin,

Hemîsan em dîne wacîbati taybetî heye: Weqû a'sqerî qirdin, rûh w mal beşîn le pênawî rizgar qirdinî neştuman le dujmin. Jêqoşîn hetaqu mirdin le pênawî Serbexoyî we serberzî gel we neştuman.

Bem çêşne — «Nizamî gel peristî» le heynî nizameqanî qomelîy diqe cêgeyêqi berzî girdewe. We imro wa her em nizame le rojhelat we rojawa belaw bwetewe. We hemû danîşt wani rûy erz le pênawî em nizame xoyan be quşt deden.

Êstaqe hendêq le zaniyarani zanîstî civaqî delên lemew paş hemû hi-qûmetanî dinya debîn be yeq, we nizamî gel peristî degorrêt be «Nizamî» qomelîy hemwa yî dinya.

Belam em nizame êstaqe lèman dûre we ême carêq pêwîstman niye.

\*\*\*

Lewey serewe betewawetî derde-qewêt qe em çaxe w dewre qe ême têdayn çaxî gel peristîyewe dewrî Kewmîyate. We dînî gel peristî imrô wa le rojhelat w rojawa blaw bwetewe.

Belam le pêş eweqe gel peristî le wulatî rojhelat derqewêt, le rojawa peyda bû we drewşayewe, le paşan bo wulatani ême gwêzrayewe. Her le salî 1492 ewe

qe Amerika dozrayewe, we qe krûni taze desti pêqird, nizami gelperisti le ewrûpa rûyda, we blaw bûwe we, we gelani Ingliz, we Firansiz, we Eleman.. i cuda cuda peyda bû.

Inca qe heray serbexoyî holande we rizgar qirdini xoy le Ispaniya le Kerni şazdemîn, we heray serbexoyî Emerika, we heray Firansej gewre sali 1789 dagirsa, weqe le 1789 ewe hetaqû 1815 Napolyon Ponapart Ewropay serewjêr qird, we tomi serbexoyî we serbesti benaw hemû Ewropada blaw qirdewe, itir trîşkey gel peristi we serbexoyî hemû Ewrûpa we Emerikej rûnaq qirdewe, we piri qird be terr w hereqet, we xûy baş.

Inca detwanî keni nozdemîni miladî be keni şeruşîr dabinên bo wer-girtini serbexoyî gelani cuda cuda, we le Ewrûpada serqirdey hemwayî her Firansa bû. Hemû çawyan lêbu, qe herayêq biqat hemû le cêgey xoyan helbistin, we hera biqan.

Inca le keni nozdemîn, lew ker-neqe rojawayîyeqan şew u roj be bê wiçan xerîq bûn bo sendinewey serbexoyî xoyan, roj helat nûstibû we xeberî le qirdewey dinya nebû, bêcge le geli qurd qe hendê car be rûhêqî qurd xohî, we gel peresti heldestan, we herayan deqird herweqû xudani [ xulaseyê qî tarixî qurd u qurdistan ] gotûyeti :

« Le beynî hadisati a'sri nozdeminda hendêq le emerateqani qurd çend car be hissêqî millî, we be hiway serbexoyî kiyamyân qirduwe. »

Inca le keni nozdemîn lesali 1830 le Firansa herayêq dagirsa we be carêq xanedani BorBon frêdira, we derqira. We ew heraye — her weqû agir le naw pûşda blaw bibêtewe — be naw hemû ewrûpaya blaw buwewe. Geli Italya be hoy qomeli qarbonarî helsan bo rizgar qirdini xoyan le Ewstrya, kewmî cermeni helis ta le pênavî serbexoyî

Her lew salane bû qe qe Firanse aley heray hel qirdibû, Mîre gewre mir,

Muhammed paşay rewandizî le

## Derdê Nezaniyê

— Ji brayê min ê delal

Cemil axayê Haco ra—

Brayê min heqe mîletê me ji mîna van mîletên din bixwenda û zana bûna malên hev ne dixwarin û hevdu ne di-quştin. Şuxl û qarên wan weq irû bêbestî û dexts ne dibû, lihev raredibûn, ji hev hez diqirin û di eleyha hev da paşgîni ne diqirin. Belê xelqê me irû van tîştan diqin û li xirabîya hev digerin. Lê ez wan di vê xisûsê de niqarim bilomînim. Lewra qo ji çikas esr û zemanan da heta niho çavên xwe wiha veqerine û wîhâ elimîne. Ji ber qo rûjgê ji rûjau şêx, mela û zana û giregîrên me ji me re tucar ket pend û şîret ne qirine û tîştên zanîne ne gotine qo çavên me vebîn, em ji weq xelqê ji bona kenci û azahiya welat û mîletê me bixebitin. Belê li me ne bûn xweyî û em hiştin destên dijmin û neyaran. Heqe mela û mezinên me em hişyar bi-qirana serên rîqadîn, qoqa Qurdistanê şêx Seid efendî ê buhîştin û şêx Evdire-limanê Garisî ne dih atin jêqirin û bêhesêb mezinên qurdan, ne jî dihatin quştin.

Qe qo evkas esr û zemanan da min ket tu qitêb, qovar û rûjnameyên qurdan ne ditin û ne bihistin. isal Bedirxaniyan ji mîletê qurd ra qovareq bi navê Hawarê çêqirin û ji mîletê me ra şandin.

Weqê ez vê Hawarê dixwînim, ji mîletê me hineq, ên nezan, tèn dora min û dibêjin : « Gelo ev Hawar çi ye qo

rewandiz î'alani serbexoyî qirdî bû, we be tîjî dabûye ser wulatani dewr u piştî we qurdeqani rizgar qirdibû le jêr dest turqe bê rehmeqan.

Inca le sali 1848 le Firansa herayêqî diqe qird we emeyş be naw hemû ewrûpaya bilaw bûwe we. Italya le layê-qewe, we Elmaniya

(1) Ji xwe me dil heye û ji zû ve em li nivîsarên qevr dîgerin da qo pêşdetir daba xwe a nivîsandî bisenîfînin û bi rêz û tarîxê ve belav biqin.



me nişan diqe. Tovê zmanê me toveqî geleq xurt e, di her zeviyê de zû şîn dibe. Em diqarin bêtirs bibêjin qo ji geleqî zmanan zûtir û çêtir. Çimqî di zmanê me de zêreqîyeq heye qo ji bona tişteqî nûjen bi pirsên xwe pirseqe nû ditine pê û lê diqe. Herweqî di zmanê elmanî de. Ji xwe awayê hevdudanîna pirsên qurdî û elmanî geleq nîzingî hev in. Pêşdetir bi bendeqe cihe ev nîzingahî di stûnên Hawarê de dê bête raveqirin.

Bi bîst hejmarên qovara me qo heta niho belav bûne me dil qir em her awayê nivisandinê biceribînin û bêxin zmanê xwe. Herweqî awayên bingehî, nezm û nesir û çend şîqlên nesrê qem û zêde di Hawarê de belav bûne.

Tenê awayê temaşayê hebû qo hej ne qeti bû zmanê me. Mîna qo xwendevanên me di vê hejmarê de dê bixwînin me ew şîql û awa ji ceriband û xiste zmanê xwe. Temaşaqe qîçiq bi navê (Hevind). Ev mewzûa ha mewzûa qitêbeqê ye, ne mewzûa çend stûnan. Lê herweqî hate gotin ev tenê ji bona ceribandan û êxistina zmanê temaşayê li zmanê me hatiye nivisandin. Ji lewra heye qo nivisevan di hin cihan de bi isûlên temaşayê ve ne çû be jî. Divêt holê bête zanîn û xwendin.

Di babeta nivisaran de çend pirsên me jî ji nivisevanên me ên delal re hene.

Heta niho ji bona gihandîna wan me gnh ne dida û her textî nivisar dixistin qovara xwe. Emê disan bêxin jî, lê ket mebit di nivisarên menzûm de divêt wezn hebit. Ji irû pêve em şîhrinen bêwezn naêxin qovarê. Ji xwe mesela weznê, bê aheng û xeyalinen bilind û zrav, tişteqî hêsani ye. Ma qî heye qo heta çaran û pîncan niqare bijmêre.

Ev in çend nimûne:

Ê	le	qe	ev	+	ge	leq	qevn
1	2	3	4		1	2	3
Xu	dan	rê	ziq	+	xu	dan	tevñ
1	2	3	4		1	2	3

Ze	vî	bân	be	yar	+	gun	dên	me	xe	rab
1	2	3	4	5		1	2	3	4	5
Ji	dij	mi	nan	ra	+	me	da	ye	cu	hab
1	2	3	4	5		1	2	3	4	5

Qa	nî	Dêr	gul	+	qa	He	re	qol	+	qa	Qe	pir
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3
Qa	zo	za	nên	+	Ba	vê	Tê	lî	+	qa	qê	bir
1	2	3	4		1	2	3	4		1	2	3

Herweqî tete ditin di xêziqên pêşîn de du ling û di lingê pêşîn de çar, di duwim de sê moviq hene. Di xêziqên duwim de jî du ling hene û her ling jî pênc moviqan hevedudanî ye. Xêziqên sêyim sêling in, di lingê pêşîn de çar, di duwim de çar, di sêyim de sê moviq hene.

Belê mirov diqare her xêziqê holê li yeq veqe, lê bi vî şertê qo moviq jî lingeqî derbasî lingê din mebin yanî divêt her pirs di nav lingeqî de bimînit û hecaqe wê derbasî lingê din mebit.

Em hineqî çavê xwe li awayê belav-qirina qovarê ji bigerin. Hawar di Gula-na sala 1932 an de dest bi derqetînê qiri bû. Hingî me geleq da bû serê xwe gelo em wê di çend rûjan de carqê derînin. Me nêt hebû em wê biqin dehrûjqî û di serê deh rûjan de carqê derînin. Lê me nediwêrî. Ji lewra we ew qiri bû panz-dehrûjqî, pêşdetir me ew biqira hefteqî. Herweqî di hejmara pêşîn de me goti bû. Lê ne tenê me ew ne qir hefteqî, serê panzdeh rûjan de carqê jî derneqet. Di ziqê hev di serê hejdeh rûjan de carqê belav bû û ji lewra di paşya salê de li şûna qo bîst û çar hejmar derqevin, tenê bîst derqetin. Heçî zane ji xwe zane ....

\*\*\*

Di despêqa benda xwe de me goti bû, Hawarê himê zmanê me daniye. Divêt bête zanîn qo zman jî himê heyîna me ye û bê zmanê xwe em niqarin bijîn û di nav qoma miletan de weq mileteqî serxwe bimînin û paydar bibin. Ji xwe jî bona her miletî jî holê ye. Nemaze jî bona me û ji bona wan miletên qo qetine rîqanê mileteqî hevol.

Ji ber qo miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi keweta da çeqan diparêzînin: Ol yeq, Zman dudo. Lê heqe ola miletê serdest û bindest yeq bibe, hingî çeq yeq bitenê ye, û bend tenê zman e.

Halê me qurdan ev e. Em qetine hin destê sê milef û dewletên misilman, piraniya me ji misilman e, em û serdestên me ji oleqê, ji dîneqî ne. Her sê ji xebateqe zor dixebitin qo me texin miliyeta xwe.

Lê herçî miletên nemisilman, weq filehên ermenî û yûnanî, qo bi babelisqan ve bin destê tirqan de mane û piraniya wan bi zmanê xwe ji nizanî bûn û bi tirqî xeber didan, disan miliyeta xwe winda ne qirine. Ji ber qo ew û serdestên wan ne ji oleqê bûn, ji olinen din bûn. Ola wan ew diparastin û nedihîştin qo winda bibin, di nav miliyeteqe dinde bihelin, bibin tirq, ereb an ecem. Jê dixuye qo zman hing olê ne xurt e jî, xesma zmaneqî qo hêj ne qetiye nivisandinê.

Carin hebûn, bê winda qirina zmanê xwe jî, tenê bi hînbûna zmanê wan em diqetin tora wan û dibûn ji mileteqî din. Ji ber qo ola me ji xwe em dighandin

wan, bi hînbûna zmanê wan, benda zmanê jî ji navê radibû û zmanê me qo tenê zmanê axafînê bû di devê me de weq zmaneqî biyani dima û bi zmanî ve me ew jî bîr diqir. Çimqî zmanê milete serdest zmanê nivisandinê bû, me pê dixwend, dinivisand û zanayên me qitêbên xwe pê çêdipirin.

Ev e zman, ev e qurdanî, ev e winda bûn, ev e çeqên me.

Ji gotinên jorin rind dixuye qo çeqa qo di destê me de ye çeqeqe ne teqûz e jî, nivçeçeqe. Ol li raserî wê ye. Heqe me ew jî pêş ve ne bir, winda qir, hingî divêt em destê xwe ji heyîna xwe bişoyin.

Gofineqe nas heye. Di bêjin qo : ew meletê qo qetiye bin destê mileteqî din û zmanê xwe winda ne qiriye mîna dileqî ye qo mifta zîndana wî di destê wî de ye, rûjgê deriyê zîndana xwe vediqe û jê derdiqeve.

Lê yê qo zmanê xwe winda qiriye mifta zîndana wî êdî ne di destê wî, lê di destê dijminê wî de ye û dijmin dertyê zîndana girtiyê xwe tucar venaqe.

Ew mifte, irû hêj di destê me de ye.

*Nivîsanoqa Hawarê*

**Lavelav**

Yareb tu tinê li min biyar be  
Ev dinya bila liser min bar be  
Tu şinê bide min ez nawestim  
Dê hezar salî welê rawestim  
Heşt sal in te xistim bin vîbarî  
Ez qirim dergehvanê vî arî  
Ne min diquje ne min dijine  
Her dem dilê min î bibirîne  
Gava dibare weqe xunav e  
Dema diêşe jana zirav e  
Qela gihanê li min didêre  
Dil û hinavan li min dihêre  
Herçiyên qo weqe min bîne  
[dîn  
Her demê dixwazînin Ceger-  
[xwîn

Pirsan diqe tir dixe Qûvanan  
Her rojê çêdiqe xweş xuwanan  
Dê geh bigirî dê geh bibêje  
Derdê di dilê xwe de birêje  
Bî vî awayî heqim û zanan  
Bî vê rêve çûna pîr û daran  
De niştirê li qula xwe xîne  
Qem û kirêjê lê biderxîne  
Ji ber qo te wa çêqirme bêvîn  
Bê qer û nezan bê jîr û bişîn  
Derdê min hemû di dil dimîne  
Li lewre holê tim î bibirîne

\*\*\*

Ne temûrling im nejt Siqer-  
[der  
Bixwazim dinê bigrim seran-  
[ser

Ne ez Mem im qo dilê min Zîn  
[be  
Ne Ferhad im derdê min Şîrîn  
[be  
Welatê delal qo berê em tê  
Her eşîreqê sed Zîn û Mem tê  
Fv xortê qo îro hûne bê per  
Kail nedibûn biqurê Siqender  
Ji bo zeriye welatî mizgîn  
Her gavê didin Ferhad û Şîrîn  
Fz qurmê evîne dil sotî me  
Qurdmaneq im bendeyê Xanî  
[me  
Min cau telata hemû qurdan e  
Li niq şîna te qeleq hêsan e  
Min ne akil e uehiş ne tevdîr  
Min nîne xwedî heval û hevîr  
Fz cendeqeqî bê dest û pê me

Dilqeti û şerxoşê vè rê me	vegerime niq Yûnis û Circîs	Romî; mêrû mezinê me quştin
Yan derdê min bêxe gora şinê	Iro jî hatime erdê mikdîs	Qita namûsê dime nehistin
Ya hin zêdetir bide min vînê	Hinde geriyam dilê min bû xav	Kira me anîn evan bê havan
Da biqaribim liber xwe ragi-	Ez çûme warê Isayê bê bav	Weq gurê di nav pez bê şivan
[rim	Gava qoli wirjî bûme bê fer	Qemend û zencîr diqin Rewa-
Dilê xwe yê xêr nedî hê dag-	Min da rê çûme niq qurê Azer	[lau
[riu	Min gotê herabe qurdê qevnar	Weq berxa şerjêdiqin Şepalan
***	Tirqan kewmê te qirin axa sar	Ji xwe re dibin Qeçan û Bûqan
Ey gewretirê şeh û emîran	Hevîya giştîqan ma liba te	Davêjine nav êgir Biçûqan
Mihriwanê bêges û fekîran	Li ber hemûyave hatme bate	Dibêjine — weteni Egilmi —
Lew hinde dirêj diqime peyi-	Ji bo felata me dê çî biqî	Yandirin qafiri Qurd degilmi
[vau	Çî mizgîniye di destê minqî	Qirê qo bi me bûne dirêjin
Da qo ji bo min bibî dilovan	Diqevime dexte te hezar car	Em niqarin hemûyi bibêjin
Ne insaf e qo yeqî gunehqar	Min neqî rê destvala rûsar	Em hinde diqin Hewar û carî
Tu hewce biqî ber deste neyar	Da qela neyar li me nebe xweş	Bi şev û bi roj gazî û zarî
Ez suxteye evine jî mejim	Piçeqi dile me jî bibe geş	Dibêjine em vî barî nagrin
Diqim çî roqa xwe bo te bejim	Ewî jî li min neqir xwediti	Me şin nema qo êdî xwe ragrin
Ev dare giran te da milê min	Herweqî evê dinê min diti	Li dest diçîye êdî Bawa te
Ev are xweru te qir dile min	Bazgûri hemûyan bûm yeqa	Min destê xwe avêti dawa te
De care li bare min dinere	[yeq	Bawerîya me geleg wezaye
Kemî u qerme li min bidere	Mingazi giştîqan qir teqa teq	Piça vînê li niq me nemaye
Ger quda ûçim diben evine	Ket qesî negote min tu qî yî?	Ev halê qirêt qo wa dirêj be
Li lewre qeseq min nahewine	Daxwaza te çîye? tu b'xweçiyî	Bawerî li dilê mé rej be
Ne Tirkiye, ne Irak u Iran	Di behra umîde bê mefer mam	***
Ne Suriye, Felestin, u ne Ewan	Li pûgu bilêqe de li der mam	
Hemûyan li erde xwe qurim	Her dem mefere dermanê	Tu li hemûyan çêtir dizanî
[uel	[dinan	Heya iro me neqir qêmanî
Ez hole mame reben u se ser	Çendeqî gerim l'Xidir û Ilyas	Ji bo qo navê te bête gotin
Pir dil ûiqime xwe bidme	Her Çendî hene külên te yên	Me mal û ceger li xwe da sotin
[quştin	[xas	Menamûsa xwe qire berpeyan
Ve qule bi xuyne bidme şuştin	Mideqî wanan jî ez xapandim	Mendal û gedeqhiştin li réyan
beibi ve jano li dil biderxe	Li vè roja dest vala gihandim	Bi derqetin li Gund û Zevîyan
Ah u qeseran hemu bi berxe	Pe nebûn qo ji bo min fikirî	Weq Hirça xwe dabû serê
Pir geriyam min nedî kada şer	Berê xwe bidin derê te mirî	[çîyan
Tu rawe bavan nebûne reber	Derdê dilê min bo te bixwînin	Bi leqan mêrxas me dane qu-
Ez sonde dixum bi lewhimel-	Çend lavayîyan liser biwûnin	[ştin
[tuz	***	Ew welat bi xwîné da bû şuş-
Ez hetu caran nebûme me'yus	Min hevî tinê mabû Mihemed	[tin
Kesda min ewe bighejm ar-	Tim tim mefera dilê min Eh-	Egîr Boqeyên bi nav û deng
[manç	[med	Di me de neman ke Şer û Le-
Ji bona felata lor û qurdmanc	Pir dil diqir qo herim Medîne	[heng
Geleqî gerim di vî warê de	Ji wî şehîre veqim birîne	Hawêr liser me agir dibarî
Min tu rê nedî di vî arîde	Bêjim : rabe ey zanayê Gewre	Li pêş me rawesti bû zivarî
***	Dinê li me qurdan têqde ewre	Ji birçîna me lingê xwe dalast
Min mefer nedî li tu zindîyan	Tirq û kcem tev li me bûne	Bi vî awayî ola te parast
vêca vegerime ser mirîyan	[gur	Gorî teme binhere l'qeda me
Kireqe xweş da tirba Cizerî	Guhpehu e diquje li baqur	Hêjaye bixemile geda me
Hêya çûme ser gorna Herîrî	Li nivroyê me Ereb neyare	Divyabû em jî bi tzu nazbin
	Mirin û quştin li me dibare	Li niqte geleqî serfiraz bin

# Revandin

Zerdelper e, bergehê çavan de, roj vemiri  
 Guleqe sor di nav av û ezmanan de miri  
 Dema hevîn û ramûsanê !! ji bo dilqetiyan  
 Her gotin dibe şerîntir ne qul dimîne ne jan  
 Delal diqene, stêr diqenin û sura êvar  
 Sar dibe rêwîngî ye li ser rêya gund û war  
 Zendên bi gurçiq himbêz diqin bejnên  
 [nermîn  
 Bayê şahiyê li ba dibe dermanê birin  
 Bin siha daran de qeçiqeq diqe ax û hawar  
 Çavên wê tejt hêstir in spehî ye weq adar  
 Rengê wê dibe zer û sor lamên wê dibin  
 [germ  
 Çikas şerîn e rûyê wê, dilê wê çikas nerm  
 Rûyê wê weq rohelata buharê; ter û tol  
 Xulama xwedê ye, bi xwe jî xwey dîn û ol  
 Li çar dora xwe mêze diqe bi tirs û guman  
 Deng naye, bi tinazî stêr diqenin li ezman  
 Ne reprepên hespan, ne ax, girîn, ne aheng  
 Dinê sar, weq mirî hêdeng, weq hewa bê  
 [reng  
 Dixwaze bin lingê wê de erd biheze, xwe  
 [veqe  
 Ew jî biqeve, tê de weq mirîqê raqeve  
 Tariya şevê de sê çar suwar xuya dibin  
 Weq şehmêr û ejdehar in ji erdê radibin  
 Qeçiq xwe davêje ser hespeqî; heyv diqene

Ne heyv tenê tariya şevê jî bi qen e  
 Qeçiq cû, revandin, «xwelî li ser wan»  
 [pismanan»  
 Dimirin bê deng «namirin li rêyê dot-  
 [maman»

*D. Zamiran Alî Bedir-Xan*

## Xurtiya Bînahiyê

Bihna gurî nîne. Lê dibêjin bînahiya  
 wî zor e. Ya mehîne jî jê ne qemtir e.  
 Carqê gur û mehîn bi hev re şert qirî bûn,  
 gelo bînahiya qijanî zortir e.

Gurî got: Şev reş e, şûv reş e, mîh  
 ker e, berx liber e, min jî hev qir dere...

Mehîne got: Hev li çardeh, erdeqî  
 rast, lê danî bûn elbeq mast, tê de mûqî  
 sipî, min jî hev qir nas...

Heye qo bibêjin, çawan bû qo gur û  
 mehîn bi darê hev qetin, ma gurî drêjî  
 mehîne ne qir? Ne diwêre, jê ditirse. Carqê  
 kesta ciwanîya wê qirî bû, mehîn pê  
 hesiya, bû firihîna wê, gur tirsîya û got:

Mehîn e guhmisîn e  
 Xwalê xwe ê gur dibizdine

*Çiroqbêj*

## DI VÊ HEJMARÊ DE:

Rûpel 3 stûn 1 — li şûna (serdestên  
 me) û (serdestên wan) (serdestên xwe)  
 û (serdestên xwe) bixwînin.

Dîsan jî xwe davêjim derê te	Bilabî ev giş li te ya ya Hev	me hovan li hevre biqî qedî
Hezar sondî duxum bi serê te	Vê rûsariyê tu bûye sebab	Da qem jî li halê hev diyar bin
Ûeya tu li me neqî duayê	Her gavê ez awayî der bi der	Bi tevgera hev rehendewar bin
Yezdanê Gewre nede rihayê	[bûm	Bi vî awayî Osmanê nadan
Her ezê li ber derê te bim seg	Li erdê ava ezî sê ser bûm	Derdê di dilê wî biqî derman
Ûeya qo raqim tola Xalid beg	Vîn ne bû pakij biqim kirêjê	Vê carê jî qêsa turq di mexî
***	Ma nexweş qarînin biqin nimêjê	Dengê top û kemberan bi
Ew bû Hebibê te ê dilovan	Derdê nexweşan ava heyate	[serxî
Key roqê li min dibûn mih-	Her lê digêrim binim li ba te	Carqê qoça wanan jî barqî
[rivan	Tu qesî bo min neqir delîl	Li ber nigê me tu tar û marqî
Ew qês jî li min borî qete jêr	Vêca min hewar e bi zelilî	Wê hingê emê tola xwe raqin
Li dest vî emelê min ê bê qêr	Ya Reb tu bi hekê Mistela qî	Himê wan di hindavde bi-
Li pêşberê wî geleq rûsarim	Ê gilaciyê li nav me raqî	[lavqin
i j ho qo li gunehan î barim	Tu pêleqe xîretê bi, medi	Dê xweş bibê qêfa Dê û Pava
		Ger vê zû biqî mala te ava

*Osman Sebri*

## Du Dengbêj

Di wextê qevn de kesrege bilind û xemilandi hebû. Rewşa wê diqet ser qulilq û mîrgên deştan, hetanî avên çem û robaran.

Çarniqarên kesrê bi bexçeyên tîrreng û tîrbihî, gul û qulilqan girti bûn.

Ew bexçe weq faceqe zivîn û zêrîn û kesr di nêv de weq rûyeqî şêrîn û tirijtav dibiriki.

Ji şehderwan û kulteynan avên zelal û qef xwe hildavêtin û bilind dibûn bal ezmanan ve, weq qesqesoran reng didan û dilop diloq mîna mirariyan diqetin ser lêva gula sor, ser pora sosina zer û ser çavê xencelisqî ê reş de.

Di wê kesrê de miroveqî zalim rûdinişt.

Ewî zalimî ew kesr ne bi xurtiya xwe girti bû.

Lê Qurdistanê ew weq mêvaneqî ezimandi bû niq xwe. Qurdistenê got:

— Ev misilman e, brayê me ye, nav beyna me de çî ferk heye, bila kesra me a mezintir û spehîtir jê re bit û emê bîndestiya wî biqîn.

Ew zalim di wê kesrê de li ser texteqî bilind û zêrîn û bi ebanos û hestiyê fil xemilandi rûniştî bû, girtin û berdan di destê wî de bû. Xira û ser xwe çû bû.

Her fiqra wî bêbextî, her awira wî ern, her gotina wî xirabî û her nivîsandina wî xwîn bû.

Rûjeqê du dengbêjên suwar diçûn bal kesrê wî ve, yeq bi ceyndiq û temeriyên zer ciwan ê din bi porên -spî pîr bû. Yê pîr ji ciwan re digot:

— Qurê min, stranên me ên spehî û xweş bine bîra xwe, zexmî û xurtiya xwe, stranên me ên bi qên û girîn û bi şahî û şîn dane serhev, dengê xwe ê zirav û melûl hedî hedî berde, em diçin kesra qo tê de zalimê me xedarê milletê me rûniştîye, divê em irû dilê wî ê hişq û polayî binermijînin.

Zalim bi hevalbendên xwe ve di diwanxaneyê de civa bûn.

Zalim ser textî rûniştî bû weq ewre-qî reş, teniştî wî de jina wî Sînemxan, jineqe qurd mîna gulê geş.

Dengbêjan dane ji derî ve, ditin diwanxaneqe bi xeml û rewş, ji zilaman teji, lê bîdeng, hatin pêşberê textî seqinîn.

Çavên bi ern û qinên qomê qetin ser ruyê dengbêjan, tinê du çavên delal weq du stêran li wan qenî.

Ê pîr dest û tiliyên xwe ên spî û zirav ser tîlên saze ve anî, ê ciwan bi dengeqî melûl û şewitî destpê qir.

Straneqe spehî û bêhevri bû, straneqe delal û şêrîn.

Ji buhar û hevîne, ji dilqeti û dezgiranê, ji şahî û şînê distiran; ji her tîştê qo dili nerm, hişî bilind diqe, ji her tîştê qo can pê diqeve, divesihe an brindar dibe û dişewite û sîng pê diqelişe.

Dengbêjê pîr bi dengeqî kebe û giran li dengê degbêjê ciwan ê zirav û melûl vedigerand.

Weq strana paşin dest bi strana welatê Qurdistanê qirin û dax û birinên wî yeq bi yeq hildan.

Stran kediya, Sînemxanê ji sînga xwe guleq veqir û avêt bal dengbêjan ve. Eniya zalimî kermîçî, rûyê wî têqre çû, ji çavên wî agir dibarî, da ber kira û ji dengbêjan re got:

— Ji jinên min di destê min de tinê ev ma, di vî welatî de we her tîşt jehr qir, niho hon dest jin û canê min jî diqîn, hiş û dilê millet qet destê we, xelq ji bo navê qurdî dest ji jîna xwe berdidin, xwe bi mirinê ve girêdidin!...

Zalim ji cihê xwe rabû, şûreq dani dengbêjê ciwan û di qezeb û piştî wî re derqet; xwîneqe germ û sor ser sînga wî de heriqî.

Bêdenq her du dengbêj ji diwanxanê derqetin. Du hêstir ji çavên Sînemxanê rejihan û weq du mirariyan qetin li ser tiliyên wê ên zirav û nerm.

## FERHENGQO

(Nivîsanoq)

Bi du manan e. Tevayîya nivîsevanên rûj-name an qovareqê, qoma nivîsevanan. Cih an mezela nivîsevanan. Hevînd ji nivîsanoqa Hawarê ye, yanî ji qoma nivîsevanên wê ye.

(Hevol)

Ol ew tişt e qo mirov pê ewle û bawer e. Ola Zerdest, Ola Mûsa. Perîcar em jê re diyanet dibêjin. Hevol: yên qo ji oleqê ne.

(Destrêj)

Pîrseqe qevn e. Weqê qeqên me tir û qevan bûn û di şerî de qevanqesân qevanên xwe bi hev re diqîşandin û tîrên xwe berdidan jê re destrêj dihate gotin.

(Lavelav)

Ji lavayîyê têt. Liber gerîyan. Lavayî qirin. Weqê mirov ji Xwedê lavayî diqe û daxwaza xwe jê re dibêje ji wê daxwazê re (lavelav) tete gotin.

Dengbêjê pîr hevalê xwe ê ciwan bir û ji kesrê derqetin. Bexçeyî de rengê xortî zer bû, cendeqê wî recifî qet erdê û mir.

Wê demê dengbêjê pîr destên xwe ên bi xwîn raberî ezmanan qir û got:

— kesra bêbext, paşîya te şewat, hilweşandin û xirabî be. Ji rewş û xemla te bila sih jî ne mine, qulilqên bexçeyên te bila êdî nebişqivin... Bûqa buharê tucar nîzîqî te nebit, ji bêriya bîhû û reng, xweşî û geşîyê bimire, vemire! bila navê te wînda bibe, xirbeyê te jî memine.

Himên xirbeyê te di sînga welatê Qurdistanê a spehî û delal de weq birîneqê her bimîne û şerm û ezabên esaretê bîne peş çavên Qurdistanê.

Dengbêj got xwedê bihist.

Ev çend sal in herû bereq ji diwarên kesrê diqeve. Diqin naqin pêq ve nacebire.

*Dr. Zamiran Alî Bedir-Xan*

## Çarînên Xeyam

Ji deftera jinê navê me dê rabe  
Dawî, destê ecelî de mirin e, çare nabe  
Meygerê çeleng xweş, xweş bîne  
Emê bibin ax, daxwaza me şerab e

Hevalên canî ji dest derqetin  
Hemî li pey ecel re qetin  
Civata jinê de hevalşerabên me bûn  
Çend zêde vexwarin û sermest raqetin

Fefa rindan ji hevalan bibe gir  
Li dawa zihda zahidan biqeve agir  
Ew xirkeyê sed pine û ew hiriya heşin  
Biqeve bin peyê dilrindan û bibe pîr

Qo Şeraba te heye toba şerabê meqe  
Tobedar hezar car jûvanî dê biqe  
Gulê çara xwe ketand, bilbil diqe hawar  
Ma li dema weq vê tobe dibê qar

Halê gul û şerabê şerabperest dizanin  
Ne ên tengdil û tengdest dizanin  
Nebîrewer ji nezanînen xwe bêstûc in  
Vê şiverê de xweşîyeq e, mest pê dizanin

Dilê min her ji rûyê gulî re girêda ye  
Destê min her bi piyana şerabê dada ye  
Fz ji her pişqeqê behra xwe dibim  
Berî qo behra min bi hemûyan hevda ye

Hawar! nanê pehti li destê nepehtîyan qet  
Xweşîya dinê li destê bê qêran qet  
Ew çavên spehî qo bergehê dil in  
Di ser sînga xulam û nezanan da raqet

Meyger gul û çîmen bûne sor û qar  
Bal bide pişt hefteqê ev dibin ax û jar  
Vexwe şerabê û gul biçine bihneqê de  
Gul dibê ax û çîmen dibê jengdar

Zahid got bihuşt bi hûriyan ronaq e  
Fz dibêjim şîliya tîrî çaq e  
Ya berdest bibe, ji yê bê, dest biqşîne  
Dengê dehûlê ji dûr ve paq e

## الطير والوتر والشعر

على الاغصان طير الرض غنت  
 بالحاء عن الاوتار اغنت  
 وناحت بالنوى والرصد والت  
 فيالله ما بالرصد اولت  
 وغنتنا بلعن الكرود حتى  
 علمنا انها لا لكرود حنت  
 ولما ابقت انا طربنا  
 عن التغريد قد رغبت فكنت  
 فقلت لصاحب الأوتار هذا  
 اوانك فالعنادل ويك خنت  
 عن الأطيّار خذ لحناً فأني  
 عهدتك عندليباً بل واحيت  
 فاصلح عوده وبدا فأبدي  
 حجازاً والصبان من حيث اصبت  
 وزنگراتاً وعشاقاً رخيماً  
 واتبعه نهانداً وبيت  
 والقي العود من يده فقلنا  
 ولم هذا فقال يداي كلت  
 فقام الشعر بالالحاء فينا  
 مقام المنشدين وما تعنت  
 وانشد قطعة انشا سداها  
 بابداع كلحمتها تحلت  
 واودع في معانيها شعوراً  
 واخلاقاً مكارمها تجلت  
 ونادي قومه الأكراد هيا  
 فهبوا وانشطوا فالناس هبت  
 الا يا ايها الكردي صبت  
 عليك مصائب عظمت وجت  
 فلو نزلت على (سنجار) مادت  
 رواسيها الشوامخ بل ودكت  
 الى العلم القويم ونيل فضل  
 به الأسلاف من قبل استظلت

كتيبان : قسه‌ی بیشینان

ما مومنا اسماعیل مہی

در دما در کتنا فی هژماری ده چند نفشتین کتیبازوین  
 گهانه کو قارامه . سپاسان لنقیسه قانی وی دکن وخباتاوی  
 پیروز دکن . . ژبر کو دثی هژماری ده جه نه مایه ام  
 ایروژی تنی چند ما مکان دگهز ینین ستونین خوه .  
 — دوستی دوستم دوسته ، دورمنی دورمنم دوستمه .  
 — آشی له خیالک ، آشه وان له خیالیك .  
 — وک موم شوقی بو بنی خوی فی یه .  
 — سال به سال خوزگه‌م به پار .  
 — که چه‌ل حکیم بو وایه ، درمانی سری خوه ته کرد

الی نیل المعالی بالعوالی

الی النهج السدید فسر تثبت  
 وجار الناس فی علم فانی  
 رأیت العالمین به تزقت  
 الی النشی الحدیث ابث نصحي  
 وقدماً قد بثت له فانصت  
 وعاهدنی وعهد الحز دین  
 علیه والنصوص بذاك نصت  
 ولكن قلما رعیت عهود  
 بهذا العصر والجیل المثلث  
 لسان الشعر قال الناس طراً  
 علی سنن الطبیعة قد تمشت  
 بعلم ثم فن وارتقاء  
 یجد واجتهاد حیث جدت  
 واما الخامل الکسلان عضو  
 اشل بیتره الأيام برت  
 فسمعاً ایها الكردي سمعاً  
 بقول قدبدا کالسيف مصلت  
 الی العرفان ان لم تمس قلنا  
 الا تبث یداک یداک تبث  
 الدردي الوانی

# سرخوه بونا مرتجان

— ژېرابی من شوکت بگ ره به —

ل وه لاتی مه غرزا  
روکی او چو نائف دیکا  
بس خوه بدن انیشکا  
مریشک تفده بونه کوم  
لشکر تفده بونه لک  
بری خوه دانه چو لی  
طیران دی گو ناگهان  
تفده فرین ژمالان  
اوژی ل هف بونه کوم  
ای سر بلندی ایران  
رابه سر خوه تو میرو  
اقت لشکری بی ژمار  
بوم کنی ژ گوته وان  
رابو هدهد بسرفراز  
گو رابه ای تو بازی  
باز چو جم شاهل بانی  
گو ای خونده کاری من  
بوم گوته بازی خونین خوار  
بازی رابو وه کی شیر  
بازی طری ب ریشی  
دستی وی گوت وهژاند  
اولان سن نیره لی سن  
سزن بورده نه ایش وار  
بازی شهدا خوه آنی  
گو ب زور وب گازن  
باز گو کیه سرعسکر  
ازم پاشا ازم میر  
بازی چو جم دبکی دی  
نشان گو پاشا و میر  
نفر بونه یوز باشی  
بازی رابو چو بانی

دیکک هبو شهره زا  
ژوان ره گو هیدیکا  
ورن یژن مریشکا  
بری خوه دانه جم بوم  
هن چلنک وهن کولک  
تقلی کوچ تف ابلی  
هاتی اشکرکی گران  
بری خوه دانه بالان  
بکی رابو گوته بوم  
وی پادشاهی طیران  
ژبو مه بیژره آرو  
گلو هیه ژی زه رار  
باکن باری پهلوان  
وی چو بلز گوته باز  
شاه ته آرو دخوازی  
دستی خوهل سر هف دانی  
زول من که بازی من  
بلز رابه هره خوار  
فرك دا خوه هاته ژیر  
هاته جم دبکی پیشی  
نطقک ژیره در ژراند  
گو ام خلکی بد لیسن  
دبک غیدی لی دا دار  
دیک ژی داری خوه دانی  
ام حق خوه دخوازن  
گو تو نه زانی ای کر  
ازم شاه و جهان گیر  
دی گو اوژی وه کی وی  
کسی نه گو از وه زیر  
حتا گها ئی پاشی  
ل بر دستی بوم دانی

تلور تف لی یونه کوم  
اقت هاتنه ژمالا خوه  
بو گو بازی دلاور  
گو تف آغا وء میرن  
بوم هیدی رابو سرخوه  
گو ب تاجا سری من  
رابن وهك پهلوانان  
هاتن طیرین دو پراك  
گو هون وه رن بنیرن  
دیکان خوه دان انیشکا  
گو فرمانا مه را بو  
ئی کو کشتن ئی کومان  
وان ژی وه کی مه کردان  
علوک و تو تک و قاز  
هسی کنن کوخی رهش

بگر فوین

دیلیم

ژ دوچپشان دبارن تیر  
مسلمانم بلی بی پیر  
ژ بو چپشین ته از پروان  
دجیلانده تو ئی رهوان  
توبس بسکان بکه چین چین  
ژر حظ وقوسه بین برهین  
ژهرمو کین ته تی بک دننگ  
شفق دابه حتا خرچنگ  
ته آور دا بر بندارم  
شف وروژی پهلوارم  
بخوازه دیلبرا من تو  
حمی شیرت هیفتی تو  
وره زلفان بده بایی  
دنیرم بژن و بالایی  
بیه سیوان لبر تاقی  
تورنگین که بزیرا قی  
دنیایی کرم هسیر  
ژ بو ژینی دقتین شیر  
ژ بوخزمت دچم کروان  
بدست وپی کتم داوان  
ژ نائف عالم تو ئی زیرین  
دینم هر کسه اودین  
دیژن دیلبرا سرهننگ  
ژقی کونی هالانی رنگ  
ژ بی چاری کر بندارم  
از بی نیسان و آدارم  
دجهانده مرا نسر تو  
ژروژی پر خویاتر تو  
ژ نائف عالم هلین تایی  
بسه قربان و ره رایی  
توروژی نقشکی باقی  
بکتر بو طی دوی گدایی  
مصطفی احمد بو طی



مهاباد و احوال دیبا هاواری

دادی ! دادی هاواری  
 گلی از کیفخوش بوم  
 فیکگاف حالی من فنجبه  
 اف حال وسان مینه  
 فرهنگ من پر دبه  
 جه مه دل فر کاک دبه  
 آپی (هرچو) دیژره :  
 هاواری پس نه هشت  
 او میرین گلی گویان ،  
 دخون ب عقلمندی  
 دگل فی تونه بونی  
 سپاسان پیشکش دم  
 ککی (بوز) لسردکه :  
 أم ، گش کردن! خوبناترك  
 از بیمه سرفکرا خوه ،  
 بهنسا من پر فره بو :

روما ، نان ژبر خواری  
 ژبر ته پر سیاری .  
 أف ارد ژمن ره گنجه  
 پاشی توجار نه رنجه .  
 هرو زیده تر دبه  
 مقاص ژی جاوبر دبه  
 «ژمیر (جلو) ره بیژره  
 کچک(۱) کرکسی هیژره  
 کو سواران بری بیان  
 گرک اف بین بیان  
 ودگل فی قاص بونی  
 ب او ی عشر بونی»  
 «ژمه ره سرور مکه  
 ژبومه رهوان بکه»  
 گوتن . وآرمانجا خوه  
 بی گوتنن دیا خوه

قدری جان

برخکی هاواری

هاوار هاوار دلالی  
 نو خواری یا ملتی  
 برخکی ته هات گها  
 برخکی پر دلال  
 کتیه ناف برازان  
 خوه شجقاتن بشورن  
 عشر که سنگ ب پرچ  
 او (بوز) ن پر دلان  
 بلی (باز میش کر) هیه  
 آفه سوچی مزنان  
 بخاطری ته هاواری

تو رهینا چافانی  
 ریزانی هم ریبری  
 خوش مقام و پر بها  
 خوه شجقات و خوه شهقال  
 عشر که نافگران  
 دشران ده مشهورن  
 پر خزی دکن دبین هرچ  
 هقالان ره هقال  
 لی نه اف سوچ بی مه به  
 کواف حس زودا نه دان  
 بهر که روبری

میش اسماعیل

[ سگمان دین دو بر و چاره چارریز دگرن . بری خورشید  
 آغاسری خوه دایه شفه ری . بری لوند آغا آلی بی روهلاتی ]  
 لوند آغا - هقالنون ! ماگر که از ناف دوه بدم . هون همی  
 میرین شردتی و کاری خوه بیر بری نه . تنی ژایرو پیدا  
 شری مه ژشرین بوری گراترو دژوارتر بین . ژلورا  
 دقیت هون ژی ژبری خورتر وزخمتر بین . دلین فه ددو  
 گرچیلکین وه چار . هقالنون ! بلا چاقین مه هرگاف ل  
 پیشی بی بین ، وکی ام پیشفه دچن ددن پی مرانی و گافا  
 کوام خوه ددن پاش مران د کفه پی مه  
 لی هروکی رحمتی گو تیه ، هرچند ژمه ثبت دقیت ام جائین  
 خوه بیاریزین و زوزو خوه مدن کشتن ، دا کو دژمنین خوه  
 بی دژمن مهبان . پیشفه زارونو پیشفه ، خوه دی ب مره به  
 [ سگمان تقدا مارشا ژیرین دخوبن و بری د کفن ]

مارشا سگمانان

ام برانه تفده گردن  
 جهین مه نه شمار ، زانار  
 ولاتی مه دی یامه به  
 هشیار بونه هرچی کردن  
 داخوازامه حتی ، مه به  
 ام دخوازن سر خوه بین  
 مه ضد خواری سر بختی خوه  
 ولاتی مه آزا بیت  
 مرن ، مرن ، مرن هبت  
 ئیدی بسه ، دپلی بسه  
 طوب لیدخن ، تفنگ تقین  
 شره ، شره لاونو شره  
 دشری ده وکی شیرن  
 پیشفه دچن خورتن مه تف  
 قباد - (د کفه دیاری . خوه دگینه پاشی یا سگمانین  
 لوند آغا . تفنگ ب ملی وی ، دور بینا سرور بکی بستو  
 بی وی فه به . دستی وی ده کراس) آفه کراسی وی ئی بخوبن

[ بزده دایت ]

تشت دبننه . لی چاقین مه ژ توشتی نه ترسیانه و دبر هر دشواری بی ده دلین مه خور ترو زخمتر بونه . ام نقدامالک بون . ژن ومیر زارو زیچ ناف هف دا دمان . هر کسی کاری خوه ، وظیفا خوه کر به . تو کسی نه هشتیه کو لوما ژی بیت دمرانی و فدا کاری بی ده هون ژ هف در کتنه . روژن هبون ام برچی دمان . شخن هبون ام ژ سره مایی دقفلین . لی گلی و گازندنه دهات بیرامه . نه دهات بیرا تو کسی . هر کسی ژبونا ولات و ملتی خوه هر زحمت دکشاند و پی شادبو . ژبر کو هر کس بیره وری کارو خباتا خوه بو .

کور دنون ! ام ایرو مالا خوه بگهیزین . امی مالاخوه آ چار سالین بردن ، ژی در کفن . لی دفی گهاستی ده امی بین دویر . خلکی چکهلگر درباسی کری دن بین ، بین نه چکهلگر خوه بدن دشتا عجمستانی ، ناف گردین عجمی . کو خوه دی حز کر پیشده ترامی دیسان هقدو بینین . دفی ناچی ده هرچی کو ژمه سرانه دین هیمی آقاهیا سرخوه بونامه . هرچی کو دمین ستون و دیوارین وی . آقاهیا بی هم نکاره بسکنه ، هم بتی بسراردی نا کفه

[ خلک خوه که رد کن و لهقدو دنهیزن . خورشید آغا بیان دبیره . ژیشک بیر بنداران مژول دبه ]  
بر بندارک - ماچره ؟ از ب چکهلگران ره ناچم ، برینامن سقکه

یکی دن - هکه خوین ژمن دچه از هرم کودری ژی بریقه بوم

لوند آغا - زارونو ! وختی مه هند که ، دق ژ کورت و پستان بردن . پیاپین کو دقیت بینه هلگرتن ژمه ره نه گر کن . دریژ مکن ، دقیت هر کس قیاخوه بقدر اخواه بینت قشم و منیژه - ( ژلوند آغاره ) ما آغا ام ژی نه چکهلگران . تمه ب چاقین خوه دیت ، مه جاوان شر دکر

لوند آغا - ( کچکان همبیز دکه ) بلی خبرا ویه ، من ب چاقین خوه دیت ، هون چکهلگر وسگانتن رندن . لی خورتن هنه بی تفنکن . امی تفنکن و بدن وان کچک - ما ام نه خورتن . تومه پیرد حسبینی . توژ کو

زانی کو ام هنگ خورتن ته نه میرن . کاکلی نه ، وان شانی مه بده

لوند آغا - چاقین من ، جانی من ، بی فیده یه

[ کچک فد گرگ نک دستگرتی بین خوه ، خاطر دخوازن و دکفن ناف نه چکهلگران ]

هقند - ( ژ دستی خورشید آغا درقه خولیشیا لوند آغا داد چکینه ) آغا ، از دک ژ تره دو پرسان بکم

لوند آغا - تو هیژ نکاری تفنگی هلگری ، هین نه ، ده سالی بی

هقند - هون ژی عجین لو ! از ژوه ره جانی خوه پیشکش دکم . هون ژمن سالین من دپرسن . ما هون هاتنه هره تی ژبونا کشتی ، هکه ولی به راه من ژی بکژوه . نه هه گر

وه من ژی دایه چاقی خوه هنگی از بگیری کشتی میم ژی مایگیری مرنی ژی نایم . دما کو تو ببری از دکم شوناته دمرم و ته دهیل ژبونا کر تو بکژوی وولی

بگیری وه تیم . ته سج کر آغا او !

ژیشک - ژخوه او بر دستی بی منه

هقند - ( درقه نک ژیشکی ) آبو از خلای دستی ته مه ، من مهبله ، اف لوند آغا ظالمکه ، دخوازه من بشینه دشتی

ژیشک - مترسه ، توئی بین ره بی ئی

[ کاروانی نه چکهلگران ببری دکفه ، خلک ژ هقدو خاطر دخوازن . قشم کتیه بن چنگی منیژی . ]

قشم - ( ژ منیژی ره ) خوه زی ام کچ نه بو وانا منیژه - ما هنگی ام اچچند یقان فه گر بدایی دبون

ژنکک - هون کچ نه بو وانا ، ام ژن نه بو وانا کی اف جامیرین ها دآنین

قشم - بین کو آینه ژنک - بین کو آنین آن مرنه آن نما دتین ، دقیت صبه هون ژی ژبونا دوصی بینین

منیژه - یادی دق ژمه برده [ پاشیبا کاروانی ژ دیاری کتا دبه ]

لوند آغا - ئیدی دمه ، دقیت ام ژی ببری کفن ژیشک - نه ژخوه

خوه کوفی و گلی بین وان دعدلانندن از زی کتم همبیزا  
چپرین دژمنان واث دانه هف

[ خلك نندا دکنن ]

قسم - (هفتدی همبیزد که ورا دمیسه) توجی خورتنکی دلای  
هفتد - کچی! ولی میبزه گزرگین آغا دی بدخسه

[ خلك دیسان دکنن ]

پیره ژن - خوه دی ته بهیله ، گرو درتی حالی ده ته  
ام کنانندن

هفتد - دحالی مه ده چه هیه ، مه دژمن کفاند ، گه یجن  
رفاند ، بو کین خوه جفاند . ژ خوه تالانی یا ئفی ایلی داو ته .

ازی هرم ل بژیشکی خوه بگرم . (خوه دده شقه ری)  
قسم - چه لاو ککی دلال وبدله

منیژه - خوه دی وی بهیله (ژ قسمی ره) برینا گزرگین  
چاوانه

قسم - ژ حالی وی خو یابه ، توانینی حالی وی نه تو حاله  
گزرگین - گه مده خوه هی ، ما تو نزان قشمه ، ژ خوه ره

دیژه . تو تشتی من نینه ، نهو د کارم تشگی هلگرم  
منیژه - خبرا قشمی به ، تو ئی چاوان بکاری تشگی

هلگری ، تو نکاری خوه هلگری  
قسم - تو نزان چه خون ژته چویه

[ ژ شقه ری پیژنا لنگان ودنگی میران تینه بهیستن .  
لوند آغا وهقالین وی ]

جقانوک - ۱۷

نین بری ، لوند آغا ، خورشید آغا ، بژیشک ، هفتدو پیابین  
دن و پیشده تر قباد

لوند آغا - (ل خلکی دنهیره و ژ هقالین خوره) مه تو وخت  
نینه کوام وندا بکن . دقتی تاقل دست ب خباتا خوه بکن

خورشید آغا - بلی ، هما نهو  
بژیشک - دی رون ، ام باخین

[ خوه ژی خلکی فدتینن و ددن فجنککی ]

لوند آغا - ژ خوه رحمتی ری یامه شانی مه دابو  
خورشید آغا - ماژو پیقه ری هیه

بژیشک - هنگی از وخورشید بکفن ناف بیان . خلکی

چکهلگر ژبی نه چکهلگر فقتینن و کاروانی نه چکهلگران  
بری خن

لوند آغا - ژخوه اقه ، توشیور و میشورا دن نینه

خورشید آغا - تنی ، دقتی قدری ده پانزده پیان ژی  
بشینن بر ب انیا شر ، آر بکاریا فلیت بکن

لوند آغا - نه ژخوه

خورشید آغا - ب بیان ره توئی کی بشینی  
لوند آغا - بلا گزرگین یوان ره هره

بژیشک - گزرگین برینداره ، بلا او بته ره بی  
لوند آغا - هنگی فله میز ، هردوژی هیژانه ، یک ژی

ئیدن چیتره  
منیژه - آخ

لوند آغا - (خلوه دزقره) اف چه دنکه ؟  
فله میز - نه تو تشته ازینی ، دنگی بریندارکی (ژ منیژی ره)

دین مبه

منیژه - دنگی برینکی

فله میز - (دقی منیژی دگره) کچی ، دین مبه  
خورشید آغا - توزانی ، لی بین از بچو آما چیتد دبو . تو

ل پیش ازل پاش . تو سگائین مه بگهینی کیری دت  
از ژی هرم پیشیا دژمن ب فلیت راحتا صبه ایقاری پیشیا

دژمن بگرم و پاشی دگل بیان بیم خوه بگهینم وه  
[ بژیشک ولوند آغا ل هفتدو دنهیرن ]

لوند آغا - (ژ خورشید ره) ککو تو گمک و ستیایی .  
دهر در آقی تنگ ده تو . لی هکه ته دل هیه

خورشید آغا - دلهون ژی هیه . ژبونا سلامتیا نفاپی بی  
دقتی از هرم

بژیشک - پزی نیر ژبو کیرابه

منیژه - (ژ فله میزه) ته دیت ژته میر تر هنه  
فله میز - (یعرن) ژمن مز تر هنه

خورشید آغا - ئیدی دقتی ام دست بکاری خوه بکن  
لوند آغا - (ژ خلکی ره) ژنون ! میرنون ! اف بو نه

چار سال ام نندا درقان چیایان ده ژبونا آزاهی و سر خوه بونا  
ولاتی خوه دختبن . دنااف فان چار سالان ده مه گمک

پیره ژن - کو دنگی تشنگان دوردکت

بر بندار - کو دنگی تشنگان دوردکت ، ژی دخوبه کو  
دژمنان باز ددن و پین مه د دین پی . . .

کالو - خبراوی به خوه هی . نهو تو نرانی چه کیفه . دژمن  
د ره فه ، پین مه د کفن پی . جارن هنه ب سری یان ب  
سینگی لهف د قلبن . هنگی تشنگ وک چونه . تنی زبقر بقا  
شلفا خنجرانه . ( بدنگی نزم د نهورینه : )

لی خنجری لی خنجری

فقدرشلی کالا نژی

از لته گریام دلالی ! چاقوشی دلالی ! تو کفی ، انیزیری کانی

ژنا کالو - مامن نه گو تبو تو خورنی بی ، مادما بر دولاتی بی به

کالو - پی تو که ره ، تو ژ کو بزانی ، بلی بر دولاتی

ماز بیچینی ، ماتو ژ کو بزانی وکی دنگی طوپ و تشنگان

دبیسیم چاوان دلی من هلدای پیژه . هری مرن هبوا کال بون

نه بوآ . خوه زی ! خوه زی ! لوان وختان ، لوان زمانان .

حتا کو ام نه دگهان سینگین هفت مه تشنگ برنه ددا هفت .

نه ژ پاش تالده و نواف چیران . هر تشت کردمانجی بو .

ژخوه عسکری رهش یکجار به نکار بو . ژ هفت باقی

وان زیده بو کو هلمکشن چیان و بکفن وارین مه . کومه

خوه دگهاند کونتارا چپی اوان روپین خوه باددان . ژمه

قدبون ، حتا سالادن ، حتا هنگی کو ام د کهن دشتی

[ دنگی تشنگان یکجار دورد کفه ]

جقانوگ - ۱۶

مپن بری ، قسم ، منیژه ، گر کین ، فله میزو پیشده ترهقند

[ نقهده ژشفه ری درد کفن . منیژه بر بنداره ، فله میز

او هلمکرتیه . گر کین ژی بر بنداره ، قسم کتیه بن

چنگی وی . برینین وان نه خدارن ]

کالو - آغانو خیره

گر کین - خیره آپو

پیره ژن - مالامنی ، کچک ژی بر بنداره ، من دگوت

مچه ، لی گنه دامن

بر بندار - مامن نه گو تبو دژمن شکیا به

فله میز - بلی شکیا به

گر کین - شکیا و کشیا روبری دن ، پین مه دانه پی .

حتا کو وی پین باژون هندای نوالادن

فله میز - دژمن گلک ئیشیا ، دنوالی ده بکاره خوه بیاریزه

ژی ، حتا کو خوه بعدلینه ژیره چند روژ دقینن

کالو - ژ پین مه پرهاتنه کشتن

گر کین - کشتی پین دژمنان بیترن

کالو - ژ پیران پر ژهند کان هندک

بر بندار - پسام ، گلو نیتا . زین مه چه به ؟ ماژمه ره

ژی تقدیرک نایه دیتن . از بکتام پشتی کشرکی من دکار بو

تشفگی بشولینم . لی چاوان خوه ، گهینم حتاوی ده ری

فله میز - ( بی حمتی خوه ) کو خوه دی جز کر ، اوژی

دبت ( ژی منیژه ره ) چاوان گلک دئیشی

منیژه - ما از کنگی د دستی تهو دهلما جانی ته ده دئیشم ،

تنی دترسم . . .

فله میز - ژچی دترسی ؟

منیژه - نه ژ توتشتی ، کو از بیژم ، مه به کو بخیدی

فله میز - ناخیدم ، کایژه چه به ؟

منیژه - ماتو نرانی ، بلی دترسم کو تو من دیسان بر دی ،

ام دیسان ژهفت قفنن . ماچره ژمن قفتی ، نه نه دبت رخ

ته ده من ژی شرد کر . ته بخوه دگوت ، بر کین من قفت

شاش نه دبون ، دگهان آرمانجی ، ئیدی ام ژهفت قفنن نه ؟

فله میز - نزانم کچی ! کارزانه ، د رب زانه . از چه

بیژم ، دنیا شره ، شر هروب آواکی به

هقند - ( بدنگ و قیر ژشفه ری درد کفه بدستی وی ره

چند بومبه هنه ) باش ایثار آغانو ! هون چاوانن ، راحتن ،

ئیدی مترسن ، دژمن گلکی دور کت . پشتاوی شکیا ،

زوزو نکاره قگره ( بومبان شانی وان دده ) اف سیقین هاژی

ژوه ره ربکره

[ خلك دکنن ]

گر کین - ته اف ژ کو پیدا کره

هقند - ککو هکه ناخیدی ازی بیژم ته

گر کین - قت ناخیدم ، هما بیژه

هقند - وکی دژمن بازدا و هون کنن پاشلا دستگر تی پین

لی بی بی ! ربی ! دو تاما خوه لیسر  
 لی بگری ! لی بگری ، دلالی ! تورنی  
 وای لِن ، وای لِن پور کری آخ ازی  
 [ دیار پیلکی څالا دمیته . ژانی باشر دنگی طوب  
 ومترالیوزان تبت . هیدی هیدی دنگ نیزنگ دین .  
 قاصدک ژشفه ری ده تی ود کفه دیاری لودورا خوه  
 دنه پره کسی نابینه پیشه دجه . دنگی تشنگان هیژ  
 نیز نگر و خور تر دبه ]

جفانوک - ۱۳

لوند آغا ، بژیشک ، قاصد ، هقند ، قشم ، منیژه  
 و پیاپین دن قدگون  
 لوند آغا - ( ژقاصدره ) ته دگوت جه ل بین مه تنگ  
 بو به . دژمن کتیه نوالی ود کشینه پحنافی

[ دنگ و پیژن هیژ نیز نگر دین . چند برك لپحنافی  
 د کفن . سگمانک بر بندار دبه ود کفه بژیشک لی دتوه ،  
 یکی دپتر ژي . . . . ]

لوند آغا - هر چند امی تی کیری څالا بکن لی نهونکارن .  
 مه هیژ کارو باری خوه نه کربه . ژو پیشه دتی حالی دهام  
 چاوان پشناخوه بدن دژمنان ودرباسی کیری دن بین ژلورا  
 دقیت ام ب ژیریشه کی دژمنان ژ چیران هلکن وباقیژن  
 رو باری دن . دی خورتو ! زارونو ! هرچی کو زیرافی  
 وی تنکه بلا لپاشی بی عینت ، ژیریش زارونو ژیریش . . .  
 [ تقداخوه ددن شفه ری . لوند آغا د کفه پیشی بی .  
 پیادبزن دکن کو ژهفت در کفن . بریندار گهانه  
 جانکشی بی ]

بژیشک - ( لودورا خوه لکچکان دنه پره . رادهیژه  
 تشنگا کشتیکي ) از کو دزانم برینان درمان بکم دقیت بزائم  
 برینان ژي فکم ( دده شفه ری )

جفانوک - ۱۴

قشم ، منیژه ، پیشده تر خاکی تفل هفت  
 قشم - دژمن دیسان حار بو به  
 منیژه - عمری صه پی حار نه در بژه  
 [ دنگی تشنگان لیسر هفت تبت . گوله د کفن دوری ،

گره گرا بالافران ژي د کفن نافی . قیرین ، آخ  
 ونالین . ژ آلی بی روژ آفایی خلک کی تفل هفت : ژن و زارو  
 کال و کوم ، چند بر بندار د کفن دیاری . هن لیسر  
 لنگانن . هن ژي ب ز کیشی خوه د گپین هفالین خوه .  
 ژنوالی فه دنگ تین . گه نیز بنگ دین ، گه دور .  
 بالافر تین ، دچن ، بومبان داتیژن . گر بنگ . . .  
 بالافرك بر ب ژیر دبه ود کفه نوالی . . . ]

منیژه - ما ام چره سکینه . بر بندار نه مانه کو ام لوان  
 مقاته بین . پرانی ب بر بنین خوه کتنه . ئین مایی بی مه  
 ژي دکارن . آن اوی صاغ بین آن خوه بگپین هفالین خوه .  
 ئیدی جهی مه ژي چیره ، انی باشره ( رادهیژه تشنگا سگمانی  
 مری و دده شفه ری )

قشم - ما اژته کنگی ب تی دهیل ( دده پی وی )  
 پیره ژنک - کچی ! کچنون ! کو فه ؟ کو فه ؟ خوه لی  
 لیسری وه مبت . مالامنی . . .

جفانوک - ۱۵

ئین بری ژ دو کچکان پیشه  
 کالهک - ( ژ پیره ژنی ره ) توژی دنگی خوه بیره  
 پیره ژن - ژخوه من تشتک نه گوٹ . افه من دنگی خوه  
 ژي بری

کالو - خوه دی او ! تو برحما خوه بکه . لبرتی حالی  
 چاوان هداراته تبت . هکه ته مروقین دیندار دقینن ، امن .  
 هکه ته میرین قنچ ، خدان بخت ورومت دقینن دیسان امن  
 پیره ژن - ( بدنگی نزم ) خبراته به برا . لی کسی بشولی  
 خوه دی تزانه

کالو - ( اوژی بدنگی نزم ) بلی خوه هی ولی به . لی  
 اقل شول بداری چافانه  
 [ دنگی تشنگان هنکی دورد کفه ]

بر بندارک - هی ، از قربانا دست ولپین وه سم . بین مه  
 پیشه دچن . دژمن پشنا خو داوان  
 پیره ژن - ما تو ژ کوزانی خورتو ؟ تو ژي وک مه لهری ،  
 تو کسی نابینی . آن ناف دمه ددی  
 بر بندار - یادی ، ماتونابهیسی کودنگی تشنگان دورد کفه

دڙمن شيڪياوخوه داپاش . سگائين مهخوه گهاندنه چپرين مه .  
 فيجا دڙمنان ديسان پري خوه دان شكفتي . لي شكفت  
 ئيدي لوان راندبو . هاتين و کتن ئي . شكفت وهڙده  
 جنڊك کتنه دستي وان

سرور بگ - در نوالي ده

لوند آغا - دڙمنان عسڪري خوه بشوندا كشاندن . نوال  
 و كه پري به . تودنگ و پيڙن ڙي نايي . سه مري پين مه  
 وقدري صد جنڊ كين دڙمنان لي مقاته نه . دگري شيران  
 ده ڙير كو توسينگين سگائين مه نه مانه ، دڙمن گوله و  
 بر كين خوه داڙيره روپي آخ و كهران . مه مري کاني بي  
 ڙ دستي دڙمنان دريخستبو . ڦي پاشي بي ديسان ڙمه زم  
 كرنه . لي مه او چند جنڊ كين وان خسته نافي كو دڦي  
 کاني بي ر ڙيمه واق صور دهر كه . . . .

سرور بگ - دهر ڊري ده ميران ، دهر ڊري ده گرداني .  
 لي دڙمن سر دست ، ام قلس و پيڪس ، ڙلورا دهر ڊري  
 ده بندست . بلي ميران قنجه ، دهر تشتي ، نمازه دشري ده  
 ميران شرط پيشينه . بلي ميران گيانه . لي ڙبونا كو  
 گيان بلهه ، تف بگره ڙيره دست و لنگ و ڙوان دستان ره  
 شور و ڙم دڦين . نه پيانه نه چك . چار مه دڦي كري  
 ده دور گرتي ، هرو پياو چك كيم دين . لسانوان تونا بي .  
 آفا كو سري خوه نه دايه کانيكي ، روڙكي دي بچكه .  
 ( دنگي وي دگهيره ، ڀڙين وهڻكي ) آغانو ! قراراهه چه به ؟

ئيدي دمه ، دڦيت هون قرار كه خوه بدن

لوند آغا - بگ ، اصل توئي . هكه قرار دڦيت ، ديسان  
 توزاني . ته چاوان امر كرامي ولي بكن . ما كنگي مه بي  
 امر پي اته كر

سرور بگ - لي هيه كو ازنه مام

[ هميان خوه كه رد كن ، دنگ ڙتو كسي نايي . ڙيشك

دكفه نيزنگي سرور بگي ، زنداوي دبه دستي خوه .

ڙيشك بي ماده ]

لوند آغا - بلي بگ تو چي امر دكي ؟

سرور بگ - بي من ، دڦيت هون خلڪي چڪه لگر ڙ بي

نه چڪه لگر ڦقتن . زار و زيچ پري خن بلا بڪشن دشنا

عجمستاني هرن نافي گردين اردلاني . نين چڪه لگر ڙ ڦي  
 كري درباسي كري دن بين و حتا پاشي بي  
 لي بينن . خوه گران بفروشن . بلي خوه رند پيسارين  
 زوزو خوه مدن كشتن . ڙهر گاشي بيتر ميري مير كڙ  
 بين ونه خوه كڙ . دا كو دڙمني خوه بي دڙمن ميلن و ڊردي  
 كردستاني ده آگري سرخوه رابوني مدن تمراندن (دنگي  
 وي تيته برين ، نمادله )

ڙيشك - ( خوه دگهينه وي ، ميري خوه دكه سينگايي ،  
 چاڦين وي هسترد كن ) چو ، هري سروري مه چو ،  
 ستونا مه آبلند و خورت هوشيا

[ قباد وهڙند خوه داڦيڙن لنگين وي ، كچك دگرين ،

چاڦين خلڪي هسترد كن . پيليڪي دڦي حالي ده دميين ]

لوند آغا - هٽالنو ! سروري مه چو . هروكي ڙيشكي مه

گو تيه بابه كي نه بچير ستونا مه آبلند و خورت هلوه شانده ،

كوني مه دسر سري مه ره خست ، لي دڦيت ام كوني خوه

را كن ، ڦدن وشوپا سروري خوه وندامكن

برانو ! نه ڙمن نه ڙي ڙ كسكي دن تيت ، هروكي دڦيت پسني

سرور بگي بدت و لپر بگفت . هكه ام دخوازن گياني

وي شابكن دڦيت ام بختن و وصيتاوي بينن جه . دڙيناوي

ده ام ب امري وي ڦه دچون ، پاش مرناوي دڦيت ام

بوصيتاوي ڦه هرن . ( آلي ڙشكيري دبه و ب سرور بگي

داد كه ) بگو ! دڙينا خوده ته او هلد گرت ، دمرنا ته ده

دڦيت او ته هلگرت

[ لوند آغا ، ڙيشك ، قباد و پيا بين دن دارو بست هلتينن ،

دائينن سر پي بين خوه ، هيدى هيدى دچن ، خلك در

دن پي وان . قشم داڦيڙه سر :

واي لان ، واي لان ، پور كڙي آخ ازي

سرورو ! سرورو ! سروري قومي

شهيدى ، بلندي ، شهيدى بهشتي

لته خست ، بچاق بركي كوركي

سروري ، گرامي آخ ليه واي ازي

بختري داڦي ! دوڦامي پور كڙي

رشا خوه گريدن ، سرور چو گورني

سگانی پیشین - رهنیا چاڤين کردستاني بو

سگانی دووم - نه ميري گورنستاني بو

سگانی پیشین - ژبوناميراني بي ، ژبونا قوماندني ژدي يا  
خوه بو بو

[ دوی دمی ده پيايک دکفه ديارى ، ب دستى خوه  
ره دور بين وششدربا سروربگى دگره ، خوه دگهينه  
داروبستى وسراژلويپن خوه دسکنه . ]

جڦانوك - ۱۱

ئين برى ، قباد پاشى هڦند

قباد - ( ب دننگى بگرين ) آخ از بنى ، از گورى من  
دگوت خوه او چند مده پيش . ما ام صه پين ته نزام ژبوچى  
بون . ته كرى يى خوه چاوان بى سرى هشت . از گورى  
من دگوت از گورى ياسرى ته بيم ، ته از كرم كيلا گورناخوه .

بگرا بگرا ! بگى زراف مرن ژبوته هيژ گلک زويه . دنيا  
دن راحتى به . تونه ميري راحتى بي . توميرى شرو قوما  
ندنى بي . اف چيا ، گو وگاز تنى يدنگ و ناقتيدانا ته  
شين وسرخوه نه . بي ته چيا نزم ، روبار زووا ، ازمان بى روژ

وتاڦه . تو ب مرنا خوه گلک تشتان ژمه دى کو ابرو  
ژهردمي بيتر ژمه ره گر کن . توقيا خوه ب مرنى دتيني  
لى ام نايين . تونه بي خوه بي ، تو بي مه بي . مروئين وك  
ته نه قصرن ، كاروا نساين . حتى رونشتنا هر كسى لى هيه .

بگو ! بگر ! ته هرثشت ، دى وباق ، زارو زيچ ژبونا  
ولاقى خوه هشتن . نهو ولاقى خوه ژبونا چى وكى دهيلي ؟  
مانابه بيراته وكى ام برى دکن ، دوتماما ته ژتره چه دگوت .  
درخوست ب مه ره وره . ته نه دهشت . ژته ره دگوت :

« تو من ژبونا ولاقى خوه دهيلي ودچى ، ما ازته ژبونا كى  
بهيلم وهرم كو ؟ ولاقى من ژى تو يى ، برده از ژى هرم  
ولاقى خوه ، از ژى ب ته ره بيم »

هڦند - ( دکفه ديارى ، لدورا خوه دنهيره ، لبردرو بستى  
سراژ نوپان دسکنه ، هر دو دستين سروربگى ماچودکه  
و بدننگى زين ) آخ من نزامى بو کو مروف دکاره دوجاران  
ژى سيوى مينه

قباد - آخ از چه ديژم . مازانم چه ديژم . بگو ! بگو !

بگى زرافت رابه ، سرى خوه هله

سروربگ - ( چاڤين خوه نيڦ بل دکه ، لدورا خوه  
دنهيره ، چاڤى وي لقبادى دکفه . بدننگى نزم ) قباد  
تو لهرى ؟

قباد - بلى از بنى ، ژبى فهيتيا خوه هيژ همه و لهرم .  
هيژنه مره

سروربگ - مه مره ژى . دا کو کراسى من ئى بخوين بي  
مال ، بدى دوتما ما من ، كرى من تيده بخوه دى بکن ،  
زو بگهين ويخن خزمتا ملنى . ملت نكاره گلک ل  
هيڦنى يى مينه . ژيره جاتقدا وجانبزارن دڦين . ژدى باوى  
ره هولى يژه

قباد - ما چره از بنى ، خوه دى جز بکه تو بخوه كرى  
خوه بخوه دى بگى وبگهينى . برينين ته نه خدارن

[ ژدڦى سروربگى خون تيت وديسان ژ برقه دچت ]  
قباد - خوه زى من اف نه گوتانا . خوه زى من اف  
دم نه ديتانا ، دترسم پى دلى خوه خرا كرى به

سروربگ - ( ديسان چاڤين خوه قد که ول هڦندى )  
هڦند كرى من تو ژ لهرى

هڦند - بلى از بنى لهرم . امركى ته هيه  
سروربگ - نه كرى من ، لى هروكى من ژته ره برى ژى  
گوتبو ، سرى خوه ژ چپرى گلک درميخينه ، ته مسح كر  
هڦند - بلى از بنى درنايخينم

جڦانوك - ۱۲

ئين برى ، لوند آغا ، بږيشك وچند پياپين دن  
لوند آغا - بگ چاوانه

قباد - ( بى حمقى خوه ) راحته  
سروربگ - هون بخير هاتنه آغانون . سگانين شكفى  
چاوان بونه ؟ دترسم دژمن لوان هاتيه هڦ ، ديل كتنه

لوند آغا - بلى از بنى دژمن لوان هاتبو هڦ ، لى ديل نه  
كتنه . ژخوه دشكفى ده پيست و پينچ پياهبون . قدرى  
دو صد عسكرى دژمنان بسروان ده گرتبون . پين مه ڦى پاشى يى  
دومترا ليوزين دژمنان خستبون دستى خوه . بږ نير يشكى  
لدژمنان بونه دهر . ژ دوساعتان بيتر بهڦ چون ، داوى

« بلی خبرواونه . افت شری ها ، شری مه دگل وان نهوك  
 شرین زمانی بری به - بری ما مه لسر تمچوران میری بی  
 شرد کر . جارن هبون ژ یونا خوینی بکی ژی . لی ایرو  
 ژ یونا ولیت وهینا خوه شرد کن ، د قومین . بلی افت شرین  
 ها کو چند سالن در ولاتی مه ده دین شرین ب آرمانجن .  
 اؤخستنه سری خوه مالا مه ژ دستی مه بین . اوما لا کو ژ  
 میژقه ژ پینج هزار سالی شه ام تیده نه . اوما لا کو گلک نیار  
 و دژمن حواندنه ما لی تو جار نه هشتیه کو او تیده چه بین  
 و وارین مه ژ مه بستین . بیانی ، و کی دهاتن و ولاتی مه  
 قد گرتن مه خوه ددا چیان . او ژ ژورقه ل چون وهاتنا وان  
 دنهیرت . لی ایرو نه ولی به . هلد کشن چیاپن مه ژی ،  
 ناهیلان ام د سروان ده ژی بسکنن . ژ لورا ، ژ یونا مه دوری  
 نینن . ری بک هیه . دقیت ام دژمنی خوه ژ مالاخوه  
 درینن و خوه بی بی مالاخوه بین »

قسم — بلی منیژه ولی دگوت . خبراوی به ژی . قستاوان  
 قلندنا مه به . دلی وان هیه ناقی مه ژ دنیایی را کن  
 [ ژ شقه ری پیژنا لنگان تبت . کچکان خوه کهر  
 دکن و بر ب پیژنی فه دچن . برک بریندار خویا دین .  
 هن ددا رو بستان ده هیندن دپشتا میران ده هلمگرتی .  
 دارو بستا پیشین ددینن اردی ، کچک دچن سر . ل  
 برینداری دنهیزن ووك مهینن فجنقی خوه ددن پاش ]

جفانوك — ۱۰

این پیشین ، سرور بگ ، دو سگمان و پیاپین دن  
 هر دو کچک بهشره — آخ ، آوه ، خورتی جلتننگ  
 [ بریندارین دن دین شکفتی و چند کان ژ دباری کاش دکن ]  
 سگمانی پیشین — سرور بگ بخوه به  
 سگمانی دووم — قُرانا میرانیا خوه به  
 سگمانی پیشین — بربری هزار میری بو  
 سگمانی دووم — سرک بو سر کن ره سری بو  
 سگمانی پیشین — خوه ندا بو ، زانا بو  
 سگمانی دووم — بهر آوایی هیژا بو  
 سگمانی پیشین — خلک پی دسکنین  
 سگمانی دووم — دژمن ژی دلزین

آخ کچی دژمنان تونه کشتی ، ته از کُشم . هندک مابو  
 از دین دپوم . بی ته منی چه بکرا ، آخ کچی آخ . . .  
 منیژه — دلی خوه رویننه ، توتشتی من نینه ، برینکه سقک .  
 لی من ژ ته ره نه گو تبو حالی مه نه تو حاله . توانی دژمن  
 خوه گهاندیه حتا پچنا قامه . ما ژ هر وی فه چه هه یه ؟  
 امی هرن کو . چارسال ، تقاف . او چند شر و خبات ، او  
 چند خوین . ژن ، میر ، پیر ، زارو هو قاس کشتی و مری .  
 ما همی ژ یونا فی پاشی بی . ژ یونا کو ام پچناقا خوه بردن  
 دستی دژمنان . ژ خوه دستی مه ده اف گیر ، اف کر مایه .  
 گلی بی زبلان و تند ورك کتته دستی دژمنان . دنا ف  
 کردستانی ده تنی اف کر مایه کو دسری وی ده ام در  
 دوراوی ده دژمن تنی کُشتن

قسم — هیژ راسترد دستی مه ده تنی اف ده رمایه کو ام دگژن  
 وولی تینه کُشتن . در دین دن ده گرد نابنه کُشتن . لی  
 وک پزو دواران تینه شر ژ بکرن

جفانوك — ۸

این پیشین ، هقند

هقند — ( ژ شقه ری درتیت ) بو کتون ، ژوه ره کفارت به  
 ( ژ منیژی ره ) مالا منی برینداری ( مادی وی دگپیره )  
 بزبناته نه خداره ؟  
 منیژه — تشتکی سقک

هقند — ( لدارا خوه دنهیره ) کا آلامه خویانا که ، چو کو ؟  
 [ تقدال — آلی دگرن ، ژ ناف کقران در دخین ؛  
 د عدلین و ژنو فقه داد چکینن سری شکیرکی ]  
 هقند — ب فی بومبار دمانی دژمنان ام گلک بئشاندن ، من  
 دگوت فی تنی دچیران ده ، لی دینم اف درژی . دقیت از  
 هرم نک قباد ( خوه دده شقه ری )

جفانوك — ۹

قسم ، منیژه

قسم — بلی مه چه دگوت .  
 منیژه — منی بگوتا ، ژ خوه نایه بیراته ، بری چند روژان  
 او خورتی بر جلین تنگ کو دبیژن ل اورو پایی خوه ندیه ،  
 روژنامه که دژمنان دچوه ند و ژ دورا خوه ره دگوت :



نه هولی ، چند روز شر ، پاشی چند روزین دن ژی راحتی .  
 فی جاری ژچار مهان بیتره ئیریشا دژمنان دستپی کر به  
 وقت نزانه بسکته . بری شر د کونتارین چپی ده دیه .  
 دژمن هیدی هیدی هلاکشیا وخوه گهاندیه بلند جهان  
 مابری ده روزان بر کین دژمنان قت ل پحنافامه د کتن  
 لی نهو پحنافامه ژ چپری خرابتر بو به . ژ آلی بی دن مزنان  
 د گوتن زاد ژ خوه بکجارنه مایه ، بر کین سگمانین مه ژی نه  
 گلمکن . هرو کیم دین

چقانوک - ۴

ئین بری ، هفتند

هفتند - ( د دستپی وی ده چند پاکیت پنبو د کفه دیاری .  
 ل کچکان دنهیره ، یکن دبیژه وان ) کچنون وه خیره ،  
 از دینیم هون هر دوژی ماده کری نه . باور بکه ترس گلک  
 گهابه وه . مترسن ، از ککی وه مه ،  
 منیژه - دی ، توژی بقهش . . .

[ هفتند د شقه ری ده وندا ده ]

چقانوک - ۵

ئین بری ، هفتند پیقه

قشم - چزه دخییدی منیژه ، بخوه دی زارو کچی دلالة  
 منیژه - بلی ، از ژی دزانم ، مادما یاری بی به  
 [ ژ دورقه گره گرا بالافران تینه بهیستن ]  
 قشم - آفه دیسان دیوین گهدرزی و بالافر ، هروکی  
 د چپرو کان ده د گوتن

منیژه - فد کره قشم ، راست بر است بر سر مه ده تین

[ کچک ل عزمین دنهیرن ، بالافر نیزنگ دین ، لدوری

گرله د کتن . پاش بیستکی ل پحنافی ژی . قشم و منیژه  
 خوه ل اردی درژ د کن . سی چار بومیه سرهفت  
 د کتن هولکی . دنیا طوز وتاری به . چاف چاقان  
 ناپینه . بالافر حتا قداندا بومیه بین خوه دسر پحنافی ره  
 دگرن . گدافکه دن فد گرن قرار گاه خوه . دنیا  
 هیدی هیدی فدیبه ، هولک هلو شیا به ، دجهی وی ده  
 چالن خویا نه . ژ برینداران یک ژی نه مایه . دنااف  
 شکیر و زاناران ده هن سیری ، مل وهستی تینه دین .

ژ نوالی قه دنگی تشنگان . دستر بژ که خورت . ژ شقه  
 ری چند بیادرد کتن ، دنااف شکیران ده دسکتن ،  
 گر گین وفله میز دنااف وان ده نه ]

چقانوک - ۶

قشم گر گین ، فله میز ، چند سگمان وعسکر

قشم - ( ژ جهی خوه ) گر گین توئی ، فله میز

گر گین - قت ملقه ، جهی خوه ده بینه

فله میز - منیژه لکویه ؟

قشم - اوژی لهره ، دنااف کفران ده

گر گین - خوه در بژ بکه ( ژ هقالین خوره ) کافی عسکر ،

دابون پی مه

فله میز - آفه تین

[ ژ شقه ری قدری ده پانزده عسکری رش درد کتن ،

سگمانین گردان وعسکر د کتن بداری هفت . ل هفت

دخن . ژ عسکران می چارک تینه کشتن . عسکرین

دب ژی تین . هر دو آلی خوه دتلین ، شره . پاش

پیلکی پشتمیرین کردانه . ]

پکی ژ پشتمیران - هی گه پخنون من هسپ بر سر

میلا کا دی یاوه دا او ! . . .

[ چند دستر بژین دن ، عسکر درفن ، سگمانین گردان

د دن پی . دنگی تشنگان هیدی هیدی دورد کفه .

دیار قالا دینه . جند کین گردان و عسکران تقلی

هفت ل اردی نه ]

چقانوک - ۷

قشم پاشی منیژه

قشم - ( ژ جهی خوه سری خوه هلدده و بان د که ) منیژه ،

منیژه ( ژ خره خرا مر پیاپ پیقه تودنگ لی فنا گرینه .

جار که دن بان د که ) منیژه ، منیژه ، کچی ( خوه بخوه )

مالامنی ، چه لی قومیه ، مبه کو . . . ( د کفه نااف جند

کان لی دگره . منیژه دنااف کفران ده دقهروژن لیا به .

قشم وی دینه ، خوه لی دتوبنه و دکشینه همبیزا خوه . رویی

منیژی بخوینه . قشم رویی وی دشوت . منیژه هیدی

هیدی خوه دلئینه . بریناوی سقکه . منیژه رادبه سرخوه )

و گرین ته . ام ژى قلس ، بى چک ، بى توشت .  
 چارمدورامه گرتي ؛ ژهر آلى رى يامه برى ، ژهر ملي دژمن .  
 چارنکارنيار ، نياردخورت ، هر کس يارى نيارد ، دوستى زخم .  
 بلى منيژه ولي . مه چه دگوت ربن چو ، گلوددلى وى ده  
 چه هبو . ماتشتكى وى نين بو کو بيژه  
 قشم — هبو ، ديدماپاشين ده ، وکى کتبو جانکشى يى ،  
 تشتک دگوت  
 منيژه — بلى دل دکو کو بيژه ، لى نکاربو ، ليقين وى  
 نه دگهات هف . نائفک دسر ليقين وى ره دگريا ، لى نه  
 دهاته در

قشم — بار بکه نافي کچککى بو  
 منيژه — ب من دگوت زيزى  
 قشم — ب من زينى

منيژه — نافي دستگر تيا خوه دگوت . کى زانه دستگر  
 تيا وى ژى چه کچککه دلال وچلنگه . آخ دنيا ، هيژ  
 سرين خوه نکريون بالهگى . هرى هر حال دلالة . ما  
 نايژن کچين ديسيمى گلک سبهى نه ، کژن ، چاقلکن .  
 آخ هکه بين مه ژى درقي دم وساعتى ده

قشم — منيژه چره هولى ديژرى ، خوه دى مکت  
 منيژه — ماخوه دى مکت ژى هيه . تونايينى گوله ژخوه  
 ره کر به عادت هما خورت وزاقا ودستگرتيان دژيره .  
 لخوا دانا بينه دست بده پير و کو کان  
 قشم — نه خيره منيژه ، چره ابرو هولى بپادى و تشتن نه  
 قنج و نه بخير ديژرى

منيژه — تو دخوازي زته ره راستى بى بيژم ، لى نزانم چاوان  
 بيژم ته . دلى من ده تشتک هيه . بلى تشتک ژمن  
 ره ديژه . . . . .  
 قشم — آخ لمن . . . . .  
 منيژه — آخ . . . . .

[ کچک دکفن همبيزا هف و بدنگ دگرين . دمکى  
 دههمبيزا هف ده دميين . قشم خوه ژهمبيزا منيژه بى  
 قد که هيستران ژ روپى خوه دماله . منيژه عجيب مايى  
 لى درنيره ]  
 قشم — مگرى خوه هى مگرى . ژمه ره شرمه کو ام ژ

بين خوره بگرين . هرچى کو دشرى ده نه تفدا براين مه ،  
 ميرين مه نه . هيمى بين مه نه . گرين هبه ، دقت ام ژبونا  
 هميان بگرين . لبر کتن هبه دقيت ام لبروان بکفن کو  
«Major Soane»yeqî ingiliz qo di nav Qurdistan û Ecemistanê de geriyaye û hîni zmanê qurdî û farisî bûye liser Qerdistanê jêrin qitebeq nivisandîye. Major di qiteba xwe de bi zmanê qurdî û bi zarê muqrî ji mijûl dibe. Ev e gotinên Major Soane

«Yên qo zmanê qurdî rind dizanin qêm in. Ji lewra hineq debêjin qo ev zman ji zmanê di farisî û erebî hevdu danî ye, pîrantîya pîrsên xwe ji wan girtine. Hineqên din dibêjin qo ev zman zarêqî farisîya qevn e, û pêş de ne çûye. No, her du gotin ji ne rast in. Zmanê qurdî zmanêqî geleq qevn e, ewçend qo ji zmanê farisî e nuh ji qevntir e. Zmanêqî teqûz, bi zmanazîneqe binizam. Ji hêla din zmanê qurdî ne qetiye bin hiqmê zmanê erebî weqê farisî û pîrsên arî ên xwerû wînda ne qiriye. Lê farisî ev wînda qirine û dewlemendiya xwe bi pîrsên erebî aniye pê.

Di nav zarên di zmanê qurdî de zarên paqlir û xwerûtir zarên muqrî û qurdmancî ne. Ev her du zar geleq nêziqî zmanê zendî, zmanê Avêsta ne.»

Carqê hevaleqî min ji min re goti bû

qo zarê muqrî zarawaqî zarê lolo ye. Ji xwe qurdîya lolo zarê qurdmancî ye. Hawar ji bi pîranî bi zarê qurdmancî derdiqeve.

Niho min divêt ez fiqra xwe liser yeqîtîya zmanê qurdî bidim zanîn:

1— Zmanê qurdî bi bijartîna pîrsên qurdî, ji hemû zarên, û bi xistana wan li şûna pîrsên biyanî qo qetine nav zmanê me (tirqî û erebî).

2— Berî her tiştî divêt em zarêqî ji bo xwendin û nivisandinê bibijêrin, pişt-re pîrsên zarên din bexin nav wî zarî

3— Zmanê qurdî bi awayê di jêrin pêş ve diqit û biser diqevit:

A : berhevqirîna şîhr û pendê di bapîr û qalan, da qo qaniyeqe edebî biqeve destê her nivisêvanî.

B : danîna dibistanan di nav bajar, gund û eşiran de.

C : wergerandina qitebên biyanîyan ên heja li zarê xwe.

D : belavqirîna rûjname û qovaran.

F : danîna du civatên cihê, zanistî û dinî. Ev her du civat bi lubbijartîna pîrsên qevnar û bi peydaqirin û hevedudauna pîrsên nuh de mijûl bibin.

*Eli Seydoyê Gewri*

### SEHÎTÎ

— 3 —

Di hejmara hawarê a şanzdehan de liser sehîtiya zmanê sê pîrsîyar ji qurdên xwenda qiri bûn. Bi van çend xezên jêrin gotina xwe û bi geleq silavan ve peşberî hingo diqim.

1— Yeqîtîya elfabêya qurdî.

2— Heçî xortên qurdan yên qo irû



## Nivîsevan

Jina paîzê bê reng û tam e, ji lewre dema werihan û mirinê ye.

Rûjên cûn, ezmanên bêroj, Şevên reş çikas nexweş in.

Bayê qûvi liba dibe, sih qûr û sar e

Ewrên giran û tarî di ezmanan de digerin sihên wan diqevî dilên mirovan û dilê wan tehl diqin.

Key nexweşiyêq ji xewê radibe û li dora dinyayê de digere.

Di paîzê de sistîya jinê, zayîn û mirin diqevî pêhev. û insan ji xwe re dipirse:

— Ma ez ji qû hatim û diçim qû?

Jin çiyê? Ew hatin û çûyin ji bo çî.

Rûjêqê ji rûjên paîzê dilê Iblis teng bû ji xwe re got ezê herim gornistanê yeqî ji mirîyan ji xewa wî hisyar biqim û pêre baxêvim û weq gotina xweqir û çû gornistanê û ser tirba nivîsevanêqî seqinî û ban wîqir û got:

— Hol! guhbide min! ji cihê xwe rabel ji gorinê dengeqî kebe lê vegerand?

Ji bo çî ezê ji tirba xwe rabim.

— Divê tu ji tirba xwe rabî!

— No ez ji tirba xwe ranabim!

— Çima?

— Ma baje tu qî yî.

Tu min nasdiqî

bi zmanê qurdî re bendewar dibine ji qurdên her welafî xorteq biartin û ji van xortan civateqê zanistî anin pê.

3— Di vê civata zanistî de berî her tiştî ferhengeqê gewre, di pişt re qitêbên qevnar û nûjen, temamên wan liser hemû zarên qurdî bilav qirin û di piştê bi yeqitîya zmanê qurdî mijûl bûn.

Bi vî awayî heya deh salan di xwendinê de yeqitî û di axaftinê de nîziqayiyê hêsani dibûnim.

Xwedê vê bendewariya Hevîndê Sorî bi miletê qurd re dirêj û berxurdar biqê.

*Osman Sebrî*

— Waliyê tirqo?

— Ha... ha... ha no.. ez ne ewim.

— belqo tu qomandarê esqeriyî

No.. no.. te disan sehneqir.

Ma qî yî bibêje...

Ê z 'blis im:

— qo wisa ye baş e başe, zûqa tēm

Qel ji cihê xwe keliki axê xwe veqir û hêdî hêdî cendeqê zelamî ê hestî angokeltaxê wê ji erde derqet

Iblis jê re got:

— Rûja te xweş be. Nivîsevanê lê veqerand:

— Ez niqarim selawa te li te veqerînim

Mirî geleq nizm digot û dengê wî ecêb bû key du hestî hev digemirandin.

Şeytên got:

Mêze kisûra min meq e min nedîviya ez selawê li te biqim.

—Xem tune.. lê dixwazim bîzanim..

Te çima ban min qir?

— min ban te qir ji lewre min ji xwe re digot, emê herin bigerin!

—Çaqe.. ger ji hewa ne hevkas spehî ye.

— Tu ji sermayê natirsi?

— No.. bi xwedê ez natirsim.. Min di jîna xwe de geleq serma hilanî.

— Belê... niho tê bîra min, te serma hilanî, ne sax qetî û wisan mirî.

Li tenişta hev bi rê ve diçûn.

Baraneqê hûr dibarî û bayeq dihat li hestiyên ser û perasûyên nivîsevanî re derbaz dibû qo êdî dileq tê de nedilivî. Ji qortiqên çavên nivîsevanî roniyêqê heşîn derdiqet, diqet erdê û rêya Iblis rondar diqir.

Nivîsevanî ji şeytên pirs qir?

— em diçin bajar?

— Qo dixwazî serseran . qeyfa te tê?

— çawan nayê

— ma di bajar de çî heye qo nîziqî dilê te ye.

— mirov

— Çima

— Çi bêjim... ez çikas ji bo wan xebitime.

Iblis diqenî û qeyfa wî dihat û digot

— Insanê reben!

— hem reben hem bextiyar

Iblis milê xwe dikelikand.

Ji gornistanê derqeti bûn, li ber pêyên wan de rêyeqe pehn xwe dirêj diqir, di her du rexên rê de avahiyên mezin bûbûn rêz. Rê tarî bû, ronîya fanosên rê hindiq bûn wê qemaniyê, qemaniya ronîya dinê eşqere diqir.

Iblis dîsan pirsqir...

— de bêje.. di gorinê de tu çawanî, tu çawan li xwe dihesî.

— Niha qo ez tê de hînbûme, ne xirab e, rahet û bêdenge, lê dizanî despêqê de giran û gelec dişwar bû. Wî qerê girêdayî qo tabûta min bismar qiri bû bismareq li mejîyê min de jî qutabû.

Dizanim qo ne tîştîqî giran e lê ez pê gelec aciz dibûm.

Min jî xwe re digot ew bi kesdê wilo çebû, min bi eklû mejîyê xwe îşên pir zelaman xirab diqir dixwestin mejîyê min jî xirab biqin, û paşê qurm peyda bûn, ew jî îşeq bû. Ez hêdî, hêdî dixwarim.. gelec hêdî. Iblis digot:

— gotina te ye.. wisa dixwin, ma çî dixwazî, ew goştê tehl û weq zirav jî zû naye xwarin.

— Lê dizanî cendeqê min jî ne tîştîqî bû, goştê wî gelec qêm bû!

— Tîrç jî goştê we zeyde ir hezdiqin ne holê ye?

— Belê.. gotina te ye, ma çawan nizanîm, ew goştê me û gundê me û her-tîştê me hemî bi hev re zu dixwin!

— Pehîzê de gorin çawa ye, hêmi ye?

— Belê.. ne bê hêmi ye, lê mirov lê fêr dibe. Lê heq rastiyê dixwazî ez jî hemî tîştan zeydetir jî wan ehmekan aciz dibim qo tèn û di tîrban de digerin û ser tîrba min de radiwestin,

Lê dizanî ez nizanîm jî qî wextî ve ez mirî me.. êdî wext çî ye sehnaqim

— Ev çar sal in tu di axê de yî nîziqe bibin pênc.

— Holê ye? di vê navbirê de sê zelum hatin ser tîrba min rawestan yeqî jî wan navê min xwend û digot naveqî wisa min tucar ne bihîstiye. Nîq dilê min di vê gorinê de qes veşartî tune.

Çawa bibêjim dilê min gelec aciz bû, ez çend salan jî bo welatê xwe xebitime, piştî vê xebatê yeq têt ser tîrba min û dibêje, min navê wî zelumî tucaran ne bihîstiye û jî gotina wî derdiqeve qo ez di gorna xwe de ne veşartîme.. ma tîştên wisa tèn qîşandin.

Yê di navê min nasdiqir lê wî jî digot qo min xulamîtiya tîrç qiriye bila cihê min bibê doje. Yê paşî digot ew çikas bî ekl bû jîna xwe jî bo serxwebûna Qurdistanê xelasqir.. Her tengiyê de ma û wisan bê pere mir, qitêbên wî niho di gund û bajarên Qurdistanê de tèn xwendin, herqes hej wî diqe lê mirî jî pesnên xelqê û jî hej qirina wan bê hay e.

Divîya bû jîna xwe di xweşiyê de biborîne.

Wextê qo qetin nav bajar de Iblis guhdariya dengeqî qir û jî nivîsevanî re got bibihîse.

Nivîsanî guhda û bilîst şagirtên dibistanê yeq jî şîhrên wî distiran, pê gelec dilxweş bû û dîsa dest meşê qirin.

Xelq li ber qitêbxaneyên mezin qom bû bûn, qetin nav wan de û nivîsevanî dit qo yeq jî qitêbên wî bi herfên ziv û zêr çapqirî peşberê xelqî de ye, xelq bi çavên geş lê dînerin û herfên qitêba wî weq stêran dîteyîsin.

Qo Iblis şahîya wî dit pê dilxweş bû û jî re got:

— dixwazî em herin durtir; nivîsevanî got;

— No.. na xwazim, dixwazim bizivirim ser tîrba xwe; min dit qo jî bo min mirin nîne.

Vegera xwe de disau dibihîst qo zaroyên Qurdistanê şîhrên wî dixwinin.

*D. Zamiran Ali Bedir-Xan*

## Çarînên Xeyam

Delala qo dilê min jê re har bû  
Ciheq di de ji xemê re giriftar bû  
Çawan diqarim pê dermanî bigerim  
Dermanqerê me nesax û jar bû

Ber çavên qûrbînan çî spehî çî qirêt  
Warê dilqetîyan çî dojelî çî bihuşt  
Sitarên bêdilan çî etlas çî caw  
Bin serê dilqetîyan çî balîşne çî nivîn

Gava hevîna pêşiyê ez lihev dam  
Ji min re a berê dersa hvînê dam  
Piştî ji pariyê zêrê dilê min  
Çêqir mifteya gencîneyên manan

Ev qarwanê jinê ecêb dibore  
Ballide dema şahiye dibore  
Meyger xema xavîyan meqşine  
Bîne piyanê şev dibore

Dilê min tucar ji zanîne bêpar nebû  
Hindiq man veşarti qo ji min re qar nebû  
Di jina xwe a heftê û du salê de  
Jina min borî ket li min aşiqar nebû

Xwe bigire ji giyanî tuê dûr biqevî  
Li paş perdeyê weşartiyên Xwedê qûr  
(biqevî)

Şerabê vexwe tu nizanî hatiyî qû  
Dilxweş be, tu nizanî dê biçî qû.

Şerabê vedixum lê serxweşiyê naqim  
ji bilî piyanê destdirêjîyê naqim  
Dizanî kesda min ji şerabperestiyê çî ye  
Da qo weq te xwepereştî meqim

Dinê dîtî û her çî dîtî hiç e  
û her tişt qo gotî û bihistî hiç e  
Peqê dinê ser bi ser geriyayî  
An ji goşeya malê de rûniştîyî hiç e

Rûja qo hespê ezmanî tê de zîn qirin  
û Mîşterî û Pewîn rewşa wî qirin  
Ji diwana kezayê nesîbê me ev bû  
Ma gunehê me çî ye kismetê me eve qirin

## İbret

Eminê Ehmed hate quştin  
Kederê du mehan e, Eminê Ehmed,  
bi naveqî din Eminê Perîxan bi destê  
tirqan hate quştin.

Emin axa yeq ji axayên welatê me bû.  
Mina axayînen din ji tirqan re xebateqe  
mezin qirî bû. Digel hevalên xwe çeq-  
hilgîrên eşîra xwetda bû hev û çû bû  
liser rehmetî Şêx Seîd efendî. Piştî qo  
Şêxê rehmetî hate bidarve qirin Emin ji  
weq axayên din baz da û hati bû nav  
qurdên Cizîrê.

Pas çendeqê tirqan efweq belav qirî  
bûn. Emin û çend hevalên wî her tişt  
ji bira qirin û vegerîyan çûn ber destê  
roman. Wan yeqo yeqo ew axa wînda  
diqirin. Tenê Emin ma bû. Vê paşiyê  
dora wî jî hat û li ber çemê Bişêrtiyê  
bi du beriqên malxrab hate quştin.

Qurdino! de ji xwe re ibret bigirin.  
Eve qurd dibêjin: rih dibe bost ueyar  
nabe dost.

*Cegerxwîn*

Berî qo navê te ji dinyayê biçê  
Vexwe şerabê xema te dê biçê  
Qeziyên delaleqê ji hev biçê  
Berî qo laqê te ji hev qeve

Sernijdevanê rindên xerabat ez im  
Ji gotinên bê cih gunehqar bûyî ez im  
Ê ji vexwarîna meya zelal bê xew mayî  
û bi xwîna qezabê lavelav qirî ez im

Gulê got rûyeqî ji rûyê min spehîtir nîne  
Kevkas westa bûna gulavgirî ji bo çî ye  
Bilbil bi zmanê halê xwe got  
Ma ji bo qentîna rojeqê qî saleq negirî

Yeqî ji kehbiqeqê re got tu serxweş î  
û her gav di dawa yeqê de rewş î  
Jinê got: melayol herweqî tu dibêjtî mē  
Ma tu weqe xwe yî?

*D. Zamiran Ali Bedir-Kan*

# Tarîxeq

Sala hezar û sêde hem çel û çar û yeq ro  
Rabû ji kewmê qurdi siltanê textê xisro  
Bidin, mal û miliyet bi ilm û iz û hîqmet  
Şêxê terik û irşad ji nifşa qurdên Palo

Ev Ristemê zemanî Behramê wextê me bû  
Ji çar mehên buharê tirqan digel wî şer bû  
Çend keymekam û walî girtin di vê buharê  
Tirqan diqirne kîrin: eman! ji destê qurdo  
Pir qirin hileqarî tirqan di kewmê qurdi  
«Hey!» dane şêx û axan makûl hem ji  
(miro

Ev tevde çûn Hewarê wan xwe bixwe  
(hev quştin  
Li ser xwe qirin dewlet qurê xunxwa  
(Holoqo)

Sed Şah û axa û mir quştin ji kewmê qurdi  
D. ye selaê danin hem qindirê weqe mû  
Zaza fena pilingan bi şûr û dar û gopal  
Bi dengê miliyetê kîrin didane tirqo

Bi sond û ehd û iman rabûn digel vî şahî  
Berê xwe dane roman gazî qirin «iro ro!»

Lengê tifeng û topan diçûn semaê banî  
Xun bûn rewan ji xortan nil û firat man  
(co co

Hineq ji qurdê ehmeq xain dibûn didilde  
Ax! ew bedoê serserem, ax! ew bê bavê kaso  
Wan şêxê me girtin, derdestî tirqo qirin  
Wê rojê çel mucalîd xistin şerîtê barû  
Zaza Qurmançê jorin heta Cezîra botan  
Agir bi wan ve danin manendi nift û penbû  
Pivaz çî sor û qewr e her tebhê wê heraret  
Qurmanç çî dest û dijmin dujwarê qurê  
(Hirto

Mela û şêx û beg ler quştin serê di wana  
Liber tifeng û topan manendi gog û qaşo  
Ziqê jinan kelaştin zaroq ji wan deranin  
Ew dane ber sungîyan wan go «Hewar e  
bavo»

Pir û ciwan û bûqan bisqê xwe tev kusandin  
Wan şeng û şûx kamet ebr û hilalê rû rûl

Textes et Traductions:

# Besna

Ji devê Ehmed Fermanê Qîqî

Bi şeranî, bi delalî ji min ra dibên Besnayê  
Xwedîya qulan û derdayê  
Şêrina liber dilê xortayê  
Li min porsorê, porbelayê  
Li darê dinyayê tu nemayê  
Li mim qedqirî, tabwindayê  
Li min qihêla serê tewlayê  
Qaxez û nivîştê min windayê  
Qetim tora mêrê xerab  
Qirim bergîreq, ji bergirê tatayê

\*\*\*

Bi şeranî, bi delalî ji min ra dibên Besna  
(Xelilê

Bejna min zirav, nava min kendil e  
Meşa min, mîna werdeqên dora çeman  
Sing û berê min sipî ne, mîna çira şîr in  
Mîna sêvê Melotê, şevê qanûnan liber  
(serê nexweşan

Hem tîrş, hem tehl û hem şêrin in

\*\*\*

Min rebenê, min riseq diristî ji xubarê  
W' ezê bişînim ser hoste Melqo, culhê  
(bêxwedîya Darê

Bira çêqe ji Amûdê heta ber Enbarê  
Bavê min xêrê biqe, xêrê nebîne  
Çima ne dam torinê mala Hesen axa  
Ez dam Brahmê Temo, mîna qundê  
(kelaçan, mişqê ber qevare

Gazî diqirne barî yareb xuda tu zanî  
Em mane zar û mehrûm bê mal û  
(mêr û zaro

Min di yeqî ciwanmêr qo «ev xeber  
(me guhqer

Yanî (Evin Ciweleq) ev xebera go be go  
Dilê min her bû qebab ji eş û derdê  
(qurdan

Ji eşqê çesmê min xun bu Nil û Dicle  
(der bû

*Evin Ciweleq*

Nizam bextê min reş bûye, çima sipî nabê

\*\*\*

Ji min ra dibên Besna, Besna Eminê  
Bejna min zirav e, serê guliyê min şûsê  
(zivîn e)

Bavê min xêrê biqê, xêrê nebîne  
Çima ne dam torinê mala Hesên axa  
Ez dam Brahimê Temo, kelaçê Sirêçqê  
Çoqa min liser çoqa wî  
Niqare heyfa sevê ji min hilinê

\*\*\*

Navê min Besna ye. Besna Xelila  
Memiqê min mîna sevê Zinarê, paşqela  
(Merdînê)

Serî sor, qoq sipî ne  
Çavê di reşbeleg meşinî ne  
Zêrê enîya min Mehmûdî ne  
Mala bavê min ne bi xana Xwedê bê  
Çawa ez ne dam torinê mala Hesên axa,  
(apê Behrî)  
Ez dame Brahimê Temo, mîna gayê pîr e

\*\*\*

Birês, birês bi xumarê  
Ezê rabim cilê torinê xwe bibim ser  
(culhê Darê)

Mala bavê min ne bi xana Xwedê bê  
Çawan ez ne dame torinê mala Hesên  
(axa, apê Behrî)  
Ez dame Brahimê Temo, mîna mişqê  
(bin qevare)

Birês, birês bi teşiyê  
Sersotê nav heriyê.

\*\*\*

Werê kutiyê dilan veqin  
Ji derdê dinyayê, biqul û birin e  
Feleqa min dawî nîne, dinya derewîn e  
Bavê min xêrê biqê, xêrê nebîne  
Genim biqîne, zîwana reş hilinê  
Çima ne dam torinê mala Hesên axa  
Xortê di Omertyan, simbêlsorê ser xaniya  
Ez dam Brahimê Temo, mîna gayê pîr e  
Dranê wi qetine rîya wî a sipî di hinarê  
(rêyê min ra bûne)  
Çoqa min liser Çoqa wî  
Niqare heyfa sevê ji min hilinê.

### Traduction

Avec douceur et grâce on me dit Besna  
La possesseuse des douleurs et des souffrances  
La douceur des coeurs des jeunes gens  
O moi! aux cheveux blonds, aux cheveux  
[denoués]

Celle à qui rien ne reste dans l'univers  
Qui a agi mais dont les efforts sont perdus  
O moi! la plus noble jument du haras  
Dont la généologie est perdue  
Je suis tombé dans le filet de l'homme mauvais  
Qui fit de moi une bête de somme de ceux des  
[tât [1]]

\*\*\*

Avec douceur et grâce on m'appelle Besna  
[khalilê]  
Je suis svelte, ma taille est fine comme un  
[(can)il]

Mon allure est comme celle des canards des  
[bords des rivières]  
Ma poitrine, mes seins sont blancs, de la  
[blancheur du premier trait de lait]  
Ils sont comme les pommes de Malatiya[2] qui  
[dans les nuits d'hiver au chevet des malades]  
Sont aigres, amères et aussi douces

\*\*\*

Moi, pauvre je filais un fil de laine tendre  
J'enverrai au maître Melko, le tricoteur du  
[malheureux Dar [3]]  
Pour qu'il me tricote, (en tissus mes douleurs)  
[de Amoude jusqu'à Enbar [4]]  
Que mon père fasse du bien, mais qu'il n'en  
[voie jamais]  
Pourquoi ne m'a-t-il pas donné au gentilho-  
[mme de la maison Hassan agha]  
Et il m'a donné à Ibrahim Temo, pareil à  
[l'hibou des ruines, au rat des alentours]  
[du grenier]  
Je ne sais pourquoi, ma chance noircie ne  
[devient plus blanche]

\*\*\*

On m'appelle Besna, Besna Emine  
Ma taille est fine, les pointes de mes tresses  
[sont pareilles aux extrémités argentées]  
[des bouteilles]

Que mon père fasse du bien et qu'il n'en voie  
 [jamais  
 Pourquoi ne m'a-t-il pas donné au gentilho-  
 [mme de la maison Hassan agha  
 Et me donna à Ibrahim Temo de Siretch [5]  
 Mon genou sur son genou  
 Il n'arrive pas à prendre de moi la vengeance  
 [de la nuit

\*\*\*

Mon nom est Besna, Besna Khelila  
 Mes seins sont comme les pommes de Zinar[6]  
 [derrière la citadelle de Mardin  
 Les pointes en sont rouges, les souches blanches  
 Mes yeux bigarrés ressemblent à ceux des  
 [agnaux  
 La serre-tête de mon front est faite de l'or  
 [Mabmoudi  
 Que la maison de mon père ne voie pas la  
 [prospérité du temple de Dieu  
 Comment ne me donna-t-il pas au gentilho-  
 [mme de la maison Hassan agha  
 Et me donna à Ibrahim Temo, semblable à  
 [un vieux beuf

\*\*\*

File, file (la laine) avec réverie  
 Je vais me lever prendre les habits de mon  
 [gentilhomme au tricoteur de Dar  
 Que la maison de mon père ne voie pas la  
 [prospérité du temple de Dieu  
 Comment ne me donna-t-il pas au gentilho-  
 [mme de la maison Hassan agha, l'oncle  
 [de Bahri  
 Et me donna à Ibrahim Temo, semblable au  
 [vieux rat du grenier  
 File avec ta quenonillo, file  
 O tête brûlée, éfoncée dans la boue

\*\*\*

Viens, ouvrons les boîtes des coeurs  
 Qui sont à cause des douleurs du monde,  
 [pleines de plaie et de blessure  
 O sphère, je n'ai point de fin (d'avenir) le  
 [monde est mensonger  
 Que mon père fasse du bien et qu'il n'en voie  
 [jamais

Qu'il sème du blé et qu'il n'en récolte que  
 [du (ziwan) [7]  
 Pourquoi ne me donna-t-il pas au gentilho-  
 [mme de la maison Hassan agha  
 A un des jeunes gens Omerî, aux moustaches  
 blondes, debouts sur les terrasses  
 Il me donna à Ibrahim Temo, semblable à  
 [un vieux boeuf  
 Ses dents sont tombés, sa barbe blanche  
 [m'égratine les joues  
 Mon genou sur son genou  
 Il n'arrive pas à prendre de moi la vengeance  
 [de la nuit.

Besna était une jeune fille de la tribu Omerî, belle et séduisante. Elle était d'une famille moyenne et aimait l'un des fils du seigneur de sa tribu. Malgré elle son père la donna à un homme âgé, Ibrahim Temo, dont le nom se répète au cours de la chanson. Besna après avoir supporté cette vie, pendant quelques années, se fit enlevée par un jeune homme et se refugia avec lui chez les (Pendjinarau).

Cette chanson est très populaire en kurdistan et compte différentes variantes. La présente m'a été chantée par Ahmed Ferman de la tribu (Kikan). Une autre variante a été enregistrée par une compagnie de gramophone, d'après le chanteur (Isa Derwiche) de (Zekho).

(1) Tat: C'est la plus basse classe de la société kurde, classe qui n'appartient en aucun clan de tribu.

(2) Malatiya: Ville kurde située à l'ouest du kurdistan de la Turquie, renommée par ses fruits.

(3,4) Dar, Amoude, Enbar: sont des villages kurdes. Amoude actuellement se trouve en Syrie et est centre de Nabiya.

(5) Siretch: Village rocailleux des montagnes Omerî, d'où le mari de Pesna tire son origine.

(6) Zinar: En kurde signifie rocher, et est le nom d'un quartier de Mardin qui est situé sur un rocher, habité par deux tribus, (Dayichan) et (Mechkinan).

(7) Ziwan: plante parasite qui croit dans les blés.

بر ديلك

— ژ قدر بجان برارا —

آخ ولاتو آخ ولاتو  
 عمر ي من چوسى سال ددبت  
 باق و برين خوه دپرسى  
 هن بري نن هن كشتى نه  
 او خواهين شين گريدان  
 چاڅين وان گي هيسترخوين  
 دگرين ول خوه دخين  
 آف خبرا ژچه بيان  
 آف جوانا فلتيه  
 آف جوانا پسام ته به  
 لسر سران لسر چاڅان  
 بايي لته كر بوره بور  
 او كاغذاته آب خونين  
 قت مترسه خوه ي كرىه  
 رنج وتنگى مه پر كشانده  
 سازي ته گر نه دريژه  
 ژ رنج وظلما نياران  
 قدر ي برا آف چه حاله  
 شينا ابرو پر ل جى به  
 ظلما نيار ژيرا هاتو  
 من نه دبت روژلى هلاته  
 ابرو خبر ژوان هاتو  
 اوين دي ژي لسر شينه  
 ل لسر ئيگرو نشينه  
 تم دگرين ل خوه دخين  
 قدر بجان ژي پى دخين  
 ژ گوتنا بكي جوان  
 ژ دسبت نياري كردستان  
 او ژخوين و دمانه به  
 هاته جم مه ميقان مه به  
 او نالينه . . . قبي ژ ژور  
 ياني ئيدن هات سرمه دور  
 يامه دثي : ابرو هيحه  
 بزدان غفور ورحيمه  
 لي ژ چاڅان خونين دريژه  
 ام بون بيهوش كرو گيژه  
 نه هو گرمان نه هقاله  
 حتا قاتى باله

لاوى فندى

يا كرى خوه كر . ژيرا گوتن :

— توساخ كرى ته ماران پيشه دان . محمد دق . كره  
 بر بنا خوه . هنگا زاني بو كو درباوى ژ كودا لي كت .  
 رابو چو سر قلا مار گازي كرو گوت :  
 — برايي مار در كشه و ره مه زودا هقدونه دينيه ، ام  
 هقدو ببينن . مارسري خوه ژ قلى دريخست ولي فگراند ،  
 — ژ بردري يي من هره ، نه توتر باسپى ژير دكي ، نه  
 ازمري قت . . .

ع . مس

مزي ماران ژ نزايا خوه ، ب جفانا خوه قت نه شيورى  
 و ب محمد رابو دستبرك و ژيرا گوت :

— براوو دنپيکه من هيه ازي روژي زير كي بدم ته  
 چوزيرك ژ محمد را آني و محمد چوما لاخوه . هر روژا  
 خوه دى كاري محمد آف بو . مدكه پر نه آژوت محمد ب  
 پري مار دولمند بو . دل كر كوهره دان و ستاندنى .  
 بر بيا كوهره باني كرى خوه كر و گوت :

— لاوو امي هرن جبهى

او كرى داپى و چونه قلا مار . مينا دبنى مره فكي  
 لرو فكي به ميرك باني مار كر و گوت :

— مارو در كف درفا

مار در كت بردري ، محمد ژيرا گوت :

— فى كرى من قنچ ناس بكه ژ ابرو بشوندا هر روژي  
 زير كي بده كرى من مار گوت — رنده ، ازي روژي  
 زيره كي بدم وي

محمد ب كرى خوه فه فگر يان هاتن ما لاخوه و محمد  
 چو كرين و فروتنى . كرى وي لسروي قراري روژي  
 دچو زيرك ژ مار دستاند . لي پي رازي نه دبو . روژكى  
 ژخوه را گوت : « ازي فى ماري بكم و دفينايي ب  
 جاره كي بخوم » شورى خوه كر بن پاشلا خوه و چو سر  
 قلا مار . دل كر كوب بى بختى مار بگزه . شورى  
 خوه ژ كالان كشانده و داپشتاخوه . دنك ل مار كر  
 و گوت :

— آپو كا زيري برازي بي خوه بينه

مار زيرك گرت وهات نك كرى محمد . كرك شورك  
 آقپته مار . شورى وي سريكي مار قت كر و مار ب  
 دلكى شوتى لي فگريا و پيشه دا ، كشت .  
 جند كي وي لبر گر ماروژي ما .  
 شقانى هات ولاشى وي دبت . چو ژ مالوي را گوت .  
 مالوي هاتن لاشى وي برن تربكه سبى ژيرا چيكرن  
 و تيدا فشارتن .

پاش مدكى محمد ژ كرين و فروتنى فگريا هات مال . او  
 پرى كو دسني وي ده بون حمى و ندا كر بون . پرسپيار

میر محی

اری اف چند جارن خوه دی بی هاواری ژ خوه نده  
قائین خوه چپرو کین کفتناره دخوازه . ژ لورا از دخوازم  
ایرو چپروکا میر محی دناف رو پلین هاواری ده یدم  
بلاف کرن .

ایا میر محی یک ژ دلگپرو ائینداری ولاتی کردانه .  
ب خوه یک ژ میره کی هیزانی به . چاوان کوری سپی  
ومزنی ولاتی مه ب یک دفت و یک زمانی دیژن .

باقی میر محی میری ولاتی هیزانی بو . د ساخینیا خوه  
ده کچا برای خوه ژ کوری خوه ره بدو آرزایا خوشبو .

بلی هر دو بچوک بون باقی میر محی پستی چند سالان ب  
ریا در گاهی پادشاهی یک تاو خوه دای جهان ټه

مشیا و جانی خوه ئی شیرین سپارته آخا جابانا و تاجی  
میرانی سپارته برای ئی مائی ، پستی چند سالان میر محی

گها چاخ و بنگا خور تانی بی . چند جارن دستگرتیا  
خوه ژ آپی خوه خوه ست . بلی مامی وی هر دم ژیره

دگوت « حتا کوشهادنناما علوم و فنون دینی و جهانی نه  
ستینی از کچا خوه نادم ته »

ژ نه چاری میر محی بری خوه دا ولاتی جزیرا بوتان .  
سرا پیرا کته بن باری شیخ و ملا . ژ دبوانخانا درکت کته

ناف توزا مزگشت و مدرسان . چند سالان ژی عمری  
خوه ئی عزیز بقی آوایی در با سکر . پستی گو شهادنناما

خوه ستاند فکریا ولاتی خوه . هانه سر سوزا خوه ومامی  
خوه . ل دری بازاری هیزان دی خرگه له که مزن

ل ناف جابانا دا کتبه هانه مدرسا فقیان . ژوان پرسى  
گواف چي به گو « ما تونه زانی سینا کچا آپی ته مریه »

هی ژ نوئه آخینکه گران کشاند و بشونقه فکریا . ب  
سری چول و چیاکت . و دگریا ل بر تومی گیا کی

رونشت و خوشخوانکه گران ل سر سینا خوه گو تیه .  
پلین گی بی ژ بر دژوار یا اگری وی وه شیان .

ازی چند بندان ژ خوشخوانا وی ژ خونده فانان ره  
د فرده بیژم :

ازی هیزانی دجینم دو جارن تی بهاره

ازی و کی بلبل دخوینم ل سر گلان و خاره

ازی هرم سینم بیبیم دنیا منوینم اف جاره

مهی تول دنی دگریا کسی ندگوسینم نه خوشه

ازی دهاتم حجرو کی فقیبا د نقیسن کیل وفرشه

نئیهی بکم مارین مربیا بره نه خون ابروین ره شه

ته رو هیقا نوری نه شوقی دابه امتی

ته گردن شو شاهی شینه نقطه نقطه خال کنی

هچی سینم ب بینه بی شک دچه جنتی

چند جارن دگل ملا احمدی جزیری هتالی کر به .  
جار کی رشبلکک ژ بره شانديه . بندک ژي هیژ قایه دبیرا  
من ده به

سلاما من حقیری صدک دثی تیکن  
ایرو د جزیری حقه ل ملی کن

میر محی عمری خوه ب ائینداری و عشقبازی ل شاخ  
و چیا بین کردستانی بهر تیه . رحمتا خوه دي لی بت .

سر پی هاتی بی میر محی دناف کردا ده بی ژ مارهنه . لی  
فرده لث نائینه گوتن . اگر خوه دی بقی ازی چنده کی  
دي ژي بلاف بکم .

میر محی عمری خوه ب ائینداری و عشقبازی ل شاخ  
و چیا بین کردستانی بهر تیه . رحمتا خوه دي لی بت .

سر پی هاتی بی میر محی دناف کردا ده بی ژ مارهنه . لی  
فرده لث نائینه گوتن . اگر خوه دی بقی ازی چنده کی  
دي ژي بلاف بکم .

میر محی عمری خوه ب ائینداری و عشقبازی ل شاخ  
و چیا بین کردستانی بهر تیه . رحمتا خوه دي لی بت .

سر پی هاتی بی میر محی دناف کردا ده بی ژ مارهنه . لی  
فرده لث نائینه گوتن . اگر خوه دی بقی ازی چنده کی  
دي ژي بلاف بکم .

تر باسبی و ماری قت

مرهٔك بناقی محمد روژ کی چو گشت و سپرانگاهی .  
لجیکی ب آف و بگل و گیا . جقاتکه ماران دبت . دناف  
جقاتی دا مارین پرستور و دوسری هنه . ژ ماران پرترسیا .  
کر کو وی جقاتا ماران بدریکی بکزه . لی نه دقداند .  
دا عقلی خوه و کور فکری . ددلی خوه دا گوت : « از  
ایرو فی جقاتی ب عقلمندی بلاف نکم ممکن نینه وی  
روژه کی من بکزن ، نافی من ژ دنی راکن » سرفی یکی  
بانی مزنی ماران کر و ژیرا گوت :

— شاهی ماران کیفا من پر ژ جقاتا وه راهات .  
از دخوازم به برا کی دینم :



له بو جقا تملتان

عصبة الام كومه لي كه وره ؟؟  
 به پيچو په نا به فيلو دوره !!  
 له دور به دورو بو حقي كوردان  
 تكانت ادا خوت دا شرنگان  
 به جوشو كول بوي بو كوردی هه ژار  
 اتگوت ام قومه اكه م رستگار  
 لوجنه ی انتداب مرخصی هات  
 كه را كشي كرد سراسر ولات  
 اگر راست نه كه ی هه لي سورينه  
 به س بوسياست هلمان په رينه  
 (طریق نايتمو توجیت پی اكهن)  
 (كوته کی دستی میستر هندرسن)

۲

خوتو وصی بوی نه قوام بون هه تید  
 دمی كوردت كرد به ته له ی ته قید  
 غایه نسطوری ناوی كورد بردن  
 لایق به خوته پیچو ناو آخن  
 تاتو نه كه رای به نا و ما نا  
 دستمان گرتبو به كلا و ما نا  
 بوچ كوردت فوتان بم به ندو وباره  
 ایسته له (ژونیوه) خوت ملدس داوه  
 منشای فتنه كومه لی تذویر  
 وا ادی حقی اقوامی صغیر ؟  
 كومه لی فساد معدنی محن  
 (كوته کی دستی میستر هندرسن)

۳

بواقلیات كه و تیده سما  
 خزمی نسطوریت له كوی بنیاله نا؟  
 هه به هیچو پوچ بم دنگو باسه  
 نوخوبنی كوردت بو كرده كاسه؟  
 هر چوار اطرافان لی بو به دژمن  
 ایران و تركو عاری کلكن

نفوسی ایه كه م نه كه بته وه  
 وها نسطوری ربك نه خیته وه ؟  
 له عدالته اما كه ی دا به  
 یاخو هر شیوه و اصولی غر به ؟  
 كارخانه ی فساد جیكه ی مكرو فون  
 كوته کی دستی میستر هندرسن

۴

له عدالتان واقم ورم ماوه  
 له سیاستان سرم سور ماوه  
 خوینی ملیونی كورد نه رژی بی  
 بو اما نه ختی تورك به ترسینی  
 خوینی مظلومی كوردی روت وقوت  
 حلاله له لای عاره بی لنگك روت  
 له سلیمانی جاده برسرا  
 بچو بناوی كورد آورسین كرا  
 تونه بی نایكا دشمن به دژمن  
 حق بو نسطوری ایه بو كوشتن  
 چون عاجز نابی لهم خوینر شته  
 له لای توالت حقوق كوشته  
 نا ترسی تاریخ لعنتت بكهن  
 كوته کی دستی میستر هندرسن ؟

سلام

سزان

لو میرو لولو میرو!  
 رو دهاتی نمیزا نیرو  
 اودا میری من بسورنگه  
 حچی دوستاوی فرنگه  
 عمری وی عمری قلنگه  
 لو میرو لولو میرو!  
 رو دهاتی نمیزا نیرو  
 اودا میری من بجنه به  
 حچی دوستاوی فله به  
 عمری وی ژ عمرا زبده به

هی ۰۰ دنیا فانی

هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 بی كو نو چيكر قانونك دانی  
 گوت «هرچی بایی عشقی لوانی  
 » گرك تم بژین بشا دمانی «  
 مخابن ، هیهات ! او گوتن نه ما  
 او پیمان زودا كت آقین چا  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 لال مبه وسان او قرار كانی ؟  
 ب هیژمار ابروشش و نیف مهن  
 نرزاد و نهپهر لدوری هفن  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی ،  
 ل مه عاشقان كا دلوفانی ؟  
 نزانم چه بو او بژنا زراف ؟  
 پیدا كرمان آخ ! ژانا زراف ،  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 او شنك و شوخی قامی كانی ؟  
 هس ان نه هشت قط نابن شفا  
 او چاقین درش خزبنا و فا  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 پر ملول مه كه قی شیرین جانی  
 او رخی روبان وك سیقین خلاط  
 سور و زردبون هرلی روز هلات  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 ایرو دور كتم ژوی زمانی  
 وی عشقی و بواخ ! گرفتار كرم  
 آقینك نهبو بر بیندار كرم  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 دبندارا یاری درمانی جانی  
 آخ مكه (نوزاد) ژبوته شرمه  
 داوپا وا هی پرتا كه گرمه  
 هی دنیا فانی ۰۰ هی دنیا فانی  
 زیر وزیر به او چرخا خامی  
 نوزاد

### شينا خوالی من

د سسی بی حزیرانی ده ، لـ آزمانی کردان ، طوفانک عجیب قومی ؛ هستیر کهک پر بشوق و پر بنور ژ نشکاکه ر ژ بیا ، خیدی ، خوه دا ربا دنیا که دن و نه هات !

ژ برقی حالیه کو ایرو لـ دنیا مه روناھی کیم ، حزن و ملال زبده تر بویه ؛ اهلی دنیا کردان — نمازه روشنداری ژ روشوا وی هستیر کی — کذب برین و دل بچوین مانه . بک ژی ازم ؛ باغی گیانی من مژ غماما شینی گرتیه ؛ هندری من ژخم و خیالان جابجان زبون و بر بنداره .

گلوچه بو ؟ ماهین دی چه بیه ! خالی من ، ولایتی من ، ماموستا و ربیری من دستی خوه ژمه قطاند و کت بن آخارش و سار . هه یواخ ! هه یواخ !

خالیمن ژ باقانده خصمی من بو ؛ لی روزا کو از آگاهی چی بی و خرابی بی بوم او بو دوستی من . ژلورا کو ، لیتپرور کی هیژابو . ترسا باف و بری من ، ربیامن لسر مالای نه یزی ، مهدبدی مروقی من سته و رمان . من بروحی خوه ژه او د پاراست . وی ژی بدلی خوه ژه ژمن حزد کر .

گلو ژ بوچه ولاتی خوه بی بهشتین ترک کر ، دست ژ خانان و شانشینی خوه کر و هات لقان چول و چپالان در بدر گر بیا ؟ وی بچوه اف پرس ژ خوه نکره بو . عشقا ملیتی هر نشت لبروی بی قیمت کر بو . هاتبو خبانو ولاتی خوه ، تولا کشتی بی ملتی خوه . هیهات ! خدی پیره نه برسری ، پیتا آگری هندری وی او کشت ، مرازی وی بویره چو گورنی .

نو ! نو ! نه مرازی وی نه او بچوه ژی نه چونه گورنی . مرازی وی مرازی مه ، مرازی گشکان بو . ژلوراب مره ، دمه ده دژي و حتا روزا پاشین ژي دي بژي . بچوه ژي نه چویه گورنی . ژ بر کو هر چي دري یا ملتی خوه ده دمرن لاشی و ان بکفه اردی ژي کیانی و ان بر بـ از منان ژه بلند دین و او بچوه دـ دلین ولاتی بین خوه ده دژین .

افندی د لا وایا خوه ده کرد پرور بو . دتار کی ده جفانا کردی لدر بیکي اشکره فکر ، او بچوه بو سروروی

جفاتی ، ژ هر آلی لبات (اعضا) جفاندن . پری ژ بهاتیدو ، هیژ بیست و چار پینج سالی بو ، بو سره کی دو می عشریان . مأموری تر کو د دستی خوه دا ددالستن . دشری شیخ سعیدی رحمتی ده چقاس بک و آغابین ولاتی مه و نیزنگی مه هتهب بیائین خوه ژه چونی همبری شیخ . لی افندی نه چو .

بسر دا بچند بیائی خوه ژه درکت چپائی مازی . آژوت سر قره قولا کندی (شواش) بی . عسکر و جبخانا و ان دیل گرت . گگاڤا شهیدی شبرین کمال فوزی بک هاته گرتن افندی بهیست کو اوی کمال فوزی بک در بیا سیوره کی ده بین انادولی . ژ بر بهیستناقی خیری برای خوه صالح بک (اؤزی بو شهیدی ملتی خوه) بچند بیان ژه شاندر سرربیا سیوره کی کو کالی فوزی بک ژ دستی نیاران بد خینه .

لی صد حیف در بیا خار پیتی شاندر بون .

د پپی شکستنا شیخ ده سروروی دلال ژی برن بر پرسیاریا استقلاللی . لی خدی ژوی آفاتی خلاص کر . شوندا سور گونی انادولی کرن . لوی ژی راحت نه دسکینی ؛ هقالی خوه بی نزان ابقاظ وار شاد د کر ، ب هقالین زانارا جفات چید کر . ژلورال جیکی سکنایوی تونه بو ، دو روزان لچیکی نه دما . ب دره که دتفه دشاندن .

پشتی عفري دیسا هات ولاتی خوه ، خورت لدورا خوه جفاندن . بجفاتا مزن ره مخا بره کر . ژ خور تین دورا وی بک ژی از بوم . تشتکی وی ژمه قشارتی تونه بو . گگاڤا کو هاته سورینی خبر دامن و چند هقالان . لی هر وکی هاواری نفیساننده خدی ژ تو وان را لهد و نه آنی .

بری وی بژیره راست کرن ، پشتی هانناوی زارو کی وی ژی جانی خوه خلاص کرن . لی دفقری و زلولی . سالک نه چومن ژی دادو : مه ل حسچی هقدودیت ژ بر کو برازیکی وی مامکی مه کشتبو ، نا قهرامه پچکی سار بو . لی دهات سر کردیتی بی ژبری گرمتر بو .

افندی بیگان هیژابو . هقالی وی کیم تبینه دین . ژ بو قی وفاتا حزین شین و گری ، رشگر پداین لهر کردی خدان رومت دکفه . خدی رحما خوه لی بکه مه ژی بر حماوی شا بکه . . .

فری جان

آخ وگسر

از مان هشین	أم نه خوه شین
از مان بستیر	أم مان بی کیر
از مان گرگر	أم مان بی خیر
از مان بدنک	ام مان بی رنگ
از مان زلال	أم مانه لال
میر گک و کانی	ما باق کانی
لات و زنا ر	کا دوست و یار
و لات شپال	أم کرن کال
بیر با ولیت	آگر و پیت
سپیان خلات	ما کا ولات
کر کوک هقلیر	لی بی سر بیر
شرفنج جزیر	أم کرن پیر
خوخ و مشمش	أم مان بی هش
شسیر و پلنگ	بی دست و لنگ
نیار دو سستی	أم ئی خستی
نیار بربیر	بدست و شسیر
بی تیر خنجر	أم کرن در
دوست و بران	کوشتن بران
دوست و بران	جه کر نه خان
شیخی بو طی	میلک صوطی
شیخ بو آرانج	خلک بون سرتاج
شیخ بو برین	خلک پی کنسین
دوست تی پری	سر ژنی فری
فند و شمال	ریکه ت ژمال
چو گورا کویر	أم هشتن دویر

مصطفی احمد بو طی

له دنیا شاد و خندان و بلندو به ختیار یان که ی  
 خدا یا کامران سه رفیراز و یا به دار یان که ی  
 نه وه ی شیران کوردان یعنی خیزانی بدرخانی  
 کو یسنحتی : ۲۴ کانون ئانی ۱۹۳۳

لا و بی کورد عوفی

بری سعی وفد اکاری گلی شیرینه وک شکر  
 وطن پرور عزیز و گه وره به زور برزه عنوانی  
 تماشای خاکی ژیر پیمان له بو ام خله جی نیژه  
 کسی ضرب و شانده معلومه بو خوش ضرب چیره  
 اوی روژی که قومی قور به سه ره به د کرد ره دیره  
 نتیجه ظلم و خون ر بڑیش نیشانه محوی خونین ر بڑه  
 رواء روژی ستمگر حه رتانه و هه ر پریشانی  
 که سی مژده حتی مه رگرت اگه ر صدسال بی بک روژه  
 کلانی منجلی میدان به حفت سال نهک به بک روژه  
 که س بابی به کوژرتین هه مور و ژ هه راول دوژه  
 کوشنده حتی کوژرانه سگ هار عمری چل روژه  
 نصیبی ظالمیش محو و فنا به و خانه ویرانی  
 له تار یخدا چلون معلومه مظلومی سه را باسور  
 اوی ظالم یورویی سگ رفیقی بیت و گورانگور  
 له شاهی راست امه تیان ابو شاهانی صاحب جور  
 له اخردا نه بی لت کراضحاککی انسان خور  
 به دهستی کاوه بی آسنگرو اتباع و خویشانی  
 له سه ر کورد لازمه امر و بناسی گه وره کانی خوی  
 قیاس لی بکات ژینی قدیمی وزلت امری  
 به گه وره و گچکه وه یکتا بناسن شاه له گل ا کوی  
 افه رموی حضرة زرده شت له اویستا که وه ختی خوی  
 کتیبی دین و دنیا بو له لای ما گوشو آترانی  
 به امیدم له لای په روه ردگار و حضرة بیجا  
 که کوردان سه ر که وی پیاوی کئی گه وره بی شاهنشاه  
 قناره هل بخا بو چند حسود و خائن و بد خواه  
 نهایت اهل مندهاردی له ترمی هر مزی خیر خواه  
 به دوزخ شادابی روحی خبیث و جمله دیوانی  
 دنی غیری به ایرادی و طمان زور هوس ناکا  
 له بو ایمه به چپی ماء مزرعه و مرعی له م خاکا  
 له بو ژینی سه ره رزی ایمه هه ر وهاچا کا  
 له پاشی مدح و ثناء بو کومه لی عالی وهاچا کا  
 بکه م بو عزة و اقبالیان توی دعا خوانی  
 اوی دشمن به کوردانه هلاکی ژهری ماریان که ی  
 خدا اوقه و مه نازداره که حفظ چاوه زار بک که ی

### وفدی گوردستانی

وفدي كوردستان وطن فروشان  
 هه رزه و كيلي شاري خاموشان  
 پاشه به ره ی باغ ويران وطن  
 چون بايقوش به حالی وطن خنده زهن  
 دهسكي له و گوله ی باغچه كه ي سه را  
 كه به خوبناوی ملت آودرا  
 بيه ن به پيشكه ش عرشي عراقی  
 بلین یار باقي هم صحبت باقي  
 تارای خوینی سوور به رن بو أمير  
 بلین پاش كوشتار هيشتاتوي دلکیر  
 دهك خجالت ين له روی محشردا  
 ايمه خاکی غم ده كه ين به سه ردا  
 ايوه نه وعرشه ي به خونين گولره نگه  
 سجده ی بو ده بن هيچ نالین نه نگه  
 خرجرا كه تان ماره پیتانه  
 خوینی ملتسه نهو ضیافتانه  
 دلتان خوش نه بی شه ری كاورانه  
 خوینی سیادهش خوینی كوردانه  
 كوردنا بزبته وه خیالی خاوه  
 براتی بخت به خوین نوسراوه

من بو به رهنگی سورم خوش نه وي  
 مژده ی شفی لی دهر نه كه وی

#### بیره میرد

اڤ شعرها ژوی وفدي راها  
 تېونفيساندن كوپاش كشتارا سلیمانی  
 یی در كتبو پيسشیا قرانی عراقی وچوبو  
 دست وداواوي .

### تولا بافان

ل با كوروان آرزل نیفر وسپیان  
 پینج سالان لیل بو آلامه كُردان  
 برهو كُردین خوه شه، فرزند ه احسان  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان  
 كردستان ژواندن فان هر می شیران  
 بری مه ل آرمانجی، پشنامه لیزدان  
 لپیش مه راهه سستی ولات، كردستان  
 دستی مه ب خنجر دفتی ده قرآن  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان  
 كردستان ژواندن فان هر می شیران  
 هر دم ب موران مژ، بر فدا گری داخ  
 نیاران كر ولات زلول و كامباخ  
 مافی ناموسه ام كو ببینن صاخ  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان

كردستان ژواندن فان هر می شیران  
 هفت سالن ل كرتی بورینا میران  
 ملین خوه دانه هفت هر وکی شیران  
 لسروان گرمینان طوب و خمه بران  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان  
 كردستان ژواندن فان هر می میران  
 چك و پوساتین خوه هلمگرت یلز  
 نه چیا و نه دشت هون مه بین ب بز  
 تشا ایروم ل مه بو به فرز  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان  
 كردستان ژواندن فان هر می میران  
 از دكه هرم فنا گرم مال  
 یادی نوقت میبژ كا كوچو (هقال)  
 ژبونا من بسن كردستان و آل  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان  
 كردستان ژواندن فان هر می شیران  
 دی بزوری یگرم كردستانا خوه  
 ازی داچكتم لسر آلاخوه  
 هنگا تولا بافان تیخم بالا خوه  
 زو پروت زو پروت ای لاوین كردان  
 كردستان ژواندن فان هر می میران

### هقال سگری

به قول عارفان صاحب امیده بویه مسروره  
 به تاریخ و به علم و تجربه معلوم و مشهوره  
 كه حق ژیر ناكه وی تاحق ضعیفه و سسته بنیانی  
 له مرشانی كس امكانی بی جهد وطن فوضه  
 له نیوام ملت ه ایوه ن رشادتان بصد توزه  
 نوئه آل بدرخانی له جیگه ی حضرة حمزه  
 له قلب ملت كورد موقعی ایوه گلی برزه  
 بلند ترصد هزار دفعه له نوشیروانو ایوانی  
 سبب هر گوشه لایق ابی بو ناجو افسر  
 له تاریخدا تماشا كهن چه ملت پرده ره حیدر  
 كه زاخی خوین له خنجر دا بچوری در كه وی جوهر

و كو معلوم و مشهوره اویش گوربگی گوردانه  
 بلی كورد زور قدیمه صاحب مردانی میدانه  
 به شاكاری بلندتان روحیان شادانو خندانه  
 صلاح الدین وحاجی قادر و شیخ احمد خانی  
 امیدم وایه ام كاره كه ده یكه زوت هلمستینی  
 له ناو لا فاوی جهلا دسته گیرت لی درت بینی  
 بشرطی شیشه ی جهل و نفاقا بینی بشكینی  
 امین آخری ام عزمه تان روژی اخاقینی  
 چه روژی جژنه کی خرشته له سه دنوروزی سلطانی  
 له نیو جمع ملل امر و كه كورد مظلوم و مغدوره  
 او اناحق سري هلداون حق مفقود و مستوره

### بوخا و له نې هاوار

هرايوه ن خانه دانی ملك و ملت مير جلادت بك  
 هرايوه ن فخری كورد صاحبی غیرت مير جلادت بك  
 له پاشی او هراتوی ارکانی دولت مير جلادت بك  
 امیری محترم ای فخری ملت مير جلادت بك  
 نوۀ شیري جزیر وقهرمانی ملكی بوتانی  
 له دنیا دا هر ايوه ن ناوتان لایق به تسجیله  
 تمنای سرنجوبی ملتی كوردت به تعجیله  
 له سایه ی لطفی ايوه . محنت و شادی كه تبدیله  
 به راستی خاندانان لایق تعظیم و تجلیله  
 له سر كورد لازمه دائم بكا عرض ثنا خوانی  
 له فكري كورد بچر كوگه وړ . هم نقشه كه بستراوه  
 به فرمبسكي هزار چاوي خویناوی نه شوراوه  
 امه كار بسكي پیرانی قدیمه تازه و تراوه  
 له ناو قلب همولا و بكن كورد ام شعره نومسراوه  
 كه شایسته ی سپاسو شكره فامیلیای بدر خانی  
 له میره كان تاكو ایستانا دگاته پیرو پاشانان  
 نیه مانندی هم شاهه فدای بی سر وتوجانان  
 صلاح الدین كه دنیای گرت امه ش برهانی حاشانان

آ - گر - ب - کور - دس - تا - فی - کت  
 لو - را - د - کت - هه - وا - ره - دل  
 هی مامستا خلکی پردي \* شوره کیشا له دو گردی  
 هی - ما - مس - تا - خل - کی - پر - دي  
 شور - ده - کی - شا - له - دو - گر - دي  
 هر لنجه خانم لنجه به \* لنجت به نوکی پنجه به  
 هر - لن - جه - خا - نم - لن - جه - به  
 لن - جت - به - نو - کی - پن - جه - به  
 ژبونا ایرو اچنند . ژخوه اف لی لی یه ، هکه خوه  
 ندانین هاواری پی بندوار بون ، لولو ل پی به .  
 هر وکی خانی بی رحمتی گرتیه :

چې بكم كو قوی كساده بازار نین ژ قماش را خر بدار

بگر فوین

له ناو تاریخي ملت قهرمانی جدی اعلانان  
 امند مشهور ومعلومه نیه حاجت به اعلانی  
 نه بو شخص بكا سعیی له دنیا بو نجاتی كورد  
 له دنیا دا هموتا لا نو كشنن بو براتی كورد  
 به غیر از ايوه کی ماوه سعی كابو حیاتی كورد  
 هرايوه ن گه به شیر وگه به خامه بو نجاتی كورد  
 سرو ماتان فدا كهن هرله بوتان تاكو بابانی  
 بدو نیکی منالی گربه پیری بی علا متدا  
 له كس نابی سوال بكری له پایانی قیامتدا  
 امه پشمه حیا گیره امه راسته جوابتدا  
 له خوابی دل به بدنای له ژیر ظلمی اجانبدا  
 نه ما بو زهره وجدانو ملی ونوی وطن دانی  
 حیف بیهوده بو چند مدتیكه لعلو گر هرمان  
 نه بو قدری له لا مان چو پنجورا معدن زرمان  
 اویستا گر علاجی كه یین به نیزه ونوکی خنجرمان  
 له آغاتا كو نو كرمان له تاجر تاكو رنجبرمان  
 هو مستو خرابات بون به باده جهل ونادانی  
 امه پشمه دلین شیخی له مویش صاحب ارشاد بو  
 اوی آغا وبك ومیر بوسپا هی جهلی امداد بو  
 فقیر وبی بها ما بو اوی دانا واسناد بو  
 غروری قومی حب وطن وك كفرو الحاد بو  
 شرف تنها عبارت بوله جی خیل تورانی  
 هتا ایستابه هاوار وبه افغان بوجی هلاستان  
 اگر مردوی قبرستان بان له بر تاثیر هلاستان  
 اویش خوی هاته میدان نره شیرو رستمی دستان  
 هتام نره شیرانه گیتان گشت له هلسان  
 چه كرمانچو چه زازا نادگاته لورو گورانی  
 هو واچاوه ری لطفی اتون ام كورده بیچاره  
 فلك پا بندی كردوون به زهری قاتل احجاره  
 دبا سعی بكه یین گه وړه و بیچوك مردانه له م كاره  
 له سایه ی بزمو رزمی ايوه ملت زهر امید وراه  
 نجاتی بی له پنجه ی دژمنی بی دینو ایمانی  
 كه كوردستان چیا كانی هو آناری ساسانه

عبابی عبابی \* گوری مه رادایی  
 عه - با - پی - عه - با - پی  
 گو - ری - مه - را - دا - پی  
 له سفاندا له سفاندا \* که زهك له روخاندا «صورتی»  
 لهس - فان - دا - لهس - فان - دا  
 که - زهك - له - رو - خان - دا  
 اری سوارو ته چقاس هسپی شهس موڤك دبتن تو  
 کاری ل وان سوارو بیژی اف هسپی لاغره .

هسپی سڤك

او هر دو هسپین کو چون دناق کرمانجان ده کیمن  
 و هندك مرهف کارن وان بیزینن . بلی اف هر دوین  
 کوتین دناق کرمانجان ده پرن و هر کس کاره وان بیزینی .  
 هسپی سڤك دو گاقان داقیره . هر گاقکی حفت موڤك تی ده  
 هته . ازی ژوه ره چنده کان ژهف کتکی بکم . ایدی  
 هون کارن ژمن چپتر و بهتر باژون و بیزینن .

گاقاپیشی : زه کوزه کوزه ینی  
 گاقاپاشی : هات کار وانی حاجی

موڤك : ۷ زه - کو - زه - کو - زه ی - نه - بی  
 موڤك : ۷ هات - کار - وا - نی - حه - له - بی

هی هاتن هاتن هاتن \* کوچرژ زوزانان هاتن  
 هی - ها - تن - ها - تن - ها - تن

کو - چرژ - زو - زا - نان - ها - تن  
 ده یار ده یار قدره تی \* طوبا خوه دی لی کتی

ده - یار - ده - یار - قد - ره - تی  
 طو - پا - خوه - دی - لی - که - تی

لی تیر گری کو چری \* ترس باقی کو چری

لی - تیر - که - زی - کو - چه - ری  
 ته - رهس - با - تی - کو - چه - ری

خم خمی طوری بانی \* کشو کاسری بانی

خم - خه - می - طو - ری - یا - نی  
 که - شو - کا - سه - ری - با - نی

فرحو باقی عزیزه \* چوژ تالانی بوژیره

فر - حو - با - تی - عه - زی - ره

چوژ - تا - لا - نی - بر - ژی - ره  
 آخو امان چچانی \* کچا احمد کیانی  
 آ - خو - ا - مان - چه - چا - نی  
 که - چا - اح - مد - که - با - نی  
 دفرده از نه کارم هسپین سڤك تغان گریدم . اگر فلکا  
 مال خراب و ستمکار پری چرخا خوه ل من ندی  
 ازی ژوه ره دورو درپژخوه شخوانین کردی تغان کوم بکم  
 و ژوه ره بلاف بکم . آخ آخ سوارو کرمانج دبیژن تو چه  
 بیژی ل بژنا سواری مه تی .

هسپی روان

هسپی روان پری جاران پالغان و خوشخوان کو دبیژن  
 هسپکی شیرینه ، سرنر مه ، روانه و کی آقا گران دبیژی ده  
 بالا خوه بدی سرارو دلالو .

هسپی روان دو گاقان داقیره . هر گاقکی هشت موڤك  
 تی ده هته . ازی چند کان دیسا کت کتی بکم . هونی ایدی  
 کارین بی سرگیژی و دل ایشی تغان باژون و بیزینن  
 گاقاپیشی : بژنا زراف شفا زیرو  
 گاقاپاشی : پوزب قولی خزیم تیرو

موڤك : ۸ بژ - نا - ز - راف - ش - فا - زی - رو  
 موڤك : ۸ پوز - ب - قو - لی - خه - زیم - تی - رو

مه چه گوئی تو غیدی \* آقا گولال مه جمدی  
 مه - چه - گو - تی - تو - غه - پی - دی

آ - فا - گو - لا - له - چه - مه - دی  
 سلاما سن سنا خوانی \* سحر که که هر قشان بت

سه - لا - ما - من - سه - نا - خوا - نی  
 سه - حر - که - که - هر - فه - شان - بت

گوندو بیری بیری \* گوندو بر خو بانو بیری  
 گون - دو - بی - ری - بی - ری - بی - ری

گون - دو - بر - خو - پا - نو - بی - ری  
 وی لسر یانی چک دشوشنن \* زند و بازن نف هلمشستن

وی - ل - سر - با - نی - چک - دشوش - تن  
 زند - و - با - زن - نف - هل - مش - تن

اگر بگردستانی کت \* لورا دکت هواره دل

# هاوار

## کوقارا کردی \* مجله کردیة

### هسپین هوه سخوانین کردی

ب ناڤی یزدانی پاك ئی دلوقان ومهربان  
 نو بزان ژربقه هسپین هوه سخوانین کردی چارن .  
 ئی ( چلنك ) و ئی ( لاغرا ) و ئی ( سڤك ) و ئی ( روان ) .  
 هسپیی چلنك در گاقان داڤیژه . هر گاقی پینچ موڤك  
 تی ده هنه .

ئیی لاغردو گاقان داڤیژه . هر گاقی شهش موڤك تی ده هنه .  
 ئی سڤك دو گاقان داڤیژه . هر گاقی حفت موڤك  
 تی ده هنه .

ئیی روان دو گاقان داڤیژه . هر گاقی حشت موڤك  
 تی ده هنه .

از هیڤی ژهڤال وهو گرگن دكم اگر کیمانی بك دهسپین  
 من ده دین بره راست بکن و درباس بن چکو هسپیی  
 چی ب کتنکی فهیتکار نایی .

اری از ی ژوه ره چند کان ژهڤ کتنکی بکم کو  
 وه ناسکرن . باشی هونی ژمن بهترو چیترو بیزین .  
 چکو هون ژمن بهتر ل فان سوار بونه وسواردین .

### هسپیی چلنك

گاقا پبشی : ازو دلالی

گاقا پاشی : چونه قرشکا

موڤك : از - و - ده - لا - لی

موڤك : چو - نه - قر - ش - کا

مالی مهل مصری \* کونی مهل عبری

ما - لی - مهل - مص - ری

کو - فی - مهل - عب - ری

شپل زیرینی \* شپل ملانی

شه - پل - زی - ری - نی

شه - پل - مه - لا - نی

کچکی ته بدنه \* میری جزیری

کچ - کی - ته - بد - نه

می - ری - جه - زی - ری

اری سوارو چقاس هسپین و کی فان ته دین تو کاری

بیژی اف هسپیی چلنکه مادو گاقه پینچ موڤکه . و کی نهافان چند

هسپین کو ب شونقه تین .

دستار گریال \* دورا باژ پرو

لولو پسامو \* لازم ب لازم

ده هورک هورک \* هورک ده فیا

### هسپیی لاغرا

هسپیی لاغردو گاق داڤیژه . هر گاقی شهش موڤك تیده

هنه . از ی ژته ره چند کان زی کتنکی بکم . ایدی

تی ژمن چیترو بهتر کار بی بیزینی .

گاقا پبشی : بشارو نه ماوو

گاقا پاشی : دورا کوند گریاوو

موڤك : ۶ ب - شار - رو - نه - ما - وو

موڤك : ۶ دو - را - گوند - گر - یا - وو

کنم دربر نام \* کنم کنم لی لی

که - نم - د - ریژ - نا - بم

که - نم - که - نم - لی - لی

کال کالی قرچکی \* کال میری کچکی

کال - کا - لی - قر - چه - کی

کال - می - ری - که - چه - کی

تكملة جغرافيا ومطبوعة  
**أبو نعيم الإصطخاني**  
 حفر جميع المعادن والصور الملونة واللوحات الخارسية  
 لطبع بطانات وادريبات بحروف نانزة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب  
**أحمد نافذ**  
 اختصاصي بالأمراض الداخلية والزهرية والأطفال

جزيرة

اندبول

الطبيب  
**محمد مصطفى**  
 الاختصاصي بالجراحة وأمراض العيون وجراحاتها

صالحية

دمشق

## اشترابات مجلة هاوار

وفي غير هذه الأقطار

عن سنة واحدة	١٥٠ فرنك
عن ستة شهور	٩٠ فرنك
عن أربعة شهور	٦٠ فرنك

في سورية وتركيا والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس

عن سنة واحدة	٥٠٠ غروش سوري	— ١٠٠ فرنك
عن ستة شهور	٣٠٠ غروش سوري	— ٦٠ فرنك
عن أربعة شهور	٢٠٠ غروش سوري	— ٤٠ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة: الامبرهات عالي يدرقان دمشق — حارة الأكراد



# هاوار

## کوفارا کردی \* مجلہ کردیہ

### تیخستیپین کوفای

- |                      |                        |
|----------------------|------------------------|
| جگر خوین             | هسپین خوه شخوانین کردی |
| قدر بجان             | شینا خوالی من          |
| جگر خوین             | میر محی                |
| ع . حسن              | تر باسپی ومارى قف      |
| علی سیدوینی گوری     | صحیتی                  |
| عثمان صبری           | صحیتی                  |
| جگر خوین             | عبرت                   |
| دكتور ك . ع . بدرخان | نقیسه فان              |
| دكتور ك . ع . بدرخان | چارینین خیام           |
| أفین جیوه‌لک         | تار بئک                |
| لاوی فندی            | بردیلک                 |
| پیره مرد             | وفدی کردستان           |
| هقال شکری            | تولا باقان             |
| عونی                 | بوخواه فی هاوار        |
| م ۱۰ بوطلی           | آخ و کسر               |
| نوزاد                | هی دنیا فانی           |
| سلام                 | جفا تملتان             |

SAL 2  
HEJMAR 23  
SÊŞEMB  
25 Tirmeh 1933

# HAWAR

ANNÉE 2  
NUMÉRO 23  
MARDI  
25 Juillet 1933

Qoyara Qurdî \* Revue Kurde

## Çêreisîyên Qoyarê


Zarê Dumilî	C. A. Bedir-Xan
Sehîttî	Gegerxwîn
Sehîttî	Lacê Hent
Herweqî hate gotin	Dr. Q. A. Bedir-Xan
Qurd û Qurdistan	Hereqol Azîzan
Elfabêya Qurdi	C. A. Bedir-Xan
Çarînen Xeyam	Dr. Q. A. Bedir-Xan
Xwe nas biqin	Feridûn
Dilmestî	Evin Cîweleq
Qeleha Xursê	Bijîşqê Mîran

## Birê Frensîzî

Memê-Alan	D. A. Bedir-Khan
-----------	------------------

Çapxana terekî

ŞAM — 1933



## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Qurd û Qurdistan

Bi çavê biyanîyan

— 2 —

Yeş ji ewrûpayiyên qo qurd û Qurdistan ditine û di bekê me û welatê me de nivîsandine, marşal Moltqê ye.

Marşal Moltqê serdareqî elman e. Ne tenê di welatê xwe, di hemî dinyayê de bi nav û deng e, kederê çar salan, ji sala 1835 heta 1839 an, di Tirqiyayê de maye, di Qurdistanê de geriyaye. Hin tiştên qo hingî di Qurdistanê de kewimîne bi çavên xwe ditine. Moltqê di leşqerê tirqan de wezîfe girti bû.

Moltqê serdar, bi kelema xwe ji xurt bû. Liser gelecq tiştan qitêbin nivîsandine. Ev nivîsarên ha pêşdetir hatine civandin û di bin navê (Tevayîya nivîsar û birên Marşal Moltqê) di sala 1892 an de li Berlinê ji nû ve hatine çapqirin. Qitêba duwim qo sernama (Nivîsarên tevlihev liser meselên rojhelatê) hildigire kala qurdan û Qurdistanê ji diqe.

Em jê birê jêrîn werdigerînin zarê xwe û digubêzînin stûnên xwe.

Rûpel : 289

Mifet û welatê qurdan

Li gora xebereqê di Qurdistanê de serxwerabûn û şer ji nû ve dest pê bane. Ev xebera ha qo rastiya wê heş kene xuya ne bûye di dèmeqe welê de tete bihistin qo herqest ji dil bawer diqir û digot qo qarên Tîqiyê bi teqîlbûna çar dewletên ewrûpayî ên mezin saz bûne û bi rê qetine. Nemaze mirovên qo bi mesela rojhelatê bendewar in li ve serxwerabûnê ecêbmayî de bîminin.

Paş şerê Nîzîbê hiqmê padişahî liser miletê qurdan yeşcar ne ma bû (1) Ji xwe miletê qurdan hetanî irû bi tevavî ne hatiye meşlûb qirin û tirqan ew tu caran ne qevandî bûn û ne êxisti bûn bin destê xwe. (2)

Êdî tu hiqmê hiqûmetê liser xelqê çîyan ne ma bû. Hiqûmetê ew di cibên xwe de rahet dihiştin.

Lê niho qo topên ingilîzî û ewistûryayî ji hiqûmetê re di bilindcîhên asiyaş de rê veqirîne, dewlet mîna berê, ji qurdan disan mîrî, kemçûr, pere û esqer dixwazit. Bi van xwestinan ji eve serxwerabûn û şer xwe şanî didin. Heqe heş xwe şanî ne da bin ji bê şiq e qo di van rûjan de de destpê bibin.

Ev mesela hanî dimîne lehiyeqe dişwar qo di nav newala xwe de bi rûyeqî hilûs û rast û bêdeng diheriqe. Hetanî qo lat û zinar diqevîn pêşîya wê. Hingî fûrîn û guşguşa avê xurtîya lehiyê xuya

(1) Misr di zemanê berê de eyaleteqe tirqan bû. Waliyê Misrê Mihemed Elî paşa li hiqûmetê rabû û welatê Misrê serxwe ilan qir û leşqerê xwe ajot Sûriyê. Qurê wî Brahim paşa serdare leşqerê wî bû. Padişahî ji leşqerê xwe rêqir pêşîye. Leşqerê Siltan di Nîzîbê de şiqest û Brahim paşa çû heta nîzingî Stenbolê. Hingî dewletên ewrûpayî ên mezin qetin navê, leşqerê Misrê dan şûn ve qişandin û xwe teqîli şuxlên tirqiyê qirin.

(2) Xwezî Moltqê irû serê xwe ji gorna xwe hildaya û halê wî miletî bidita. Çawan tewihaye û hatiye qevandin û ji hev qetiye û stowê xwe xwar qiriye.

diqin.

Fmê li hir biqurtî kala millet û welatê qurdan biqin qo di vê demê de seza ve çavên Ewropayê bi aliyê xwe ve biqıştin. Lê ji bona vê qirinê em naxwazin vegerin zemanên qevn û bi ksênefon (3) dest pê biqin. Ne ji kala wan Qardûxên (4) nerahet biqin qo ne tenê hingî, lê irû ji ji bona herqesê qo dixwaze biqeve welatê wan û ew zemt biqe dijmineqî dijwar in û hej irû xaniyên xwe, herweqî serdarê yûnanî gili diqe, di şiqle qelehan de, bi burcan dorgirti, lêdiqin qo di wextê şerî de ji wan re talde û şergeh in.

Dîsan me dil nîne em biqevîna dîroqa vî milletî a drêj û tarî û bixebitin wê bexin ber ronahîyê. Ne ji seh biqin heqe ev merovên ha dahattiyên nijadeqî tûranî ne, an hej bêtir neviyên Medên qevn û Xeltan in qo zmanê wan hej di incilên gundiyan qo fileh mane û liser tixubên Ecemistanê rûdinin, hilanî ye. Emê tenê halê qurdan û welatê wan yê irû de bibêjin. Herweqî rêwiyan qo rê bi wan qetiye û bê qo bi tu zmanê bizanin di nav wan de geriyane, mane û di bin hezar talûqeyên rastin û xeyalî de, bi hawarî ji rêyên Bidlîs û Colemêriqê ên asê û dijwar derbas bûne û dane çiyayên Qurdistanê, ji me re didin zanin.

Qurd geleqî bi erdê xwe ve girêdayî ne. Ewçend qo di dinyayê de tu millet ji wan bêtir pê ve ne girêdayî ye. (5)

Qurd, ev miratxwerên cotqariyeqe

(3) ksênefon serdareqî yûnanîstana qevn e. Bi 2300 salî beriya irû digel leşqerê xwe ji welatê Qurdistanê derbas bûye û wextê millet û welatê me daye.

(4) Di zemanê ksênefon de ji qurdan re qardûx digotin.

(5) Xebera wî ye. Ma irû jî ne welê ye. Qurd diqin heta Emerikayê, lê çavê wan dîsan li welatê e. Ji xwe em bi xwe jî nabêjin: « Şam şeqir e, welat şerîntir e ».

qevn di zozan û newalên welatê xwe de dijîn. Yeçcar hejî destê naqin. Herçend di wan deştan de robarînen zelal qo ji çiyayên welatê wan datên, diheriqin.

Belê qêfa wan ji çiyayên re têt qo tede zivistaneqe dijwar hiqm diqe û ji deştê re nayê qo havîneqe drêj û spehî lê heye.

Di nav wan de şivanînen yeçcar qoçer geleq hindiq in. Piraniya wan tevda xelqeqî cotqarî ne. Ji tevayîya wan re qoçar tete gotin ji ber qo, weqê dinya germ dibe û di cihên nizm de ji germê aciz dibin û tirêjên rojê bertên çiyayên dihelînin, hingî pêpelûq pêpelûq qeriyên xwe ber bi bilindcihên ve diqıştin û xaniyên xwe bi qonên reş qo ji mûyên bizanê çêdiqin, diguhêrin. An nê demanî ne û li havîne dertên havîngehan. Ji lewra û ji vî awayê jiyînê di hundirê welatê wan de cihên şarîstan û bajar qem in. Herçî bajar jî ne di nav, lê di dorên Qurdistanê de ne.

Heqe xêzeq di ser Diyarbeqr, Mardîn, Nisêbîn, Cizîra-Bolan, Wan, Mûş, Palo, Meraş û Adyamanê bête qîşandin, Qurdîstana xwerû di nav vê çêxêzê de dimîne. (6)

Di nav van tixûban da bajarînen mîna Zaxo, Sêrt, Hesênqêt, Şîro, Petirqe h. p. tene ditin. Xelqê van bajarînan bi piranî û tevayî qurd in. Yeç carînan û tenê di deştên Xarpût û Meletyê (7) de di nav

(6) Ne hemî Qurdîstan. Ji birên Qurdîstanê, herçî Marêşal bi xwe ditine.

(7) Di van her du bajarînan de jî, ji biyantyan pêve xelqê cih tevda qurd in. Lê ji ber qo zmanê xwe kenc hilnanîne herçî qo pê nizanin ji wan re nequrd dibêjin. Hetanî irû weqê ji xelqê tete pirsîn xuya dibe qo pêşiyên wan ji eş rên dorê hatine û di wan bajarînan de cih bûne. Mirovên wan, ap û pismam, hej di nav eşîran de ne, û bi her awayî qurd û qurdzman in.

xelqê de geleqî nequrd peyda dibin.

Di van û di bajarinen din ên mezin de di nav xelqê de, ji aliyê zman û nijadî ve tevlihevîqe temaşa ber pê bûye.

Fileh xelqê cih ê qevintir in, neviyên asûrî û gildaniyên qevn in. Pêşdetir ermeniyên mihacir ji hatin û têqilî wan bûne. Ên pêşîn bi piranî yakûbî û nes-tûrî ne. Ji ber cuda bûna mezheban bi hev ne xweş in. Ên paşîn bi qinîsa rûm ve girêdayî ne. Tenê çendeq bi propa-ganda Roma û Vened qê ji yên xwe geriyane û bûne qatoliq. Qurdên cînar ji berêve xwe têqilî wan qirine. Bi ser van da bi hênceta şerê ehlê selibê ereb ji hatine û qêm û zêde şopên xwe liser van hemî-yan hiştine. Paşî, hiqm qete destê tirqan.

Cuhiyên qo di çola dinyayê de mîna hesin in, di van welatan de ji ne qêm in.

Nemaze ber bi nivroyê ve welatê qurdan bi kûntarên çiyayinen asê têwerhatî ye. Jê wê ve êdî ereb destpê diqin. Di van nekeban de avahiyên qurdan nînin. Hebin ji hema çend bajar in, ew ji di şiqle qelehan de û bi diwarên stûr dorgirti ne. Qurd bi van, xwe ji nijdên ereban diparêzin.

Ji rexê din Çiyayê Şingarê - bireqî welatê qurdan - asê û diwarwarî biser deşta navbera çeman a bêpîvan diqeve. Ji vaji ve (bileqis) di aliyê baqûr û rojhelat de qurd û ermenî nav hev de diheriqin.

Tenê di baqurê Palowê di çiyayên birêl de qo hêj ne esqereqî tirq ne ji biyaniyeqî pê li wan ne qirine, di wan cihên asê de qurd biserxwe mane. Hafiz paşa (8) da bû çavê xwe vê bermaya serxwebûna qurdî ji hilweşîne û bêxe bin destê dewleta xwe. Lê şerê Mîsrê hat û qete navê û nêta Hafiz paşa ne çû serî.

(dûmahiq heye)

*Hereqol Azîzan*

(8) Hafiz paşa ji sala 1838 an heta 1839 an serdarê leşqerê tirqan bû. Di Nîzîbê de Brahmî paşa zora wî bir.

## Herweqî hate gotin

— Ji deftera Şêx Seîd —

Ji bo na welatî mirin, ma çî jê spehitir e?

Ji bo welêt mirin û di qozîqên pêşîn de.

Dest ji welêt berdan û revîn, ji gund û war; histan û bexçe; qimt û zînar; mêrg û çiyayên welêt dûtqetin, di rêya xurbet û bêqesiyê de perîşan bûn; ma jê xirabtir çî ye?

Bi hav û dê û zaro û bi jineqê jar di welatê biyanîyan de bê kedr û perîşan, bê xweyt û sermiyan geran!

Dilê tu qesî de agirê hevîne û dostiyê ji bo qetîyan nîne.

Dilê her qesî ji wan re sar e, dinê li wan neyar e.

Navê wî zelanî bînamûs derdiqeve, helaqet û hêbextî diqevin pê şop û rêça wî. Jê tê pîrsqirin welatê te li qû ye? Tu çima ji welatê xwe derqetî?

Qo tê de dijmin hebûn diviya bû te pêsîrên wan bigirta û ji welatê xwe re arîqarî biqira. Gava ev xeberên rast û tehl digehin te, dilê te dişewite, rûyê te sor û zer dibe, têqre diçe û tu ji xwe re dibêjt:

— Wey li min ezo!

Lawo! dilê te niqare vê bînamûsiyê hilgire. Lêxa bi camêrî bê tirs û tomet xwe havêje ser rêya welatê xwe û ji bo wî û jîna xwe dest ji xebatê û ji şerî û berbertiyê meqşîne!

Sîng û bedena xwe bi mîranî û dil-xweştî ji welat û jîn û zaroyên xwe re biqe mertal!

Rabin.. rabin xortno!! Rabin jiho şerî!! Dilê we bila tucar sist mebe!!

Wey ji wî dilî re qo tede tirs heye, wey ji wî çeng û basqî re qo di şer û êrişê de sist dibe, dilerize!!

Divê ew erda qo bin pêyê we de ye û ew dijminên qo di peşberê we de ne ji mîranîya we bilerizin û sist bibin!!

Divê dilên we ji polayê kahimtir bibe  
û dilên we bibe mertalên we!

Weq zaroyan xwe bi jîné vegirê nedin!!

Mêrê mêr careqê dimire; tirsoneq hezar  
caran dimire!

Ne mirin lê tirs-tehl e. Revîn ne  
gotineqe qurdi ye. Yê qo direve jin û  
zaroyên xwe, welat û namûsa xwe dimi-  
rine û laşê xwe ê bêqêr davêje tariya  
bêbextiyê.

Berde, bila sînga te de gulên şerê  
welatî bibişqivin!

Ne rûyeqî zer; lê sîngên mēran ên  
bixwin spehî ne.

Berde bila xwîna te a sor û germ  
liser pîrçê sînga te de biheriqe!! Beden  
û rûyê xorteqî mirî di nêv qulîlq û çîme-  
nên qurdistanê de ji bûqan spehitir e.

Rabel Rabel Ne şer û quştin, radanser  
û êriş lê revîn û bêbextî giran in.

Bi cir û qomê radin ser

Xort e Qurdistan û camêr

Destê rastê de şîr, tifeng

Weq şêrên nêr, bi kir û deng

Weq bav, qal, qaliq û bapîr.

Xwîna me germ e nabe tîr!

Welat sax be, serbest be hew!

Ala me her serdest be hew!

Qo hon bi rast qurên Qurdistanê ne  
rabin dema şerî yel

Kabin bi camêrî û mērxasî, Xwedê  
tucar rehmet û ariqariya xwe ji camêrên  
xweynamûs û bext qem naqe!!

Ji hejmara dijminan, ji boşbûna wan  
metirsin !!

Xwe bavêjin baza êrişqeran!

Bila tîrsa ji jîné ne êxin dilê xwe de!!

Dilê we bila geş be, dilê we bila şabe,  
di siha mirinê de azahiya welatî û bext  
û namûs veşarti ne.

Roja xweşiya Qurdistanê ji siha mirinê  
dê xwe hilavêje!

Kedr û mezinahî û nav û deng di  
siha mirinê de veşarti ne.

## Çarînên Xeyam

Heqe min dest dirêjiya guliya te diqir  
Ne mecazî bi rastî min ev diqir  
Min guliya te de dilê xwe ê diwane dit  
Min ji dilê xwe re destdirêji diqir

Şerabê vexwe erdê de dirêj raqevî  
Bê jin bê heval û yar té biqevî  
Vê veşartiyê bo qesî tu car mebej  
Guleqe werihayî çû ne bişqivî

Ev şerbiq weq min aşikeqî zar bû  
Destê wî li ser guliya yar' bû  
Ev destiqên di gerdena wê de dibinî  
Desteqe qo li gerdena yarê giriftar bû

Şeraba sor dixwazim û şîr û diwan  
Bihneqe aza û hineq jî nan  
Qo qetîn dest, rûniştina xirbeyî  
Xwestir e ji welatê mir û siltan

*D. Zamiran Ali Bedir-Kan*

Me piyana bindestiyê a tehl çend caran  
vexwariye.

Me zeriqa bêbextiyê û mirinê çend caran  
tam qiriye!

Qezeba me birindar e, dilê me teji xwîn e,  
lêva me sewiti ye.

Yên bêtirs û bi mēranî radidin ser,  
naqevin; qetîyan û vezeliyan radiqin.

Yên ditirsin, xwe, namûsa xwe û  
welatê xwe hildîweşinin.

Tuê welatê xwe vejîni!!

Yê qo şerî de recifiye û dest ji na-  
mûsa xwe berda; ew niqare wê tucarê  
peyda biqe.

Tu gotin bi kasî mēranîyê ne bilind e û  
tu gotin bikasî bêziraviyê ne nizm e.

Wey li wan, yên qo birinên wan di  
pišta wan de ne.

Parîz : 1933

*D. Zamiran Ali Bedir-Kan*

## Strana Qeleha Xursê

*Weqê liber mîr asê bûyîn*

Berbevanê wê: Bijışqê mîran

Mîr çû geliya, mîr çû geliya  
 Bî kubkuba kibristiya [1]  
 Me sibehê ser e, liser xursiya  
 Hûr nijîni, hûr nijîni  
 Smail axa bi xulamî ve liser seqîni  
 Eli Hemanê wê li Hemdan diqir gazi  
 Tu bi aaxayê xwe ve girtiyê mîrê min î  
 Hemdan dibêje: bi ehdê, bi emanê  
 Heta bête ser min top û cebîrxane, jî  
 [ bajarê Wanê  
 Ez nabim girtiyê mîrê Eli Hemanê  
 Ez Hemdan im. ez Hemdan im  
 Ez xweyîyê tîfînga xare me, şîrê dev-  
 [ heşîm im  
 Ez kesabê serê Qeran û Mûsan im  
 Qeleha Xursê walî zinarê walî zinarê  
 Li min xweş têt kubkuba qewiqê ve  
 [ Qabarê [2]  
 De werin keliyê gamêşê deşta Mîsarê [3]  
 Ber de qaş e, der de qaş e  
 Qeleha Xursê ber de qaş e  
 De werinê gelî xweyîyê debr û mîaşan  
 Binêrin, binîya qelehê, seyra term û  
 [ qelaşan  
 Derbeleq e, derbeleq e  
 Qeleha xursê derbeleq e  
 Lê difirê cuhtê ordeq e  
 Xayînê qumê kûçî beg e  
 Qeleha xursê qurîsî qurîsî  
 Hemdan bi şîr rekîsî  
 kûçî begê me li silhê pîrsî  
 Em xursî ne, em xursî ne  
 Em deh malî (in) dwanzde rêspî ne  
 Em axa ne tucar mîr û haqîm ser xwe  
 [ ne dîne  
 De werinê, de werinê, mîaşxwerîno.

[1] Texlîteq tîfînga qurdmancîye, mîna helkedar h. p...

[2] Çiyaq jî çiyayên cihê Botan e.

[3] Di şerî de aaxayên deşta Mîsarê hatîne quştin, çelî wîna diqe.

## Dîmestî

Meygerl civat temâm bû, meseqîne weqe la!  
 Rabe jî xwîna kelbîm camê biqe malamal  
 Ger qeqabê ve rûjê, jî cegera min nebit  
 Ev rindiyên hesindil sermest bûna wan  
 [ mihal.

Meyger emanzû bi zû, canê xwe bilivîne  
 Vê dîwana natiwan, zinhar tu merevîne  
 Bêqesîya sibehê li balê irû bîne  
 Çavê xwe veqe berxî, li pêşîya te ye çal  
 Meyger bala xwe bide, ger badeya te  
 [ tir e

Çend hêstirên çavê min, wê diqe ava  
 [ şîr e  
 Badenûşên berî me wîsan qîrîn bîne bîre  
 Bizan dekîka nîha bî me tene hezar sal.

*Evîn Cîweleq*

## Elfabêya Qurdi

15

Lê, jî ber qo zmanê farîsî zemanêqî drêj bî herfên erebî hatiye nivîsandin û pê dabeqe wî mezin heye û geleş pîrsên erebî têqetîne û denganiya erebî bi geleşî lê hiqm qiriye, ew dengê qo me bî (u) nişan qîrî di zmanê eceman de yeqcar wînda bûye û bûye (و) qe erebî

Nivîsevanê rehnîmayê jî ber qo niqarî bû dengdêrê bibîne, bawer qîr qo ev dengê dengdareqe serxwe ye, jî (ا) ê cihê ye. Jî lewra ew bî (ق) qe sê nîktan nişan qîr.

Herweqî xwendayînen me qo di medresan de xwendine û di bin hihmê isûlê elfabêya erebî de mane dibêjin: qo di zmanê qurdi de jî, jî (ق) ê pêve du (ا) ên din hene. Mîna dengdarên ereban: (س) û (ص), (ت) û (ط).

(dûmahîq heye)

*C. A. Bedir-Xan*



## MEMÈ-ALAN

Mem après avoir quitté le vieillard continua à suivre le chemin que ce dernier lui avait montré, la route qui conduisait à (Cizîra-Bolan).

Au bout d'un instant, en effet, il rencontra un cavalier qui poursuivait une gazelle. La gazelle avait tellement devancé le cavalier qu'elle était sur le point de lui échapper. Mem se mit à sa poursuite et put l'atteindre sans grand difficulté; avec la crosse de sa canne et il la donna au cavalier.

Le cavalier se fâcha et lui dit:

— Mais qui es-tu, toi qui viens me prendre la gazelle que je poursuivais?

Mem répondit aimablement:

— Ne vous fâchez pas, si je l'ai prise, c'est pour vous la rendre, j'ai vu qu'elle vous échappait.

— Non, je ne veux pas, lâchez la, et si vous voulez faire courir votre cheval avec le mien attaquons la ensemble.

Mem lâcha la gazelle et tous deux se mirent à sa poursuite. Mem de nouveau l'attrappa le premier. Le cavalier furieux de sa défaite, proposa à son adversaire de se battre avec lui. Mem lui laissa le premier coup et sut parer et faire dévier la lance sans être atteint; puis à son tour, seulement pour lui montrer sa supériorité, il lui donna un coup et le fit tomber de son cheval et perdre connaissance.

( Tacîn ) lorsqu'il reprit ses sens reconnut sa défaite et invita chez lui Mem qui n'accepta pas.

\*\*\*

Beqo, travaillait toujours, devant son miroir monté sur un entonnoir. Il sut alors que Mem se rapprochait de (Cizîr). Il appela sa fille, lui raconta l'affaire, lui donna les instructions nécessaires et l'envoya auprès de Zîn.

La fille de Beqo raconta à la princesse qu'elle devait aller quelque part et qu'elle n'avait rien de convenable à se mettre. Zîn sans même bouger lui montra l'armoire. La fille de Beqo, conformément à ce que son père lui

avait dit, prit la robe que Zîn portait dans la fameuse nuit d'enlèvement.

\*\*\*

Mem s'approcha du fleuve de (Cizîr). En effet, comme le vieillard l'avait dit, il n'y avait ni pont ni passage. De l'autre côté on voyait une fille qui s'appretait à la lessive, debout devant un chaudron. Mem l'interpella et lui dit:

— Je suis un étranger qui ne connaît pas les routes, ne veux tu pas m'indiquer le passage de (Cizîr) pour que je m'y rende.

La fille de Beqo, éprise de la beauté de Mem, lui répondit:

— Grâce à Dieu, tu es enfin venu. Il y a six mois que je t'attends, ne me reconnais tu pas? Je suis Zîn, ton hôtesse de la fameuse nuit. Et voulant jouer un double rôle, au lieu de faire tomber Mem, au piège tendu par son père, elle chercha à se faire passer pour (Zîn) et à le suivre dans son pays. Elle ajouta:

— Pourquoi veux tu aller jusqu'à (Cizîr). Je suis venue exprès à ta rencontre, pour ne pas te laisser entrer à (Cizîr) où te peux risquer ta vie. Viens me prendre sur ton cheval et volons vers ton pays

— D'où sais-je que tu es (Zîn), découvre toi, ouvre ton visage.

La fille de Beqo, en lui montrant la bague, lui répondit:

— Comment peux-tu te défier de moi, voilà ta bague, que tu m'avais donné.

Mem insista pour qu'elle se découvrit. La fille de Beqo ne consentait pas. Mem avec une flèche de son arc lui enleva le voile de son visage. et au dessous apparut un visage presque aussi noir que le voile lui même. La fille de Beqo, vaincue, commença à suivre les instructions de son père et indiqua à Mem l'endroit où passer le fleuve.

\*\*\*

Mem à l'endroit que lui avait montré la fille de Beqo, lança son cheval. Bozê-rewan, se précipita sans hésiter. Mais après un instant il tomba dans un champ de jonc et de roseaux qui lui piquaient la peau comme des flèches. Et de toutes parts surgirent des serpents, des dragons et toute espèce d'animaux

féroces. Bozé-rewan luttâ contre eux jusqu'à ce qu'il baigna dans le sang. Boz vaiucu recula, se retourna vers son cavalier et lui dit:

— Comme cheval je ne peux plus lutter. Mais comme dragon de mer je les tuerais tous en un instant, à l'instant même je peux retourner à mon origine, mais tu m'es trop cher pour que je te laisse sans monture. En effet, pour que de dragon de mer je redevienne cheval domestique, il me faut ton grand père Neriman.

Mem touché de ces paroles voulut descendre du Bozé-rewan et le laisser retourner à son origine et vaincre ses ennemis. Boz n'accepta pas. Et ils regagnèrent le bord.

Mem de retour sur la rive rencontra un troupeau, puis son pasteur. Il lui demanda le passage du fleuve. Le pasteur l'emmena à un autre endroit et lui montra un passage, en lui disant:

— Sans crainte tu peux lancer ton cheval, des centaines de fois j'y passé.

La fille de Beqo suivait Mem de l'autre côté de la rivière; en le voyant passer la rivière gagna l'autre bord, elle se déshabilla et se mit sur sa route. Et lorsque Mem s'approcha d'elle, elle commença à crier:

— Après m'avoir mise en cet état comment veux tu me quitter et fuir, j'appellerai au secours et tout le monde viendra me voir dans l'état où je suis, alors tu auras à répondre.

Mem proteste, mais la fille de Beqo insistait dans sa ruse, et elle lui proposa enfin cette solution:

— Promets moi qu'en retournant dans ton pays tu me prendras avec (Zin). Moi aussi je m'appelle (Zin). Seulement je ne suis pas la princesse, mais la fille du magicien de Cizra-Botan, favori du prince.

Mem seulement pour s'en débarrasser, consenti et dit:

— Quand est-ce qu'on a vu le loup mourir de deux bouchées au lieu d'une.

La fille de Beqo après avoir entendu la parole de Mem lui donna ces conseils:

A l'entrée de la ville il y a un vieillard qui t'attend, et qui t'offrira l'hospitalité. Il te proposera de descendre; ne quitte point la selle et va directement au palais des trois (Celaliyan)

les seuls qui pourront t'amener à ton but. Ce vieillard est mon père, Beqoyé-Awan, le magicien de Botan que par sa magie a connu toute ton histoire d'amour avec Zin.

Mem remercia la fille de Beqo et continua son chemin.

\*\*\*

Mem heureux de s'être débarrassé de la fille de Beqo avait complètement oublié les conseils qu'elle lui avait donné. Et en effet à l'entrée de la ville un vieillard s'approcha de Mem, le salua cordialement comme quelqu'un qui le connaissait depuis longtemps, et lui offrit l'hospitalité. Mem refusa catégoriquement. Le vieillard voyant ça sortit de sa poche une lettre et la remit à Mem. Mem reconnut tout de suite l'écriture de son père et la signature de ce dernier et de ses oncles. On recommandait Mem à Beqo. Mem s'étonnait; Il se rappelait bien que malgré tous leurs efforts, son père et ses oncles n'avaient pas trouvé quelqu'un qui connaissait le chemin de Botan. D'où venait cette lettre par quelle voie? et D'où connaissait-on Beqo? Mem décida de suivre le vieillard jusqu'à chez lui et il se mirent en route. Peu après on aperçut distinctement la maison de Beqo. Elle était telle que sa fille l'avait décrite. Alors Mem se rappela ses conseils et mit son cheval au galop.

Mem tour à tour rencontra les misérables de (Cizîr), passa au marché aux chevaux, et se mit en contact avec les commerçants de la ville. Mem apprit par eux que (Zin) depuis six mois était en deuil et s'était retirée dans ses appartements, ne n'en sortant point et ne recevant personne.

Parmi tous ces hommes-là il ne trouva personne pour lui montrer la maison des (Celaliyan). Tous lui offraient l'hospitalité. Enfin il prit contact avec des appaches, eux aussi à sa question lui répondirent en lui offrant l'hospitalité. Mem insista beaucoup. Ils lui expliquèrent:

— Chez nous, c'est quelque chose de mal de montrer au nouveau venu une autre maison que la sienne. (à suivre)

## خوه ناسی بکن

ژ ما جو اغانی دلال ره ببتکس دکم

ای دل تو وره بکه تماشا  
 کاتاج و درفش و کانین اوشاه  
 کاشا هنشاهی جهان فریدون  
 ایرج منوچهری تکیه گردون  
 غوزر ای بدوده هاتی زابه  
 کاری وی بکیر ژبومه زابه  
 کر آپی وی کبجادی زور دل  
 اوستیاغ دوریستاره ویده بی دل  
 کیگارس و خسروی نیک بوش  
 ناچی وی د دقتراده قیروش  
 لهراسبی فرزی وی رحام بو  
 قدسی ژ نفری تار و مار بو  
 کشتاسبی دین داول زرادشت  
 بهمن چو بدوده دوت همالیست  
 دارایی های چه ژیر دبیر بو  
 زردشتکرنا جهان دبیر بو  
 دارایی دوم چه ازدها بو  
 کوهین و مغین ژیر رها بو  
 دارایی سیم کوهات جهان  
 فرخنده نهان بو آریانه  
 اسکندری هیک زپر ژ بردار  
 بلش کیش دکرن ژ بوملک دار  
 جنگک لکلیکیا بک لاریل  
 دارا دشری دوم ده بو دیل  
 سردار یون ژ نوح هتانی سید  
 سه سالی بری مسیح دناف مد  
 آشوری دروژ هلات جهانگیر  
 درشهری آواده بونه بار گیر  
 آلابازرفش گهسته یونان  
 هند وین وولاتی توران  
 \* \* \*

کارستمی کرد و کافی چوپین  
 کانیلو فری عکیت و کورگین  
 سلطانین بلوج و غور و سیستان  
 سلطانین هرات غزن و افغان  
 باییره ژواره شیری چوپین  
 سلطان لوان ژ نسلا گرگین  
 \* \* \*

یزدوا بر ویز و نوش و تیرداد  
 سه مروی وه بونه شاهی آزاد  
 ایوانا بنود ژ تاج و گوزان  
 درگوشه ژ بوتلودو دهبان  
 پشتی کو مسیح دبو به رهبر  
 ساسانی لدو دبو نه سرور  
 دوژا کو حسین دبو به زاقا  
 روژاوه دبلخی چوبه آقا  
 سلطانی بو به و حاکمانین  
 بدلیس و جزو کرانی وان  
 اف کسرو یو کیانی کوردن  
 دوزامه درسته پی خیردن  
 تیزداد ژ کری خونفساند  
 ای کوردی کری و کردی آزاد  
 شیر گوهی ژ کرنا آزر یجان  
 شیر گوهه بلی د فینجا برجان  
 یوسف بصلاح الدین ناف دار  
 پرساوی بکه ژ فلیپ و ریشار  
 فرزی وی اکر کو فتحاقسی  
 چیکرا بزمانی کردی قدسی  
 خلکی نه دگوتی فاطمیبو  
 زانایی بکین زمان بری بو  
 زانایی جهانها سراسر  
 پستی وی د دن بخامیادر  
 پشت خاتی انبیاب پنج صد  
 شبیست سالی دبو ملک خدی بند

هشتا ژ اکانا هشتی سالی  
 سلطانی کرن بلا ابالی  
 در مصر وین حجاز و سوری  
 بایزید وولاتی شهر زوری  
 هسکیف ملکانی وی ژوان  
 شیروی بخو فرزی واکران  
 مروانی و آمدی لکومان  
 نوط سالی دو بدده مانه سلطان  
 میری د جزیرا شهری بوتان  
 کردیتی نما لدو بدرخان  
 سلطانین بناف سلیم وقانون  
 باغی مه له کرینه کانون  
 هیژابو کو خانی ته ادیس  
 زیر حل بکرا د شهری بدلیس  
 کردمانچ ته کرینه باز کی تورکان  
 بون بو کی رمان جوانی ایران  
 ای کوم و جفانتین اورپایه  
 دبل بون بقی طرزی قی روایه  
 بلغار و مجاروسای لبنان  
 آزاد دین زبل مه کردان  
 ویلسون لکومایه سوزکاته  
 موسیو کلمنصو گوتناته . .  
 لشکر کشی انگلیزی کانی  
 سوزا کوته گوتی ژارا کانی  
 راست گری جهان امیل بودجو  
 گفتاراته گوتبو چه راست چو  
 بیژنه تو بزشکیه چه دارو  
 درمانی نه ساغیامه بارو  
 بکتی ژمره چه خوش علاجه  
 یات بون دمه ده چه بی رواجه  
 ای کوردی چیای دشت و زوزان  
 امید می کن ژ دست گیران  
 ب . فریدون

(۱) زمانی کوردی چاوان خوهر و پاک دبت ؟

(۱) ماناڤی پر سیاری دڤیت وه هابت . زمانکی کوردیکی ته ڤایی (عمومی) چاوان تی په بیدا کرن کو هممو کوردان - کوردمانج ، گوران ، لور ، کلهور ، بختیاری ، زازان ، هاوارمان . . . - ژور و ژیر ، روژ هلات و روژ آڤایی کوردستانیدا ، تی بگهینه وه کاربین پی بنویسن و بڅوبین . چما ڤا پر سالازی وه هابت ؟ چنکی زمانی کو هممو کوردان ، کیم وزه حف تی بگهینه هیژ په بیدانه بویه ، ونه هاتیه میدانی کومه روڤ ، بیاقیژی وصف کرناوی مه ژول بیه وه بڅه ریکه .

هه ره کس زانه کو ، صاف و باقیژیا زمانکی هانجا پاشریه کیتی (وحدت) وه لهڤ آئینا زاربین وی ئی زه حف تی تصور کرن . ژبو وی جوها باقی پرسی عه ولی وه هادین سه ڤا گهیا شتافی مرازی ، و په بیدا کرناڤی آرمانجی ، دڤیت بهری هه رتشتی چقاس زارین وزمانین کوردی -

و هک کورمانجی ، بابانی ، زازایی ، لوری ، فیلی ، بختیاری ، هاوارمانی . . . - هه نه به هه مو واسطه بان و باویکی زانینی

(اسلوب علمی) وه ره جڤانندن و به لافکرن . یانی هه رزارو هه رشیوه دایکی - علی الاقل - دوسی کتوبک دڤیت وه ره چاپکرن کو چه تا زانا و نقیستانی کوردان ، کاری بن ژری فیده بینن وه شیحو گوین وه نقیسا خونان ، بقسه و پرمس و گالگالا هه مو زارین و لهجه کانی کوردی چیکن وه درستکن وه کاری بن قسه و پرسیانی بیگانه بان به رین وه هیدی ، هیدی ده ستاوان ژری وه ره کشانندن چه تا بتوانن باویکی کوردی ئی خالص و مخلص بیژن و بنقیسن .

۲ - بچی آوایی زارین کوردستانی این جهی جهی نیزیگی ههڤ دین . ئوزاره کی وه لی تته پی کو ، کورد هممو دزارین هڤ دگن ؟

نیزنگ بونا زارین وزمانتی کوردی ، هیدی ، هیدی ئو بڅو بڅو آنجاخ پاش جڤانندن و به لافکرینا وان دبت . چونکه وی چاغی هه ر په کی ژخورت و جوانانی کوردان ژخورا زاریکتر - بی زاری خو - دعبینه تدقیقات و خه باتا خو سه روی زاری دمشینه . و ڤایا مده یک دوام د که نتیجه بیدا چقاس زارو لهجه یانی کوردان هه نه تینه

به لافکرن ، لا کین باویکی زانستی . وهه ر خوهندا وزانا و نقیستان د کاره بو نزدیک کرنا عه زمانانی کوردی وزارینی کوردمانجی وزارایی . . . نقیسا خونان پیرس و گالگالا ئو آوایا هه مو زارو زمانانی کوردی تهڤ لهڤت وه تیکهل بکه . وشهڤ و روژ بڤی آرمانجی مه ژول بیه . و بونا کو هممو کوردانی زانا و نقیسکاران زانین و تدقیقات خویانکه لهما لهجه یانی کوردیدا بکن و ره خواندن و تیگیشن ، دڤیت املایکی (آوای نقیسن) متفق علیه موجود بی هه که لاتینی بی هه که عربی . مثلاً املائی عربی بی که پی زمانی فارسی و عثمائی - سری تی نقیساندن ژبو کوردی ژری - ولو موقتاً - چا که و باشه خواصا املاینا زانا و منوراندا . نه کو وه ک برانی مه ئی کوردانی وه لاتی ژیری کوردستان که نقیسا خویان بچروف مقطعه بنقیسن چه تا مطبعه بیدا ، بیه وه ک شور به تهڤ لهڤت و تیکهل ، سروڤ نکار بی ژناڤ دهر که ڤیت .

۳ - زمانی کوردی چاوان پیشه دچی ، و بچی آوایی بسر د کشت ؟

هه مو نقیستان و خواندا ڤانرا ناسه کو ڤا بر سیاریا نتیجه یا بر سیاریا بکم وئی دو دیانه یانی لپاش جڤانندن و به لافکرنا هه مو زارینی کوردی ، و په بیدا بونا زاریکی ته ڤایی ، زمانی کوردی خو بڅو سه رد که ڤه وه پیش چوینی تی چه سبانندن . و ولی سقا که زوسه ر بکه ڤه وه زه حف زه نگین و ره نگین بیه ، لازمه پشت ساله کی ژاڤه باتانان ، جڤاته کی هه موایی = ته ڤایی (موثر عمومی) بوزمان وه ره لهڤت وه ژبو نا په ککرنا آوایی نقیسن (املا) وزارینی کوردی (لهجات) و دانینا اصطلاحاتا زانستی = زانینی . ژول بیه و بڅه ریکه . و قراراتی که ڤا خصوصادا دهر یدخه دڤیت نک هه مو کورد زمان مقبول بت و بدل و ره تنفیذ کرن . و دبت هه ر که س بزانی که سرو ڤیتی ئو ڤقدر و قیصتا وی بشوغلانندا

زمانی باڤ و با پیرودی و دو تمان تی ناسکرن وزانین . ژبه روی لازمه لسه ره مو کوردانی وه لات پاریزان ، زارو زیچا خویان زمانی کوردی ئی ته ڤایی هین بکن وه هه مو نقیسا خوڤی زمانی دایکی بنقیسن .

صديتي

له بو بکينبا زماني کوردي

— ۵ —

زماني کوردي ، پراستي زمانکي پر شيرين نوزه حف زه ننگين و هره ننگينه . چونکي گالگالاوي ( مفردات ) زور ، آوايي قسه بيژي ( لهجه واسلوب ) گه لک زه حفه . نه وژي ژبه ره به لاقبونا کوردانه لسره حدان ، وه پارچه کرنا وه لاقی وانی ده لالی کوردستانه لـ ناقبه را دوسی ملت نـ دولتاندا . لوما کورد ، ژه . قدو قه قه تپانه و ژه قدور که تنه . وژ ظلم و بی بختیاد ژمنان استبداد و تحقیرا بیگانه یان ، باژیران و گوندان به ردانه . چونه که تنه ناق نه والان نـ او دهشتان نـ ده رکه تنه سهر چیان او زاران ، دورلمدنیت نـ او محروم ژ علم نـ او عرفانی .

سه قاوی زماني وانی کوردي ئی پاک نـ او ده لال ، ژ نعمتی خوه ندن نـ او نقیساندن محروم مایه . وه ( ته نی = تنها ) لناق گوندي وعشیراندا هاتیه پیشف نـ او قسه کرن . نه ما خوه ندا نوزانای کوردان — هه که گوندي نـ او عشیری هه که باژیری به — گشک بزمانی بیگانه نونه یاران علم نـ او عرفان هین بونه نـ او خویان زانا نـ او خوه ندا بین کوردان حسابانده ، نـ او نوزمانی باق و دی پرس نه کر نه . سه قاوی گره نـ او ریباتا که ناقبه را کوردان هه بویه ، وندا بویه نـ او بی بکچار ژ ناق و ان را بویه ؛ نه کو لناق هه به رکه . ژبه را کوردان ئی مه زن نـ او گه وره را بویه . به لکو هه عشیریکی ژ کوردان خوه ته نی کورد حسابانده و بستقبلی ئیدبنان نه خواستیه علاقه دار بیه . بقی آوايي ، ته قدا بیگانه ی هه قدو بونه . یانی چار ، پنج مهر و قین کورد نه گهر لچیکی بیچن وه دل بکن که لسره وه لاقی خونان قسه بکن وه ژبه له نگازی اوی باس بکن ؛ بی شک نکارن پاسانی نـ او بگه نگازی سرازو خوتان فیم کرن بدن ، ونه توانین مقصدا خویان هین بین . چنکی هه ره پدک لوان باوا یکی قسه دکه ودلی خودا دبی : نه زته نی کوردم . ئیدن نه گهر کوردری بن زماني کوردي نوزان . چما ؟ چونکه زارو شیوه ی وی نوزان .

والحال نه وان هه مو ( هه مه ، حه مو ، حه مه ، گیشک ، ته قدا ، گیشتی ) زارو نـ او لاوینی ملتکی به کزمان ویکتزا دأویه کخوینن . وه لی ژله ف نه ها تیا شیوه نـ او زارین وان ، نکارن هه ق و دن ناسبکن وه خوناسکرن بدن . نه گهر خوه ندا نـ او زانا یا ملتکی بقی آوايي نکاری بن یقسه و نقیسا خویانی ملی دهستی هه ف دین بگرن و آری بکاریا خوتان بکن ؛ بی شبهه نه ممکنه تشتکی دبنداژی دهستی هه ف بگرن وه کفکرو به کبستق بین . چرا ؟ چنکی نشانه یه کیتیا ملتیکی وه کبونا کومه لیکي هه بون وه بیا زمانکی — یکی یانی علی الاقل نقیسانی دا — یه ک نسق وه کاوايه . بی قایا تشتکی دن چی نابه و نابه در سترن قط . نوا نقیرا پرسه ک تبالا هه مو خوه نده قان و نقیسه قان نه وژي قایا به : چاوان زمانیکی کورد یکی یکستق و بکاوا ( علی الاقل ) نقیسانیدا تی په پیدا کرن کو هه مو کوردان تی بگیمنه و پی سرازو مقصدا خوبان بقه دینن وه چاک ادا بکن ؟

\*\*\*

قا نقیسا خویانی قرا نقیسی ، و بونا که ( هاوار ) راری بکم تمیز کر بوم ، وه بچو ها با وی پرسی مژول بو بوم . ژ ژر مارا ( هاوار ) ی ئی شانزدهان دا پرسیا ریکی هیژا دورا لیا قی موضوعی ، موضوعی نقیسا ران دها تی بو بلاق کرن . وه بکورتی حه یانی به کییا گولانی جو حاب دهات خواستین . وه ختا که من آف دیت و خواند . دلی من قه بو و چا قین من ژونی بو وه از زور پی کیف خوه ش بوم . سه قاوی مجبور بوم جو ها بی کو بو تامیا نقیسا را خو حاضر د کردم همان بتعدیل و تغییر یکی هندک بتقیسم و بدم بو نه ف پرسیا ریانی کول ( هاوار ) بدهاتیه بلاق کرن ، و پاشی قه گه رم لسره تامیا نقیسا ری ( مقاله ) خو ، وه دورا لیا زارو زمینسا کوردی ، خواسما زازایی ( دو ملی = دو تبلی ) دا هنک زانینی بو هور تی وزمانی به لاق بکم کو حه یانی ایرو تشتک ژوی نه هاتیه نشر کرن . هیقیامن ژمیری ده لال وهیژا خودی بی هاواری مه هه مو کوردان نه قه کو ژقی نقیسی شتک ده رنه خه ژبر کو دریزه و مخالفی شرطی پرسیا ریاهقندی صوری به (۱) .

( ۱ ) هیقی و داخو ازا ته لسر سران و سر چاقان .

**صعبیتی**

له بویکبیا زمانیا کردی

— ۴ —

ژ برهه‌سی پرسان فه از دبیژم  
 ۱ — گره که جفانک ژچار کارین کردستانی چسپه  
 سیداو، زانا و چند مروشین گوب لهجئین کردستانی ئفان  
 زانن تیده کوم بین

۲ — شیوکی سڤک و بلند و شیرین کو پرین کردان پی  
 مژول دین بگرن ئین دن ئفان بکژن اگر پرسک ژوی ئی  
 بیژارتی کیم بی ام کارن ژ شیوین کوشتی بدزن  
 چان ۰۰۰ گوام وها بکن دژواری دگهی دو ملیون کرد  
 لی اگر ام شیواکی ژئفان چیکن هنگا دژواری دگهی  
 نه ده ملیون کرد .

چاوان گو ملتان همیان وها کر به یانی شیواکی پر شیرین  
 گرتنه ئین دن کشته .  
 بلی دقونفری ده هی بیترام کارن دلایل و نیشانان ژفکرو  
 بپراخوه ره درپژ بکن ابدی هقال ساغبن .

**هگرهوبن**

بو و نه ب شیوا سیورکی لی ب یا پیچاری بو . بکی  
 ب ناڤی احمدی خاصی چیکربو»  
 لی ملا نذیر کو ژ دولمی یا سیورکی پیقه تو دولمی بی  
 نا عجبینت دیژه : « بلی احمدی خاصی ژی مولودک  
 چیکر به و او مولود گهابه سیورکی ژی . من او دینیه .  
 هماسی چار په لک بون . ژ پرسین گرومانجی بی تیژی  
 بو . لی پشتی کو مولودا عثمان افندی درکت اوبطال بو»  
 لی ژ بر کو من دل نینه ازوی بطل بکم ژ خوه‌ند  
 فانان هقی دکم هکه بی دزانن و دکارن پیدا بکن  
 نشیستهکه وی ژ من ره ژریکن دا کو از وی ژی  
 پیختم چاپی .

شام، تارا گردان : ۱۶ تیرمه ۱۹۳۳

بهردت عالی بدرخان

آربانچی زحف پی وش بی . خو حدزه کرد .  
 کرگک راقا :

— از آن میدان د'قلک بکین . تولى تانزى  
 و بویچیان د'کری . اگرکی آپ لوی آمه تاي  
 جری بر قسی . او نوي ره قاجو : « هی کرگی ،  
 کرگی . . . از تو بوري نولى لیچکانی نوي یا»  
 باجی ت ترا قاج : « هی آپ آربانچی ، بی  
 قهر ، ت بخو و بویچی قندی»

لوی آمی میدا ، فاندنا کرگک دا ، کرگک  
 شی ، ترا قاجا : قیگی ت انکه هی من بوري  
 من ری و شو از بنیکه کی برقس  
 لوی قا : حو لو

دستی یوو بنی گرد . کرگک ترا قاجا :  
 بنیکه کی ماری دیری بکی  
 لوی قا ، هی کرگی . کرگی از انکه هی  
 ت و لیچکانی ت پیا بوري .

کرگک قا : سه‌ره‌ی منو ، هی آپو آربانچی  
 بی تیزت بخو و بویچی قند یا  
 لوی ترسا ، قا : انو مه‌قاج ، آخری از  
 مرسنا . قالی خوتام کیردی آپو آربانچی قجیا .  
 تانزى و بویچی هلاکک لوی دی ، د حال ده  
 گرت و خنقنای . آربانچی ب لوی ، کرگک  
 ولیچکان شانی .

پاش کو من مولود و اف بنداها نقیساندن هر دو شانی  
 برای شیخی رحمتی شیخ عقد الرحیم افندی دان .  
 هنگی اوی ژ من ره گوت کو ژ قی مولودی پیقه  
 مولود که دن ژی ب زاری دولمی هاتیه چیکرن و بسر  
 خست : « لگورا کو د بیرامن ده مایه ژ فی درپژ تر

لوی جری فا: قاندى چى چى؟

کرگج جری فا: ابرك بول وزدكى

لوی زانا دوزد کس چينو فننگ نی کرده

شى . کرگج کورت قساوت . نوری لیرکان

دو را قزیا . شى آری هی هت . اژا آشوانچی

ئی دینای . کرگج هاوار کرده جری فا:

— اورو لوی بین مارا پیدایی ، من ری

فا . ازدو نو بورا . من جری فا حتا حوت روژی

قندی . لوی شى ، فننگ نی کرد . يت نکا

تازی و کیکان حادره ك حتا دی لوی ینو

آشوانچی فا: بول رندو

او وخت پوستی لوی نوای چتوری کردی .

آشوانچی خیلی پی و هس بی . کرگی ری فا:

— ازو نو میدان دلانین بکین . ازو نوری

کتیک و تازیبیان د کون . اگر ددی لوی آمه

تنکی ای در را کای بکه . او دو نوری

قاژی: «ای کرگی ، کرگی ، کرگی ! ازو

تو بوری توری ابر کان» . بادوت جرافاژ:

«ای ددی آشوانچی ، ت بخوه و کیکى قندی

بی تبر»

لوی آمه میدان ، قندا کرگج ، کرگج شى ، جری فا:

— چرنکی بت نکا من بوری ، من ری وشو

تنکی کاری کران

دستی ژ وینى گروتی . کرگج جری فا:

من ری دیری بک

لوی فا: ای کرگی ، کرگی ، نکا ازو نو

بورا نوری لیرکی نو

کرگج فا نوبتا منا ، دست پا کرد:

ای ددی آشوانچی بی تبر ، ت بخوه و

کتیکى قندی

لوی ترسا ، فا: هونی ، قاز ، آخر از ترسنو

قسه ی تمام کردی ، ددی آشوانچی قزیا .

تازی و کتیکان وختو لوی دینایی ، گروتی وفتسنایی .

آشوانچی ب لوی ، کرگی وب لیرکان بی شای .

رومیلیا بالووی

رومیجی زویجادویبکی ده هاوار کورت .

شاری دو پیرو رمای . میانی دو ، جامند کیرگج

تولی دس لیچکاتا . ینه ری لوبیک پیدایی

زحف قشان . کرگج زحف ترسه . لوی ترا فا:

— از نو بوری تولی لیچکاتی تووی یا

کرگج ترا فا: قندر حتا حوتنا رویمیجی

لوی ترا فا: قی چنیا

کرگج فا: لیچکی زحف قجی

لوی زانا نی دو ده چو چينو ، فننگ

ن کرده ، شى . کرگج کت دشش یابیش .

دو را تولی لیچکاتی خوبا قجیای . شى آربه .

اوجا آربانچی ی دی . کرگج هاوار کرده ترا فا:

— آ پرو لوی بک من ری پیدایی . من را

فا از نو بوری . من ترا فا قندر حوتنا رویمیجی .

لوی شى فننگ ن کرده . ت انکی تانزی

و بویمیجی حدرك ، حتا آبو لوی ینو .

اربانچی فا: زحف حو لو

ان وختو پوستی لوی نوای چتوری کیردیه .

بی مینا بابا گردان ب (و) ی دگهرین و لیشونا (آف) و (شف) ی (آو) و (شو) دیژن .

د قواعدی ده : زاری دوملی د قواعدی ده ژ هر زاری بیتر نیزنگی کردمانجی بی به . بری پیشین پروناقین (از) و (من) ، پروناقین زندگی ، دئی زاری ده و که خوه مانه و (از) ژ ی نه کتیه . ژ لورا هر و کی د کردمانجی بی ده به ، د دوملی بی ده ژ ی فعلین لازم و متعدی جهی جهی تینه تصرف کرن .

تقی د مسه لا جسنی ده زاری پالووی کیم کریه . لی زاری سیور کی می ونیرین خوه و که خوه هلاینه . د هن جهان ده مسئلا جسنی دئی زاری ده ژ کردمانجی بی بیتر ، کورتر و هور کتره . اوچند کو د فعلان ده ژ ی تینه دین .

پاش کو مه اف فرقیین ها ، بکرتی ، گوتن امی ژ خوه ند قانان ره منهوکی ب دوزاران بدن زانن ، ب بی سیوه رک و بی پالووی .

آف منهو چیرو ککه مگری به . پار خورتکی هژ ده سالی ، ژ ولاتی مگری ، اف چیروک ژ من ره گوتبو من ژ ی نفیساند بو . من اف منهو لهر دو زارین ژیرین دا ور گراندن . بی پیشن ژ ملا نذیر وی دووم ژ محی الدین ره دا ور گراندن . محی الدین خلکی پالووی به . ژ گندی همان ژ عشیرا قاسمان .

ژ بونا کو یک دین حکمی زاری ئی دن ده ممیت من ژ هر دو وان ره منهو وا مگری خوه ندن وژی ل زاری وان دا ور گراندن ، بی کو یک یا آدن ببینه .

دوملییا سیورکی

روژی روزان د دوین د هاوار دا کوت . شاری دو پیرو رمایی . دوی میان د کرگین و دس لیرکی جا د مندی . لوی یندو قشان اینان را پیدابی . کرگک خبیلی ترسا . لوی آی ری قا :

— اژدو تو بورا توری لیر کان

گرگک جری قا : حتا حوت روژی قندر

اغه فرقین بنگهی دناقبراهر دو نفیستان . د نفیشتا ملا تزیور ده مه تنی تشنن ولی گهارتن کو بریقه رنگین خوه ئین بناتی وندا کربون ورنند ند کتن وزنی .

\*\*\*

زارین زمانی گردی ئین بنگهی سسی نه . زاری ولاتی ژورین ، بی ولاتی ژیرین و زاری دوملی . هر و کی ناسه زاری ولاتی ژورین کردمانجی به و د کردمانجی بی ده فرقین زاراوا و شیوان هبه ژ ی زاری کردمانجی بی تو کیانی شانی بکیتیکه زمانکی دده . لی زاری ولاتی ژیرین نه ولی به . دناقف خوه ده لی زارتن دن بلاق دبه و چه چه ژ هف قدفته ، مینا بابا گردی و لوری . ژو پیقه د وی ولاتی ده زارتن دن هه ب گلکی ژ زاری ولاتی ژیرین دورن و د کتن نیزنگی زارین دن .

زاری دوملی : اف زار زمانی کردین دوملی آن زازانه . کردین دوملی د ولاتی ژورین د روژ آقایی وی ولاتی ده روشتی نه . ب پرانی تقلی کردمانجانن و ژ زاری خوه پیقه ب کردمانجی ژ ی دزانن . لگورا کو من سح کر یزاری دوملی ده ژ ی چند پره نه لی د بنگهی ده اف برین ها ددونه . د ناقف ئان هر دو پیران ده د دنگانی و قواعدی ده فرقین اشکره تینه دین .

د دنگانی بی ده : د زاری سیورکی ده حرفا (ژ) بقاسی کردمانجی بی نین به ژ ی ، د هن پرسان ده تینه دین . لی د دوملی پین دین ده مینا زاری پالووی ده (ژ) یکجار نینه و شوناوی (ز) یک آن (ج) یک رابویه . ژ لورا هکه ژ دوملی یان ره ژ بر کو لیشونا (ژ) یا کردمانجی (ز) دیژن زازا هاته گوتن دوملی پین پالو و مادنی ژ دوملی پین سیورکی بیتر زازانه .

د زاری دوملی ده پرسین هر زاری گردی تینه دین ، کودمانجی بابا گردی هورمانی ه . پ . . . دئی زاری ده (ف) هه به و گلکه . دبه ژ کردمانجی بی بیتر ژ ی . لی د هن پرسان ده فی (ف)



لی نه کر نه باف نه چون ستنبولی ومولود نه کت چاپی  
و خدی ژ عثمان افندی ره حر نه کر کو کداخوه  
بجرفین رهش بیت . ام فی چاپی ژبونا شا کرنا  
گیانی وی پیشکشی وی دکن .

\*\*\*

ژ هیلا دن من دزانی بو کو نک محمد علی عونلی  
افندی<sup>(۱)</sup> ژی نقیشتکه مولودی هیه . من ژیره شاندا  
ونقیشتاوی آنی . مه هردو نقیشت دانین برهف . مه  
دبت کو دناقبرا وان ده کیم وزیده فرقن هنه .  
بری پیشین د دستپیکا نقیشتاوی ده ده بیت هنه ،  
دیامه ده تنی سسی نه . من اف ژ ملا نذیر ره  
خوهندن . اوی گوت « بن بیتین زیده پاشی هاتنه  
بسرختن ، هر حال یکی ژ برخوه گوته »  
دقی بابی ده از تشکی نابیزم . لی هرو کی خوندقان  
بجوه دی بینن د و زنا وان بیتان ده خواری و کجانی زیده نه .  
عثمان افندی بجوه نکار بو بیتن بی وزن آن خوار وزن  
بنقیسینه . ژیره مولوداوی گواه .

دگل فی هندی ام وان بیتان بی کوتو تشتی وان  
بگهیرین ، راست براست د گهیرین هره :

بنامی واهیری نو آرد و آزمین

که ما دست کرد ب نو گروه رنگین

شما حمدی خوه اللابیری بیارن

شو وروژ قاپی دای د بقارن

پیغمبری ری صلواتی بوان

تم وتم دردی جی فرد بنالن

مثالی نادنی زانی ت مردم

(۱) محمد علی عونلی افندی ژ خوه ندابین گردان  
ئین ولا تباریز و ملیتپوره . بجوه ژی خلسکی سیور کی به .  
بصری د ازهری ده خوه ندیه . اف ده سالن د دیوانا  
قرانی مصری ده مترجمه . ل شرفنا ما کو فی پاشی بی  
بصری هاته چاپکرن پیشگو تنککه هیژا نقبساندیه .

ت جتیرینی گروهی توژی توخم

که توزانانکی نو دنیا سنینو

بزان آذنی جایی جو نیو

و دارو ای چه کی جتیر بکارو

کی جتیر چی کارت ای و دارو

بسو توبه بیارن هی غدارین

دنیای د توحی هول بکارن

گناهد خوری آری بن بنالن

برژنن حرسی چانرا بکان

ببو عفیو گوناھی مایی فیردو

گوناھکاری کی عمری خو د کردو

صلواتی بوانن رند و بولی

بره سنن پید ماگان د رسولی

ژو پیشه د منهبوی (من) ده ، د گلک جهان ده

ناقبرا نقیشتامه و یا محمد علی افندی فرقین دن ژی هبون .

مه اوفرک برپیل و د بن ره و بکو بکو نشان کر نه .

لی فرقین مینا پیش و پاشبونا پرس و حرفان و

گهیرنا جیوکان نه هیژایی نشانکرنی بون . هروکی د

بیت و مصرا عین ژ برین ده تینه دین .

چاغو قربان بی د فی اللای رسا

وقنا قربان بی د فی اللای رسا

کامکی آدر را خلاص خوری واشت

وا بوانوئی رسولی ری صلات

کامکی آدر را خوری خلاص واشت

وا رسولی ری بوانو الصلات

کردو اینان آرد باللای بول نیاز

کرد اینان و آرد باللای نیاز

— تو چاوان هيني دومي بي بو بي ؟

— ژ د يا خوه هين بومه . باقي من ژ ديرشوي هاتيه سيوركي ، ل سيوركي ديا من مهر كړيه . د باس پنځه زازايه . كچا ملا سليمان ، ملا سلېن كړي حافظ عيسي يه ، او ژ پسامي عثمان افندي ، مفتي بي سيوركي يه . ياني از خوارزي بي زازانم . از پنځه دناڅ زازان ده مزن بومه . ژ خوه ل سيوركي بي دومي خبر ددن ، لي بي كردمانجي ژي دزان . خلكي دورا سيوركي ژي زازانه . از تم دچوم گندان و من هر گاف ژ خلكي را مولودا زازاكي د خوه ند . نيدى من زاني بو كو پاش چند سالان راستي مروثي خوه هاتمه . ملا نذير بگيري من بهاتا . دومي زماني دياوي ، زماني وي بو . لي بي زماني باقي خوه ژي ، و كه خوه ، پاك دزاني بو . د كار بو هر تښتين دومي بي ژ من ره بي كردمانجي مانابكه . ملا بي من ملاكي زور ، ملاكي كتيب بن چنگك بو . مولودا زازاكي ، با ملا بي باقي و نهج الاناما ملا خليلي سعردى پيره بون . پاش دوروزان ملا بي من ژ درى هدا . هر سي كتيب د بن چنگك . . .

ملا نذير نقشتا خوه د سالو ( ۱۳۲۱ ) د پانزدهي مها نيساني ده پنځه نفيسانده بو . لي ابرو چاښين وي ژ بر پنځه شى بيكي او چندتاري بونه كو دستننيسا خوه نما دكاره پنځونه . ژاورا من ژيره هريت بگويكو د خوه ندن ، اوى مانه دكر زير و زبر د عدلانن ، من ژي بي هر دو حرفان ، عربي ولاتيني د نفيساندن . د دما نفيساندنې و بي هينجنا هر پرسانو من بالاخوه ددا قواعدى ، دستورنن زمانكي دانين درو برپيل د نفيساندن . بي څي آوايي از د گام بنگهي زاري دومي ژي و من او دداني بر كردمانجي بي . ژ هيلادن دتيا بو از بزاتم و ژ خوه ندقانان ره بدم زانين ، گلو اف مولوداها كنگي هاتيه نفيساندن و بي چي آوايي ژ عثمان افندي ره هلكت بو . لگورا گوتنا ملا نذير بيكي ژ ملا بين سيوركي ، پناڅي حجى يوسف مولودك بزمانى تركي نفيسانده بو .

او و عثمان افندي بهفت نه خوهش بون . چچكو بربري بهفت د كرن . پاش بلاقبونا مولودا حجى يوسف ميلدارين وي دگوتن : « ملاقي وزاناتى هولى دبه . نه بي كالكالان . . . » اف كرتو پست ب گهي عثمان افندي هه ژي د كرن . نه گر كه ام بيژن كو هر دوملاژي كړد و كړد زمان بون .

وكي عثمان افندي اف بهيستن ژ ناسين خوه ره گوت : « هكه زاناتى بي نفيسانده نامولودى بي از مولودكي بي زمانكي ولي بنفيسينم كو پي هيژ تو كتيب نه هاتيه نفيساندن ، نه بي تركي ، نه بي كردمانجي لي بي دومي . . »

تو بي څي آوايي و ژ وي بربري بي اف مولوداها هاتمه پي . نك دلي من اف جارا پيشينه كو ژ بربريا دو كړدان تشكي قنچ بر پي بو به . عثمان افندي پار لسيوركي چو به رحمتي . رحمتا خدي لي پت .

ديسان لگورا گوتنا ملا نذير عثمان افندي مولودا خوه بي پينچ سالان برپيا مشروطيتي ، ياني د سالو ( ۱۳۱۹ ) ده نفيسانديه .

مولودا حجى يوسف ياني آتركي ژ خوه هنگي كتيب چاپي . لي با عثمان افندي نه دكت . جاركي نقشته كه وي شانديون دياربكري ، او نقشتا كو من با خوه لير نفيسانده . لي ژ بر كو زاني بون بخوين بشوندا فكراند بون . هر وكي د پلي وي ئي پاشين ده پتركي نفيساندي به : « بالخاصه سلام و ننادنصكره . استفسار خاطر ايدرم . مذكور كتاب ولايتدن كرو اعاده ايدلى . سبي او قويا مامشاردر . باقى سلام . ۱۲ حزينان ۳۲۲ - امضا نايته خوه ندن »

پشتي مشروطيتي پسامكي من ، فائز بگ بدرخان ، بو بو قيسقامي پتوركي . با څي ملا نذير حجى ابراهيم چو بو بالي . مولود شاني وي دا . پر نه آرتوت فائز بگ هاته عزل كرن و فكر يا ستنبولي . مولود ژي پنځه ره بر كو بيخه چاپي . لي لسنبولي ژي او نكار بون بخوين . هنگي فائز بگ ژ حجى ابراهيم ره نفيسانده بو كو آن او پنځه آن كړي وي خوه بگهين ستنبولي مولودي ژوان ره بخوين دا كو بكارن چاپ بكن .

# هاوار

## کوارا کردی \* مجله کردی

### زاری دومی و مولودا عثمان افندی [\*]

بری چنداکی، برب خالصکا تاری فه دجوم.  
دنیا له بووناری، من وهفالکی خوه مه خوه دا بو  
بن چراکی و مه فیتکک دخوه ند.

د پاش مه ره کالک دهات، عمری وی در دورا پینجه  
وشیستی ده، سلاف له کسرخوه دا ناس کرن، ملا  
محمد نذیر گری حجی ابراهیمی دیرشوی، بری پانزده  
روژان ژ ولیت هاتبو وین د گریا کو ژیره آن برای  
وی ره کارکی پیدا بکم، من گوت:  
— قنجه، صبه و ره مال أم فد کرن.

لی زمانی وی نه زمانی خلکی جهی بوطن بو، هیژ  
بیتر دجو سرزاری دشتا دیار بکری.

صبه تر کالوهات، بسر هاتیا خوه ژ من ره گوت.  
ژ بر ترکان، ژ برستمکار بیباوان باز دا بو، د ناخآختنی  
ده من سح کر کو هر چند باقی وی دیرشوی بو لی  
بخوه د سیورکی ده ژ دبیا خوه بویه، ژ لورا زاری  
وی نه زاری جهی بوطن بو.

میقانی من ملا، ملا کی مدرسه دینی بو، کیم وزیده  
بچرفین لاتینی ژی دزانی بو.

وکی من ناخی سیورکی بهیست و من زانی کو محمد نذیر  
ملا به زاری دومی و مولودا زازا کی هاتن بیرامن.

ژ میترقه من دل هبو هنکی ب زاری دومی مژول بوم.  
نمازا مولودا عثمان افندی بیخم دست، وی ب یکی ره کو  
رند ب دومی یا سیورکی دزانه بخوبیم، لبر بنقشیم و بدم

[\*] کتیبخاناهواری دقان روژان ده مولودا زازا کی چاپ  
وبلاک کر به، اف بندها پیشگو تنکاوی مولودی به.

چاپکرن، ژ خوه د ثی زاری شیرین ده ژو پیقه  
تشتکی دن نه هاتیه نقیساندن، هاتبه ژی من نه دبیه،  
نه ژی بهیستی.

بلی ژ ژو قه به ازل ثی مه لودی د گریام، بری دوسالان  
نقشتمک کتیبو دستی من لی ناخآف، ژ پیشی و پاشی بی  
چند روپل کیم بون، ئین مایین نیف چرانندی و دهن  
جهان ده پرسین حشفانندی هبون، د گل ثی هندی پیلکی  
از پی مژول بوم، بکیر نه دهات، من ژی تشتکی  
هیژا و تکوز نه آتی در، ژو پیقه ژ من ره آریکارک  
ژی دقیا بو، آریکارکی ولی، هرچی کو من تزانی  
بو بکاره ژ من ره مانا بکه.

ملایی من هر چند کردمانج لی سیورکی بو، من  
ژی پرمی هکه ب دومی دزانت، ژ خوه اولی و رازی  
لین فگراند:

— هنگ کردمانجی بی دومی ژی دزانت، ژ  
ژنکی ره (جنیک) ژ سرف ره (سردم) و آتی ره  
(او) دبیزن.

لی دلی من لکوتنا وی رونه دشت، ژ بر کو  
بخوه کردمانج بو، گلک کردمانج هنه کو ب دومی  
دزانت، لی دآخفتنی ده هر دوزاران ثقی هفت دکن  
وو که خوه نزانن دبیزن، لی زازا بن هنه کو د کردمانجیا  
وان ده تو کیانی نینه، مینامه ب کردمانجی دزانت، ژ  
بر کو کردمانجی دناقبرا کوردین ولاتی ژورین ده زمانی  
تقایی بی به و ستران و دیلو کین زازان ب کردمانجی نه.  
بروی بکی ژ من ره بک دقیا بو کو دومی زمانی

دی و باقی وی ببت، من ژ ملی پرمی:



سال ۲

هه‌ما ۲۳

سێشبه

٢٥ تیرمه ١٩٣٣

# هه‌وار

السنة ٢

العدد ٢٣

العدد

الثلاثاء

٢٥ تموز ١٩٣٣

کوفارا کردی \* مجله کردیته

تێخستییین کوفاری

ج ٠٤٠ بدرخان

جگر خوین

لاجی حه‌نی

د کتورک ٠٤٠ بدرخان

هر کول آزیزان

ج ٠٤٠ بدرخان

زاری دو ملی

صحیبه

صحیبه

هروکی هاته گوتن

کرد و کردستان

الفانی یا کردی

د کتورک ٠٤٠ بدرخان

فریدون

أفین جبه‌ه‌لك

بژیشکی میران

چاره‌بین خیام

خوه ناس بکن

دلستی

کله‌خرمی

SAL 2  
HEJMAR 24

YEKŞEMB  
1 NÎSAN 1934

# HAWAR

ANNÉE 2  
NUMÉRO 24

DIMANCHE  
1 AVRIL 1934

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## DI VÊ HEJMARÊ DE

Kurd û Kurdistan  
Yewnanistan  
Mijde  
Çûk û Fil  
Kaxeza Eşkere

Delalê Beriyê  
Çarinên Xeyam  
Pendname  
Dêrik  
Straninen Botan  
Tu çîre?  
Xeyamwari

Herekol Azîzan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Lawiki Pijderi  
M. E. Boti  
Xwediyê Hawarê

Stranvan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Cegerxwin  
Newzad  
Str. Jéliyan  
Remoyê Qenco  
M. E. Boti

## BIRÊ FRENSIZÎ

Le Beau de la Steppe  
Chansons de Botan

D. A. Bédir-Khan  
Pirs. Kurdan





SAL 2  
HEJMAR 24

YEKŞEMB  
1 NÎSAN 1934

# HAWAR

ANNÉE 2  
NUMÉRO 24

DIMANCHE  
1 AVRIL 1934

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### K—Q

Di elfabêya me de ev du herf bi hev guhêrîne: « k » ketiye şûna « q » ê, û « q » ketiye şûna « k » ê.

## KURD Û KURDISTAN BI ÇAVÈ BIYANIYAN

### —3—

Me jor de tixûbên welatê kurdan goti bûn. Welatê wan li bakur ji cihên bilind ko bi darên mazi û berûwê dorgirti ne, dest pê dike û hin bi hin ber bi nivro nizm dibe û digehe çolê. Li serê çiyayên wan ên biberî kanî der dibin û çem û robarin diherikin, digehin medrebên birincê ko ji quntarên çiyê ber bi destê ve drêj dibin.

Di cihên bilind de çandini kêm in. Ji ber ko gava di beriyên bêdar û bej de roj her texlit zad û çandini şin dike, digehîne, serê çiyayê hêj bin berfê de ne.

Li gundên kurdan bergehêki spehi heye. Gava mirov nizingî wan dibe tof tof darên gwiz xwe şani didin. Di bin siha wan a pehn de xani veşarti ne.

Ji rexê din dora kanî an keviyên robaran bi spindaran xemilandi ne. Di tu gundi de ev ne kêm in. Ji xwe ev spindarên ha di lêkirina xaniyên wan de bingehêki mezin in.

Ev dar, têt-avexwarî û li bin rojeke geş, di zemanekî kin de digehin drêjahike welê ko mirov li wan ecêbmayî dimîne. Wek zilên zeviyên ceh û genim li rex hev himbêz, bedenên wan zrav û rast, mîna nayan bilind dibin.

Li gora nizm û bilind bûna cihê avahiyê, dora wan de rez, darên zeytûn, bistan û zeviyên ceh û genim hene.

Lê di gundên kurdan de, kêm tête ditin ko minareyek bi ser wan keve. Ji vajî ve gundên tirkan, ên kiçiktir ji tucar ne bêminare ne. [1]

Diwarên xaniyan bi kerpiçên ko bi heriya kakirî tête birin, lédikin; bê tu dar û dep. Li şûna penceran di jorê diwaran re qulan vedikin. Ev qulên ha bi tu tiştî ne girtî ne. Ji ber ko hatinditina pipok û kaxezê li wir hêj ne nas e.

Deriyê xaniyên xwe ji darê berûwê pihêt çêdikin. Di ser diwaran re bi bi-hustek an bi du bihustan ji hev dûr, beştinen spindaran drêj dikin, û bi mirdiyaqan neqeba beştan dadigirin û axê berdidin ser. Qederê pêki, pêyek û niv. Ev e, banê xaniyên wan.

Li Havînê, kurdmanê di ser van banan de dinivin; û pericar ev banên ha bi diwareki çarpê bilind, dorgirti ne. Ev diwar şûna singtaldekê digirin. Xaniyên maqûlan ji di vî şiklî de ne. Tenê du tayên wan hene û carinan bi milekî wan ve burceke çarparsû bilind dibe.

Belê xani bi her tiştên xwe welê hatine lêkirin ko di wextê şer û pevçûnan de bi kêrî wan bèn, ji wan re bibin şergeh û asêgeh.

Di hundirê xaniyan de ji aliye malê pève mezeleke mezin tête ditin. Mezela rûniştinê û mêvanan. Li mezê de tifikê heye. Ji her du milên tifikê ve du dikanên nizm, lê raxistî radibin û tèn heta derî. Çend balgih li ser in. Raxera koçka maqûlan bi mehfûran xemilandi ne. Tevayîya raxistina wan ev e. [2]

[1] Ji ber ko em kurd tucar Xwedê ji bir nakin, û ew di her derê de bi me re ye. Jû pève kurd bêyi ko xwe bigihinin hev û herin mizgeftê dikarin nûmêja xwe bikin. Ji lewra ko em ne li xeni lê li xwediyê xeni digerin.

[2] Welê dixuye ko Marşal tenê xaniyên kefxwê û kiziran ditine. Ji ber ko herwekî em dizanin xaniyên serokên eşiran bi awakî spehi raxistî ne, û bi xeml û xêz in.



Gund di nav hev de, bi şiverênen teng bi hev re girêdayî ne. Şiverênen welê ko hêstir bi xwe bê talûke tê re nikarin derbas bibin. Ev rê ji bona suwarên nehînbûyî tiştêki gelek dişwar û bitirs in.

Her cih û welat di nav xwe de deba- ra xwe pêk ditîne û hewcedarî ê din nabe. Ji xwe naxwazin dan û standina wan bi xelkê dorê hebe.

Jin kirasê penbû û nivhevrişim, cawê sor û reş-xêzkirî çêdikin. Bi vî cawî şalên mêran ên fireh, û şapikên wan tèn çekirin. Jû pêve jin bi çekirina eba, kulav û kumên wan jî mijûl dibin.

Mehfûrên xwe, ko xemla xaniyên wan a bingehî ye, an li erdê raçandî an li levnê vegirti, çêdikin. Mêr bi cotkariyê mijûl dibin, diçin ber pêz, qelûnê vedikişînin; an ne di şerî de ne.

Texmînkirina nifûsa kurdan tiştêki dişwar e. Lê herhal jî niv milyonî ne kêmtir in.[3]Piraniyeke wan misilman e. Di tixûbên ecem de kurdên fileh jî hene. Li Şingalê û ber bi nivroyê wê ve, kurdên êzîdî rûdinin. Ji ber tirkan ve êzîdî jî (.....) re diparêzin û jî lewra kirin û firotina wan re destûr heye. Filehên ermenî ko di nav wan de rû- dinin û jî wan ne kêmtir in, tev de fi- lehên ortodoks in.

Di navbera hemî kurdan de mişabe- teke milî heye. Heçko demînin hev. Rengê çermê wan bi qasî yê tirkên dorê û ermenîyan ne esmer e. Kurd bi piranî bejnîbilind û bi dest û lep in. Dîtna wan wek tewandî ye. Lê çavên wan gelek nizingî hev in, û bergehêki wan welê heye ko mirov dibêje di kortikên xwe de qey dibrûskin.

Kurd di gerandina avê de gelekî şeh- raza û hinerwer in. Bêyi tu aletan, cuhên avê jî kaniyên cihên bilind de rawestayî, dibin û digehînin pal û kaşan. Ji kaniyê bi sactan ve dûr. Heta wê dera ko şinahî hewcedarî avê ne. Ji xwe di wan doran de, jî her texlî şinahî- yan re av divêt.

Perîcar palên çîyan heta bi bilinda- hiyeke ecêb, şehnişînwarî tebeq tebeq, mîna diyarên bi serhev, ajotî û avakirî ne. Wek rezên me ên çêtir-xebitandî.

[3] Dîsan jî kurdan herçî Marşal bi xwe ditîne, ne hemî kurdistan û tevayîya kurdan.

Belê kurd jî bona destxiststina bihustekî erdê çandbar û danîna daran holê di- xebitin. Zevî û awayê gerandina avê jî bona kultûra [4] mîletê kurdan bir- haneke bes e.

Belê welat û ezmanê vî mîleti ê zelal ko bi tevayîya giyanê xwe pê girêdayî ne, holê ye.

Di sala hezar û heştêsed û sih û heşt- an de Hafîz paşa bi ser Çiyayê-Ûerzan de girti bû; û bi şûr û agir xelkê wî ajotî bû heta bilindcihên çiyê, deverên asê, nav fêş û zînanan de.

Xelk liber disekinîn. Hetanî ko zad û qût dest bi kêmbûnê kirin. Hingê rispiyên wan li der konê serdarê mîzefer de xuya bûn. Jê efwa xwe dê bixwestana.

Paşê jî bona xistina vî xelkî bin destê hikûmeta xwe jî rakirina wan jî wan çiyayên asê pêve tevdiroke din nizani bû. Belê dilê wan hebû wan jî cih û malên wan rakin, bibin deştê û li wê derê bi cih kin

Paşa gelek tişt jî wan re wad dikirin. Paşa di cihekî welê de dikarî bû bi qî- ma dilê xwe comerd û destvekîrî bibe.

Ji wan re digot ko, li deştê, jî her yekî wan re, jî erdê wan deh caran bêtir erd dê bihata dayîn. Dîsan sê salan, jî wan ne qemçûr ne jî wêrgû dê ne hata standin. Ji milê din, jî wan re wêşê dewlemendiyên deştê dida. Mîna çandina darên tû, çekirina hevrişim, bi xwedî- kirina hespan. Li şûna ko li çiyê tûtîr- kan bidin hev û herin ber pêz. Lê mirov welê jî, kari bû jî masîyan daxwaz bike, jî xwe re torekê çekin

Rîspî bi çavên zelûl li ezmên fed- kirin û tiştên ko jî wan hati bûn xwes- tin, pesnê wan dan, û tev xelatkirî dan rê û vegerîyan nik yên xwe. Tiştên ko seh kirî bûn, jî mirovên xwe re gotin. Cih de jin û zaro rahiştin lifingên xwe. Kuştar jî nû ve dest pê bîkirana. Her wekî dest pê kirin jî. Û hetanî ko ser-

[4] Di hejmarê Hawarê a nezahîm de me jî kul- tûrê re çand gotî bû û di ferhengokê de bi awayê jêrin mana kirî bû: «Ji tevayîya ilm û hiner û piş- yên spehî re çand tête gotin. Me ev pîrs jî çan- dinê girt. Ji xwe di her zmanî de jî welê ye. Çand an kultûra ewrêpayî: tevayî û awayê zanîna xelkê Ewrûpayê ye. Em dikarin bêjin Çanda Kurdan jî. Pê dîrok, çîrok, stran, dîlan, mamik, medhelok û her texlî pişê, rêzîk û adetên me, têne seh kirin.

xwerabî bi temamî ne hatine kevandin,  
kuta ne bûn. Lê hikûmetê bivênevê dev  
ji istimara Kurdistanê berda. Ji her ko  
bi ceribandîne têgehîştî bû ko proja  
rakirina kurdan ji çîyan û cihkirina  
wan deştê nare serî.

Kurdistan seranser ji komên gundên  
jihevcihê pêkhatî ye. Carinan çavê mi-  
rov di sinên çîyan, an di nav fers û  
zinarên asê de, bi burcekê dikeve.

Ev burcên ha xweserî hin began in.  
Lê beg bi xwe hergav tê de rûnanin.  
Tenê di zemanê tengî û talûkê de di  
kevin-ê; û ew ji wan re dibin asêgeh.

Ev mîrekên ha, cuda cuda, di nav  
xelkê xwe de rûdinin. Destê tukesî de  
birekî welêt ê mezin nîne. Tenê di  
wextê tengî û talûkê de mirovên wek  
Begê Rewandizê, Bedir - Xan Beg û  
Seyid Beg, birek ji xelkê xwe didin hev,  
dixin bin alên xwe û leşkerekî xurt  
ditînin pê. Lê piştî ko talûke dibore û  
mesele safî dibe, leşker ji hev dikeve  
û ji mezinê xwe vediqete. Ji xwe her-  
kes tenê kerîyê xwe diparêzîne.

EVE QELSÎYA VÎ MILETÎ. HEKE YEK BUWANA,  
DI NAVBERA WAN DE TIFAQ HEBUWA EV MILETÊ  
HA NE DIHATE KEVANDIN Û MEËLÛB KIRIN. LÊ  
GAVA YEK DIKEVE TENGÎYÊ ÊN DIN DI CIHÊN  
XWE DE RÛDININ, ARÎKARIYA WÎ NAKIN. HER-  
WEKÎ GAVA REŞÎD Û HAFIZ PAŞA DAJOTIN SER  
WELATEKÎ ÊN MAYÎN LI CIHÊN XWE DIMAN,  
BI AZAHÎTEKE YEKROJÎ ŞA Û KÊFXWEŞ DIBÛN,  
HETA KO DOR DIGHA WAN JÎ.

Ber bi nivro, di berîyê de kurd gihane  
tixûbên xwe ên tebîî. Erebên ko yekcar  
vajîyê vî miletî ne, xarên wan ên paşin  
ji hev de xistine û ew sekinandine.

Herwekî şerê ereb nikare şahîne kurd  
di bilindcihên xwe ên asê de biqefilîne,  
kurd ji welê, di berîyê de nikare wî  
bike bin destê xwe, hetanî ko ji hawirê  
xwe dernekeve.

Dijminê wan ê xedartir, heke yekcar  
ji xurtiya xwe ne ketî buwan, diviya  
bû ecemên hevtixûb bibin.

Lê ji herkesî zêdetir, xwe ji paşayê  
Beşda û Diyarbêkrê diparêzin. Ji lewra  
ko wî wextî, liber destê hikûmetê û di  
wan doran de, leşkerekî bi pêncî hezar  
pey-yî û karkirî hebû. (dûmahik heye)

HEREKOL AZIZAN

## ÇARÎNÊN XEYAM

Da, ji xweşdiliyê tinê nav maye  
Wey hevalê gihayî, şeraba xav maye  
Destê xweşiyê, ji şerbikê şerabê mekişîne  
Îro ko destê te de, tinê piyan maye



Heya kengê gotina çar û pênc, ho meyger  
Çi yek, çi hezar; seh kirin dişwar e, ho meyger  
Em hemî, ji axê ne; kemaçe werine

[ho meyger

Em hemî ba ne, şerabê bine ho meyger



Ho çerxê! tu her, dilê min xemgîr diki  
Kirasê min, yê şahiyê zîzîr diki  
Bayê ko li min dide, av diki  
Ava ko vedixum, devê min de ax diki



Ho gulê! tu wek rûyekî dilhevin xuya dibi  
Ho şerabê! tu wek lêva canrevîn xuya dibi  
Ho bextê şerût, tu bi min re  
Her dilsar î, lê xemrevîn xuya dibi



Destê te de yaqûta ruhn heye, ho meyger  
Dilê min wek yaqûta ronak ke, ho meyger  
Piyaaneke dagirtî bide destê min, ho meyger  
Da ji şerabê dilê xwe jîndar kim, ho meyger



Çendan li dora xwe dinêrim  
Ji çemenan, bihuşt e; ji kewserê, çem  
Dest wek bihuştê ye; gotina dojhê berde  
Rûne vê bihuştê de, bi delaleke bihuşdem



Ronî û şerab û tava heyvê, ho meyger  
Û delaleke yaqûtreng û nazdar ho meyger  
Şerbikekî şerabê bide min berî ko  
Şerbikan çekin ji axa min û te ho meyger



Dema spêdeyê ye, delala qedrgiran  
Lêva te bi stran be, destê te bi piyan  
Bi hezaran Cem û Key xistin erdê  
Ev çûyîna Tirmeh û hatina Gulan



Sibeh e, xweş e, dilxweşi ye; ho meyger  
Ko şeraba şevê maye, piyanê jê dagire

[ho meyger

Piyanê bide destê min û qedrê vê demê bigire  
Sibehê bibi livinê aqîdê, ho meyger



Di vê rêya xedar de bi dilnêrmî bijî  
Hevqas xema dinê mexwe şa bijî  
Da ko paşayîka vê dinê, neyin e  
Xwe tune hesab bike û aza bijî

Dr. K. A. BEDIR-XAN

# DELALÊ BERÎYÊ

JI DEVÊ EHMED FERMANÊ KIKI

— 1 —

Hay lo dilo! . . . . .  
Emrê dilê min pê ra, de bajo  
V' êvarê mi rebenê! . . . . .  
Tu carê li darê dinyayê  
Nabe tu peya bi  
Li ser bozê qesirandi  
Dêl û bijî bi hena bi . . . . .

— 2 —

W' ez tu nifira li bejna delêl nakim  
Li Beriya-Mêrdinê, li Kepezê-Kika, erdê  
[bêpîva  
Bira li delêl derkeve xarek, mîna xarê şemera  
Suwarê seklawî li delêl kar bin  
Erdê bêpîva, li cî xa' ber' dir, ga' nê xwe  
lêdikin[1]  
Bihustê lawê bava bi lire be  
Mêrê xerab ji mêrê çê bi şade be  
Destê xorta dizgînê negire  
Lingê lawê bava di rikêbê nesekine

— 3 —

Şadê-şudê delêl gelek hene  
Bû hefadê koçan û kerîyan  
Navê revê, delal heram e  
Delêl were malê me va ne  
Serê stûna kona nîzik e, j' te bi xuya ne  
Tevdana sing û berê min, xezalê!  
Ji eşa pêve, li nefsa canê delêl  
Suwarê seklawîya helal be

— 4 —

Di v' êvarê, emrê dilê min pê ra  
Bira li me nehata ji ba  
Bayê xerbî zînetê rûkê dinê  
W' ezê bala xwe didim-ê, maqûlê di kika  
Kîşane oda bavê Bişar  
Şêwr û mişêwrê roja barkirinê

— 5 —

V' êvarê xewa xelkê delal di paşila min  
[de naye  
Nizam delal gûti sar û germê  
Ezê nizam delal nexweş e  
W' ez nizam seklawî ranê delêl kutane  
Nizam wacê mala bavê min kevn bûne  
[kêç ketin-ê

— 6 —

Di v' êvarê, delal, minê ji gira girê kcwkeyo  
Ketim rêz û koçan û kerîyê di kikan  
Xelka min e delal, liser nag û delûlan  
[girtiye todeyo  
Minê nihêrî bejna zirav, mîna seklawî,  
[seklawîyê Bavê-Bişar

[1] li cihê xamberindir guhanê xwe

Li der konê Bavê-Bişar bisekîae, bêreşmeyo

— 7 —

V' êvarê . . . . .  
Seyda lawikê xelkê delal teyr û tivilkê  
[dora mala bûn  
Seyda xelkê min i delal, xezala serê geleyo  
Delal de rabe destê xwe bi destê min de  
Emê hevdi birvinin; xwe bidin dora  
[Xabûrê-Begara  
Bira Girê-Mîxergan ji min û xelkê delal ra  
[bibe sitareyo

— 8 —

V' êvarê . . . . .  
Ezê daketim Beriya-Mêrdinê, ji dilê min  
[rebenê! beriya berê  
Lê şîn dibû kulilka qewanê, tûmê di xerdelê  
Salê-çûnê ez xwestika xelkê delal bûm  
Sala vê salê, ketim tora yeki pisê mirdar  
Roja barkirinê, li dewsa koç û wara dimam  
Darê dergûşê li min bû bela  
Mirata kitanê, li min rebenê, bû baskê  
[di qertelê

— 9 —

Di v' êvarê . . . . .  
De bajo, rêdûro bajo, betiliyo bajo,  
[heyiriyo de bajo  
Li ber germîya havînê rûmene, vê sibekê  
[tuê bigiri sar û germê  
Serê te biêşe, tuê nesax bikevi  
Di welatê xerîbiyê, bi emelê serê min bi

— 10 —

Hay lo dilo! . . . . .  
V' êvarê minê Çaxirbazara şewiti  
Mi ne diye, bi saxlûxdana, bi çava ji min dûro  
Sing û berê min rebenê!  
Vê sibekê mîna baççekî, ji baççeyê Nisêbinê  
Mîna mêrgê, ji mêrgê Tilkerme  
Hawik, ji hawikê dora Xêbûro  
Emrê dilê min pêro  
Were delal tewafa sing û berê min, rebenê!  
Serê xwe deyne rakeve  
Ev stêra li me der bû, Stêra-Karwanqiranê  
Serê xwe deyne rakeve, Stêra-Sibê li me dûro

— 11 —

Dere, hey lo, dilo . . . . .  
Delal tu terka min bidî, ez terka te nakim  
Lo! lo! melûlo, xempiro, keserkûro!  
De bajo rêya te dûro! . . . . .  
Îro du ro ji sing û berê min, rebenê! maztûlo  
Xwezika min xelkê delal bidîya  
Mîna dewr û dewrana ewilî, tev selefê  
[Bavê-Bişar  
Beriya-Mêrdinê, ser piştê hemdanîyê  
Vê sibekê li hawikê dora Xêbûro

— 12 —

Heylo! . . . . .  
V' êva rê emrê dilê min pê ra

Vê sibekê karê tev bizinê, diçêrin li pozê  
[Çiyayê-Şingalê

Cilê delêl hatine ber şuştinê  
Ezê bistinim qalûbek sabûna Îelebê  
Bişom ser ava Zirganê  
Bisom, lêkim ava mawerdi, ezê raxim ser  
[darê qurnefilê

—13—

Di v'êvarê . . . . .  
Kaleki mala bavê me heyê, liber rehîma  
[Xwedê, roja barkirinê  
Sê brê me hene, li bin darê silehê, roja  
[qewimandin û kuştinê  
Gava çavê min nekev, li bejna xelkê delal  
Ezê berê xwe bidim, herim Midyatê  
Dawa taqîya xwe bibim cem hoste Melko  
[ser boyaxa reşkirinê

—14—

Dilo lo! . . . . .  
Vê sibekê xelkê min î delal çû welatê xeribiyê  
Kesek li mala tunine, w'ezê sebra dilê xwe  
[pê binim

Derdê dilê min pir in, şevê kanûna  
[şevine drêj in

Ezê rabim lêwik li dergûş xînim  
Ji derdê dilê xwe re rebenê, bilorinim,  
[bilorinim, bilorinim  
Hêstirê xwinê, ser sê biskê di şê, hinarê  
[rûka bibarinim  
De bajo emrê dilê min pê ra . . .

—15—

Haylo dilo! . . . . .  
Rabe berê xwe bidin welatê Kurdistanê  
Herin Diyarbekra xopan, korta gidiya  
Ezê vê sibekê herim, kevirkî rakim, ji  
[bedena hevsa xwiniya

Ezê wî keviri têxim navbeyna xwe û ber vî dili  
Di pey bejna delal, li welatê xeribiyê  
[sebra dilê xwe pê binim  
De bajo emrê dilê min pê ra, tim lo lo!  
De bajo rêdûro, bajo xempiro . . .

—16—

V'êvarê ji gira, Girê-Girdêşê, Girê-Girdêşê  
Xelkê min î delal suwar bû, ciwanika ibeyê  
Berê xwe da xêmê beriya jêrin  
Lingê ciwanika xelkê delal li keviran dikeve  
Fzê nizam teresbav solbend neçê solkiriye  
Zikê min dişewite, dilê min vê ra dişê

—17—

Keçikê digo: lo delal ez ne jin im, na bimêr im  
Ez xweyînga heft bra me, weki şêr in  
Dotmama donzde pismama, suwarê  
[hespê nêr in  
Gava çavê min nekev li bejna delêl  
Ezê herim binîya Nisêbinê

Her heft bra, donzde pismama şokê vedîşêrim  
—18—

V'êvarê . . . . .  
Heylo delal, li min û li Tilkermê  
Delalê malê suwar bûye; vê royê, vê rogermê  
W'ez ne ketim ber etra delalê malê  
Ez kefim ber etra bi şalê sipî, bi kirasê melesî  
Çûye serê kaniyê, vê sarê, vê saregermê  
De bajo heyirîyo! . . .  
—19—

Heylo dilo! . . . . .  
W'ezê diçûm ber derî, derî li min venebû  
Hilkişiyam liser banê xênî, rê tune bû  
Daketim aliki hewşê, min bala xwe da-ê  
Xelka min a delal, li bin şibakê  
Di xewa şêrin da bû  
Sura bayê xerbî hali bû  
Temarê li çavê min kiri bû  
W'ezê bi xwe hişyar ne bûm  
Çûm tewafa sing û bera, bi kilit û bi mifte bû  
Ehmedê Ferman, nizam ne siûda min, vê  
[sibekê, ne bextê te bû  
—20—

Dere heylo . . . . .  
V'êvarê Xwedêo, rebio, minê tiştik ji te navê  
Koneki çarstûnî, çitik şikakî, navmalê  
Mêkutki ji darê benavê  
Minê konê delal vegirtiya  
Li Beriya Mêrdinê, li Kepezê-Serê-Keniyê  
Navrokê Evdiselamê . . . . .  
—21—

Lê, lê xezalê . . . . .  
V'êvarê tu xezala min î, xezala binê beriyê  
Devî li çêrê, çavî li karê, guhî li gaziyê  
Heylê xezalê . . . . .  
—22—

Vê sibekê Xwedê bikira miradê min û  
[xelkê delal  
Li Beriya Mêrdinê, meha Temûz û Tebaşê  
Minê rojî bigirta li ser rojîyê  
Xwezi ez bibuwama rimek ji dwanzde movika  
Têketama ser piyê xelkê delal, suwarê  
[hemdaniyê  
—23—

Di v'êvarê keçikê digo: dilê min qûma ferêl e  
Kosara Kika, Amûda rengîn, stûna welato  
W'ez nakim terka bejna zirav, heya  
[serê nin nere  
Diyarbekrê, ber darê celêdo . . . . .  
—24—

Haylo dilo . . . . .  
Lo delal, heya gava mirinê  
Heya roja kuştin û qewimandinê, delal heylo  
Vê sibekê tirsê min ji wê tirsê ezê bimirim  
[welatê xeribiyê  
Berî kalbûnê, pîrbûnê, min tîr ne go  
[delal heylo...

# YEWNANISTAN

## ÇAWAN BISERXWE BÛYE

Di sala hezar û pêncsed û sisê de, ango beri çarsed û sê salan Yewnanistan keti bû bin destê tirkan de. Xelkê Yewnanistanê di bin destê tirkan de, jar û perîşan bû bûn. Ne şeref ma bû cem wan, ne ji dewlemendî; çî cotyarî û çî dan û standin. Di sala hezar û heftsed û heştê de gava di navbeyna Ûrûs û tirkan de şer çêbû, yewnanan hevî dikirin ko Ûrûs dê bibe arîkarê wan, û ji bona biserxweyîya xwe rahûn.

Tirkan zûka esker şandin ser wan, şerên mezin, şerên giran û xwindar çêbûn, tirkan zora wan birin û eskerên wan hatin şikestin. Lê Yewnanistanê hevîna azahî û istîqlala xwe her xurtir kir. Piştî mîdekê şairekî yewnan, Konstantîn Rîga rabû û bidizî civateke welatî danî. Di dora wê civatê de zelamên hêja, xwenda, zana û kêrhatî gihane hev.

Di sala hezar û nehsed û heştan de tirk ketin pey konstantîn Rîga û xwestin wî bigirin. Destê tirkan nedigihî wî, Konstantîn Rîga baz da û çû Nemseyê. Tirkan ji dewleta Nemseyê spartina Konstantîn xwestin, wê dewletê jî bextreşî vê re kir û Konstantîn sparte tirkan û bi destê tirkan di bajarê Belgradê de hate darvekirin.

Hevîna û germîya Yewnanistanê sist nebû. Gund dişewitîn, bajar xirab dibûn, mîrg û parîzên spehî dibûn tîrb û gornistan, lê di kavilên wan de gula azahîyê vedibû û xwe geş dikir. Camêr û mîrxasên nû wek Mavrokordato û Îpsilantis dest bi xebata welêt dikirin û xwe dişidandin. Dil, gotin û armanca Yewnanistanê bû bû yek. Serxwebûna welêt an mirin!!

Ji nû ve ji bo azahîya Yewnanistanê serxwerabûneke mezin destpêkir û xelkê Yewnanistanê ji nû ve ji dinyayê re da zanîn ko xwîna wan ne kerisiye û kurên kal û kalikên xwe ne, wek berê egît û gernas in; dilê wan teji mîrani û camêri ye.

Îpsilantis bi duhezar zelamên mîr zora tirkan bir û tirk ji axa Yewnanistana bakur derêxistin. Lê pişt re, di sala hezar û heştad û yekê de Îpsilantis jî şikest û revî çû Nemseyê. Serekên din dibin emrê Georgakis de bi zelamên xwe ve di Dêra-Sekoyê de bi tirkan re şer kirin.

Tirkan çarmedora wan girtin. Yewnanan gava ditin ko êdî ji mirin an xwespartinê pêve tu rê ne maye bi mîrani êriş kirin ser tirkan û hemî di wî şerî de wekî şeran hatine kuştin.

Keşe Germanos gava şikestina welatîyên xwe bihist xelkê dora xwe kom kir û çû ser tirkan. Di wî şerî de (15000) tirk hatin kuş-

tin. Di wê salê û di şerêkî din de Yewnanan ji nû ve (8000) tirk kuştin. Di sala hezar û heştad û bist û dudowan de mezinên Yewnanistanê istîqlala xwe îlan kirin. Tirkan ji nû ve esker şandine Yewnanistanê û di nav tirk û Yewnanan de şerên mezin çêbûn, gelek xwîn hate rêtin dîsa tirkan zora Yewnanistanê birin, (23000) zelam û (47000) jin û zaro bi destê tirkan hatin şerjêkirin.

Serkên Yewnanistanê û zelamên wan hevî û hevîna xwe sist ne kirin, ji nû ve dest bi xebat û şerî kirin. Di sala hezar û heştad û sisêyan de di navbeyna wan û tirkan de ji nû ve şerên mezin û xwindar destpêkirin, Vêcar (3000) tirk hatin kuştin. Lê gundên Yewnanistanê hati bûn şewitandin, nik xelkê pere nema bû, welatê Yewnanistanê xerab bû bû. Xelk ji birçîna dimirin.

Di sala hezar û heştad û bist û pêncan de tirkan ji nû ve ordûyeke mezin pêk anin û şandin Yewnanistanê. Dîsan şerên xwindar destpêkirin. Êdî wisa xuya dibû qey dema mirina Yewnanistanê hatiye; eskerê tirkan zehf û xweyçek û cebîrxane bûn. Gava mîrxasên Yewnanistanê seh kirin ko êdî mirin e, destên xwe dan hev û bi mîraniyeke ecêb şer kirin.

Dewletên din heya wê demê destên xwe ne dilivandin û arîkarîya Yewnan ne dikirin. Lê gava yekbûn û yekîtiya hemî Yewnanistanê ditin dest bi arîkarîya wê kirin. Ji boyî Yewnanistanê di navbeyna Ûrûs û tirkan de şerêkî mezin çêbû. Tirk hatin şkenandin û di sala hezar û heştad û bist û nehan de Yewnanistan bû dewleteke xweyistiqlal û di sala hezar û heştad û sihi de dewletên dinê hemî istîklala Yewnanistanê nas kirin.

Îsal sed û sih û sê sal in Yewnanistan xweyistiqlal e, biserxwe ye. Miletên hesir û dil ên bêtir serxwe bûn, ên mayî ji dê serxwe bibin.

Xwedê insan aza û serbest afirandiye. Em ji tu miletî ne kêmtir in. Tu miletî ji miletê me ne mezintir e.

Paris: Dr. K. A. BEDIR-XAN

## TU ÇIRE AXÊ DE YÎ? . .

— Ji Mela Ehmedê Botî re —

Sadiyê şîrazî, yek ji şairên Ecemistanê e bi nav û deng e. Sadî du kitêbên mezin hiştine. Bostan û Gulistan. Gulistana wî jî qiseyên felsefî û hikemî teji ye. Çarîna jêrîn a kurdandî ya Sadî ye. Ji yara xwe a mirî re gotiye.

Rojên Buharê ne, gul û lale û nesrin,  
Ji axê dertên, tu çire di axê de yî?

Mirî ewrên Buharê, herim bi zar bigirim  
Di gorna te de, ewçend ko tu jî, ji axê der bibi

REMOYÊ QENCO

## PENDNAME

Ezê bêjim hon dilê xwe megirin  
 Dinya ne hêja ye, entê tev bimîrin  
 Mala me geleki kûr e, yek max e  
 Ew ji li bin şeş heft tebeqên ax e  
 Em tev bira ne, ji yek dê û bav  
 Ji mirîyan ra çî maye, ji bil nav  
 Qet şîyar nabin, ta kengê razin  
 Hon mezin in, em ji we dikin gazin  
 Xelk dibêjin şeş û mela  
 Wextê zekata xwe, dibêjin bela  
 Çiman hezretê peyqember gotiye  
 Zekatê mexwe, ger tu haşimî ye  
 Malûmê we ye, ew qrêja mal e  
 Lewra ji şerîfan ra ne helal e  
 Em bi dilê xwe tev hakim û mir in  
 Di zekatê de, ji qismê feqîr in  
 Madam ko em warîsê enbîyan e  
 Çima em xerîkî karê dinya ne  
 Bes e, hon ji xew rabin, ez gori zû  
 Zarokên xwe ra bêjin ilmên nû  
 Çiman hezretê fexrel-alemin  
 Gotiye: «Ullibul ilme welaw fis-sin»  
 Misilman kengê li Sin, hebûn, ew çax  
 Ax! ji derdê we şeş û mela ax! ax!  
 Hon dibêjin em bûne qutbê razî  
 Qet yek ji we nabe miftî û qazî  
 Hon bi van her du ritban ne razî ne  
 Lewra hon belengaz û pitazî ne  
 Hon tev mêr û çeleng û xort û ciwan  
 Hon ji pîra parsê dikin ji bo nan  
 Ez mela me lewra dilê min diêşe  
 Xwedê rehma xwe bike di ên pêş e  
 Em hîni tu kari ne kirin yekcar  
 Lewra em hêj mane tîral û bêkar  
 Axa, ez ketim bextê te û Xwedê  
 Ezê çend pîrsan bêjim tu guh bidê  
 Binêre di bin destê de heye sed xan  
 Hemî belengaz û reben û gavan  
 Tu malê wan distîni her bi dilêş  
 Tevî dixî . . . na menûr û derwêş  
 Ger we tev bidana bi top û tîving  
 Dê hon ji bibûna hemberî firing  
 Lakin çî bikim we tev da bi şabaşa  
 Qet kes ji we ne bû wezîr û paşa  
 Li ser bextê min bê hon mêrê çê ne  
 Ax ax êsirê destê xelkê ne  
 Bes e, hon eqlê xwe bidin serê xwe  
 Destê xwe bigirin vîcar li perê xwe  
 Çiman ji bona ax û mal û xwelli  
 Perê xwe didin bi hev dikin gili  
 Hon mala xwe bixun her yek bi serbest  
 Di hemberê neyaran da bibin yekdest  
 Ji hev ra pir qone bin û guh bidêrin  
 Li çerxa felekê hon pir binêrin  
 Gerek ji bo neyar e, yek ji bo me  
 A neyar jê ra hat, a me bîdom e  
 Em ji şûva xwe bajou û toy biçînin  
 Dê zû şin bê, emê wî zû bibînin  
 Carînan em rezekî datînin del sal  
 Em naxun jê, ji kurê me re dibê mal  
 Ewê ko çêkir vapor û balafir  
 Deh sal bi şûn ve ne ma çû mir  
 Ev tev ji me ra, rêya din û iman  
 Hubil-weteni defil û birhan  
 Ez bi xwe bê el û eşîr û ebr im  
 Pêlek maye enrê min, ezê bimîrin  
 Bes ji bona we ye, ew qirqîra min  
 Lê ez çî bikim, hon guh nadin şîlara min  
 Hon dizanin lê hon li xwe nakin bar  
 Em ji, ji dilêşî dikin hawar  
 Fikra min maye min ev tenê dixwest  
 Lê ez çî bikim li vir qelena min şikest  
 Bi kéré, min tûj kir serê qelena zil  
 We digel a tê hêjim, dibin çil  
 Eger hon ji gotînin min aciz bûn  
 Hêvî dikim efw bikin Cegerxwîn  
 CEGERXWÎN

## DÊRIK

Dêrika Çayê Mazî  
 Welatê bav û kal e  
 Lê sed hawar û gazî  
 Jê dûr ketim çend sal e

Ez li wê hatim dinê  
 Wê dergûşê, hejandim  
 Heywax hey mala min-ê  
 Dijminan, jê revandim

Perçake ji bihuştê  
 Besreka Zêrin weiat  
 Îro dest nagehişt-ê  
 Ax û keser ji dil hat

Bağ û bağçe bê hejmar  
 Çi bi çî mêrg û zevî  
 Li her derê, avên sar  
 Ji kaniya tê dizî

Kulêbe bûye xopan  
 Dengê berê jê nayê  
 Temaşagaha xortan  
 Ji min ji sêwî mayê

Ji çiçekê rengereng  
 Sermest newala Govî  
 Çima îro nakî deng  
 Mina tebayê kovî

Xwezi vê carê ji min  
 Serê Xabê bidîta  
 Bila ruhstînan eanê min  
 Hingê ji xwe r' bimêta

Dilê min jê têr ne bû  
 Ax! ew Asraka Berxêr  
 Gelo ew roj heye ko  
 Dîsa bibînim bi xêr

Gulher hêsa ne dibû  
 Ji keçên hustû-b' morî  
 Çavê min li wê vebû  
 Dilê min jê ra gorî

Maucêl û Kani-Hinar  
 Gorinê birê min in  
 Îro bibe pîrsiyar  
 Cuwahê derdê min in

Rela-Reş û Lata-Sor  
 Yek sorgul e, yeke mor  
 Bîn bikim ez dor bi dor  
 Têr nabim hetanî gor

Du textê Qîzê-Qirêl  
 Hemberî hev dinêrin  
 Li ser wan xweş qelisêl  
 Gurçik û dil çedibin

Xwedê kerem bikira  
 Bibama teyrekî baz  
 Li wan cih li wan dera  
 Bigerim perwaz, perwaz

Dêrika Çayê Mazî  
 Welatê bav û kalan  
 Dîtina te dixwazî!

Newzad: ji te ra heyran  
 NEWZAD



Ji Starnên Cihê Botan:

## KÊRE

Bihar xweş dibê binê vi Seqlani  
 Heşin dibê kulîlka ketê, ya vi bêrzani  
 Xwezi ez bibiyam mîlkeke kurebazi  
 Sê şevên çile û kanûnê, herf û bagerê  
 Min serê xwe bikîşanda bin kulavê te şivani

Dilîki min, dilîki bi heyhêz e  
 Bêri û berivan ji malê me bêne rêz e  
 Kesik ne diye ser dewr û zemana, hakim  
 [bigirin şivanê ber pêz e

Xwezi ez bibiyam qumîlo  
 Ez biketam hêrikê Qereçox, erdek şilomîlo  
 Keçikên Mûserêşa, Xêrka, Teya, Mira  
 [bihetan, ez bêxistam mîlo  
 Ez bibiram sûka Cizirê bidam bi  
 [sibhan û kilo  
 Baniya bêxista çehvê rastê, ê çepê  
 [bima wîlo

Dilîki min bi heyhêr e  
 Çehvê min yek heyv e, yek stêr e  
 Memikên min yek mîzgeft e, yê di dêr e  
 Du kehnî navbeyna sing û berê min der bîne  
 Yek Rûsor, ye di Spîpêl e  
 Heçî nexweşê ev heft sal bi  
 Ser piştata xwe ranebî  
 Firkê jê vexwê, roj bi roj ber bi xêr e

Ezê bidim te, banê Bamêş bi pûş û pelêş ve  
 Ezê bidim te Seqlên bi êş ve  
 Ezê bidim te, Sûka-Tarî bi tewbên qumêş ve

Mîrê min, agir bikevê Banê-Bamêş,  
 [pûş û pelêş ve  
 Serê şapê pède bê, Seqlan bi êş ve  
 Xwedê xerab bikê Sûka-Tarî, bi tewbên  
 [qumêş ve

Tu lawikê min berde malên me cûne  
 [zozana, her beleka  
 Warkoza mi biye Banê Xanê, germa  
 [Havîne bi şûndewsî koz û kuleka  
 Dewleta mîrê mi mezin bê

## RÊDÛR

Êvar e, çaxê hevîra  
 Ti li serê xelkê delal şar û momî ne  
 Keçikê digo: kuriko devê xwe ji xal û  
 [nişanê gerdena min berde  
 Kuri digo mala bavî şewitîyê! xema nexwe  
 [stêra sibehê li me dîr e

Vê baranê lez ke, lez ke  
 Ti li serê xelkê delal şar û momî ne  
 Bejna te nazikê, enterikî tim i kesk e  
 Ji nimêja meşrebê ezê diçûm tewata xal  
 [û nişanê gerdenê  
 Heta spêda sibê dibî şerê simbelê sosinî  
 [qoce bîska

Mi di ti li kolanê, Xidir-Mame da  
 Minê dawa enterikî Şamê girt û  
 [qet berneda

Ji nimêja meşrebê ezê diçûm tewata sê  
 [bîskê di şê  
 Heta fecara sibê min terka cotê  
 [zernemika ne da

## MEMOKÊ

Hey lê Memokê ciwanê dilîki kûl bişoz e  
 De ti li min veke herî û bişkoja  
 Dinya li min cineta baqî bi, te li min  
 [kir-ê doje

De rabe Memokê ciwanê, te singsuhrê  
 Bi xet û bi xal û bi nişanê  
 Te li min xira kirî bi dergelên Colemêrgê  
 Bağ û Dağçeyên Wanê

Sibe ye, sê mala ji gundê me bar kir  
 Heylê ciwanê, Memokê 1 te singsuhrê bi  
 [xet û bi xal û bi nişanê kir  
 Memoka min ji eslê mala bavê xwe delal e  
 Te mala lawika li min xira kir

STRANVANÊ JÊLIYAN

## BO LAWANÎ KURD

Lawani kurd! mijde bê lêtan, le paş şeş mang diyar nebûn, ewa emro ewel nûsawî Hawar le bin çap da hate derewe. Ey brale bizanin ke hemû mîletêk be zmaniye we nasrawe, we enasire. Ke zman ne bû hiç şteki tir bûnî we pêkhatinî dirist nabê.

Bo jiyane we serkewtinî zman nûsin, bilaw kirdinewe, we rojname pêwîst e. Temaşa keyn lem peri Kurdistane we, bo ew peri, le sere we, bo xwarewey taw deyn le sê çapxane bew lawe nabinin. Yekekiyan çapxaneyî Jiyanî Silêmani ye. Ke emêş le hexêr-hatînî piyawekî gewre, heracî milk, êlanî tapo bew lawe şteki tiri tiya niye. Duwemin Zari Kurdmancî ye. Ke hi piyawekî feylesofi pirqiyemî xoman e. We hemû pûl û pareyekî lew çapxane da xerc kirdurwe bo berzbûneweyî zmanî kurdi we le çapdanî kitêbî pêşinanî bêhawta, le paş ewe ke hiç yarmetî le ême ne di ewa ewişt hate hali bêxwedî. Sêyim Hawar, hawar e.

Hawar wekû hemû ezanîn hedefî esasî berzbûneweyî zmanî kurdi, yekxistinî her du zman e, yanî kurdi serû û kurdi xwarû we.

Ey beqêşêrani niştiman, ey ew kesaneyî ke xwênî germî paki kurdayetî le leşa ecûlc, ey ew kesaney ke bo berzi zmanî wilat hewl eden, himet biken, tê bikoşin bo jiyane weyî hawarman û zarman. Nûsrawekani wilatike bibinin we tozi dilman be hi xoman we xoman bisûtê. Bo çi emêş hewl nedeyn legel xêwî em du çapxane be nixeman da bo berzi we yekyete zmanman.

Ême ke wilatî xweşewîst çawerewan mane zmanî xoman herz nekeynewe, kê hewlman bo eda, kê bo zmanman tê ekoşê. Bo çi her yekî le ême carî be yek du çirokî kurdi xoş ke her kurdêk sed ezanê, hemû rûperew bew çiroka bêhawta felsefiyane nerazenine we, bo çi be hasî xo parastin le nexoşî pir nekeynewe, bo çi dawa kirdinî pêwîstî wilatî tiya bilaw ne keynewe?

Brakanim, bizanin ke jiyani nûsrawî man be ême we bestrawe, berzi ême be berzbûneweyî zman mane we ye. Yekyete ême be yekyete zman mane we ye. Nabê xoman bo fewtanî xoman hewl bideyn. Têkoşin, be mal û be pare bo berziyî zman man wacib e leser hemû lawekî dilsoz.

Ey brale, bo çi ta êsta hêştûmane em du nûsrawe man bixewin. Bam hewl bidên bo hoşhênanewe seryan bo xizmetî niştiman.

Le paş em nûstine zoreyî haware itir hîwam wa ye hemû lawekî dilsoz hewli ser-

Dibêjin carekê çukekê hêlina xwe nizikî rêya avexwarîna filekî de çekirî bû. Hêk û fexkî jî tê de kiri bûn. Fil weke adetê xwe ê berê tê re bori, da avê vexwit. Dît ko hêlinek teji hêk û fexkî wa li ser rêya wî de ye, anî pê lê kir. Hemî kuşt û şkêrandin û çû ser avê. Gava çûk hat û dît ko ne hêlin ne tişteq xuya nakin, hemî di vî halî de ne, yanî ev neqenci û xirabiya ha ji filê ye. Çûk firî û liser serê fil danî û jê re got:

— Ya melik te çire ev şuret serê min de aniye, te ez di darê dinyayê de tinê hêliştim. Ser vê qasê re em cîranên hev bin û ez digel te bê xali-xarez bûm. Te ez kiçik û reben ditim ji lewre te hûsan li min kir. Fil lê vegerand û got:

— Belê herwekî te gotî wisa ye. Ji lewre min ev li te kir.

Çûkê berê xwe jê wergerand û firî çû bal koma teyran ve û giliya halê xwe li nik wan kir, û serhatiya xwe ji wan re got û ji wan daxwaz kir ko bèn hawara wê.

— Teyrino hon digel min werin em tev de biçin bal fil ve û danin ser serê wî û çavên wî binikilinin, biqoqilinin. Dîsa ezê tepeke di jî lê bikim.

Teyran gotina wê dirist dêran û milên xwe dane hev û çûn liser serê fil danin û çavên wî dane ber nikilan, hela kor kirin û ew ji qoqikên xwe rijihan.

Fil bê ronahî û xwarin û vexwarin ma, cihê xwe de. Dike hawar û zar-zar. Mêş û mêriyan girtin kiloxê wî û qoqilandin û dest bi xwarina goştê wî kirin.

Çûkê, disan xwe jê ne da paş çû bal çaleke ji wan ên têrbeq ve û serhatiya xwe ji wan re jî got. Beqan lê vegerandin:

— Hey çûka reben ma tepa me di mezinahiya fil de çi ye, em çi dikarin.

Çûkê got: Bes min divêt hinek ji hewe digel min bèn û em biçin bal kortaleke nizikî fil ve û hon di wê kortalê de bixwînin û bikin qurqur. Ji lewre gava fil dengê hewe seh bike ê bawar bike ko ev dengê he ji erdeke biav têt. Dê bêguman bibe û ji êşa xwe dê bê bikeve tê de.

Beq pê qail bûn, çûn, li çalê de êwirin û tê de xwendin. Fil dengê wan bihist û tihne lê zor kir, berê xwe da wî dengî û qestê kir. Giha ser lêva çalê da ko avê vexut, hew dît ket û hilweşa tê de. Vêre vêre çûkê fir da û danî ser serê wî û her du çengên xwe liser hejandin û gazî kir ê:

— Hey heywanê gunchkar, yê ko bi xurtî û zexmî, û hinermendiya xwe xira yî, ser paça xwe çûyî û ji rê derketî û tu hesab ji min nekirî, niho te çawan dibînî û dihesibînî ko min tu bi vê tep û hinermendiya xwe û digel vî cendekê hûr kuştî û existî vê çala kûr de.

Tu deng ji fil ne hat ser hev de tepisî, welê mir û çû.

M. E. BOTI

xistinî bida we bo pir kirdinewe yî beynî kolekekani le hemû nûsrawekî tira nûsin be zmanî xoman, kurdi xwarû, tiya bibinin bo ewey ke be her du zman ew xizmete ke Hawar hewli bo eda pêk bêt.

# NAME

## BO LAWANÎ KURD LE IRAQA

Ey lawan! le demêke we Hawar der ne eçû. We le pêştirîş da hawar ne dihate Iraq. Çûnki hikûmetî iraq hatinî hawarî bo Iraq bend kirdi bû. Beheq û naheq bê, êsta ême gö nadeynê. Ewey ke emro ême le şwênî egereyn lew gelê mihimtir e.

Bo çî lawanî Iraq wekû pêşû meqale û şîir bo hawar nanûsin. Belê lew roje we ke hikûmetî Iraq çûnî hawarî bo Iraq bend kirduwe lawanî Iraqîş destî xoyan lê kêşawetewe. Ebuwaya wa ne buwaya. Ihtimal e ke hawar be dili xelik, be dili bêganekan ne bêt. Belam be dili xoman we hawilatî xoman e. Leber ewe ême derman hêna. We emroş derî ehênin. Û Xwe hez bike axirîş derî ehênin û heta destî birwa be naw hemû kurdana bilawî ekeynewe. Wekû ewe dizanin ewelemîn hedefî hawar pêkhanîn, rêk-xistin û pêşxistinî zmanî kurdî ye.

Hawar wekû dêberêk e. Lem dêbere de debê hemû terhe towêkî pêwe bikirê. Towî esasi em dêbere duwan e. Lehceyî bakur (şînal), lehceyî nivro (cenûb) yanî kurdî wilatî jorû û kurdî wilatî xwarû we.

Heta (15—16) jmarey, hawar be her dû kurdî derdeçû. Belam le paşa kurdî Sûran yanî Baba-Kurdî xoy kem kird. Çûnki wekû le pêşe we witman hawar îtir ne eçuwe Iraq. Êwe nûsrawî xotan le hawara ne edî, we berî koşêşî xotan ne exward. Belam ey lawan baş bizanin em rewîştî ewe ye rast niye. Ewelcar berî koşîşî ême bo ême niye. Ewa bo neweyî paşeroj e. Îşî ême tow be zewîye we çandin e. Eme ke ême pê elên tow denike, be ser zewî da bilaw ekrêtewe, we be gasin exrête bin zewîye we. Le paş ewe le ême we diyar niye, heta sewz ebêt. Nûsarî eweş her wa ye. Ême ewe le ser rûperey hawara derêjin. Renge sewzî ew bibînin, we rengîş e ney bî-

nin. Nabê ewe le ber eme dilteng bibin we le dili xotana bilên: «Nûsrawêk ke min le şeklî çap da nabînim boçî û bo kê binûsim?» Êwe ewe bo yekyete zmanî kurdî û bo neweyî paşeroj binûsin.

Ey lawan wekû eşîret le wextî hawar da pelamari tîngî xo didin eweş herwiha pîrî qelemî xotanî bidin we des be îşî xotan bikin.

Kurd û kurdayetî tenha be koşêşî ewe, be koşêşî lawçak etwanê bijî.

Daxim bo ew mileteye ke lawî ew bo ew ténakoşin. Xwezgem bew mileteye ke lawî ew lê hoşyar in.

HAWAR

## XEYAMWARÎ

Şev e, tarî ye, l'me ava bû hîv  
Ka ew zend û destên wek zêr û zîv  
Ger perde rabe û derkeve roj  
Dê jê re xwe vekin kaş û beroj  
Trij dibin tir her bi simta xwe  
Roj kurt dibin em bi qedera xwe  
Me jî biskên yarê ne girt davek  
Me ber meqsedê ve n'avêt gavek  
Barana hûr bêtirş e, xunav e  
Bêpaki em diçin nav e  
Hingî ewr bibore pey re têt tav  
Li ser me hene lertzîn û pertav  
Leylan jî dîr ve xuya ye, av e  
Wek me nezan her bêdeng û nav e  
Ji pêlên avê hiltên biqbîqok  
Em nezan dibên ev in birîqok  
Hoste bêbingeh danî ev diwar  
Tama mirinê kirim birîndar  
Govenda bûkan û stêrikan e  
Hevîna wan jana îlîyan e  
Tiştên li şûnwaran mayî hiç in  
Hevalên keyfê bê şop û rêç in

MISTEFA EHMED BOTÎ





# LE BEAU DE LA STEPPE

— 1 —

Ô cœur! . . . . .  
La vie de mon cœur est avec toi, pousse  
[ton cheval en avant  
Ce soir, ô moi, malheureuse  
Que jamais sur la surface du monde  
Tu ne descendes du cheval (1)  
Tacheté rouge et blanc, bien entretenu (2)  
La queue et la crinière teintes en rouge

— 2 —

Je ne fais aucune malédiction sur la taille  
[de l'aimé  
Dans la steppe de Mardine, sur les collines  
[plates des kikan, terre démesurée  
Puisse-t-il surgir pour le bien-aimé une attaque  
[pareille à l'attaque des chemmars (3)  
Les cavaliers saklawi (4) se jettent sur l'aimé  
Sur la terre démesurée, que les brebis  
[effleurent de leurs mamelles  
Que l'arpent des fils des pères (5) coûte  
(une livre (6)  
Que les lâches, des héros, soient distingués  
[par témoins  
Que la main des jeunes gens ne puisse  
[plus tenir les brides  
Que les pieds des fils des pères ne  
[tiennent plus dans les étriers (7)

— 3 —

Les témoins (de la bravoure) de l'aimé  
[sont nombreux  
Il était le protecteur du convoi (8) et des  
[troupeaux  
Le nom de la fuite, aimé! est interdit  
Aimé, viens, nos foyers sont ici  
Les sommets des piquets des tentes sont  
[proches, tu peux les apercevoir  
Que les mouvements de ma poitrine et de  
[mes seins, gazelle  
Après la tombée de la nuit soient donnés (9)  
[à l'être bien-aimé

(1) C'est à dire, il faut que tu ne quittes jamais la selle.

(2) L'expression (qesirandin) s'applique au lavage et au blanchissage des tissus, noirs par l'effet de différents procédés. Par ce mot on fait allusion à la propreté du cheval.

(3) Tribu arabe d'origine hédjaziennne. Jadis en perpétuelle lutte avec les kurdes de la plaine de Mardine, à différentes reprises en guerre avec le fameux Ibrahim pacha, finalement battue auprès de Nissibine. Cette lutte contre un ennemi commun a servi à la réconciliation des tribus kurdes de la plaine qui se battaient entre elles.

(4) Race de cheval noble.

(5) C'est à dire les braves.

(6) C'est à dire que la lutte soit si acharnée, que les guerriers disputent le terrain avec une telle bravoure qu'un arpent de terre coûte une livre or.

(7) Toujours la définition d'une guerre acharnée.

(8) C'est à dire « chargement du matériel, transport » d'où le mot « koçer » celui qui se transporte, non-sédentaire.

(9) Littéralement « non-prohibé, permis »

Au cavalier du cheval saklawi

— 4 —

Ce soir, que la vie de mon cœur soit  
[avec lui  
Des vents, que ne vienne pas vers nous  
Le vent de l'ouest, parure du visage du monde  
Je fais attention, je constate, les chefs des kikan  
Se sont retirés dans la chambre du père  
[de Bichar (10)  
C'est le conseil et les délibérations pour  
[le jour de chargement

— 5 —

Ce soir, le sommeil de l'être-aimé (11) ne  
[vient pas entre mes bras  
Je ne sais si l'aimé a été pris par le froid  
[ou par la chaleur  
Je ne sais si l'aimé est malade  
Je ne sais si la saklawi a meurtri (12) ses cuisses  
Je ne sais si les campements de mon père  
[ont vieilli, si les puces sont tombés (13)

— 6 —

Ce soir, bien-aimé que parmi les collines,  
[ce soit pour moi, la colline de kawkab (14)  
Je m'achemine dans les rangs, les charges  
[et les troupeaux des kikan  
L'être que j'aime, sur les chameaux dans  
[une chambrette (15)  
J'ai regardé la taille fine comme celle d'une ju-  
[ment saklawi, des saklawi du père de Bichar  
Devant la tente du père de Bichar, sans licou

— 7 —

Ce soir . . . . .  
La chasse des garçons des belles n'était que  
[les oiselets des alentours des maisons  
La chasse de l'être aimé est la première gazelle  
[du devant du troupeau  
Ce soir, aimé leve toi, mets ta main dans  
[ma main  
Enlevons nous l'un l'autre, allons au bord  
[du Khabour (16) des Begara (17)  
Que la crête de Maghergan (18) serve de  
[couverture pour l'être aimé et pour moi

— 8 —

Ce soir . . . . .

(10) Rehid bey, chef des kikan, qui guerroya pendant de longues années dans la plaine de Mardine. Rival du fameux Ibrahim pacha, chef des milan. D'ailleurs il est question de lui dans la biographie du chansonnier.

(11) Littéralement du « joli monde »

(12) Mot à mot « a frappé »

(13) En cas de victoire le campement avance, change de place et se renouvelle, sinon il est toujours dans la même place.

(14) Hauteur aux environs de Hasseteche, fréquemment citée dans les chansons de la plaine, de même que les monts Abdul-Aziz et Sindjar. Ils servaient de lieu de campement et d'embuscade.

(15) Petite chambrette montée sur le dos des chameliers et réservées aux femmes et aux enfants.

(16) Rivière de la Haute-Djéziréh, prenant sa source à Seré-Kani. Cette rivière près de Deir-Zor se jette dans l'Euphrate.

(17) Nom de tribu arabe.

(18) Crête de la contrée.

Je suis descendu dans la steppe de Mardine  
 [ô moi malheureuse, la steppe de jadis  
 Là fleurissaient ce matin la fleur de margueritte  
 [les racines de moutarde  
 L'année passée j'étais la fiancée de l'être cher  
 Cette année je suis tombée dans le filet  
 [d'un misérable  
 Le jour de chargement je reste à l'endroit  
 [des campements  
 Le bois du berceau m'est devenu un fardeau  
 Le kitan (19) hideux, pour moi malheureuse  
 [est devenu une aile d'aigle

— 9 —

Ce soir . . . . .  
 Lance (ton cheval) lance route-lointaine,  
 [lance fatigué, lance, ô que je t'admire  
 Ne demeures pas dans la chaleur de l'été, ce  
 [matin tu seras pris par le froid, par la chaleur  
 Tu auras mal à la tête, tu tomberas malade  
 Dans le pays étranger, tu serais à ma charge

— 10 —

O cœur . . . . .  
 Ce soir le Tchakhirbazar (20) brûlé  
 Je ne l'ai pas vu de mes yeux, par oui-dire,  
 [il est loin de moi  
 Ma poitrine et mes seins, ô moi malheureuse  
 Ce matin comme un jardin, parmi les  
 [jardins de Nissibine  
 Comme une prairie, de celles de Tilkerm  
 Comme un îlot, des îlots des alentours  
 [de Khabour  
 Que la vie de mon cœur soit avec lui  
 Viens, bien-aimé, au pèlerinage de ma poitrine  
 [et de mes seins, ô moi malheureuse

Pose ta tête et dors  
 Cette étoile qui est venue sur nous, c'est  
 [l'étoile Karwanqiran  
 Pose ta tête et dors, l'étoile du matin  
 (est loin de nous

— 11 —

Va, va, ô cœur . . . . .  
 Aimé, si tu me délaisse, je ne te délaisse pas  
 Lo! lo! ô triste, trop de douleur,  
 (souffrance-profonde  
 Lance (ton cheval), ô chemin-lointain  
 Aujourd'hui, privé depuis deux jours de ma  
 (poitrine et de mes seins, ô malheureuse  
 Oh! si j'avais pu voir l'aimé  
 Comme dans les anciens temps, avec le groupe  
 (des cavaliers du père de Bichar  
 Dans la plaine de Mardine, sur le dos  
 (du hemdani (21)

Ce matin dans l'îlot des alentours de Khabour  
 — 12 —

Ce soir la vie de mon cœur avec (lui)  
 Ce matin, le chevreau avec la chèvre, paissent  
 (sur le cap du mont de Sindjar  
 Les vêtements de l'aimé ont besoin d'être lavés  
 Je prendrai une pièce du savon d'Alep  
 Je les laverai dans l'eau de Zirgan (22)  
 Je les laverai, je les arroserai avec de  
 (l'eau parfumée, je les étalerai sur  
 (les arbres des giroflées  
 — 13 —

Ce soir . . . . .  
 Nous avons un vieillard de la maison de nos  
 (pères (23) à la clémence de Dieu, le  
 (jour de chargement et de la mort  
 Nous avons trois frères, tous sous les crosses  
 (des armes, au jour du combat et de la mêlée  
 Quand mes yeux ne verront plus la  
 (silhouette de l'aimé  
 Je me dirigerai, j'irai à Midyat  
 Je donnerai le pan de ma robe, chez maître  
 (Melko (24) pour le faire teindre en noir  
 — 14 —

O cœur! . . . . .  
 Ce matin mon bien-aimé est parti pour  
 (le pays étranger  
 Il n'y a personne à la maison que je puisse  
 (consoler mon cœur  
 Les chagrins de mon cœur sont nombreux, les  
 (nuits des kantins, ce sont des nuits longues  
 Que je me leve, pour mettre le garçon  
 (dans le berceau  
 Pour consoler les douleurs de mon cœur,  
 (que je lui chante des berceuses  
 Que je verse des larmes de sang sur les trois  
 (boucles blondes, sur mes joues  
 Lance (ton cheval) la vie de mon cœur avec  
 — 15 —

O cœur! . . . . .  
 Leve toi, tournons nous vers le pays  
 (du Kurdistan  
 Allons vers la malheureux Diarbekr, fosse  
 (des misérables  
 J'irai, ce matin, je leverai une pierre de la  
 (muraille de la prison des sanglants (25)  
 Je mettrai cette pierre entre mon cœur et moi  
 Dans le pays étranger je consolerais mon  
 (cœur avec elle  
 Lance, la vie de mon cœur avec, toujours lo!

(22) Petite rivière, prend sa source dans les montagnes de Ghource et se jette dans le Khabour.

(23) Veut dire: qui est transmis par nos pères. Très vieux respecté par la maison.

(24) Nom propre, teinturier.

(25) Le mot «xwini» qui littéralement veut dire sanglant, signifie criminel, et dans un sens figuré équivalait à l'expatrié.

(19) Espèce de châte, porté seulement par les femmes mariées.

(20) Village en ruine de la contrée.

(21) Race de cheval noble.

Lance, ô route-lointaine, ô plaine-douleur

—16—

Ce soir, parmi les crêtes, la crête de

(Guideche (27))

Mon bien-aimé monté sur un poulain ibe (27)

Il s'est dirigé vers le versant de la steppe

(du sud

Les pieds du poulain du bien-aimé se

(lieurtent aux pierres

Je ne sais pas, le malheureux maréchal-

(ferrant l'a mal ferré

Mon corps brûle, mon cœur souffre avec lui

—17—

La fille disait: ô bien-aimé je ne suis pas

(une femme (libre) je suis avec un homme

Je suis la sœur de sept frères, qui sont

(comme des lions

Je suis la cousine de douze cousins, tous

(cavaliers des chevaux enfiéris

Lorsque mes yeux ne verront plus la silhouette

(du bien-aimé

J'irai au bas de Nissibine

Chacun des sept frères et des douze cousins

Sur la sommité de crête de Hamidiye, je

(les enterre tous

—18—

Ce soir . . . . .

O bien-aimé, à moi et à la vue de Tilkerm

Le beau de la maison, est monté, dans ce

(soleil, dans cette chaleur du soleil

Je ne me tourmente pas à cause du beau

(de la maison

Je me tourmente, parcequ'il ne porte que

(le pantalon blanc et la chemise de soie

Il est allé à la tête de la source, il va prendre

(ce froid, ce chaud et froid

—19—

O cœur . . . . .

J'allais vers la porte, la porte ne s'ouvrait

(pas à moi

Je suis monté sur le haut de la maison, il

(n'y avait pas de chemin (28))

Je suis descendu du côté de la cour j'ai

(fait attention

Ma bien-aimée (29) sous la fenêtre

La brise du vent de l'est était venue

Elle m'alourdisait les yeux

Je ne me suis pas éveillé de moi même

Je suis allé au pèlerinage de la poitrine

(et des seins

Ils étaient enfermés avec cadenas et clef

Elmed Ferman (30) je ne sais si s'était

(mon augure

Ce matin, si s'était ta chance

—20—

Va, lo! lo! . . . . .

Ce soir, ô mon Dieu, je ne te demandes rien

Qu'une tente à quatre piquets, une cloison

(des Chikak (31))

Un marteau du bois de benav

Puissé-je dresser la tente de l'aimé

Dans la steppe de Mardine, sur la crête

(de Serê-Kani

Dans l'ilot de Evdiselam

—21—

O gazelle! . . . . .

Ce soir, tu es ma gazelle, tu es la gazelle

(du bas de la steppe

La bouche à la pâture, l'œil sur le gazelon,

(l'oreille aux agucts

—22—

Ce matin, que Dieu accomplisse mon vœu

(et celui du bien-aimé

Dans la steppe de Mardine, aux mois de

(Juillet et d'Août

Je jeûnerai jeûne sur jeûne

Ah! si je devenais une lance de douze pouces

Et que je tombe aux bras du bien-aimé, du

(cavalier du hamdani

—23—

Ce soir, la fille disait: mon cœur est comme

(du sable de l'Euphrate

Kosara-Kikan (32), Amouda (33) brillante,

(colonne de la patrie

Je n'abandonne pas la taille fine jusqu'à ce

(que ma tête aille

A Diyarbekr, devant l'échafaud du bourreau

—24—

O cœur! . . . . .

O aimé jusqu'au moment de la mort

Jusqu'aux jours de la tuerie et de la mêlée

(toujours lo! lo!

Ce matin, ma crainte est de cette crainte,

(je mourrai dans le pays étranger

Avant de vieillir, et je n'aurai pas dit

(suffisamment ô aimé lo! lo!

DELALÈ-BERİYÈ ET CHMED-FERMAN

DELALÈ-BERİYÈ — Dalalè Beriyè mot à mot signifie le beau de la steppe, ou de la plaine.

Le «Delal» chant populaire lyrique et héroïque, est très répandu dans le Kurdistan

(30) C'est le nom du chansonnier. D'ailleurs c'est la coutume des chansonniers dans de pareils cas de citer leurs noms.

(31) Tribu kurde du Kurdistan du nord.

(32) Nom propre de localité.

(33) Petite ville, actuellement en Syrie.

(26) Crête de la plaine de Mardine.

(27) Race de cheval noble.

(28) Les toits des maisons de villages kurdes, sont en terrasse.

(29) C'est le garçon qui parle.

limitrophe de la frontière turco-syrienne actuelle, de «Djéziret ibni Omar» jusqu' à la plaine de «Siroudj».

Différents groupes de tribus comme Milan et Berazan ont leurs «delal» particulier. Celui de «beri» constitue une sorte de thème commun que chaque chansonnier adopte à sa tribu. Dans le présent texte, on parle des kikan, parceque le chansonnier Ehmed Ferman appartient à la tribu kikan. Le «delal» est propre aux tribus de la contrée que nous avons désignée.

Le thème du «delal» ainsi qu'on le voit, partiellement, dans le texte que nous venons de publier, roule sur un épisode d'amour chanté sur le mode épique. C'est la bien-aimée qui chante les péripéties de guerre et l'amertume de la séparation d'avec son amant.

Pour le texte que nous venons de publier, nous avons dit qu'il ne représente le thème que partiellement. En effet il y a longtemps que Ehmed Ferman âgé de (75) ans, mais encore robuste et vigoureux, n'ayant même pas un cheveu blanc, n'a pas chanté le «delal» en compagnie des cavaliers, en allant vers le champs de bataille; expatrié depuis une dizaine d'années, il ne le chante qu'irrégulièrement en mêlant les strophes, en les invertissant, en oubliant un grand nombre, surtout de telles qui concernent les péripéties de la guerre et les faits d'armes du «delal». Lui même avoue ces lacunes, il se rappelle le temps où parmi l'entourage de son chef, à cheval, accompagné d'autres chansonniers, au moment de la charge des cavaliers, il les encourageait par ses paroles et ses mélodies.

Tout les «delal» sont du même type. Selon les contrées et les tribus les paroles varient; chaque chansonnier introduit même plus ou moins de variations.

On se souvient que dans notre huitième numéro page: 9 nous avons publié un passage du «Delalé-Beriyé» sous le titre de «Yeli Delal» chanté par «Meryem» khanonm. La comparaison du texte ci-dessus avec le petit passage chanté par Meryem khanonm peut donner une idée de la variation du delal.

Meryem khanonm est une botaniennne; elle n'appartient pas à la tribu «Pendjinaran» comme nous l'avions indiqué dans le neuvième numéro de notre revue. Elle est originaire de Botan, de la tribu Jéliyan, village de Kërte; c'est la fille de «Hadjie Hamko», renommé pour être bon tireur et bon chasseur.

EHMED-FERMAN —Après ce court aperçu général sur le (Delalé-Beriyé) nous donne-

rons quelques renseignements biographiques au sujet du chansonnier Ehmed Ferman qui nous l'a chanté.

Ce récit contiendra aussi quelques phases de la lutte de Ibrahim pacha, chef des Milan, contre les chammars.

Ferman est le nom de famille. Ehmed appartient à la tribu des Kikan clan «Nedjaran» de la fraction «Mir-Meman». Ehmed est né dans le village de Milebi, situé dans la montagne de Mazi, région de Mardine. Son père menait une vie paisible et tranquille. Il avait ses champs et son troupeau. Il était estimé dans son clan, car il avait sept enfants, tous des garçons. Ehmed était l'aîné. Dès son bas âge il faisait le pâtre. Comme c'est de coutume, dès le premier jour, on l'a muni d'une flûte de pâtre. Nous laissons maintenant Ehmed nous raconter sa vie et ses aventures de chansonnier.

«J'étais très jeune lorsque j'ai commencé à faire paître nos tronpeaux à travers plaines, et montagnes. Dès les premiers jours je portai les armes, un sabre et un pistolet, pas de ceux d'aujourd'hui, un pistolet (kurmandji). Je passais mes soirées dans la société de l'agha. Jeune et timide je me retirais dans un coin et j'écoutais avec délice les chansonniers qui chantaient. J'admirais la musique. Petit à petit je commençais à les imiter. A la campagne à côté de mon troupeau je passais mon temps à chanter tout ce que j'avais entendu le soir, dans la société de l'agha. Mes camarades n'avaient pas hésité à dire à nos aghas que je me plaisais à chanter. Les aghas ont insisté et je fus obligé de chanter devant eux. C'est ainsi que j'ai commencé à m'initier au métier du chansonnier et à être connu. La chanson qui m'a fait connaître est celle que je viens de vous chanter, le Delal.»

Au bout de quelques années le chansonnier Ehmed se brouille avec son père et quitte la maison paternelle. Il se procure un fusil et quelques camarades et organise des bandes; voleur de grand chemin, il dévalise les passants. Rechid bey chef des kikan, fait chercher Ehmed et le prend à son service. Il est alors un chansonnier classique, favori du chef. Doué d'une véritable âme d'artiste Ehmed se brouille aussi avec son chef et se dirige vers Wiranchehir. Nous laissons Ehmed nous raconter sa mésaventure de Wiranchehir.

«Rechid bey s'était fâché avec moi. Je l'ai quitté et je suis allé à Wiranchehir. J'avais l'intention d'entrer au service de Ibrahim pacha, comme chansonnier. A Wiranchehir

j'avais un compatriote, je suis allé chez lui, nous devions aller ensemble chez le pacha. Entre temps quelqu'un m'avait dénoncé au pacha en disant que j'étais «kiki» et de l'entourage de Rechid bey et que j'étais venu pour espionner. Rechid bey et le pacha étaient ennemis l'un de l'autre. On m'arrêta et on m'amena chez le pacha. Le pacha me confia à un négre du nom de «Ewat» qui faisait fonction de geôlier. Ewat me réserva la meilleure place dans sa prison, me fit coucher sur le ventre et me passa une lourde chaîne au cou. La femme du pacha (Khansa) était la fille d'un agha des (kikan) de (Dawid) agha. Mon hôte avait trouvé le moyen d'avertir (Khansa) qu'un kiki était en détention. Khansa intervient et Ewat me mit en liberté. Alors je suis rentré dans ma tribu et j'ai continué de servir mon chef.»

Ehmed après être resté encore quelques années chez Rechid bey se décide à le quitter de nouveau et s'en va chez (Omer) bey chef de la tribu (Dumiliyan) au nord de Mardine. Il est son chansonnier.

Ehmed possédait une belle jument. Omer bey, un jour, en fit cadeau à un de ses hôtes et donna de l'argent à Ehmed pour qu'il aille acheter une autre. Ehmed quitta la montagne et vint à la plaine pour chercher une nouvelle monture. Il rendit visite à sa famille. La tribu des (kikan) se préparait à la guerre contre Ibrahim pacha. On dit à Ehmed: où veux tu aller nous sommes en état de guerre. Ehmed resta et prit part à la guerre. [1] D'ailleurs les kikan et les milan n'étaient pas en bon termes. (Huseynê Qandjo) chef des kurdes yézidis (Dinan) et allié de Ibrahim pacha avait tué le frère de Rechid bey, (Temir) agha.

Du côté des chammars outre les kikan se trouvaient, principalement les (Qareguetchi) et les (Tay).

C'est encore Ehmed qui fait le récit suivant :

«Entre (Qarejdagh) et (Wiranchehr) nous avons pris contact avec les forces de Ibrahim pacha. Nous avons essuyé une défaite terrible. Nous étions trahis. [2] Le chef des Tay, bien

[1] A cette époque là l'hégémonie de la plaine se trouvait entre les mains des chammars. Plusieurs tribus de la plaine, kurdes et arabes, leurs payaient tribut. Ce tribut était désigné par le mot «xweyiki», droit de maître ou de protection. Les chammars s'engageaient vis à vis de leurs tribus vassales à les protéger contre les agressions étrangères et tout sorte de vol, de sorte que tout détail ou autre chose volé à ces tribus devaient être restitué par les chammars à ces derniers. Et évidemment les tribus vassales prenaient forcément part aux expéditions, même si celles-ci étaient dirigées contre les kurdes. Ibrahim pacha luttait contre cette hégémonie, survenue par suite de l'invasion des tribus bédjaziennes dans la plaine de Mardine.

[2] Nous n'avons aucune autre preuve de cette trahison que le présent récit de Ehmed.

qu'arabe, avait mis Ibrahim pacha, au courant de la situation de notre armée. Les Tay quoique soumis aux chammars ne voulaient pas que ces derniers soient maîtres absolus de la plaine. Les forces de Ibrahim pacha nous ont attaqué avant que nous ayons bivouaqué et pris les dispositions de combat. Quelques unes des tentes étaient dressées, d'autres se trouvaient encore sur le dos des chameaux. Nous avons laissé tout notre matériel sur place; tentes, troupeaux et autres. On entendait le cri des enfants et des femmes, sur le dos des chameaux effrayés qui couraient à tort et à travers. Presque 24 heures sans arrêt nous avons fuit et grâce à nos chevaux nous nous sommes sauvés.»

Plustard Ali Abdourazaq le neveu de Faris de Abdulkерim qui était pendu à Mossol, organisa une razia contre Ibrahim pacha. Le pacha le prit vivant et l'expédia à Constantinople. Le Sultan Abdul-Hanid, qui avait pour principe de diviser, fit un bon accueil à Ali, le décora et l'autorisa de se rendre chez lui.

(à suivre)

D. A. BEDIR-KHAN

CHANSONS de BOTAN :

### KÈRE

Le printemps devient agréable auprès de  
(ce Seqlan  
Bleue devient la fleur de la trèfle, celle  
(de la prairie fleurie  
Si j'avais été une brebis sans cornes  
Les trois nuits, les quarantes jours et le  
(kanûn, dans la neige et la tourmente  
J'aurais retirai ma tête sous ton manteau,  
(ô pasteur 5



Mon cœur est un cœur plein d'enthousiasme  
On commence de notre maison à se  
(disposer à traire  
Personne n'a vu, dans les époques et le temps,  
(qu'on prenne le prince comme pasteur



Puissé-je être devenu une souche sèche  
Me trouver sur la petite pente de Qaratchokh  
(dans une terre bien arrosée 10  
Que les filles des Mouçarechan, des Khérkan  
(des Teyan, des Miran, arrivent, qu'elles  
(me prennent sur le dos  
Qu'elles me portent au marché de Djézireh  
(et me vendent pour du khol  
Que l'on mette et applique sur l'oeil droit,

(l'œil gauche demeurant tel qu'il est



Mon cœur est plein d'enthousiasme  
L'un de mes yeux est lune, l'autre est étoile 15  
L'un de mes seins est mosqué, l'autre est église  
Deux sources ont jailli sur ma poitrine

(et mes seins

Une est Rûsor «le ruisseau rouge» l'autre est  
(Spîpêl «des ondes blanches»

Tout malade, tel que depuis sept an il ne  
(s'est pas redressé

S'il en boit une gorgée, de jour en jour  
(il ira vers le mieux 20



Jé te donnerais Banê Bamech avec le tapis  
(de feuilles mortes

Je te donnerais le Seqlan avec son moulin  
Je te donnerai le Souk sombre «de Djizireh»

(avec les pièces d'étoffe



O mon émir, que le feu tombe sur Banê  
(Bamech et le tapis de feuille morte

Que l'avalanche tombe continuellement sur  
(le Seqlan avec son moulin 25

Que Dieu détruise le Souk sombre avec  
(les pièces d'étoffe



Laisse mon garçon, nos maisons sont parties  
(pour les paturages d'été et les places

(où la neige est à demi-fondu

Les lieux des campements sont devenus les  
(toits des khans, pendant la chaleur de l'été

Et les emplacements des brebis et agneaux  
(malades

Que le pouvoir de mon émir devienne grand 30

## RÊDÛR

C'est le soir, c'est la période de la pâte  
Toi, sur la tête du bien-aimé il y a de la toile

Ta taille — maison détruite — avec des  
(anneaux et des chaînes (1)

La fille disait: ô garçon, éloigne ta bouche  
(des mouches et des signes de ma gorge

Le garçon disait: que la maison du père soit  
(brûlée! ne mange pas de la douleur

(l'étoile du matin est loin de nous 5



Dans cette pluie dépêche toi dépêche toi  
Toi, sur la tête du bien-aimé il y a de la toile

Ta taille ô fine, porte toujours une robe verte  
Depuis la prière du maghreb, j'allais au

(pèlerinage des mouches et des signes

Jusqu'à ce que blanchisse l'aube du matin 10  
C'était la guerre des moustaches pareilles à

(l'iris et des boucles superbes



Je t'ai vue dans la ruelle de Khidir Mame  
J'ai saisi le pan d'une robe de Damas et je

(ne l'ai jamais quitté

Depuis la prière du maghreb je suis allé au  
(pèlerinage des trois boucles blondes

Jusqu'à l'aube du matin je n'ai pas quitté la  
«paire des pointes jaunes «des seins»

## O MEMOKA

O Memoka, ô jeune fille, mon cœur n'est

(que plaie et feu

Allons, viens ouvrir le devant de ma veste

(et les boutons

Le monde m'était un éternel paradis, tu

(me l'as fait enfer



Leve toi, Memoka, ô jeune fille, la

(poitrine hâlée

Avec des lignes (harmonieuses) et des

(mouches et des signes 5

Tu as détruit pour moi les accès de Djolamerg

Les jardins de Wan



C'est le matin, trois familles de notre village  
(ont chargé

O jeune fille, ô Memoka à la poitrine hâlée

Avec des lignes (harmonieuses) et des

(mouches et des signes 10

— Ma Memoka de l'origine de la maison de

(son père est belle—

Tu as détruit pour moi la maison des garçons



Leve toi, Memoka, ô jeune fille, la poitrine

(hâlée

Avec des lignes (harmonieuses) et des mouches

(et des signes

Tu as détruit pour moi les accès de

(Djolamerg 15

Les jardins et les vignes de Wan (2).

## COMMENTAIRE

Les trois chansons kurdes dont on a lu ci-contre le texte et la traduction constituent des échantillons assez caractéristique de la poésie populaire kurde. Elles ont été recueillies dans la tribu Jéliyan (fraction de Botan), et transcrit telles que les livre actuellement la tradition orale, qui assure leur transmission depuis un temps difficile à déterminer; elles ne constituent, dans leur forme actuelle, que

[1] Le vers ci-dessous omis pendant la composition, man- que dans le texte kurde: «Bejna te kulnalê tokan û zincir e»

[2] Cette strophe est la répétition de la seconde, dans la partie kurde, elle n'a pas été répétée.

des fragements d'ensembles plus considérables qui ont été partiellement oubliés par le chanteur.

Comme la plupart des pièces lyriques populaires déjà publiées par «Hawar», ces trois chansons traitent le thème éternel d'un amour passionné; elles fournissent de comparaisons et d'allusions suggérées par la vie quotidienne kurde et exprimées d'une manière souvent très brève, qui constituent pour le lecteur étranger un symbolisme assez difficile à pénétrer. Les remaniements instinctifs que les chanteurs ont fait successivement subir au texte traditionnel, au gré de leurs préférences, obscurcissent encore le sens de la plupart de ces morceaux, dont la forme parfois dialoguée, par ailleurs, ne se révèle qu'assez laborieusement. C'est pourquoi un bref commentaire de ces textes ne paraît pas inutile, encore que le lecteur ne puisse manquer de retrouver, même à travers les imperfections de la traduction, l'élan lyrique très original et très spontané qui marque toute la poésie populaire kurde.



Le titre de la première pièce «Kêre» n'a pu recevoir aucune interprétation satisfaisante. Après une introduction impersonnelle (vers 1 et 2) le dialogue commence entre la jeune fille et le garçon et paraît se poursuivre comme suit: jeune fille vers 3 à 8, garçon vers 9 à 13, jeune fille vers 14 à 20. Ici intervient une tierce personne, l'émir, dont les propositions occupent les vers 21 à 23 et entraînent une réplique de la jeune fille (vers 24 à 30).

L'introduction situe la scène près de Djézireh (ruisseau de Seqlan). Les premières paroles de la jeune fille expriment une idée de faiblesse: brebis sans cornes, puis durant les trois nuits (les plus longues de l'année) les quarante jours (les plus froids de l'année; il s'agit d'expressions courantes au Kurdistan) et le kanûn (ensemble des deux mois correspondant à Décembre et Janvier, saison très froide) aurait été enveloppé dans le manteau du pasteur tandis que la jeune fille reste sans aide et sans appui.

La strophe suivante est assez obscure. Il est possible qu'il y ait ici une lacune et que, dans le texte primitif, soit intervenu après le vers 5, l'émir, qu'on retrouvera au vers 21. En ce cas le vers 8 constituerait une réplique piquante à l'émir qui aurait offert sa protection. On pourrait trouver là, en dehors de cette hypothèse une allusion à la légende assez répandue d'un prince qui se serait fait pasteur. (Banefcha Narin)

Le garçon (vers 9 à 13) formule à son tour ses vœux sous une forme imagée, inspirée de la vie des nomades; il envie la souche que les filles des nomades ramassent et vendent pour s'acheter du kohl. La localisation géographique (pente du Karatchogh etc) est très précise; il s'agit de l'extrémité du territoire appelé «Bec de Canard» dans les pays sous mandat français.

La réplique de la fille (vers 14 à 20) contient une série de comparaisons imagées; allusion à deux ruisseaux de la région de Botan. L'émir (vers 21 à 23) lui offre une forêt, une rivière avec moulin, tout le marché aux étoffes de Djézireh; mais elle voue ces présents à la destruction (vers 24 à 26) et demande qu'on «laisse son garçon», car la saison

s'avance, ainsi que l'indiquent des allusions au départ pour les paturages d'été (vers 27—29). Le dernier vers paraît destiné à faire oublier à l'émir ce que les paroles précédentes pouvaient avoir de trop audacieux.



La seconde pièce (Rêdûr, chemin lointain) commence également par une introduction impersonnelle (vrs 1), puis vient un dialogue qui paraît ainsi découpé: jeune fille (vers 2) garçon (vers 3) jeune fille (vers 4) garçon (vers 5) jeune fille (vers 6 et 7), enfin à partir du (vers 8) le garçon parle seul. Encore que la répétition soit une des procédés lyriques favoris en kurde, les (vers 2 et 3) qui reproduisent des fragements de la suite sont peut être interpolés par la fantaisie d'un chanteur.

Le sens de cette chanson apparaît assez clairement. L'itérét de la pièce réside dans l'accumulation d'allusion symboliques, dont plusieurs reviennent constamment dans la poésie kurde et y constituent des véritables clichés.

La «période de la pâte», c'est l'heure de la soirée où les femmes pétrissent la pâte devant les fours, heure propice aux conversations entre filles et garçons et à l'ébauche des idylles.

Les impécations «que la maison du père soit brûlée» etc... reviennent fréquemment. Moins qu'un vœu formel de destruction, elles paraissent traduire le désir de voir arriver tout malheur plutôt que la surprise et la séparation des amants. L'allusion, très fréquente, à l'étoile du matin», signifie que la nuit est encore peu avancée et que les amants ont encore du temps devant eux.

La plupart des allusions précises à des détails corporels sont stéréotypés: «des mouches les signes de la gorge» «de pèlerinage des trois boucles blondes» d'autres sont moins habituelles: «des moustaches pareilles à Paris», c'est à dire adroitement contournées. Les «points jaunes» sont celles des seins ou, selon une autre expression typique «de lait n'a jamais circulé».



La troisième pièce «Memoka» reproduit l'invocation du jeune homme à sa bien-aimé. On y saisit sur le vif le procédé lyrique de répétition; on y retrouve encore les allusions stéréotypées à la beauté corporelle. Les figures symboliques sont faciles à comprendre; l'amour de la jeune fille retient le garçon, cependant que l'on s'apprête à partir pour les paturages d'été (vers 8); c'est ainsi que le jeune homme a cessé de monter chaque été vers le Nord, Wan-Djolamerg, (vers 6 et 7, 15 et 16) d'ailleurs il s'est brouillé, à cause d'elle, avec ses camarades (vers 12) toutes ses habitudes rompues, sa vie est devenue un enfer (vers 3).



Il est difficile, dans l'état actuel de notre connaissance du folk-lore kurde, de déterminer l'origine et l'évolution de telles pièces lyriques, certainement très remaniées au cours de leur transmission orale.

Il ne serait pas sans intérêt de les comparer avec des pièces plus considérables, parceque mieux conservées, comme le «DELAL» publié dans le présent numéro.

PIRSIYARKERÊ KURDAN





Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar : Mîr Celadet Alî Bedir-Xan  
Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire : Êmir Djeladet Aalî Bédîr-Khan  
Damas—Syrie

SAL 2  
HEJMAR 24

YEKSEMB  
1 NISAN 1934

# HAWAR

ANNÉE 2  
NUMÉRO 24

DIMANCHE  
1 AVRIL 1934

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## DI VÊ HEJMARE DE

Kurd û Kurdistan	Herekol Azizan
Yewnanistan	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mijde	Lawikî Pijderî
Çûk û Fîl	M. E. Botî
Kaxeza Eşkere	Xwediyê Hawarê
Delalê Beriyê	Stranvan
Çarinên Keyam	Dr. K. A. Bedir-Xan
Pendname	Cegerxwin
Dêrik	Newzad
Straninen Botan	Str. Jêliyan
Tu çire?	Remoyê Qenco
Xeyamwari	M. E. Botî

## BIRÊ FRENSIZÎ

Le Beau de la Steppe	D. A. Bédir-Khan
Chansons de Botan	Pirs. Kurdan



## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### K—Q

Di elfabêya me de ev du herf bi hev guhêrîne: « k » ketiye şûna « q » ê, û « q » ketiye şûna « k » ê.

## KURD Û KURDISTAN BI ÇAVÊ BIYANIYAN

### —3—

Me jor de tixûbên welatê kurdan goti bûn. Welatê wan li bakur ji cihên bilind ko bi darên mazi û berûwê dorgirti ne, dest pê dike û hin bi hin ber bi nivro nizm dibe û digehe çolê. Li serê çiyayên wan ên biberf kanî der dibin û çem û robarin diherikin, digehin medrebên birincê ko ji qûntarên çiyê ber bi deştê ve drêj dibin.

Di cihên bilind de çandini kêm in. Ji ber ko gava di beriyên bêdar û bej de roj her texlit zad û çandini şin dike, digehine, serê çiyayê hêj bin berfê de ne.

Li gundên kurdan bergehêki spehî heye. Gava mirov nizingî wan dibe tof tof darên gwîz xwe şani didin. Di bin siha wan a pehn de xani veşarti ne.

Ji rexê din dora kanî an keviyên robaran bi spîndaran xemilandi ne. Di tu gundi de ev ne kêm in. Ji xwe ev spîndarên ha di lêkirina xaniyên wan de bingehêki mezin in.

Ev dar, tîr-avexwarî û li bin rojeke geş, di zemanekî kin de digehin drêjahike welê ko mirov li wan ecêbmayî dimine. Wek zilên zeviyên ceh û genim li rex hev himbêz, bedenên wan zrav û rast, mîna nayan bilind dibin.

Li gora nizm û bilind bûna cihê avahiyê, dora wan de rez, darên zeylûn, bîstan û zeviyên ceh û genim hene.

Lê di gundên kurdan de, kêm tete ditin ko minareyek bi ser wan keve. Ji vaji ve gundên tirkan, ên kiçiktir ji tucar ne bêminare ne. [1]

Diwarên xaniyan bi kerpiçên ko bi heriya kakiri tete birin, lédikin; bê tu dar û dep. Li şûna penceran di jorê diwaran re qulan vedikin. Ev qulên ha bi tu tiştî ne girti ne. Ji ber ko hatinditina pipok û kaxezê li wir hêj ne nas e.

Deriyê xaniyên xwe ji darê berûwê pihêt çêdikin. Di ser diwaran re bi bihustek an bi du bihustan ji hev dûr, beştinen spîndaran drêj dikin, û bi mirdiyaqan neqeba beştan dadigirin û axê berdidin ser. Qederê pêki, pèyek û niv. Ev e, banê xaniyên wan.

Li Havînê, kurdmanç di ser van banan de dinivin; û pericar ev banên ha bi diwarekî çarpê bilind, dorgirti ne. Ev diwar şûna singtaldekê digirin. Naniyên maqûlan ji di vi şiklî de ne. Tenê du tayên wan hene û carinan bi milekî wan ve burceke çarparsû bilind dibe.

Belê xani bi her tiştên xwe welê hatine lêkirin ko di wextê şer û pevçûnan de bi kêrî wan bèn, ji wan re bibin şergeh û asêgeh.

Di hundirê xaniyan de ji aliyê malê pève mezeleke mezin tete ditin. Mezela rûniştinê û mêvanan. Li mezêlê de tifikê heye. Ji her du milên tifikê ve du dikanên nizm, lê raxisti radibin û tèn heta derî. Çend balgih li ser in. Raxera koçka maqûlan bi mehfûran xemilandi ne. Tevayiya raxistina wan ev e. [2]

[1] Ji ber ko em kurd tucar Xwedê ji bir nakin, û ew di her derê de bi me re ye. Jû pève kurd bêyi ko xwe bigihinin hev û herin mizgeftê dikarin nimeja xwe bikin. Ji lewra ko em ne li xênî lê li xwediyê xênî digerin.

[2] Welê dixuye ko Marşal tenê xaniyên kefxwê û kiziran ditine. Ji ber ko herwekî em dizanin xaniyên serokên eşiran bi awakî spehî raxisti ne, û bi xeml û xêz in.

Gund di nav hev de, bi şiverênen teng bi hev re girêdayî ne. Şiverênen welê ko hêstir bi xwe bê talûke tê re nikarin derbas bibin. Ev rê ji bona suwarên nehînbûyî tiştekî gelek dişwar û bitirs in.

Her cih û welat di nav xwe de deba- ra xwe pêk ditine û hewcedarî ê din nabe. Ji xwe naxwazin dan û standina wan bi xelkê dorê hebe.

Jin kirasê penbû û nivhevrişim, cawê sor û reş-xêzkirî çêdikin. Bi vî cawî şalên mêran ên fireh, û şapikên wan tèn çêkirin. Jû pêve jin bi çêkirina eba, kulav û kumên wan jî mijûl dibin.

Mehfûrên xwe, ko xemla xaniyên wan a bingehî ye, an li erdê raçandî an li tevnê vegirî, çêdikin. Mêr bi cotkarîyê mijûl dibin, diçin her pêz, qelûnê vedikişinin; an ne di şerî de ne.

Texminkirîna nifûsa kurdan tiştekî dişwar e. Lê herhal jî niv milyonî ne kêmîr in.[3]Piraniyeke wan misilman e. Di tixûbên ecem de kurdên fileh jî hene. Li Şingalê û her bi nivroyê wê ve, kurdên êzidî rûdinin. Ji her tirkan ve êzidî jî (.....) re diparêzin û ji lewra kirin û firotina wan re destûr heye. Filehên ermenî ko di nav wan de rûdinin û jî wan ne kêmîr in, tev de filehên ortodoks in.

Di navbera hemî kurdan de mişabe- teke mîlî heye. Heçko demînin hev. Rengê çermê wan bi qasî yê tirkên dorê û ermenîyan ne esmer e. Kurd bi piranî bejnîbilind û bi dest û lep in. Difna wan wek tewandî ye. Lê çavên wan gelek nizingî hev in, û bergehêkî wan welê heye ko mirov dibêje di kortikên xwe de qey dibrûskin.

Kurd di gerandina avê de gelekî şeh- raza û hinerwer in. Bêyî tu aletan, cuhên avê jî kaniyên cihên bilind de rawestayî, dibin û digehînin pal û kaşan. Ji kaniyê bi saetan ve dûr. Heta wê dera ko şinahi hewcedarî avê ne. Ji xwe di wan doran de, jî her texlît şinahi- yan re av divêt.

Pericar palên çiyân heta bi bilinda- hiyeke ecêb, şehnişinwarî tebeq tebeq, mîna diyarên bi serhev, ajotî û avakirî ne. Wek rezên me ên çêtir-xebitandî.

[3] Dîsan jî kurdan herçî Marşal bi xwe ditine, ne hemî kurdistan û tevayîya kurdan.

Belê kurd jî bona destxististîna bîhustekî erdê çandbar û danîna daran holê di- xebitin. Zevî û awayê gerandina avê jî bona kultûra [4] mîletê kurdan bir- hanêke bes e.

Belê welat û ezmanê vî mîletî ê zelal ko bi tevayîya giyanê xwe pê girêdayî ne, holê ye.

Di sala hezar û heştad û sih û heşt- an de Hafîz paşa bi ser Çiyayê-Xêrzan de girtî bû; û bi şûr û agir xelkê wî ajolî bû heta bilindcihên çiyê, deverên asê, nav ferş û zinaran de.

Xelk liber disekinîn. Hetanî ko zad û qût dest bi kêmbûnê kirin. Hingê rispîyên wan li der konê serdarê mîzefer de xuya bûn. Jê efwa xwe dê bixwestana.

Paşê jî bona xistina vî xelkî bin destê hikûmeta xwe jî rakirina wan jî wan çiyayên asê pêve tevdireke din nizani bû. Belê dilê wan hebû wan jî cih û malên wan rakin, bibin deştê û li wê derê bi cih kin

Paşa gelek tişt jî wan re wad dikirin. Paşa di cihekî welê de dikarî bû bi qî- ma dilê xwe comerd û destvekîrî bibe.

Ji wan re digot ko, li deştê, jî her yekî wan re, jî erdê wan deh caran bêtir erd dê bihata dayîn. Dîsan sê salan, jî wan ne qemçûr ne jî wêrgû dê ne hala standin. Ji milê din, jî wan re wesfê dewlemendiyên deştê dida. Mîna çandina darên tû, çêkirina hevrişim, bi xwedî- kirina hespan. Li şûna ko li çiyê tûlir- kan bidin hev û herin her pêz. Lê mirov welê jî, kari bû jî masîyan daxwaz bike, jî xwe re torekê çêkin

Rispî bi çavên zelûl li ezmên fed- kirin û tiştên ko jî wan hati bûn xwes- tin, pesnê wan dan, û tev xelatkirî dan rê û vejerîyan nik yên xwe. Tiştên ko seh kirî bûn, jî mirovên xwe re gotin. Cih de jin û zaro rahiştin tifingên xwe. Kuştar jî nû ve dest pê bikirana. Her wekî dest pê kirin jî. Û hetanî ko ser-

[4] Di hejmara Hawarê a nêzdehîm de me jî kul- tûrê re çand-gotî bû û di ferhengokê de bi awayê jêrin mana kirî bû: «Ji tevayîya ilm û hiner û piş- yên spehî re çand tête gotin. Me ev pîrs jî çan- dinê girt. Ji xwe di her zmanî de jî welê ye. Çand an kultûra ewrêpayî: tevayî û awayê zanîna xelkê Ewrûpayê ye. Em dikarin bêjin Çanda Kurdan jî. Pê dirok, çîrok, stran, dilan, mamîk, medhelok û her texlît pişe, rêzik û adetên me, têne seh kirin.

xwerabî bi temami ne hatine kevandin,  
kuta ne bûn. Lê hikûmetê bivênevê dev  
ji istîmara Kurdistanê berda. Ji ber ko  
bi ceribandîne têgehîştî bû ko proja  
rakirina kurdan ji çîyan û cilkirina  
wan destê nare serî.

Kurdistan seranser ji komên gundên  
jiheveihê pêkhatî ye. Carinan çavê mi-  
rov di sinên çîyan, an di nav fers û  
zinarên asê de, bi burcekê dikeve.

Ev burcên ha xweserî hin began in.  
Lê beg bi xwe hergav tê de rûnanin.  
Tenê di zemanê tengî û talûkê de di  
kevin-ê; û ew ji wan re dibin asêgeh.

Ev mirekên ha, cuda cuda, di nav  
xelkê xwe de rûdinin. Destê tukeyê de  
birekî welêt e mezin nine. Tenê di  
wextê tengî û talûkê de mirovên wek  
Begê Rewandizê, Bedir-Xan Beg û  
Seyid Beg, birek ji xelkê xwe didin hev,  
dixin bin alên xwe û leşkerekî xurt  
ditînin pê. Lê piştî ko talûke dibore û  
mes'ele safî dibe, leşker ji hev dikeve  
û ji mezinê xwe vediqete. Ji xwe her-  
kes tenê keriyê xwe diparêzîne.

EVE QELSÎYA VÎ MILETÎ. HEKE YEK BUWANA,  
DI NAVBERA WAN DE TIFAQ HEBUWA EV MILETÊ  
HA NE DIIATE KEVANDIN Û MEËLÛB KIRIN. LÊ  
GAVA YEK DIKEVE TENGÎYÊ ÊN DIN DI CÎHÊN  
XWE DE RÛDININ, ARÎKARÎYA WÎ NAKIN. HER-  
WEKÎ GAVA REŞÎD Û HAFIZ PAŞA DAJOTIN SER  
WELATEKÎ ÊN MAYÎN LI CÎHÊN XWE DIMAN.  
BI AZAHÎYEKE YEKROJÎ ŞA Û KÊFXWEŞ DIBÛN,  
HETA KO DOR DIGIHA WAN JÎ.

Ber bi nivro, di beriyê de kurd gihane  
tixûbên xwe ên tebiî. Erebên ko yekcar  
vajiyê vî miletî ne, xarên wan ên paşin  
ji hev de xistine û ew sekinandine.

Herwekî şerê ereb nikare şahîne kurd  
di bilindcîhên xwe ên asê de biqefilîne,  
kurd ji welê, di beriyê de nikare wî  
bike bin destê xwe, hetanî ko ji hawîrê  
xwe dernekeve.

Dijminê wan e xedartir, heke yekcar  
ji xurtîya xwe ne ketî buwan, diviya  
bû ecemên hevtixûb bibin.

Lê ji herkesî zêdetir, xwe ji paşayê  
Beşda û Diyarbekrê diparêzin. Ji lewra  
ko wî wextî, liber destê hikûmetê û di  
wan doran de, leşkerekî bi pêncî hezar  
peyayî û karkirî hebû. (dûmahik heye)

HEREKOL AZIZAN

## ÇARÎNÊN XEYAM

Da, ji xweşdiliyê tinê nav maye  
Wey hevalê gihayî, şeraba xav maye  
Destê xweşiyê, ji şerbikê şerabê mekişîne  
Îro ko destê te de, tinê piyan maye



Heya kengê gotina çar û pênc, ho meyger  
Çi yek, çi hezar; seh kirin dişwar e, ho meyger  
Em hemî, ji axê ne; kemaçe werine  
[ho meyger

Em hemî ba ne, şerabê bine ho meyger



Ho çerxê! tu her, dilê min xemgîr diki  
Kirasê min, yê şahiyê zirzîr diki  
Bayê ko li min dide, av diki  
Ava ko vedixum, devê min de ax diki



Ho gulê! tu wek rûyekî dilhevin xuya dibi  
Ho şerabê! tu wek lêva canrevî xuya dibi  
Ho bextê şerût, tu bi min re  
Her dilsar î, lê xemrevî xuya dibi



Destê te de yaqûta ruhn heye, ho meyger  
Dilê min wek yaqûta ronak ke, ho meyger  
Piyanêke dagirti bide destê min, ho meyger  
Da ji şerabê dilê xwe jindar kim, ho meyger



Çendan li dora xwe dinêrim  
Ji çemenan, bihuşt e; ji kewserê, çem  
Dest wek bihuştê ye; gotina dojhê berde  
Rûne vê bihuştê de, bi delaleke bihuştê



Ronî û şerab û tava hoyvê, ho meyger  
Û delaleke yaqûtreng û nazdar ho meyger  
Şerbikê şerabê bide min berî ko  
Şerbikan çekin ji axa min û te ho meyger



Dema spêdeyê ye, delala qedrgîran  
Lêva te bi stran be, destê te bi piyan  
Bi hezaran Cem û Key xistin erdê  
Ev çuyîna Tirmeh û hatîna Gulan



Sibeh e, xweş e, dilxweşî ye; ho meyger  
Ko şeraba şevê maye, piyanê jê dagirê  
[ho meyger  
Piyanê bide destê min û qedrê vê demê bigire  
Sibehê bîbî livinê aqîdê, ho meyger



Di vê rêya xedar de bi dilnermî bîjî  
Hevqas xema dinê mexwe şa bîjî  
Da ko paşayîka vê dinê, neyin e  
Xwe tune hesab bike û aza bîjî

Dr. K. A. BEDIR-XAN

# DELALÊ BERÎYÊ

JI DEVÊ EHMED FERMANÊ KIKI

— 1 —

Hay lo dilo! . . . . .  
Emrê dilê min pê ra, de bajo  
V' êvarê mi rebenê! . . . . .  
Tu carê li darê dinyayê  
Nabe tu peya bi  
Li ser bozê qesirandî  
Dêl û bijî bi hena bi . . . .

— 2 —

W' ez tu nifira li bejna delêl nakim  
Li Beriya-Mêrdînê, li Kepezê-Kika, erdê  
[bêpîva  
Bira li delêl derkeve xarek, mîna xarê şemera  
Suwarê seklawî li delêl kar bin  
Erdê bêpîva, li cî xa' ber' dir, ga' nê xwe  
lêdikin[1]

Bihustê lawê bava bi lire be  
Mêrê xerab ji mêrê çê bi şade be  
Destê xorta dizgînê negire  
Lingê lawê bava di rikêbê nesekine

— 3 —

Şadê-şudê delêl gelek hene  
Bû hêfadê koçan û kerîyan  
Navê revê, delal hêram e  
Delêl were malê me va ne  
Serê stûna kona nîzik e, j' te bi xuya ne  
Tevdana sing û berê min, xezalê!  
Ji eşa pêve, li nefsa canê delêl  
Suwarê seklawîya helal be

— 4 —

Di v' êvarê, emrê dilê min pê ra  
Bira li me nehata ji ba  
Bayê xerbî zînetî rûkê dinê  
W' ezê bala xwe didim-ê, maqûlê di kika  
Kîşane oda bavê Bişar  
Şêwr û mişêwrê roja barkirinê

— 5 —

V' êvarê xewa xelkê delal di paşila min  
[de naye  
Nizam delal gîti sar û germê  
Ezê nizam delal nexweş e  
W' ez nizam seklawî ranê delêl kutane  
Nizam wac mala bavê min kevn bûne  
[kêç ketin-ê

— 6 —

Di v' êvarê, delal, minê ji gira girê kcwkeyo  
Ketim rêz û koçan û kerîyê di kikan  
Xelka min e delal, liser nag û delûlan  
[girtiye todeyo  
Minê nihêrî bejna zirav, mîna seklawî,  
[seklawîyê Bavê-Bişar

[1] li cihê xamberindir guhanê xwe

Li der konê Bavê-Bişar bisekine, bêreşmeyo

— 7 —

V' êvarê . . . . .  
Seyda lawikê xelkê delal teyr û tiyilkê  
[dora mala bûn  
Seyda xelkê min î delal, xezala serê geleyo  
Delal de rabe destê xwe bi destê min de  
Emê hevdi birvînin; xwe bidin dora  
[Xabûrê-Begara  
Bira Girê-Mişergan ji min û xelkê delal ra  
[bibe sitareyo

— 8 —

V' êvarê . . . . .  
Ezê daketim Beriya-Mêrdînê, ji dilê min  
[rebenê! beriya berê  
Lê şin dibû kulîlka qewanê, tûmê di xerdelê  
Salê-çûnê ez xwestîka xelkê delal bûm  
Sala vê salê, ketim tora yeki pîsê mirdar  
Roja barkirinê, li dewsa koç û wara dimam  
Darê dergûşê li min bû bela  
Mirata kitanê, li min rebenê, bû baskê  
[di qertelê

— 9 —

Di v' êvarê . . . . .  
De bajo, rêdûro bajo, betiliyo bajo,  
[hêyirîyo de bajo  
Li ber germîya havînê rûmene, vê sibekê  
[tuê bigirî sar û germê  
Serê te biêşe, tuê nesaî bikevî  
Di welatê xerîbiyê, bi emelê serê min bi  
— 10 —

Hay lo dilo! . . . . .  
V' êvarê minê Çaxirbazara şewiti  
Mi ne diye, bi saxlûxdana, bi çava ji min dûro  
Sing û berê min rebenê!  
Vê sibekê mîna başçekî, ji başçeyê Nisêbinê  
Mîna mêrgê, ji mêrgê Tilkermê  
Hawîk, ji hawîkê dora Xêbûro  
Emrê dilê min pêro  
Were delal tewafa sing û berê min, rebenê!  
Serê xwe deyne rakeve  
Ev stêra li me der bû, Stêra-Karwanqiranê  
Serê xwe deyne rakeve, Stêra-Sibê li me dûro  
— 11 —

Dere, hey lo, dilo . . . . .  
Delal tu terka min bidî, ez terka te nakim  
Lo! lo! melûlo, xempiro, keserkûro!  
De bajo rêya te dûro! . . . . .  
Îro du ro ji sing û berê min, rebenê! mazûlo  
Xwezîka min xelkê delal bidîya  
Mîna dewr û dewrana ewilî, tev selefê  
[Bavê-Bişar  
Beriya-Mêrdînê, ser piştî hemdaniyê  
Vê sibekê li hawîkê dora Xêbûro  
— 12 —

Heylo! . . . . .  
V' êva rê emrê dilê min pê ra

Vê sibekê karê tev bizinê, diçêrin li pozê  
[Çiyayê-Şingalê

Cilê delêl hatine ber şuştinê  
Ezê bistinim qalûbek sabûna Helebê  
Bişoni ser ava Zirganê  
Bisom, lêkim ava mawerdî, ezê raxim ser  
[darê qurnefilê

—13—

Di v'êvarê . . . . .  
Kaleki mala bavê me heye, liber rehîma  
[Xwedê, roja barkirinê  
Sê brê me hene, li bin darê silehê, roja  
[qewimandin û kuştinê  
Gava çavê min nekev, li bejna xelkê delal  
Ezê berê xwe bidim, herim Midyatê  
Dawa taqîya xwe bibim cem hoste Melko  
[ser boyaxa reşkirinê

—14—

Dilo lo! . . . . .  
Vê sibekê xelkê min î delal çû welatê xeribiyê  
Kesek li mala tunine, w' ezê sebra dilê xwe  
[pê binim

Derdê dilê min pir in, şevê kanûna  
[şevine drêj in

Ezê rabim lêwik li dergûş xînim  
Ji derdê dilê xwe re rebenê, bilorinim,  
[bilorinim, bilorinim  
Hêstirê xwinê, ser sê biskê di şê, hinarê  
[rûka bibarinim  
De bajo emrê dilê min pê ra . . .

—15—

Haylo dilo ! . . . . .  
Rabe berê xwe bidin welatê Kurdistanê  
Herin Diyarbekra xopan, korta gidiya  
Ezê vê sibekê herim, kevirki. rakim, ji  
[bedena hevsa xwîniya  
Ezê wi kevirî têxim navbeyna xwe û ber vî dili  
Di pey bejna delal, li welatê xeribiyê  
[sebra dilê xwe pê binim  
De bajo emrê dilê min pê ra, tim lo lo!  
De bajo rêdûro, bajo xempiro . . .

—16—

V'êvarê ji gira, Girê-Girdêşê, Girê-Girdêşê  
Xelkê min î delal suwar bû, ciwanika ibeyê  
Berê xwe da xêmê beriya jêrin  
Lingê ciwanika xelkê delal li keviran dikeve  
Fzê nizam teresbav solbend neçê solkiriye  
Zikê min dişewite, dilê min vê ra dişe

—17—

Keçikê digo: lo delal ez ne jin im, na bimêr im  
Ez xweyînga heft bra me, wekî şêr in  
Dotmama donzde pismama, suwarê  
[hespê nêr in  
Gava çavê min nekev li bejna delêl  
Ezê herim biniya Nisêbinê

Her heft bra, donzde pismama şokê vedişêrin  
—18—

V'êvarê . . . . .  
Heylo delal, li min û li Tilkermê  
Delalê malê suwar bûye; vê royê, vê rogermê  
W' ez ne ketim ber etra delalê malê  
Ez ketim ber etra bi şalê sipî, bi kirasê melesî  
Çûye serê kanîyê, vê sarê, vê saregermê  
De bajo heyîriyo! . . .  
—19—

Heylo dilo! . . . . .  
W' ezê diçûm ber derî, derî li min venebû  
Hilkişiyam liser banê xênî, rê tune bû  
Daketim alikî hewşê, min bala xwe da-ê  
Xelka min a delal, li bin şibakê  
Di xewa şêrin da bû  
Sura bayê xerbi hati bû  
Temarê li çavê min kiri bû  
W' ezê bi xwe hişyar ne bûm  
Çûm tewafa sing û bera, bi kilîf û bi mifte bû  
Ehmedê Ferman, nizam ne siûda min, vê  
[sibekê, ne bextê te bû  
—20—

Dere heylo . . . . .  
V'êvarê Xwedêo, rebio, minê fiştik ji te navê  
Koneki çarstûnî, çitlik şikakî, navmalê  
Mêkutki ji darê benavê  
Minê konê delal vegirtiya  
Li Beriya Mêrdinê, li Kepezê-Serê-Keniyê  
Navrokê Evdiselamê . . . . .  
—21—

Lê, lê xezalê . . . . .  
V'êvarê tu xezala min î, xezala binê beriyê  
Devî li çêrê, çavî li karê, gulî li gaziyê  
Heylê xezalê . . . . .  
—22—

Vê sibekê Xwedê bikira miradê min û  
[xelkê delal  
Li Beriya Mêrdinê, meha Temûz û Tebaşê  
Minê rojî bigirta li ser rojiyê  
Xwezî ez bibuwama rimek ji dwanzde movika  
Têketama ser piyê xelkê delal, suwarê  
[hemdaniyê  
—23—

Di v'êvarê keçikê digo: dilê min qûma ferêt e  
Kosara Kika, Amûda rengin, stûna welato  
W' ez nakim terka bejna zirav, heya  
[serê nin nere  
Diyarbekrê, ber darê celêdo . . . . .  
—24—

Haylo dilo . . . . .  
Lo delal, heya gava mirinê  
Heya roja kuştin û qewimandinê, delal heylo  
Vê sibekê tîrsa min ji wê tîrsê ezê bimirim  
[welatê xeribiyê  
Berî kalbûnê, pîrbûnê, min tîr ne go  
[delal heylo...



# YEWANISTAN

## ÇAWAN BISERXWE BÛYE

Di sala hezar û pêncsed û sisê de, ango heri çarsed û sê salan Yewnanistan keti bû bin destê tirkan de. Xelkê Yewnanistanê di bin destê tirkan de, jar û perîşan bû bûn. Ne şeref ma bû cem wan, ne ji dewlemendi; çî cotyarî û çî dan û standin. Di sala hezar û heftsed û heştê de gava di navbeyna Ûrûs û tirkan de şer çêbû, yewnanan hevî dikirin ko Ûrûs dê bibe arikarê wan, û ji bona biserxweyiya xwe rabûn.

Tirkan zûka esker şandin ser wan, şerên mezin, şerên giran û xwindar çêbûn, tirkan zora wan birin û eskerên wan hatin şikestin. Lê Yewnanistanê hevîna azahî û istîqlala xwe her xurtir kir. Piştî mîdekê şairekî yewnan, Konstantin Riga rabû û bidizî civateke welatî dani. Di dora wê civatê de zelamên hêja, xwenda, zana û kêrhatî gihane hev.

Di sala hezar û nehsed û heştan de tirk ketin pey konstantin Riga û xwestin wi bigirin. Destê tirkan nedigihî wi, Konstantin Riga baz da û çû Nemseyê. Tirkan ji dewleta Nemseyê spartina Konstantin xwestin, wê dewletê ji bextreşî vê re kir û Konstantin sparte tirkan û bi destê tirkan di bajarê Belgradê de hate darvekirin.

Hevî û germiya Yewnanistanê sist nebû. Gund dişewitîn, bajar xirab dibûn, mêrg û parizên spehî dibûn tîrb û gornistan, lê di kavilên wan de gula azahiyê vedibû û xwe geş dikir. Camêr û mêrxasên nû wek Mavrokordato û Îpsilantis dest bi xebata welêt dikirin û xwe dişidandin. Dil, gotin û armanca Yewnanistanê bû bû yek. Serxwebûna welêt an mirin!!

Ji nû ve ji bo azahiya Yewnanistanê serxwebûneke mezin destpêkir û xelkê Yewnanistanê ji nû ve ji dinyayê re da zanîn ko xwîna wan ne kerisiye û kurên kal û kalikên xwe ne, wek berê egîr û gernas in; dilê wan teji mêranî û camêri ye.

Îpsilantis bi duhezar zelamên mêr zora tirkan bir û tirk ji axa Yewnanistana bakur derêxistin. Lê pişt re, di sala hezar û heftsed û yekê de Îpsilantis ji şikest û revî çû Nemseyê. Serekên din dibin emrê Georgakis de bi zelamên xwe ve di Dêra-Sekoyê de bi tirkan re şer kirin.

Tirkan çarmedora wan girtin. Yewnanan gava ditin ko êdî ji mirin an xwespartinê pêve tu rê ne maye bi mêranî êriş kirin ser tirkan û hemî di wi şerî de wekî şêran hatine kuştin.

Keşe Germanos gava şikestina welatîyên xwe bihist xelkê dora xwe kom kir û çû ser tirkan. Di wi şerî de (15000) tirk hatin kuş-

tin. Di wê salê û di şerêkî din de Yewnanan ji nû ve (8000) tirk kuştin. Di sala hezar û heftsed û bist û dudowan de mezinên Yewnanistanê istîqlala xwe ilan kirin. Tirkan ji nû ve esker şandine Yewnanistanê û di nav tirk û Yewnanan de şerên mezin çêbûn, gelek xwîn hate rêtin disa tirkan zora Yewnanistanê birin, (23000) zelam û (47000) jin û zaro bi destê tirkan hatin şerjêkirin.

Serkên Yewnanistanê û zelamên wan hevî û hevîna xwe sist ne kirin, ji nû ve dest bi xebat û şerî kirin. Di sala hezar û heftsed û sisêyan de di navbeyna wan û tirkan de ji nû ve şerên mezin û xwindar destpêkirin, Vêcar (3000) tirk hatin kuştin. Lê gundên Yewnanistanê hati bûn şewitandin, nik xelkê pere nema bû, welatê Yewnanistanê xerab bû bû. Xelk ji birçîna dimirin.

Di sala hezar û heftsed û bist û pêncan de tirkan ji nû ve ordûyeke mezin pêk anin û şandin Yewnanistanê. Disan şerên xwindar destpêkirin. Êdî wisa xuya dibû qey dema mirina Yewnanistanê hatiye; eskerê tirkan zehf û xweyçek û cebirxane bûn. Gava mêrxasên Yewnanistanê seh kirin ko êdî mirin e, destên xwe dan hev û bi mêraniyeke ecêb şer kirin.

Dewletên din heya wê demê destên xwe ne dilivandin û arikariya Yewnanan ne dikirin. Lê gava yekbûn û yekitiya hemî Yewnanistanê ditin dest bi arikariya wê kirin. Ji boyî Yewnanistanê di navbeyna Ûrûs û tirkan de şerêkî mezin çêbû. Tirk hatin şêrandin û di sala hezar û heftsed û bist û nehan de Yewnanistan bû dewleteke xweyistîqlal û di sala hezar û heftsed û sihî de dewletên dinê hemî istîklala Yewnanistanê nas kirin.

Îsal sed û sihî û sê sal in Yewnanistan xweyistîqlal e, biserxwe ye. Miletên hesir û dil ên bêtir serxwe bûn, ên mayî ji dê serxwe bibin.

Xwedê insan aza û serbest afirandiye. Em ji tu miletî ne kêmîtir in. Tu miletî ji miletî me ne mezintir e.

Paris: Dr. K. A. BEDIR-XAN

## TU ÇIRE AXÊ DE YÎ? . .

— Ji Mela Ehmedê Botî re —

Sadiyê şîrazî, yek ji şairên Ecemistanê ê bi nav û deng e. Sadî du kitêbên mezin hiştine. Bostan û Gulistan. Gulistana wî ji qiseyên felsefî û hikemî teji ye. Çarina jêrin a kurdandî ya Sadî ye. Ji yara xwe a mirî re gotiye.

Rojên Buharê ne, gul û lale û nesrin,  
Ji axê dertên, tu çire di axê de yî?  
Mina ewrên Buharê, herim bi zar bigirîm  
Di gorna te de, ewçend ko tu jî, ji axê der bibî!

REMOYÊ QENCO

## PENDNAME

Ezê bêjim hon dilê xwe megrin  
 Dinya ne hêja ye, emê tev bimirin  
 Mala me gelekî kûr e, yek max e  
 Ew ji li bin şes heft tebeqên ax e  
 Em tev bira ne, ji yek dê û bav  
 Ji mirîyan ra çî maye, ji bil nav  
 Qet şiyar nabin, ta kengê razin  
 Hon mezin in, em ji we dikin gazin  
 Xelk dibêjin şêx û mela  
 Wextê zekata xwe, dibêjin bela  
 Çiman hezretê peyqember gotiye  
 Zekatê mexwe, ger tu haşimî ye  
 Malûmê we ye, ew qrêja mal e  
 Lewra ji şerîfan ra ne helal e  
 Em bi dilê xwe tev hakim û mir in  
 Di zekatê de, ji qismê feqîr in  
 Madam ko em varîsê enbîyan e  
 Çima em xerikî karê dînya ne  
 Bes e, hon ji xew rabîn, ez gori zû  
 Zarokên xwe ra bêjin ilmên nû  
 Çiman hezretê fexrel-alemin  
 Gotiye: «Utlîbul ilme welew fis-sîn»  
 Misilman kengê li Sin, hebûn, ew çax  
 Ax! Ji derdê we şêx û mela ax! ax!  
 Hon dibêjin em bûne qutbê razi  
 Qet yek ji we nabe niftî û qazi  
 Hon bi van her du ritban ne razi ne  
 Lewra hon belengaz û pitazi ne  
 Hon tev mêr û çeleng û xort û ciwan  
 Hon ji pira parsê dikin ji bo nan  
 Ez mela me lewra dilê min diêşe  
 Xwedê rehna xwe bike di ên pêş e  
 Em hîni tu karî ne kirin yekcar  
 Lewra em lêj mane tiral û bêkar  
 Axa, ez ketim bextê te û Xwedê  
 Ezê çend pirsan bêjim tu guh bidê  
 Binêre di bin destê de heye sed xan  
 Hemi belengaz û reben û gavan  
 Tu malê wan distîni her bi dilêş  
 Textî dixî... na memûr û derwêş  
 Ger we tev bidana bi top û tîngîş  
 Dê hon ji bibûna hemberî firing  
 Lakin çî bikim we tev da bi şabaşa  
 Qet kes ji we ne bû wezîr û paşa  
 Li ser bextê min bê hon mêrê çê ne  
 Ax ax êsirê destê xelkê ne  
 Bes e, hon eqêl xwe bidin serê xwe  
 Destê xwe bigîrin vekar li perê xwe  
 Çiman ji bona ax û mal û xweli  
 Perê xwe didin bi hev dikin gili  
 Hon mala xwe bixun her yek bi serbest  
 Di hemberê neyarau da bibin yekdest  
 Ji hev ra pir qene bin û guh bidêrin  
 Li çerxa felekê hon pir binêrin  
 Gerek ji bo neyar e, yek ji bo me  
 A neyar jê ra hat, a me bêdom e  
 Em ji şûva xwe bajon û tov biçûnin  
 Dê zû şin bê, emê wi zû bibînin  
 Carinan em rezekî datînin deh sal  
 Em maxun jê, ji karê me re dibê mal  
 Ewê ko çêkir vapore û balatir  
 Deh sal bi şûn ve ne ma çû mir  
 Ev tev ji me ra, rêya din û iman  
 Hubil-weteni delil û birhau  
 Ez bi xwe bê çî û eşîr û ebr in  
 Pêlek maye emrê min, ezê bimirin  
 Bes ji bona we ye, ew qirçira min  
 Lê ez çî bikim, hon guh nadin şihra min  
 Hon dizanin lê hon li xwe nakin bar  
 Em ji, ji dilêşî dikin hawar  
 Fikra min maye min ev tonê dixwest  
 Lê ez çî bikim li vir qelema min şikest  
 Bi kéré, min tûj kir serê qelema zil  
 We digel a te bêjim, dibin çil  
 Eger hon ji gotinên min aciz bûn  
 Hêvi dikim ew bikim Cegerxwîn  
 CEGERXWÎN

## DÊRIK

Dêrika Çayê Mazî  
 Welatê bav û kal e  
 Lê sêd hawar û gazi  
 Jê dûr ketim çend sal e  
 Ez li wê hatim dinê  
 Wê dergûşê, hejandim  
 Heywax hey mala min-ê  
 Dijminan, jê revandim  
 Perçake ji bihuştê  
 Besreka Zêrin wetat  
 Îro dest nagehişt-ê  
 Ax û keser ji dil hat  
 Bağ û bağçe bê hejmar  
 Çi bi çî mêrg û zevi  
 Li her derê, avên sar  
 Ji kaniya tê dizî  
 Kulûbe bûye xopan  
 Dengê herê jê nayê  
 Terasagaha xortan  
 Ji min ji sêwî mayê  
 Ji çiçekê rengereg  
 Sermest newala Govî  
 Çima iro nakî deng  
 Mîna tebayê kovî  
 Xwezî vê carê ji min  
 Serê Xabê bidîta  
 Bila ruhslin eanê min  
 Hingê ji xwe r' bimêta  
 Dilê min jê têr ne bû  
 Ax! ew Asraka Bexrê  
 Gelo ew roj heye ko  
 Dîsa bibînim bi xêr  
 Guher hêsa ne dibû  
 Ji keçên hustû-b' morî  
 Çavê min li wê vebû  
 Dilê min jê ra gori  
 Mancêl û Kani-Hinar  
 Gorinê birê min in  
 Îro bibê pirsîyar  
 Cuwahê derdê min in  
 Reha-Reş û Lata-Sor  
 Yek sorgul e, yeke mor  
 Bîn bikim ez dor bi dor  
 Têr nabim hetanî gor  
 Du textê Qizê-Qirêl  
 Hemberî hev dinêrin  
 Li ser wan xweş qelisêl  
 Gurçik û dil çedibin  
 Xwedê kerem bikira  
 Bîbama teyrekî baz  
 Li wan çih li wan dera  
 Bîgerim perwaz, perwaz  
 Dêrika Çayê Mazî  
 Welatê bav û kalan  
 Dîtina te dixwazî!  
 Newzad: ji te ra heyran  
 NEWZAD



Ji Starnên Çîhê Botan:

## KÊRE

Bihar xweş dibê binê vi Seqlani  
 Heşin dibê kulîka ketê, ya vi Bêzranî  
 Xwezi ez bibiyam mihkeke kurebazi  
 Sê sevan çîle û kanûnê, berf û hagerê  
 Min serê xwe bikişanda bin kulavê te şivani  
 Dilikî min, dilikî bi heylêz e  
 Bêrî û herivan ji malê me bêne rêz e  
 Kesik ne diye ser dewr û zemana, hakim  
 [bigirin şivanê her pêz e  
 Xwezi ez bibiyam qurmilo  
 Ez biketam hêrikê Qereçox, erdek şilomilo  
 Keçikên Mûseresa, Xêrka, Teya, Mira  
 [bihetan, ez bexîstam mîlo  
 Ez bibiram sûka Cizirê bidam bi  
 [sibhan û kilo  
 Bianiya bexîsta çehvê rastê, ê çepê  
 [bima wilo  
 Dilikî min bi heylêr e  
 Çehvê min yek heyr e, yek stêr e  
 Menukên min yek mizgeft e, yê di dêr e  
 Du kehni navbeyna sing û berê min der bine  
 Yek Rûsor, ye di Spîpêl e  
 Heqî nexweşê ev heft sal bi  
 Ser piştata xwe ranebî  
 Firkê jê vexwê, roj bi roj ber bi xêr e  
 Ezê bidim te, banê Bamêş bi pûş û pelêş ve  
 Ezê bidim te Seqlên bi êş ve  
 Ezê bidim te, Sûka-Tarî bi tewbên qumêş ve  
 Mirê min, agir dikevê Banê-Bamêş,  
 [pûş û pelêş ve  
 Serê şapê pêde bê, Seqlan bi êş ve  
 Xwedê xarab bikê Sûka-Tarî, bi tewbên  
 [qumêş ve  
 Tu lawikê min berde malên me çûne  
 [zozana, her beleka  
 Warkoza mi biye Banê Xanê, germa  
 [Havînê li şûndewsî koz û kuleka  
 Dewleta mirê mi mezin bê  
 RÊDÛR  
 Êvar e, çaxê hevîra  
 Ti li serê xelkê delal şar û momî ne  
 Keçikê digo: kuriko devê xwe ji xal û  
 [nişanê gerdena min berde  
 Kuri digo mala bavî şewitîyê! xema nexwe  
 [stêra sibehê li me dîr e  
 Vê baranê lez ke, lez ke  
 Ti li serê xelkê delal şar û momî ne  
 Bejna te nazikê, enterikî timî kes e  
 Ji nimêja meçrebê ezê diçûm tewafa xal  
 [û nişanê gerdênê  
 Heta spêda sibê dibî şerê sîmbêlê sosinî  
 [qoce biska  
 Mi di ti li kolanê, Xidir-Mame da  
 Minê dawî enterikî Şamê girt û  
 [qet berneda  
 Ji nimêja meçrebê ezê diçûm tewafa sê  
 [biskê di şê  
 Heta fecara sibê min terka cotê  
 [zermemika ne da  
 MEMOKÊ  
 Hey lê Memokê eivanê, te singsuhrê  
 De ti li min veke berî û bişkoja  
 Dinya li min cineta baqî bi, te li min  
 [kir-ê doje  
 De rabe Memokê eivanê, te singsuhrê  
 Bi xet û bi xal û bi nişanê  
 Te li min xira kiri bi dergelên Colemêrgê  
 Bağ û bağçeyên Wanê  
 Sibe ye, sê mala ji gundê me bar kir  
 Heytê eivanê, Memokê! te singsuhrê bi  
 [xet û bi xal û bi nişanê kir  
 Memoka min ji eslê mala bavê xwe detal e  
 Te mala lawika li min xira kir  
 STRANVANÊ JÊLIYAN

# MIJDE

## BO LAWANÎ KURD

Lawani kurd! mijde bê lêtan, le paş şeş mang diyar nebûn, ewa emro ewel nûsawi Hawar le bin çap da hate derewe. Ey brale bizanin ke hemû milletêk be zmaniye we nasrawe, we enasire. Ke zman ne bû hiç şteki tir bûni we pêkhatini dirist nabê.

Bo jiyane we serkewtini zman nûsin, bilaw kirdinewe, we rojname pêwist e. Temaşa keyn lem peri Kurdistane we, bo ew peri, le sere we, bo xwarewey taw deyn le sê çapxane bew lawe nabinin. Yekekiyan çapxaneyi Jiyani Silêmani ye. Ke emeş le bexêr-hatini piyaweki gewre, heraci milk, êlani tapo bew lawe şteki tiri tiya niye. Duwemin Zari Kurdmanci ye. Ke hi piyaweki feylesofi pirqiyemeti xoman e. We hemû pûl û pareyekî lew çapxane da xerc kirduwe bo herzbûneweyi zmani kurdi we le çapdani kitêbi pêşinani bêhawta, le paş ewe ke hiç yarmeli le ême ne di ewa ewiş hate hali bêxwedi. Sêyim Hawar, hawar e.

Hawar wekû hemû ezanin hedefi esasi herzbûneweyi zmani kurdi, yekxistinini her du zman e, yanî kurdi serû û kurdi xwarû we.

Ey beqesêrani niştiman, ey ew kesaneyi ke xwêni germi paki kurdayetî le leşa ecûle, ey ew kesaney ke bo herzi zmani wilat hewl cden, himet biken, tê bikoşin bo jiyane weyi hawarman û zarman. Nûsrawekani wilatike bibinin we tozi dilman be hi xoman we xoman bisûtê. Bo çi êmeş hewl nedeyn legel xêwi em du çapxane be nixxeman da bo herzi we yekyete zmanman.

Ême ke wilati xweşewist çawerewan mane zmani xoman berz nekeynewe, kê hewlman bo eda, kê bo zmanman tê ekoşê. Bo çi her yeki le ême cari be yek du çiroki kurdi xoş ke her kurdêk sed ezanê, hemû rûperey bew çiroka bêhawta felsefiyane nerazenine we, bo çi be basî xo parastin le nexoşi pir nekeynewe, bo çi dawa kirdini pêwisti wilati tiya bilaw ne keynewe?

Brakanim, bizanin ke jiyani nûsrawi man be ême we bestrawe, berzi ême be herzbûneweyi zman mane we ye. Yekyete ême be yekyete zman mane we ye. Nabê xoman bo fewtani xoman hewl bideyn. Têkoşin, be mal û be pare bo berziyi zman man wacib e leser hemû laweki dilsoz.

Ey brale, bo çi ta êsta hêştûmane em du nûsrawe man bixewin. Bam hewl bidên bo hoşhênanewe seryan bo xizmeti niştiman.

Le paş em nûstine zoreyi haware itir hiwam wa ye hemû laweki dilsoz hewli ser-

# ÇÛK Û FÎL

Dibêjin carekê çûkekê hêlina xwe niziki rêya avexwarina fileki de çêkiri bû. Hêk û ferkik ji tê de kiri bûn. Fil weke adetê xwe ê berê tê re borî, da avê vexwit. Dît ko hêlinek teji hêk û ferkik wa li ser rêya wî de ye, anî pê lê kir. Hemî kuşt û şkenandin û çû ser avê. Gava çûk hat û dît ko ne hêlin ne tişte xuya nakin, hemî di vî hali de ne, yanî ev neqenci û xirabiya ha ji filê ye. Çûk firî û liser serê fil danî û jê re got:

— Ya melik te çire ev şûret serê min de aniye, te ez di darê dinyayê de tinê hêliştini. Ser vê qasê re em cîranên hev bîn û ez digel te bê xali-xarez bûm. Te ez kiçik û reben dîtîm ji lewre te hûsan li min kir. Fil lê vegerand û got:

— Belê herweki te gotî wisa ye. Ji lewre min ev li te kir.

Çûkê berê xwe jê wergerand û firî çû bal koma teyran ve û giliya halê xwe li nik wan kir, û serhatiya xwe ji wan re got û ji wan daxwaz kir ko bèn hawara wê.

— Teyrino hon digel min werin em tev de biçin bal fil ve û danin ser serê wî û çavên wî binikilinin, biqoqilinin. Dîsa ezê tepeke di ji lê bikim.

Teyran gotina wê dirist dêran û milên xwe dane hev û çûn liser serê fil danin û çavên wî dane ber nîkilan, heta kor kirin û ew ji qoqikên xwe rijihan.

Fil bê ronahi û xwarin û vexwarin ma, cihê xwe de. Dike hawar û zar-zar. Mês û mêriyan girtin kiloxê wî û qoqilandin û dest bi xwarina goştê wî kirin.

Çûkê, dîsan xwe jê ne da paş çû bal çaleke ji wan ên têrbeq ve û serhatiya xwe ji wan re ji got. Beqan lê vegerandin:

— Hey çûka reben ma tepa me di mezinahiya fil de çi ye, em çi dikarin.

Çûkê got: Bes min divêt hinek ji hewe digel min bèn û em biçin bal kortaleke niziki fil ve û hon di wê kortalê de bixwinin û bikin qurqur. Ji lewre gava fil dengê hewe seh bike ê hawar bike ko ev dengê he ji erdeke biav têt. Dê béguman bibe û ji êşa xwe dê bê bikeve tê de.

Beq pê qail bûn, çûn, li çalê de êwirin û tê de xwendin. Fil dengê wan bihist û tihne lê zor kir, berê xwe da wî dengi û qestê kir. Giha ser lêva çalê da ko avê vexut, hew dît ket û hilweşa tê de. Vêre vêre çûkê fir da û danî ser serê wî û her du çengên xwe liser hejandin û gazî kir ê:

— Hey heywanê gunehkar, yê ko bi xurti û zexmî, û hinermendiya xwe xira yî, ser paça xwe çûyi û ji rê derketi û tu hesab ji min nekiri, niho te çawan dibini û dihesibini ko min tu bi vê tep û hinermendiya xwe û digel vî cendekê hûr kuştî û êxisti vê çala kûr de.

Tu deng ji fil ne hat ser hev de tepisi, welê mir û çû.

M. E. BOTÎ

xistinî hida we bo pir kirdineweyi beyni kolekekani le hemû nûsrawêki tira nûsin be zmani xoman, kurdi xwarû, tiya bibinin bo ewey ke be her du zman ew xizmete ke Hawar hewli bo eda pêk bêt.

LAWIKÎ PIJDERÎ

# KAXEZA EŞKERE

## LI SER DESTÊ RÊYA TEZE

Ji HEVALÊN HECIYÊ CINDÎ, CERDOYÊ  
GENCO Û JI WAN RE KO PÊ  
BENDEWAR BIBIN

Hevalên delal!

Em di rojnameyên biyaniyan de dixwînin ko li Rewanê, ji bona kultûra kurdmançî xebateke zor tête xebitin. Gelek kitêb hatine çap û belav kirin. Di gundan de dibistanin vebûne. Tê de mamosteyên kurdmançî darsa zarokên me bi zmanê kurdmançî dibêjin.

Bi bihistana van tiştan dilê me şa, rûmeta me geş û bilind dibe. Me ji we gelege minet e. Îro herçi ko rê didin me û arikariya me dikin ko em ji bona kurdaniyê bixebitin ew dostên me ne, em hevalbendê wan in.

Herê em qedrê qenciye dizanin. Ji lewre me dil kir, liser xebata we a kultûrî bendekê binivîsinin û belav bikin, bi kurdmançî û bi frensizî. Da ko kurdmançên dinyayê û xelk bizanin ko kurd di her derê de ji heqê xwe ne talankirî ne. Disan pê bihesin ko di qelemrewa Hikûmeta Ûrûs de heq, zman û heyîna kurdmançan, mîna mîletên din, bi awakî resmî hatiye nas kirin.

Îro, di babelîska bîstan de, kurdên bextreş û di her derê de zorditi, li çirake azahiye digerin; da ko di dora wê de xwe bigehînin hev û di bin ruhnahiya wê de ji bona azahî û bilindiya mîletê xwe bixebitin. Ji lewre me dil kir, em ji wan re bidin zanin ko li Rewanê çirake welê diçirise.

Ji bo vê kirinê, destê min de materyel, yekcar ne kêmbin jî, hindik in. Ji lewre min ji we re, bi postê çend kaxezên sewgirandî rêkirin. Lê ji we tu euhab derneket. Ji ber ko destê min ji we nabe min dil heye ezê carekê bi hawarê jî biceribînim., Ji xwe tiştên ko ez ji we dipirsim ne tiştînen veşartî ne, û belavkirina wan ji we re û ji Hikûmeta Şewrê re pesn in. Ev in pirsariyên min:

1 -- Elfabêya Rewanê kengê hatiye

çêkirin. Bi çi awayî saz bûye. Bi destê civatekê, an bi destê mirovekî?

2 -- We elfabêya xwe kengê, di kîjan sal û mehê de belav kir, û bi çi awayî? Bi kitêbekê, an bi Rêya-Teze?

3 -- Hejmara Rêya-Teze a pêşin di kîjan tarixê de derketiye?

4 -- Helanî iro di Rewanê de çend kitêbên kurdmançî derketine. Navên wan, tarîxa çapa wan, navê nivîsevanên wan

5 -- Di Rewanê û di hemî cihên Qevqazê de çend dibistanên kurdmançî hene? Navên cihên dibistanan digel sinf û hejmara şagirtên wan

6 -- Dibêjin ko di Rewanê de dibistaneke mamostan heye. Heke welê ye hejmara sinf û şagirtên wê, pronivîseke (programme) dibistanê jî

7 -- Di cîmhûriyetenû Rewan, Azerbeycan û Gurcistanê de çi qas kurdmanç hene? Bi çi awayî lêk ve bûne? Di nav van de liser sedî çend xwendî hene?

Herwekî hon dibînin pirsariyên min tenê kultûrî ne û hon dikarin bêtirs û pirs li wan vegehinin. Ezê çavneriya cuhabên we bikim.

Paşî hon ji min re sax bin û slaven min bigehînin kurdmançên welatê jorin û serhedan.

XWEDIYÊ HAWARÊ

Piştî ko min xezikên jorin nivîsandin kaxezeke Heciye Cindî giha destê min. Pê re deh kitêbên kurdmançî jî hebûn. Ez bi wan gelek kêfxweş bûm. Min ji Heciye Cindî gelek minet e. Xwedê jê razî bit. Lê cuhabên hevalê Cindî gelek kêmbin in. Ji lewre ez jê û ji we hemîyan hevî dikim li pirsariyên min weke xwe vegehinin da ko ez bikarim benda xwe bi awakî rind û tekûz binivîsinim. Jû pêve û ji bo vê kirinê jî min re (Zman-name) yek jî divêt.

Zû ve ye Rêya-Teze bi aliyê me de ne bat. Çi lê qewimî.

X. H.

## BIYANÛ

Ji ber necihbûnê şîhra «xeyamwarî» ne kete vê hejmarê. Ew dê bikeve hejmara tê.

# LE BEAU DE LA STEPPE

— 1 —

O cœur! . . . . .  
La vie de mon cœur est avec toi, pousse  
[ton cheval en avant  
Ce soir, ô moi, malheureuse  
Que jamais sur la surface du monde  
Tu ne descendes du cheval (1)  
Tacheté rouge et blanc, bien entretenu (2)  
La queue et la crinière teintes en rouge

— 2 —

Je ne fais aucune malédiction sur la taille  
[de l'aimé  
Dans la steppe de Mardine, sur les collines  
[plates des kikan, terre démesurée  
Puisse-t-il surgir pour le bien-aimé une attaque  
[pareille à l'attaque des chemmars (3)  
Les cavaliers saklawi (4) se jettent sur l'aimé  
Sur la terre démesurée, que les brebis  
[effleurent de leurs mamelles  
Que l'arpent des fils des pères (5) coûte  
(une livre (6)  
Que les lâches, des héros, soient distingués  
[par témoins  
Que la main des jeunes gens ne puisse  
[plus tenir les brides  
Que les pieds des fils des pères ne  
[tiennent plus dans les étriers (7)

— 3 —

Les témoins (de la bravoure) de l'aimé  
[sont nombreux  
Il était le protecteur du convoi (8) et des  
[troupeaux  
Le nom de la fuite, aimé! est interdit  
Aimé, viens, nos foyers sont ici  
Les sommets des piquets des tentes sont  
[proches, tu peux les apercevoir  
Que les mouvements de ma poitrine et de  
[mes seins, gazelle  
Après la tombée de la nuit soient donnés (9)  
[à l'être bien-aimé

(1) C'est à dire, il faut que tu ne quittes jamais la selle.

(2) L'expression (qesirandin) s'applique au lavage et au blanchissage des tissus, noircis par l'effet de différents procédés. Par ce mot on fait allusion à la propreté du cheval.

(3) Tribu arabe d'origine hédjazienne. Jadis en perpétuelle lutte avec les kurdes de la plaine de Mardine, à différentes reprises en guerre avec le fameux Ibrahim pacha, finalement battue auprès de Nissibine. Cette lutte contre un ennemi commun a servi à la réconciliation des tribus kurdes de la plaine qui se battaient entre elles.

(4) Race de cheval noble.

(5) C'est à dire les braves.

(6) C'est à dire que la lutte soit si acharnée, que les guerriers disputent le terrain avec une telle bravoure qu'un arpent de terre coûte une livre or.

(7) Toujours la définition d'une guerre acharnée.

(8) C'est à dire « chargement du matériel, transport » d'où le mot « koger » celui qui se transporte, non-sédentaire.

(9) Littéralement « non-prohibé, permis »

Au cavalier du cheval saklawi

— 4 —

Ce soir, que la vie de mon cœur soit  
[avec lui  
Des vents, que ne vienne pas vers nous  
Le vent de l'ouest, parure du visage du monde  
Je fais attention, je constate, les chefs des kikan  
Se sont retirés dans la chambre du père  
3 Lo, merovo, nezano! [2] berê xwe  
bide ezmana, çi qiyas (çiqas) heşin e.  
Û seyr bike li gerê di vê felekê. Hemû  
stêrikê di rengin e. [3] Û sibhan bike  
ji xudanê keremê re, yê ko ew li hewa  
êxistin û danîne. Belê heyf û xebînela  
min tê li hisn û cemalê di wan, yê ko  
paşkê bikevin halê ko em pê ketî ne.

4 Lo, wî [4] dibêjin axirzeman e, û  
erd û ezman bi hev ketine [5] û dolabê  
di felekê sist bûne, û stêrik hejihan,  
û tidarikê di xwe li ketinê kirine. Belê  
heyf û xebînela min tê li heşinan, li  
rihan û gulçîçek û pelên beybûn û so-  
sinan. [6] Yê ko xemlên xwe avehlin  
weke masiyê li bejê hişk bûne û mirine

5 Lo, wextê ko barî teala li dinê peve  
binê û defterê di xêr û gunehên me

[1] Ko di Buharê de baran lê hatiye

[2] Lo însano, cêhilo

[3] Hemî stêrikê di rengin in

[4] Lo wê dibêjin

[5] Pev ketine

[6] Li şinê rihan û gulçîçek û li van beybûn û sosinan

Şerab ger ji heram e, her vexwe  
Bi cejn û govendê her vexwe  
Ko piyanek şeraba sor kete dest  
Dilopeke wê ji merijîne, hemiyê vexwe

Delalê! şeraba pak û zelal vexwe  
Bi navhilanîna dilrevîn û spehiyan vexwe  
Şerab xwîna tirî ye, tirî dibêje:  
Min xwîna xwe li te helal kiriye têr vexwe

bîné û li ber alemê û dinyayê û milyaketan bixwîné way li min bêmefero! Wekê [7] min bikişînin hizûrê ezê çi ciwaba rihê xwe bidim? Lo tu mêran û Xwedê dihebîni.

**6** Lo, dengêki bilind ji ezmana dahatiye. Go: bilezînin û mizgîniyê ji miriya re bibin; bila ji tirba rabin û xemlên xwe wergirin, weke kulilkê di rengîn. Lê Buhara qiyametê hatiye, pê ve [8] herin. Lê milyaketê di xwe kirine qasidê di we.

**7** Lo dengêki xafil ji ezmana hatiye û me hay jê nîne. Go: mirîno ji tirba rabin, lê qiyameta heqelyeqîn e, xwe ji ax û ritamê dawesînin, û xeml û belgihê di qiyametê wergirin. Û serên xwe hilînin, weke zîlika gihayê heşîn.

**8** Lo, dengê nefir hat ji ezmanan û ji heybetê felek hejiha û stêrik rijihan. Yeqîn weqatê di wan e ko çiyayên bilind bihelihin û ber û behr bibin meydan, û heşir-û-mehşûr bèn ko heft pê li pêkî bikevin. Yeqîn ko hakim nêta wî ko bikê diwana.

**9** Lo, ma wekê qiyamet bê û barî teala hakim bê û Mikail gilihçi bê û Cibraîl şehde bê û Ezraîl dehwaçi bê û alem bê hizûrê, way li min gunehkaro! bi wê saetê bêmefero! Gelo halê min wê çi bê?

**10** Lo, ez hawara xwe ji Xwedê re dişînim, ko dogeh xopan bê û bihedimê, ko ez bi çavan ne bînim. Lê ne bes e derdê dinê û xema mirina ko ez her dibînim. Ji tirsê jana dogehê ez dilê xwe pê dikewînim. [9]

[7] Kurdmancin hene (wekê) û (wekî) ji hev venaqetînin. Her duwan bi awakî û di şiklê (wekî) de bi lêv dikin. Di axallî de holê hebe jî, di nivîsandî de divêt ji hev bêne veqetandin. Gava bi mana (wext) e, (wekê) ye. Lê ko bi mana (heke) ye, hingê (wekî) ye. Wekî niho: Wekê «wextê» ez ti Şamê bûm. Wekî (heke) ez çûm Şamê. Ji aliyê din disan kurdmancin hene ko (hingê) û (hingî) mîna hev bi lêv dikin û ji her duwan re (hingî) dibêjin. (hingê) bi mana wext e: Hingê min jê re got. Yanî: wî wextî, wê çaxê, wê gavê min jê re got. Hingî min jê re got. Yanî min hinde, hewqas, ewçend jê re got.

[8] Ji pêl ve herin

[9] Lê zêde ji jana dikrê dogehê ko daim dilê xwe pê dikewînim

**11** Lo, weylek li serê min bê, wekê min bi xezeb li hizûrê bikişîné û defterê di gunehên min bîné û liber civatê bixwîné û min destedesta bikin û bal dogehê ve bişînin . . . Xwezî ez ne buwama, min ew saet ne ditaya ko min dahilînin zêzemîna dogehê de.

**12** Lo, stêrka sibehê hilatiye, û qewî dilezîné û destê xwe li ba dikê û lev (li hev) dixê û dengê xwe hiltîné. Go: lo merovo birev û tobe bike, lê milyaketê bi xezeb li pey we dikudîné; ko heçî tobe ne kir û xêr ji keda xwe ne kir wê îmanê jê bistîné.

**13** Lo, merovo bes van şer û gunehan bike, biqere û rûne. Lê dingedinga ezmana tê û dergehê di wan vebîne û barî teala bi milyaketên xwe ve dahatiye. Hingî mirî hene ji tirba rabîne, û em gunehkar in û me tobe ne kir. [10] Qewî li me bisû ne.

**14** Lo, ma erd şehde ne, û ezman gilihçi ne, û barî teala hakim e, û milyaketê di wî dawaçi ne. Lê heke ew rehmê ji ba xwe nekê, me eza nekê, me mefer bi kesî di ve nîne.

**15** Lo pa ez çi bikim, sefil im, sergirdan im, rûreş im, gunehkar im. Lo dikrê mirinê ne yê xêrê bê ko ez xafil girtim û ne hişt ko ez tobedar bim.

**16** Lo, dilê min bi kerba qewî dinalê. Go: ne xwezî bi vê dinê û ne bi vî îş û bi vî halê ko mirin weke bazihê li pey ordeke li pey me dizûrê û dikalê.

**17** Lo, dilê min qewî diêşê û dinalê bi birîna, û hemû ji kerba hêstir ji çehvan dibarin [11] weke peşkê di xwîné. Hemû ji xema mirinê û zêde ji ezabê dogehê ko daim tehlî ne, û girin e.

[10] Û me gunehkara tobe ne kir

[11] Ji çehvê min hêstir dibarin

**18** Lo, xwezî ez teyrek buwama ji teyrên li ber bayî, ko ez biçuwma keviya behra mezin û min xwe pê niha-ya ko min xwe ji derdê dinê û ji gunehan xelas bikiraya. Û zêde tirsaya min ji mirina ko ez jê xafil bim û li serê min bê.

**19** Lo, hilû rabe, da em tobe bikin. Malxrabino serê xwe hilînin û ji xew rabin, lê dinê bi hev ketiye û em rakîşandin pey gunehan, şuşlê me xirab e. Xwezî me ev dinya ne ditaya û ronahiya wê ne bînaya. Wê paşê eseh me bikê ber dehwa û hesaba.

**20** Lo, malxirabo serê xwe hilîne û ji xewê rabe, lê dinya pev ketiye. Lo wî dibêjin axirzeman e, heyama qiyametê hatiye, dê em tobedar bin û tîdarika axiretê bikin. Lê emê di xafil hew te di ko mirinê bi tihna me girtiye.

**21** Lê mirinê tu qewî bi lez bi ciwanî pey me dikudênî, tu daîm suwar î û li ser me pê ve tînî, tu nahilî ko em pîr bibin, heta barî teala bi sebr emanetê xwe ji me bistinê.

**22** Lê, dinê te ne hişt em tîdarikê di mirinê bikin. Te em serberdayî berdane sehayê. Te got sefayê bikin bi dilê xwe, lê mirin dûr e, û niho nayê. Te em xapandin û mirinê em xafil girtin. Te ne hişt em tîr sefayê bikin li vê dinyayê.

**23** Lê dinê, tu ewil nîşanî me didî, rahetî û sefa û xweştîyan, û paşê tu dilê me teji dikî ji jan û derd û tehlîyê. Zêde dikrê mirinê ne yê xêrê bê ko her suwar e û li serê me pê ve tînê, û me tişt û malê di pîr şemirand û me dest ji ber rihê xwe kiriye.

**24** Lê mirinê tu pêşkarê me bûyî Zivistan û Havîna, û te mehbûbê dila ji me standin, xudanê hesp û rext û zîn e. Lê dikrê mirinê ne yê xêrê bê ko ji dêla xemlê di nadir û serpeçanê

di nazik te serên me bestin bi kevnîkê di heşin.

**25** Lê dinê te ne hişt em tîr sefayê bikin li vê dinyaya betal. Te axa ji me birin û te ji me re hiştin pîr û kor, kevn û kal. Lê dikrê te ne yê xêrê bê, ko te ji xema û ji kesera te serê me bestin bi kevnîkê di reş û şalan. Lê pa em çî bikin me mical bi te nîne, me tu spartî hikmê barî teala.

**26** Lo malxirabino serên xwe hilînin; lê dinê em dêris kirin. Vê mirinê ji koma û ji civata, ji me ne hişt yek ji bi tenê, da em belgihê evdaliyê wergerin û tayih bibin li vê dinê. Lê heyf û xebînetê te ko em bi van keser û van kulan em biçin bikevin gorinê.

**27** Lê dinê te ez kirim evdalekî şeqî, ji şîrî te ez berdame peyê gunehan, ji piçûkî heta bi pîrî. Lê mirin qonaxî ye, cihê min kir nav agirê dojhê, û ba û pîzrûk û zemherîra.

**28** Lê dinê te ez ji guncha bar kirim û te destê min ji xeyrata birîne, û ez dizanim ko paşî poşmanî ye, û keser in, û şîn e û girîn e. Xwezî ez bi mirîya re ranebuwama ko min dojhê ne ditana. Lê min taqet bi ezabê wê nîne.

**29** Lo malxirabo, serê xwe hilînin û çavê xwe veke, û ji xew rabe, lê mirinê em dêris kirin û em sêwî hiştin ji dê û bava, û felekê em tazî hiştin li ber barana û li ber tava.

**30** Lo, oxura felekê ne ya xêrê bê ko em ji tişt û malê di pîr em xîzan kirin û em existin ber van mitalan û van hesaban.

**31** Lo, berê xwe medin vê dinyayê, lê xayîn e û bê ra ye û derewîn e. Geh tehl e û geh şêrîn e, geh şahî ye û geh şîn e, geh ken e û geh girîn e. Tehqîq tu destgirtîya min buwayî ko min tu bi yekî di bidayî. Lê pa ez çî bikim tu maka min î, min mical bi te nîne.

**32** Lê dinê, tu xayin î, û bêra yî, te ez berdame peyê guneha, serberdayî. Tehqîq wekî tu destgirtîya min buwayî ko min tu bi yekî di bidayî, lê pa ez çi bikim, tu maka min î, min mical bi te nîne û tu bi min dikari.

**33** Lê dinê, xwezi ez ne buwama û min xêr û mekseba te ne ditaya û ko te ez berdame pey guneha û te ez menih kirim ji hifza qewlên Xwedê û welîyan. Tehqîq tu destgirtîya min buwayî ko min tu bi yekî pir bidayî, lê pa ez çi bikim tu maka min î, û min tu spartî Xwedê û mêrên welî.

**34** Lo qulingo, tu pir bilind dibi û tu dinyayê dibîni çi mîna ye. Got: Lo çi hewce ye ko hon pîrsa dinê ji min bikin, wê li darî çava ye. Îro şahî ye, benda wê şîne. Wesfê wê ne hêja ye. Heke hewe ji min yeqîn e, ko dojah ew bi xwe ye. Xwezi em ne buwana û me ew ne ditaya.

**35** Lo ev dinya mîna ye, Zivistana ko darê di ter û hişk û merhovê di çê û xirab yek awa ne. Û sibeha qiyametê mîna ye. Heyva nîsanê ko darê di ter û merhovê di çê wê xemlê xwe wergerin. Û fehm bike û qenc bizane, darê di hişk, merhovê di xerab wê ji agirê dojahê re bibin xwirde û nan.

**36** Lo qulingo! tu bi ser me gazî dikî û dikûdênî. Got: Lo bihna dojahê ji vê dinê dibihim û ez hawara xwe ji Xwedê re dişînim ko laşê min tê nemînê. Xwezi bi wî merhovê ko jê birevê û xêr û xêrata bikê û li pêşîya xwe bişîne.

**37** Lo qulingo, sergirdano! ko tu qewî hewar dikî û dilezênî. Got: lo ko ez direvim, ko dengê guregura agirê dojahê dibihim û dilê xwe pê dikewînim, ko ne xwezi bi cihê heramxwerê ko keda xeyran bi zilmê dixwin, ko

cihê di wan ezabekî dijwar e. Xwedê tu medî, kes nebînê.

**38** Lo qulinko, ez dibêjinî tu bi cihê xwe xayin î, her zivistan tu piştî xwe didî çîyan û berfan û bamişt û sîpana. Berê xwe didî deşt û berîya û sefayê dikî her awana û dîsa ko bû germ û havîn, xwe didî çiyayên bilind û honikayîyan û zozanan.

**39** Got: lo ez ne xayin im, lê dinê xayin e, û ez ji ber direvim û dilezînim, nahêlê li derekê biqerim, ko ez emrê xwe bi rahetî biqedînim. Ez her ser wan gazî dikim û dengê xwe hiltînim ko hon jê birevin, ji dinyayê, lê xayin e ko ez xayintîya wê dibînim.

**40** Lo qulingo, em nîzanin, tu bihayî an tu nivistî yî? Tu xwe bişidînî, û bi hewa xwe hilênî, lê tu qewî sist î. De em pîrsa dojahê ji te bikin, lê me dengê wê ji nêj ve bihistîye. Got: de ez saxlûxa wê qenc bidim hewe, belê jê birevin, weke mêrên margestî.

**41** Lo dojah alikî jê behrek agir e û kutrît û zift û qîr e, û bihneke dijwar jê têt, û reş û tarî û hawîr e, lê dikrê wê ne êxêrê bê, ko aliyek jê behrek serma ye, û ba û pîzruk û zemherir e.

**42** Lê felekê zalimê! ev çi dûmat e ko te bi serê me de aniye, ko ji dêl xweşiyê te dilê me ji xema û kesera dagirtîye. Wekê ji me dihat em xêrata bikin, te ne hiştiye, û niha ji tişt û malê di pir te em xîzan kirin, anîn parsekiyê.

**43** Lo qulingo, tu qewî bi hewa dikevi û çengên xwe dihejinî û berê xwe didî ezmana û tu erş û kursî dibîni, da em pîrsa bihuştê ji te bikin, tu Xwedê û mêran dihebîni, ko em hêciwan tu mizgînîya bihuştê ji me re bîni.

**44** Lo wesfê bihuştê miqate ye, û



bajarekî bê qeder mezin e, û bilind e, û bê sûr e, û jê difûrê û diherikê bihneke xweş û behrek nûr. Hin sipî ye û hin jî heşîn e, û hin kesk û suhr e. Lo behra me tê nebê, xwezî em ne buwana ko janeke mezin e, û derdekî kûr e.

45 Lo dikrê bihuştê ê xêrê bê, wesfê wê raserî me ye, tiştê ko ne çava ditine û ne guha bihistine û bi ser fikrê dila ne ketiye. Lo heke hewe ji min yeqîn e, mexelitin ko bihuşt dîne, barî teala ew bi xwe ye.

46 Lo bihuşt welatekî bê qeder fireh û wetenekî şêrîn e, û buhareke bêhed xweş e, û her daîm heşîn e. Da em dia ji barî teala re bikin ko me jê mehrûm nekê, lê dilê min ji guncha şikestiyê û bi kul û birîn e. Lê dogeh miqabil e, û me taqeta ezabê wê nîne.

47 Lo pa em çi bikin, ezman bilind e, û erd qewîn e, û em nizanin çi rayekê bikin bi guncha û bi va kula û bi va birîna. Û mirin hatiye û me mical bi rihê xwe nîne. Lê heke barî teala bi rehma xwe me eza nekê, heke na, me mical û mefer bi tu kesê di nîne.

48 Lo merovo, berî mirinê rayekê bike, û hilû rabe, lê barî teala adil e, ne rûmetî li ba wî heye, û ne mehaba. Mir û feqîr, xênî û xîzan li ba wî yek hesab e, û her yek, fihlên wî dike mîzana û cizayê wî didê-yê, heke sefa û rahetî ye, û heke cefa ye, û ezab e.

49 Lo merovo hilû rabe, dê em tobe bikin, lê talihine dijwar li ber me hene, û sisê ne, û li ber me veketî ne. Eseh emê bi ser wan kevin, daîm li derê rê ne. Yek jê mirin e, yek jî hizûr e, û êdî dogeh e. Ko jan û kul û derdê me jê ne, û bijan e. Lê pa em çi bikin ko qisas û cizayê me ne, û her sê hikmê Xwedê ne.

50 Lo qewlê kitêba em gêj kirin û

me guhdariya wan ne kiriye, ko dibêjin wê qiyamet bê, û wê mirî ji tirba rabin û bihuştî û dogehî.

51 Lo rabe em ji barî teala re tobe bikin, û bixwînin fatiheyê ko : yareb, tu bi iz û celalê di xwe kî ko heke em ne hêja ne bihuştê, tu me neki dogehê, girê hesretê besî me ye.

52 Lo ez weke qulingî hawara xwe dikim dinyayê û dengê xwe hiltînim weke kewê bestî li schrayê û ez bi hezarî dixwînim û heryek navê wi hiltînim û ji hezarî yek pey dengê min nayê. Yê ko ez ji te re dixwînim qewlê di pîr in. Ti beha pê nayê. Lê pa ez çi bikim ji derdê dinê û kulê di axiretê, hedana min nayê.

53 Lo çi behreke bixêr hatiye bi me re û ez gerandim van mêrgan û va guhera, û liber çeman û min jê çînî baqek rihan û gulçîçek ji civata nâdir re, û rehmet li dê û bavê ko qewl gotin û dê û bavê hazir û guhdêra.

Herwekî tete dîtin Lavij gotareke dînî ye. Tê de çelî axiret û dinya din dikin. Ev gotara ha îro jî di dêrên filehên Torê de bi qeydekî botanî tete gotin û strandin.

Ji Lavijê sê nivîşt, bi xeta siryanî, keti bûn destê min. Min ew her sê dan ber hev û ferqên wan ber pel û di bin stûnan de nişan kirin. Ew ferq mîna ko xwendevanên me dê bibînin ne tiştinen mihim û ne gelek in jî.

Di hejmara Hawarê a 26an de ezê bendeke xweser liser Lavijê bînivîsînim û bi çend awayan lê hûr bibim.

C. A. BEDIR-XAN.



# LAVIJ

1 — Qu'est-ce que cette voix, qu'est-ce ce tumulte? Et qu'est-ce ce tonnerre dans les cieus? C'est le son de la corne, de la trompe, et du clairon. Les uns disent que c'est la resurection, et les autres disent que c'est la fin du monde.

2 — Le son de la corne et de la trompe du jugement dernier est-il venu des cieus? La terre et le ciel ont tremblé, la voix a pénétré dans les oreilles des morts et l'esprit est entré dans les corps. La pluie fine de la resurection est tombé sur eux et ils ont poussé comme l'herbe, lorsque le printemps arrive sur elle.

3 — O homme! ignorant, tourne-toi vers le ciel, comme il est bleu. Et contemple les rotations de la sphère. Tous les astres sont diaprés. Et loue le maître de la générosité, celui qui les fit entrer et les a mis dans les airs. Oui, je les déplore, elles me désolent, la grâce et la beauté de ceux qui plus tard seront dans l'état où nous sommes tombés.

4 — On dit que c'est la fin du monde, la terre et le ciel se sont entrechoqué et les roues de la sphère sont disjointes et les astres ont tremblé et se sont apprêtés à tomber. Oui je les déplore, elles me désolent, les verdure, les basilics, les fleur-roses et les feuilles des marguerites et les fleurs d'iris. Celles qui ont jeté leur parure, et comme le poisson sur la terre sèche, sont dessechées et sont mortes.

5 — Lorsque le très Haut détruira le monde et lorsqu'il apportera le cahier de bien et du mal que j'ai fait et le lira devant la tere, l'univers et les anges, malheur à moi, qui serai sans refuge! Lorsqu'il me trainera à l'audience comment devrai-je lui répondre de mon âme, ô toi qui aime Dieu et les hommes. [1]

6 — Une haute voix est venue des cieus elle a dit : dépêchez-vous et donnez la bonne nouvelle aux morts, qu'ils se lèvent de leurs tombeaux et qu'ils se vêtent de leurs parures commes les fleurs diaprées. Oui le printemps de la resurectien est arrivé, suivez le. Il a fait de ses anges des messagers pour vous.

7 — Une voix innattendue est venue des

[1] C'est à dire pour l'amour de Dieu et des hommes.

cieus et nous n'avons pas fait attention. Elle a dit : ô morts levez-vous de vos tombeaux, c'est la resurection promise. Secouez de vous la terre et la poussière, et revêtez-vous de votre parure et de votre tenue de resurection et levez vos têtes comme la pousse de l'herbe verte.

8 — La voix de la trompe est venue des cieus et de la majesté la sphère a tremblé et les astres sont tombés. Voici sûrement le temps où les montagnes fonderont, où la terre et la mer s'applatiront, et où les annonciateurs de la fin du monde viendront; sept pieds se mettront à la place d'un seul pied [2]. Sûrement le juge a l'intention de tenir des audiences.

9 — Lorsque la resurection arrivera, le très Haut sera juge, Michel plaignant, et Gabriel témoin, et Israël accusateur, et le monde se présentera en audience, malheur à moi, ô pécheur, à cette heure là sans refuge! Quel sera alors mon état.

10 — J'envoie mon appel de seconrs à Dieu, que l'enfer soit ruiné et se détruise, que je ne le voie pas par mes yeux. Ne me suffisent-ils pas, la peine du monde et le chagrin de la mort que je constate toujours. Par la peur de l'enfer je cautérise mon cœur.

11 — Malheur soit à ma tête, lorsque avec colère il me trainera à l'audience et qu'il apportera le cahier de mes péchés, le lira devant l'assemblée et me livrera de main en main et m'enverra vers l'enfer. Oh si je n'avais pas existé, si je n'avais pas vu cette heure où l'on me fera descendre au souterrain de l'enfer.

12 — L'astre du matin s'est levé et se dépêche, il agite les mains et tes frappe l'une contre l'autre et il hausse la voix. Il a dit : homme! va, repens toi, les anges en colère sont à notre poursuite; à ceux qui ne sont pas repentis, qui n'ont pas fait de leur pouvoir des œuvres bonnes, ils leur prendront le foie.

13 — O homme! ne fait plus ce mal et ces péchés, cesse et assieds-toi. Le tumulte des cieus vient, ses portails se sont ouverts, et le très haut, lui même avec ses anges est descendu. Tous les morts se sont levés des

[2] Veut dire, il n'y aura pas assez de place sur la terre pour les ressucités.

tombeaux, et nous, nous sommes des pécheurs et nous ne nous sommes pas encore repentis. Certes ils sont en courroux contre nous.

14 — Les terres sont témoins, les cieux sont plaignants et le haut créateur est juge et ses anges sont demandeurs. Mais si lui même n'a pas de clémence envers nous et ne nous soustrait pas au supplice, nous n'avons nul refuge chez aucun autre.

15 — Qu'est-ce que je dois faire, je suis misérable, étourdi, visage-noir, pécheur. Que le nom de la mort ne soit pas de bonne augure, il m'a surpris tout d'un coup et ne m'a pas laissé me repentir.

16 — Mon âme gémit beaucoup avec douleur. Elle a dit : Que le monde n'ait pas existé ! ni cette affaire ! que je ne sois pas dans cet état, où la mort crie comme le faucon à la poursuite du canard.

17 — Mon âme souffre beaucoup et gémit de blessures, et de douleur les larmes tombent des yeux comme les gouttes de sang. Tout cela, c'est du chagrin de la mort et sur tout du supplice de l'enfer qui est toujours amertume, douleur, deuil et pleurs.

18 — Ah si j'étais un oiseau, de ceux qui volent devant le vent, et que je sois allé au bord de la grande mer et que je m'y sois caché, que j'aie sauvé ma personne des douleurs du monde et des péchés. Surtout j'ai peur de la mort et que dans un moment de distraction elle vienne me surprendre.

19 — Mets-toi debout pour que nous nous repentions. O maisons-ruinées ! levez vos têtes et réveillez-vous, le monde s'est entrechoqué et nous a entraîné vers les péchés, notre situation est mauvaise. Puisse-t-il arriver que nous n'ayons vu ce monde et n'ayons pas aperçu sa lumière. Car plus tard on nous amènera au procès et aux comptes.

20 — Maison-ruiné lève la tête ; et lève toi, du sommeil, le monde s'est entrechoqué. On dit que c'est la fin du monde et que l'époque de la résurrection est arrivée, allons repentir et nous préparer à l'autre monde. Mais nous les distraits, voilà que tout d'un coup la mort nous a pris notre vigueur.

21 — Mort, tu nous poursuis vraiment avec ardeur et avec jeunesse, tu es toujours à cheval et tu te précipites sur nous, tu ne nous laisses pas vieillir, jusqu'à ce que le haut créateur, patiemment, nous reprend son dépôt.

22 — O monde tu ne nous a pas laissés nous préparer à la mort. Tu nous a laissés libres sur la terre, tu nous a dit : amusez vous comme il vous semble bon, la mort est loin et ne vient pas maintenant, tu nous a trompé et la mort nous a pris, tu nous a pas laissés nous amuser suffisamment dans ce monde.

23 — O monde, au premier abord tu nous montres, l'aisance, le plaisir et l'agrément, et puis tu remplis nos cœurs de douleurs, de chagrin et d'amertume. Que la mention de la mort ne soit pas de bonne augure, elle est toujours à cheval et se précipite sur nous ; et nous avons abandonné toute chose et des biens abondants et nous avons retiré nos mains de nos âmes [3].

24 — O mort, tu étais toujours, pendant l'été et l'hiver notre guide, et tu as pris de nos mains le bien-aimé des cœurs, possesseur d'un cheval, d'une armure et d'une selle. Que ta mention ne soit pas de bonne augure, au lieu des belles parures et de couvre-chef fins tu as enroulé sur nos têtes des bandes vertes.

25 — O monde, tu ne nous a pas laissé nous amuser jusqu'à ce que nous soyons rassasiés, dans ce monde périssable. Tu nous a pris l'agha et tu nous a laissé les vieux, les aveugles, les anciens et les vieillards. Que ta mention ne soit pas de bonne augure, toi qui as enroulé nos têtes par le chagrin et la douleur avec des bandes noires et des châles. Mais que faire, nous ne pouvons rien sur toi, nous te confions à l'autorité du créateur.

26 — O maison-ruinés levez vos têtes, le monde nous a infecté. Cette mort des groupes et de la société d'entre nous n'a pas laissé même une seule personne, se vêtir de l'habit d'ermite et passer dans ce monde comme disparu. Oui je me plains et me désole qu'avec ces douleurs et ces chagrins nous irons tomber dans le tombeau.

27 — O monde tu as fait de moi un mauvais ermite, dès l'âge du lait tu me laissa aller au péché, du bas âge jusqu'à la vieillesse. Oui la mort est un hôte, elle a fait ma place dans les feux de l'enfer, parmi la tempête, la bourrasque et le vent.

28 — O monde tu m'a chargé des péchés et tu m'a éloigné des bonnes actions et je sais que la fin est repentir, douleur, deuil

[3] C'est à dire : quitté nos âmes.

et pleur. Ah si je ne me levais pas avec les morts, afin que je ne voie pas l'enfer, je ne peux pas supporter son supplice.

29 — O maison-ruinée, lève la tête et ouvre les yeux, et lève-toi du sommeil. La mort nous a infecté et nous a fait orphelins de mère et de père; et la sphère nous a laissé nus sous les pluies et les lumières des corps célestes.

30 — Que la destinée de la sphère ne soit pas de bonne augure, elle qui nous a laissé dépourvus et privés des choses et d'abondant biens et nous a réduits à ces pensées et à ces comptes.

31 — Ne vous dirigez pas vers ce monde, il est traître sans racine, et mensonger, il est tantôt amer, tantôt doux, tantôt illumination, tantôt deuil, tantôt sourire, tantôt pleurs. Certes si tu étais ma fiancée je t'aurais donnée à un autre, mais que puis-je faire, tu es ma mère, je n'ai pas de force contre toi [4].

32 — O monde, tu es traître et sans racine, tu m'as abandonné aux péchés sans contrôle. Certes si tu étais ma fiancée je t'aurais donnée à un autre, mais que puis-je faire, tu es ma mère je n'ai pas de force contre toi, tu as pouvoir sur moi.

33 — O monde c'eût été préférable que je n'aie pas existé et que je n'aie pas vu tes biens et tes gains. Tu m'as jeté au péché et tu m'as défendu d'apprendre les sept paroles du Dieu et des saints. Sûrement si tu étais ma fiancée, je t'aurais donné à un vieux, mais que puis-je faire, tu es ma mère je t'es confié à Dieu et aux hommes saints.

34 — O grue, tu t'enlèves à des altitudes élevés et tu vois le monde; quel cristal est-il? Elle a dit : Mais est-il nécessaire que vous demandiez la définition du monde, car il est à la vue des yeux. Aujourd'hui c'est illumination, mais c'est le deuil qui l'attend. Sa définition est sans valeur. Si vous avez confiance en moi, (je vous dis que) ceci est l'enfer même. Ah si nous n'exisitions pas et si nous ne l'avions pas vu.

35 — Oh oui ce monde est cristal, pendant l'hiver le bois vert comme le bois sec, les hommes bons et les hommes mauvais ont le même sort. Le matin de la resurrection aussi est

cristal. Au mois d'avril les bois verts et les hommes bons se revetiront de leurs parures. Comprends et sache bien que les bois secs et les hommes mauvais seront pris au feu de l'enfer comme aliment et pain.

36 — O grue! tu nous appelles et tu te précipites sur nous. Elle a dit : je sens l'odeur de l'enfer de ce monde et j'envoie mon appel de secours à Dieu, afin que mon cadavre ne reste pas dedans. J'envie cette homme qui lui échappera et fera des biens et de bontés et les enverra devant lui.

37 — O grue, ô tête vertigineuse! tu donnes l'alarme, et tu te hâtes. Elle a dit : si je fuis, c'est que je sens le bouillonnement du feu de l'enfer et avec lui je cautérise mon cœur. Je n'envie pas la place des mangeurs des choses illicites qui mangent l'œuvre des biens avec injustice et tyrannie, et que leur place soit un grand supplice. Mon Dieu ne donne pas ceci que personne ne le voie.

38 — O grue, je dis que tu es infidèle à ton poste. Chaque hiver tu tourne le dos à ces montagnes et à ces neiges, à ces places balayées par le vent et à ces amorcellements de neige, tu te diriges vers la plaine et les vallées et tu t'amuses chaque instant, et puis lorsque la chaleur commence et que l'été arrive, tu te diriges vers les hautes montagnes, vers les fraîcheurs et les plateaux.

39 — La grue : O non, je ne suis pas infidèle, c'est le monde qui est infidèle, je fuis devant lui et me dépêche, il ne me laisse pas m'installer quelque part et finir ma vie en repos. Toujours j'appelle et je hausse la voix pour que vous le fuiez, ce monde, oui, il est traître et je vois sa trahison.

40 — O grue, nous ne savons pas si tu es avertie ou si tu dors. Il faut que tu te reprennes et que tu pèsasse dans les airs. Mais tu t'es beaucoup relâché, alors nous t'interrogeons sur l'enfer, oui depuis longtemps nous avons écouté sa renommée. La grue : alors je vous donnerai bien satisfaction, fuiez le comme les homme mordus par le serpent.

41 — L'enfer d'une côté c'est une mer de feu, de soufre de goudron et du poix, et il vient de lui une audeur acre (aigu) et il est noir, ténébreux, et sans issue; que sa mention ne soit pas de bonne augure! et de l'autre côté il y a une mer de froid et de

[4] Je ne peux pas lutter contre toi.

vent, de tempête et de bourrasque.

42 — O monde cruel, qu'est-ce que ce malheur que tu nous fis surprendre par lui. Au lieu de délices tu as rempli nos cœurs de chagrins et de douleurs. Quand nous pouvions faire du bien, tu ne nous a pas laissés et maintenant tu nous a privés de toutes choses et de beaucoup de biens, tu nous a fait pauvres et nous a réduits à la mendicité.

— 43 O grue! tu t'enlèves en l'air et tu secoues tes ailes et tu te diriges vers les cieux et tu vois le trône et les chaires. Alors nous te questionnerons sur le paradis. Pour l'amour du Dieu et des hommes.

44 — La définition du paradis est fixe et difficile à présenter; c'est une ville sans mesure grande, haute, sans muraille, et de lui écume et coule une agréable odeur, et c'est une mer de lumière. En partie il est blanc et en partie il est vert, et aussi bleu et rouge. Si nous n'y avons pas notre part, ce serait préférable que nous n'ayons pas existé. Car c'est un grand mal et une profonde douleur.

45 — O que la mention du paradis soit de bonne augure, sa définition est au dessus de nous, c'est quelque chose que les yeux n'ont pas vu, et les oreilles n'ont pas écouté, et qui n'a point été inspiré à la raison du cœur. Si vous avez confiance en moi ne vous trompez pas, vous avez vu le paradis. Dieu c'est lui même!

46 — Le paradis est un pays d'une grandeur sans borne, et aussi un pays doux, un printemps sans limite, agréable et il est toujours vert. Prions le bon Dieu pour qu'il ne nous prive pas de lui. Mon cœur est brisé par des péchés et il est plein de plaies et de blessures. Oui l'enfer est en face et je n'ai pas la force de supporter son supplice.

— 47 Mais nous, que devons nous faire. Le ciel est haut et la terre est puissante et nous ne savons pas quel parti devons nous prendre avec les péchés et ces blessures, et la mort est venue, et nous, avec notre esprit nous n'avons pas de force. Que le bon Dieu par sa clémence ne nous torture pas, sinon nous n'avons chez nul autre d'appui et de refuge.

— 48 O homme! avant la mort prend un parti, et lève toi debout. Dieu est juste, chez lui il n'y a ni parti pris ni considération. Le prince et l'indigent, le riche et le pauvre

sont pour lui du même niveau. Pour chacun il met les actes à la balance et lui donne ce qu'il mérite, soit plaisir et repos, soit tourment et torture.

49 — O homme lève toi debout, pour que nous nous repentions. Devant nous se trouvent des pièges forts, ils sont trois et ils sont exposés devant nous. Certes nous y tomberons. L'un c'est la mort, l'un la compuration et l'autre c'est l'enfer. Notre souffrance, notre douleur et notre amertume viennent de là et c'est douloureux. Mais que devons nous faire ils sont notre talion et notre châtiment. Et tous les trois sont la sentence de Dieu.

50 — Les paroles des livres nous ont tourmentés et nous ne les avons pas écoutés. On dit que la resurrection arrivera et les morts se leveront des tombeaux, ceux du paradis et ceux de l'enfer.

51 — O lève toi faisons notre repentir au haut créateur et lisons des fatiha [4] et disons: ô Dieu agis selon ta majesté et si même nous ne sommes pas digne du paradis ne nous met pas en enfer, la crête [5] de séparation nous suffit.

52 — Je fais comme la grue j'envoie mon appel de secours au monde et je lève ma voix comme la perdrix liée [6] et je chante et je cite le nom de chacun séparément et personne ne suit ma voix. Ceux que je te lie sont les paroles des «pir» [7]. On ne peut en estimer la valeur. Que dois-je faire? de la douleur du monde et de la souffrance de l'autre monde je n'ai pas de repos.

53 — O quelle mer de bonne augure nous est venue et elle me promena parmi ces prairies et ces ravins et devant les rivières.

[4] Sourate d'ouverture du Coran.

[5] Ce mot est employé comme une image faisant supposer une montagne entre le paradis et l'homme.

[6] Au Kurdistan on fait la chasse de la perdrix avec des noeuds coulants de crin de queue du cheval. Ces noeuds sont supportés par de petits pieux plantés en terre. Les chasseurs dressent des perdrix spéciales pour cette chasse. Ces perdrix sont de deux espèces. L'une en chantant attire les perdrix de la contrée; elle est placée sur un poteau et enfermée dans une cage. On l'appelle «djélab». L'autre liée par une de ses pattes se trouve au milieu des noeuds coulants. Elle s'appelle «besti» qui veut dire liée. Les perdrix invitées par le chant de la «djélab» arrivent en quantité et se mettent au dessous du poteau. Alors ils aperçoivent la «besti» qui par ses gestes les incite à se battre. Elles se précipitent sur la perdrix liée. Au cours de la lutte leurs pattes se prennent dans les noeuds. L'expression de «besti» est propre à la contrée de Botan. Ailleurs elle est appelée «ribat». Djélab veut dire celle qui attire.

[7] Le mot «pir» qui signifie vieux, au sens figuré veut dire toute personne qui a atteint le sommet de son métier ou de sa doctrine, tel un apôtre.

# LE BEAU DE LA STEPPE

(suite)

Ali Abdourazzaq; arrivé chez lui, prépara avec Abdulkerim une nouvelle attaque et avec le gros de son armée il se porta au Zirgan des kikan et campa à «Girè-Mîran». Ses forces commencent à brûler les villages des kurdes, à les piller et les dévaster. A ce moment là Ibrahim pacha à la tête de ses nomades se trouvait au sud de Deîr-Zor. Mis au courant de la nouvelle agression de Ali Abdourazzaq; il mobilisa ses hommes, et par une marche forcée les porta en quatre jours à «Serè-Kani» où il campa. Il convoqua les différents chefs des Milan. Ils tinrent conseil et choisirent mille cavaliers d'élites et le second jour ils attaquèrent Ali-Abdourazzaq et Mohamed-Abdulkerim et leurs alliés. Les chammars subirent une nouvelle défaite.

Ali-Abdourazzaq après cette défaite fit teindre un chameau en noir et l'envoya à son oncle «Faris» qui se trouvait en Iraq, en lui faisant dire que Ibrahim pacha avait ravi leur honneur et que dans la haute Djézireh le prestige des chammars était menacé. «Faris» mobilisa ses forces et vint camper sur le territoire de Nissibine. Il rassembla tous les vassaux des chammars: Ahmed-Youssif des Achitan, Ibrahim agha des Daqoriyan, Abdourahman chef des Kikan, des Qaragutchi Khalil bey et Drei, le cheïh des Tay, Mouslit pacha chef des Djibour et les autres chefs et tribus comme Beguara et Charabiya etc. . . Toute cette constellation de tribus kurdes et arabes marcha sur Ibrahim pacha. Comme première étape ils campèrent auprès du village de Husseynè Qandjo à «Hilèbi». Husseynè Kandjo gardant la défensive,

---

J'ai ramassé là un bouquet de basilic et de fleur-rose pour la société distinguée. Que la clémence de Dieu soit pour les mères et les pères de ceux qui ont dit les paroles et pour les mères et les pères des présents et des auditeurs.

Le «Lavij» tel qu'on le voit est un préche qui s'adresse aux adeptes de toutes les confessions sans faire aucune distinction de religion, excepté le mot fatiha que l'on trouve dans le (51) ème verset.

Nous avons transcrit le présent «Lavij» de trois différents manuscrits en caractères assyriens, et nous avons noté les toutes petites différences des manuscrits en marge du texte. Dans notre prochain numéro nous donnerons quelques notices historiques et légendaires du Lavij. Ainsi que nous essaierons de faire une analyse linguistique de cette assez ancienne prose kurde qui a subit l'influence de différents parlars et un peu l'influence de la langue écrite.

D. A. BEDIR-KHAN

opposa une résistance opiniâtre. Faris pour ne pas perdre du temps, ni subir des pertes préféra laisser Husseynè Qandjo tranquille et marcha vers le nord; il pénétra dans le territoire de Ibrahim pacha. Le gros de l'armée de Faris bivouaqua à (Milani), (Yaban) et (Mozikè-Şerqîyan). Le second jour les forces de Faris attaquèrent Ibrahim pacha. Ibrahim pacha après avoir repoussé l'attaque fit une contre-attaque et mit de nouveau en déroute ses adversaires.

C'est ainsi que conclut Ehmed : «Le résultat de cette guerre ne fut pas plus brillante que les autres. Les chammars ne firent que d'amener du butin à Ibrahim pacha. Moi qui avait pris part à cette guerre j'ai perdu mon manteau de fourrure, mon aba et mon sac en tapisserie. Après cette défaite je suis venu chez moi. Eumer bey avait envoyé quelqu'un pour me chercher. Je l'ai suivi et je me suis rendu chez Eumer bey sans m'être acheté du cheval.

Après quelques années j'ai quitté Eumer bey et je me suis rendu à Mardin chez Abdulkadir pacha. Je l'ai servi pendant vingt ans. Il me maria. J'ai passé une dizaine d'années à Diyarbekir.

Revenons à la lutte des chammars et de Ibrahim pacha. Hadî petit fils de Ferhan pacha, cheïkh des chammars était venu camper avec ses alliés dans le territoire de Nissibine. Hadî avait bien organisé ses forces et se préparait à porter un coup décisif à Ibrahim pacha et à l'éloigner pour toujours de la haute Djézireh. De son côté Ibrahim pacha s'organisa également. Tout les kurdes, même les vassaux des chammars, de même que les plus acharnés rivaux des Milan comme les Kikan se mirent du côté de Ibrahim pacha. Les kurdes campaient à Girè-Faris. Le combat fut acharné et décisif, les arabes furent battus, et ils se replièrent vers l'Iraq. Les kurdes les poursuivaient. Hadî voyant le danger fit inonder la plaine par les eaux du Djaghdjagh et ce n'est ainsi qu'ils purent échapper aux kurdes. Comme vous le savez d'ailleurs depuis cinq années je me trouve en Syrie.»

Le récit de Ehmed Ferman prend fin ici. Nous devons ajouter que Ehmed chante toujours très bien la chanson qui lui a valu sa renommée, le «Delalè Beriyè». On trouvera difficilement quelqu'un pour le concurrencer en chantant cette chanson.

Nous reproduisons ci dessous un passage d'une chanson de l'époque qui retrace les péripéties de la lutte entre Ibrahim pacha et les chammars et qui fait allusion à la victoire du pacha.

Dilè min rebenè, dileki li din e  
Beriya Mèrdinè, berike rengin e  
Geli peyè kurmanca kosk û melrisa biedilinin  
Geli segmana leng û bengè suwara bişidinin  
Qereberbangè sibè şênika li ser konè şexè  
[şemera dalinin

Bi sè şopa wan dişkêninin  
Hèya Kepezè Serè Kaniyè, Zirgana Kika  
[ser pey wan datinin

Talèn û yextirme vedigerinin  
Zincirè delûla diqetinin

Guleyê segmana di singê xwe da dihelinin  
Emş û Emêşa, jinê şêxê şemera, qizê  
[şêxê teya

Di wara da hésir distinin  
Hêya nav û dengê Brahîm paşa li  
[dinyayê hebê

Mêrê şemerî quleka mêrê kurmanca  
[narevinin

Mon cour, malheureux, est un coeur affolé  
La steppe de Mardine est une stppe colorée  
O guerriers kurdes, arrangez les emplacements  
[et les tranchées  
O fantassins, ajustez les sangles des cheveux  
Dans le crépuscule du matin ils dsrignent des salves de  
[mousqueteries sur la tente du cheïkh des Chammars  
Ils les enfoncent de trois cotés  
Juspu'à la crête be Serê-Kani, juspu'à la Zirgan  
[des Kikan, ils les poursuivent  
Ils s'emparent du butin, et de trophés de guerre  
Ils cassent les chaines des chameaux  
Ils fondent les balles des guerriers sur leurs potrines  
Les amches et ameyches, femmes du cheïkh des  
[chammars, filles du cheïkh des Tay  
Ils les font prisonnières dans les emplacements  
[des campement

Ibrahîm precha le héros de ces guerres de tribus  
mourût peu après la constitution ottomane dans  
des conditions assez tragiques; et il est enterré en  
territoire syrienne.

De la grammaire kurde [1]

## DÉCLINAISON DE L'ARTICLE

(suite)

En conséquence nous ne pourrons pas  
placer dans notre grammaire un article partitif  
comme celui du français. D'ailleurs nous al-  
lons voir que ce dernier disparaîtra dans les  
temps passés des verbes transitifs, en même  
temps que la déclinaison, qui n'existe que  
simultanément, nous pouvons donc dire que  
le sens partitif en kurde ne s'exprime que  
de la façon précédemment citée, et ces dé-  
sinences sont plutôt l'effet des déclinaisons.

Au sujet de la déclinaison de l'article  
indéfini nous devons noter que la déclinaison  
du masculin n'est jamais et nulle part  
négligé comme est celle du substantif. Donc  
au lieu de dire (ez hespeki dibînim) on ne  
pourra jamais dire (ez hespek dibînim).

## DÉCLINAISON DU PRONOM

Les pronoms, qui forment une partie vari-  
able du discours se déclinent également.  
Mais dans la langue kurde on trouve des  
pronoms sous deux formes distinctes. On  
peut classer ces pronoms en deux catégo-

ries, pronoms-sujet et pronoms-complément,  
c'est à dire à l'état de régime.

Evidement les pronoms de la seconde  
catégorie sont les formes déclinaison des pro-  
noms de la première catégorie, et comme  
tels ces pronoms ont des formes propres  
de déclinaison.

FORME SUTJET	FORME COMPLEMENT
Je	Ez Min
Tu	Tu Te
Il, elle	Ew Wî, wê
Nous	Em Me
Vous	Hon We
Ils, elles	Ew Wan
Qui, que	Kî Kê
Quoi	Çi Çî

Donnos quelques exemples :

Ez Memî dibînim	Ez wî dibînim
Je vois Mem	Je le vois
Ez Ziné dibînim	Ez wê dibînim
Je vois Zin	Je la vois
Ez hespan dibînim	Ez wan dibînim
Je vois les chevaux	Je les vois
Mem Ziné dibîne	Kî kê dibîne
Mem voit Zin	Qui voi-il qui
	(qui voi quelqu'un et
	quelle personnn voit-il)
Kitêb li ser masê ye	Çi li ser çî ye
Le livre est sur la table	Qu'est ce qui est sur quoi
Min Mem dît	Min ew dît
J'ai vu Mem	Je l'ai vu
Min Zin dît	Min ew dît
J'ai vu Zin	Je l'ai vue
Min hesp dîtin	Min ew dîtin
J'ai vu les chevaux	Je les ai vus
Memî Zin dît	Kê kî dît
Mem a vu Zin	Qui a vu qui
Baranê erd kelaşt	Kê kî kelaşt
La pluie a fondu la terre	Qui a fondu quoi

De même :

Hespê kê	Dûmahika çî
Le cheval de qui	La suite de quoi
Ez te û wî dibînim	
Je (vous) vois, toi et lui	

Nous avons dit que dans les temps passés  
du verbe transitifs ces pronoms s'intervetis-  
sent, et le pronom-complément passe à la  
place du pronom-sujet, et vice versa.

Dans ce cas, le complément ne se décline  
plus et au contraire c'est le sujet logique  
qui se décline; le verbe s'accorde avec le  
complément qui en vérité est le pronom-sujet.  
C'est un phénomène propre à la langue kurde  
et qui est la base de l'organisation des verbes  
kurdes. Dans nos articles traitant des pro-  
noms et des verbes nous assaierons de déter-  
miner les motifs de la formation de ce méca-  
nisme de conjuganson, qui pour l'étranger est  
assez bizarre et difficile à assimiler. (à suivre)

[1] Voir les articles précédents traitant de la grammaire kurde  
dans les numéros du Hawar : 16, 17, 18.





Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Ali Bedir-Xan  
Şam — Sûriye  
Directeur Propriétaire : Êmir Djeladet Aali Bêdir-Khan  
Damas — Syrie

SAL 4  
HEJMAR 26  
—  
YEKŞEMB  
18 TEBAX 1935

# HAWAR

ANNÉE 4  
NUMÉRO 26  
—  
DIMANCHE  
18 AOÛT 1935

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar: Mîr Celadet Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye.  
Directeur Propriétaire: Êmir Djêladet Aalî Bêdir-Khan. Damas—Syrie.

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Mame-Yare	Tewfiq Wehbi
Were dotman	C. A. Bedir-Xan
Ehmedê Zeydan	Xwediyê Hawarê
Xorto	Hawar
Koçera mîran	Dr. K. A. Bedir-Xan
Zerdeşt	Dr. K. A. Bedir-Xan
Welatê min	Cegerxwîn
Zozanên Bêli	Lawût
Çarînen Xeyam	
Xanim	Melayê Cizerî
Dil ji min bir	Melayê Cizerî

### BIRÊ FRENSIZÎ

Le soleil noir	Dr. K. A. Bêdir-Khan
La grammaire kurde	D. A. Bêdir-Khan



ÇAPXANA TEREQÎ  
ŞAM—1935



SAL 4  
HEJMAR 26

YEKŞEMB  
18 TEBAX 1935

# HAWAR

ANNÉE 4  
NUMÉRO 26

DIMANCHE  
18 AOÛT 1935

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## MAME-YARE

Le Girdî-Gulan bîmnêjin, ba le wê be tenya bîm, çünke namewê gorîşim le nîzik gorî eşikerekani Koye we ebêl. MAME-YARE

Le lay rojhelati silêmani we nîzik be şar girdêki qûtî-rût we liwanî heye ke be tenya we nextê dîr le girdekanî tir wek palewanêki be fiz û hêz, lûtî be çeşnî berz kirdiwetewe bo asman ke herwekû biyewêt bew nîzmi xoye we, şan le şani «Kurekajaw» we «Pî-remegrûn» bidat.

Em girde be fîze, gileyiyêki eger le bextî xoy bu bê, ewîş le layeni naweke yewe ye; heta nîzîki sî û hewt sal le mew pêş pê eyan wîl «Girdê-Gulan» belam lew salane de, Xwe be awati xoy geyan, we de nawêk şad bû ke her çoni pê wey binazî boy rewa ye; lew sawe pê elên Girdê-Mame-Yare.

Pîr Mame-Yare ke êsta le teple-serî ew girdewe seyri kirdeweman eka, be lay zor le lawekani emrowe, bole kesêki dîrin. Renge hindektan basiştan ne bîsti be. Çünke jiyani emîş wekû hî hemû gewreyeki kemani gum buwe. Belam min bextiyarane be çawpêkew-tîni şad bûm.

Mame-Yare piyawêki barikeley kelegel bû. Du çawî tij we rûyêki çirçî hebû. Be rişî bulbulî çermig we simêli ber qirtênrawyewe, dêmenêki seyri hebû, rûxoş we rend bû, le cil û berga entîkexaneyêki giyandar bû.

Le çiraxan we rojanî hebni de zirê we kulawî zêri eposî, cûtê qerebinay zilî be piştîya şor ekerdiwe, dû demançey ekird be berya, şirêki ebest be

piştîyewerimêki drêji egird be destîye we, we bem çeşne le pêş miteserif we memûran we xelqe we eroyîşt.

Mame-Yare be taybetî xoşewîstî hemû minalêk bû, we hemû minalêkiş layî ew xoşewîst bû, le şewî çiraxana ta ew ne hataye we demançeyêki ne teqanaye zemawen desî pê ne ekird. Le ber ewe minalan be çwar çaw çawerewani hatini debûyin; we her ke prişkî barûl le lûley demançey ewewe dereçû îtir agirbazi despê ekra.

Le birim dêt her wextî ême minalan ke pey egeyîştîni be çing çirewşekîri be sera dabêş ekirdî, we hemîşe her dû girfani pîr bû lew çeşne ştane. Çak le birim dêt desîşi çênay be sere we pey ewitîni; «Minaline! hîwam her be êwe ye».

Ewsa ke le sîrey minalîmana, ême Mameyareman tenya le ber şarayîni, bergî entîke we çerey xoş ewîst, belam ke gewre bûyin we le jiyîni geyîştîni em pîre ewamêre le lay xoşewîstîrewewe gewretîr bû.

Pîr-Mameyare nawî «Yar-Ehmed» kurî Xidir begî, Homer aşayî xelqî «Dewên-nerêne» bû ke lay «Şarbajêr». Homer aşa bapîri yekiyek bû le dwanza swarey Meriwan, zor xoşewîst buwe lay Ewrehman paşayî bebe, ewende xoşewîst buwe le lay ke paşa ew sîrey le Taran, Feth-Eli-Şah pêşkeşî kirdî bû, da bûye.

Wekû têgeyîştûyîni Yar-Ehmed le salî 1804 da le «Dewên-nerêne» le dayik buwe, ke pê ega le ser rê we şoni baw û bapîri debê be nokerî pa-

şayi bebe, le 1840 leşkerî bebe da ekrê be zabiti topçı we heta erşeky «Ko» ye lem firmane da emênêwe. 1847 da meyanî Ehmed paşayi bebe we Dewletî Osmani têk eçe. Dewletî Osmani le jêr fermani serdar Necib paşa da leşkirêk crazênêwe we eynêrêt bo ser Ehmed paşa. Ehmed paşas leşkirî xoy deng eda we eçêt bo beramberî her dû leşkir le rojaway Ko ye beramber be yek ewestî.

Wext mangî Gulan ebê, baregayî Ehmed paşa le lay girdî «Rizetû» helêda, leşkirî kurd wereyan emende be hêz huwe ke le şikani tirkakan hemû dilniya bûn, belam daxî be cergim bextî reşî kurd lêreşa ney hêna bû.

Ewarey pêncşemû ke duwayî mang ebê, serbaz we mifirdî daway mûçe eken, yekê le wezîrekan be paşa elê: [Tûle heta birsi bêt çaktir raw êkat]. Paşa emey be göy da eçê we, ew roje mûçe nadat. Em qiseye her göy leşkireke ekewêwe, le serêkewe wernegirtinî mûçe we le serî kîtirowe bilhaw bûnewey qiseyekî wa sûk, we cige le manêş çawerawî hendê ke gwaya, şer kirdin legel leşkirî xelife pêçewaneyî dîn we birwaye bûn be mayey serpeçê leşkir, we le encama hemû qise eken be yek ke ew şewe bilawey lê biken, we teqey tifengyêk eken be nîşaney erş kirdin.

Birînar aşay binbaşî şewê be wey zani, zû ray kird bo çadirî paşa ke xerberî bidatê.

Her lew kate da teqey tifengyêk [1] dêt, dest be cê leşkir dest eka be bilaw kirdin. Ehmed paşayi bedbext ke eme ebînê suwar ebê we legel çend noke-rika serî xoy helegre.

Bem renga duwa hikimdarî bebe le wilatî Mad û Arî dereçê.

[1] Wa be nawbang e, em tifenge kes ney teqandîwe. Ew şewe reşeba huwe, tifengiyêkî pir be xêweteke helwarawe kewlûte xwarewe we teqîwe.

Leşkerî tirk lem bilaweyê agadar nabîn, bo sibeynê dêne pêşewe bo şer. Belam hiç beranberiyek nabînin we lê egen ke kesyan le berambera nemawe. İtir be serbestî pêş ekewin. Belam kul û pir topxaney Ehmed paşa des eka be gule barandin be seryana, eyan peşokênê. Serdarî tirk têega ke le hendê topçı bew lawe kesê tir ne mawe, ferman eda ke biyangirin. Leşkireke çwar dewrî Yar-Ehmedî topçı eda we be dil girtiyanin.

Necib paşa em azayîye ke Yare niwandi bûn zor pey xoş ebê, bangî ekate layî xoy we ew guftugoyaneyan ebê:

Necib paşa — Leşkerî paşatan hemû bilawey kird to boç be tenya beramberî kirt?

Yare — Min fermanber im, topxane be min sipêrawe, fermani şerim pê dirabû, karî xom be cê hêna

Necib paşa — Femandereket serî xoy helgirt, to boç destit le şer helnegirt?

Yare — Wekû witim fermani şerim wergirti bû, belam le paş eme fermani şernekirdinim wernegirt

Le ser em qise lawçakaneye Necib paşa pitir Mame-Yare eçê be dila we delê: «Bo em lawçakiyet emewêt padaştêkit bidimewe, çit ewê bilê

MameYare — Xwe paşay xom bihêle hiçim nawêt

Necib p. — Paşayi xot ne ma royist, îtir wilateketan kewte jêr destî Dewletî Osnaniye we, dilwistit çi ye bilê

Yare — Le paş eme, jiyanim nawêt ta malî dinyam bo yêt

Necib paşa be çawekî aferînkari we dostiyewe peya rwanî we gutî: çak e.

Belam her ew roje serdar pê zani ke Yare dèyêkî be berat be destê we ye, be fermani beratekey bo taze kirdiwe, dèyekê nawî «Kanî-Dirkeysegan» bû ke êsta be dest Ehmed aşai Gosaley xizmî we yêti.

# WERE DOTMAM

Were dotmam, awa şetê me şebet e, Hey dotmam, hey dotmam  
Pêla navê li hev dikete Gul û gulçêçeka nava koman  
Hevîniya xelk û alem ji heyamê pê- Heçî derdê dotmamê ne dîne  
[xembera adet bi Bira ji min mekin gazînd û  
Ya min û ya dotma min li Cizira Bo- [Roman  
[ta, biye qebahet e

— Ji Haco axa re —

Dotmam welê ye, heta mirov xwe nas dikit mirov emrê xwe xelas dikit.

Ez pir bûme. Di derxika canê min de çil Buhar bişkivine. Qurma bedena min çil Zivistan ditine. Bi sedan ba û bahosan ew hejandine, bê hejmar berf û baran tê re çûne.

Herwekî dibêjin ciwani bizaniya piri bikariya. Lê pesn ji Xwedê re ko hej ewçend ne pir im ko nikarim.

Wekê ez ji ciwan bûm, simbêl hej nû avêti bûn ser levên min, dilê min bi hevîniya delalan hildavêt, hon ne yek, ne dudo, ne deh, ne bist bûn. Kej û gewr, esmer û genimi, bejnîbilind û navîn, kinên we ji hebûn.

Hon hemî ji min, ji me re bûn. Me kijan bixwesta, ne ewê, ne mamên me, ne digotî nû. Lê min, me hemîyan nîzani bûn. Çavên me bi we, bi bedewiya can û giyanê we ne diket.

Me dev ji we berda bûn. Yekî biyani dihat, hon dixwestin. Me ji xwe re ne fikir namûs. Hon dibirin. Hon bêqedr dikirin. Di rêzika dinyayê de hon tayih dibûn. Ev ne sûcê we, lê yê me bû.

Hon di gulistana mala me de gul û bişkojin bûn. Başvan û dîdevanên we em bûn. Bihua we a xweş, rengê we ê geş û birewş tu dibêji qey ne ji me re bûn. Em pê ne dihesiyan. Me ew ne diditin.

Yek dihat, destê xwe drêji we dikir, hon diçinîn, dibirin. Pêde welê bû. Hon, gulên gulistana me dihatin çinîn, me guh ne dida, em pê bendewar ne dibûn.

Rojekê, me hew dit, gulistan bê gul, daristan bê bilbil maye.

Em di himbêza jinên biyani, hon di bin çengê mîrên nenas de.

Bi vi awayî me xwerûtiya tovê mala

Ewî êsta lew gore tarîk we lenya-yey (Girdî-Gulan) da ehesêlwe we girdeke be nawyewe nawenrawe, em milelperwere gewreyeyeke 37 sala be daxewe çawerewani çejnî kurd êkat.

TEWFÎQ WEHBÎ

xwe, tovrindiya malbata Azizan wînda dikir.

We zaro dianîn, li me, li xwalên xwe dihatin. Merd, ewamêr, xweyrûmet. Ji bavên xwe re namûs dikirin.

Zarowên me li xwalên xwe dihatin. Xwalên wan kurên kê? Ji kijan ra û nijadi? Ji kijan mal û malbatê?

Wan navên me hildigirtin. Yên we ko ji zikê mala me derdiketî li ser dara bavê xwe şin dibûn.

Herê dotmam, keçmama çeleng, tu çûyi, hon çûn. Em di destê jinên biyani de, hon di bin rikanê mîrên nenas de.

Zarowên we xwarziyên me ne. Lê ne xwarzînen adeti. Li şer xwal û xwarzi. Lê ne xwarziyên me. Ji ber ko ne ji nijadê me ne, xerîbî wî nijadi ne. Carin hene, neyarê wî nijadê pak in ji.

Belê li şer xwal û xwarzi. Xwal û xwarzi li rex hev, berê wan li armancekê şer dikin. Xwarziyên me li me radibin. Berê wan li berê me ye. Em armanca wan, ew armancên me ne. Heçko em ji hev re polik in. Bi destên hev, di destên hev de dimirin.

Dotmama delal, ma ne heyf e, xwina zikê te bi xencera min bête rêtin. Ma ne mixabin e, kekên te bi berikên berê zikê te bikevin. . . .

No! no! dotmam, heyraniya pismam, êdi bes e, hew bibe jina xelkê, bes bibe dêya nekurdnijad, vegere were himbêza pismamê xwe, paxila kurmamê xwe.

«Vegere» ev ne gotîneke rast e. Em nikarin ji te re bibêjin «vegere». Ji ber ko tu ne çûyi, me tu rêkiri. Me bi destên xwe tu hinartî mala xelkê.

Himbêza xwe veke ez ji te re tîm. Min himbêz bike. Min wek mîr, pismam û her tiştê xwe maço bike.

Dotmam, min ji te re got ez pir bûme. Lê piriye ez hişyar kirim.

Buhar ciwani ye, Zivistan piri. Zivistan pişti Buharê têt. Di Zivistanê de Buharinen veşarti hene.

Herê dotmam were, xwe berde himbêza pismamê xwe. Ezê ji te re, ji Zivistana xwe a sar Buhareke germ çêkim.

Were dotmam, heyraniya pismam were, xwe di gerrîniya dilê min ê ciwan û ciwaniya min a kevn de bigerrîne.

Were dotmam were, ez stûna heyina te a stîwar im, tu ji bibe rewşa jiyîna min a Rewşen.

Şam: 18 Îlon 1934

C. A. BEDİR-XAN

## WELATÊ MIN

Welatê min tu î bûka cihanê,  
Hemi bağ û bihuşt û mêrg û kani.  
Şepal û şeng û şox û naz û riud î,  
Gelek sêrin û gewr û pir ciwan î.  
Serî taca Selahedînê kurdi  
Enî roj e, di bîrea asimani.  
Du birhên te kevanê Ristemê Zal  
Du zilfên te ji tirên qehremani.  
Du çavên te wekî deryayî Hirmiz.  
Kepû elmas e, karê Mûş û Wanê,  
Du lêvên te kitêba Hacı Qadir,  
Zimanê te ji benda Şêxê Xani.  
Rûyê te agirê Zerdest û Mezdik.  
Ji te ronik şeraba kamirani,  
Çena te gohê Cûd û Şax û Hevlêr,  
Qirik eywana taqa xusrewani.  
Di singa te kitêba Zendawesta,  
Memik fêrfûr e, tê de neqşê Manî.  
Du destên te tixûbên tirk û qehtan,  
Hero ceng e, bi tirên zerweşani  
Ji singa te bi jêr de gohê Laleş  
Ziyaretgah e bo me her zemani,  
Bi nişan û bi nan û xwinrijandin,  
Me dest girt û qelen da û, tu ani.  
Ser û pê, zend û bazin tev bihinc,  
Hemi sor in ji rengê zehferani.  
Bi te em şa ne bûn, ev bû dused sal,  
Ji me dengê tifiugan çûye bani.  
Bira û bav û ap û pismam,  
Li ser te hevdi kuştin pehlewani.  
Ji lewra ta bi zazan tev bi xencer,  
Dihalîn hev li meydanê, berani.  
Bi talan û bi kuştin hem bi suhtin,  
Me konê şer li ser singa te dani.  
Emir û begler û paşan û ağan,  
Kirin wêran sera û bire û xani.  
Li aliki te deng û ceng û halan,  
Li aliki sedayê xewse sani.  
Hemû bûne mirid û şêx û sofî,  
Bihuştî ne, çî kin nav û nişan î.  
Li axur radizin, lê şêx diçî jor,  
Berî nivro ji bani lêt girani.  
Ser û pa tev dikî gulav û enber,  
Dibê nûr e, kero ma tu çî zani?  
Bi van xapan dixwarin xwarinên xweş,  
Wekî şêx û melayên vi zemani.  
Di êşên me hebûn dijwar û xedar,  
Xezanî yek ewa di her nezani.  
Weke sêr û pilingan em diçin hev,  
Ji meydanê rovi penir hilani.  
Me ew rojên ciwanî tev bi der dan,  
Bi ziwari û belengazi û şivani.

## EHMEDÊ ZEYDAN

Diwana mir de rûniştî bûn, êvarê. Mir  
go, hey zilamê selfeke mi bêjê û serê mi.  
têşilhê, go pê rahet bibê ezê enteriki lêkim.

Ehmedê Zeydan, ji eivatê, go, mirê mi ezê  
selfeke te bêjim.

— Mir goti-yê de bêje

— Mirê mi, jinke mi hebû, gelekî fêber  
dilê mi eziz bû, mi niv saetê ne diyana he-  
dana mi ne dihat. Rokê, ez hatim mal go pi-  
reka mi zik û pişt diqulibi. Mi go, te çî mane  
ye, çî l'te qewimiye?

— Wele filankes ez bêhal im,

— Labid dilê te diçê çî, ji tehlîni, ji tirşnî?

— Wele dilê mi diçê goştê pezkovi

Pa wextê wilo got, ez Ehmedê Zeydan  
im, wilo jina mi fêber dilê mi eziz, mi ra-  
hiştê tifenga xwe û nû rê girt, ez çûme nêçirê.  
Li vi diyari, li vê newalê, mi di kovi, ez li  
ber rûniştim û mi tifiing avêtiyê, mi li bin  
çengê wi da. Mi quliband, mi xencer kişand  
û ez bezime ser. Mi serê wi jêkir, mi eyar kir  
goştê wi hûr hûr kir, mi kire eyêr de, avête  
milê xwe û ez hatim.

Li mi bû şev. Şkeftê kete ber min. Me-  
rebê ez tê de beyitim, sê çar qurm ji xwe re  
agir kir, û ez li ber êgir rûniştim. Mi goştin  
avête ser perenga, ji xwe re biraşt, û qelina  
xwe dagirt. Mi di carkê devê şkeftê bû reş.  
Go mi halo meyizand va dehbek bi ser  
mi de hat. Ya sitar nestecirûbilah. Kezebê  
dilê mi jê qelîha. Ez ji ber rabûme ser xwe,  
mi cih dayê, wêna ne hate ser cihê min, pêş-  
niqabili mi rûnişt. Mi qelin da dest, qelina  
mi ne girt. Mi slav kiriyê, slava mi neveda.  
Mi goştê braştî f'ser nên dani, mi dayê da, ji  
dest mi ne girt, û ma pêşniqabili mi rûniştî.

Şev kete nişev, ne ez jê wêrim razim, ne  
ew dirazihê. Heta carekê kete nêziki sibê,  
mi di carekê hema dehbeyê me xumiha, ra-  
ziha. Mi kesaxeyê xwe ji xwe kir, mi girtê  
ser goştê kovi, û mi tifiinga xwe, seyê wê, bi  
têzekê firikand û mi berik kire ser, û kelîm  
paşiya şkeftê. Ez wilo mam û çavê mi ma lê,  
mi di carekê rabû û rûnişt. Li vi milê

---

Herê bûkê pepûkê jar û mest î,

Li ser singa te zava man biyani.

Te reş daye serê xwe her li ser me,

Li te rokê dibê piroz kitani.

Cegerxwin e kurê te her dinali,

Ji ber jana xezanî û nezani.

CEGERXWÎN

xwe meyizand û li wi milê xwe meyizand, ez ne ditim. Carekê meyizand kesaxeyê mi li wê derê ye, û li ser tiştêki de ye. Ji wi, we ye ez im. Hema carekê destê xwe halo kir û li kesaxê xistin. Kesaxe kire piçk û pari. Meyizand ne ez im, kûzên jê hat, halo meyizand, ez ne ditim, carekê li paşîya şkeftê meyizand, qirên pê ket û hate mi. Go berê tîfîngê mi da-yê da û mi lingê wê kisand, xûrmên ji tîfîngê hat, mi li bin çengê dehbê xist. Kûzên jê hat û devê şkeftê ve derket.

Ez hatim, li ber agirê xwe rûniştim, mi nanê xwe, goştê xwe xwar. Ya mirê mi, mi digo ez Ehmêdê Zeydan im, û mêr di ser mi re ninin. Bi serê mir ji tîrsa wê şevê kezêbê dilê mi qetiha.

Mir go, piçki serê mi rahet bû  
— Mi di carekê du xort hatin. wi kurkiri ne, û rextê wa li piştê wan e

— Go: ya Ehmêdê Zeydan çi heqê te hebû te diya me kuşt?

Û rahiştine çepelê mi, û ez birim. Ez birime civatekê, nizikiya sêsed mêrî tê de rûniştiye, û dido li ser textêki rûnişti ne, di nivê weqa zilama da, yek jê bi serê mir heta niha ji ez dibêjim cûn tu bûyi, û ê ditir gote:

— Ya Ehmêdê Zeydan çi heqê te hebû wê derba bi xezêb ti li diya mi xî

— Ya mirê mi, rixset heye ez biştexilim, heke ez ayil im, mi bikuje, û heke ew ayil bê êdî disanî emrê te ye.

-- Go, biştexilê bi rastî

Vêca mi mesele jê re got, weke go çûme şkeftê û mi goşt da-yê ne girt, û eihê xwe da-yê ne girt û qelin da-yê da ne girt. Heta go kete berê sibê ber bendî hev man, heta go ew razîha û axir mesele ji ewil heta taliyê mi jê re got

— Ewê go di rex de rûnişti devê xwe kire guhê wi de. Heta niha ji ez didêjim ewê di rex de rûnişti tu bûyi. Kurê wê şiyand sial ji diya xwe kir, diya wîna go «kêm dibêjê û zêde nabêjê». Ji cem dê ciwab li kur ve-geriha, kur go:

-- Madam xayintî ji diya min e, ji cem mi mi ti efw kiri, bibin-ê cem bavê mi

Bavê wîna sial ji Ehmêdê Zeydan kir. Ehmêdê Zeydan jê re şexilî, ji ewil heta bi tali. Meyizand go jina wi ayil e go, here min ti efw kiri.

Du xulama rahiştî çepelê wi û anîne cem kurê wi. Carekê meyizandin qirên bi aliyê malê ket û girin, timam bû, jînik mir. Mêrê jînkê şiyand go, werînin ji mi re da ez bikujim

Kurê wîna go, te ji diwana xwe ew efw

kir û giha civatê mi, ez nema didim

Ehmêdê Zeydan her dibêjê, ewê di rex de, bi serê mir cûn tu bûyi

Kurê mirê cîna, ê li ser text rûniştî gote Ehmêdê Zeydan: ez dibinim ti gelekî mitala diki, li xwe çetin megire ev tiştê hate serê te timam ji destê jina te hati serê te. Ti ji mi ne meztir î, guhê xwe bide mi, ji te rê bibêjim. Jiuke mi hebû, mi niv saetê ne diyana sebra mi ne dihat. Rokê ez hatim mal go jina mi bê hal e, mi gotî-yê:

— Hîrmet, ma çîma?

— Go wele ez gelekî nexweş im

— Ma dilê te naçê tiştêki?

— Go, dilê mi diçê goştê teyrê tawûs

Pa teyrê tawûs cem dijminê min e, û di cihêki asê de ye, me bin zikê erdê ji mêra ji hev teji kiriye. Mi go ez firelek im, ez firim û çûme teyrê tawûs. Ez gihame nivê rê mi di carekê hînehemek ji wê ve hat, dengê xwe li mi kir, xwe ji ber riya mi bide alikî,

Ew bihurt ser riya xwe û ez bihurtim ser riya xwe. Go ez çûm devê xawiyê go teyrê tawûs tê de, û mi danî. Li devê xêni hishisand mi di diya wi rûniştî û pireka wi rûniştî û her di kurê wîna ew ji li hindirû rûniştî, teyrê tawûs li ser refikê. Mi di diya wi dibêjê:

— Malava ev kurê mi natebitê, dil ketiye jina kurê cîna û işev careke di çû û ez ditirsim rokê di vê riyê de bê kuştin.

— Ya Ehmêdê Zeydan guhê xwe bide ser mi tiştê hati serê mi, li xwe çetin megire, tu ji mi ne meztir î. Wextê diya wi wilo got mi fehm kir go kurê wi dil ketiye jina mi, ez bihurtim hindirû. Mi her di kurik li hev xistin, hûr-hêra kirin, jina wi li taqê qesrê xist, mi rahişte lingê diya wîna, mi ew ji li diwarî xist, mi her sê carek bi ser hev de hûr hûr kirin. Mi rahişte teyrê tawûs, mi kire paşîla xwe û ez firim, ez hatim nivê rê. Mi di carekê yarê jina mi ji wê ve hat, ba kire mi, xwe ji riya mi bide alikî, çîqa halo çû ez hatim pêşiyê, çîqa halo vejeriha ez hatim pêşiyê, kir ne kir xilasiya xwe ji mi ne kir. Carekê mi lêxist, mi ji hev kire du çêni, mi serê wi jêkir û mi kire paşîla xwe û ez hatime cem jina xwe. Mi meyizand jina mi wi xwe xemilandiye, çîqa cileqe xweşik wi li xwe kiriye û çavê xwe kil kirine. Mi go: Hîrmet ti rahet î?

— Go, elhemdililah ez raheht im

— Ma te çi xwar, ti raheht bûyi?

— Hebek tîrş û tehl mi xwar û ez raheht bûm.

Mi rahişte teyrê tawûs û li ber danî, mi

— Go, elhemdililah ez raheht im

— Ma te çi xwar, ti raheht bûyi?

— Hebek tîrş û tehl mi xwar û ez raheht bûm.

Mi rahişte teyrê tawûs û li ber danî, mi



go: ez çavê te me, tiştê te xwest mi ji te re anî.

Wextê çav li teyrê tawûs kir, jinkê fehîm kir bê kuştina yarê wê ev teyr nayê. Madeki zer î pîs bi jnikê de hat. Ya Ehmedê Zeydan li xwe çetin megire ti ji mi ne meztir î. Mi serê yarê wê ji paşila xwe derxist û mi li ber danî. Rîh ji jinkê çû. Mi goti-yê; Çima madê te qulibt û ti bêkêf bûyi, hey qehbê — Gote mi, ez di bextê te de me

Mi go, bext ji te re nîne. Mi derî lê girt mi şûr kişand û lêxist, mi kuşt. Dê Ehmedê Zeydan ez dibinim ti geleki diqehiri, ev tişt timam jina te bi serê te kir.

Ya mirê mi, bi eniya mir ewê di rex kurê cîna de ser text rûniştî, heta niha ez dibêm eyn ti bûyi. Kurê mirê cîna go;

— Ehmedê Zeydan, te divê ti herî mal

Mi go, herê mi divê ez herime mal. Emr kir ser di xortan, rahişte çeplê mi û ez avêtim pişt xaniyê mi. Xanik di pişt xaniyê mi de bû û qulekek devê wê di xênî de bû. Ez li wî xaniyi rûniştim û di wî deriyi ve li hindirû dimeyizand. Jina mi wî xwe xemilandîye, çavê xwe kil kirine û li hindirû dikeve û dirabê. Mi di carekê xortek ji der de hate hindirû, ez wî eyn nas dikim, filankes kurê filankes. Wî û jina mi destê xwe di stikura hev re anîn û rûyê hev maç kirin. Jinkê doşek danî, jê re balgî û zenberîş, jê re danîn, qazek jê re anî, wî bi destê xwe gurand, jinkê hûr hûr kir, li êgir kir û birincek ji çêkir, heta kelin. Jinik rabû kire mesrefê de, goştê qazê li ser danî, kire bin tiştê de. Wî destê xwe avête jinkê, kişande ser doşekê, dê wêca vê îşê pê bikê û nûka xwarina xwe bixwê. Pa ez bi çavê xwe dibinim hedana mi nema dihat. Mi derî vekir û ez ketime ser. Mi go: ez filanê filankes, ez Ehmedê Zeydan mi digo ez mirî bim kes nikarê pê li tîrba mi bikê, îro ti pê li namûsa mi dikî.

Wîna li mi veğerand: ti zirta zêdeyi xwe meke, heke ti mêreki mêrxas î, çekê bi xwe re deyne, ez û ti emê bi efra rahijne hev û heke ti nedeynî çeka bihêle ez ji çekê xwe ênim û emê rajne hev, ti biçek, ez bêçek ti fixra te nîne.

Wextê wîlo go, mi çek avêtin, me rahişte hev, wîna nav di jina mi da. Jinkê rahişte lingê mi û ez di bin de dam erdê, gote jinkê: — Şûrê wi werîne da em serê wi jêkin

Destê wê ne giha şûr, beroş kire bin piyê xwe, şûr bènê xwar. Ez di bin de mam keftelête dikim. Hingî rîh şerîne, gidêmiya mi di bin taziyê mi de ye. Carekê destê mi lêket, mi gidêmi kişand û mi avête ûrê wi. Roviye wî mi bi ser xwe de anîne xwar. Mi lingê xwe

## ZOZANÊN BÊLÎ

—Ji Welato ra—

Gelek bilind û pir av  
Gava sibê dide tav  
Di panzdehê Gulanê  
Heya Çemê-di-Kanê  
Gîşk rêl û dehl û zevî  
Lê digerin pezkovî  
Di bin hêlê de Salik  
Gundiikeki pir kiçik  
Kesera dil Diharan  
Ew ava wek robaran  
Keçelek gîşk dar û si  
Ka gopalen çivilbi  
Hele warên Çirikê  
Keskayî tê qirikê  
Ji Qezêz û Tixinkêr  
Li wî erdê axbizêr  
Heyhey dikir şivanan  
Weheweha gavanan  
Çûçik, şalûr û bilbil  
Ew loriyên piştbiçil  
Gava ko zom radîbûn  
Miri li wir radîbûn

Tev şihar û zinar in  
Çima wer xweş diyar in  
Carê çû bûm serê zût  
Golberan û Qeretût  
Tev de kesk û hişin e  
Şag û newal, kani ne  
Hember malan zimag e  
Meleşê wî devşag e  
Çi wareki bihuştî  
Canê mirov divejîn  
Dûdirêj û Sêvdinan  
Gori we bin xeziran  
Tevî nivîşk û tovmast  
Kêfa dilê min dixwest  
Heya Gola-Zêriyan  
Dihat dengên bêriyan  
Bi xiroşme û bilûr  
Borîna canegên stûr  
Dikin şayi û sazân  
Li ser dikin perwazan  
Dinê dibû şahînet  
Ew bû cihê tebiat

LAWÛT

da singa wî û mi çend kire dera ha. Jinik hê li şûr dixebitê da şûr bènê xwar, da serê mi pê jêkin. Wextê halo meyizand, mi mêrik kuşt, go:

— Ya Ehmedê Zeydan, ez dexila Xwedê û te, mi kir ti meke

Mi go: ma ti xwe ki kû da?

Mi da ber ekfiya heta mi hûr hûr kir. Laşê wê û ê mêrik tevda mi kire xirareki mûwi da û bi şeriteki peve şidandin. Mi erd kola, her di kirinê da. Mirê mi ev bû selfa mi.

Mir go, b'eniya mi serê mi bi selfa te rahet bû. Kuro rabin enteriki werinin, li Ehmedê Zeydan kin. Ya Ehmedê Zeydan wê rojê li ser text, di rex kurê mirê cîna de rûniştî ez bi xwe bûm û b'eniya mir go ne ji mi bana wê rojê te bikirana piçk û parî.

Mir ji, zavayê mirê cîna, Mirê Bota Mihemed Begê neçirvan bû.

★★★

Ev çiroka ha ji min re mixtarê Tilşeyra-Aşitan, heci Hemze kurê heci Silêman gotiye. Min tu tiştê wi ne guhart û herweki ji devê heci derketiye welê ji guhasiye Hawarê. Zarê wê gelek nizingî zarê Hevrkan e. Di Hawarê de gelek nivîsar bi zarê Hevrkan belav bûne. Xwendevanên ko bi zman mijûl dibin heke ev û nivîsarên din dane her hev, ewê xwe bi xwe dikarin vê nizingahiye tederinin.

Di çirokê de tete gotin ko Mihemed Begê neçirvan, mirê Botan, zavayê cînan bû. Me di hejmara Hawarê a bist û pêncan de biserhatiya Mihemed begî digel keçperiyê, bi hênceta şihra «Bêriya-Botan», goti bû.

*Korto! Ceji diroka miletê xwe karek  
li ser xwe girtiye. Ew barekî giran e. Ji xwe  
barên giran para mēran, para mēran barên  
girani in. Ce ew kiriye pišta xwe û daye  
kaxê çiyayên ko birêve bilintir û asêtir dibin.  
Herçend hibdikîştî û ji destê dūr dikiwî,  
diwestî, lê ewçend zexm û xurt dibî.  
Hawir diquhêre, tîştinen nenas dibî.*

## ÇARÎNÊN XEYAM

Wê şeraba yaqûti û rengsor bîne  
Wî heval û destbrayê azayan werine  
Tu dizanî ko heyin ji axê çêbûye  
Bayek e, li dibore, şerabê bine.

Dizani spêdeyê de dikê sibehî  
Çire hinde dike hawar û gazi?  
Neynika sibehê de nişa te dikin  
Ko ji jiyîna te şevê borî û tu pê nizanî,

Min falek ji deftera hevîne vekir  
Ji nişkekê ve pisporekî bi dilgermî got:  
Bextiyar e, ew zelandê ko mala wî de  
Delala wî heye, heyrî, û şeva wî beye, drêj  
[wek salê.

Berî ko navê te ji dinyayê biçê  
Vexwe şerabê xema te dê biçê  
Kezîyên delalekê ji hev bike  
Berî ko laşê te ji hev bikeve.

Sernijdevanê rindên xerabat ez im  
Ji gotinên bê cih gunehkarbûyî ez im  
Yê, ji vexwarina meya zelal bêxewmayî  
Û bi xwîna kezêbê lavelavkiri ez im.

Xwe bigire ji giyanî tê dūr bikevî  
Li pişt perdeyê veşartiyên Xwedê kûr bikevî  
Şerabê vexwe tu nizanî, hatiya kû  
Dilxweş be, tu nizanî dê biçî kû?

Şerabê vedixumî lê serxweşiyê nakim  
Ji bilî piyanê desdrêjîyê nakim  
Dizani qesda min ji şeraberestiyê çi ye?  
Da ko wek te xweperestiyê mekim

Dinê dîtî û herçî dîtî hiç e  
Û her tiştê ko gotî û bihistî hiç e  
Heke dinê seranser geriyayî  
An ji goşeya malê de runiştîyî hiç e

Gulê got rûyekî ji rûyê min spehitir nîne  
Hevqas westabûna gulavgirî ji bo çi ye  
Bilbil bi zmanê halê xwe got  
Ma ji bo kenîna rojekê kî salekê negirî.

Roja ko hespê ezmanî tê de zîn kirin  
Û Mişterî û Perwîn rewşa wî kirin  
Ji diwana qezayê nesibê me ev bû  
Ma gunehê me çi ye, kismetê me ev kirin.

## KOÇERA MÎRAN !...

Ho koçera min! Min bi maça devê xwe  
maç bike. Hevina te ji şerabê spehitir e. Bih-  
na te bihneke şirin e. Dengê navê te wek  
roniya rojê belav bûye, ji lewre herkes hej  
te, hej sira bayê te dike.

Ho keça koçerê miran! Tu esmer î, lê  
spehi yi. Tavê li rûyê te neyiriye, ji lewre tu  
esmer î. «Zêrê zer î xirab nabi, tu koçer î  
deşti nabi.»

Di nav kulilkên sor û zer de kulilka  
spehitir tu î. Di nav jinên zirav û şirin û bi  
bejn û bal de a çelengtir tu î.

Di spehitiyê de serdara serdaran û ser-  
taca delalan tu î.

Singê te ezmanê min e, mirari ser singê  
te de wek stêrkan diçirsin. Çavên te ne  
çavên xezal û askan in. Di çavên te de agir

# JI MELÊ

Di Kurdistanê de mela zehf bûn. Xwedê kêmaniya wan medit, îro ji ne hindik in. Lê gava bi tenê «Mela» tete gotin herkes pê dizane ko ew mela «Malayê-Cizeri» ye. Qesta me ji ew meylayê biagir e ko di bin wî de kuç di-sincirin û jinan nanên xwe pêve didan.

Diwana melê, nemaze bi felsefe û tesewifa xwe heja ye. Lê ewçend ji ji pirsên biyanî teji ye. Me dil kir em çend malikên diwana wî, ji bona ceribandîne, bi herfên me ên nû û xweser binivîsinin. Ev in, du xezelên wî :

## XANIM :

Pir ji dîna te xerib im xanim  
Ji te ser ta bi qidem heyran im  
Her bi can teşneleb û le'lan im  
Dil di benda giriha zilfan im  
Yûsîfê cirhekeşê hicran im  
Niqteî daireî rindan im  
Lew şebi daire sergirdan im  
Badenûşê qedehî hirman im  
Bi dil ateş ji ceger biryan im  
Lew perîşan im û pir êşan im  
Aşîqê nazik û mehbûban im  
Tu mebê bê ser û saman im  
Gulê başê iremê Buhtan im  
Şebçiraxê şevê Kurdistan im  
Çi tebiyet beşer û insan im  
Lilahlilhemd çi alîşan im  
Di rêya yarê de li rêza san im  
Lew di eqlimî suxen xaqan im  
Sibehê îd e, û ez pê zanîm

hildibe û kortalên kûr û tarî tê hene.

Zêndana dilê min çavên te ên reş in.  
Hêlina heyîna min di siha mijangên te de ye.

Koçera min, ji xewê rabe koçera min.  
Buhara pêşin e; mêrg û solin bi bihn û reng in,  
ba serxweş e, kanî sar û bi kêf û guşguş in;  
hezar strana hevîne dixwîne.

Libadeyê te ziv e, bedena te servehati ye.  
Di zendên te de bazinên zêr û gewherkiri,  
di baskên te de bazbazingên sor û zivkiri hêlîteya rewşê distiriya.

Bisk û guliyên te ên çinçinkiri bihna misk  
û enberê belav dikin û ser dilê xortan vedidin.

Hewa bi bihna te bihndar, çiçek bi rengê te rengdar dibin.

Wek tawûsê lûleper û nazdarî, meşa te wek meşa qunrî û kevokan nerm û sivik e.

Ho koçera min! Serê te nêvserk û kum-

Go bi kêra te seher qurban im  
Xweş birindarekî bê darman im  
Carekê şefqe ke rûh im, can im  
Ji Xwedê re veke benda biriyê  
Dinbirê hûrî-misalê zeriye  
Nazikê neyşekirê surperiyê.

## DIL JI MIN BIR :

Şûx û şengê zuhrerengê dil ji min bir dil ji min  
Awirê heybetpilingê dil ji min bir, dil ji min  
Wê şepalê miskixalê dêmdure gerdensematê  
Cibheta biskan sema lê dil ji min bir, dil ji min  
Zilf û xalan nûn û dalan wan ji min dil bir bi nalan  
Goşeyên qewsen hilalan dil ji min bir dil ji min  
Dêmedirê boebirê xemrî û keysû herirê  
Sine kir armancî tirê dil ji min bir dil ji min  
Surşirîne nazenîne kuştîme nakit yeqîne  
Wê bi çengala evîne dil ji min bir dil ji min  
Fetl û taban da xuraban ebleq û cuhtê şibaban  
Dame ber penc û gulavan dil ji min bir dil ji min  
Xweş - xeramê ez xulamê nazikê sêrînkelanî  
Suhtîya eywanmeqamê dil ji min bir, dil ji min  
Maherûyê miskeboyê sur - pilingê şêrexoyê  
Wê bi zilla şibhî goyê dil ji min bir dil ji min  
Her du çeşman naz û xeşman kê ji ber wan

leq û heş nian  
Saheta min di bi çeşman, dil ji min bir, dil ji min  
Mahitabê, afitabê, dêm ji rojê şevniqabê  
Xweş bi çengal û kulavê dil ji min bir, dil ji min  
Serwînazê serfirazê şibhî zêr remza mecazê  
Dame ber çakûç û gazê dil ji min bir, dil ji min  
Bejn û bala tox û lala min kirin vêk ra mitala  
Çiçeka terhin û ala dil ji min bir, dil ji min  
Mîrê xazî şêrê tazi vegeran min di bi bazi  
Kir li me ji xêflet ve xazî, dil ji min bir dil ji min  
Şîr û xîştin zilf û qîştin hin veşartin hin vehîştin  
Pehlewanan dest vemîştin, dil ji min bir dil ji min  
Ruhniya çehvên mela yî ew tecelaya te dayê  
Ya ji Ehmed dilrevayê, dil ji min bir, dil ji min.

ribkiri, tiliyên le gustilkiri, gustilkên te sef-kiri, eniya te toq-kiri, nermikên te guharkiri, gerdena te morikiri, zendên te bazinkiri, lingên te xilxalkiri, bedena te bişkojkiri. şara serê te gulivk û serçaxkiri, keziyên te şerab-kiri, ristika te serdilkiri ne, ho koçera min! Çavên xwe veke ez dixwazim stêra qedera xwe bibînim.

Lêvên te sor in, û wek agiri germ in.  
Gul bi kenina te dibişkive û bi girîna te diwerihe.

Koçera min, rabe û min bi maça xwe maç bike.

Dilê min serxweşiya maça te û mestliya bihna te dixwaze. Berde, bila zenda min bibe kemberbestiya nêvtenga te. Dev û lêvên te kaniya ramûsanê ye, bihêle bila bêriya dilê min, bi ava wê kaniyê din û bêhiş bikeve! ! Ho koçera min.

Dr. K. A. BEDIR-XAN

# ZERDEŞT Û RÊYA ZERDEŞT

«... our dear and valiant brethren, the kurds, the only heroic people who have perserved the purity, integrity and independence of the old Iranian race.» The Editor of The Iran League, Bombay. Vol. VI, no 1, October, 1933. Page 31.

Dinê wînda, ber cavên cihan Xwedê ne bû  
Bi hawara hişê te erd û ezman rabû.  
Te got ji bo herkesî yek namûs û yek bext,  
Çi piçûk, çi mezin, çi hakimê şûr û text.

Baweriya te rêya rast e, ditina pak,  
Gumana rind, kirina baş û gotina çak.  
Fermana te vejand jînê ji xewa tari,  
Ronîya pêşin î, fexra miletên Ari



Zerdeşt  
ji me ye,  
û îro jî di  
Kurdistanê  
de hin  
kurd he-  
ne ko pê  
bawer in.  
Ew jî Ey-  
zedî ne.

Ji ber ko  
za n a y e  
kurdistanê  
ê berê  
Zerdeşt  
bû, jî bo  
me zanî-  
na bin-  
yan û  
qeydeyên  
rêya Zer-  
deşt çak e.  
Ji vî zanî-  
nê mede-  
niyeta me  
a kevî,  
bilindî û  
kûrahiya  
hişê me,  
dîlpakiya  
MILETÊ  
K U R D  
xuya dibe.

Ji xwe  
felsefe û  
nivîsan-  
din ango  
destpêka  
pêşketina  
cihanê bi

heyîna nijadê me ve girêdayî ye. Cihan-  
dostî, cihanbratî jî destxetê me ye.

Navê kitêba zerdeştîyan Avesta  
ye. Nivîsevanê wê Zerdeşt e. Dema nivî-  
sandina Avestayê biewleyî hej ne hatiye

zanîn. Hin nivîsevanên rojavayê dibê-  
jin ko şeşsed sal berî Isa pêxember ha-  
tiye nivîsandin. Hinekên din û zerdeştî  
bî xwe bawer in ko Avesta pênchezar  
sal berî Isa pêxember hebû. Herhal

kitêbeke gelek kevn, mezin û hêja ye.

Berî Zerdeşt û Avestayê mirovan yekitiya Xwedê ne dizanin. Baweriya wan tarî, bê him û bê binyan bû.

Tiştên ecêb wek heywan, ba, av, dar, çiya ji xwe re dikirin Xwedê, hej wan dikirin, ji wan ditirsiyan û ji wan re lavelav û perestîş dikirin. Yekitiya Yezdan, mezinahiya wî bi Avesta hatiye belav kirin. Rastiya hiş û dil, pakitiya laş û mal û cil bi fermanên Zerdeşt bûn qeydeyên jinê û armançên miletên pêşketî. Gotina dinê Zerdeşt a paşin ev e: dinyayê de rêyek heye, ew jî rêya rastiyê ye. Ma şairê Kurdan ê mezin Xanî jî ne digot:

Kizb û xilaf mebej ger te bikin ker bi ker.

Ji bîli vî mamikê me ê delal: Derew dijminê Xwedê ye; çiqas ronak û servehatî ye.

### HÎMÊ BAWERIYÊ

Zerdeştî divê baweriyê binin ko: Xwedê yek e, bê hewrî ye, bê deng e. Abadîn e, zana û xurt e. Her hebû, her heye û her dê hebe. Ji afirandiyên xwe re mihriyan e, qenci û xweşiya wan dixwaze.

Xwedê bi çavên me naye ditin, lê dinê ji serî heya binî şahidê heyîna wî ye. Ezman, roj û heyv, stêr, giya, av û heywan bi gotinekê her tişt heyîna Xwedê û mezinahiya wî nişa me didin.

Ew tiştên ha hemî bin qanonên afirandinê de hatine saz kirin. Qanonên afirandinê abadîn in, nayin guhartin, nayin edilandin, çawan hatine afirandin wisan dimînin, ser xwe disekin. Xwediyê qanonên jorîn, şehînsahê wan, aferideyê wan Yezdan e.

Xwedê zana ye, ji kirin û fikirin û ji gotinên me xweyhay e. Kes nikare jê tişteki veşêre, naye xapandin, yê qo bawer dikin Xwedê dixapînin tinê nefsa xwe dixapînin û tewza hişên xwe dikin.

### ARMANCA VÊ ZANÎNÊ

Zanînên himên baweriyê, me ditine nîziki veşartiyên daxwazên Xwedê. Bi vî awayî em dizanin vên û fermanên Yezdan çî ne û em çawan dikarin xwe bigehînin wî.

### MAYÎYÊN VÊ ZANÎNÊ:

Ji vê zanîne xuya dibe ko başî û piyariya Xwedê bi zelumên qenc re ye. Dinê û jin destên me de wek mehfûrekê ye. Xweşi, çelengi, reng û awayê mehfûrê herwekî destên xebatkerên xwe de ne wisa jî, spehîti, bextiyari, siûd û çakî û neçakîya jinê û paşiya me di destê me de ne. Herwekî Xwedê piyar, mezin û neqenciya afirandiyên xwe naxwaze, ji qehr û belayên jinê tinê em mesûl in. Kirêtî, jarî, ketin û şerpezeyî destkuta me ne.

Ev fêkiyên jehrîn karê tirali, bêbextî û belengaziya dilên me ne. Yê ko hej Zerdeştî dikin divê hej ronahiyê bikin. Fikirin, kirin û gotinên wan divê wek ronahiya rojê pak, rast û qenc bibin. Tinê zelumên bêbext xwe wedişêrin.

Yên ko kirinên xwe vedişêrin, û ji bo veşarlîna wan dikevin pê tariyê ne mêr û ne jî camêr in. Di nav beyna rastî û nerastî, spehîti û kirêtî, ronahî û tarîti, qenci û xirabiyê de şerekî mezin heye.

Em bi çavên xwe dibînin ko nerastî, kirêtî, tarîti, xirabî hero sistir dibin. Ketin û xirabûna wan fermana Yezdan û armanca mêrên camêr in. Ji kirinên qenc can û dilê me şa dibe, ji kirinên nexweş tirs û eş dikeve dilê me, jîna me dibe bê tam û bê xurtî. Ev hesandina dili, ev kêfxweşi û dilêş têsira ronahiya Xwedê ye. Jin û mêr pê dihesin û jin û mêr rehmet û ezabên vê ronahî û tarîtiyê dizanin.

Ji xêzikên jorîn dixwiye ko kurd, ji kerema Xwedê, her li ser rêya rastiyê de mane. Berê bi Zerdeşt û niho bi dinê me ê delal û mezin misilmaniyê.

Dr. K. A. BEDIR-XAN

# LE SOLEIL NOIR

## Les Coutumes du Pays des Kurdes

Le plateau de Hewreman qui est situé au sud du Kurdistan entre Suleymaniyeh et Sine — la première, ville des gens d'un esprit rare et fin, la deuxième célèbre par la beauté de ses tapis et ses objets d'arts — est une merveille de la nature.

Ce pays riche, fertile, doté d'un charme exceptionnel est par excellence le foyer des poètes et des artistes.

Pour ceux qui connaissent bien le Kurdistan, seules les montagnes et le plateau de Milles-Lacs avec ses eaux de cent couleurs pétillantes, sa végétation vigoureuse et florissante, sa situation remarquable, sa richesse minière au nord du territoire où, entourée de brumes rose se cache la source de la vie et du bonheur éternel; peuvent être comparées au plateau de Hewreman. En escaladant les montagnes de Hewreman on éprouve une sensation bizarre. On croit atteindre le ciel bleu et clair du pays, en suivant les pentes colorées et parfumées par des fleurs connues et inconnues qui grisent l'odorat et enchantent les yeux.

Mais le merveille de la nature s'accomplit à l'aurore, une heure et demie avant le lever du Soleil sur la terre d'Asie; des monts de Hewreman on le voit enfoncé dans le velours de la nuit comme un démon noir, dépassant de quatre à cinq fois sa grandeur.

Les Kurdes habitués à ce spectacle vous font suivre les mouvements et l'évolution grandiose de l'Astre.

La nuit règne encore et sous la voûte étoilée, silencieuse, la terre dort et donne l'impression d'un temple vide et chaque chose apparaît nonchalante et mystérieuse.

Malgré les notions précises de la science on aime à croire que la terre se reposant dans la tranquillité immense de la nuit c'est le soleil qui avance.

L'Astre qui tout d'abord est absolument noir, petit-à-petit évolue et prend une couleur de sépia très foncée pour passer à une teinte mauve, lilas et ces différentes couleurs, par des changements très graduels, se fondent en un ton jaune vif.

Puis la coloration prend une allure plus précise, le jaune devient rose comme une flamme naissante, un rouge très vil lui

succède pour faire place au globe d'un rouge ardent comme un énorme morceau de fer brûlant qui semble verser le feu dans l'espace.

Au loin, à l'horizon sur des collines éteincelantes on aperçoit des bandes d'oiseaux pareils à des essaims bourdonnantes d'abeilles. La densité de la nuit s'affaiblit, des brumes passent, des ombres et des nuages s'enfuient, entre la terre et le ciel on voit se former un rond doré comm une ceinture magique: d'où sortent des rellets rouges, bleus, gris, mauves, jaunes et blancs dans une limpidité qui laisse voir les étoiles.

Pendant une heure et demie, les yeux sont extasiés par ces jeux colorés et lumineux et se reposent en contemplant l'aurore qui naît dans la plaine. Comme une grande rose l'Astre s'épanouit dans le jardin du ciel et la terre pâlie, rit sous la lumière éblouissante dont les diverses couleurs teintent le frisson des eaux. Ce que je viens de peindre est une des mille beautés de ce pays. Mais il faut entrevoir les raisons de la vénération presque religieuse que les kurdes éprouvent pour la nature et leur culte de la lumière.

Mon séjour m'a permis de voir les coutumes intéressantes qui caractérisent la nation. Sans avoir la prétention de donner à ces lignes la portée d'une étude je veux raconter des choses vues les concernant.

Ainsi la fête de la naissance du printemps est un grand événement familial et social de ce pays, de cette race grave, libre, amoureuse, et forte. Le 21 Mars est considéré comme le premier jour de l'année. L'hiver, la nuit qui étaient tombés sur la vie passent et une clarté neuve comme l'eau limpide des sources jaillit des rochers, envahit la terre. Les belles heures s'approchent. Les arbres effeuillés s'habillent.

Le ruisseau qui pleurait tout un hiver sous les glaçons chante sur les sables à travers les buissons. Le froid n'est plus têtù, le soleil promène les fleurs dans les champs et les prairies. La neige des hautes montagnes se fond et comme le poète le chante des forteresses blanches, gigantesques tombent et s'écroulent. L'armée des roses, des tulipes, des narcisses envahit la terre doucement en la calinant. Les troupeaux chassés par la neige et réfugiés dans les plaines prennent leur marche vers les montagnes et les plateaux.

Ceux que la neige avait fait descendre

commencent à monter. Des milliers de moutons et des chèvres s'élancent vers les hauts pâturages. Un sang vif s'éveille dans les veines des hommes et des animaux. Les oiseaux chantent, les pâtres vivifient leurs flûtes et dans la fête de la montagne les échos des rêves enfuis inspirent les poètes.

Dans les villes et villages les maisons sont ornées. Les salons, et les salles à manger sont fleuries de roses et dans de petites corbeilles et des vases plats les grains de blé ensemencés dans la terre mère, élancent leurs lourds épis. C'est le jour où chaque table a la grande abondance des mets et des douceurs.

Chez les Kurdes non mahométans, chez les Yezidis, les adeptes de l'ancienne religion Kurde, le vin rouge coule. La jeunesse habillée élégamment rit, chante et danse. Tout le monde est gai. On oublie les rancunes, on s'embrasse et on pardonne. Et ce jour là, le moindre mot désagréable, le plus petit geste impoli sont considérés comme une offense à la divinité au même titre qu'un acte brutal et inexcusable.

Cette vieille coutume est très respectée. Le même jour on met dans des tasses vertes remplies d'eau des morceaux de papier sur lesquels sont écrits des vers célébrant les temples antiques, la lumière divine et on boit cette eau qui est considérée sacrée.

Il est bizarre de voir les Kurdes mahométans fêter avec tant de joie la naissance du printemps, vestige de leur ancienne religion, tandis que les mêmes, surtout les nobles ferment leur cuisine pendant les deux grandes fêtes islamiques. Ils prétendent que festoyer pendant ces fêtes porte malheur.

Le proverbe ture qui dit — le Kurde est musulman comparé à un incroyant — «gavour» trouve peut-être sa signification dans des coutumes pareilles de cette nation.

Chez les Kurdes l'idée de la famille est très développée, la naissance d'un enfant est un événement d'une importance spéciale. Dans les villages, entre les tribus on fête publiquement pendant une période variant de 3 à 7 jours, la naissance de l'enfant.

La mère est comblée de cadeaux : montres, bracelets, bagues, jolis tapis, soieries multicolores. Le septième jour l'enfant reçoit son nom. Le prénom du père ne lui est pas donné : si celui-ci est mort avant la naissance. L'appeler par le nom de son

grand-père où grande-mère paternels ou maternels est dans les coutumes. Le parrain est toujours un homme de bonne renommée, le plus recherché est celui qui a bu l'eau de sept mers, symbole du savoir et de sagesse. Quand l'enfant a 10 ans il est envoyé chez ses oncles.

Les frères et les sœurs recevant mutuellement leur neveu renforcent les liens familiaux. Et envoyer à la rencontre d'un voyageur ou d'un visiteur estimé le neveu au lieu du fils de la maison c'est l'honorer et le considérer.

La coutume musulmane orientale qui consistait à ce que le mariage se fit par intermédiaire, sans que les futurs époux puissent se voir, a toujours été inconnu chez les kurdes. Les femmes kurdes n'ont jamais porté le voile; aussi l'amour avec toutes ses grâces et ses conseils charmants naissait souvent spontanément et grandissait en générale d'une manière bien sage.

La femme kurde n'apporte guère au foyer conjugal que sa gracieuse personne et son coeur chaud et dévoué, la dot est chose inconnue; le mari prend tous les frais à sa charge et bien souvent assure à son beau père une somme rondelette.

Plusieurs fils à marier peuvent amener dans une famille une véritable débacle financière. Heureusement en général les jeunes hommes très ardents et moins patients arrivent à se débrouiller eux mêmes pour obtenir la main de la bien-aimée. Après l'entente intime des deux jeunes gens, la mère ou la tante du jeune homme fait une démarche discrète chez les parents de la jeune fille. Si cette démarche est encouragée le père ou l'oncle fait la demande officielle.

Le soir du jour où le consentement est accordé dans une réunion intime on fête les fiançailles. Dès cet instant le fiancé a la permission tacite de voir sa fiancée chez elle. Les jeunes gens ne se gênent pas pour user et même abuser de cette autorisation et ceux qui arrivent à s'assurer la sympathie de leur future belle mère peuvent bien se mettre à l'aise. La durée des fiançailles n'est pas fixée. En général elles ne dépassent pas une année. A partir de ce moment des petits cadeaux offerts gentiment par le fiancé entourent la petite fille rêveuse.

Le jour heureux venu si les futurs époux

sont dans le même pays un cortège de piétons se forme, s'ils habitent des villes différentes c'est un cortège de cavaliers. La jeunesse se met en tête précédée par des enfants de dix à douze ans. La fiancée vient après ayant à ses côtés quatre jeunes femmes mariées suivies par les membres des deux familles et de leurs invités. Quand le cortège arrive à proximité de la maison nuptiale gai et chantant on entend des voix de femmes :

— Où est le gendre.. pourquoi n'est-il pas venu à la rencontre de sa fiancée?.. ah non.. dans ces conditions nous allons rentrer chez nous.. nous allons la conduire chez son père....

Les confidences des femmes âgées m'ont appris qu'il n'était pas rare que des jeunes filles innocentes et crédules palissent d'inquiétude et passent des mauvais instants en pensant à la possibilité d'un retour triste vers la maison paternelle. Les murmures persistent et le gendre qui est là dans un coin, dans une rue à peine éclairée s'avance tout rouge, timide et balbutiant des mots incompréhensibles. De nouveau des murmures, des quolibets, des exclamations montent du côté des femmes.

— Ah... tiens.. vraiment il est beau.. quelle taille... mais comme il est timide... il n'ose pas même lever les yeux...

Mais pourquoi ne parle-t-il pas? Pas même un mot de gratitude à l'adresse de cette belle fille.

Ainsi on rit, on fait des plaisanteries et on avance. L'habitude veut que cette cérémonie se passe pendant la soirée. De grandes bougies illuminent le parcours. La demie obscurité qui règne encourage même les femmes les plus timides à plaisanter librement. Arrivés au futur foyer tout le monde se réunit dans la salle, le prêtre prononce les mots rituels et dit qu'il sont liés par le mariage. Jusqu'au matin des réjouissances, des attractions, des danses enchantent les invités et pendant trois jours la fête continue...

Au cas d'un refus de la part des parents de la jeune fille, le jeune amoureux, s'il obtient l'accord de sa belle, l'enlève. Comme c'est facile à imaginer; l'enlèvement d'une jeune fille est une chose bien périlleuse. On peut risquer même la vie. Cet enlèvement est considéré comme un acte tout à fait honnête et même chevaleresque.

Le jeune homme accompagné de ses frères, cousins ou amis fait l'exploit. Le «grand» du pays ou des chefs et des notables interviennent. Souvent on trouve la possibilité d'un arrangement amical.

En tout cas tant que le mariage n'est pas conclu le jeune homme respecte la jeune fille. C'est là une question d'honneur. Des chansons prétendent que la jeunesse doit avoir un pareil souvenir et que ce souvenir arrive toujours à dissiper les malentendus, même graves du ménage.

Les craintes, les soucis, les frissons, les risques, les souffrances est les joies éprouvées par ces deux jeunes cœurs, les unissent pour toujours avec un charme indescriptible.

Un proverbe kurde dit : «celui qui ne veut pas mourir sur le chemin conduisant à la cousine (le mot cousine veut dire la bien-aimée) est un malheureux». Une coutume ancienne voulait qu'un enfant riche, devenu orphelin soit marié — même à l'âge de 10 ans — afin de sauvegarder sa fortune; cette coutume ne s'appliquait qu'à l'enfant mâle parce qu'on accordait à la femme la plus grande confiance dans sa générosité et son honnêteté.

La petite fille qui devenait orpheline ne pouvait, elle, être mariée que vers l'âge de 16 ans. Je veux donner aussi un amusant exemple de la superstition kurde.

Dans certaines régions le chiffre 13 n'est jamais prononcé. En comptant on dit : onze, douze, plus est quatorze.

Une chose bien gaie aussi est de voir comment une jeune fille développe son goût et son talent de bien s'habiller. Elle s'entoure d'un nombre de poupées qui sont ses mannequins.

Sur des chemises, des robes, des pyjamas des couvre-chefs faits pour la poupée, la jeune fille laisse courir sa fantaisie élégante. Ces vêtements après mille changements et modifications lui servent de modèles ainsi qu'à ses amies. Le travail des tapis, des kélims, des couvertures, des chales, des broderies contribue énormément à ce perfectionnement artistique tant au point de vue couleur qu'au point de vue dessin. Ces travaux d'art sont souvent exécutés sans modèle, œuvre de l'inspiration et de la fantaisie artistique pleine d'imprévu, de caprice et d'imagination... Devant le métier chantant, bavardant, si le secret du cœur est déjà



trop lourd rêvant elle travaille et produit ces chef-d'œuvres d'un goût sûr d'une richesse fine et d'une coloration éblouissante. Leur marbre c'est la laine. Ce travail a aussi sa littérature.

Les chansons dénommées «chants devant le métier» composées et chantées par les jeunes filles sont spirituelles, pleines de malice et de coquetterie. Sous les ombres des arbres, des grands rochers, à l'entrée des grottes — fréquentes dans les montagnes du pays — on rencontre souvent des jeunes filles assises devant leur métier bavardant avec un jeune homme. C'est un plaisir considéré comme tout à fait innocent.

Mais si le métier au lieu d'être devant elle est à l'écart on arrive à penser facilement que la relation a dépassé le simple fleur. Concernant le travail du métier elles ont une coutume qui est saisissante. Si pendant l'exécution d'un travail par la maîtresse de la maison, son mari vient à mourir on laisse le travail inachevé et on en fait cadeau à une personne étrangère à la famille, chère au défunt. Ainsi j'ai reçu de la femme de Derwiche Aga, le chef des Yézidis de la Syrie le kélim à moitié tissé, après la mort de son époux tué par un autre Yézidi.

Ce dernier avait disparu au cours de la guerre générale et Derwiche Aga le considérant comme mort avait autorisé sa femme à se remarier. Le disparu revenant au pays après une absence de 14 années tua le Aga le considérant responsable de cet abandon. Les kurdes ont beaucoup de respect pour les morts et un culte pour leur souvenir. Chaque endroit où le sang humain a coulé est indiqué par la pierre qu'érige un des amis du mort.

Les passants ajoutent d'autres pierres à à celle ci pour sauvegarder pieusement les noms de l'oubli. Les cimetières sont soignées et proprement entretenues. On vénère les morts par un feu brûlé durant trois jours dans la chambre mortuaire, puis pendant une semaine à côté de leur tombeau. Ceux ci sont constitués par une colonne de marbre de 2 à 3 mètres de hauteur sur laquelle pour un homme on grave des dessins : poignards, fusils, outils de travail, aigles ou cercles symbolisant le Soleil alors que pour les femmes l'ornement consiste en dessin de fleurs : marguerites, mugnets, ou d'objets de coquetterie : peignes, bracelets etc... Les cimetières

en général sont situés hors des villages et des villes, sur les collines.

Planter des arbres aux cimetières est une coutume. On considère que les ombres des arbres donnent le repos à l'âme dans le calme éternel. Les arbres de Judée sont les préférés.

Les kurdes ont un amour excessif pour les animaux, et une véritable vénération pour le coq et l'aigle. Le coq symbole de la gaieté qui par son chant joyeux annonce le lever du soleil et tel le sage, prédit les malheurs dans son chant intempestif.

On prétend qu'une fois dans un village du plateau de Hewreman et une autre fois à Mamed dans la région de Pijdere les coqs chantèrent pendant la soirée.

C'était un présage de malheur, auquel personne ne fit attention; la même nuit ces villages étaient détruits. Dans ces régions on ne tue jamais un coq.

Pendant les mariages on fait tourner un coq autour de la jeune mariée pour lui assurer le bonheur, la lumière fraîche et l'indépendance dans la vie.

Si un coq est introuvable il est remplacé par une statuette de coq préparée spécialement pour cet usage.

Des aigles accompagnent souvent les chefs dans leur déplacement.

Le printemps passe, le nouveau né rit et devient dans la joie un jeune homme et se marie, le vieillard répète ce mot devenu un proverbe kurde : «La mort ! Oui; mais non la vieillesse».

Dr. K. A. BEDIR-KHAN

De la grammaire kurde

## DÉCLINAISON DU PRONOM (suite)

Prenons le verbe transitif (dilin-voir).

Conjugons son indicatif présent :

Ez dibîn—im	Je vois
Tu dibîn—î	Tu vois
Ew dibîn—e	Il, elle voit
Em dibîn—in	Nous voyons
Hon dibîn—in	Vous voyez
Ew dibîn—in	Ils, elles voient

On voit distinctement les désinences de chaque personne qui au pluriel sont les mêmes. Citons le passé composé du même verbe.

Min dît	J'ai vu
Te dît	Tu as vu
Wi, wê dît	Il, elle a vu

Me dît	Nous avons vu
We dît	Vous avez vu
Wan dît	Ils, elle ont vu

Conformément à la règle, ci dessous mentionnée, ce sont les pronoms-complément qui ont pris la place des pronoms-sujet et en conséquence le verbe est resté sans désinence, puisque la terminaison est l'effet de l'accord avec le pronom-sujet et que ce dernier manque, et alors qu'il traîne les désinences comme partie intégrale de son propre être.

Conséquemment dans la phrase «Zin a vu» Zin — bien qu'elle soit sujet — et parce qu'elle se trouve à la place du complément, sera déclinée «Zinè dît» et au contraire dans la phrase «J'ai vu Zin» Zin, bien qu'elle soit complément ne se décline pas, puisqu'elle s'est intervertie avec le sujet «Min Zin dît».

Dans les phrases suivantes nous retrouverons les désinences des verbes qui avaient disparu pendant la conjugaison de ces derniers sans complément.

Zin m'a vu

Zinè ez dîtim                      Wè ez dîtim

On voit bien distinctement que la désinence du verbe n'est que l'accord de ce dernier, non pas avec le sujet logique, mais avec le complément qui en son origine est un pronom-sujet, de sorte que toujours c'est le sujet logique qui se décline.

Autres exemples :

Min (me) tu dît	Je t'ai vu, nous t'avons vu
Min (me) ew dît	Je l'ai vu, nous l'avons vu
Min (me) hon dîtin	Je vous ai vu, nous vous avons vu
Min (me) ew dîtin	Je les ai vu, nous les avons vu
Te (we) ez dîtim	Tu m'as vu, vous m'avez vu
Te (we) ew dît	Tu l'as vu, vous l'avez vu
Te (we) em dîtin	Tu nous as vu, vous nous avez vu
Te (we) ew dîtin	Tu les as vu, vous les avez vu
Wi (wan) ez dîtim	Il m'a vu, ils m'ont vu
Wi (wan) tu dît	Il t'a vu, ils t'ont vu
Wi (wan) em dîtin	Il nous a vu, ils nous ont vu
Wi (wan) hon dîtin	Il vous a vu, ils vous ont vu

## NOM DE NOMBRE ET VERBE

Des parties variables du discours il ne reste que le nom de nombre et le verbe.

En ce qui concerne le nom de nombre nous nous contenterons de ce que nous avons exposé dans l'article traitant des parties du discours et nous réserverons les détails pour l'article le concernant.

Quant au verbe, le changement qu'il subit par le fait de la conjugaison c'est la forme de flexion qui lui est propre.

Tout en réservant les détails du verbe pour l'article le concernant nous donnerons ici un tableau de conjugaison des deux verbes kurdes. Un intransitif et un transitif.

On forme les temps simples du passé en supprimant la terminaison. Dans le verbe intransitif on ajoute au radicale les désinences. Le verbe transitif se conjugue sans désinences.

### KET-in

### KIR-in

Ez ketim	Em ketin	Min kir	Me kir
Tu ketî	Hon ketin	Te kir	We kir
Ew ket	Ew ketin	Wi, wê kir	Wan kir
Ez ketime	Em ketine	Min kiriye	Me kiriye
Tu ketiyî	Hon ketine	Te kiriye	We kiriye
Ew ketiye	Ew ketine	Wi-ê kiriye	Wan kiriye
Ez diketim	Em diketin	Min dikir	Me dikir
Tu diketî	Hon diketin	Te dikir	We dikir
Ew diket	Ew diketin	Wi-ê dikir	Wan dikir
Ez biketam	Em biketan	Min bikira	Me bikira
Tu biketayî	Hon biketan	Te bikira	We bikira
Ew biketa	Ew biketan	Wi-ê bikira	Wan bikira
Ez dè biketam		Min dè bikira	
Tu dè biketayî		Te dè bikira	
Ew dè biketa		Wi, wê dè bikira	
Em dè biketan		Me dè bikira	
Hon dè biketan		We dè bikira	
Ew dè biketan		Wan dè bikira	

On forme les temps composés du passé à partir de l'infinitif parfait.

### KETI-BÛN

### KIRI-BÛN

Ez Keti bûm	Min kiri bû
Tu keti bûyî	Te kiri bû
Ew keti bû	Wi, wê kiri bû
Em keti bûn	Me kiri bû
Hon keti bûn	We kiri bû
Ew keti bûn	Wan kiri bû
Ez keti bwam	Min kiri bwa
Tu keti bwayî	Te kiri bwa
Ew keti bwa	Wi, wê kiri bwa
Em keti bwan	Me kiri bwa
Hon keti bwau	We kiri bwa
Ew keti bwan	Wan kiri bwa
Ez dè keti bwam	Min dè kiri bwa
Tu dè keti bwayî	Te dè kiri bwa
Ew dè keti bwa	Wi, wê dè kiri bwa
Em dè keti bwan	Me dè kiri bwa
Hon dè keti bwau	We dè kiri bwa
Ew dè keti bwam	Wan dè kiri bwa
Ez keti bin	Min kiri be
Tu keti bi	Te kiri be
Ew keti be	Wi, wê kiri be
Em keti bin	Me kiri be
Hon keti bin	We Kiri be
Ew keti bin	Wan kiri be

Le présent, le subjonctif et le futur se forment à partir de l'impératif. Dans ces temps la forme de conjugaison des deux verbes s'unifie et tous les deux se conjuguent

SUIVEZ LES GRANDES REVUES FRANÇAISES QUI PUBLIENT  
SOUVENT DES ÉTUDES SUR LA LITTÉRATURE ET ARTS KURDES

## LE TRÉSOR DES LETTRES

*Directrice fondatrice: Irmine Romanette*

Abonnement un an: (40) francs.

Prix de numéro: 4 francs 50.

DIRECTION: 3 RUE DEBROUSSE PARIS 16e.

## ATLANTIS REVUE ILLUSTRÉE D'ARCHÉOLOGIE TRADITIONNELLE

*Directeur fondateur: Paul Le Cour*

Abonnement un an: (30) francs.

Prix de numéro: (4) francs.

DIRECTION 46 RUE DE MONTREUIL PARIS-EST

## DANTE REVUE DE LA CULTURE LATINE

*Directeur Propriétaire: Lionello Fiumi*

Abonnement un an: (50) francs.

Prix de numéro: (5) francs.

DIRECTION ET ADMINISTRATION, 32 AVENUE DE L'OPÉRA PARIS 2e.

DEMANDEZ A VOTRE LIBRAIRIE:

Sonson de la Martinique. Roman par Irmine Romanette. Prix: (12) francs.

Survivances. Poèmes de Lionello Fiumi. Prix: (60) francs.

L'Atlantide et la métaphysique occidentale. Par Paul Le Cour. Prix: 3 francs 50.

avec les pronoms-sujet et reçoivent des désinences. kurde, écrite par l'auteur de ces lignes.

Bikeve, bekevin, bikevin. Bike, bikin, bikin.

Ez dikevim	Ez dikim
Tu dikevi	Tu dikî
Ew dikeve	Ew dike
Em dikevin	Em dikin
Hon dikevin	Hon dikin
Ew dikevin	Ew dikin
Ez bikevim	Ez bikim
Tu bikevi	Tu bikî
Ew bikeve	Ew bike
Em bikevin	Em dikin
Hon bikevin	Hon bikin
Ew bikevin	Ew bikin
Ez dê bikevim	Ez dê bikin
Tu dê bikevi	Tu dê bikî
Ew dê bikeve	Ew dê bike
Em dê bikevin	Em dê bikin
Hon dê bikevin	Hon dê bikin
Ew dê bikevin	Ew dê bikin

Ce tableau de conjugaison a été publié pour la première fois, en 1933 dans une brochure, traitant entre autres de la langue

### ERRATA:

Dans le numéro 25, page 16, colonne 2 un nombre de lignes ont été omises par erreur. Il convient donc d'ajouter, après la ligne 44, le passage suivant:

Nous devons aussi donner quelques exemples des pronoms qui n'ont pas des formes spéciales de déclinaison et qui se déclinent d'après la règle générale.

ez mirovan dibînim	ez hemîyan dibînim
je vois les hommes	je vois tous
ez Memî dibînim	ez filanî dibînim
je vois Mem	je vois un Iel
ez Zînê dibînim	ez filanê dibînim
je vois Zin	je vois une telle

ez filanan dibînim  
je vois tels, telles

Tu kijanî (kijikî) dibîni Lequel vois-tu  
Tu kijanê (kijikê) dibîni Laquelle vois-tu  
Tu kijanan (kijikan) dibîni Lesquels vois-tu

D. A. BÉDIR-KHAN

